Şoreş Reşî



# DÎROKA KURDÊN KOÇBER

(Anatoliya Navîn, Xorasan, Sûriye, Rûsya)

-I-



# Dîroka Kurdên Koçber
(Anatoliya Navîn, Xorasan, Sûriye, Rûsya)

-I-

# Exil och flykting Kurdernas Historia
(Mellersta Anatolien, Khorasan, Syrien, Rysland)

**Şoreş Reşî**

**Navnîşan / Adress**
Înstîtuya Kurdî li Stockholmê / Kurdiska Institutet i Stockholm
Mogårdsvägen 13
143 43 Vårby Gård

**Telefon**
0046 8 38 81 12

**Çapa Yekem / Första Upplagan**
Tebax 2008 / Augusti 2008

**Rûpelsazî**
Xalidê Ezîz

**Wêneyên bergê**
Kesayetiyên Kurd

**E-mail**
kurdiskainstitutet@yahoo.se
soresresi@hotmail.com

**Çapxane / Tryckeri**
Berfîn Verlag
Köln

**ISBN**
91-976138-2-7
978-91-976138-2-8

©
Înstîtuya Kurdî li Stockholmê & Şoreş Reşî

# Dîroka Kurdên Koçber

(Anatoliya Navîn, Xorasan, Sûriye, Rûsya)

## Beş I

Şoreş Reşî

Instîtuya Kurdî li Stockholmê
1996
Kurdiska Institutet

# NAVEROK


Dêstpêka Mirovahiyê û Cografya ....................11
Kurdên Koçber ....................16
Di Serdema Kevir de Kurdistan ....................18
Koka Kurdan ....................22
Arî-Aryan-Arran ....................25
Navê Kurdan ....................32
Tofana Nûh ....................34
Xorrî ....................35
Mîtanî (Marîannî-Mêranî) ....................49
Gûtî (Kardû, Cudî, Gûtîyûm) ....................53
Hatî (Hîtît) ....................56
Mûşkî (Kurtî) ....................70
Sumer (Kengî) ....................72
Lûlû (Lûlûbuman, Lubîla) ....................78
Kassî (Kussî-Huza) ....................80
Asûr ....................81
Ûrartû (Bîa) ....................87
Med (-Medeîa/Arîan) û Pers (Artae) ....................91
Macar û Kurd (Saka-Îskît) ....................106
Tûr-Tûran û Sede-Sînsînko ....................125
Zelanî ....................131
Çend Bûyer ji dîroka Kurdan ya piştî Mîladê ....................133
Mazda-Zerdeştî, Êzdatî û Elewitî ....................136
Serdema Ereban ....................147
Serdema Ebbasîyan (749-1258) ....................157
Serhildanên Xariciyan ....................162
Têkîlîya Kurd û Vîkîngan ....................164
Xorasan Welatî Kê Ye? ....................169
Eba Muslimê Xorasanî ....................179
Mezhebên Cûda û Serhildanên di dû Eba Muslimê Xorasanî ....................183
Tirkmen-Oxûz ....................194
Selçûqî (1040-1157) ....................210
Êlên Tirkmenên li Afyonê ....................222
Têkçûna Selçûqiyan ....................227
Di dema Osmaniyan de Tirkmen/Oxûz ....................230
Şadî ....................234
Danîşmendiyan (1062/1080-1177/1178) ....................249
Eretna ....................251
Qeremanî/Avşar ....................254

Candariyan-Şêxbizin-Şivan-Qeren (1212-1478) ..............260
Dulqadiriyan-Zulqadiriyan (1339-1521) ..............261
Germîyan (1299-1429) (Avşar, Mirdêsî…) ..............268
Hikumeta Ezaz û Kîlîs (1180-1620) ..............275
Hikumeta Babiryan (Xelebirkan-Zarên Mildirêjan) ..............277
Moxol ..............278
Timûr ..............284
Jêder û Çavkanî ..............287

# PÊŞGOTIN

Xwendevanên hêja!

Di nivîsandina vê pirtûkê de min ji dû kaniyan sûd wergirt: Yek, rehmetîyê bavê min Osê Erîf bû; tim digot: "Em ji Xorasanê û ji Xerpetê hatin." Ew gotin bûn destpêka lêgerînên min. Ya duyemîn jî têkoşîna azadîxwaz bû. Vê şoreşê, pêşeng û lehengên wê di alî raman de bandoreke mezin li ser min kirin ku di hundirê min de vejînek mezin derket holê. Ew lehengana nebîyana ev pirtûka jî dernediket, ew şiyarbûn, bîr û bawerîyên mezin jî dernediketin û mumkun e îro em têketena xizmeta dîroka fermî... Ji bo wê spasiya wan herdû aliyan dikim û bejna xwe li ber wan ditewînim.

Ji bo wê jî ev berhemeka cûda ye, di beşa xwe de şoreşeke û bi perspektîvekî nû hatiyê nivîsîn! Hêvîdarim rê li ber niqaşên nû û dîrokê ji nû ve nivisandinê veke!

Yên ku vê nikaribin tahemûl bikin û xalîçê bin lingan hatî kişandî jî bi awayekî nû êrîşan bikin... Bila bizanin ku roj bi heriyê nayê sîwax kirin û êdî Kurd xwedî rabûrdû û pêşêroja xwe ne...

Min gelek hewl da ku agahiyan hîn berbiçavtir bikim, lê di vê rewşê de ji destê min weqes hat. Bê guman kemasî hene, lê di vî warî de gava yekemîn û ji bo xebatên pêş bingeheke. Hêvîdarim ku xort û keç û dîrokzanên Kurd wê hîn pêşdatir û nûjêntir bikin. Yekê jî ev karê zanko, înstîtû û komên pisporanan e. Ji bo kesekî derfetên xwe bi sînor re karekî giran e.

Ji bo ku Kurd bê dewlet in, heta niha li ser dîroka wan lêkolînên zanistiyê hatine kirin kêm in. Miletên serdest jî vê yekê firsend dihesibînin û li ser kelepûra me ya dîrokî rûdinên û dibêjin ya me ye... Hatina wan a Kurdistanê hîn hezar sal nebiyê, lê xwedî li dîroka deh hezar sal û Sûmer, Hatî, Oxûz û Turkman derdikeve û dike malê xwe...

Her ku ev lêkolîn kûr bû û min parçêbûn û trajêdiya Kurdan dît, kêfa min herimî. Kurd di pevajoyekî dîrokî gelek bi zahmet û dirêj re derbas bûne. Her ku mirov dikeve nav, fêr dibe, yan giriyên mirov tê yan jî mirov bi hêrs dikeve: ku çawa heta roja îro ew wiha girtî û berovajo hatiye zanîn û nivîsîn. Birastî mirov gelek şaşmayî dimîne ku ew xelka mecbûr bûyê serokên xwe yên serhildan kirî teslîmî nijatperestên misilman bike û pê canê xwe rizgar bike!... Gelek caran bira li hember bira derxistine û rûhiyeta wî gelî xirav kirine...

Gelo mirov dikare fêhm bike ku parçeyekî êlê li Xorasana Îranê, parçeyekî li Lazqîyê û parçeyek jî li Navênda Anatolê? Çawa dibe ku perçeyek ji êlê xwedî ola Zerdeştî, yek Elewî-Sersor, yek Şîa û yek jî Sunnî ye? Ew ji tirajediyê jî zêdetir e; şîne şîn! Şîna Kurda ye. Navê pirtûkê bibûya Şîna Kurdan belkî hîn rastir jî bibûya.

Ji vê parçebûnê re hêza min têrê nekir. Min nikarî herim her cîh û parçeyekî. Gelek sedemên wê hene: Maddî, dem, tirs, berpirsiyartiya bav bûnê û hwd... Min karî tenê du caran herim Xorasanê. Careka din jî pêwîst bû lê min nikarî. Carekê çûm Gîlanê. Bi taybetî ji bo çûna minê Xorasan gelek kesan got: "Mere! Dewletê te bikuje!" lê min got bizanim, ku ewê min bavêne paşiya wesayitan û heta vir bi erdê re kaşkine, êvaran di nav maran de rakevime û dê min bikujine jî ezê herim. Di serê min de tenê va lêkolîna temam kirin hebû û min çend caran ji xanima xwe re got: Eger ez wê temam nekim bimirim, çavên min ê vekirî herin! Bi rastî jî ez di gorê de rihet ne radizam û çavên min ê li paş bimana. Li Bakûrê Kurdistanê gor îmkanan li herêmên Kolik, Meletî û Semsûrê hinek lêkolîn di cîh de kirin. Li beşekî mezin ên gundên Anatoliya Navîn geriyam û ji kalan sûd wergirtim. Bi zor û zahmetiyan pirtûk dame tercûme kirin.

Di dîroka Kurd û Kurdistane ya dirêj de tenê ew pêkelokêke û heta pirtûkên ji vê baştir, berfirehtir û kûrtir derkevin ew ya gaveka li pêş e. Pêştebûna wê di îdeayên nû de ye: Heta îro digotin ku nivîsa kevirên Elegeşê ya Tirkan e! Heta ji destên min hat min li ber çavan raxist ku ew qala Kurdan dike...Dibêjin: Oxuz kalên Tirkan in... Lê min hewl da ku îspat bikim ew Kurdên li dervayî Welat in...Ji bo Saka, Îskît, Peçenek, Alan û yên din heta roja îro ew bi miletên din re girêdidan... Lê ew kalên Kurdên îro li dervayî Welat in...Her wekî din digotin: Xorasan warê Tirkan e; cara yekemîn Tirkan Anatol servegirtin; Germîyan, Qereman, Beranî û Pezgewr Tirk in û hwd gelek îdea yên bi vî rengî hene. Ev pirtûka di dest we de dîrokên li ser derawan hatî nivîsandin dihejîne û hewl dide ku vê yekê îspat bike. Di nivîsandinê de bi serketim an na ez nizanim. Eger bi ser neketibe kêmasiya min e. Lewra li ber min zahmetiya ziman jî hebû.


Li dij her astengîyên derketin pêş min va pirtûka bi zimanê xwe kurdî nivîsand. Ev bi serê xwe serhildana hezar salan a li dijî dagirkeran e... Belê ew em kuştin, koçber kirin, xwestin asîmîle bikin, lê biser neketin; ev jî bersiveka hezar salan e û parçeyek ji berxwedana Kurdên Koçber e... Min xwest pirtûkxana Kurd pirtûkeka nû qezenc bike; xortên Kurd dîroka xwe bizanin û serê wan bilind bibe. Berî her tiştî Kurd bigihêjin zanyariyeka gîştî û hevûdû baştir fêhm bikin; paşê jî min xwest bibim bersiva dagirkeran û penûsên dîrok berovejo kirine...

# Dîroka Kurdên Koçber
(Anatoliya Navîn, Xorasan, Sûriye, Rûsya)

## Destpêka Mirovahiyê û Cografya

Gor zanîna îro, 6 milyon sal berê mirov ji çar pêyan derbasî jiyana du pêyan (Australopithecus-Ece Homo) bûne.[198] Yanê mirov 6 milyon sal berê rabûna ser piyan û hû kirine ku mîna îro birê herin. Gor agahiyên nû tê gotin ku evê biye 8 milyon sal û mumkun e ku va zanîna rojeka din were guhartin bibe 10 milyon yan jî hîn zêde. Ji ber vê yekê dîroka kevne her tim di nava guhartinekê de ye.

Tê îddea kirin ku dîroka mirovahiyê cara yekemîn, ji 6 miljon sal heta milyonek sal BÎ bi giştî li rojhilatê Afrîka, ji Hadara Etiyopya bigre heta Taung a Başûrê Afrîqa, bi taybetî jî li Kenya (Lohogam) û Etiyopya (Hadar) yê destpê dike. Du milyon nîv sal BÎ mirov (Homo Habîlîs) bi komên çûk li dora gol û keviyên rûbaran jiyan derbas dikir. Ji 3,4 miljon salan vir de jî mirovan di alî girbûna mêjî û laş de jî ferqeka mezin peyda kir. Yanî 3,4 milyon sal BÎ hecma mêjiyê mirov 450 cm kûp bû, di 2,5 milyon salên BÎ de jî ew dibe 500 cm kûp û îro jî 1500 cm kûp e.[198] Di heman pêvajoyê de îskeletê mirovan jî tê guhartin. Di destpêka de îskeletê mirovan wek îskeletê gorîla bû û piştre hêdî hêdî hate guhartin. Di hema pêvajoyê de germ û serma dunyaye jî tê guhartin ku hemû bihevre girêdayî û li ser hev bandorê çêdike. Tê zanîn ku mirovan cara yekemîn 100 000 sal berî îro, dest bi dengkirinê kirine û ramanên mîna roja îro pêş xistine.[199]




**Nexşa Belavbûna Mirovahiye**

Homo Erectus di navbera 1,8 milyon û 90.000 sal berê de, ji Koobî Fora-Kenya dest bi belavkirina berbi bakûr dike. Îhtîmalekê mezine, ku mirovahiyê ji ber sedema zêdebûna nifûsê, kêmbûna avê û hişkbûnê, berê xwe de welatên jor û dest bi belavbûnê kir. Li bakûrê Afrîka bûn du şeq: Yek, berbi Cezayîr û Ewrûpa (Spanya); yek jî berbi Rojhilata Navîn û Çîn çû. Hinek zanyar jî dibêjin raste rast derbasî aliyê Erebîstan bûn û li Rojhilata Navîn dest bi belavbûne kirin. Vê demê bakûrê dinyayê di bin qeşayê de bû. Yanî: Bakûrê Amerîka-Kanada; Îngilîstan, Skandînavya, bakûrê Ewrûpa, Rûsya, Hindîstan, Çîn û Qefqasya di bin qêşe de bûn.[66] Di roja îro de ew dîtin hebekê hatiye guhartin, gor rojnama Swêdî SvD (2007.01.15/Îngrîd Persson) di kovara Sciense-2007 an de radigihînî 200 hezar sal berê mirov li Afrîka hebûne. Ji wir di navbera 50-60 000 salan berê dest bi belavbûne dikin. Nêzîkî 40.000 salan berê jî ewe ji dora Îran, Pakîstan, Hindîstanê li dinyayê belav bûne. Lêkolîner ji kolînên li dora çemê Don gihîştine vê encamê. Mirov dikare bibêje ku ve demê li bakûrê Ewrûpa, Asya qeşa hebû û jiyan tunebû. Li başûrê dinyayê jî ji ber germî, hişkî û pirbûna nufusê, gelan berê xwe da navenda dunyayê. Jixwe piraniya şaristaniyan jî li wir destpêdikin. Wekî Çîn, Hindîstan, Kurdistan, Mezopotamya, Derya Spî û Başûrê Ewrûpa. Bicîhbûn, çandinî, ajal kedîkirin, ol, nivîs û hwd li wê xetî derdikeve holê. Ji ber vê, ji beşa li ser welatê me re dibêjin **"Nîvhîva bi bereket/heyî"**.

Piraniya pisporan hemfikir in, ku dema Neolîtîk (bi cîhbûn, çandinî û kedî kirin) cara ewil li xaka Nîvhîva bi heyî de destpêkir; ji ber avûhewa û xaka baş nîv hîva bi heyî, ji Mezopotamya heta Dîlok, Deşta Amîkê û Çûkûrovayê pêk dihat.[14] Çend sedsal berî niha ew şaristanî pêk hatiye, lihevhatinek nîne, lê gor texmînî ji ya li başûrê Ewrûpa kevntir e. Li Ewrûpa, di şikeftên Vallonet-Fransa de hate îspatkirin ku mirov 900.000 sal BÎ li wir bi cîhbûne. Dîsa 300.000 sal berê li Moral û Ambona- Îspanya mirovên bi cîh bûnî hatine tespîtkirin.[198] Birêz Ocalan jî dibêje: Civaka Neolîtîk cara yekemîn li hundur û dervayê çeperên çiyarêzên Toros-Zagros de 12.000 sal BÎ derket. Li cîhên nêzîkî avê jî bi pêşket. Sedema vê; kultura heywan û giya ji bo kedî kirin û rişandinê mûsait bû. Baranên mîna avdayinekî tabîî hebû. Di dîrokê de şoreşa herî mêzin bicîhbûna mirovan e, ku li Çemê Hallanê-Batman, Çemê Kotê yê Erxanî û li Rihayê di gelêk girên biçûk de 11.000 sal BÎ pêk hatiye. Tiştekî dinî îspat bûyî jî eve, ku kaniya zimanê Hint-Ewrûpayê, esas hewzeya bakûrê Diclê û Firat e.[75] Îddeayên li ser zimanê Hind-Ewrûpa ji alî lêkolînerên Nyzeland Rûssell Gray û Qûentîn Antkînson ê ji Unîversîta Auckland jî tenê pejirandin. Di govara zanistî ya "Nature"-2003.11.27 an de dinivîsînin, ku zimanê Îndo-Ewrûpa koka xwe ji 9000 salan berê ji Anatolê digire. Wana 87 zimanên Îndo-Ewrûpa analîz kirine; bi alîkariya 200 peyvên di hemû zimanan de heyî, gihîştine wê encamê ku bakûrê Kurdistan dayika zimanê Îndo-Ewrûpî ye. Bi dîtina min Kurdistan, ji destpêka dîrokê de biye goristana şaristaniya kalên Kurdan; ew yeka di bandora zimanê kurdî yê li ser zimanê dinyayê, navên

cografîkên herêmî yên bi kurdî (wek Ararat), bandora ola Kurdan yê li ser olên dinyayê û bi ser weqas împaratoriyên zilm li Kurdan kirî de jî, ne helandina Kurdan encamên ew şaristaniya mezin e... Di demên pêş de ewê derkeve holê, lê niha ew derfet zêde nîne.

Tê gotin ku bi guhertina hewa, helandina qeşa û bi barana pir re di alî heywan û heşinayî yê de gelek pêşketin çêbûne. Ji ber vê gelên bi nêçîrê debara xwe dikirin li cîhên xwe sekinîn û zêde belav nebûn. Bi taybetî jî li: Başûrê rojavayê Asya, devera çiyayî ya li Filîstîn, Kommagene, Anatoli û Zagrosan zêdebûna baranê ya berbiçav û guhartina hewayê, bû faktorekî ku xwezayê; daristan, ajal zêde kirin. Gor zanîna îro ew guhartinan li derdora 13.000 salan BÎ pêk hatiye. Bi ser vê heyiyê de, êdî çêkirina gundan û bicîh bûn jî dest pêdike. Ew jî dorê salên 12.000 BÎ ye. Ew bi serê xwe di dîroka mirovahiyê de şoreşek bû û piştî wê jî pêşketin hîn zûtir bûn. Ji 10.000 sal BÎ bi şûnde, li Sûriyê û Filîstîne gundên ji xaniyên qilot (gilover) çêbûn; ew xaniyên yekemîn tenê hesibandin.[198] Pêwîste mirov Kurdistanê jî li vê zêde bike, lewra kolanên tên kirin vê yekê didin xuyakirin û yekê jî hîn wekî tê xwestin kolandin pêk nehatine. Taybetî jî dewletên desthilatdar ji kolanên têkiliya wan bi Kurdan re bê îspatkirin ditirsin. Mînaka wê herî berbiçav, bendava Ilisuya (Germava) li Heskîfê ye... Ev yeka ji alî M. Akar ve ji bo Semsûrê tê gotin: Li herêma me, mirov 12.000 sal BÎ derbasî jiyana malan bûn. Malên qilotikê yek odeyî çêkirin û şikeftên Palanî wek xanî bi kar dianîn.[85] Xaniyên li Haranê ne ku ji wan re "Konik" tê gotin jî dişibînin vana.[85] Bi baweriya min piranî li dora çemên Nil, Dicle, Firat û Hindûş ev gundana çêbûn. Şaristaniya mirovahiyên yekemîn li wan deran ava bûn. Bajar, gund çêbûn, rişandin pêk hat, alav hatin çêkirin. Li Çatal Hoyukê di 6500 sal BÎ gund çêbûn û ev malên li wir hatinî çêkirin bi yên Anatoliya Navîn ve pir nêzîkî hev in. Li Semsûrê (Perre/Pirîn) alavên malan yên ji keviran 150-100 sal BÎ çêbûnî di şikeftên de hatin dîtin.[85] Ew jî yek mînake ku Kurdistan yek ji cîhê niştecîhbûna mirovahiyê yekemîn e.

Hinek nûser heykelên kevne li Misir bi şaristaniya Kurdan ve girêdidin. Gelo Kurd berî bên cîhê niha li Misir man û li wir şaristaniyek avakirin û piştre derbasî bakûr bûn? Sfenks-heykel (li Qehîrê) di serdema Şêr de, di navbera salên 10970-8810 BÎ de hatiye çêkirin û ji çandeka pêşketî (Kurd-Ş.R) ya berê li Misirê jiyaye ma ye. Ew mîmariya hanê ji mîmariyên ji wê bi şûnda hatî hemûyan pêşvatir e. Têkiliya wê çandê bi yên li Çatalhoyuk û Kurdistanê ve heye. Îhtîmaleka pir mezine, ku Kurd ji vê deverê (Misir) ber bi bakûr belav bûn.[159-409] Nivîskar di vir de îşaret pê dike ku Kurd berê li wir xwedî şaristanî bûne, piştre bi afatên xwezayî û gor baweriya wê demê bi cezayê xwedê ew ji wir derketine û ber bi bakûr hilkişîne. Mirov dikare di vir de mînaka Xwedayê Misrê yê bi navê "Ra" bîne bîra xwendevanan. Ku, navê Xwedakî wiha girîng îro jî Kurd ji bo rojê bi kar tînin û pîrozbûna rojê ya nava Kurdan tê zanîn. Li Anatoliya Navîn Kurd hîna jî ji rojê re dibêjin re/ro. Di alî hinek kevneşopiyan de jî Misrî û Kurd wek hev in. Wek mînak: Xwedayên Misriyan 12 heb in

û êlên Kurdên li Anatolê jî wek 12 tên parve kirin. Dîsa hinek edetên li ser eznîlixiyê/şînê (rû berdan) û rola ga yê di nava civakê de hinek ji wan in. Ew kevneşopiyana ne nû ne, divê ji demên kevn ve mabin û ne dûre ku dema nivîskar qal dike be.



**Bajarê bin erdê**

Di çirokên kevn de tê gotin: Însanê ku Xwedayê rojê Re (Ra) gelêk kal didîtinî, ew ji holê rakirin. Çîrok wiha ye: "Bavê Ra derbasî cîhê wî bû. Wî agir û tîrên ku laşê dijmin qûl dikî û ji holê radikî avêt (volkan), dijminên nêzîk dibin qewirandin û laşê wan şewitand..." Ra bane Xwedayê erdê Geb kir û jê re got: "Ronahiya te ew marên ketine qûlan ma derxe. Va dixwaze pê îşaret bike, ku ewên reviyabûn ser çiyan û ketibûn şikeftan derxe... Tê ve watê ku ew însanên pişta xwe danî Ra êdî li hinek navendan nayêne xwestin (Misir). Van însanên mîna mar yên di çîrokê de derbas dibin, dibû ku mirovên li Kapadokya (Kûyûlar-6500 sal BÎ) û mirovên li salên 9500-9000 BÎ de çûnî çiyayên Kurdistanê û wira ji xwe re war girtinî ye mîna maran bin? Li Misir zireata kevnar di sala 10500 BÎ de ji nişkeva qût bû û piştî 1000-1500 salan BÎ de li Kurdistanê dîsa derket holê. Va jî têkiliya ve goçê nîşan dide. Yanê, mirov ji ber volkanan û agirê ji ezman dibarî reviyan û baweriya agir jî ji bîr nekirin. Vê yekê li ser baweriyên Asya Biçûk û nêzîk bandorêk çêkir û baweriyên li wir parçeyek ji wê çande ne. Di nava wan de proto-Îbranî û Hînt-Îran jî hebû.(159-419)

Dîsa di dîroka mirovahiyê de bûyera wek şoreşekê girîng jî 10.000 sal BÎ mirovan dest bi xwedîkirina ajalan kirin bû. Bê guman ji her alî de ew pêşketineka mezin e. Ji alî zêde kirina: ji şîr, goşt, postê wan; ji firotina wan

îstîfade kirin û ji alî bi cîhbûna mirovan de roleka girîng lîst. Bi vê re girêdayî zîreat jî bi pêşket. Tê zanîn, ku 8500 sal BÎ li wir çandinî hatiye kirin.[199] Bi taybetî jî cîhê ku îro Kurd lê belav bûnî, Îsraîl, dora Nîl, Yewnanîstan û xeta perava başûrê Ewrûpa cîhên ku cara yekemîn çandinî hatiye kirine. Li Ewrûpa ew yeka BÎ 2000 salan de pêk tê ku ferqeka mezine û di alî afirandina şaristaniyê de jî pêşveçûneke mezin e.



**Kûyûlar**

Li Kurdistanê, hate îspatkirin ku mirovên 12.000 sal BÎ derbasî jiyana niştecîhî û çandinê bûne. Kolanen li Çatal Hoyûkê hatî kirin didine îspatkirin, ku mirovan 9.000 sal BÎ xwarinê xwe goşt bûye. Ji sedî 90 ji pezên kedî peyda dikirine û şîr, mast û penêrî peyda dikirine. Mêr 1.70 cm, jin jî 1,55 cm dirêj bûne; mêr 32, jin jî 29 salan dijiyane. Eger em vana hemûyan bigînin ba hev, derdikeve holê, ku xwedî kirina pez û çanda pez li cem Kurda ji her miletekî zedetirê; pir kevne û bi kemasî 15.000 sal in berdewam dike..

Li Tepe Serab-Kirmanşahê kolanên hatî kirin de gundekî 10.000 sal BÎ hatî avakirin peyda bû. Malên gund di bin erdê de ne; banî ji bi daran û xaliyê hatiye porkirin. Di malan de genim, ceh û alavên ku vana dikî erdê hatin dîtin [4]. Ku ew forma xaniyan bi "**Tolik**" ê li Anatoliya Navînê berê bikar dihatî ve wek hev in; ew yeka him ji alî şekil ve him jî alî termê ve nêzîkî hev in. Li Rihayê ew Konikê li Anatoliya Navîn jî Tolik e. Ti guman tune ku bingehekî wana yî dîrokî û civakî hevbeşî heye. Li ser xaniyê bi vî rengî li Anatolê bûyereka trajîk ê li gundê Tirko-Haymana pêk hatî tê qalkirin. Mezine me digotin: "Dema koçberiyê, gundê Bûldix (Reşî) li cîhê gundê Tirko îro bûye, mala B.... ya ji Reşiyan, ji ber deyn vê malikê ji xwe re wek xulam bi kar dianiye. Êvarekê malê di tolika xwe de ramedî ye, keçika malikê mezin jê wek berbûk (berbûç) çûye daweteka gund. Bi şev baranê hûr hûr heta seda barî ye. Xaliya li ser tolikê şilbûyî yê giran dibe û stûna bin tolikê dişkêne. Di bin de heft kes dimirin. Sibe keçik ji dawetê tê ku mala bavê ya di bin tolikê de mirine. Dest bi şinê dike û dibeje: 'Malê li we here li neviyên we nere!.." Îro jî ew heft goran (mezelan) li gundê Xabûra li keviya rê ne. Piştî demeka dirêj, di avakirina xaniyê di vê formatê de jî êdî tê guhartin şiklekî nû derdikeve holê, ku hina jî ew sîstema li gelek deran berdewam e. Li Kurdistanê malê bi vî rengî 7.000 sal BÎ tên dîtin ku ewê: çar koşe, binî bi kevir, serî bi kerpîç hatine avakirin û ewê hatiye tespît kirin.

## Kurdên Koçber

Di destpêka vê xebatê de her çiqas armanca min tenê dîroka Kurdên Anatoliya Navîn bûn jî, her ku xebat kûr bû min dît ku ew armanceka nîvçe ye. Yanî mirov nikare tenê xwe bi Kurdên li Anatoliya Navîn bi sînor bike. Lewra birayên wan ên ku li cografyayên din dijîn jî pêwîst bû bên nivîsandin. Ew cografya jî pir fireh e: Ji Hindîstan bigre heta Herat, Belûcîstan, Xorasan, dora Derya Kesk, Qefqasya, Erzirûm, Qers, Dêrsîm, Semsûr, Meletî, Riha, Dîlok, Mereş, Helep, Lazqiye direj dibe. Bê guman Anatoliya Navîn, yanî: Kurdên Enqere, Kirşehîr, Qayserî, Aksaray, Qonya, Yûnak, Polatli, Eskîşehîr, Haymana yê dikevin nav û Kurdên li dora şerîta Derya Reş û yen li Adapazari jî dikevin nava lêkolîna me. Ev Kurd xwedî dîrokeka hevbeş in. Ji bo vê jî vana wek "Kurdên Dervayê Welat" yan jî "Kurdên Koçber" bi nav dikim. Ji bo wê, dema min Kurdên Koçber nivîsîn, mebesta min ewe; ku Kurdên di nava wê cografya yê de bên fêhm kirin. Ji ber ku dîroka wan kêm-zêde, nezik û dûr bi hevra girêdayî ye û ji hev veqetiyane, tevlî hevbûne...Heta mirov dikare bibêje; ku Kurdên îro kurdiya xwe xirav bûne-şikeştine yan jî nikarin xwe bi zimanê dayik baş îfade bikin, dikevin nava vê çerçova cografî ya min tarîf kirî...


## BÎ Hejmara Mirovan

Gor tespîta ku zanyarên îro kirî, 4.000 sal BÎ li ser cografya Kurdistanê 5 milyon; li Çîn 3,4 milyon, li Hindîstanê jî di navbera 400-600 hezar mirov dijiyane. Eger di navbera Çîn û Kurdistan de muqayesek bê kirin, te dîtin ku mirovên li Kurdistanê zo bi zo ji yên Çîn zêdetirin. Heta li Hindîstan mirov pir kêm in. Dîsa gor heman zanyaran hejmara mirovan li destpêka mîladê wiha ye: Cografya Kurdistanê îro nêzîkî 20-24 milyon; li Hindîstanê 44 milyon li Çîn jî nêzîkî 64 milyon dijî ye. Gor heman jêderê di navbera 8.000-6.500 sal BÎ herêma herî zêde mirov lê dijiyayî dîsa Kurdistan, Misir û Anatol e. Di navbera 6000-4000 sal BÎ de jî xelk li Balkan, Ûkranya, navenda Ewrûpa belav dibe. Di 4500 sal BÎ de jî li Yêmen xelk tê dîtin.[66-39] Çima li Hindîstan û Çîn mirovatî weqas zêde û li Kurdistanê jî kêm bû? Eger Çîn îro ji milyarekî zêdetir e diviyabû li Kurdistanê îro 3-4 milyar hebûyana... Sedema wê çi bû?

1- Pirbûna nifûsê û şerê nav mirovan.
2- Parçebûna komên mezin (Arran-Hînd-Ewrûpa)
3-Xweza ji bo jiyana mirovan li herêmê din baştir bû.
4- Hatina netewên dinê wek Ereban.
5- Tofanên xwezayî.


Mirov dikare gelek sedemên din jî lê zêde bike. Bê guman mirovên li wê cografyayê hemû ne Kurd bûn û koma Arranê wê demê hîna jî tevhev bûn û serhejmara wan jî ne hindik bû. Heta mirov dikare vê yekê jî bibêje, ku Kurdên

weqas komkujî, parçebûn û belav bûn di serî re derbasbûnî eger dîsa jî li ser piyan mane û serhejmara wan îro jî zêde ye xerê, sedema vê yekê yek jî ew bû, ku serhejmara wanê dîroka kevn hîn zêde bû. Bi qêtîn û helandina ew jê man. Yanê gelek gelên îro cûda xuya dikin ji Kurdan veqetîn. Ew yeka jî mezinbûn û bi kok-binatiya vî netewî nîşan dide. Yekê jî eger ew sedsalên dawî dewleteka serbixwe avabikirana îro dikaribû serhejmara wan du caran ji ya îro zêdetir bibûya.



**Nifûsa Mirovan 4000 BÎ**

Li ser wê dîtina profoserê Unîversîta Ûmeo Lars Bacmanê swêdî di lêkolînê xwe de encamên balkêş derdixe holê: Lêkolîna li ser DNA yê 1007 kesên ku niha li Ewrûpa dijîn hatî kirin de derket holê, ku ji sedî 80 kesan kromozonê xwe ji Rojhilata Navîn tên. Yanî ji 100 kesan 80 kesî bi eslê xwe yî ji kesên li Rojhilata Navîn nêçîrvanî kirî hatiye. Profesor vana dike du beş: Yekê, 40.000 sal berê ji navenda Asya hatine bakûrê Fransa. Ya duyemîn jî, 25.000 sal berê ji Kurdistanê çûne Balkanan. Ji sedî 20 kes jê 9000 sal berê ji Rojhilata Navîn hatine (DN-2001 Asiater första vesteuroperna). Ew lêkolîna jî îddeayên li ser serhejmara belav bûyî û kaniya zimanê Arranî dide destek kirin.




Mirovên yekemîn li Ewrûpa


## Di Serdema Kevir de Kurdistan

Kurd netewa li Kurdistan, Mezopotamya û Rojhilata Navîn ya herî kevn e; lê mixabin heta îro ji bo ku nebiye hêzeka siyasî ya mezin, ekonomîk, eskerî û desthiladarê li ser axa xwe, li cîhane cîhê pêwîst negirt. Heta roja îro kolan, lêkolîn û belgeyên ku şaristaniya vî miletî bi pêşxistî ye peyda nebûne. Yên ku hatinî derxistin jî ji alemê re eşkere nekirine. Ji her aliyekî ve êrîş û dizî li ser çand û şaristaniya wî netewî heye; lê hêviya me ji vir pêde zêdeye û di serî de xortên Kurd û alimên bê alî ne, ve ronehiya Kurdan derxin holê. Yek ji wan lêkolînerên hêja jî birêz Andrew Collînsê ku ji pirtûka Kurdan yê pîroz Avesta wiha radigihîne: " Şansê ku Ahûra Mazda, navdar û rû xweşikê Yîma hîşyar kir, hîn ew serma dibirî nehatibûn. Ahûra Mazda bi wî re got: Di bin erdê de "War" e kî çêke û ma bi çar aliyan de here. Ji her curê ajalên mezin û biçûk, ji manga, ji heywanên bêr/bar (ker,hesp), ji însanan, kûçikan, çivîkan/mîrişkan û ji arê vêdikevî bîne û li War bi cîh bike!



**War- Derî**

Got: di nava wî Warî de ava dixûşî çêke. Li keviya avê; çêre, daran û çahîrê birşîne (biçîne) û çivîkan ewran lê bi cîh bike. Li wir ji şitlên hemû meywe û sebzeyan dikanî birşinî (biçîne). Ew hemû heywan û nesne dema ku li nava wî War î de man, şivanê dilxweş re hat gotin ku ew tu caran rizyayî nabin. Piştî çend zikan (nifşan) ew serma hanê çû û Yîma însan û heywanên Îranê ji wir derxistin û dîsan bir dinyayê. Bi vî awî dunya di saya Yîma yê kurê kral Tahmuras de rizgar bû. Va çîroka Yîma ji kevneşopiya Zerdeşt û di lîtaretûra Avesta de hatiye gotin, ku mûhtemelen heta sedsala VI an BÎ te re. Di vir de cûdahî di navbera vê û tofana Nûh de heye. Vekirî tê gotin ku bajarekî bin erd, yanê War ê kî çêke. Kêm îtîraz hene ku va serma ye di navbera salên 15.000 û 8.500 an de pêk hatiye. Ahûra Mazda ji kralê rûxweşik re dibêje taxa jor neh kolan, di a navîn de şeş kolan, di ya bin de jî sê kolanan çêke. Û gotiye: taxê jor 1000; li ya navîn 600 li a binî jî 300 jin û mêran bi cîh bike. Tê wata 3800 însan. Di tekstê de cîhê wî War î mixabin tune! Belgeyên li Çatalhoyukê derketine, îspat dike ku kal û bavên (Kurdan) wê çandê li wir jiyane.(159-358)




**War- Newşehîr**

Nivîskar dixwaze îspat bike ku di serdema volkanîk de sermayek hatiye û kralê Kurdan bi vî awî li Kûyûlar a Kapadokya ew xaniyên bin erd çêkirine û bi vî awî ji serma û lehiya volkanîk rizgar bûne. Eger ew gotinên kevn ji bo Kurdan wek "Xelkê Şikeftan, gelê çiyan" jî bên bîra mirov ev yeka hîn zêde were fêhm kirin.

Behzad Xoşhalî radigihîne, ku Dr. Siklî di sala 1951 an de berhemên şaristaniyê di şikefta 'Şaneder' de peyda kirin. Ew şikeft dikeve başûrê çiyayê 'Biradost' ku nêzîkî Zê ya Mezin e û her wisa nêzîkî bajarê Rewandûzê ye. Dr. Rolf Siklî di kolana şikeftê de çar katên binerd dîtin ku kûrahiya wan 45 pê ne û ji katên jorîn bo yê jêrîn bi vî rengî ne:

**Qata Çaran:** Beşa herî jêrîn e û kûrahiya wê 25 pê ne ku hin agirdanek û xweliya tevî hestiyan tê de heye. Ew jî nîşane ya vê yekê ye ku mirovên wê serdemê agir keşf kirine û bi kar anîne. Aletên din ên wekî tevr, rende, alavên kulkirinê û hestiyên mirovên 'Neandertal' jî li wir bi dest ketine. Kevnahî û dîroka wê digihîje beriya 70 hezar salan.

**Qata Sêyem:** Di vê qata şikefta Şaneder de berhemek ji kevirên hesteyên vê serdemê wekî tevir û kevirê tûj jî tên dîtin û tu nîşaneyek ku mirovê destpêkê çandinî kirine nayê dîtin. Dîroka wê vedigere ser Serdema Kevirîn a Nû. Mêjûya vê katê 30.000 sal e û bi xwe jî 'Hunera Biradost' e.

**Qata Duyem:** Di vê qatê de, berhemên ji Serdema Kevirîn a Navîn wekî kêr, rende û gurzên kevirîn tenê dîtin. Lê berhemên vê serdemê ne tenê yên sikefta Şaneder in belkî li şikefta Zerzî ya nêzîkî bajarê Silêmaniyê û şikefta Hezermêrd ku dikeve 15 km başûrê Silêmaniyê jî hin berhemên vê serdemê hatine dîtin. Her wiha di sala 1954 –1955 an de ji aliyê Prof. Biraydûd ve li şikefta 'Balî Kure' ku dikeve 15 km rojhilatê Çemçemalê û şikefta 'Kîwaniyan' û 'Badak' ku dikevin başûrê rojavayê Rewandûzê jî hin berhem hatine dîtin. Hin berhemên vê serdemê li şikefta Bîstûn jî hatine dîtin. Her wisa li şikefta Kurîn ku dikeve bin desthilatiya Tirkiyê jî hin berhem hatine dîtin.

**Qata Yekem:** Pir berhem di vê qatê de hatine dîtin û hêza mirovên vê serdemê di afirandin û çêkirina alavên kevirîn ên rengareng û xweşik de derdikeve holê.



**Kûyûlar**

Hatiye dîtin ku 6500 sal BÎ li Yarmo (binê Zagrosan û sînora başûrê Kurdistanê) 25 mal hebûne û 150 mirov lê jiyane. Ev mirovanan bi xwarina goştê beraz, mî, û bizinan dijiyane. Koçberiya yekemîn ê li vî gundî di 6000 BÎ de dest pêkiriye. Vê demê van gundiyana têkiliyê xwe bi Şanidar, Palegawre, Kirmanşah re hebûne û ji wan hîn moderntir bûne. Vê demê ji malê xwe ra bi heriyê ocax (kuçikan-tifikan), kervê aşa û sepêtê çêdikirine. Tiştê din î balkêş jî ewe ku vana tekiliyên xwe bi kesên li Çayonu (Erxanî) dijîn re jî hebûne. Kesên li Çayonu ye jî ceh dirşandine (tov dikirine), sifir bi kar dianîn, tîtikê sûsê çêkirine û herdû kultur berdewamiya hev in.[10] Ew alavên derketinî didin îspat kirin ku ew çanda yek e, dîsa gor pelgeyên dinê hatinî bi destxistin têkilî û nêzîkbûna çandên li Kafqasya, Loristan û Helebê heye ku ew jî belavbûna Kurdan ya BÎ dide nîşandan.

## Koka Kurdan

Li ser kok û gera Kurdan yê li ser rûyê erdê gelek teorî û dîtin hene ku wana jî hev gelek dûr in. Rehmetî Cemîl Paşa dibêje: Kurd, ji nijadê endo-ewropî ne. 10 hezar sal BÎ ji Skandînavya bi sedemeka em nizanin koç kirine hin deverên li Asya û Ewrûpa servegirtin. Kurd gava gihîştin Ararat bûn du tîş: Kûtî û Kurtî.[9-27] Kesên wek Walter Scheefuss jî dibêjin: Ji bakûrê Almanya hatin; ji alî zanistî, xwezayî û mantiq ve pûç derdikeve. Hinek kesên mîna: C. Burney jî dibêjin ji Ûkranya û başûrê Rûsya hatin[4] jî mirov dikare li ser zêde niqaş bike û girêdayî qala kîjan katê têye kirin e. Li ser wê emê di rûpelên pêş de bi taybetî li ser dema Saka-Îskîtan de rawestin. Berovajî vê, gelek nîşane hene ku mirovahiyê ji Rojhilata Navîn, Asya Navîn û Başûrê Rûsya belav bûye. Lewra, li jor jî me qal kir, ku dema jiyan li Kurdistan geş bû, li bakûrê Ewrûpa û Skandînavya yê di binê qeşa de bû. Ji bo wê ne mumkun e ku Kurd ji Skandînavya hatibin. Yekê jî tu tevgerên bi vî rengî nehatine tespît kirin û di beşa nifûsê de jî min destnîşan kir ku piraniya mirovahiyê li xeta Çîn, Kurdistan û Fransa de belav bûne.

Dîtina din ê li ser koka Kurda jî ji alî Viladîmîr Mînorsky ve tê îddea kirin ku dibêje: Kurd ji Medya Biçûk a li Atropatanê (Ezerbeycan), li sala 700 BÎ belavbûn.[12] Dîtineka bi kêmasî ye. Lewra Kurd miletekî mezin in, beşekî ji wî netewî mezin î ku pêşengiya wan kirî, yan jî mora xwe li dîrokê xistî û ketî ser nivîs û belgayan ji wir belav bûye. Ew raste lê ne hemû Kurd in. Yekê jî mirov dikare bipirse gelo Kurd berî vê demê li kuderê bûn? Lê hema nivîskar wexta li ser zimanê kurdî şirove dike, bi xwe re dikeve nav nakokiyê: Di bingehê kurdî de zimanê civateka girîng heye. **Karektera xwe giştî, berî Kurd herin ser çiya hatiye avakirin.**[12] Bi rastî ev niqteka gelek gelek girîng e û dide îspatkirin, ku Kurd milete herêmê ne û ji ber êrîşan mecbûrê çiyayan bûne. Bêrî wan êrîşên dijwar jî xelk li hîva bi bereket niştecîh bû.

Prof. Marr jî îddea dike ku: "Karduk (Kurd) û K'art (Gurcî) di destpêka dîrokê de yek bûn. Kurd niştecîhê çiyayên Asya Biçûk ê (Anatol) eslî ne û zimanê kurdî li wir ava bû. Kurd bi Xaldî, Gurcî û Ermeniyan ve meriyê hev in û zimanê wan deng dikirin; paşê zimanê Îranî qebûl kirin[2-41]. Li gor kevalên kilsê yên Sumerî yên 2000 sal BÎ, welatekî bi navê Kar-da-ka hebu ewê li kêleka Gola Wanê û li keleka welatê Xelkê avê bû.[2]

Lehman Haupt dibêje: X/Haldî mihacirên ji rojava hatine.[142-2] Ji bo ku Ermenan bi Xaldiyan ve wek hev dibîne wiha dinivîse. Bi dîtina min ne yek in. E. Mayer jî dibêje: niqta wanê ku jê derbasî tevgerê bûnî nava Çemê Aras e. Bi hatina (sedsala VII) Ermeniyan re Xaldî berbi çiyan belav bûn.[142-2] Hinek nûser û jêder Xaldiyan wek Ermenî nîşan didin. Rast e, Ermeniyên ji rojava, ji dora çemê Tuna, yan jî bakûrê Yewnanîstanê hatine tê gotin, lê bi dîtina min eve bi Xaldiyan ve jihev cûda ne. Xaldî gelê bakûrê rojavayê Kurdistan in û bi hatina Ermenan re wan cîhên xwe terk kirin. Bê guman ew karê dîrokzanan e

lê ne dûre ku Xaldî kalên beşek ji Kurdên îro li Dervayê Welat bin. Bi taybet jî mirov dikare bibêje ku kalê Kurdên Celalî, yan jî Xelikî yên îro belav dijîn e. Gelek îşaret hene ku ew Kurdên Xelikî ne.

Hinek jêder îddea dikin ku Gurcî ji milêkî Xorriya ne. Ji kolanên li Gurcistanê hatinî kirin de, alavên ji 5-4.000 sal BÎ derketinî ye bi tiştên ji Derya Spî, Sûriye û Filistîn ê derketî ve hevdû digirine. Motîfên li Gurcistan û Loristanê 4000 BÎ derketinî jî gelek dişibînin hevdû. Gorî Gordon Childe ewana ji alî qebîleyên hov ên ku ji Gurcistanê hatinî ve hatine wan herêmana.[47] Gorê lêkolîna Aynûr Ozfiratê li ser bajarê Haranê de ewe vê tespîtê dike: 3000 sal BÎ kultura li Mersin, Ûrmiyê, bakûrê Sûriyê, Ras Şamra ye hevbeş biye.[54] Ew deverên cografîk yên ji hev dûr, di direjiya dîrokê de herdem bûne cîhê Kurdan. Bi dîtina min, sînorên cografîk ê Kurdan di dema BÎ de, ji Qefqasya û dora Derya Kesk heta Xelîca Îranê, ji wir jî heta Mersînê ye. Li rojava sînor zêde ne kifş in, lê ez di wê baweriyê de me ku beşekî Anatola mezin jî di navê de ye. Eger Kurdbûna Hîtîtan bê îspatkirin wê demê, Anatolû bi tevahî dikeve nava wan sînoran.

Di ansîklopediya Îslamê de tê gotin: ku Cyrtî-yan (Kurdên Îranî) çawa li rojavayê welatê Karduyan î kevn Zagrosan niştecîhbûn? Serkeftina Med û Îraniyan bû sedema cîh guhartina qewmên Îranî.[142-4] Raste milête Arran belav bû, lê bi ditina min belavbûna herî mezin di dema Ereb û Asûriyan de pêk hat. Kurdên ku ji welatê xwe derketinî bi serkeftina Medan re li cîhên xwe yên berê vegerîn. Bê guman belavbûna Meda jî roleka girîng di vê babetê de lîstiye. Heman jêder li ser belavbûna Asagartab jî disekine û dibêje navenda wan li Sîstanê bû; lê di dema Asûr de em vana li Medya; di dema Dara de jî em vana li zozanên Arbela yan Asûriyan dibînin. Dara, serokê Asagartaba yî bi navê Çîtrantahma li wî bajarî lidarxist. Di salên 220 û 171 ê BÎ de em eskerên Cyrtîî yen bi pere li Asya Biçûk, di şerên di navbera Roma, Selefkiyan û di nava kraltiyên Bergama de dibînin.[142-4]

Nêrîna min jî ewe ku Kurd gelê herêmê yî eslî, kevnare û ji tu deran nehatin. Di herikandina dîrokê de çûyin û hatin çêbiye, lê ti caran Kurdan demdirêj Kurdistan terk nekirine. Yên demdirêj manî Kurdên niha li Dervayê Welat in. Di sedsalên dawî de ew jî vegeriyane, lê dîsa hatine belav kirin. Dema mirov li Kurdistana îro mêzedike serhejmar bi piranî Kurd in. Kêmnetewê dinê di nav de jî pir kêm in. Ew kêmnetewan, dema êrîşên mîna yên Moxolan, ji bo ku xwe biparêzin yan jî dema Kurdistan ji alî artêşa wan ve hatiye dagirkirin ew li wir, di nava Kurdan de ma ne. Eger ne wiha biya Kurd ê çima biçin li çiya bi war bibin? Yanî gelê ji derve hatî û xwestî welatekî din dagir bike, ew ê yekemîn li cîhen bi heyî û ji bo jiyanê baş e bi war bibin. Kurd netewa Rojhilata Navîn ê bi kok e û ji şaristaniya dinyayê re gelek îstîfada wî çêbiye. Wekî hinek îddea dikin gelêkî dagirker biya, ew li çiya bi war nedibûn...Eger weqas bi bingeh û esîl nebiya çawa dikaribû li ber êrîşên Ereb, Asûr, Xelkê Golan, Moxol, Tirk, Bîzans û yên din li berxwe bida? Çawa karî li wê herêmê bijî? Eger

mirov li cografyayê binêre, miletên Arran bi serhev ve ne; zimanê wan hîna jî cîrane û li ser cografyayeka giştî ye; bi taybetî jî Kurd, gor weqas asîmîlebûn û bindestiyê hîna jî piştî Ereban miletê herêmê yê duyemîn mezin e... Eger Kurd wek Faris, Tirk û Ereban bi sedsalan dewlet bûyana û wek Ereban ola wan serdest biya îro nifûsa wan ê bibiya 200 milyon yan jî gelê herêmê yê herî mezin...Ti şik û guman tuneye ku Kurd gelê herêmê ne. Lê ji ber tevgerên siyasî û leşkeriyên mezin, beşek ji Kurdan jî cîh guhartine, ew rastiyeke. Bê guman nayê wê watê ku hemû Kurd di wê rewşê dabûn. Ew Kurdên ku cîh guhartinî û ji warên xwe barkirinî hîna jî bi piranî li dervayê sînorên Kurdistan in. Jixwe hesabê yên heliyanî nayê kirin. Emê di vê xebatê de hewl bidin ku vê yekê îspat bikin. Vê dîtine Dr. Frîtz jî piştgiriyê lê dike: Di çîrokên Kurdan de tiştek heye; em ji başûr hatin van herêmên çiyayî û zozanên vir. Di eslê xwe de Kurd gelê deştê ne, bi zora goçên hatinî mecbûrî çiya bûne...[8]

Heta sala 1983 an dihat zanîn, ku şaristaniya mirovahiyê ji Jerîcho (BÎ 4750) ya li başûre Mezopotamya dest pêkiriye; li Kurdistan û dunyayê hatiye belavkirin. Lê, kolanên li Zagrosan va têza pûç kirin. Zagros: Ciyê de û bavê Kurdan e. Cara yekemîn mirovatî li wir, ji şikeftan derket, kete mal û bajaran; dewlet hatin avakirin. Li dunyayê bajarê herî kevn li Zagrosan, yanî li Kurdistanê derketin û şaristaniya mirovahiyê li welatê Kurdan destpêkir. Kolanên li herêma Xotê Berçêmê ya ku giredayî navça Amedê Erxanî ye, bajarekî di navbera salên 7250-6750 BÎ hate dîtin. Yanî, ji Çatalhoyuk (BÎ 6500-5800) 750 sal; ji Jerîcho 2750 sal kevntir e.[5]



**Hatûşa**

Ew cîhê kevnare îspat dikinê ku Kurdistan di şaristaniya mirovahiyê de jî yek cihê herî kevn e. Di kolanên nêzîkî Samsat û keviyê çemê Firat, Grîtîlle û Hayaz-hoyukên 40 km li rojhilatî Meletî û li keviyê çemê Firat Caferhoyuk; nêzîkî Elezîzê Boytepe, nêzîkî navça Kovancilar, hoyuka Saraybahçe derkete

holê ku gîştik ji 7000 sal BÎ ma ne. Lê mixabin, çavê dijminatiya netewan reş bibin wa cîhe ku dîroka mirovahiyê û şariştaniyê ronî dikin di bin bendava Kebanê de dimînîn... Prof. Hauptman û hevalên wî di wê heremê de 140 bajarên kevnareyî tespît kirine û piraniya wan jî di bin avê de dimîne. Di nav wan bajaran de yên herî kevn Xotê Berçêmê û Nevala Çorî ya nêzîkî Samsatê ye. Ji bo Nevala Çorî Hauptman dibêje "Muhteşêm muhteşêm!" Ji ber ku, cara pêşî li vî bajarî du cûreyên genim, nîsk, hestiyê miyan, bizinan û berêzan û îbadetxane hatine dîtin. Va jî tê wata mirovan li wir çandiniyê kirine û ajelan kedî kirine.. Ji van bajaran jî kevntir, li Kurdistanê bajarekî din ê bi navê Hallan Çemî heye ku 10200 sal BÎ hate dîtin, lê hîn derbarê wî de tu agahdarî nîn in. Di van bajarên kevnare yên ku li Kurdistanê derketinî holê de hatiye tespîtkirin; ku di navbera bajarên Meletî, Mîdyat, Amed, Wan û heta Başûrê Mezopotamya rê hene. Taybetiyek din daye nîşankirin; ku di giştikan de çand û wekheviya jiyaneka hevbeş heye. A. Eren di pirtûka xwe bi navê 'Doxû Anatolû û Ûrartûlar' de dibêje: Ji destpêka qirna Kalkolîtîk (sifir-kevir: 6000-5000 BÎ) de, *ji Qefkasya bigre heta Meletî-Elezîz; ji bakûrê Sûriyê heta Gola Ûrmiyê, Şehrîzur û herêmeka pir fireh de çandeke hevbeş heye."* Va jî vekirî dide xuyakirin ku gelê li vê hereme dijiya, ji kok û binatekî bû û ew jî Kurd in. Va yeka jî pirsa Kurd ji ku hatin? dide bersivandin, ku qasî hişên mirov digejî Kurd yek ji gelê herêmêyî herî kevn in.

Piştî van dîtinan ev pirsa dikeve hişê mirov, gelo navê vî miletî wek Kurd derbas dibû an na? Bi qasî tê zanîn navê Kurd tam derbas nabe. Qala welatê Karduk, C/Kirdî û gelek navên din tê kirin lê bi dîtina min ew navana wê demê Kurd bi giştî temsîl nedikirin. Dibe ku ew navê hinek êl yan jî federasyon û yek ji zarava axivê Kurda bû. Gelek navên bi vî awayî cûda ye hene. Wek mînak: Arrî-Arran, Xorrî, Gûtî, Kusî, Mad û hwd.

## ARÎ - ARYAN - ARRAN

Berî hertiştî pêwîste mirov li ser peyva Arran raweste. Kesên Kurd bi hêsanî dikarin bibînin ku ew peyveka kurdî ye û ji bo ku navê xwe daye gelêk netewan ew jî îspateka li ser kevnbûna nijada Kurd e. Wek dayikekê yan jî wek kaniyeka ku dena-boyaxa xwe de ye kurahiya dîrokê. Ew jî nîşaneyeke ku kok, çand û şaristaniya netewa Kurd afirandî ye wek zêrekî bin axê ye, her ku tu bikolî ewa derkeve holê. Dîrokzan, gerok û lêkolîneran li ser vê peyvê çi gotine? Em li destpêke li vê yekê binêrin: Aran: Welatê gorîgehê (kurban).(103-93) Arînna: Xwedayê sereke yî Hîtîtan e, wata xwe bi zimanê Lûwî kanî ye.(103-103) Wek tê zanîn kanî teva nabe û her dem dizê, wata Xwedê jî ewe ku kesê her dem tiştan dide û diafirîne ye... Herodot dibêje Arî tê wata esaletê û bi Arya ve di hema watê de ye.(87) Çima gotiye tê wata asaletê? Ji ber ku ew nijada bi kok û binat bû; gelê herêmê yî kevn bû, xwedî şaristanî bû û gor yên di dûre hatinî bi esalet e, dema nivîskar ew pirtûka nivisî jî rewşa civakî ragihand û bo

vê got esalet e. "Arî" wek min gotî peyveka kurdî ye û ji agir tê. Ku ew jî forma kurdî yê kevn e.

Li ser peyva 'Arî' Şirova herî kevn mumkune ya bavê dîrokê Herodotos be; ew dema qala gelên rojhilad dike wiha rêz dike: Pars ji xwe re dibêjin **"Artae"** lê Yewnanî navê **Kephen** li wan dikin. Yewnaniyan ji Medan re digotin **"Arîan"**.(87-345) Nav lêkirina Yewnaniyan ji bo Parsan balkêş e; ew hêjayê lêkolînê ye û bi dîtina min ew Parsan cûda dihesibînê... Lê her wiha nivîskar komeka bi navê **Arî** jî dide nasîn ku wanan ji Medan cûda nîşan dide. Gor agahiyên di pirtûka wî de: komên li navenda Xorasan-Îran wek Arî tên nişandan.(87-345) Ew koma dawî bi dîtina min kalên Kurdên îro li Anatoliya Navîn, Xorasan, rojavayê Kurdistanê û rojavayê Sûriyê ne. Heta mirov dikare li wan Derî-axifan (Xezarî yên li Afganîstan jî Derî diaxifin lê ew dervayê ve îddeayê ne) jî zêde bike. Mumkûn e xeyalî bê dîtin lê bi dîtina min di wir de Arîan: Soran-Hewreman-Goran in û Arî jî Kurmanc in; lê pêwîste, ew hîn zêde were lêkolîn kirin. Ji agahiyên Herodotos mirov dikare encameka qetî derxe; ku Kurd (Med) û koma li navenda Xorasanê ye Arî ne. Arî ango Arparêz, bi farisî **"Ateş perest"** e. Ji mêj ve ola Hînd-Ewrûpayî yan "Arparêzî" bû û pirsên ar û agir du gotinên kurdî ne, tenê di zimanê kurdî de hene.(9-15) Hindîstanî (Pencapî) jî dibêjin **"ag"**. Arya mêriyên berê li Îran û Îndîan yên ku bi zimanê Arî dengdikirin ew nava li xwe datanîn. Ew mirovên li wir rûdiniştî lê bi Arî deng nedikirî re jî digotin **Anarya.** Îzady dibêje: Peyva Arî yê îro di navê etnîkî (êl-Ş) Alan de dijî ye. Aryan wek prensîp koncepteka zimanî ye ku bi meriyê zimanê Îndo-Arian û farisî (Nûrestanî jî di nav de) bi hev re zimanê Îndo-Aryanê ji malbata Îndo-Ewropî ye ku pêşketineka zimanî û çandî ji êlên dinê Îndo û ewrûpî pêk tîne.(172-684)

Îro dema Arî tê gotin neteweyek yan jî nijadek têye fêhm kirin; gelo ew rast e? Îro Alman, Swêdî, Kurd, Faris, Hind neteweyek yan jî nijadek in? Ew îhtîmaleka pir pir hindik e. Lê mirov dikare wiha bêje: Bi hezaran salan berê, li destpêka mirovahiyê, baweriya û ola wan netewan yek bû û zimanê wan jî ji kaniyekê herikî... Çawa îro Îslam tê gotin û gelek netewên cûda di nava tixubên îslamê de dijin, Arî jî wiha bû... Peyva Arî bi xwe ji agir tê. Kurdên Anatoliya Navîn hîna jî nabêjin agir; dibêjin **"ar/êr"**. Ew zimanê kevn e. Gor zimanzanan, di taybetmendiyê zimanê Kurdên Anatoliya Navîn de motîfên kurdî yê kevne 4000-5000 sal berê hene. Ji bo vê Arî ya ku îro tê ziman, ji cografya ku gelên bi ar/agir bawer dikirî tê. Yanê Aran erdnîgariya miletên bi agir bawer dikiriye û di navenda vê de jî Kurd hene. Gelek nijad ji wê cografyê li dinyayê bilav bûn. Di beşa serhejmarê de min qal kiribû. Li welatekî û li gelek cîhan wî agirê pîroz herdem vêdikeve -wek ocaxê herêmî yê di Elewîtiyê de- xere (eger), ewê wek welate Arran-Agiran bê binav kirin. Eger neferek ji wê cografyayê biçûya cîhekî din pêwîst bû bigota **"Ezî ji welatê Arran im"**. Navenda wir jî Kurdistan û Ezerbeycana îroyîn e. Xelkê ji wir çûyî Ewrûpa, Hindîstan û cîhên din jî gotine em Arî ne. Ku ew peyva yê ji kût/kin kirina

Arran derketî yê. Gelek dîrokzan didin xuyakirin ku li Kurdistanê berê cîhê agirgehê hebûne. Hîna jî li Îranê ew hene. Li cîhekî ku ar weqas pîroz be, navê Arî, aran, aryan jî weqas nemir dibe.

Bilgîn îddeayeka pir balkêş dinivîse: Gor lêkolînên dawî Aryanan Volgayê ji xwe re 6000 sal meskên-war girtine. Van a hesp li wir kedî kirine û ji wir li dunyayê belav bûne.[71-90] Bê guman ew îddeayeka pir cîdî ye, bersiva wê karê dîrokzanan e. Lê beşek Kurd di bin navê Saka de ji wê herêmê heta dora Gola Aral demeka dirêj jiyane. Dîsa Bîlgîn dinivîse ku: Sirî derya-Amu derya welatê Arya yî orîjînal tê qebûl kirin, Sasaniyan vê re **Îranîvej** digotin.[71-91] Li ser wê dîtine di nava zanyarên dîrokî de îttîfaqek nîne. Hinek dibêjin Kurd ji rojhilat hatine; yên din jî dibêjin Kurd gelê Zagrosane. Bi dîtina mîn jî Kurd gelê Kurdistana îro, Anatoliya, Derya Kesk û Heyva bi Bereket in; beşek ji vir çûn navenda Xorasan û Amû Derya û piştre dîsa vegerîn...Hema nivîskar di berdewamî yê de dibêje: Ji vir beşek çû Hindîstan şûnde, 1800 sal BÎ **Saravatî** li herêma Îranê çiyayî bi cîh bûn û beşek ji wan jî Mîtanî bûn berbi başûrê rojava çûn. Sala 800 BÎ jî Medan bi Parsan cîhê xwe terk kirin.[71-92] Bi dîtina min ew îddea ji bo beşa Hatî-Hîtîtan rast e, lewra di heman demê de (1800) ew koma tê Anatolê. Medan jî xwe li hember Asûr li bakûr bi rêxistin kirin, yekîtiya xwe çêkirin û hêdî hêdî vegerîn cîhê xwe û navenda dijminê xwe. Mirov dikare vê tevgerê wek vegerekê binirxîne, ne wek cîhê xwe terk kirin. Dîsa jî hêjayî lêkolînê ye...

Wek tê zanîn navê Afganîstanê yê berê, yanê heta salên 300 PÎ jî Aryana bû, paşê bû Xorasan û ji sala 1800 an de bû Afganîstan. Dîsa navê Îran jî ji vê peyvê tê. Xorasana Îranê yê wê demê di nava sînorên Aryana de bû.

Bi hezaran sal BÎ li Kurdistanê û bakûrê tixubên Kurdistana îro ku Ezerbeycan jî di navê de, navenda gelên agirperest bû. Vê yekê bandora xwe li Rojhilata Navîn jî kiriye û di gelek niqtan de kultureka olî ya hevbeş derketiye holê. Xelkê Misrî yî bi rojê bawer dikiriye û navê pêxemberê wan yek jî ra/ro ye. Di vir de îddea ya Collins tê piştrastkirin.[159] Di nava beşekî Kurdan ewê bûne Arîna ku raste rast peyveka kurdî û ji forma agirê kevn ar tê ye. Di nava Asûriyan û Hîndiyan de jî bawerî bi vî awî ye. Li wê cografya fireh tenê bawerî bi roj û agir tê ku balkêş e. Bandora wî olî bi hezaran sal dom kiriye û heta sedsala XX an jî bi awayê "ocaxa" (ateşgeda-Altar) hîna jî di nava Kurdan de jiyaye. Hîna jî Kurdên li dervayê welat dema sond dixwin, dibêjin: **"Bi vê rojê be!"** Li rûpelên pêş emê dîsa li ser vê rawestin.

Birêz Ethem Xemgîn dibêje: Ji gelê û ji zimanê wan re jî gotine "Arî". Ji ber vê yekê gelek nivîskar îddea dikin ku Ariyên rastî gelê Kurd ê.[53] Ew yeka ji alî kevirên BÎ 843 an de ji Asûriyan mayînî de hatiye îspatkirin. Di wan de dinivîsîne ku ji gelê dora **Kirmanşah re digotine Aryan**. Xêr ji vê, peyvên kurdî yê hatinî dayîn ser vê komê, navê Xwedêyan, di alî olî de pîrozbûyîn, navê li ser gelek cîhên cografik ên mîna Arîobarzanes (Arî-berzan, Ezerbeycan), Armeniyan, Ardahan (Ar-dadan), Ararat (Ar-hat), Aras, Îran û hwd û

bandora heta roja îro berdewam bûyî hinek îspatên ji vê ne. Siraç Bilgin dibêje: Ihtîmaleka mezin e ku berî ji hev veqetandina yekemîn, ji bo Kurdan ev peyva "Aryan" bi kar dihat. Keltiyan ji bo wan mirovan digotin **"Ariovistus"**. Ji bo qewmên bakûr û navenda Ewrûpa û evên girêdayî wan ên ku koçî Hînt-Îran kirî giştikan re digotin Aryan. Aryanan heta hezar sal BÎ di nav yekîtiyeka ziman û çand de bûn.[71] Heman îddea ji alî Şerefxan Ciziri ve jî tê kirin ku gelên li Anatol û Mezopotamya li ser esasê ziman dike sê beşan:



**Xwedayê Rojê**

**A- Gelên kevnare (niştecîh):** Ne Hînt-Avrupî, ne jî di koma zimanê Samî de ne. Di Mezopotamya de şaristaniya herî pêşketî Sumeran ava kir. 5000 sal BÎ ewna ji Zagrosan koçî başûrê Mezopotamya kirin. Berî ew werin jî gelê din li wir hebûn. Li bakûrê Mezopotamya jî gelê kevnare Xorrî hebûn. Asûriyan vê re digotin Subartu.

**B- Gelên Hînt-Ewrûpa:** Welatê wan başûrê Rûsya bû; di navbera Derya Reş û Xezarê de belav bûbûn. Ji ber pirbûna serhejmarê û kembûna erdên çêre koç kirin. Di nava wan de yekîtiya zimanî he ye, lê ne eynî neteweyek in. Ji wan re Aryan digotin û hinekan koçî rojavayê Ewrûpa kirin. Evên koçî Anatol, Asya û Mezopotamya yê kirinî re jî gotin Hînt-Îranî. Vana, Hîtît, Mîtanî, Med, Pers û Keltî bûn. Van koçana di navbera BÎ salên 2500-2000 dom kir. Med li dora Ûrmiyê û Wanê û li başûre Xezarê koçber bûn.

**C- Gelên Samî:** Akad, Asûr, Amori û Aramî ne. Welatê xwe çola Erebîstanê û Sûriye ne.

Di roja îro de koma Arran bi navê Îranî tê xwendin. Di vir de Îranî ne tenê di wata Fars an de ye. Ji ber ku di vê komê de Faris xwedî dewleteke bi berdewamî ne ew nava yî girtî ye. Lê, ew nav Arranî yan jî Kurdî biya hîn baştir û hîn di cîh de dibû. Lewra Faris tenê êlêk yan jî konfederasyoneka ji vê komê bûn. Yekê jî bi qasî mirov dibîne li bakûrê welatê me navê ji Arran a manî zêdetirin. Mirov dibêje gelo ew (Ezerbeycan) navenda wan bû yan jî herî dawî li wir bi hêz bûn? Wekî tê zanîn gelê herêmê Gurcî jî derengî ji ola Zerdeştî derketibûn. Ew jî cîhê lêkolînê kûr e. Li ser jihev belavbûna vê kome jî S. Bilgîn dibêje: 2000 sal BÎ komên Hînd û Îranî ji hev veqetîn. Civata Hînt geliyê Hayber derbas bûn û çûn Hindîstana îro. Bav û kalên Îranî yên îro li demeka din li Asya Navîn man.[71] Ev veqetandina 2000 salan BÎ mumkun e

ku di navbera komên Belûc, Piştû, Darî, Saka û yên nêzîkî wan de pêk hatibe. Îddea ku Arranî li Asya man û ji stebên Asya berbi başûr belav bûn niqteyeka girîng e. Gelo hemû Arranî li ba hevbûn yan jî ew komek ji Arranî bûn? Pêwîste ew baş bê lêkolîn kirin. .

Dîtinen dijber jî îddea dikin: ku Kurd ji başûr berbi bakûr belav bûn. Birêz Mihotûlî dibêje: Aryayî ji navenda Zagrosan berbi Hîmalaya û rojava belavbûn; ew yeka ji ziman, ol û fîzîka wan tê fehm kirin û ji kolanên arkolojîk jî ew hatiye îspatkirin.[87-45] Bi dîtina min di tespîtên bi vî rengî de dem roleka bingehîn dilîze, nizanim mebesta nivîskar kîjan dem e. Lewra Kurdan dem bûye çûne, dem bûye vegerîne. Netewên Arya li destpêka dîrokê li tevahî Anatolê, rojhilatê Derya Spî, başûrê Qefqasan-Ezerbeycan, A/E-rbûnî (Ardahan), rojavayê Îran û Derya Kesk, Xelîça Basra rûdiniştin. Bi êrîşên ji rojava, başûr û bakûr re helkiştin çiyayên wê cografya yê. Ew çiyana welatê Aryan e û navê nijada wan jî Arî ye. Îro jî xelk, di nava wê cografyayê de gelêk cîhan wek **"ARAN"** bi nav dike.[87] Hinek dîtin hene ku li Ermenîstan û Ezerbeycana îro tu caran Kurd nebûne xwedî desthilatdar û nebiye welatê Kurdan. piraniya wan jî ji alî nijatperestan ve tê gotin û bi vî awî ew dixwazine mêjiyê gelê bişon. Lê tenê peyva herdu navan jî kurdî ye. Armenîen û Arîberz... Ar- ji agirê kurdî; berz jî ji bilindî ku di wata: mêrên ji Aran û agirê berz de ye. Kurd niştecîhên wê herêmê yê herî kevn in. Gurcî yê wir jî berê Agirperest bûn; piştre derbasî Xiristiyanî yê bûn; ku ew jî nîşaneyeka kevnbûna Kurdan yê li mintikê ye. Bi cîhbûna Kurdan ya li navenda Ermenîstan gelek kevn e. Ermen bi xwe di salên 700 BÎ de hatin. Lê berî wan Kurd li herêmê dijîn û di dema Medan de jî dengê Ermenan tunebû. Di dema Farisan de jî hêzên Kurd û Faris li herêmê hebûn. Di serdema Îslamê de jî Kurd hebûn. Ji sedsala V an PÎ heta sedsala XI an koçberiya Kurdan ya Ermenîstanê berdewam kir.[154-193] Ew dema jî rastî ber hatina Tirk û Moxolan tê, Arran hertim bû ware Kurdan. Tenê mirov li navên herêmê (Derbend, Aras, Kur, Rêvan, Anî...) binêre ew têr dike ku herêm welatê kê bûye..


Gelek îspat û îşaret hene ku herêma Qefqasan, Kurdistan, Derya Kesk, Îran, Xorasan û Asya Navîn welatê Arranê biye. Li ser vê niqtê Îzady dibêje: Gel en li bakûrê Rojhilata Navîn, Asya Navîn hema hema bi tevahî, nêzîkî 500 sal BÎ wek zimanê zikmakî Hînt-Ewrûpî bûn; koçberên li Kurdistan, Îran, Asya Navîn û Hindîstanê bicîh bûnî, xwe wek **Er** yan jî Arî (Aryen) binav dikirin.[154-180] Seferoglû jî dibêje: Cografya Aranê di navbera çeme Kûr û Aras de ye û bi herêma Tiflîs, Rewan, Gêncê û Qerebaxê re tê gotin. Di belgeyên Qirna Navîn de jî wek Aran derbas dibe. **Sala 700 BÎ li wir Sakasen/Sakasûn dijîn**. Şaxekî kî wana yî bi navê **"Saka Bala"** di navbera 646-1576 an PÎ de bi navê Kurd dihate nasîn. Ji êla Babirakan **"Kolû Ûzûnoglû-Mil Dirêjan"** Kurdên Xiristiyan bûn, berî sala 1050 Gregoryan, paşê jî bûn Ortodoks. Mîrîtiya wan li Anî yê 1200-1317 de jiyaye.[91-15] Li wir du-sê niqteyên girîng in derdikeve holê, yekemîn; gelo hinek ji êla Dirêjan bûn Xiristiyan? Ya din: tenê ji wê herêmê re

digotin Aran? Sêyemîn jî: Saka yê li wir dijîne. Saka Îskît yekin? Li wir jiyana wan rastî berî Med an dike, ew jî têza ku Kurd ji ber êrîşên dijminan reviyan herêmên çiyayî bi hêztir dike. Ji bo ku derbasbûna alî Qefqasan bi zahmet e û pêwîstiya geliyê Arran derdixe holê, ew yeka îşareteke ku beşek ji Kurdan li bakûrê Derya Reş dijîn û hinekan ji wan jî ew alî Qefqasan girtibûn. Bi qasî min lêkolîn kirî, têkiliya Kurdên îro li Anatol û Xorasan û mintiqeyên din bi wan Kurdana re heye. Van dîtinen min Seferoglû jî piştrast dike ku balkêş in: Wekî tê zanîn Kurdên Kûr-Arasê ye ji zend a Rewadî yan jî Şadiyan wek sê beran li Anî, Divîn û Gêncê di navbera salên 950-1200 an de mîrîtî damezirandine. Vana ji bo fetîhkirina Anatolê ji Selçûqiyan re rêbertî û kilavûzî kirine ku torinê Saka ne.[91-16] Kîlîta girîng ê dîrokê li vir destpêdike: Eger ew dîtina rast be, em rê li rûpelêkî nû vedikin û dibêjin ku Kurdên îro li Anatol, Xorasan, Rojavayê Kurdistan û Sûriyê neviyên Sakane û ew Saka yên ku mohra xwe li dîrokê xistî kal û bavê me ne!

Kesê li ser Arrî-Arrana şiroveka cûda tîne birêz Abdullah Ocalan e, Ocalan wiha dibêje: Dîtinen dibêjin; çav şîn, por zer ên Arî 2000 sal BÎ ji Ewrûpa çûne stebên Rûsya; ji wir jî li Îran, Hindîstan û Anatolê belav bûn ji kok de şaş e. Ev îddeaka nijadperestî ye. A rast ber eqsê wê ye ku ji Hîlala bi bereket ew belav bûn.[72] Çawa min li jor jî nivisî di vê de tu guman nîne. Bi taybetî jî; bi pêşketina împeryalîzma Asûr û Ereb an, ew gelên wê herêmê berbi çiyan û mintikên bê însan belav bûn. Tespîteka birêz Ocalan a dine girîng jî ev e: Di her peyveka Rojhilata Navîn de Sumerî roleka girîng lîstiye. Di wir de jî wiha ye. "Ar" û "Ard" di Sumerî de tê wata gîsin (saban) û erdê ku teyî ajotinê. Sumeriyan bi erdê ku bûyî şûv re digotin "ard". Mumkun e ku wan jî ew peyva ji gelê herêmê yê cotkarî dikirî û bi navê Xorriyan girtibin. Yanê Aryen tê wata: Xelkê ku erdê dajoyî. Peyva Aryen, nijad yan jî ji temsila etnikekê zedetir, komên ku cotkarî û malcitî bi pêşda birinî re dihate gotin.[72] Ji bo ku kesên kurdî nizanin peyvên Sumerî werdigerînin zimanê din -bi taybetî jî tirkî- şaş werdigerînîn. Bi dîtina min îhtîmaleka mezin e, ku ew "erd" e, yanê bi cîhe kirinî şûv re digotin erd. Di kurdî de hîn jî ew peyva bi kar tê. Ew di wata erdê ajotî û najotî de jî bi kar tê. Lê di peyva Ar de ti guman tune ku agir e. Bi dîtina min, peyva Arrî-Arran-Arryan a ji hertiştekî bêtir girêdana xwe bi bawerî û dîn re heye.

## ARYEN - SAKA

Wekî min li jor jî got, li ser axa welatê me gelek cîh hene ku bi Ar-Arran (Ezerbeycan, Aras, Ardahan, Arpaçay, Anî, A/Erîvan û hwd) hatine navkirin. Yek ji wana jî çiyayê Agirî ye. Agirî yan jî Ararat, peyvên kurdî ne. Ar- di Kurdî de agir e; -arat jî îhtimaleke mezine ku ji lêkera "hatin " ê zivirîbe vê forma îro. Yanê di wata agir jê hat de ye! Tenê ew peyva jî dide xuyakirin ku Kurd ji dema ew çiya volkanîk biye virde li wir bûne û ew navê ar-agir li wî çiyayî dane. Nêzîkbûna wî û Aran jî balkêş e.




Di sedsala 15 û 6 an Bî de goçen hatine Kurdistanê
Hatina Aryenan û gelên din ên Hînt-Ewrûpî

M. Îzady

Gelek lêkolîner, dîrokzan, antropolog, fîlolog dema qala dîrokê dikin, gilî gazincan dikin ku navê Kurdan di belgeyên dîrokî de kêm derbas dibin. Raste. Sedemên wê hene bê guman. Di serî de, Kurdan li destpêka mirovahiyê li ser heyva bi bereket şaristaniyeka gelek pêşketî afirandin. Bi alîkariya avûhewayê û rûbaran jî vejîneka mezin derket holê. Vê heyî yê, li wê wextê nav û dengê xwe gelek belav bû û ji mirovan re bû navendeke kombûnê yan jî êrîşê. Îro çawa mirov xwe li Ewrûpa û Amerîka digirine û dixwazin li wir bijîn, wek wê bû. Ji ber pirbûn û bi hêzbûna Kurdan yê wê demê, ku bi sîstema êlan de dijiyan pêdiviya yekîtiyeke netewî nedîtin. Êlek yan jî federasyon û konfederasyoneka ji êlên Kurd têra parastina wan dikirin. Li hember vê, dijminan xwe hîn zêde bi rêxistin û hêztir kirin ku hêza Kurda ye têra wê nekir û belav bûn. Ew êrîşên dijmin jî Kurd mecbûrî yekîtiya netewî kirin ku vê jî împaratorî ya Medan derxist holê. Ji bo wê, Kurdan li destpêka dîrokê navên êla, federasyona êlan, malbatan û şexsan bikar dianîn. Wek Gûtî, Xorî, Mîtanî, Hatî, Lûlû, Kasî, Lûwî, Mar, Elam û hwd.

Sembolên ku Arrana bi kar tanî jî gelek watedar in ku mirov bandora wan li hemû herêmê dibîne. Mihotûlî dibêje: Di hunera Ariyan de sembolên herî girîng: roj, boxê/canege û xezal bûn. Boxê sembola Xweda ya bahozê bû, xezal jî sembola Xweda yê parastinê ya pîroz bû. Pêrikên (kurs) rojê jî sembola çanda agir bûn.[87-105] Bandora rojê jî li Asya û Rojhilata Navîn tê zanîn, boxê jî li Anatol, Misir û Hindîstanê gelek hêja tê dîtin ku sembola çanda hevbeş e...

## Navê Kurdan

Li jor jî hate gotin ku êl, federasyon-êl û konfederasyonên Kurd gelek navên cûda bi kar anîne. Ji bo ku her federasyon jî gelek bi hêz bûye, pêdiviya yekîtî û netewbûne nedîne. Yan jî rêberekî bi hêz derketibiya, hemû êl û federasyon di bin navekî de kom kiribiya encam cûda dibû. Ew yeka ji alî gelek nûseran ve, cûda hatiye şirovekirin: Firat dibêje: 1300 sal BÎ gelê bi navê Haltî-Lohorto li "Orarto" rûdinişt. Wana berê bi navê "Gotto" yanê şêrvan dihatin nasîn. Ew nava ji alî Asûriyan ve wek Gerdo dihate xwendin û peyva Kurdo jî ji wê derket. Xort îro wek kehreman tê zanîn, Kurd hîna jî wextê bangî hev dikin dibêjin lo xorto.[127-9] Bi ve sîstemê mirov dikare bibêje ku navê Gûtî jî nêzîkî wan e.

Navê Kurd ji ku hatiye, cara yekemîn kingê bi kar hatiye û wata xwe çi ye? Birêz Ocalan dibêje: "Baş tê zanîn; ku cara ewil navdayin ji alî Sumeran ve bûye kevneşopiyek. Îhtimaleka mezin e ku peyva Kurd ji Sumeran tê. "Kur" di zimanê Sumerî de tê wata çiya. Ev ek a din jî "ji kuderê" îfade dike. Bi vê re girêdayî ev tê wata "gelê çiyan". Di Sumerî de "Kurtî" gelê li çiyan dijî ye. Vaya di dawiyê de Grekan ji Lûwiyan heynan û wek "Kurdienne (Welatê Kurdan) bi kar hat.[75] Tê wê watê ku Kurd, di dema Sumeriyan de li çiya bûn? Vê yekê jî em ji jêderên Misir fêr bibin:

Gor belgeyên Misiriyan 3.000-2.800 sal BÎ gelê li rojhilatê Misir (Kurd) wusa resim kirine." *Enî pan, poz têyr, wek çûka hov hatiye teswîr kirin û kralê wan jî navê xwe Anubaninî ye* " Di belgeyên Sumeriyan de jî wiha ye: " *Eni pan, poz têyr, şervanê çewîk û wek çûkê hov in. Ew desthilatdarên çiyayên rojhilat in û kralê wan jî Anubanînî ye*" hatiye çêkirin û resimkirin. Di belgeka din ê Sumeriyan de ji bo Gûtiyan (Kurd): "*Şeytanên çiya û dijminên Xweda.*" tê nivîsandin. Bi tesfîra Misiriyan ve hevdû digre û tê nivîsîn ku: "Xelkê enî pan, poz qertel, çewîk, şervan û mina çûkê hov in" Di destana Gilgamêş de tê gotin, ku ji Tûfana Nûh şunde gelê cara yekemîn bûyî xwediyê Mezopotamya wanê çiyayî ne.[4] Anubanînî di esas de kralê Lûlûyan e û bi Gûtiyan ve bûn yek û dewlet ava kirin.

Xenophonê Grekî wek rojnamevanekî beşdarî sefera Grekan ya rojhilat bûbû. Fermandarê artêşê dimire û ew serokatiya leşkeran digre ser xwe. Di Kurdistanê re derbasî Ermenîstan; Derya Reş û dîsa vedigere Grekland. Di pirtûka xwe ya bi navûdenga bi navê **"Vegera Dehhezaran-Anîbasîs"** ku di salen 401-400 an BÎ nivîsandî de, ji bo Kurdistanê dibêje **Karduchoî** (Kardaka).. Gorî wî, ew welatê yî li rojhilatê Kentrites (Botan) ê bû. Dibêje, wexta artêşa me gihîşt navça Zaxoyê em rasta gelekî aza û şervan hatin, navê wan Kartuxî bû. Ev gelê han di navçekê çiyayî de dijiya û daxwazek wan a cîhêbûnê ji Şah hebû û ji jiyana serxwebûnî û azadiyê hez dikirin.[16] Di seferê wî yê ku di Kurdistanê re derbas bûyî de hertim qala vî gelî dike. Ev gela yî qet benda wî bernade, rihetiyê nade eskerên wî û naxwazin ma ew welatê wan dagir bikin; ev gelê Kurd e. Gorî ew dinivîsîne, wê demê vî gelî ne desthilatdariya kral Artaxerxes, ne jî desthilatdariya Ermeniyan nasnedikiriye. Her çiqas hinek kes dibêjin ev gelê Gurcî bûn jî ne tiştekî raste. Wek tê zanîn Ermenî ji bo vê herêmê dibejin **Kordûdh**, Aramî dibêjin **Beth-Kardu**, Ereb jî dibejin **Bakarda (Kardaî)**. Di Akadî û Asûrî de kardu tê wata qehreman, karadu jî te wata bi qûwet.

Li ser navê herêmê Minorskî dibêje: berî Selçûqiyan peyva Kurdistan nedihate zanîn, ji bo wê Ereban agahiyên li ser Kurda ye bi navên cûda cûda dane. Wek: Zavazan, Hilat, Armeniye, Ezerbeycan, Cibal, Fars û wekî din. Agahî ya cara yekemîn Mesûdî û Îstahrî 951 an de didin. Dîsa gorê wan Kurd li Xorasan jî hene.[51] Ew tespîteke raste, ku heta niha ji alî lêkolîneran ve nehatiye dîtin.

Şahnama ku sala 1010 an de ji alî Fîrdewsî ve hatî nivîsîn de jî tê gotin ku: Ji milên Dehak yek mar peyda bûn; ji bo wana rojê du xort dihatin kuştin û mêjiyê wana didan maran. Paşê şûna xortekî pezek kuştin û xortê rizgar bûyî re jî gotin herê çiya û qewmê Kurd ji wan peyda bû ku bajar nedîne.. Malên wan kon in û tirsa Xwedê di dilê wan de qet tune ye...[86] Bê guman ne bi vî awayî biye; gor çîrokê ew kralê ku Kurdistan dagir kirî, wekî kesekî di laşê wî de mar derketî, bi hov, bi tirs û bê vijdan tê nîşan dayîn. Kurd jî ji ber wî çûn çiya. Ew dagirkirina Kurdistanê û çûyîna Kurdan yê serê çiya bi vî awî sembolîzê dike.

## Tofana Nûh

Di cîh guhartina miletan de tofanê xwezayî yên mîna: erdhej, serma, nexweşiyên mîna tîfo, teqîna volkanan, hişkbûn û lehiyê jî roleka mezin lîstine. Yek ji wan tofana girîng jî ya Nûh e. Avûhewa serûbin bû; ji ber wê jî welatê **Kharsag/Xarsag** bi tevahî ji holê rabû. Kesên ku bajar dewletên li Mezopotamya li derdorê 5500 BÎ de hatinî avakirinî ji cîhên xwe rabûn û çûn.(159-256) Bajarên kevne ku piştî deh hezar sal BÎ li hîva bi heyî hatinî çêkirin bi vê tofanê re bin ax bûn û gelê barkirin, îhtîmaleka mezine ku çûbin çiyayan. Hîna jî di bin axa welatê me de dîrokêka eşkere nebûye, ramedî ye û li bende derketinê ye.

Di kevalên kilsê yên li welatê me Kurdan derketine de qala nexweşiya giran wiha tê kirin: " Kûzên genimê tijî bûn, îsal mahsulî/heyî ye baş bû. Marjin bezî mabêda pîroz. Li mal mêrê wê-Xwedê Enlîl-ji nexweşiyê bê hal ketibû. Mala xanim Nînlîl, hêlîna wê, ew mala dibiriqî ji nexweşiyê dişka. Nexweşî... nexweşî –li her welatî belav bû. Dayika min a muhteşem! Wî ji nexweşiyê biparêze. Ji wî marî re êdî rihetî nîne, ji nexweşî û êlêf/agir."

Dayik ji bo ku zarok baş bibin gelek dûayan dike, di dawî de zarok rind dibin. Lê ji bo ku careka din ew nexweşî dubare nebe, tedbîr werdigire: "Xwarina ku tu li Eden ê (Cennet) çêdikî rind bikelîne, xwarin gerek baş bê paqij kirin. Bavo, goşt xwarin dijminatiya herî mezin e".(159-253)

Di heman belgeyan de qala kavilbûna welatê Xarsag jî tê kirin: Sermayeke pir xirab welat girt; bahozê her der reş kir. Xelkên mala Xwedê Enlîl êdî şa nabin. Qederê ser malê girt. Ji berfê mala Enlîl êdî xuya nake. Ji hêrsa sermayê çar dîwarên Xwedê em parastin. Qedera Embarê deyndarê dîwarên qaling e, ji ava bi bahoz û hêza wê em xelas bûn. Lê, nikarî manga ji holê rake....Welatê min belav bû; lê ji holê rakir -tenê av e- çi heyfe ku hertiştek ji holê rabû...(159-256) Vekirî dide xuyakirin ku xelk ji welatê xwe çû û hertişt ji holê rabû. Bê guman xuya dike ku gelê ji wir çûyî di alî çandinî û xwedîkirina ajelan de xwedî zanyarî bûn.

Di lêkolînên li herêma Sumeran de hatî kirin de derket holê, ku dema tofan bûye (4500 sal BÎ) xelk niştecîh bûye û di qirna sifir (mis) de dijiyaye. Tofanê bi dirêjî 500 km û firehî 150 km re erdî di bin avê de hiştiye û di navbera Zagrosan û heta deştên Sûriye yê bilind belav bûye. Ew karasata, di destana Gilgamêş û heşt kralên berî wî jiyanî de jî te qal kirin. Dîsa tê nivîsîn ku piştî tofanê gelê ji bakûr ve hatî li wir dibe desthilatdar. Ew gelê hatî di alî cotkarî, ajeldarî, maden de gelek pêşketî bû.(4) Ew gelê hatî Sumerî ne. Gelek nivîskar û lêkolîner dibêjin ku Sumerî ji bakûr ve hatine.

Gereg gelê Arya yî ji Asya pêşîn çûyî ew bûyera Nûh li Hîmalaya kat/qal kiribe, lewra mirov nikare zanistî îzah bike ew kultura di cografyeka weqas fireh de çawa dişibine hevdû. Belgeya li ser wê bûyerê 3000 sal BÎ ye û di wir de tê gotin; ku Ûtnapîştîmê ji bavê xwe tofanê bihîst û keştiyeke mezin ava kir. Bûyer 4000 sal BÎ li bakûrê Mezopotamya pêk tê, bi erdhejeka mezin re

gola avê hildiweşe û av berbi başûr diherike. Keştî li ber avê dikeve û li çiyayê Nisir disekine.[87-45] Bi ditina min ew jî îspatek e ku Kurd ji Anatol û ji hîva bi bereket ber bi bakûrê Derya Reş, Xorasan û Asya çûn. Di beşa Macar û Kurdan de jî emê bibînin ku hinek Kurd li Asya Navîn in û li ser keviran çîroka xwe nivîsandine.



Kevala Kilsê ya Tofanê

Şaîrê welatê Kurdên Kassiyan, Sîn Lekke Ûnîn ê ji Riha, di destana Gilgamêş de wiha dinivîsîne:

*" Şêrekî mîrovatî ji erdê rakira*
*Şûna tofan bişkêne derbas bive,*
*Bajarêk ji holê rabûya*
*Şûna tofan bişkêne derbas bive,*
*Vêba dinya dişewtinî hebûya*
*Şûna tofanê*
*Birçîbûna dunyayê diqewrînî hebûya*
*Şûna tofanê...*

Navê Xarsag jî balkêş e. Gor birêz Collin nîşan dike welatê Kurdan e. Lê çima gotine Xarsag? Gelo ji welatê Xorriyan re digotin? Îhtîmaleke mezin e. Ji alî din ve ew nava dişibîne navê Xorasan jî... Gelo Kurdên ji welatê Xarsag piştî tofanê yan jî ji ber êrîşên dijminan çûn bakûrê rojhilat û li wir welatê avakirî ji welatê jê hatî bi navkirin? Ne dûr e, lewra îro jî li Erzirûmê navça Xorasanê heye, her wiha li Îranê jî; heman kesan nav dane herdûyan. Dîsa navê Şîrvan jî bi heman awayê ye. Lê vê yekê jî em ji dîrokzanan re bihêlin. Ji bo destpêka wê em berê li ser Xorriyan rawestin.

## XORRÎ

Hemû jêder, lêkolîner û nûser vî navî wek Horî dinivîsînin lê bi min ew tam ne di cîh de ye; lewra koka wê peyvê ji Xor a kurdî tê û gereg rastnivîsa wê jî Xorrî yan jî Xorî be. Wekî me li jor qala welatê Xarsag kirî de jî me got girêdana wê bi Xorriyan re heye. Di nivîsên bi mixî de Xorrî wek **"Kharrî"-Xarrî** hatine nivîsîn. Li ser kevirên Bisutun de peyva Arran û Harrî di heman wateyê de hatiye nivîsîn.[87-116] Ew yeka jî pir watedar e ku wata Arran û Xarrî wek heve, yek e. Yanî Xarrî ye Arî ne, yan jî ew ji welatê Aran in û hevûdû temam dikine. Di kurdî de "Xor" di wata rojê de ye[19]; di farisî de jî ji rojê re

dibêjin Xorşît; di wir de têkiliya peyvan, cografya û ol hîn balkêş û vekirî xuya dibe... Peyva Xorrî jî balkêş e. Xor-me got ku roj e, -rî jî di kok de rê ye; rî be jî ne şaş e, ji ber ku hîna jî Kurd rî bi kartînin û tê wata: Riya rojê, ji bo ku roj di nav wê komê de û li ser wê erdnîgariyê pîroz e, wata, gelê li ser riya Xwedê derdikeve holê...Li pêş dîsa gelek peyvên mîna H/Xorasan, H/Xarran, H/ Xaleb, Aras, Alan, Xweza, Xwedê û hwd ên bi wî rengî emê li ser bisekinin.

Lêkolînerên Îngîlîz navê Xorrî wek Hurrîan û Hurrîte; Babîliyan jî wek Horîte bi kar anîne, ku ew jî digehejê navê Xorriya yî ji bo xwe bi kar tanînî. Kralê Mîtanî Tûşattra, nama ku ji kralê Misrê re şandî de: Hur-wu- (u)- he (Hur-ru-he) dinivîsîne. Ji alî Hîtîtan ve jî wek Hur-la bi kar hatiye. Li bajarê Nuzî (Kerkûk) wek Hur-ru- (m)-î û li belgeyên Hana de jî wek Hu-rî bikar hatiye. Bi Sumerî cîhê ku Xorrî lê rûdinên re Subir dihate gotin. Ji bo Xorriyên Aryan digotin **"Evê ji welatê bilind"**. Ji bo Babîlan ew welatê bakûr bû û ji bo Asûran jî welatê xerîb bû. Ji bo vê **2000 sal BÎ Subarî bi Xorriyan ve jî wek hev dihatine qebûl kirin.**[94-142] Mînak: Nînua-rî, Arrafa-rî, Hana-rî tê wata: Kesê ji Nînova, ji Arrafa... Hu: saha; Hî: rê, He: pirê...[94-157] Ji wan agahiyan mirov dikare Hu di wata saha de yê; wek saha rojê, mala rojê, cîhê rojê bibîne. Rî jê di wata "ji-hatin" de ye. Yanî "ji welatê rojê ye"; bi dîtina min ya herî rast ew e, ku kesên di riya rojê de ne. Di zimanê Sumerî de ji Xorriyan re digotin Khurrî-Kurrî; di belgeyên Misiriyan de jî wek Kharru; di Tewratê de jî wek Hor yan jî Horît derbas dibe. Di zimanê Babîlî de tê wata şikeftan û bajarê Xorrî jî li cîhe Riha yê îro bû.[137-50] Ş. Beysan dibêje: Bi zimanê Sumerî, Xorrî tê wata Welatê Bilind. Welatê wan li bakûr û navenda Mezopotamya de bû. Ji bo ku Sumeriyan li başûrê Mezopotamya dest bi jiyaneka nû, nivîsê û şariştaniyê kirin ku ew cografya jî deşt e; çiyayên Kurdistanê ji wan re 'bilind' xuyadikir ku ew jî xwezayî ye. Wata şikeftan jî ne şaş e, mumkun e ku ew netewên cîran Xorrî bi şiklê jiyana wan jî ew bi navkiribin ku şikeftên li bakûrê Kurdistanê îspata wê ne. Yekê jî şikeft wê demê gereg di asta bilind de bin yanê lûks bin, lewra gor şertên wê demê ew wek qesra ne.

Li Anatoliya Navîn û Xorasanê peyva "Xor" a ku îhtîmaleke ji koka Xor têyî ye, di hinek rewşan de di wata zeîf-jar bûnê de, di hinek rewşan de jî di wata melodî ya di xew de tê bikar anîn. Dîsa li Anatoliya Navîn peyva koka xwe îhtîmaleke ku ji Xorrî digrî ya "Hûr": di wata kesê gotinan fêm nakî-lûrt, azad û serbixwe de bi kar tê. Wextê li yekî hinekî bi hêrs ketin dibêjin "Va çi Hûr re! Yan jî çî lûrt e!" yanê gotina gelê din nabihîze. Lê di vir de pirs ew e, ku ew peyva ji Xorriyan de ma ye an ji "Hurriyet" a erebî-tirkî hatiye stendin ew ne diyar e. Ne dûre ku koka Hurriyetê ji Xorriyan hatibe.

Di Încîlê de Xorrî wek gelê di şikeftan de bikar hatiye û hatiye nîşandan. Xorrî ji cîhê ku şikeftên xwe gelek hatiye.[94-209] Paytextê Xoriyan jî bajarê Orrhos (Riha) bû.[94-33] Orrhosê mirov nikare wek Arhosê, yanê bi agir re eleqadar bixwîne? Xuyaye ku peyv bi latînî hatiye gotin, Orr-ji agirê kurdî; -hos jî latînî di mana malê de ye; yanî "mala agir". Îhtimaleke mezine, ku kral (mîrê mîran)

yan jî Xweda yê Xorriyan li wir rûdinişt û agirê pîrozî mezin jî li wir bû... Li vir peyva Xorasan jî balkêş e, eger em şiroveka cûda bikin çawa dibe? Ku xor di vata: roj, agir-ar de ye û Xorriyan navê xwe ji wir girtine. –san jî zêdebûn (ek) ku cîh nîşan dike ku wê çaxê Xorasan tê wata welatê Xorriyan?! Gelo ev mumkune? Belê, ji ber ku di dirêjahiya dîrokê de gelên li Xorasan, Arran, Arrhos, Hatay, Fîlîstîne û Nuzî yê yek netew bûn. Ew jî Xorriyên kal û bavên Kurdên îro li Anatol, Xorasan û cîhê din dijîne...

Xorrî ji alî milet yan jî şaristaniyên din ve jî bi Kurdan ve tên girêdan. Beysanoglû dibêje ew wek Subarî dihatin hejmartin û xwediyê şaristaniya yekemîn a li bakûrê Kurdistanê bûn. Li wir mirov leza dewleta Tirk dibîne ku çima dixwazin navendeka girîng a mîna Heskîfê rojekê zûtir têxin bin avê... Xelkê medenî yê yekemîn ê li jora çemê Dicle û bajarê Amedê jî di nav de Xorrî bûn, ku ji Subariyan dihatin hesibandin.[137-50] Avakirina şaristaniya yekemîn girîng e, lê cografya ku hatî nîşandayin bi dîtina min kêm e. Bi taybetî jî dora herdû çeman û heyva bi bereket bê gotin hîn zêde mantiqî ye. Hinek dîtinen din jî wê rast dikin: Welatê Xorriyan (bi Asûrî ve re Naîrî tê gotin) ji bakûrê Meletî heta Hewlêrê û ji bakûrê Zê heta nêzîkî Wanê dirêj dibû. Hîn li bakûr jî êlên Ûrartûyan hebûn.[94-13] Niqta din ê balkêş jî Xorrî û Subarî wek beşên hev tenê îspat kirin. Wek tê zanîn Subarî li başûrê gola Wanê bûn û îhtîmaleka mezine ew Kurdên niştecîhên ku koçber nebûne. Lê bi lawazbûna dijmin re ber bi başûr dirêj bûne. Gelek dîrokzan wana wek Zebarî yên îro nîşan didin. Eger mirov kûr bifikirê di wir de cografya ku Xorrî lê belav dibin, hema hema cîhê ku îro Kurmanc lê niştecîh in nîşan dide. Gelo Xorrî bav û kalên Kurmancan giştikan bûn an tenê dê û bavên Kurdên îro li dervayê welat dijîn bûn? Ew pirsa hîn zêde lêkolînê dixwaze... Lê kesên pispor wê cografya yê wiha radigihînin:

Robert Braîdwoodê ku li ser cografya Kurdan lêkolîn kirî dibêje: Çandeka mezin li ser wire û va cografya ji Libnana kevn û çiyayên Libnan jî dike nava xwe û ber bi Derya Spî dirêj dibe. Zozanên Anatol û Îranê dike nava xwe, Zagrosan û heta başûrê Mezopotamya dadikeve.[94-24] Ew çanda hevbeş îşareteka pir mezine ku gelê Kurd ji berê ve, yanî herî kêm pênc hezar sal in ku li ser axa xwe dijî, derdixe holê. Li ser vê babetê dîtinen din jî wiha ne: Li bakûr: Qefqasya, Antî Toros; li başûr Hewlêr, bakûrê Sûriyê; li rojhilat çiyayên Med, Ûrmiye; li rojava çiyayên Amanos bûn.[94-84] Welatê Xorriyan ji çiyayên Zagrosan heta rojhilatê başûrê Anatolê û heta Sûriyê dirêj dibû.[137-50] Eger wî lêkolînerê hêja li cîhên mîna Xorasan, başûrê Derya Kesk û bakûrê Derya Reş jî lêkolîn kiribiya, îhtîmaleka mezine, ku ew cîhana jî bi cografya Kurd û Xorriyan ve girêbidana. Îro ji bo wê dîtine îspata mina yekemîn ewe, ku gelê me yî li Xorasan digot em pênc hezar sal in li wir dijîn û avahiyên kevne li Xorasan in. Bi taybetî jî xaniyên kevne di zinaran de hatinî çêkirine li ser çiyayên bakûrê Xorasanê ku mezinan digot ew ji Kurdan de ma ne... Îspatên din jî emê di herikandina pirtûkê de bidin.

Ji zankoya Frankfurtê arkeolog Prof. Jan-walke Meyer, bajarê Xorriyan Tell Chuera ku pênc hezar sal dîroka xwe heyî dît. Ew li navbera sînorên Tirkiye û Sûriya îro de derxist holê. Ew herêma ji bo dîroka Kurdan gelek girîng e û di wê baweriyê de me ku li pêşêrojê hîn zêde pelge û îspat ê derkevin. Di wî bajarî nûjen de qesr, perestgeh, embar, mal, cîhe zibil derketin û di dora bajer re jî du sûr hene. Bajar li ser 90 hektarî hatibû avakirin û 15 hezar şêniyê xwe hebûn. Niqta dinê girîng jî, ew bajara bi hesp rojekê ji serbajarê Xorriyan ya bi navê **Waschukannî** dûr e. piraniya bajaran di navbera çemê Xebûr û Balik de hatibûn avakirin, lê taybetmendiya wî bajarî ew bû ku bajar bi plan hatibû avakirin.[189] Li ser erdnîgariya dora Heleb, Riha, Dîlok, Meletî, Semsûr (Prof. Andery Alfoldî dibêje: Welatê Xorriya Kummuhiyan jî Semsûrê. Grek navê Kommagene lê dikin) û derûdoran wan bi hezaran cîhên xirav bûye ku di bin de dîroka Kurdan ya kevne radikevî heye û li hêviya lêkolînerên Kurd e. Ew cîhên ku lêkolîn hatinî kirin de jî gelek belgeyên dîroka Xorriyan ronî dikin hatin derxistin ku mînaka berbiçav bajarê Alalah e...

Ji bo herêma Semsûr nûserê herêmî dibêje: Ji hestî û kevirên ku 5000-4000 sal BÎ derketî de têye fêhm kirin ku li herêma me gelê bi navê Xorrî jiya ye. Dîsa ji encama kolanên Aslan Tepe yê li Meletî hatî kirin de derket holê, ku Xorrî ye 5000-4000 sal BÎ di dema kevir de; 3000-2000 sal BÎ de jî dema madenî jiyane. Xorrî 3000 sal BÎ li Haranê, di navbera 3700-3500 salan de jî li Dîlokê jiyane. Ew yeka ji seramîkên rengîne derketî hate fêhm kirin. Piştî Naram-Sîn, Xorriyan, herêm bi giştî kirin bin kontrola xwe. Hemwelatiyê xwe Subarî jî kirin bin desthilatdariya xwe û heta Kerkûk û Derya Spî û Welatê Kenan çûn. Li vir xala girîng ewe ku; Subarî jî kirine bin desthilatdariya xwe. Wê çaxê derdikeve holê ku -eger Kurd bûyina Subariyan raste- Xorrî ne Kurmanc giştik in... Ew wata jî derdikeve ku Xorrî konfederasyoneka êlên Kurd bû û birayên xwe kirin bin desthilatdariya xwe. Li Asya pêşîn, di navbera salên 1800-1500 an BÎ de bûn welatekî bi hêz. Tê gotin ku rêvebertiya Hîksosên heta Misir çûyînî de jî Xorrî hebûne.[137-54] Di kolanên li Anatola Navîn de, gelek belgeyên ji Xorrî, Hîtît û Mîtaniyan de manî derdikevin. Îhtîmalekê ku ew ji dema 1800-1500 BÎ ve mabin. Ji bo ku hîna jî em ji dewleteka vana bi nav bikî û di muzeyan de veşerin dûr in; dewletên serdest gor kêfa xwe bi kar tînin. Li gundê Omê (Sêvikî) sêniyek derket ku gor texmîna min ji dema Xorriyan yan jî ji dema Hîtîtan ve ma ye û cilên wê demê, bi taybetî jî sol/mêrisên (kaloş-çarixên) wê demê bi yên Kurdên koçber ve dişibine hev...

Birêz Xemgîn dibêje: Berdewama Gûtiyan Xorrî bûn. Lê 3000 sal BÎ hîna ku li bakûrê Mezopotamya bi cîh nebûbin, li herêmê êleka din a Kurdên bi navê Sûbarû hakimê wê cografyayê bû.[4-100] Hema nivîskar bi berdewamî dibêje: Hatiye îspatkirin, ku va gela berê li navbera golên Wan, Ûrmiyê û Ezerbeycanê de dijiya. Xorrî jê wê demê di navbera Ezerbeycan, Anatoliya Navîn û Hemedanê de koçber dijiyane. Rastiyeke ku ew gelayî 2000 sal BÎ li vê herêmê niştecîh dijiye û gelek dewletên bajarî, yan jî êlî ye avakirine. Berî Xorriyan tu

gelên dinê li vêderê dijîne nihatiye tespît kirin.[4-102] Di nava nûseran de tam lihevhatinek tunebe jî, bi dîtina min ew bi nîvkoçeriya Xorriyan re girêdayî yê. Carna li bakûr, carna jî li başûr tespîtkirina van divê bi vê yekê re girêdayî be. Êlên Xorrî 2000 sal BÎ li bakûrê Suriyê, Kizzûwata (Çûqûrova), Amîk û li Anatoliya Navîn belav bûn. Vî gelî li bakûrê Rojavayê Îranê yê îro dewletên xwe çêkirin û ji wir jî ber bi rojava belav bûn. Gelek dewletên bajarî ava kirin: Wek mînak, Arrafa, Nûzî, Amûr, Kargameş, Ûrkîş (Amûda) û Taifa (Li deşta Mêrdînê) û herêmê xwe mîna; Amedanu (Amed), Hanigalbat, Pûlûrûmzî, Alzî û Îşûwa bû.[58] Asûriyan ji vî gelî re Sûbarî digotin. Gorî Subariyan jî, Xorrî bi gelên Zaxrosan Gûtî û Kasî yan va di têkiliyên nêzîk de bûn. Du hezar (2000) sal BÎ di du kevirên bi nivîsên Sumerî de qala welatê **Kar-da-ka** tê kirin ku li başûrê Gola Wanê tê hesibandin. Ji wan nivîsana hezar salî bi şûnde jî, Tiglath Pîleser bi qewmê Kur-tî-e re li çiyayê Azû şer kiriye. Aramiyan ji herêma Botan re digotin **Bes Kardû**.[51] Di belgeyên Fermandariya Giştî ya Tirkiyê de, ji herêma çiyayî ya li bakûrê Ava Botan re **"Welatê Kardûkan"** tê qal kirin. Navê Cizîrê yê kevn, **Kardû Gazartasî** ye. Ermenî jî ji herêmê re "Kerdûh" dibêjin.[44] Gor Dr. Akbûlût jî, 3000 sal BÎ êlên şervan li navbera Dicle û Firat de bi cîh bûn. Di belgeyên Sumerî û Akadiyan de ji welatê wan re Sûbarû, ji gelê re jî digotin Sûbarûyan. Xelkê herêmêyî yekemîn î nûjen Xorriyên ku ji Sûbarûyan tên qebûl kirin in. Demeka dirêj ev êlana di bin navê Xorriyan de jiyan, lê di salên 2000 an BÎ de, wek Xorrî û Mîtanî bûn du bir. Li destpêkê Xorrî bi hêz û mezin bûn. Paşê jî Mîtanî bûn kraliyeteka mezin û bi hêz. Ji Mîtaniyan şûnde Asûr, Ûrartû, Med û Îskît (653-625 BÎ) hatin.[61] Ew bir bûna Xorriyan gotina kalê me tîna bîra mirov ku digotin: Kurmanc bûne dû biran yek Mil yek jî Zil. Ew beşbûna heta vê demê dirêj dibe an na, nayê zanîn.

Xorrî heta sala 1340 an BÎ de serbixwe jiyan û piştre serdestiya Mîtaniyan qebûl kirin. Ji 1200 an, heta 700 BÎ jî Frîgya bûn serdest û heta serdema Medan ew berdewam bû.[85/4-99] Gor belgeyên heta îro derketinî holê, dewletên Xorrî û Mîtanî feodal bûn. Erd di navbera prensên xanedan, mîrên zend û êlan de hatibû parvekirin.[137-59] Ew parvekirin bi sîstema birêvebirana êlên îro li Anatolê dijîn ve hevdû digre û xuyaye ku berdewama hev in. Arkeologê Fransiz Schaeffer 12 km li bakûrê Lazkiye, 40 km li başûrê Hatay, li lîmana Ûgarît û girê (hoyuk) Ras Şamra alfaba Ûgarîtan ya ji 1850 salan BÎ dît. Zimanê wan piranî bi zaraveyek Samî bû. Hinek jî tablet bi zimanê gelê li wir niştecîh yê Xorrî bûn. Ûgarît bajarekî girêdayî Xorrî û Mîtaniyan bû.[94-10] Ew belge jî nîşan didin ku Kurd li wir niştecîh bûne; îro jî li heman cîhî Kurd hene, lê pir heyfe ku ew hatine asîmîle kirin.

Prof. E. Cheîre, li başûre rojava yê Kerkûkê kolanê kirî de bajarê Nûzî derxist. 4000 tabletên li ser hiqûq, rêvebirî û kar ê li wir derketinî yên Xorriyan bûn û 2000 sal BÎ hatibûn nivîsîn.[94-10] Wekî me li sernivîsa nifûs de jî nivîsandî Kurd gelê li herêma heyva bi berekete niştecîh in.

Wadîe Jwaîdeh dibêje: Gel en mîna Gûtî, Lûlû û Kasiyan ê ku li çiyayên

Zagrosan dijîn, gelê herêmê yên herî kevn in û wan gelana hemû bi Elam ve mirovên hev in. Gel e cara yekemîn li rojhilatê Torosan bi cîh bûyî jî Xorrî bûn û tê fikirkirin ku ev jî ji koma Elaman bû.[65] Bi vî awayî tê xuyakirin ku Xorrî xelkekî pir û li cografyeka fireh jiyaye. Ew rewşa hanê jî gelek pirsan bi xwe re derdixe holê. Gelo Xorrî weqas pir bûn, yan jî şaristaniya wan pir pêşketî bû û ji bo wê gelek belav bûn yan jî xelkekî koçber bû ku ji bo ajelan û ji ber dijminan tim cîh diguhartin? Bersiva vê ji alî Xemgîn ve wiha tê dayîn:

Di navbera 4000-3000 sal BÎ de Xorrî ji Ezerbeycanê heta Anatoliya Navîn, ji wir jî heta Hemedanê, di herêmeka pir fireh de nîv koçber dijîn.[4-99] Dîtineka balkêş e. Gelo çima nîv koçer dijîn? Eger mirov şertên wê deme bîne ber çavan û kêdikirina ajelan û bi wan ve debara xwe kirin, divê karekî pir bi istîfade be... Mirov dikare bibêje ku karê vê demê yî herî bi kelk-kar pez xwedîkirin bû. Kurdên ku îro jî bê pez nikarin bijîn û çandeka mezin a ajelan afirandî, wê demê ji bo wî karî diçûn zozanan û ew jiyana 5000 sal in berdewam dike... Eger mirov Kurd be, yan jî rûhiyeta Kurdan (taybet jî yê koçberan) baş nirxandibe dê heq bide vê ditina min. Li navenda Anatolê jiyana wan ji alî seramîkên ji kolaneyên Alaca derketî holê de xuya dike ku 3000 sal BÎ Xorrî li Anatoliya Navîn jiyane.[4-99] Dema min di kovara Veger de ew yeka nivîsî gelekan qerfên xwe kirin lê dîrok vê yekê eşkere dike. Wekî min berê jî gotî; hîna jî belge derdikevine, lê ew ji alî kesên nezan ve tenê derxistin û di malê kesan de tenê vêşartin. Li pêşerojê ew yeka hîna jî eşkere bê dîtin. Hinek jêder û belgên din jî nîşan didin ku Xorrî hemû ne koçer bûne. Yên niştecîh ên bi miletên din re şer kirî û piştre tevlî birayên xwe koçer bûne jî hene.

Lewra belgeyên ji herêmê derketinî didin nîşandan, ku dema Akadî li navîna Mezopotamya bûn desthilatdar, cîranên wan li bakûrê rojava, bakûr û bakûrê rojhilat Xorrî bûne. Ew yeka ji levhê bi zimanê Xorrî yê li bajarê Kiş ê derketinî hatin îspatkirin.[4-99] Ew jî dide îspat kirin ku berî Akadî bên yan jî bi hêz bin Xorrî xwediyê başûrê Mezopotamya ne. Niqta ji alî dîrokzanan ve hîn bi tevahî nehatî pejirandin ev e; yanê Kurd ji wê herêmê mecbûrî çûyîna bakûr û bakûrê rojhilat bûn. Ev yeka di her dema dîrokê de pêk hatiye: Kralê Babîl Hammûrabî (1792-1750 BÎ) dewleta Asûr xeland/xiravê kir bi şûnde bi Xorriyan re şer kir û ew gela ber bi jor, bakûr ajot.[4-102] Ew bûyereka ku ji alî her kesî ve tê qebûl kirin e, lê kes naxwaze bêje ku ew Kurd bûn û koçber bûn. Ji bo ku Kurd di saha siyasî ya cîhanê de ne xwedî gotin in, ew neheqî li vî miletî tenê kirin. Di wê demê de bi pêlekî nû ya ji Amorîtan pêk hatî, gelê kevn bi hêz kir û qedera wî hezar salan ket destên Samiyan. Dewleteka monarşîk a central a bi hêz avakir û gelek belgeyên Sumerî wergerandin û belav kirin.[66] Di dema kralê Asûr Şemsî Adad (1748-1716) de, kralê Babîl Hammûrabî (1728-1686 BÎ) û xanedana Misirê yê XII an de ji herêma Xorriyan koçberiyekê destpêkir û xelk çû Anatolê herêma Hîtît lê bi cîh bûnî û bakûrê Sûriyê. Ew koçberiya hanê ji dora gola Wanê, Zagrosan û bakûrê Dîclê derket û hêdî hêdî dom kir. Xorriyan di sala 1760 an BÎ de li ser herêma di dest Asûrayan yên di nava Dîcle

û Zê re êrîşên bi hêz dikirin. Di dema Hammûrabî de li Sûriyê dihatin dîtin.[94-208] Di van belgeyên dîrokî de jî vekirî derdikeve holê ku Xorriyên li heyva bi heyî niştecîh ji her alî de rastî êrîşan tên û mecbûr dibin ku cîhên xwe terk bikin û ber bi bakûr û çiyan hilkişin. Ev tespît ji bo me pir girîng e. Lewra; **koçberiya Kurdên îro li dervayê welat û yên li Anatoliya Navîn ji wê demê dest pêdike...** Hinek dikarin bêjin îspata wê çi ye? Kevirên ji herêmê derketî, zimanê Kurdên li dervayê welat î di forma kurdiya kevn de, çanda hevbêş a derketî holê hinek ji wan in. Di beşa Sakan de li ser wê koçê emê hinekê fireh rawestin.

Mumkune, ku bê gotin çima tenê ew welata rastî êrîşan dihat? Ne tenê li welatê me, welatên bi heyî hemû rastî ew êrîşana tên. Di roja îro de jî, welatê dewlemend her çiqas rastî êrîşên bi vî rengî neyên jî, rastî hatina penaberan tên... Eger ji alî eskerî û civakî ve, ew welatana ne bi hêz bûyana, dikaribûn rastî êrîşên eskerî jî bihatana. Ji ber ku welatê kalên Kurdan yê li ser maden, riyên ticaret, cotkarî û ajaldarî ye pêşketibû, ji çar aliyan ve bû sedema êrîşan. Di navbera salên 2000-1500 an BÎ de, konfederasyonek ava kirin, lê bi qasî Hatiyan bi ser neketin û navendî nebûn.[72]

Bajarê Ûrkîşê li rojhilatê Dicle cîhê herî kevn ê Xorrî lê niştecîh bûne û li nava 3000 sal BÎ li bakûrê Xabûrê (Heskîf?) derbasî jiyana rûnişkandinê bûn. Belgeka Xorriyan li Kultepe hatî dîtin de dinivîse, ku Xorriyan derdora 2000 sal BÎ de li Anatolê dewletên biçûk avakirine.[4] Ew dewletên biçûk mirov dikare wek dewletên federasyonên êlan fêhm bike. Dewleta Tirkan ku dixwaze Heskîfê di bin avê de bifetisîne, sedema wê jî ewe, ku desthiladar naxwazine ku ma çand, dîrok û koka Kurdan eşkere bibe. Îro ji ber vê ta û janê, ew hewl didine ku wê şaristaniyê rojekê zûtir bikujin ku têzên xwe yên pûç û pelax berdewam bikin...

Li Kilîkya yê, Xorriyan BÎ 2100 an de seramîka rengîn bi pêş xistin. Dîsa li Meletî, Elezîz û Mûşê jî ew seramîkan derketin û tê wê watê ku Xorrî li wê herêmê hîn zû bi cîh bûne. Gelek belge didin xuyakirin ku va xelka 2000 salan berî BÎ li vir jiyaye; bajar û dewletên êlan avakirine. **Berî vî netewî ti îşaret tunin ku netewekî din li wê herêmê jiyaye**. Gelek belge, name derketin holê û ji wan di yekê de, vekirî tê gotin ku ji Meletî-Mereşê hetanî Derya Spî dewleta Xorrî ye.[4] Li dervayê sûrên Kerkûk û Nînova, M. Mallowan kolanê kirî de raste kav/fîraq û kacaxên Xorrî û Mîtaniya hatiye.[94-67] Li Meletî, Elezîz, Mûş, Erzirûm, Kaxizman, Wan firaqên Xorriyan yên 3000 sal BÎ hatin dîtin.[94-79]

Me li jor, ji Xemgîn ragihand ku Xorrî di dema Hammûrabî de, carna jî tê nivîsîn ku 3000 sal BÎ ew ber bi rojava çûne; 3000 sal BÎ de li dora gola Wanê belavbûna Xorriyan ya ber bi başûr û rojava destpêdike. Li rojava heta Toros û Kîlîkya ye çûn û li wir kraliyeta Hîtîtan tehdît kirin. Li Kîlîkya herêmeka bi navê Kizzûwatna hebû û payîtextê xwe bajarê Kûmme (Osmaniyê?) bû. Gel e li wir jî ji Xorrî û Lûwiyan pêk dihat û bi Xorrî dipeyivîn. Abdulhamdî Toplû, wê dipejirîne lê qala Lûwiyan nake.[27] Mumkune ku ew koça çend caran jî pêk

hatibe, lê yên hatinî tespît kirin nika ew in. Xuyaye ku Xorriyan bi Lûwiyan ve di nava aştiyê de jiyane; lê Lûwî kî bûn? Mihotûlî dibêje: **"Gelê li Anatolê yê herî kevn Lûwî ne. Ew jî ji koma zimanê Ariyan in û di zimanê wan de tê wata "welatê cîhê bilind."** Pêş Anatolû bibe Helen, Lûwiyan di heykelên yezdaneyên xwe de xweda yê tirî Tarhûzza bi kar tanîn. Ji ketina Troya şûnde, hesin û tunc kete dest Helenan û êdî bûn hêzeke li hember rojhilat. Heta Firat Helenîzm pêk tê. **Lûwî ji holê radibin, Frîgya û Lîdya** jî vê qederê parve dikin. **Lûwî bi Hatiyan ve mirovê hev bûn**. Di sala 1200 an BÎ de li împaratoriya Hatî nivîsa Lûwî ya hiyeroglîf (wêne) bi kar dihat. Ew zimanê gelê bû; lê nivîsên din bi Akadî, Asûrî û Xorrî bûn.[87-96] Ez di vê baweriyê de me ku Lûwî jî êleka Kurd bûn; şerê Troya jî şerê Grek û Kurdan bû. Di fîlmê Troya de jî îşaretên vê hene, di vir de serê jinên di malbata kraltiya Troya de bi zêrên îro Kurdên Xorasanê bikar tînin girêdayî ye ku gelek balkêş e. Dîtina dinê girîng jî ew e ku dibêje: Xorrî, 2300 sal BÎ ji çiyayên Sabalan (başûrê Derya Kesk) hatin û mîrîtiyên bajarî ava kirin. Di cîhekî din de jî dibêje: -Li bakûrê Sûriyê û rojhilatê vêderê, hebûna Xorriyan ji 2300 an BÎ vir de tê zanîn- Di salên 1500 BÎ de jî, li bakûrê Sûriyê dewleta Mîtanî avakirin; gelê vê dewletê jî Xorrî bûn. Komek mirov hatin û ew birêvebirin. Ewên ku va dewleta çêkirin û birêvebirin zimanê xwe mîna Îranî ya kevn e. Mîtaniyan ragihandina xwe bi zimanê Xorrî dikirin. Heta baweriyê bi çend Xwedayên wan tanîne.[80] Bi dîtina min Xorrî ji Xorasan heta Fîlîstîn diçûne û dihatine. Ji bo vê jî navê bajarê Tehran a kevn **'Rê'** ye. Ango ew li ser riya çûyîn û hatine bûye. Yek jî bi hatina Ereb û Asûriyan re Kurd ber bi bakûr, bi taybet jî dora Derya Kesk ve çûn. Ji bo vê ji destpêka dîrokê ve, ew herêma warê Kurdan e. Gor rewşa avûhewa û gelên êrîşkar, ew carnan dihatiye guhartin; lê xeta bingehîn ew e, ku Kurdên-Xorriyên di navbera Xorasan û Filistîne de nîv koçer bûne.

Ji nameyeka derketî tê fêhm kirin, ku di navbera Mereş, Meletî û Derya Spî de dewleta Xorriyan ava bûye.[4] Ew name beşekî Xorriyan dide xuyakirin, lewra wana gelek bajar-dewlet avakirine û piraniya wan jî di nabera Derya Spî, Firat û bakûrê rojavayê Sûriyê de bûne. Wekî din jî li her alî Kurdistan dewlet û warê wan hene. Ji wê mektûbe jî xuyaye ku Kurdan bi dilê xwe cîhên xwe terk nekirine û bi zora dijmin ew ber bi bakûr ve çûne. Lê ew îddea ku Xorrî bi rêyeka aştiyane hatin başûr zêde ne di cîh de ye: Xelkê Xorrî ji gelek êlan pêk dihat û li başûr û rojhilatê Derya Kesk dijiya. Wek êl û zendan ji wir ew hêdî hêdî û bi rêyeka aştiyane hatin Mezopotamya.[94-140] Xelkê bi darê zorê ber bi bakûr hilkiştî bi rêyên aştiyane ne; lê mumkune ku ji sistbûna dijmin sûd wergirtibin û dîsa jî hatibin cîhên xwe yên berê. Di vê vegera bi israr de qerektera Kurdan ya ku welatê xwe terknakî derdikeve pêş. Hîna jî ew israra vegera welatê xwe berdewam e. Yekê jî sîstema wan ê civakî û maldariya wan jî ew mecbûrî vê dikir, lewra ji bo ajalên wan zozan û beriyên herî baş ê li Kurdistanê bûn. Sîstema wan ê rêxistinî jî wan dîtinana û belavbûna wan ê li cografya fireh dide îspatkirin. Ji bo wê ew hertim bi hev re tevnedigerîn,

carnan di aliyên cûda de jî diçûn. Yanê belgeyên li Kerkûk û Meletî û cîhên dinê jihev dûr derketinî vê didin xuyakirin.

Gorî dîtina W-N Torî, Xorrî ji çend birran pêk dihatin û welatê wan rojhilat û başûrê Derya Kaspî yê bû. Wana ber bi bakûrê Mezopotamya belav bûn û 2000 sal BÎ heta çemê Diyala dirêj çûbûn.[11] Bi dîtina min, mirov ji şûna welatê wan re bêje cîhê wanî zozanan yan jî cîhê wanî demên teng baştir e. Lewra Kurd ji bo ajalên xwe û ji bo ewlekariya xwe diçûn vê herêmê. Ew birrên ku tenê qalkirin, îhtîmaleke mezine, ku federasyonên êlên Kurmanc bûn. Heta salên 1500 an PÎ jî ew jiyana federasyonî berdewam dikir û carna jî li hember dijminan, ew dibûn konfederasyon û dewlet...

Dr. Hellmut Chrîstoff jî ji bo Kurdên ku zivistanê diçûne Sûriyê û stebên Mezopotamya û li başûrê Torosan ajel xwedî dikirî re dibêje Kurdên ku mîna eslê xwe manî; evê din jî mîna wan bi nav dike û wek mirovên baş nîşan dide. Dema diçûn Sûriyê her tim bi Bedewiyan re şer dikirin. Carna bi Ermeniyan ve di zivistanê şêk/dijwar di şikeftên bin êrde de derbas dikirin û ji bo yemî ajela jî tim bi hevra diketin nava nakokiyan.[12] Çiqas balkêşe ku heta sedsala dawîn jî ew rewşa hanê berdewam dikir. Kurdan bi Erebên ji bo şêlandinê ji başûr dihatî re şer û pevçûn dikirin. Bi Ermeniyan ve jî gelek caran hevkarî dikirin, gelek caran jî nakokiyên ji bo berjewendiya, di navbera wan de derdiketin. Heta îro li navenda Anatolê ji bo vê çîrokekê* heye ku tê qalkirin.

Prof. J. Friedrich dibêje: Morfolojiya zimanê kurdî bi morfolojiya zimanê Xorrî ve hevdû digre. 2000 sal BÎ va xelka li alî bakûrê rojava yê Mezopotamya, bakûrê Sûriyê jiya ye.[12] Di alî ziman de jî yekbûna wan ti gumanê nîne ku ew ji yek netewê ne. Torî, cografya vî zimanî ji wiha nîşan dide: Zimane Xorrî li destpêka 2000 sal BÎ di navbera Gola Wanê û Firatê de dihat deng kirin. Çemê Firat di navbera Hatî û Xorrî dipeyivî de sînor bû. Xorrî diket nav koma zimanên Hînt-Ewrûpa, Hatî jî diket nav koma zimanên Asya Pêş. Xorrî bi Ûrartûyan ve tê gotin ku ji sedî sed ji heman bapîran bûn û zimanekî nêzîkî hev bikardianîn (Torî). Mumkune ku ew bi zaravê zimanê kurdî axêf bûn; wek Kurmancî û Kirmanckî.

Dîrok, jiyana civakî, belgeyên ji xirbeyan derketinî hemû yekbûna Kurdan û Xorriyan didin îspatkirin. Aliyê Xorriyan yê çandî jî vê yekê hîn bi hêztir dike. Bi taybetî jî zimanê Xorrî û kurdî gelek nêzîkî hev e, yek e. Li ser ziman Torî van agahiyan dide: Çanda Xorrî û Kurdan ji 11000 sal BÎ vir de bi

*Salekê zivistan pir şek derbas bû; Kurdên xwedî pez jî ka teva kir û ajel birçî man. Herder di bin berfê de bûn û bihar mabû derengî. Rojekê yê Kurd tere ba cîranê xwe yî Ermen û jê kayê dixwaze. Ermenê keysperest dibêje: " Eger te xwîşka xwe da min, ezê ka bidim!" Kurd bi xemgînî vedigere mal û ji xwîşka xwe re qal dike. Çend rojên din derbas dibin û pez edî hiriya hevûdû dixwe. Eger ew nihata rawestandin pez di nava çend rojan de hemû qir dibû... Xwîşka mêrê Kurd, êvare ji birayê xwe re dibêje: "teklîfa Ermen qebûl bike!" Lê êvarê xew nakeve çavên wê û heta sibê digrî û distirê: "De ware ware xêrbiyo ware, zimanê wî gawirî bibire, birango rabe pez berde, xwangê xwe ji gewir berde..." Heta sibê bayê xerbî tê û berf dihele û pez tê berdanî derva...).

berdewamî hevdû digre û ji belgeyên arkeolojîk bigre hetanî hevdû girtina ziman de gelek belge hene. Gramatîk, morfolojî ya zimanê Xorrî wek kurdî ye, wekhevbûn nîşan dide ku kurdî ji Xorrîtî tê.

| Xorrî | Kurdî | Xorrî | Kurdî |
|---|---|---|---|
| Bawr | gewr/mor | urh | rast |
| Man | man/bûn | tal | dar |
| Ard | gund | lut | jin |
| Gavt | ceh | gult | gav |
| Elm | sond | sêl | heyv |
| Sêr | şev | şîr | du |
| Zêl | cerg/kezeb | ard | dan |
| Ahr | qehr | hubr | dû/dûman |
| Egî | sar | eka | yek |
| Panca | pênc | pitq | pituk/dergûş |
| Henna | hema/niha | has | hîs [94-17/21]. |

Heta vir me ji dîtineyên cûda îstîfade kir; van dîtinan nîşan û îspat kirin, ku li cografyayên cûda dem bi dem dewlet û desthiladariya Xorriyan ava bûye. Ji bo me xeleka girîng, gor îşaret û belgeyên derketî, Xorrî kalên Kurdên îro li dervayê welat in –koçber in-. Ew li cîhekî ku ji cografya Kurdistanê ya îro hê firehtir jiyane. Lê ji ber êrîşan carna ber bi jor carna jî bi milên din de fireh bûne. Gelek dîrokzan hemfikirin ku Xorrî zendêkî (federasyon) êlan bûn, yan jî wek konfederasyon dijîn. Xuyaye ku di demên teng de dibûne konfederasyon û di demen aştiyê de jî wek federasyona êlan jiyane. Ji bo vê jî gelek dewletên bajarî avakirine û kêm navendî bûne. Xorriyan wek êl hebûna xwe berdewam dikirin. Ew dîtin ji alî kesên din ve jî tê parvekirin: Te zanîn ku bûn nîv dewlet jî. Ji kolonyalîzma Sumeran şûnde bûn xwediyê dewletên bajarî. Ev jî mînakên mîna, Ûrkîş, Nûzî, Ûrfa û Samsat ve tê zanîn.[75]

Heta demên dawî jî li Anatoliya Navîn êl wek sîstema federasyona dijîn; her êlêkê serok û civata rûspî yên xwe hebû; dîsa di civaka mîrêmîran de jî serokên her êlê amade dibûn. Rêvebiriya Xorriyan wekî me got: xwe mîna bajar-dewlet bi rêxistin kiribûn. Ez vê sîstemê wek êl-dewlet dibînim. Heta sala 2000 an BÎ jî wan dewletan xwe li bakûrê Mezopotamya û Sûriyê parastin. Hemû bajar-dewletên Xorriyan ji Zagrosan heta Derya Spî belav dibûn. Xemgîn: Di nivîsa hezar û 1900 sal BÎ de Meletî wek Mîlîda derbas dibe û qala bajarekî bi navê Samûra ya li kelêka Firat jî tê kirin.[4-119] Di dema Akad de bajar-dewletên Xorriyan ev bûn: Hîbîlat, Gûmarsî, Mardaman, Nawar, Rûmûs, Samrûm, Şerşî, Satarsa, Sîmarûm, Sîmamûm, Ûrkîş (Amûdê 2000 BÎ Paytexta Xorriyan e), Ûrblûm (Hewlêr) bûn. Di dema Babîla kevn de jî bajarên mîna: Arrafa (Kerkûk), Nûzî, Mûkîş, Amûr, Taîte, Waşşûkkanî, Kargameş û Ûrkîş lê zêde bûn. Di dema Asûr de jî bajarên li bakûrê Dîcle ev in: Paphî,

Kadmûhî, Bûssî, Alzî, Madana, Nîhanî, Alalîa, Tûbûrzî û Pûrûlûmziy bûn. Li bakûrê Sûriyê jî Alalah, Ûrşû, Haşşû, Ûgarît, Gûbla, Qatna, Qadeş û Kinza bû. Li Zagrosan jî: Zamûwa, Zohap, Zîhaw, Helwan, Namrî û Haşmardî bûn.[94-83] Ji Zagrosan heta Derya Spî bajarê Xorriyan ye girîng Arrapcha, Nûzî, Mûkîş, Armûr, Arapa, Hanîgalbat (Bakûrê Sûriyê) Taite û Karkamîş (Mereş) bûn.[11]




**Bajarên Xorrriyan** [94-173]

Heta vir me hewl de ku li ber çava raxin Xorrî kalên Kurdên koçber in. Lê belgeyek heye ku mirov nikare ji vê zêdetir aşkare û îspat bike ku koka Kurdên koçber û Xorriyan yek e. Xwezî îmkan dest bida ku me ew bi wêne jî pêşkeş bikira lê îro ev ne mimkune. Em bi vê hêviyê ne, ku ciwanên me û rewşa dinyayê ku tê guhartin rojekê wê jî û belgeyên din jî derxe ronehiya mirovatiyê. Di kolandinên li Alalah (Bakûrê Sûriyê/Helep) de kevirekî bi zimanê Xorrî yê li sala **1650 BÎ** hatî nivîsîn derket. Di wî kevirî de: navê mehên salê, agahî li ser gelên dinê li dora wan û agahî li ser Xorriyên Helebê dijîn ku ji wan re **Çûxreşiyan** dihate gotin heyî derket! Berî her tiştî em peyva Çûx-reşî-yan zelal bikin. Çûx, basme ku li xwe dibî, yan jî wê çaxê fistanê ku bi ris (hirî) didrûne.. Reşî jî federasyona êlan ya bi nav û deng e. Mirov dikare bêje ku: Reşî yên çûx li xwe dikirî yan jî ewên ku çûx didrûnî û difirotinî… Gelek êlên Kurd ên navê xwe nêzîkî vê jî hene, wek mînak: Ebareşan, Kumreşan, Qotreşan

û hwd. Gelo îro jî ew êla hene? Belê. Di heypeyvîna min (2001) bi rehmetiyê Prof. Şeref Aşîryan (Rûsya) re kirî de, digot: Çûxreşî li bajarê Grasnadarê de îro jî hene, ola wan Êzidiyatî ye û pismamê Reşiya ne…Îro ew ÇûxReşiyan e li Ermenîstanê herêma Elegezê, gundê Camûşwanê, gundên deşta Araratê û Tiflîsê dijîn û Êzîdî ne. Taybetmendiya wan jî ew e ku ji jiyana azad hez dikin û tevlî êlên din nabin. Reşî jî li Tiflîsê, hinek li Ermenîstanê û deşta Araratê hene ku Êzîdî ne. Taybetmendiya wan jî ewe ku: hinekî ferdî ne, çanda xwe gelek xweş parastine û di alî çandî de azad in. Ji wê eşkeretir kîjan milet dikare dîroka xwe bide îspat kirin? Di gotina rehmetî de jî vekirî xuya dike ku ew Kurdên Çûxreşî yên îro li Rûsya yê hem Kurd in, hem jî Êzîdî ne, hem koçber in û hem jî pismamên Reşiyane ku îro jî zindî û li ser piyane. Tene ew hevoka dîrokêka bi çar hezar salan dide ber çavan…

Gor belgeyên ji Alalah û Boxazkoy derketinî, fermandarê artêşa bajarê Allepo-Helep navê xwe **Zukraşî** bû. Ew bi xwe ji Xorriyan bû.[11-26] Di navê wî fermandarî de jî diyare, ku ew ji konfederasyona Reşiyan e. Dîsa gor belgeyên ku derketî; prensê Yerîsalemê (Qudsê) yê bi navê Arad-Hedad navekî Xorriyan bû. Navê bi ar-agir dîsa balkêşe. Misiriyan ji bo Filîstîn digotin **Huru** û gelek nivîsên derketî nîşan didin ku Xorrî li wir jiyane.[11-31] Li rojavayê Enqere gorekî Xorriyan hate dîtin, ji ber ku Xorriyan mirî dişewitandin û dikirin kûpan û wê çaxê ew sîstema hîn li Anatolê bi kar nedihat.[11-27] Heta tê gotin ku bajarê Enqere jî navê xwe ji kurdî girtî ye; lewra di zaravê dimilî, soranî û şêxbizinî/ lerî de Engûr tirî ye.[71-39] Ew belgeyêna jî didin îspatkirin ku Xorrî berê li rojavayê Enqere jî jiyane. Ew belgeyên-sinî ya li gundê Omê derketî jî vekirî didin xuyakirin ku ew li wir jiyane. Mirov dikare wan sînoran heta Derya Ege jî fireh bike.

Gelek belgeyên bi Xorrîtî hatî nivîsî yê ji salên 1500-1300 an BÎ de manî jî li Raş Şamrê, Tûnnîp, Qatna û Alalah derketin û alavên Xorriyan bûn. Gel en li wir dijîn bi piranî Xorrî û Semîtîkên rojava bûn. Xorriyan bandoreka dinî ya xurt li ser Semîtiyan çêkiribûn.[94-109] Îhtîmaleka mezine, ku Semîtiyên wir Asûrî û Suryanî bin û di bin bandora ola Xorrriyan de mabin.

Xorrî di sala 1600 an BÎ de, ji rojhilatê Dîclê heta Kerkûk, Silêmanî; ji wir başûrê Sûriyê û heta Wan û Ûrmiyê kiribûn bin destên xwe. Lê di wan salan de Hatiyan bajarê Xorriyan ya girîng Heleb servegirtin. Di sala 1559 an BÎ de, kralê Hîtît Murşîlê yekem êrîşî Babîlê kir û li vegerê dewleta Xorrî ji holê rakir. Ji mirina Murşîl şûnde Hatî perçe bûn û di 1550 BÎ de Xorriyan dîsa dewlet avakirin. Kralê xwe jî Parattarna bû. Kralê duyem jî Saûtarna (1520-1480) ye û wê demê dewleta Misir û dewleta Kurd ê bi navê Kardûnaj di alî polîtîk de di astekê de bû.[4]

Di dema kral Sausstar de Xorrî dewleta li Anatolê ya herî bi hêz bû. Heta Kerkûkê di destê wan de bû û li gelek cîhan jî mîrîtiyên wan ên serbixwe hebûn. Bi Misir ve têkiliyên wan baş bûn. Kral Aratatma (1445-1405) keçka xwe da kralê Misir Tûdmozîs.[4-106]



**Kralê Hîtîtan**

**Hinek kralên Xorriyan:**

| **Xorrî** | **Lûlû** | **Gûtî** | **Akkad** |
|---|---|---|---|
| Arî Şan | Anû Babanî | Basîûm | Sargon |
| Atal Şan | 2800 | Sa Ratîgubasin | 1227-2221 |
| Tîşarî | --- | Enrîdûwazîr | Naram Sîn |
| 2200 | Satûn | Elûlûme | 2196-2160 [94-309] |

Piştî Saûtarna hate kuştin, lawê wî Arartama II (1390-1352) hat cîhê wî. Ji ber têkîliyê wî û Misir, di nava dewletê de serhildan derket û kral hate kuştinê. Lawikê Tûsrata[52-1340] hat û cara yekem wî xwe wek dewleta Mîtanî û gelê Xorrî de nasandin.[4-107] Sedema vê nasandina cûda bi dîtina min ew e, ku Mîtanî federasyoneka di nava Xorriyan de bûn. Dema desthilatdarî heynan destê xwe dewlet bi navê xwe xwendin û navê Mîtanî kete rojava dîrokê. Gel e Xorrî jî di wir de wek Kurmancan tê xuyakirin. Yanî rêvebirê dewletê yê ji êl yan jî federasyona êla Mîtanî ye, lê hemû wek Kurmanc tenê dîtin.

Kralê Asûr Addad Nîrarî (1275 BÎ) êrîşî Mîtaniyan kir; Mîtaniyan ji Hatiyan alîkarî xwestin, lê piştgirî ji wan re nehat. Mîtaniyan şer wenda kirin; Harran û Tûr Abîdîn kete destê Asûr û herder şewitandin. Piştî van şeran em êdî şerên herêmî dibînin. Xelkê Hanîbalgat raperîn kir û dewleta Xorriyan a biçûk avakirin lê Salamanasarê Asûr di sala **1250 an** de ew ji holê rakir. Bi ser vê de xelk ber bi bakûr helkişt û dewleta Ararat (Ûrartû) avakirin. Dema

kraltiya Xorrî-Hatî ya girîng li Asya Pêş hate hilweşandin, li hember êrîş û çespandina dijminan, gelê li Filîstîn, Sûriyê û Mezopotamya koç kir û ber bi bakûr helkişt.[87-117] Ji vê demê bi şûnde êdî Kurd hêza xwe li **welatê bav-kalan winda dikin û mumkune ku piraniya wan vê demê çûbûn bakûrê Derya Reş û navenda Xorasan û Gola Aral...** Ew yeka heta dema Medan bi vî awayî berdewam bike û Kurd êdî mecbûrî ciyan bibin...



**Bajarê Alaca- Deriyê Kral BÎ 1300**

Dîsa di sala 1100 an de **grûba Mûşkî** dewleteka Xorrî ava kir. Di belgeyên Asûr de tê xuyakirin, ku berî Medan di navbera Hezar û Ûrmiyê de dewleta bi navê **Manerê** hatiye damezirandin. Di heman belgan de di wan herêmana de 2000 sal berî zayinê Med (Kurd) jiyane û ji bo ku ji hev belabûne her tim rastî êrîşan hatine.[52] Gor dîtineka din jî va gela li herêma Meletî, Heleb, Semsûr û Wanê dijiye û berî wan jî tu gelên din tunin. Bi dîtina birêz Burkay 3000 sal BÎ Mezopotamya welatê Sûbariyan bû. Sumeran ji wî welatî re Sûbir, Akad an Sûbartû digotin. Lê navê vî gelî paşê hat bi navê Xorriyan ve hate veguhastin û ji Derya Reş heta Zagrosan bûn hêza yekemîn. Di sedsala XV an BÎ de jî li nêzîkî Antakya piraniya gelê Xorrî bûn û piştî Hîtît jî têk birin bûn desthilatdarê sînorên Kurdistana îro. Li rojava Kîlîkya û li başûr jî Sûriyê zept kirin û paytextê xwe bû Riha. Wê demê cîranên xwe li başûr Akad bûn û Mezopotamya di bin kontrola wan de bû. Hîtîtiyan jî ji Qefqasan hatin Rojavayê Xorriyan bicîh bûn û Bogazkoy ji xwe re kirin paytext. 1800 sal BÎ Xorrî heta Misir, kembera Deryaspî jî kirin bin kontrola xwe.

Birêz Îzady dibêje: Digel bi hakimbûna çandeke nû (Ûbeydî) ya li Kurdistanê re, Kurd bûn hakimê çiyan. Niha ji bo koka wan belgeyên qetî nîn in, Xorrî, piştî desthilatdariya Ûbeydî yan 1000 salan bi şûnde, ya niştecîhên herêmên maf daxwaz diki, yan jî gelê koçber bûn. Lê tê fêhmkirin ku Xorriyan, di bin hêzbûna xwe ya çandî de gelên li Zagros-Toros di bin yek nasnamê de gîhandin hevûdû. Lewra li Başûrê Kurdistan-Gûtîûm, Ûrartû, Alalah û

Hatûşaşê zaravayên cûda yê Xorriyan bikardihatine ku va hatiye îspatkirin[154-70]. Birêz Îzady îddea dike ku; Êla Canpolatê ya bi nav û deng ji Qirna Navîn vir de li Payas-Îskenderûnê dijî ye. Hebûna Kurdan ya li wir ne rastiyeka dem demî ye. Kurd ji kalên xwe Xorriyan vir de li Edene, Îskenderûn û Antakya yê dijîn. Nivîskarê Roma, Pliny Mezîn, PÎ sedsala yekemîn de êlên Kurdên li wir rêzdike û qala **Belikan û Bahraşan** dike. Ew û gelek êlên din 1900 salan li wir dijîn.[154-36] Bê guman hebûna Kurdan yê herêmê kevne; lê di dema Asûriyan de êlên ku desthilatdariya wan pejirandin man, yên din ber bi bakûr hilkişiyan.



**Hatûşa**

2000 sal BÎ, ji Qefqasan Hîtît hatin û li rojavayê Xorriyan bi cîh bûn. Çanda Hîtîtan gelek di bin bandora Xorriyan de mabû, nivîsa wan jî fêr bûbûn. Gor belgeyan, Xorriyan li salên 2300 an BÎ de li Kîlîkya bi cîh bûn û bi Gûtî, Kasî, Lûlû, Elam û Mar an ve heman netew in. Beşa herî mezin Xorrî bûn.[4-100] Wekî tê dîtin hemû jêder û nûser destnîşan dikin ku Xorrî Kurd in. Di wê de ti guman nîne û ez bawerim di demên pêş de ewê hîn zelaltir bibe. Piştî Xorriyan, Mîtanî yên ji navê derketinî dewlet avakirin û di dîrokê de rolên girîng lîstin.

## MÎTANÎ (Marîannî-Mêranî)

Wekî tê gotin Mîtanî ji nava Xorriyan derketine; îhtîmaleke ku yan ew perçe bûn yan jî ji konfederasyon-dewleta Xorrî federasyona Mîtanî veqetî û dewleta xwe ya serbixwe avakir. Gelo mirov dikare bibêje ku ew têza ku dibêjin Kurmanc wek Zil-an û Mil-an bûn du beş, koka xwe ji wir digire? Îhtîmaleke. Lê dikare ji wir jî were ku konfederasyonekî mîna Xorriyan mohra xwe li dîrokê xistî di vê demê de parça bû û ew jî heta roja îro hat. Heta mirov dikare bipirse gelo navê Milan jî ji vir tê? Li derdora sedsala X an PÎ de jî perçebûneka bi wî rengî ye, di dîrokê de heye û têza nêzîkî rastiyê ewe, ku ew li wê sedsalê parçe bûn. Lê mirov dikare wê teza ji dema Xorriyan jî bi tevahî red neke...

Li ser navê Mîtaniyan Torî dibêje: Bi piranî di peyva Sar Mîtanî û Mîtanî de derbas dibe. Ev peyva di wata polîtîk û cografîk de paralel hatiye bikar hatin. Di nivîsên Boxazkoy de: Hur-la-as, Kur-e û Mî-ît-ta-an-nî bi Kur-kur-meş, Harî û **Mît-ît-tan-nî** ve cîh guhartî hatiye nivîsandin. Di vir de xuya dike ku Mîtaniyan xwe wek Xorriyan didaye nasandin.[94-212] Ew rastî ya ji Xorriyan veqetandinê dide nîşandan. Gelo mirov nikare wan navana heryekî wek federasyonê ku konfederasyona Xorrî tanînî meydanê şirove bike? Gor praktîka piştî du hezar salan ez wê encame derdixim, ku Xorrî di destpêkê de konfederasyona sê federasyonên Kurd bûn. Yekemîn Mîtanî jê veqetîn û serbixwebûna xwe îlan kirin.

Mihotûolî dibêje: Mîtaniyan xwe wek **"Marîannî"** ku têyî wata leheng bi nav dikirin. (Asûriyan ji vê re digotin Hanîgalbat).[87-114] Navê ku wan li xwe dikirî girîng e, di vir de peyva esil ziman û koka wî netewî dide eşkere kirin. Ew navê esasî ye, yên dinê mîna Mîtanî bi piranî ji alî gelên din ve û piştre lê hatine dayîn ku gelek caran ew tên guhartin. Peyva ji bo xwe bikartanînî jî formeka mêr-mêranî ya Kurmancî ye, ku hîna jî bikar tê. Mumkune ku ew koma ji êlên Kurd pêk dihatî gelek şervan bûn û ew navê mêranî li ser mabe. Mirov dikare bêje ku têkiliya wî navî bi bajarê Mêrdîn û konfederasyona Milan re jî heye. Lewra bajarê Mêrdînê dikeve nava herêma Mîtanî ku lê jiyane.

Li ba Mêraniyan jî sîstema konfedere hebû; her kes di nava êla xwe de serbixwe bû, li derva girêdayî kral/mîrê giştî bûn û herkesî hêza xwe eskerî hebû. Edet û ola wan mîna kalên xwe Gûtiyan bûn.

Padîşahe Asûr Tiglatplaser di pirtûkê xwe de dinivîsîne, ku Ûrartûyan Nayrî yên girêdayî Mîtaniyan, welatî xwe yî: ji bakûrê çemê Dîclê û Firat, Xarpût, Dêrsîm-Bedlîs û li başûr dirêj dibe; ji wir jî heta çiyayê Torosan dirêj dibû. Ji vê jî ev dertê, ku Ûrartû dewleteka ji konfederasyona Mîtanî û gelê Arya yê li Araratê pêk dihat.[17] BÎ di sala 715 an de bakûrê Sûriyê di destê Mîttaniyan de bû, lê Mîtanî bi êrîşên dawî yên Hîtîtan qels ketin. Mêraniyan ji kesên di ereba hespan yê şer de digotin "Meryannî". Zanyarê Mîtanî yê bi navê Kikkulis li ser giya û hespan têzek amade kir û ev di arşîvên Hîtîtan de ye û rastî eve ku ev ji welatê Mîtaniyan (Mêrdîn) ê hatiye. Di salên 1700 an BÎ de welatê Mêranî di navbera ava Çaxçax (Nisêbîn) û Circipê de bû. Pey Mêraniyan, Nehrî mîrnîşîneka din li Araratê sererast kir. Nehrî di 1500 an BÎ de ji Araratê heya Torosan mîrîtiyek saz kiribûn. Nehrî birreka Sûbarîne û Kurd in. Rojhilatzan Majarson dibêje: Navça Nehriyan ne tenê dora çemê Zê ye. Padîşahê Asûran Tiklat Palazarê yekemîn û neviyên wî dibêjin ku gelê ku li serê kaniyên Dîcle û Firat û bakûrê çiyayê Nîfast (Bedlîs, Amed, Xarpût, Dêrsîm) û çiyayên Torosan desthilatdarî dikir. Ev welatê Nehriyan e û di hengama Îskenderê mezin de navê **Kurdûwan** stendibû. Nehrî bapîrên Mad û Kurdên îro ne.[9]

Nivîskarê Tarîxî Ûmûmî Mûerrixîn dibêje: Di salên 1600 an BÎ de mîrnîşîna Mîtanî ya jêhatî, şervan û pir xûrt bû. Ji alikî ve rojavayê Kurdistanê

bi giştî; Sûriye, Amûra, Arafa (Enqere, Anatol) û Asor di bin destê Mîtan de bû û ji Mîtan re serê xwe nizm dikirin. Tê fêm kirin ku Mêraniyan xaka Xorriyan bi tevahî kirinê bin desthilatdariya xwe. Ew sînî û heykelên li Navenda Anatolê derdikevin jî vê didin xuyakirin. Jêderên dîrokî dibêjin ew di dema Kassiyan de derê pêş ketin. Sînorên dewletê li destpêkê ji Firat heta Xebûr û Torosan dirêj dibûn. Paşê heta Antalya û Îskenderûnê sînorên xwe fireh kirin. Li destpêkê paytextê xwe Riha bû. Dema xwe ya herî bi hêz jî BÎ 1600 an de bû. Mêranî vê demê li başûrê Mezopotamya bi Asûriyan re û li başûr jî bi Misiriyan ve di nava gelek têkîliyên cûda de bûn. Ew têkilî carna wek şerên dijwar, carna wek kirîn û firotin, carna wek mirovatî û gelek cûreyên din de pêk dihatin.

Tekiliyên Misir û gelên Arran bi şer destpê dikin. Misirî, ber bi bakûr derbasî tevgerê bûn; bi Mîtaniyan ve şer kirin û welatê wan talan kirin. Bi ser vê de, demeka heyiyê/dewlemendiyê dest pê kir. Ji ber ku, ji cîranê xwe Asyayî, bi taybetî jî ji dewleta Mîtanî gelek xenîmet digirtin. Ji wan dîl girtin, tiştên şer guhartin û gelek xenîmet jî bi dest xistin; bi vî awayî di welatê Misir de heyiyek çêbû. Bi taybetî jî di dema kral Thutmosis III an (1493-1438) de 17 caran êrîş li dij Kurdan hatin kirin. Wî kralî berê dixwest peravê Derya Spî heyne. Paşê gihîşt Kadeş ê. Di bin serokatiya kesê bi navê Furstenê ji Kadeşê de îttîfaqek çêbûbû û bi mehan şer kirin. Artêşa îttîfaqê ji xwe şûnde gelek erebeyên şer û çek cîh hîştibûn. Di êrîşa heştan de (1457) artêşa Misir gihîşt Firatê. Di nivîsekê de tê gotin: Sê serokên êlan û 30 jinên wan; 80 dîlên şer, 306 kolê, jinên koleyan, zarokên wan û weqas kesên sivîl, zarok û jinên wan jî min dîl girtin..." Di dema Thutmosis IV an de hikumeta Misir êrîşên xwe li dij Asyayî yan dev jê berda. Ji ber ku kralê Mîtanî razi bû ku keçika xwe bide kralê Misir. Lê vê carê jî Hîtîtan dijminatiya Misirê kirin.[69]

Di kolînên Amarna yên li Misirê de 350 nameyên dîplomatikê li ser textên ji heriyê hatî çêkirin derketin holê (1887). Evên balkêş ji alî kralê împaratoriya Mîtanî, **Tushratta** ve hatibûn nivîsin. Ev piştbazêkî Misiriyan girîngbû. Ji kralê Misir re keçikên xwe tim dişandin. Yek ji wana jî **Kija (Kejê)** bû ku bi kral Akhenaton (1353-1336) re zewicî û jê lawikek bû. Ji ber ku jina xwe berê Nefertîtî çar keçik anîbûn, qîmeta Kejê zêde bû û jê re şato hate çêkirin. Hinek jêder dinivîsînin ku Nefertîtî Kurd e, lê ew ne di cîh de ye. Ji wan nameyan yekê kralê Mêranî ji dayika Akhenaton Tejê re dinivîsîne û loma jê dike. Di namê de dinivîsîne ku; diyariya ku bavê Akhenaton soz dabû, Akhenaton neşandine. **"Min ji mêrê te heykelên ji zêrê safî xwestibûn... Lê niha... Lawikê te (Akhenaton) ji min re darê bi avzêrê şandine. Wextê li welatê lawê te zêr mîna xweliyê pir in, ew çima nade min û pirsgirêkên mezin derdixe? Ev îşareta baweriya wî bi min nayê ye?"** Çima ji kral re ne ji dayika wî re nivîsandiye? Belkî Akhenaton bi karên olî re zêde eleqedar dibû û girîngî nedida polîtîka derva yê welat.[70] Bi dîtina min ev sedemeke rast nîne. Îro jî di edetên Kurdan de bav/dayikê lawik muhatap tê girtin. Yanî xezûr rasterast ji zavê tiştên wiha naxwaze. Yekê jî dema keçik danê peyman

(qeling) bi dê û bav re hatibû kirin ku ew berpirsiyarê wî karî ne. Dema ew herdû dewlet bi zêran re mijûl bûn xetera ji bo wan jî li bakûrê welatên wan xwe dida xuyakirin ku ew jî Hatiyên Kurd bûn.

Hatiyan bakûrê Misir û Mîtanî tehdît dikirin. Bi ser vê de Misir artêşa xwe şand lê dereng bû; heta ku herin kurê Tushratta bavê xwe kuşt û li cîhê wî rûnişt. Hatiyan di dawî de Mîtanî têk birin. Di arşîva Hatiyan li paytext Hatûşa de nameyek hate dîtin, ku ji alî kralîça Misir ve hatibû şandin. Di namê de nivîsiye ku mêrê wê miriye û ji kralê Hatiyan dixwaze ku ew lawikek xwe ji wê re bişinê ku ma ew mecbûrî kesekî bê kok û binat nebe...[70] Tê fêhm kirin ku wê demê jî di nava kraltiyan de zewac karê esîlzadan biye. Heta demên dereng axa û mîrên Kurdan jî ew kevneşopiya didomandin; keç û xortên xwe ji malbatên mîr û begên di asta xwe de dizewicandin. Ev hê jî di nav Kurdên li Anatoliya Navîn de heye.

Di dema Ramsesê II an de jî (1285) Misiriyan li Kadeşê bi Hatiyan re şer kirin. Di sala 1270 an de Ramses II bi serokê Hatiyan Hattusilis ve peymanek mor kirin. Di peymanê de biryar hat wergirtin ku dîlên hatine girtin bihev werin guhartin. Herdû alî jî ji bidestxistina Sûriyê devberdine û li dij êrîşkarên sêyemîn ew îttîfaqê çêbikin. Li ser navê Xwedayên Hatî û Misirî sond xwarin. Ewên ku peyman xirab bike 1000 carî Xwedê Hatî 1000 carî jî Xwedê Misir bela xwe bide serê wan.[69]

Di salên 1300 an de li herêmê çar hêzên mezin hene: Misir, Hatî, Mîtanî û Babîl.[69] Di salên 2000 an BÎ de welatê Xorriyan Mûsil û Kerkûk jî dikire nava xwe. Di dema Mîtaniyan de (1500) ji Kîlîkya heta Kerkûk û Mûsilê dirêj dibû. Navenda dewlete jî Hanigalbat bû; li dora çemê Xabûr. Di dema rêvebiriya Mîtanî de, Anatol û Qudûs jî dikete nava sînorên wan. Lê di sala 1360 an de Mêranî ji ber şerê hundur lewaz bû.[69] Tê dîtin ku di serdema Xorrî, Mêranî û Hatiyan de sînorê Kurdistana îro yê ku Kurmanc lê niştecîh û beşekî Anatolê yî mezinî di bin desthiletdariya kalên Kurdan de bûye. Asûr jî wê demê (1550 BÎ) di bin desthilatdariya Xorrî-Mêraniyan de bûn; tevlîheviya di welatê Mîtanî de Asûran jê îstîfade kirin. Di bin serokatiya Assur Ubalît (1365-1330) serxwebûna xwe îlan kirin, ji ber êrîş û talana wan gelê Mîtanî koçê cîhên din kir.[94-231]

Faik Bûlût ji tabletka Asûriyan ku ji sala 843 an BÎ mayî de radigihîne ku: Aryan, ji Herat û Meşhedê di geliyê Serahs re derbasbûn û hatin wir. Nêzîkî sala 900 an BÎ de vê koçê destpêkirî ye. Pars li pêş, Mad jî li paş hatine.[36] Ji wê agahiyê ew tê fêhm kirin, ku Mad û Pars gelê Asya Navîn in. Ez vê dîtine parve nakim, berê jî min got Kurd gelê hîva bi bereket in û piştre çûn Asya Navîn. Salên 900 an jî êdî miletê Arran xwe li Asya birêxistin kir û ber bi rojava yan jî rojavayê başûr hat. Ew hatin ji neçarî û ji bo tolhildanê bû... Lê dîtina din gelek balkêş e: Aryan, li stebên Rûsya bûn du beş: Hîtît û Xorrî. Hîtîtiyan bi Mîtaniyan ve împaratorî saz kirin, bi hev re jî şer kirin û di dawiyê de wek di kevalên li Boxazkoy hatine dîtin de tê nivîsandin BÎ di sala 1400 an de

peymanek çêkirin.[36] Ev agahiya ji bo îddea vê pirtûkê gelek hêja yê, lewra Xorriyên li stebên Rûsya piştre wek Saka derdikevin pêşberî me û bi dîtina min ew sê beş bûn. Wek Kurmanc, dimilî/Kurmanckî û lerî ji hev cûda lê xaka wan cîranê hev bû. Mirov dikare wek Îskît, Saka û Sarmater jî bi nav bike. Îro jî berdewamiye wanê li Navenda Anatolî ye ne. Di beşê Saka de emê dîsa qal bikin.

Dewleta Mêraniyan bi êrîşên Hîtît/Etiyan û Asûriyan ji holê rabû; kral Salmanasar di sala 1270 an de ew ji holê rakir. Di xirabê Nînova de gelek agahî li ser Kurdan derketin û Henry Layard ji wan heykel, nivîs û wêneyan van agahiyan dide: Wênekeşan li ser keviran, bajarên bi surê nekiş kirine. Ew li keviya çeman tenê tesfîr kirin. Evên ku hatine dagirkirin, di nava şaristaniyeka gelek pêşketî de bûn. Îşareta ve jî meqere (meqereyên girêdanê) li ser deriyên kelehan bi kar dianîn û erebên wan ên hespan ên modern û bi çînik (motîf) hebûn. Yekê jî di tekerê wan erebena de heşt, yekcaran jî 12 stûn hebûn. Gelek vazo, darên bi nirx, şal, camên bi sûs hebûn. Di nepixandinên axê yên li bajarê Nemrûdê yê herî kevn de, tê dîtin gelê ku hatî dagir kirin xwedî kumên ecêp bûne. Asûriyan kumê xwe li jor gilover bûn. Yên vî gelî mîna kovikan bûn lê ne wek Asûriyan seriyên xwe tûj, hinekê pan û qilot bûn. Wekî xuya dikir, yan ji kulav yan jî ji şerîtên bi keten hatibûn çêkirin. Botên eceb ên hetanî textikê junî dikirin lingen xwe û pozî cîzmeyî ber bi jor xwar bûn. Îro jî li Îran û Tirkiyê ev bi kar tên. Porê wan dirêj e, ji paşve girêdane û şerîtekê dane ser[68] dibêje. Wekî tê dîtin ev wênen li ser keviran yên hatinî çêkirin û Layard qala wan dikî de cil û bergên mîna yên Kurdan e. Îro jî ev tiştana hene û ji wan solana re: "Kaloş û Çarix" tê gotin.

## GÛTÎ (Kardû, Cudî, Gûtiyûm)

Pêwîste zimanzanên Kurd li ser vê peyvê lêkolîneka kûr bikin; lê wekî xuyadike yan jî gor dengê dide, nêzîkî peyva kurdî ye. Eger çar-pênc hezar sal li ber çavan bê girtin mirov dikare bibêje navê Kurdan koka xwe ji peyvê wergirtiye. Lê dîsa jî em vê yekê ji dîrokzan û zimanzanan re bihêlin û binêrin ka li ser Gûtiyan çi hatiye gotin: Tê gotin ku ew peyva di wata leheng (qehreman) û kesên şervan de bikar dihatiye. Birêz Ocalan dibêje: tê mana ga.[72] Eger wiha be, divê girîngî yan jî pîrozbûyina ga di nava vê komê de hebe; yan jî ewana ga xwedî dikirin ku ew nava lê hat dayîn. Asûr ji bo wan dibêjin: "Cin û ejderhayên çiya." Navkirina Asûriyan hîn mantiqî xuya dike, lewra ew gelê çiyan, şervan û dijminê sereke yê Asûr in û ew nav lêkirin jî xwezayî ye. Prof. Şemsettîn Gunaltay dibêje: Ji dema neolîtîk (8000 BÎ) vir ve li Rojhilata Navîn dijîn; ew mirovan taybetmendiyên xwe yên wê demê, ku merd, çipik, bi vîneka bilind û serî xwar nedikiri girtibûn û bajarekî mezinî bi navê Gûtiyûm ava kiribûn. Ew taybetmendiyên tên hejmartin bi zêdehî mirov dikare di nava Kurdan de û di qerektera wan de bibîne.

Serokkomare Tirkiyê yê berê Îsmet Înonî di dema peymana Lozanê de, li dij têza Îngîlîzan: *Ji demeka pir kevn vir de, li çiya gelekî tûranî (di wata tirkan de bi kar tê, lê wê demê Kurd înkar dikirin û hemû Kurd wek Tirk-Tûranî didan nîşandan) yê bi navê 'Guduya' rûdiniştin. Gelekî pir şervan bûye û navê xwe tê wata 'şervanî;' dema mirov werdigerîne zimanê Asûrî jî ew wek "Gardu* yan *jî Kardû tê xwendin. Peyva Kurd ji wir te; dibêje.* Her çiqas Kurd înkar bikirana jî, ji dîrok û çanda Kurdan agahdar bûne û ew yeka ji bo berjewendiyên xwe bi kar anîne. Eger cîhê peyva Tûran de Kurd bigota her tiştê gotibû rast dibû. Prof. Egon Von Eîstedt: *"Gelên li Mezopotamya dijîn 3000 sal BÎ Kurd û Lor nasdikirin. Gûtî û Lûlû yan jî Gûtîum-Lûlûbium navê gelê di newalên Zagrosan de rê nedidayî û li wir bi cîh bûyî re dihate gotin. Zimanê Xorriyan mîna yê bapîrên xwe Gûtiyan bû"* dibêje. Di vir de Lûlû û Gûtî cûda tenê bi navkirin û tê tespît kirin ku pênc hezar sal in ew li Zagrosan dijîne. Gelo mirov dikare bibêje Lûlû kalên Lor-Lek ên îro ne? Îhtîmaleke mezine ku wiha ye. Wê çaxê mirov dikare bibêje ku Gûtî kalên Kurdan –ji bilî Loran- yê giştî bûn? Ew cîhe lêkolîneyên kûr e, lê ji bo ku Eîstedt dibêje ew Gûtî bapîrên Xorriyan bûn ew encama jî dikare derkeve.

Lêkolînerê Kurd Îzady jî vê îddeayê bi hêztir dike û Gûtiyan wek hemû Kurdan û Sûbarêyan jî wek êleka girêdayî wan nîşan dide: Sumerî di belgeyên xwe de qala êleka Gûtiyan dikin ku ew Subirû-Saubarû (Subarî) bûn. Di dema modern de jî ew Zebarî ne. Zebarî çar hezar sal in hîna jî li heman cîhî dijîn. Li bakûrê Hewlêr, navê kralê Gûtî Tirigan hîn jî tê parastin, ku li bakûrê Zebariyan li ser êla Têrikan ma ye.(154-74) Têrika hîna jî li Anatoliya Navîn, Kurdistan û gelek cîhên din hene. Eger mirov vê belge û ditineyên din jî cîddî bigre, Gûtî yekîtiya Kurdan ya giştî ne. Wê çaxê jî ev pirsa derdikeve holê, gelo wê demê zaraveyên kurdî hîna derneketibûn holê? Gelek dîroknûs îşaret pê dikin Gûtî kalên Kurdan yên bi giştî ne. Yek ji wana Torî ye û dibêje: Sumeriyan, Gûtî wek şeytaneyên çiyayî yên bawerî bi agir dianî didan nîşandan. Wê demê Gûtiyan di perestgehan de agirê mezin vêdixistin û baweriyê bi Xwedê anîne. Tiştekî din ê tê zanîn jî ew e; ku berî Sumeriyan jî gel li vir dijîne. Ji dema wan de jî belgeyên bi wêneyên keştî û miyê hatine dîtin.(6) Yê din R. Blaga ye ku hîn balkêştir dike: Gûtî navê gelê 3000-2000 sal BÎ li Ezerbeycan û Kurdistanê jiyaye. Yekê jî sala 1000 an BÎ de ji Ûrartû, Mana û Medan giştikan re digotin Gûtî.(95-73) Bi taybetî jî hevoka dawî zêde baweriyê dide, ku mirov wana wek kalê hemû Kurdan bibîne. Dîrokzan bi piranî êrîşên Gûtiyan ên ser Asûr, ji rojhilat û navenda Zagrosan nîşan didin û ti qala Ezerbeycan nakin. Eger ew dîtin rast be, tê wê watê ku Kurd wê çaxê bi navekî dihatin nasîn.

Dîsa îddeaka pir zelal ji alî Torî ve tê kirin ku dibêje: Li cografya Kurdistana îro de gelê herî kevn ê tê zanîn Gûtî ne (wek Kûtî jî tê nivîsîn, BÎ 4000), ev ji alî gelek dîrokzan û arkeologan ve tê pejirandin. Ji Gûtiyan bi şunda jî bi dor Xorrî (BÎ 4000-1200), Mîtanî, Nehrî (BÎ 1500-612), Kassî, Ûrartû û Med tên. Zimanê Gûtiyan bi yê Xorriyan va yek bû.(38) Ji alî ziman û çandî ve jî nêzîk bûn û yekbûna wan, van îddeayan jî bi hêztir dike. Heta gor şertên demê û

bi hezaran salan ew qetî jî dibe. Bi qasî min dîtî, li ser kevnbûna Gûtiyan di nava dîrokzanan de lihevhatinek nîne û ew piranî li başûrê welatê me xuya dikin. Xorriyan jî giraniya xwe li bakûr e. Îro çawa giraniya Kurmancan li bakûr; Soran, Hewreman, Goran û Lor jî li başûr in, wê demê jî Gûtî li başûr, Xorrî jî bi giranî li bakûr xuya dikin. Lê Torî dibêje: nayê zanîn ku kengî ew hatin başûrê Gola Ûrmiyê bi cîh bûn. Di belgeyên Asûr yên dema kral Asûr II an de xuya dike; ku li rojavayê welatê Med, ji çiyayên Şahberdî-Kafelan Kuh destpê dike heta rêzeçiyayên Alwand dijîn. Xelkê Zagrosan herî kevn e û ji alî hemû dîrokzanan ve wek kalên Kurdan tên qebûl kirin. Nivîsa mixan û zimanê Xorrî bikar dianîn. Pir şervan bûne.[94-102] Ji nivîskar û dîrokzanên cûda taybetmendiyên Gûtiyan jî derdikevin holê, ku ya herî hevbeş şervaniya wan e, li çiya jiyane, gelên dorê jê ditirsiyane û bi Xorriyan ve tekiliya wan ê dîrokî û çandî heye. Prof. Şemsî Gunay ji bo Gûtiyan dibêje: Ew berî seramîkê derbasî bi cîhbûnê bûn, çandinî û ajal kedî kirin. *Gelekî biezamet, çipik, merd ji çaxa neolîtîk bi vîneka bilind û serî xwar nedikirine.* Mîtanî *jî berdewamiya wî gelî ne.* Kralê Asûr Salmanassar I an (1280-1261) ji bo Gûtiyan (li hinek belgeyan jî Qûtî hatiye nivîsîn) wiha nivîsiye: Wekî stêrkên li ezman, hejmara xwe ne diyar, di xerakirinê de pispor, li dijî min raperîn kirine û dijminatî avakirine. Di kevirekî din de jî: Ji sînorên Ûratrî heta sînorên Kummuhî min xwîna tabûrên artêşa Gûtî mîna avê velokir (rijand).[94-115] Ji vê tabletê xuya dike ku ew gela vê serdemê heta Ararat belav dibûye. Di vê yekê de bandora Asûran û êrîşên wan ji başûr de jî hene, lê eşkere dibe ku Asûriyan bo hemû Kurdan ew navî bikar tanîne... Yekê jî gelê vê demê li Kurdistanê dijî, guman tê de nîne ku çû serê çiyan û navenda Xorasanê...

Wekî ku tê îddea kirin, eger Gûtî gelê herêmê yê herî kevn e, pirsa, gelo wana ti dewlet û mîrîtî avakiribûn û rewşa dinyayê ya wê demê çi bû? tê bîra mirov. Tê gotin ku li destpêka 3000 salan BÎ de êlên Samî ber bi rojavayê Firat kom bi kom hatin. Hinek dîtin jî dibêjin ew 4000 sal in. Hinek Samî wek karker û leşker ketin nava bajarên Sumerî-Kengiyan. Paşê kar û cîhê Kengiyan ji dest girtin û ji sala 2750 BÎ vir de jî Mezopotamya kirin bin kontrola xwe. Kralê şer Sargon û kralê çar demsalan jî Naram-Sin bû. Kurdan BÎ di sala 2600 an de di rêbertiya kralê xwe yê bi navê Kamassî de, li Zagrosan dewleta xwe ya yekemîn avakirine. 200 sal ji vê bi şûnde Ereban dewleta Akad ava kirin. Gûtiyan di sala 2233 an de ew dewleta rûxandin û bûn desthilatdarê herêmê. Dewleta Gûtî jî ji alî kralê Ûr, Tîrîgan ve di sala 2120 an BÎ de hat xelandin.[52]

Gelên li Zagrosayên yên bi navên Lûlû û Gûtî, tirsa herî mezin a Akadiyan bûn. Kralê Akad prensê Gûtî yê bi navê Şarlak (Şerwan) dîl girt, dîsa jî êrîşên Gûtiyan berdewam kirin. 2500 salan BÎ (hinek jî dibêjin 2233 an-59) Gûtiyan (Kutetî-Kurtetî) dawî li rêvebiriya Akad anîn. Gor belgeyan Gûtiyan paytextê wan **Kurtiyûm** bû û paşê hatin **Arafa (Kerkûk)**. Kralê wan jî navên Arî li xwe dabûn. Wek: Lasîrab, Basiûm, Enrîdûpîzîr, Saratîgubisin, Tîrîgan. 2368 sal BÎ de Gûtiyan desthilatdarî dîsa wenda kirin; kral Tîrîgan dîl ket û

dîsa helkiştin çiya.[87-79] Dîtin hene, ku dibêjin gelê Samî yên ku çûn û li dervayê bajarên Gûtî-Kurdan bicîh bûn; bi roj çûne li nav bajaran kar dikirine, êvaran jî derdiketine dervayê bajêr. Piştî demekê bi zewacan û tevlihevbûnê ji wan Asûrî hatin meydane...

Salên di navbera 2123-2113 an BÎ de, ji bajarê Ûr, kral Ûtkhegal dikeve ser şopa gelê çiya (Gûtî) û nêçîra wan dike. Piştî vê êrîşê, bakûrê dewleta Akad ya ketî destên Gûtiyan rizgar dike. Di dû wî kralî de Ûr-Nammû û yên ji wî şûnde jî heta salên 2004 an BÎ de êrîşî Elam an kirin û di dawiyê de şer wenda kirin.[66] Di sala 2120 an BÎ de, Ûr an dewleta Gûtî ji holê rakirin. Bi ser vê de Gûtiyan, di bin serokatiya Tîgran de li Zagrosan dewleta bi navê **Anzan (Xêza)** avakirin. Heta dema Medan vana îdara xwe berdewam kirin. Kralê Gûtiyan yê yekemîn tê zanîn Emnatûm e. Evên din yên tên zanîn jî: Ûrbaba, Gudea, Ûrnûngirsû, Sulme, Halbûm û gelekên din in..

Di kevneşopiya Gûtiyan de her êlekê kralêkî xwe hebû û ji nava wan kralana jî kralê giştî dihate hilbijartin. Dema xwe sê sal bûn. Ew sîstema heta derengî di nava Kurdan, Kurdên dervayê welat û bi taybet jî di nava Reşiyan de hebû. Di nava Gûtiyan de êleka bi navê Kaûrhî jî hebû ku îro gelek zana dibêjine ew peyvana wek hev in. Gûtiyan nivîsa bizmaran di salên 3000 an de bi kar dianîn û tê gotin ku bi Sumeran ve tevhev dîtine. Di kitêbên Sumeran de ji bo welatê Gûtiyan "Welatê Îblîsan" têye bi kar anîn.[59] Gor belgeyên Akadî, Gûtiyan 2300 an BÎ de çend caran êrîşî rojhilatê Firatê kirine û di heman demê de ji avabûna dewletên din re bûne asteng. Di dema Sargon de jî êrîşî Akad kirine lê bi serneketine. Di 2300 an BÎ de êrîşê Tûr Abîdîn dikin û dagir dikin. Di dema kralê Lûlû yê bi navê Elûlûmes de dewleta Akad ji holê rakirin û Kerkûk kirin navenda xwe. Kralê Akad-Ûr III Sû sîn (1972-1964) êrîşî Xorriyên li Zagrosan dike û gelek dîl tîne dor bajarê Nippûr û pê dîwarên qelê çêdike. Di dema kralê Gûtî Tîrîgan li Babîl dewlet lawaz ket. Di şerekî de serê kralê Gûtî jêkirin û gel mecbûr bû ku here çiya.[94-128] Gûtî vekişîn çiya bi şûnde, vê carê jî rastê êrîşên cîranê xwe yên rojava Asûriyan hatin. Salmanassarê III an (1263-1234) di êrîşekê de Gûtî belav kirin. Heta herêma Tor xwîna Gûtiyan rijî. Dîsa kral Tîglathpîleser I an (1114-1076) li Azû (Sason) Gûtî têk birin û bi ser vê yekê de Gûtî vekişiyan rojhilatê Dîclê û êdî bêdeng bûn.[94-132] Ji wan bûyeran tê fêhm kirin, ku şerê gelên cîran bi sedsalan ajotiye û herdû aliyan jî di dema direj de wenda kirine û bûye sedêm ku herdû gel jî bi hezaran salan êdî pişta xwe rast nekin. Ev şerên ku tenê zanîn, lê yên nayêne zanîn?!

## HATÎ (HÎTÎT)

Îlme modern ew wek Hîtît bi navkirine, lê di esil de ew nava ji gotina Hatî ya berê li vê cografya jiyaye hatiye derxistin.[80] Hatî, peyveka kurdî ye ku ji hatine tê. Dîrokzan dibêjin gelê niştecîh ew nava li Hatiyan daniye; ji wê ev encama derkeve; ku gelên berî wan jî Kurd bûn ku peyva Hatî ya kurdî lênan.

Yanê ew piştre hatine. Lê ew navê wanî esasî çi bû? Îhtîmaleka pir mezine ku navê êl û federasyona êlan bûn, lê bi giştî bi navê Hatî derbasî dîrokê bûn. 2000 sal BÎ xwe avêtin nava Anatolî ye û li destpêkê xwe li başûrê rojhilatê Anatolê xwe bi war kirin. Zimanê wanî ji grûpa Hînt-Ewrûpa û diyalekta kevna teyî nasîn bû. Paytext Hatûşaş (Boxazkoy) e ku dora sala 1650 an BÎ de derket holê.[66]



**Hatûşa**

Li ser hatina wan ê Anatolê jî dîtinen cûda hene. Hinek dibêjin 1800 û hinek jî dibêjin 1500 an de, [71] lê li ser ji bakûr ve hatina wan hemû yek deng in. Yanê ew ji Qefqasya ve berjêr daketine. Lêkolînên etîmolojîk didin xuyakirin ku Hatî beşekî mezin ê Aryan e. Wata navê wan jî ewên hatî ne. Li keviya Kizilirmak bajar dewletên mîna: Kuşar (Alîşar), Hatûşa (Boxozkoy), Neşa-Kanîş (Kultepe) û Zalpa di bin sîwana Hatiyan de kom kirin û dewlet ava kirin. Li ser kevirekî, kral Anîta tekoşîna xwe ya li hember cîranan qal dike, xwe wek Hatî dide nasîn û dibêje zimanê min jî ê bajarî Neşa ye.[87-86] Wekî tê gotin ew li Anatolê bi cîh dibin û şaristaniyeka mezin bi pêş dixin, Împeretoriyeka mezin ava dikin û bi şervaniya xwe deng didin.

Di pirtûkên dibistanên Tirkiyê de tê gotin ku Hatî sê hezar sal BÎ li Anatolê bûn. Ew bi jêderên din ve hevdû nagre. Nûserên Tirk Hatiyan bi Hîtîtan vê ji hev cûda hesap dikin. Wek berê jî min gotî berî Hatiyan jî Kurd li Anatolê hebûn. Dibe ku nûserên Tirk vana beşekî ji Gûtî û Xorriyan dibînin, ji bo wê vê dîrokê didine. Di lêkolînê hatî kirin de derket holê, ku Anatol berî dîrokê jî xwedî şaristaniyeka pêşketî bû. Ewya jî Hatiyan avakiribû. Hatiyan 3000 sal BÎ di Anatolê de yekîtiya siyasî çêkirin û ji Hîtîtan re bûn pêşeng. Di dema Hatiyan de xanî ji kerpîçan û hîmê wan li ser keviran bû. Hîtît ji Qefqasan, li destpêka 2000 sal an BÎ de hatin Anatolê; ew êdî îspat bûye.[148-31] Di vir de nivîskar Hatiyan wek gelê niştecîh dibîne, yên din ê hatinî jî wek Hîtît bi nav dike. Lê bi dîtina min gelê berê li wir navê xwe ne Hatî ye; dîtin hene ku wek Haldî jî didin, divê navekî wanî giştî yan jî navên êlan hebin. Lê ya rast, gelê bere li vir bicîh bûyî, bi yên nû hatirê gotin Hatî. Navê yên kevn pêwîste hîn zêde were lêkolînkirin.

Şerîf Firat, tekiliya Kurd û Hîtîtan wiha dinivîsîne: 50 sal BÎ, kalên Zaza-Dumbelî yên îro yanê Tirkên Part, ji alî Belh û Bexterêyan hatin Îranê; **hinek Zaza jî Tirkên Etî ne** ku li sînorê Îranê derketine.(127-6) Wek tê zanîn Tirk ji bo Hîtîtan dibêjin **Etî**, ji bo çi vî navî lê dikin nizanim; Mumkune ji daxwaza ku wana wek Tirk nîşan bidin derketibe holê ku vê yekê jî tînin ziman. Çima dibêje hinek? Dibe ku Dimilî axêf jî di nava vê konfederasyonê de bûn. Hema nivîskar rastiyeka din tîne ziman: Zaza, ji ber dagirkirina Ereban ji Îranê derketin û çûn çiyayên bilind yên rojhilat. Heta ji şaristaniyê derketin û çûn derên bê deng.(127-13)

Di navbera salên 1900-1200 an de hukum ajotin. Zimanê wan ji diyalekta Hînt-Ewrûpa yê kevne û Hatûşaş (Boxazkoy) jî paytextê wan bû.



**Hatûşa- Deriyê Şêran**

Du alfabe bi kar dianîn; yek a mixan, yek jî a hiyeroglîf bû. Ji Mezopotamya destnivîsa mixan anîbûn û nivîsên dirêj û tabloyên heriyê bi vê dinivîsandin.(80) Di vir de birêz Çix, Hatî û Hîtîtan cûda dide xuyakirin. Lê xeleka girîng ew e ku tespîta "ji Mezopotamya hatin" e. Ew çima ji Mezopotamya hatibûn? Sedema vê yekê gelo xwezayî bû, êrîşên Ereb û Asûriyan bûn? Tekiliya hatina Hatiyan ê Anatolê û wendabûna Sumeriyan ji dîrokê çi ye? Ev pirsan li bersivên zanistî digerine... Di pirtûkxana li Hatuşaş de nivîsên bi heşt zimanan derketin. Bi zimanên mîna; Hîtît, Hatî, Xorrî, zimanê Îranî ya kevn, Palaiska (Hînt-Ewrûpa û di dema merasîmen ji bo Xwedêyê bi navê Zîparva de dihatiye bi kar anîn.), Lûwiska (diyalekta Hint-Ewrûpa), Sumerî, Akadî ye.(80) Ji van zimanên derketî jî xuya dike ku Hatî navendeka girîng bûye. Name û nivîsên ji her deverî hatine arşîv kirin. Hatî, zimanekî Asyayî û ji Hîtîtî cûda bû.(80) Ew tespîta çiqas raste

nayê zanîn; lê encama ji vê derdikeve ewe ku du netew, yan jî du zarava axifê (wek kurmancî û kirmanckî) cûda nê. Bi dîtina van Hatî miletê berê li vir bi cîh e, zimanê wan jî Asyayî ye, tê vê watê ku ne Kurd in. Ez vê dîtine rast nabînim, lewra gelek îşaret hene ku ew Kurd in. Wekî me got vana navê Hatî li yên nû hatî kirin ku ew jî îspateke ku Kurd in. Ji alî cil-berg û olî de jî îspat hene. Destnivîsa hiyeroglîf ê bi zimanê Lûwiyan bû; bi zimanê Hîtît ve ji heman kokî ye, lê hinekî cûda ye. Tabletên ber çavên gelê hemû bi vî zimanî ne; di vê yekê re te xuyakirin ku xelk vê ziman û nivîsê jî dizaniye. Di vir de ev pirsa tê bîra mirov: Gelo Lûwiyan berê destnivîsa hiyeroglîf bi kar tanîn û evên îdara welat kirinî dest xwe paşê dest bi nivîsa mixan kirin?[80]


Lûwî, wek tê zanîn netewê Anatolê yê herî kevn e. Çawa zimanê wan bi yê Hîttîtan ve ji kokekî dibe? Di vir de jî nakokiyek heye. Dibe ku Lûwî beşek ji Kurdên niştecîh, Hîttît jî yên koçber bin.


**Nivîsa Hîeroglîfer**

Birêz Ocalan dibêje: Ew di destpêkê de mîna konfederasyona êlan bûn, paşê bû navendî û koledar. Wekî di babetê din de jî me gotî, bi piranî sîstema rêvebiriya Xorrî, Mîtanî, Hatî û yên din sîstemeka êlan in. Ew yan wek federasyon yan jî wek konfederasyonan; gor rewşa rojê û dijminatiyê ew dibûne hêzên mezin; împeratorî û koledar. Ji bo ku Hatiyan hesin bi kar tanîn, di heman demê de bi Asûr, Misir û Babîl re şer dikirin. Di sala 1595 an BÎ de Babîl dagir kirin. Kral Şuppilûliuma (di wata avkanî ya pak) di sala 1380 an de bû kral. Ji bo ku erdê xwe fireh bike êrîşî kraltiyên bajarên dor xwe kir, her der xirawe kir, şewitand û 3300 dîl ji wan deran anîn. Nêzîkî Misirê bû û Misirî gelek tirsîn. Kralê Misir Tutenkamon miribû, jina wî ji krale Hîtît lawikekî dixwaze, lê li sînor ew tê kuştin û bi ser vê de, 70 salî şer di navbera wan de derdikeve.[69]

Şuppilûliuma gelek caran êrîşî Mîtaniyan dikir. Ji ber vê yekê kral Sutarna nêzîkî Misiriyan bû û keçika xwe bi navê Gilûkhipa (Gulpêrî?) de Amenophisê III emîn. Kralê Kassiyan Kadashman-Enlil jî xwîşka xwe dayê û di nameyeke de tê fêhm kirin ku ew ji bo xwîşka xwe di nava fikaran de ye. Şuppilûliuma keçika xwe jî dide kralê Hayaşa yê li rojhilatê Anatolî ye, kral Hukkanaş. Hema kral keçika xwe ya bi navê Muvattîş dide mîrê welatê Mîran yê bi navê Mûşhuîlûvaş. Yekê jî dide kurê kralê Mîtanî Maddîvatza û dibêje keçika min meke dereca diduyan û ewê bibe kralîçe.[80] Bi Misiriyan ve di sala 1285 an BÎ de li Kadeşê şer kirin û Sûriyê di nava xwe de kirin du

par. Bajarê rojavayê Anatolî ye Troya ket destên "Qewmên Deryayê" bi şûnde dema Îyonîbûnê destpê dike. Ew yeka heta Mezopotamya û rojhilatê Derya Spî berdewam kir..



Belavbûna Hîtît û Hêzên Mezin

Di dema xwe ya herî bi hêz de, tevahiya Anatolê kontrol dikirin, tiştê balkêş ewe ku li dora Çûkûrovê û rojavayê Kurdistanê jî bajar dewletên otonom hene. Tiştê din ê balkêş jî ev 12 dewlet in.

1- Tabal: Qeyserî, Nîxde û Qereman
2- Melitene: Meletî, Elbistan, Samsat
3- Kummush: Semsûr
4- Gurgum: Mereş
5- Qeretepe
6- Adana
7- Sakçagozu
8- Sam'al: Osmaniye
9- KarkHemûsh: Dîlok
10- Til Barsip

11- Arpan: Reyhanli
12- Ungî Patin: Hatay(66)

Di sîstema rêvebiriya Kurdên Anatolê û Kurdên li dervayê welat ê kevn de hejmara 12 bi kurahî cîh digre, kes bersivê nade sedema vê çi ye. Li vir jî 12 derketin hemberî me, tekiliya vê û wê heye? Dikare bibe, ew hêza wan êlan di nava Împaratoriyeke de jî mumkune ku rola xwe bilîze û di bajar dewletê xwe de otonom bijî. Di navbera salên 1700-1200 an de wek dendike Xorrî û Mîtanî; di dema Asûr de, 1000-700 an BÎ de jî wek bajardewletên serbixwe xuya dikin. Îhtîmaleke ku ew Kurdên îro yên li dervayê welat in.

Di belgeyên Kultepe yên ji BÎ 1900 an de mane, ji bo Hîtîtan, peyva Hatî ye bikar te. Hatî ji dewletên bajaran pêk dihat û hertim bi hevre şer dikirin. Xwedêyê xwe yê herî mezin **"Arînna"** (navê bajar e û Xwedayê wî bajarê rojê jî Arîna ye- 87) yanê, dayika-rojê bû.


**Arîna**

Di serdema Hatiyan de jî hîn ola Arî/ Arya, Xorrî û Mîtaniyan berdewam e. Girîngiya wî weqas zêdeye ku navê Xwedê xwe yê herî mezin Arînna ye. Ew mînaka Têkiliyê dînê Arya û gelên berdewamiya wan û baweriya wan a agir-rojê derdixe holê. Di sala 1600 an BÎ de bajarê Aleppo (Heleb) ji alî kralê Hatî Mursilis ve hate xirab kirin. Wî kralî êrîşî Xorriyên alî Qanê jî kir. Ji salên 1400 an şûnde, Xorrî ketin nava rêvebiriyê û îdara dewletê êdî kete destên wan. Piştî demekê kral ji Xorriyan êdî dihatin hilbijartin. Ji şere navxweyî bişûnde, rastî êrîşên êla hov ya bi navê **Gasga** hatin.(69) Ew çanda olî ya hevbeş nîşana herî mezine ku ew koman bi navên cûda hatine binavkirin kalên Kurdan e. Bi navkirina Xwedê yê bi Ar-înna bi serê xwe îspateke û ew bû pênc hezar sal hê jî bandora vê yekê di nava Kurdan de heye. Li aliyê din, bo Hatiyan dibêjin ku 1000 Xwedayên wan hebûne; ji wana hinek yên gelê berî wan li wê xakê bi cîh bûne; hinek jî yên gelên din bûne. Ji bo ku li dij wan serhildanan çênekin, Xwedayên wan jî qebûl dikirine. Ew tolarensa li hember olên din hê jî di xwîna Kurdan de heye û ti caran olên din biçûk nedîtine. Di îbadetxanê Hatiyan de sihêrbazê hebûne û wana gorî firîna çûkan, yan jî gor xêzên li ser cîgerên heywanan bîr û baweriya Xwedêyan dixwendine. Heta salên dereng, Kurdên Anatolê jî ew metoda bi kar tanîn. Ajelê ku serjêdikirinî, zik vêdiqelaştin li tiştî zik dinêrîn de bizanibin qedera wan çawa bibe; yan jî pirsgirêka wan ê wê rojê çawa çareser bibe... Bavê min çend caran li ber min

ew pêk anîbû... **Heykelê li nava Enqereyê ku rojê tesfîr dike ji Hatiyan ma ye û çanda Kurdan ya olî nîşan dide; lê Tirk lê xwedî derdikevin...! Yekê jî ew bi yên Saka û yên li Kutahya derketî ve gelek dişibin hevdû.**



**Sembola Rojê**

Xwedêyên ku dihatine pîrozkirin yan jî jê re îbadet dihate kirin 63 bûn, ku di lîsta derketî de navên wan hebûn. Yê sereke **Teşupe** ye ku Xwedayê bahozê bû; jina wî **Hepa** bû. Canegê bi navên Xorrî û Şerî yê ku erebeya Hepa dikşandinî jî hurmet didîtin.[87/94] Di nava gelên Arran û Hatî de cejna biharê **"Purullî"** dihate pîroz kirin. Vê cejnê; tekoşîna temsîldarê zivistan marê bi navê "Îllûyanka" û Xwedayê ezman "Teşûp" sîmge dikir. Yezdan mar dikuşt û heyî/bereket dibû.[87] Di vê kevneşopiyê de mar temsîla serma û tuneyî yê dike, lê di kevneşopiya Êzdiyan de (ya me kevn jî) jî temsîla heyî yê dike. Divê têkiliyek yan jî bingehekî wan ê civakî ya hevbeş hebe...

Li deriyê Yazilikaya, perestgeha Hîtîtan heye, ku li dîwar dozde (12) Xwedêyên dar di dest de ye hene. Vana wek hev in, yezdanê çi ne, navên wan çi ne nayê zanîn. Lê divê hejmara dozde (12) girîng be; piştre ewê Anatolê bawerî bi 12 Xwedayên Olympos (navê xwe Hera) bîne; Îsa ewê bi 12 hawariyên xwe ola xwe belav bike; 12 îmam cîhekî gelek girîng digrin...[119-30]

Hejmara êlên Reşiya yên li Anatolê jî hemû 12 ne. Lê wexta hemû Reşiyan bidî ber çavan ew hejmara êlan digihîje 70-80 êlan. Divê tekiliya van 12 an, yan rasterast an jî endîrekt bi hev re hebe. Ew jî tekiliya Hatî û bi taybet jî Kurdên li Anatolê derdixe holê. Dibe ku ji hinekan re zêde xeyalî be, lê wiha

ye: Çavdêrek, lêkolînerek, oldarak û civaknasekî baş dikare vê têkiliyê îspat bike. Lewra di nava Kurdên li Anatoliya Navîn de û di praktîka wan de agir pîroz e, lê ew misilman û bi piranî Henîfî ne... Kes nikare bersiva vê nakokiyê bide?! Êl hertim 12 ne, lê kes bersiva vê nikare bide... Di civaka Hatiyan de kral temsîldarê Xwedê nînbû û biryar ji alî civakeka ku ji wê re **"Panku"** dihate gotin ve dihatin wergirtin. Îro jî Kurd ji vê re dibêjin **Pergar** yan jî rûspî.[87] Girîng e ku Hatiyan kral pîroz nedîtine û ew wek rêvebir dihatiye dîtin. Li nav Kurdan û bi taybetî li nav Kurdên li Anatolê jî, koma rûspiyan heta demên dawî (dema koçberiyê de) kar dikir lê bi hatina Komara Tirk re ew ji holê radibe. Ew jî bi serê xwe îspatek e. Ji kîjan alî ve dibe bila bibe mînaka bi vî rengî gelek in û ew encam derdikeve holê: Wan Kurdana, ew kevneşopiyên bi hezaran salan ji kalên xwe û di praktîkê de girtine û di bin mêjiyê wan de cîh girtiye; piştre bi zorê olê wan û rewşa wan hate guhartin, lê kevneşopiyên berê hê jî şopa xwe didin dom kirin.



**12 Xwedayên Hatiyan yên bi çek li Yazilikaya-texmînî 1250 sal BÎ**

Di alî civakî de kevneşopî wiha bûne: Li cem Hatiyan 18 cejn hebûne, cejn ev bûne: Oroqê, xermana, bax xelandin, mirovên kal, xanî çêkirin, ejderha kuştin, mirovên li dûr, seri şûştinê û birina çihê razanê, li ber gerandinê û hwd bûne. Hinek ji van ê yên gelên berê li vê herêmê bûne û hinek jî ji yê Xorriyên di heman demê de jiyayî mane.[80] Îro jî ew cejnana di forma rojên taybet de bi giştî nebe jî, li hinek herêman û di nav gelên li Anatolê de pêk tên. Hîna jî li Anatolê dibêjin "Serê xermanê" ku koka xwe ji wir digire. Wekî din jî dema beran berdanê, dema bax xelandinê û xanî çêkirine de jî bi forma cejnê yan jî wek rojeka taybet, yan jî ji rojên din cûdatir tê peşwazî kirin. Têkilî di alî kincan de jî xwe dide îspatkirin:

Gor M. Çix dinivisîne kincên Xwedayên Hîtîtan wiha bûne: Blûzekî mil dirêj, di bin de jî fistanêkî bi çirtik, li navê pişt, li serî tiştekî mîna fesan lê ji wan dirêjtir û hemûyan jî guharê xwe hebûne. Mêran jî di ser de îşlik, şalekî hetanî çokan û solên poz xwar.[80] Kincên jinan, bi taybetî jî tasê/kofiyê li serî û solên ku em "çarix-keloş" dibêjin gelek nêzîkî yên Kurdên li dervayê welat in. Bi taybetî jî serpêçana jinan û keloşên di lingên mêran de heta demên dawî jî li Anatola Navîn û Xorasan bi kar dihatin. Bavê min digot: Berê mêrên Kurd jî guharê dikirine guhên xwe.

Hatiyan dema xanî yan jî qesr çêdikirine cejn dikirine û taximê xaniyan tiştên mîna: Zêr, zîv, sifir dikirine. Dema davêtine jî wana gotiye: Ev maden çiqasî saxlem in xerê, xanî jî weng saxlem bibe. Wekî din jî rûn, hingiv, xwê û meywe jî dikirinê ku ma bereket bibe. Ji ber ku paşnav tunebûne, mirov bi navê bavê dihatine bi lêv kirin. Hîtîtan ji bo nexweşiyan giya bi kar dianîne û ji bo baran bibare jî dawetê dikirin, di dawetê de wanî xwe tazî dikiriye.[80] Çiqas balkêşe ku hîna jî ew kevneşopiyana li Anatola Navîn bi kar tên. Wextê xanî çêkirine, em tiştan davêjin texim û wextê dîwar bilind bû jî mirov qurban li ser serjêdikin. Bi navê bavê bi lêv kirin hîna jî di nava Kurdan de bikar tê. Ji bo nexweşiyan giya bi kar anîn heta demên dereng jî bikar dihatin; bi hezaran derman çêdikirin, lê mixabin piranî wenda bûn. Min hinek di kovara Avaşîn-9 an de komkirin lê pir hindik in. Ji bo ku baran bibare, gelê me berê hildikişt serî çiyan û qurban serjêdikirin. Hilkiştina çiya jî balkêşe ku ji baweriya kevn a Sumerî û Xorriyan tê. Li Xorasan jî ew bi kar tê. Wekî din jî dema hişkî yê, zarokan bûka baranê çêdikirin û li ber malan digerîn. Wextê diçûn ber malê, xwediyê malê av davêt ser bûkê û xwarin dida zarokan...

Di tespîtkirina gelan de wasita herî girîng ziman e. Zimanê Hatiyan çawa bû? Gor zanyaran: Zimanê Hatî bi zimanê Lûwî û Pala ve ji malbatek bûn. Ji komên netewên dinê tevhev dijiyanî peyvan heynan û di guhartineyên etîmolojîk re derbas bûn. Zarava Kurmancî, guhartina cîh û dema etîmolojîka wî zimanî ye:

| **Hatî-Xorrî** | **Kurmancî** |
|---|---|
| Mu | min |
| Ta | te |
| Gestug | guh |
| Paî | peya (çûyîna bi peya) |
| Gud | ga |
| Tia | tê |
| Maş | bimeş |
| Katanîpa | kitan |
| Kuen | kuştin |
| Kuer | kêr |
| Karulî | kal |
| Hastiya | hestî |

| | |
|---|---|
| Şiwat | şewat |
| Nîda | nan |
| Şe | ce |
| Zarî | zar |
| Mane'ra | mane'ra (Xorrî) |
| Harî (Xorrî-Haldî) | êxirî (kral, mezin) |
| Harî (Xorrî-Haldê) | herin (rê) |
| Ebanî (Xorrî-Haldî) | banî (cîh, welat) |
| Sale (Xorrî-Haldî) | sal [87-100] |

Pir balkêşe ku 4000-5000 sal in ew zimana hîna jî wek hev e ku ew jî, xurtbûn û kûrbûna çand û şaristaniya Kurdan derdixe holê. Ew jî îspateke Kurd û Hatî-Xorrî-Mîtanî miletek e. Ji bo miletê Hatî, ewên berê li wê axê bi cîh bûnî navê Hatî lêkirine, ew jî îspata gelê berê li wir niştecîh jî Kurd bûne derdixe holê. Mirov dikare bi rêya etîmolojiya peyvên Hatî, yekîtiya nijadî û zimanê Hatî û Kurdên îro bide îspatkirin.[87]

Di dema Împaratoriyê de kilameka eskeran wiha bû:

| | |
|---|---|
| Neşaş weşpeş, Neşaş weşpeş | *Kincên Neşaş kincên Neşaş* |
| Tiya-mu tiya | *Tenê ji min re tene* |
| Nu-mu uwaş-maş katta arnut | *Û yê min ji diya min Uwaş re bibine* |
| Tiya-mu tiya | *Tenê ji min re tene* |
| Nu mî uwaş-maş katta arnut | *Û yê min ji diya min Uwaş re bibine* |
| Tiya-mu tiya | *Tenê ji min re tene* |
| Tiya-mu tiya | *Tenê ji min re tene* (Siraç) |


Hîtît

Wiha tê fêm kirin, ku Xorrî, Hatî, Mîtanî û Lûwiyên li başûrê rojavayê Anatoliyê xwedî çand û zimanekî hevbeş in. Ew gelana bi Kurdan ve di her alî de wek hev in. Mirov dikare bibêje, heta hucrêyan wek hev derdikeve holê ku di dîroka ti miletên din de îspata wiha nîn in.

Kralê Hatî Şuppîlûlîuma di destpêka demsala 1400 an BÎ de ji bajarê Kargamiş, ji bo avakirina qesrê 3300 kes anîn Hatuşaş. Subay û eskerên anîn jî dervayê wî hesabî ne. Kurê wî Murşîlî II an jî ji çiyayê Arînan de 15 500 kes gor belgeyeka din jî 66 000 kesan anîn.[87-183] Ew cîh guhartina navxweyî jî dikare di koçberiya Kurdan de rolek lîstibe.

Di alî şoreşa teknîkî de jî Hîtît gelek pêşketîbûn. Hertim diyariyên ji hesinan çêkirî ji kralê derve re dişandin. Bi taybetî jî bi çêkirina erebên şer, ji alî şer de ew pir pêşketin û wek bayekî di ser Mezopotamya re derbas bûn.

Di heman demê de Misir ji alî kralên Kenanan û Xorriyan ve hate dagirkirin û vana jî erebeyên xwe yên şer hebûn.[69] Bi dîtina erebeyên şer bê guman Hatiyan pêşketineke mezin derxistin holê û Împaratoriya xwe fireh kirin.

Tê gotin Misir bi dewletên mîna xwe bi hêz re şer kir û beşek ji şaristaniya xwe, jî miletên kirî bin destên xwe girt. Ji wan welatên rojavayê Asya xelatên mîna qumaşên bi qelîte, vazo, erêbeyên şer û hacetên rojana dihatin.[68] Bi taybet jî cîranên Misirê, yên li bakûr û rojhilat mîna Kurdan û Asûriyan li ser çanda Misir bandorek çêkirine. Yanî dema qala şaristaniya Misir tê kirin bê zanîn ku ew koka xwe ji cîranan jî digire.

**Di dîrokê de kralên Hatiyan yên ku tên nasîn ev in:**

**Dema Hîtîta Kevn:**

| | |
|---|---|
| 1650-1620 | I.Hatûşîlî (=Labarna) û Kadduşî |
| 1620-1590 | I. Murşîlîn û Kalî (Babîl 1594 zept kirin) |
| | I. Hantîlî û Harapşîlî |
| | I. Zîdanta |
| | I. Huzziya |
| 1525-1500 | Telepînu û Îştapariya |
| 1500 | Tahurvaîlî |
| | Allûvamna û Harapşekî |
| | II. Hantîlî |
| | II. Zîdanta û Iyaya |
| | II. Huzziya û Şummîrî |
| | I. Muvattallî |

**Dema Împaratoriyê:**

| | |
|---|---|
| 1450-1429 | II./I. Tuthaliya û Nîkkalmatî |
| 1420-1400 | I. Arnuvanda û Aşmunîkkal |
| 1400-1380 | III./II. Tuthaliya û Taduhepa |
| 1380-1345 | I. Şuppîlûlîuma û Hentî, Tavanna (=Malnîgal) |
| 1345-1343 | II. Arnuvanda |
| 1343-1310 | I. Murşîlî û Gaşûlaviya, Danûhepa |
| 1310-1282 | II. Muvattallî ( Şerê Kadeş-1285) |
| 1282-1275 | III. Murşîlî |
| 1282-1276 | III. Hatûşîlî û Puduhepa ( Peymana Kadeş-1270) |
| 1250-1220 | IV. Tuthaliya |
| 1220-1215 | Kûrûnta (=Ulmîteşup) |
| 1215-1210 | III. Arnuvanda |
| 1210-1200 | II. Şuppîlûlima.[80] |

Hatiyan Împaratoriyeka fireh, pêşketî û dewlemend avakirin. Ew dewlemendî bû hedefa êrîşên gelên ji derva yên birçî û dijminên Hatiyan yê bi sedan salan Asûr û Ereban. Hatiyen xwedî şaristaniyeka kur û fireh, di sala 1200 an BÎ de ji alî gelên ji deryayên Spî û Ege hatinî ve hatin ruxandin! Ew


kî bûn? Xelkên li Derya Spî û Ege dijîn bûn. Xelkê cûda cûda bûn, lê wek Moxolan bûn; pir şervan, pir pît diketin tevgerê; xwînmij bûn. Li ser belavbûna wan di berhema bi navê "Hîstorîen Med Nya Ögon" de wiha tê nivîsandin: Vana çima malên xwe cî hîştin? Pirbûna nifûsê hatina wan kêm kir; demeke dirêj hewa xirav çû û hilberîna wan xerav bû; serokên wan ketin dû talanê ku artêşa xwe bihev bigrin, xwedî bikin û cîranên xwe bişêlînin. Bi taybetî jî li şerê Hatiyan gelek jin û zarokên kuştî li dû xwe hîştin ku xelk lê eceb mayî dima. Kralê Hatiyan nameyeke ji cîranê xwe re dişîne û tê de dibêje: "Me hê ti îşaret ji gelê gola nedîtiye (hîn êrîş nekirine-ş) û namê (kiremît) dike firinê ku bişîne; hîn di wê merhelê de tenêgihîştiye, ku ew gelê hov hatiye û welatê wî rûxandiye. Ew name sê hezar sal şûnde derdikeve holê.[67] Belê, hovîtiya wan ji zarok û jinên li dû xwe kuştî hiştî xuya dike. Xuya ye, ku di şerên bê xeber û nişkeve de serkeftîbûne û bê tedbîrbûna Hatiyan jî bû sedema hilweşandina wê Împaratoriyê.

Hinek Hatî vekişiyan rojhilatê başûrê Anatol û dewletên bajarî yên mîna Meletî, Mereş, Zincîrlî, Sakçagozu, Kargamiş avakirin. Vana jî, dawiya sala 700 an BÎ ji alî Asûriyan ve hatin rakirin.[148-32] Herodot jî vê salê wek 1225 nîşan dide û wiha berdewam dike: di sala 1160 an de êlên mîna Thrak, Thyn, Bîthyn, Phryg û Mys an êrîşî welatê Hatiyan kirin. Piştî wan yekemîn car koçberên Grek hatin Anatolê.[84-506] Ji wê hatine bişûnde jî, êdî şaristaniya Grekan bi pêşdikeve. Çawa me got Misiriyan ji şaristaniya gelê Arran sûd wergirt, Grekiyan jî ew kirin û şaristaniya xwe liser hîmê Arranan bi pêşxistin. Bi nêrîna min ew jî hêjayî lêkolînan e.

Ji hatina Helenan ya Anatolî ye şûnde, êdî navekî nû li Anatolî ye danîn. Wek birêz Ocalan jî dibêje Frîgya yî, Lîdya yî, Hîtîtên mayî û Lûwî di nava xwe de helandin. Cîranê xwe yê rojhilat jî, kraltiya Komagene bû. Vê dewletê Semsûr, Meletî, Elezîz, Mereş, Dîlok û Riha dikire nava sînorên xwe. Wata vî navî gelê cotkar û xwedî pez e. 'Kom' îro jî wek mezra bi kar tê û 'gen-gel' jî bi mana gelê.[75] Heredot, Xanthos û Strabon dibêjin: Hîna ku Frîgya yî (-Ermen) nihatibûn Anatolê, Li Macarîstan û Romanya yê li keviya Tûna dijîn û ew ji êlên Tiraq in. Seramîkên wir û yên dora Kizilirmak û Troya wek hev in.[87-125] Dibe ku ew seramîkên derketinî yên Îskît-Sakayên li herdû cografya jiyayî bin. Wî gelî ez wek kalên Kurdên li dervayê Welat dibînim. Yanî ew alî jî gereg bê lêkolîn kirin.

Bi hatina gelên ji golan û Asûriyan û bi îxaneta êlên di federasyona Hatî de, împeratorî di sala 1250 an de hilweşiya.[75] Bi taybetî jî kolera ku di sala 1338 an de pêk hatî, gelê Hatî teva kir û piştî vê Asûr bi rehetî ketin nava dewletê û heynan. Piştî dewlet tê ruxandin, êlên ji bin sîwana Hatiyan belavbûnî mîrîtiyên bajara avadikin. Pir balkêşe, ku di herêma ku Kurdên Anatoliya Navîn cara dawîn jê hatinî de ava bûne. Evna: 1-Tabal (Kayserî-Mersîn), 2-Meletî (Meletî-Komagene), 3-Gurgum (Mereş jî têde ye û ji alî Hîtîtan ve hatiye avakirin), 4-Qeretepe (Nû hatiye avakirin), 5-Adana, 6-Kummuş, 7-Sakcagozu, 8-Sam'al, 9-

Arpad, 10-Tell Tainat, 11-Til Barsip, 12-Karkhemiş ê. Gor Mihotûlî radigihîne; ew bajar dewletê di navbera dewletên bi hêz de wek tampon bi kar dianîne.[87-88]





**Bajarên Hîtît**

Li Wêranşehrê û Kurdistanê em rastî peyva **"Tomast"** tên û peyveke bi wî rengî di zimanê Hatiyan de jî heye. Wekî tê zanîn penêre bi rûnî ku di yara de amade dibî re tomast tê gotin.[93-39] Yanê mastê bi rûn e.

Li ser vê babetê Mûazzez Çix wiha dinivîsîne: "Ji kral Telepînu şûnde di welatê Hîtîtan de tevlîhevî çedibê. **Kaşka/ên** li bakûrê welatê wî belav dijiyan hertim êrîşên kraltiyê dikirine. Çi diketiye destên wan dişewitandine û dişkênane. Di ve navbera de Tuthakiya II an dibe kral, ku jina xwe jî Nikalmatî bûye. Ji wan şûnde jî Arnuvanda û Aşmunikal derdikevin holê. Di dema Arnuvanda de, Kaşkan êrîşê xwe pir dijwartir kiribûn û kral nedizanî ewê çibike? Biryarê dide ku ji Xwedê alîkarî bixwaze û wiha dibêje: " *Tenê Welatê*

*Hattî ji Xwedêyên xwe re pak û saf e; tenê em hûrmeta te digrin...Emê dîsa mî, ga yên xwe besî, nan û şerabê pêşkêşê te bikin... Li Nerîk, Hurşama, Kaştama, Hîmuya, Zalpuya ye mizgeftê me xelandin û tişt birin... Heta Hatuşa hatin, bajarên mîna Tuhaşuna û Tahantariya xelandin... Ji ber bajarê Nerîk î di dest Kaşkayan de ye emê dixwazinî kurbaneyên xwe bişînin bajarê* ***Hakmîşa (Amasya)...'*** Kral Arnuvanda, bi şerta ku kes îxanetê li kral neke, ji xaqa Hatî hinekê dide begê Kaşka û ji vê yekê şûnde dengê Kaşkan tê vemirandin".[80]



**Heyiya Paytexta Hîtît BÎ 1300 Hatûşaş**

Ji Hatiyan şûnde xelkêkî nû yê Hînt-Ewrûpî, Frîgiyan Anatolî dagir kirin. Heta rojhilatê Asûr jî belav dibûn. Di sala 1114 an de dema kralê Asûr Tîglatpileser I an xort hate ser text, Frîgiyan got em dikarin êrîşî wan bikin, lê ji 20 hezar leşkerên Frîgya 14 hezar mirin, şeş hezaran jî xwe teslimî kralê Asûr kirin. Asûran erdên ku winda kirî hemû heynan û 28 caran ew krala, ji Firat derbasî aliyê rojava bû.[69]

# MÛŞKÎ (Kurtî)

Gor jêderên ji serdema Hatî, Asûr û Ûrartûyan: li rojhilatê Sêwasê û Torosan qewmeka bi navê Mûşkî dijî û ew ji Aryan bûn. Gor belgeyeka Hatiyan ya serdema dawî nîşan dide, ku li Pahuvalî (Dîvrîxî) yê, Mûşkî di bin serokatiya Mîta de dibine tehlûkeka mezin.(87-124) Dîsa dîrokên kevn nivîsandine ku Mûşkî, ji 1100 sal BÎ li bakûrê Kurdistanê mîrîtiyê kirine. Heya Kîlîkya û Kapadokya xistine bin destên xwe. Bi gotina Tewratê jî vana hukumdarî kirine. Ji kevnerêçên dîrokî xuya dibe, ku di sala 1800 an BÎ de navê padîşahê Lîdya Mîtayê Mûşkî bû. Di wan salan da Mûşkiyan li Lîdya û Kapadokya hukumdarî dikir.(9-55) Eger ew dîtin rast bin, kalên Kurdan yê berî ku Grek û Frîgya yî-Ermen û gelên di bên, li rojavayê Anatolê jî jiyane. Kî dizanê ku ne welatê wan î kevn e? Di beşa Hatiyan de jî me dît ku berî xelkên Deryayê hîn tu xelkên rojavayî li van cîhana nedîjîne. Heta mirov dikare bibêje ku di dema volkanîk de jî Kurd û xelkê Arranî li wir bûn. Belga vê jî li gundê Buldix (Sêvika, taxa yeşîltepe) heyê; li wir, pekên mirovan yên ber bi rojhilat direvî ye li ser zinarê volkanîk hene. Xelk pêl lavaya nerm kiriye û hina jî şopa xwe li wir maye. Dîsa li heman gundî, di şikeftên pir kevn de wenêyen xezalan, mirov û tiştên din hebûn.

M. E. Zekî îdea dike ku: Mûşkî di navbera Sêrt û Amedê de dijîn û bi piranî li dora Dicle niştecîh in. Îhtîmale ku vana ji Mûşkiyan têne.(19-177) Mûşkiyan bi piranî li bakûr û dora Qoçgîrî ya îro dijîn. E. Xemgîn dibêje: Mûşkî qebîleka ji Xorriyan bû û sala 1100 an de bakûrê rojavayê Kurdistan kirin kontrola xwe. Heta Kapadokya û Kîlîkya sînorên wan dirêj dibûn. Navê bajarê Mûş ji wê qebîlê te. Di sala 770 an BÎ de bi Ûrartûyan va li hember Asûr bûn yek û xwe parastin.(4-123) Bi baweriya min ji qebîleyekê zêdetir wek federasyoneka êlan xûya dike û bi şervaniya xwe derdikevin pêş. Giredana wan û Xorriya jî pir girîng e; ji ber ku ew hemû federasyon êlên ku ji împeratoriya Xorriyan qetiyane. Îhtîmaleke mezine, ku bi hatina xelkên ji deryayê û hilweşandina Hatiyan re ew hilkiştin herêmê çiyayî û bi şerê gerîlatî dîsa vegeriyan Kapadokya û cîhên din. E. Cemîl Paşa jî dibêje: Mûşkî, ji Kurdên Sûbarî ne. 1100 sal BÎ li bakûrê Kurdistane mîrîtî kirine, heya Kapadokya û Kîlîkya xistine bin destên xwe. Di sala 770 an BÎ de tevî Kurdên Araratê li dijî kralê Asûr Sargonê I an şer kirin û di 612 an de tevî Medan bûn. Bajarê Mûşê ji Mûşkiyan ma ye.(9) Bi vê re giredayî Uyfalvî (Migration des peuples) dibêje: Dihate zanîn ku Mûşkiyên ji Firat heta Kizilirmak belav dibin mirovên Mata (Med) bûn. Zaborovskî jî dibêje, Mata berdewamiya Sumeriyan bûn.(87-23) Di Kurdbûna wan de hema hema guman nîne û tevgera wan, bi ya Reşiyan û Canbegan ve dişibîne hevdû. Êlêka bi heman navî yê giredayî Reşiya yê niha li çiyayên Lazqiyê dijî û lê mixabin ewê bune Ereb.

Wekî mirov bikare texmîn jî bike; hatina gelên Deryayê wek tofaneke bi ser xelkên Anatolê ve hatiye û hemû ji cîhên xwe veqetiyane. Wekî berê jî

hate tespîtkirin, şerkirina wan û Moxolan wekhev bûye. Ji başûr jî êrîşên Asûrî yên dijwar ev xelkana (Êlên Kurd) mecburî koçê kirin. Gelên Anatoliyê ku di navbera Asûr û wan de mabû, ji bo parastina xwe helkişiyan çiyayên Qefqasan. Ji bo parastina wan qelehên herî xwezayî ew çiyayên bilind û newalên kûr in. Ji vê şunda Gurcî, Ermen û grubên êlan derketin. Bi vî awayê êlên ji alî Hîtîtan ve dihatine kontrol kirin, ber bi Anatoliya Navîn derbasî tevgerê bûn û bi Asûran rê ketin nav şer. Di nava wan de ewên herî girîng in nîv barbar in, ku navê xwe Gasgas yan jî Kaşkî dihatin nasîn bûn. Kralê Hatiyan her sal êrîşî ser wan dikir. Mûşkiyên ku bi wan re di nav tekîliyê de bûn jî, di salên 1165 an BÎ de herêma Alzî û Purulumzî (Çeme Murat-Elêzîz û Firatê-ş) ji xwe re dikirin sîper.. 65 salan bi şûnde Kral Tîglatpileser I an BÎ 1115- 1077 an de êrîşî wan kir û ew belav kirin. Asûriyan bi 20 hezar kes êrîş kir û pênc kralên Mûşkiyan têk birin. Piştî vê Mûşkî bûn du parçe. Beşek çû dora çemê Kizilirmak, beşek jî li başûrê rojavayê Gurcîstanê bi cîh bû û tova qebîla Gurciyan yê bi navê Meskî yan pêk anî.[47] Mumkune ji ber vê be, ku hinek dîrokzan îdea dikin ku Gurcî ji Kurdan veqetîne. Niqteyeka girîng e gor wê dîtine jî ew sererast dibe, lê emê vê yekê ji dîrokzanan re bihêlin. Dîtina min ê di derbare wan îdeyan de ewe, ku ne tenê Gurcî, xelkên din ên li Qefqasya yê zimanê xwe ji koma Arî jî, yen ji Kurdan veqetî ne...

Xeleka girîng yek jî di warê ol de derdikeve holê; gor zanyaran Gurciyan ji berê ve baweriya xwe bi Ahûra Mazda tanîne. Li Sevsamora ku li dora çiyayê Bagînetî û Aragvî du şatoyên **Ahûra Mazda** dihatin parastin. Di sala 330 an PÎ de Gurcî ji Zerduştî bi dûr ketin û bûn Xiristiyanên Ortodoks.[47] Navê çiyayê Ar-ag-vî jî balkêş e. Li ser vê babetê Koroglu dibêje: Di dema imperatoriya Hatiyan (1450-1180) de, li herêma Elezîzê (Alzî-Elzi-Işuwa-Enzî û Şupa) kraliyeteka bi navê Işuwa hebû ku kralên xwe bi navên ji koka Xorriyan bûn. Piştî hilweşandina Hatiyan qewmeka nû ya bi navê **Mûşkî** hat Alzî ye. Di navbera wan û Asûran de gelek pevçûn û şer derketin. Ev tekoşîna heta dawiya sedsala IX an berdam kir. Di dema II. Aşşur-naşir-apli (883-859) de seferek li dijî Mûşkiyên rabûnî ser piyan hat kirin. Paşê, di dema III. Şalmanu-aşarêd (858-824) de jî li ser herêmê gelek zordarî hebûn û wî kralî tam şeş caran êrîş bire ser Mûşkiyan.[56] Wekî tê zanîn li çiyayê Elewî-Lazqiyê jî Kurdên Reşî hene, ku ji vana êlêke navê xwe Mûşkî ne, ji bo agahiyên zêde li ser wan li Kovara Veger ê binêrin.[190] Dîsa li Amed û Rakka yê jî Mûşkiyê hene û ewe giredayî Karaulus(-Reşiya) in.[160-599] Li Yozgatê kela û gundekî bi navê Mûşalimê heye; li Elezîzê navçeya bi navê Mûşar (Aydinlar) heye. Mûşkara jî navê Nevşehîrê yî kevn e.[103-589] Hemû îspat didin nîşandan, ku ew beşek ji kalên Reşiyan yên îro ne.

Mihotûlî dibêje: Li hember zexta Asûriyan, Tagal û Mûşkiyan demekê di nava konfederasyona Frîg (Ermen) de cîh girtin. Lewra Tukultînînurta ji rojavayê Firat 28 800 kes biribûn û piraniya wan Mûşkî bûn.[87-125] Xuyaye ku Mûşkiyan-Reşiyan tekîliyên xwe bi Ermenan ve ji demeka pir dirêj vir ve

berdewam e. Ew yeka heta salên 1920 an jî dewam kir. Dîtineyên ku dibêjin hinek êlên Reşiyan ji Ermeniyan hatine ne rast in, lê gelêk têkiliyên germ çêbûne û berovajî hinek Kurd bûne Ermen. Dîsa kralê Ûrartû Rusa yê II an jî gelek Mûşkî biribûn cîhên ku nû zept kirî. Di seramîk û mirî veşartinê de jî herêma başûrê Qefqasan, rojavayê Îran û bakûrê Dicle û Firat wekhev in. BÎ 900-800 an de herêma Mûşkî Ketmuhu(?) bû, kralên xwe jî bi navên mîna: Kuştaşpî, Kundaşpî bûn, ku bi kralên rojavayê Îran ve wekhev bû. Ji bo ku serê xwe neditewandin ji wî re digotin **"Kurtî"**.[87-125] Wekî me berê jî got, taybetmendiya wan ê herî mezin ewe; ku serî li ber ti hêzan netewandine. Ew yeka bi kesayetiya Reşiyan û êlên din ê koçber ve hevdû digire.

Sargonê II an, kralê Ûrartû Rusa têk bir (716), ji perestgeha Haldiyan 10 ton zêr, weqas jî zîv, 6110 kolê, 260 asilzadê û gelek ajal bir. Lê mecbûr ma ku bi Mûşkiyan ve peymanê çêke, lewra Mûşkî li çiyabûn nedikarî bi wan re şer bike, paşê di êrîşeka Kurtiyan de mir.[87-121] Federasyoneka balkêş û şervan e; hêvîdarim lêkolînên kûr û fireh li ser wan bên kirin; lewra hemû federasyonên min nivîsîn û yên ezê binivîsim ji bo dîroka Kurd wekî xelekên zincîrekê ne. Yek yekê aşkere dike.

## SUMER (KENGÎ)

Li ser dîroka Sumeriyan gelek guftogo hene; hîna jî baş nihatiye tespîtkirin, lê Kurdbûna wan îdeaya herî nêzîkî rastiyê ye. Hinek turkolog jî dibêjin ew Tirk in, lê ev ji zanistiyê dûr e. Wekî tê zanîn, dîroka nivîskî bi Sumeriyan ve destpê dike û tê gotin ku Sumeriyan hertiştekî xwe ji bakûrê Dicle û Firat girtin. Wekî birêz Ocalan dibêje: Ji teknîka cotkariyê bigre hetanî saziyên sereke li vê herêmê pêk hatinî ji bakûr bi xwe re anîn. Sumer gav bi gav ji bakûr ve hatin jêra Mezopotamya yê. Dîroka Sumer û Xorriyan derbasî hundirê hev bûye.[75] Ew tespîteka girîng e. Mumkune ku Sumerî federasyonek yan jî beşek ji Xorriyan bin. Beşek jê vegerî başûrê Mezopotamya û bi hatina Ereban re ew dîsa vegerîn bakûr. Bi têkçûn û belavbûna wan re piraniya wan hatin bakûrê Kurdistanê û wek Hatî hatin binav kirin... Dîtinên ji wê cûdatir jî hene û dibêjin Sumerî ji başûrê rojhilat hatin û bi koka xwe re hemû tekiliyên xwe qût kirin û şaristaniya wan di destpêka 4000 sal BÎ de destpêkir.[66-12] Gor vê tespîtê, texmînî ew ji rojavayê Hindîstanê hatine. Torî ji hinek jêderên arkeolojîk wiha radigihîne: Jêder nadin xuyakirin ku Sumerî kengê hatine herêmê; lê tiştê tê zanîn, dema ew hatin li vir gelên din hebûn. Samî 2600 sal BÎ hatin û li bakûrê Sumer bi cîh bûn. Li başûr û bakûr Sumerî di tengasiyê de hiştin. Salên 1900 an BÎ de jî Sumer ji alî Akadên Samî ve hatin helandin/ asîmîlê kirin.[94-40] Ne dûre, ku beşek ji Sumer çûbin bakûr dîsa û wekî min gotî navê Hatî lê hatibe dayîn. Hinek dîrokzan dibêjin ku ew 5000 sal BÎ ji bakûr, hinek jî dibêjin bakûrê rojhilat (Derya Kesk) hatin. Gor baweriya min, ew xelka berê jî li herêma hîva bi heyî rûdinişt; lê ji ber sedem yan jî sedemên xwezayî,

zordarî yan jî sedemên em nizanin çûn bakûr, li wir wek Xorrî xwe bi rêxistin kirin û dema rewş aram bû jî hatin başûrê Mezopotamya. Bi hatina Ereban re beşekî mezin ji wan ber bi bakûr ve çûn. Mirov dikare bibirse gelo ew ne kalên Hatiyan bûn? Ev niqtê hîn zêde hewcedarî ronîkirinê ye. Lê ew dîtin ji alî Collîns ve jî tê piştrast kirin.

Arkeolog Sîr Leonard li bajarê Ur kolan kirin, tiştên ditinî, bi yên li çiyayên Kurdistanê yên ji dema neolîtîk ve nêzîkî hev-xisim bûn. Vê yekê, di belavbûna şaristaniyê de xeleka qetiya gîhand hev. Ji ber ku; xelkê bakûrê Zagrosan 5000 sal BÎ ber bi başûr hat û bajarên başûrê Kurdistanê girtin. Paşê hîn ber bi jêr çûn û 4500 sal BÎ dest bi avakirina zeviyan kirin. Ew tiştên bi xwe re anîn mîrasa çanda Samarra bû. Bajarê yekemîn ya bi navê Erîdu li Mezopotamya hatî avakirin jî berhema vê çandê bû. Heykelên mîna maran yên li Ûr derketine 5000 salan BÎ bûn; lê heman heykel li Kurdistanê li salên 6750 an BÎ de hebûn.[159-322] Ew belgeyên arkeolojîk yekîtiya çandî ya bakûr û başûr dida xuyakirin. 4000 sal BÎ li bajarê Sus ê wêne marêkî bi siro hatê dîtin. Du hezar sal şûnde heman mar bûbû sumbola Xwedê **Mardûk**.[87-33] Wekî min berê jî nivîsî, gelek balkêşe ku heta demên dereng, mar, di nava Kurdên Anatoliya Navîn û yên rojavayê Kurdistanê de cîhêkî taybet dilîst. Heta roja îro çîrokên Şahmaran tên qalkirin û cîhekî nîv-pîroz nîşan didan. Eger mirov wêneyên maran yên li ser deriyê Lalîş jî hesap bike, dîrokeke kûr digihîjê hevûdû. Di beşa Êzdatî de emê fireh li ser rawestin.

Li ser dîroka Sumeriyan bê guman Sumerologa Tirk Mûazzez Îlmi-ye Çix gelek salan kar kiriye û ji ser kevirên Sumerên dîrokî gelek berhem afirandine. Em nizanin ew çiqas objektîv e; lewra di pirtûkên wê xanimê de ez rastî dîtinên hîssî hatim û ji bo wê bi guman ez jê sûd werdigirim. Çix, ji şaîrekî Sumerî wiha radigihîne: "Kal û bavên min berî hezaran salan barê vir kirine. Ji ber ku nivîsandin nedizanîn, nenivîsîne ku ji kuderê û çima hatine. Lê ji mezinan hatiye guhên me: Ji bakûrê rojhilat, ji welatê bi navê **"Dîlmûn"** bi riya deryayê ew hatine. Sedema hatine, li welatê meyî her tim baran dibarî bi salan baran nabarê û herderik ziya dibê û netewe me jî bi her alî de belav dibê. Bapîrên me jî hatine vir. Bajarê min Nîppûr, bavê hemû Xwedayan û kralan **Enlîl** avakiriye. Kesên din jî hatine bajarekî din çêkirine û kraltiyê bajaran avabûne. Paşê jî bihev re pêşbirka hêzê kirine (bihev re şer kirin-Ş). Yek ji wan kraltiya bajaran ji xaka me gelek dûr bûye, li bakûre rojhilat, piştî çûyina heft çiyayên mezin bajarê **Aratta** bûye.[80] Bê guman belgeyeka girîng e. Ji wê tê fêhm kirin ku xelk ji bakûrê rojhilat, ji ber hişkbûne hatiye. Bajarê Aratta kuder e, tekiliya wî bi çiyayê Ararat û Arran ve çi ye? Lewra peyveka kurdî ye û divê têkiliya wan bi hevre hebe. Yan jî ew li Asya Navîn bûn? Gelek îşaret hene ku xelkê Arranî heta Asya Navîn belav bûye; mirov dikare bibêje herî kêm heta Xorasanê belav bûye. Ewên hatine îhtîmaleke ku pêşiyên Kurdan yên heft hezar sal berê ku hatine başûrê Mezopotamya bin. Li cîhên ku ew gel jê hatî: zêr, zîv û kevirê şin î (zagîn) hebûne. Hema helbestvan dibêje: Hinek ji me **"Ser**

**reşan"** li vir bi cîh kirine. Em çima vî navî li miletê xwe dikin? Tiştekî ecebê ne? Hîn em nehatibunî wî cîhî, cîranê me çav şîn û por zerê hebûne. Li vir min tu kesî bi wî rengî nedî! Em ser reş û çav reş in, lê rengê me mîna genime, em ne reş in...[79] Xuyaye ku ew belga hêja nîşan dide ku neteweki kej li wir (Asya Navîn) biye. Di vir de pirsek tê bîra mirov: Ew gela kî bû û kejbûna Kurda bi tevlîhevbûna bi vî gelî bi şunde re pêk hat? Îro di nava Kurdan de hejmareka pir mezin kej û çavşîn hene. Ew di nava hemû zarav axifên Kurdan de mewcû-te. Bi taybetî jî di nava Kurdên Lor/Ler û kurmancan de pir balkêşe. Çix ji van belgan niqteyek girîng radigihîne: Di xanî çêkirinê de gelek kevirên rengîn bi kar dianîn, evê herî girîng jî, kevirê Zagînê yê ku rengê vî şîne, dikirin temelê xaniyan û çavên heykelan. Ev kevira jî ji başûrê Derya Kesik û ji Afganîstana îro dihat. Bi vê yekê re giredayî jî dibêjine Sumerî ji wir hatin.[80] Îro jî ew kevira di çêkirina tizbiyan de bikar tê, li Xorasanê dostan yek jê diyarî min kiribûn. Bê guman li vir jî girîng e ku em balê bikşînin ser bi navkirina Sumeriyan yê wek "Ser-reşan". Di beşa Xorriyan de jî navê Çûxreşiyan derbas dibû û hîna jî ew nava tê bi kar anîn. Gelo ew tenê tesadufe? Çawa ku kevneşopiya mar bi hezaran salan dom dike, navê Kurdan dewam neke? Porê wan, yan jî kumên ku bi kar tanîn reş bûn? Eger risên ji hiriya reş bûne xere dikare kum yan jî cilên wan reşbin...Yekê jî îro di nava Kurdan (Tirkan jî) de kevneşopiyek heye ku kevirê şîn ji bo bînaçava bikar tînin. Ji sedî sed ew kevneşopiya jî koka xwe ji Zagînê Sumeriyan digire. Hinek nivîskar jî cûda nêzik dibin:

5.000 sal BÎ di navbera Dicle û Firat de dijîn. Nivîs belav kirin, teker afirandin, zevî ajotin, hejmara 60 ku em di saetan de bi kar tînin Sumeran dîtin.[119-19] Di vir de hatina ji bakûrê Dicle û Firat bi ya ji welatê Dîlmûn ve lihev nayê. Lê dibe ku ji cîhekî çûbûn cîhê din û di dawî de jî hatibin başûrê Mezopotamya. Yan jî ji bakûrê Firat heta welatê Dîlmûn ew belav dibûn. Bi dîtina min jî Dîlmûn raste, lewra îspatên wê zêde ne. Tûncer dibêje: Wana bawer dikir ku Xwedê li ezmanan e.[119-20] Ji bo wê jî **Zîgurat** ava kirine û Kurd heta roja îro qurbanan li cîhên bilind serjêdikin. Li Anatolê jî li Xorasanê jî wiha ye. Mihotûlî dibêje: 4000 sal BÎ bajar dewletên mîna Ur, Ûrûk û Lageş ava kirin. Sumeran cejna **Dûmûzî** pîroz dikirin ku wek cejna beran berdanê û Kosegelî ya Kurdên îro ye. Dûmûzî, xwede **Kengiya** yî pirbûnê/seksê û dûlgirtine.[87-62] Mihotûlî îdea dike ku navê wanî bingehîn Kengî ne û piştre ew wek Sumerî hatine binavkirin. Nivîskar Murşît El Yusif, di navbera Sumerî û Kurdan de girêdaneka bingehîn çêdikê û dibêjê ew ji bakûrê Îraqê daketine û berdewamiya wan netewên di navbera Dicle û Firat de jiyane û ji bilî Kurdan tu miletên din li wir nejiyane.[45]

Kurdistan û Mezopotamya, berî Îsa her tim bû qada şer û afetan. Di du belgeyên ji Sumeriyan 2000 sal BÎ mane de welatekî bi navê **Kar-da-ka** hatiye nivîsandin. Ev welata gorî G. R. Drîver li başûrê Wanê bû. Nêzîkî hezar salî şunda Tîglath-Pileser bi gelê bi navê Kurtîe tê nasandin re li çiyayên Azû (Hazo-li gor hinan jî vira Sason e, Drîver. Di Şerefnamê de keleheka bi navê


Suyê li Bedlîsê derbas dibe) dikeve şer. Di kîtabên Asûriyan de: ji bo Kurdistan 'Kardaka', ji bo Kurdan jî civaka 'Kurtî' ye derbas dibe.


**Kral Gudea-Sumer-2001 BÎ**

Welatê Sumeriyan li herêma îro ya wek "Şatûl Arab" tê bi nav kirin de hatibû avakirin. Xelkê Samî jî li bakûr û rojavayê wan dijî. Elam û Gûtî jî li rojhilat û rojhilatê bakûrê wan dijîn. Li cem kralê bajarê Nîş Urzababa, fermandarekî bi navê Sargon (2334-2279 BÎ) kar dikir. Piştre kralê xwe kuşt li ser text rûnişt û dewleta Akad li ser bingeha Sumeriyan fireh kir. Sargon komkujiyek pir hov li hember Elam pêk anî. Lê îttîfaqa Gûtî û Sumeriyan dawî li xanedana Sargon anî.(72) Di pirtûka bi navê "Dîroka Dinyayê" de wiha tê gotin: Bêyî ku bizanibin wana di rastiyê de karê Xwedayên Sumeriyan pêk dianîn: "Wê demê Enlîl qesra xwe ya jê hezdikirî windakir. Çavên xwe zivirand (çexê) çiyan, çexê welatê dujminan kir. Wî bangi xelkekî li çiyan kir, ev xelka ne wekî yê din bûn, ew Gûtî bûn. Vana mîna xelkên din kanûn nasnedikirin. Tevgera wanê weke mirovan bû, lê axaftina wan dişibiya lêketina kûçikan. Enlîl banî wan kir ji çiyan. Tiştek ji destên wan ên dirêj xelas nebû..." Rêyen maden û yên taciriyê ku diçûn Sûriyê jî di destê Gûtiyan de bûn.(69) Bi taybetî jî, ji bakûrê welatê Sargon, êrîşên Gûtiyan ku ji Zagrosan hatin ew welat xirab kirin û di dawî de jî kirin bin destên xwe. Lewheyên axî yê derketî de nivîskarêk welatê Sumerî wiha tarîf dike: Welatê me di nava du çeman de ye û deşte. Ji çiyayên Amanus dar; ji çiyayên Ebla mermer û kils, ji Hahhumê zêr, ji Meluhha yê zîv, ji Elama rojhilat sifir, ji çiyayên bakûr jî bazalt tê.(79)

Piştî mirina Sargon zarokên wî welat fireh kirin, neviyê xwe Naramsîn (2254-2218) gor tabloyên derketî: got ez Xwedê me û Sumerî xeyidandin; Xwedayê Sumeriyan Enlîl û perestgeha wan **Ekur** bi erdê re kire yek. Xwedê me pir bi hêrs ket û çavên xwe berdan rojhilat û Gûtiyên hov ên ku li wir dijîn ajotin ser Naramsîn. Hêza Naramsîn pê nevestî/têre nekir ku wan mirovên mina mêriyan hatinî rawêstîne. Ji vê yekê bişûnde tuneyî li welatê me bû. Gûtiyan bajarên me hemû xirav kirin; lê mîrîtiya bajarî ya Lagaş azad berdan. Bajarên mîna Ûr, Ûmma, Nippur û Ûrûk ji Lagaş re cîh hiştin. Li wan bajaranê de herî zêde Sumerî lê dijîn. **Car caran ez difikirime: gelo vana yek ji milê (êl) miletê me ne?** Gûtiyan hema hema 130 sal welatê me birêvebirin şunde, ji bajarê Ûrûk, Utuhegalê (2123-2113) Sumerî xwe kire kral û serhilda. Nivîskarekî me dinivîsîne ku: Wî, Gûtiyen mîna boçik û marên çiya, evên ku

kralê me dibin welatên din, welatê Sumer bi dijminan tijî dike, mêran ji jinan, zarokan ji dayikên wan diqetînin, ji xaqa me avêtin. Kralê wanî dawî Trîgan dîl girtin.(79) Balkêşe ku Gûtiyan dest navêtin bajarên ku Sumerî lê bi piranî ne û gor belge jî nivîskar dikeve teredûtê ku ew jî milekî netewê wan in ku rastî jî ewe. Tê gotin ku Asûriyên li bakûr dijin, êrîşî Nippurê kirine û wira jî mîna bajarê Ûr xirab kirine.(79)




**Sumer** (66-13)

Amorît: bi eslê xwe ji Samiyan in, BÎ 2000 an de ji rojava êrîşî Mezopotamya û bakûrê Sûriyê kirin. Li her derê bajarên Amorîtan çêkirin: Marî, Harran, Nahor, Qatna, Ûgarît. Babîl dibe paytext. Serokê wan BÎ 1750 an de Hamûrabî ye. Wan Amorîtana li rojavayê Mezepotamya, di herêmen deşt û çiya digehêjin hev de koçber dijîn. Dema xelkê niştecîh ji hêzê ketin, wan êrîş kir, navenda wan jî bû Harran. Bi wan êrîşan re Sumerî ji meydana siyasî rabûn. Di lêkolînan de hatiye dîtin ku li Harranê serokên êlan hebûne.(81) Berî Amorîtên Ereb jî, tê zanîn ku mirovên herêmê (Sumerî) yê bi zimanekî deng

dikiriye. Sumeriyan ev yeka wek helbest nivîsîne û li ser lewhekê wiha gotine: Li wan rojan welatê Subur-Hamazî... ji ber şeran Xwedê zimanê di devê wan de guhart.[81] Şaîre Sumerî Ludîngîrra (zilamê Xwedê) wiha nivîsiye: Min dema vê nivîsî, biyaniyan welatê me birêve dibirin. Ji ber vê gelek zimanên cûda li welatê me dihatin peyivandin. Ji bo ku: Ziman, huner û jiyana me ji bîr nebe ez dinivîsîme. Pêwîste em him Akadî him jî Sumerî bizanin. Akadî, zimanê evên ku me birêve dibine. Ev herdû ziman qet naşibin hevûdû. Zimanê me yek, du yan jî ji sê kîteyan pêk tê. Bi zedêbûnê cûda yan jî gotinan didin rûhev jê wate derdixin. Mînak: **"e"** tê wata mal; **"ete"** jî ji mal; **"lu"** di wata zilam; **"gal"** di wata mezin de ye; dema em tînin keleka hevdû "lugal" dibe mêrê mezin. Ji bo nivîsê jî zaravên me hene: Ji prensan re emegîr; ji jinan re emesal. Jin wextê dinîvsînin û dengdikin zaravê xwe bi kar tînin. Vana him zimanê me, him jî ola me ji destê me girtin û li ser rûniştin. Sargon hertişt ji destê me girt.[79] Ji vê belge aşkeretir ti tiştên din nabe û vekirî dide xuyakirin ku çand û zimanê kalên Kurdan ketiye bin destên Ereban û ew kirine malê xwe..



**Zimanê Sumerî**

Di zimanê Sumerî de hem bandora Xorriyan, him jî bandora Amorîtan (Samiyên ku ji başûr hatine) heye; lê ev nayê wê watê ku Sumerî ne qewmeke orîjînal in. Di dîrokê de ti şaristaniyên ku mina wan bandora xwe heta roja îro li ser dîrokê heye nîne.[72]

"Cîranan, ji bo ku cinê ketine hundirê jina min derxin çûn cem jineka ku sihrê bikin anîn. Jinikê kaseyek nav bi xwê û av tijî anî, pêlên dara ilgin ê avêtinê û av avêtin ser jina min. Paşê dû kir û ronahî li dora jina min gerand, paşê jî bi bronzekî dengê bi tirs û xof derxistin û gotin: "Cin-no, nexweşîno, Uduk a xirav, ala xirav, îblîs, ji laşê Navîrtûmê derkevin".[79] Ew sîstema nexweşî xweşkirinê berî 50 salî li Anatoliya Navîn jî hebû. Di navbera herdû bûyeran de qet cûdahî nîne û tu dibêjî qey di navberê de pênc hezar sal derbas nebûne. Li herêmê ji vê nexweşiye re **"Al Basma"** dibêjin ku ew bi tirkî ye. Navê xwe yê orîjînal nayê zanîn û ew nav ji xwîn herikandina ji jinên nû zarok çêkirî girtiye. Piştî zarok anînê xwîn nasekine û li gor baweriya wan pîrejinek tê û

tiştê zikê jinikê dibe, xwîn diherikê û jinik dimire. Ji bo ku cin bi ser nekeve, pêwîste nexweş şiyar be. Ji bo wê jî dengan derdixînin, teneke û firaqan lihevdixin, tifingan diteqînin, guh û porê jinikê dikşînin. Piştî hezaran salan ew kevneşopî gelek dişibine hev ku mirov şaşmayî dimîne... (Ji Anatoliya Navin Serpehatiyên Dîrokî –Ş.R. mêzeke). Ji bo wê, di navbeyna Kurdan, bi taybet jî yên koçber û Xorrî, Mîtanî, Hatî û Sumeriyan de hem ji alî dîrokî ve, hem jî ji alî civakî, çandî, olî û ziman de gelek nêzikatî hene.



Nivîsa Sumer a aîdê kral Gudea-2100 BÎ

Li Anatolê, Hîtîtan û Xorriyan nivîsa mixan heynan û dest bi nivîsandina zimanê xwe kirin. Ûgarîtê li Sûriyê jî ji vê, nivîsa pîtan çêkirin. Wan netewan ji Sumer berhêmen wêjeyî dianîn û tercûme dikirin.[79] Bi vî awayî Sumeriyan çanda ku afirandinî, bi taybet jî pêşketinê di alî wêjeyî de li hemû herêmê belav dikirin.

## LÛLÛ (Lûlûbuman, Lubîla)

Heta vir me hewl da ku bibêjin gelê Kurd di serdema kevn de, carna wek federasyona êlan, carnan jî wek konfederasyon û Împaratorî dijîn. Ji wî miletî beşek jî Lûlû bûn. Divê ew jî federayoneka êlan be. Lê îro neviyên wan kî ne ? Em nizanin. Îhtîmaleke mezine, ku ew mezinên Kurdên Lor-Lek-Leran û Bextiyarî bin. Vana di salên 2334 (2360) an BÎ de, li herêmê Suleymanî, Şehrîzor

û Zahavê dewleteka Kurdan a bi hêz, di rêbertiya kral Anubanî de ava kirin. Dewlet heta sala 612 an BÎ berdewam kir. Bi Gûtiyan ve bûn yek û ji Hîlwanê heta Kerkûk kirin bin kontrola xwe. Di pirtûkên ku bi zimanê xwe nivîsandinî de qala şerê bi Akadiyan re dikin. Di salên 2300-2233 an de bi Akadan re şer kirin û serokê Lûlûyan Satunî dîl ketê destên wan. Ji vê tarîxê şûnde bi Gûtiyan ve bûn yek û heta dewleta Akad ji holê rakirin ev yekîtî berdewam bû. Di belgeyeke de hatiye xwendin ku hinek kral û rêvebirên Asûriyan ji Lûlûyan bûne. Ji herêmê Lûlûyan re Loristan tê gotin û hinek êlên vê herêmê koçî Sûriyê kirin.[59] Ewên ku çûne Sûriyê jî beşek jê çû Cezayîr û beşên din jî di dirêjahiya dîrokê de hinek vegeriyan Loristan û hinek jî ber bi Derya Kesk ve çûn.

Di sedsala IX an BÎ de paytextê Lûlûyan bajarê Zîmriye bû. Medan, Asûr ji holê rakirin bi şûnde, Lûlû bi Medan re hatin girêdan. Gor dîtina birêz Torî, Kassiyan di bin serokatiya Gandaş de, sala 1760 an BÎ de çûne Lorîstanê. Berî koçê, welatê wan bakûrê Dîcle bû ye û li wir bronz çêdikirine; di kolonan de ew yeka derketiyê holê. Beşek ji Lûlûyan, vê demê hê li rojavayê Kurdistana îro dijîne.

Prof. Dr. M. Atok Kaşgarli di pirtûka xwe ya bi navê: "Dogu ve Guneydogu Anatolu Uygarligina Gîrîş" de wiha dinivîsîne: Gelê Zagrosan yê yekemîn Lûlû (Lubîla) û gelê nêzîkî çemê Diyala yê bi navê Gûtiyan bûn ku dapîrên Kurdên îro ne. Di sedsala XVII an BÎ de **Kassî** li Lorîstana îro bi cîh bûn û li Babîlê 600 sal bûn desthilatdar. Cara yekemîn wan hesp anîn herêmê û li cem Kassiyan hesp pîroz dihate dîtin. Rêvebirên Kassiyan bi Mîtaniyan ve xismên hevbûn. Kralê Elaman sedsala XII an BÎ de, Kassî ji holê rakirin. Kassî jî bapîrê Kurdan in, lewra eslê Kassiyan ji Medan e. Bê guman ji holê ranabin lê hêjayî gotinê ye ku ewên rizgar bûn vekişîn çiya, yan jî çûn cîhên din. Wextê çûn cîhên din jî navên wan bi rengekî din di dîrokê de derbas dibin. Wekî me di beşa Hatiyan de jî gote, di esas de navê wan ne Hatî bûn lê ewên niştecîh ew nava li wan kiribûn.

S. Mihotûlî balê dikşînê ser xelekeka girîng a ku xelkê Elam/Îlam bi Arranan ve digihîne hev; ew xal ji bo koka Kurdan girîng e. Li ser vê wiha dibêje: Xelkê Elam ji xwe re digotin **Hatamî**; di kolanên Sus de hate îspatkirin, ku ew 4000 sal BÎ hatine wê herêmê.[87-48] Peyva Hatamî bi hatî ve nêzîkî hev e, lê çiqas tekiliya wan heye hê nayê zanîn; mumkune yek bin jî. Di dema kral Kurî Kum (2670-2660) de yekîtiya Hatamiyan hate çêkirin û kraltiya **Aryan** avakir. Paşê Sargon ê yekan di navbera salên 2725-2670 an de bajar û welatê Aryan heta Kerkûk girtin. Lê Aryan serî dananîn û vekişîn çiyayan. 2500 sal BÎ jî Gûtiyên hîn li jor, di bin serokatiya Şarlak de dest bi dagirkirina başûr kirin.[87-48] Di beşa Arran de jî min gotibû ku Asûriyan ji bo Kirmanşahê peyva Arya bi kar tanîn ku divê ji navê vê dewletê girtibin.

Kralê Lûlû, Anu Bananî di nivîseka xwe ya ji 2800 sal BÎ de mayî dibêje: Welatê Zihaw-Helwan di bin desthiladariya min de ye. Dîsa di vê nivîsê de em fêr dibin ku Gûtî di bin rêvebiriya Lûlûyan de bûn. Tê fêhm kirin ku ji heman

milete, lê êlên xwe cûda bûn.[94-95] Belê ew fedarasyon bi hev re di nav tevgerê de ne. Carna yek serkêşiyê digre û derdikeve pêş carna jî ya din digre.

Di dema kral Ameha de Lûlû û Asûriyan şer kirin û Lûlû têk çûn. Bi ser vê de xelkê Lûlû vekişiyan çiyayên Nisir, Kiniya û Pîremîgru.[94-101] Ji destpêka dîrokê vir ve gelê me dema di şeran de têk diçûye direviya çiya. Ew yeka ji rewşa îro ya civakî bigre heta nebûyîna xwedî dewletekê de jî xuyaye.

## KASSÎ (Kussî-Huza)

Li ser dîroka Kassiyan Torî dibêje: Di sala 1760 an BÎ de di bin serokatiya kralê xwe Gandaş (1732-1717) de; bakûrê Dîclê, yan jî dora Çemê Diyala ji xwe re war girtibûn û li wir dewletek avakiribûn. Gelên li bakûr û bakûrê rojhilatê Derya Kesk di sala 2000 an BÎ de koç kirin. Ji wana yek jî Hatî bûn û di bakûrê Kassiyan re hatin Anatolê. Bi vê re Kassî hatin Loristanê dewleta Kassî avakirin.[94-133] Ew hatin û veqetîna koman girîng e, sedemên vê jî bê guman gelek girîng in, ku bersiva van dikarin gelek girêkên dîrokî vebikin. Cîhê ku jê hatine balkêşe ku navenda Xorasan e, bere min nivîsî bû ku S. Bilgîn û nûserên din jî vê yekê dinivîsînin. Li vir dîsa pirsa; gelo Kurd ji Asya Navîn hatin yan jî ji başûr çûn vê herêmê? derdikeve holê. Xeleka esasî ya bête ronî kirin ev e. Bi dîtina min Kurd ji başûr çûn navenda Xorasanê. Bi taybetî komên ji wê herêmê hatine bi Kurdên li dervayê welat ve hevûdû bê şik temam dikin. Yanê ew, bi taybetî jî Xorrî, Hatî û yên din, ji her alî ve wek berdewamê hev in. Torî dibêje: di kav û kacaxên derketî de tê xuyakirin, ku berî ew bên herêmê aletên ji bronzê çêdikirine. Bronzê derketine rastî salên 2700-2100 û 900-700 an BÎ tên.[94-80]

Di belgeyeka ji Asûran mayî de tê fehm kirin ku Kassiyan hezar sal BÎ li herêma xwe bi cîh bûne. Hamûrabî û dewleta Babîl ji ber êrîşên Kassiyan mecbûr diman ku tim bi wan re têbikoşin û qelehan avakirin.. Ji ber êrîşen Hayiyan jî xelkê malê xwe terk kirin, lê Kassiyên li Babîl li ber xwe dan û ji êlên li Zagrosan jî alîkarî xwestin. Ev jî te vê watê ku Babîlan welatê Kassiyan dagir kiribûn. Kassiyan, di rêberiya kral **Kastîlyas** BÎ 1595 an de dewleta bi navê **Kardûnaj** ava kirin û Babîl jî di nava sînorên vê de bû. 400 sal li wir hukumdarî kirin. Di dema kral Agumê III an de tê dîtin ku bi dewletên cîran û bi taybetî jî bi Misrê ve elçiyên xwe şandine welatên hev. Di atlasa Bonnîer amedê kirî de jî tê nivîsandin ku sala 1570 an BÎ de Kassî ji çiyayên rojhilatê bakûr hatin xwarê û deşt dagir kirin. 300 salan jî li wir hukumdarî kirin.[66] Di ve serdemê de jî îttîfaqa Kurdan li hember Babîliyan xuya dike. Ji rojhilat ve, yanê ji Zagrosan ve Kassî; ji bakûr ve jî Hatiyan êrîşî Babîl dikirin. Di encamê de Hatiyan di sala 1595 a BÎ de Babîl dagir kirin.

Gorî lewheyan, sînorên dewletê ji behra Îranê heta gola Ûrmiyê û sînorên Kurdistana îro dikirin nava xwe. Di derdora salên 1242 an de dewleta Kardûnaj kete krîzeka aborî û xelk ji wir koç kirin. Di derdora salên 1235 a de

Asûriyan di Kardûnajê de gelek kes kuştin û dewlet ji holê rakirin. Kassîtan ji Xwedê re digotin **"Huza-Hoza"**. Çar hezar sal berî zayinê Kassîtan kelpîç çêkirin.[59] Îro jî di kurdî de huz a Kassiyan wek Xudê-Xuda, yan jî mirov dikare bibêje di xweza de hîn tê zinde kirin.

Zanyarên wek Hilprecht, Înckler, Halî, E. Meyer dibêjin ku: Hatî, Mîtanî, Elam, Sumer, Med û hwd ji Arya têne. Kassî jî cara yekemîn di dema kralê Babîl Şamsulluna 1960- 1923 an BÎ de li Mezopotamya xuya dikin. Wê çaxê xwe wek **Kardûnyaş** û Mezopotamya jî wek **Kardûnya** didane nasîn û hesp difirotin Samiyên dewlemend. Ji bo ku gelek hişk bûn ji wan re digotin **Kurtetî** jî. Dewleta avakirine jî bi navê Kardûnaj dihate nasîn û heta 1145 salan BÎ dom kir û dema xwe ya herî baş jî dema malbata Kurî Kal Zu bû. Kralê Asûr Sanaşerîb sala 705 a BÎ de dema êrîşî Zagrosan dike û vê yekê li ser lewheyan dinivîsîne. Di lewheyan hatine dîtin de qala Kassiyên gelek şervan dike. Kralê Pars jî dema di wir re derbas dibûn, mecbûr dibûn ku diyariyên giranbiha bide Kassiyan. Dîsa Îskenderê Makedonî jî nikaribû wira bigire.[87-82,84]

Heredot di berhema xwe ya dîrokî de navê wan wek **Kîssîa** dide û di alî kincan de vê tarîfê dike: Wek Med û Persan cil li xwe dikirin û çek girêdidan; tenê cûdahiya wan ji herdûyên din ev bû, ku kumên wan ji metal û serê pozê kuman dirêj bûn.[84]

Kassiyan dewleta Babîl di sala 576 an de rûxandin û Babîl di bin desthilatdariya dewleta Kassiyan ya bi navê Kardûnî de ma.[94-41]

**Kralên Kassî û Kardûnî**

1. Gandî (1732-1717)
2. Agum I (1716-1695)
3. Kastîlîas I (1694-1673)
4. Ascheshî (1672-1665)
5. Abiratta (1664-1647)
6. ........

32. Enlîl Nadîn Achche (1160-1158) [94-192]

Êla Kassî ya herî mezin û ya belav dijî navê xwe **Bazî** bû. Haşmar (tê wata şahîn) jî êlêka Kassî ya kevne. Li çiyayên çeme Diyala jê dizê rûdiniştin.[94-199] Kassî di sala 1160 an de ji alî Asûriyan ve ji holê hatin rakirin.

## ASÛR

Li ser koka Asûriyan zêde agahî nînin; min di beşên derbasbûyî de jî qal kir û tê gotin ku ew mihacirê Samiyên ku hatine dora bajarên Sumeriyan bi war bûne. Di dû hatina Samiyan, pêleka din a ji xelkê Samiye vê re dibêjin Amorît hat û Samî hîna jî bi hêztir kiribûn. Gelê Samî cara yekemîn li derdora 2300 sal BÎ de yekîtiya xwe çêkir û wek dewleta Akad derket sehna dîrokê. Pêşengiya vê jî Sargon (2334-2279) kir. Ji bo wî jî wiha dibêjin: Li bajarê bi navê Azûpianu yê li kêleka Firat jineka ser-keşe qedexa mêran şikand û lawikekî

xwe bû. Dixwest vê yekê veşêre, da kes pê nehese. Lawik kire selêka ji çiloyên dara çêkirî, bi heriyê sîwax kir û bi ava Firat ve berda. Pêlên avê ew bire Aqqî, kesekî av dikşandî ji avê ew selêka derxist û li wir wek bexçewanek ew mezin bû. Navê **Sargon** lê danîn. Dayika wî jî keça kralê bajarê Kiş bû. Bi xwe ji xanedana Akadan, yanî ji bedewiyên çolê bû.[69] Ji vê bûyere ew encam jî dikare derkeve, ku koka Sargon dibe ku ji miletekî din be jî, lewra di nava Kurdên li Anatoliya Navîn de qala çîrokeka balkêş tê kirin. Li ser esasê vê çirokê neraste ku mirov bêje ew Kurd e, lê ew îhtîmala heye.


Sargon

Li Anatoliya Navîn heta îro jî qala vê çîroka balkêş tê kirin, ew kesên qal dikin nezan in û xwendin-nivîsandin jî nizanin; yanê ne mumkune ku li cîhekî xwendibin. Ti şik û guman nîne ku ew ji kalên xwe bihîstibûn, çîrok wiha ye: Kralê welatekî dizewice. Zarokên kral nedibûne. Jinika din dike û ew jê re keçik û lawikekî mîna du topên zêr tîne. Lê hêwiya jinikê pir nexwaz û dilreş bûye. Dema dergûş tên dunê, şûna wan du cewrikên kuçikan davêje ber dayikê. Zarokan jî dike selêkê û bi avê de berdidê. Vê selêkê şivanik ji avê derdixe û mezedike ku du xizan in. Wana mezin dike. Dayika wan jî, dema bixwe dihese dibîne ku wê du cewrik anîne, şerm dike û şaş dibe çawa bike... Mêrê wê tê û dibîne ku jina wî du cewrik anîne; gelek bi hers dikeve û jina xwe li çatê heft rêya li kutekan giredidê. Lawê vê jinikê mezin dibe û dibe kral. Xwîşka wî jî li cem wî ye. Pişt re li şopa koka xwe digere. Diya xwe li çata çar rêyan dibîne, tîne mal serê wê dişo û kincên paqij lêdike. Paşê tere cem bavê xwe; damariya xwe dikuje û bavê xwe tîne cem diya xwe...

Ev Sargona radibe û Împaratoriyeka mezin ava dike. Sumer, Îlam, bê dijberî heta Heleb (Aleppo), çiyayên Toros, Amanos û heta perava Derya Spî diçe. Li bakûr heta kaniyên Dicle û Firat diçe û Kurdistanê bi giştî dike bin kontrola xwe. Tê îdea kirin ku cara yekemîn di dîrokê de wî Împaratorî çêkiriye. Mêtîn cara ewil di dema wî de destpêkir.[72] Li Sumer bajar xirab kirin, sûrên dora bajaran ji holê rakirin; ji ber tirsa Sumeriyan ku tim li dijî Akad serhildan pêk dianîn ew bê hêz kirin. Akadiyan jî pir bi xwîn serhildanên wan dipelixandin û bi sedhezaran mirov dîl girtin û wek karker-kolê bi kar tanîn. Zarokên kralan tanîn li qesra xwe, perwerde dikirin, propaganda xwe bi wan dikirin û pêwîst biya li dij kralê ku bavên zarokanê zarokên wan bi kar tanîn. Zimanê Akadî li hemû cîhan fermî bû. Li Sumer birevebirên Akad hebûn lê li herêmên din garnîzon ava dikirin û birevebir ji xelkên wêderê dihatin hilbijartin. Artêşa xwe bi çekên nû û zirxan ava kiribû. Armanca wî, ji bo ku payîtextekî nû û baş çêke pêdeviya wî bi destxistina daristan û madenên

Kurdistanê hebû... Gelek maden ji Kurdistan û Îranê anîn Akad. Niqta din ê balkeş jî ewe ku ji Sargonê I an (2725-2660) re Şarrukan jî digotine(87-48) ku di kurdî de ew peyva hîna jî bi avayê şerûd-şervan-kesê ji şer hez dike bikar tê. Mumkune ku ew nava Kurdan li wî kralî danîbin.

Jêderên Ewrûpî dibêjin: Asûrî û Babîlî ne heman netew in; herdûyan jî ziman, çand, dîrok û nasnama xwe cûda ne. Babîliyan dîrokeka devlemend li piştê hebûn û dema giredana bakûr derbasî tevgerê bûn ew derê ser sahna cîhanê ketin.(69) Di pirtûkên dibistanên Tirkan wiha tê gotin: Asûrî miletekî Samî ne. Ji tevlîhevbûna Harriyan zimanekî nêzîkî Sumeriyan dengdikirin anîbûn meydanê.(148-55) Dema dewleta Akad avabû şûnde jî, bi sedsalan zimanê fermî yê Asûr-Akad Sumerî bû. Du re, xuyaye ku hatiye guhartin yan jî zimanek nû avakirine...

Împaratoriya Akad ji alî Gûtiyan ve gelek qels hate xistin. Ji çiyayên Zagrosan evarê êrîş dikirin û rewşa Împaratoriyê gelek dikirin tengasiyê. Bi ser êrîşên Gûtiyan û qelsbûna Akad re Sumerî li başûr ketin tevgerê. Dema kral Shar-Kalî-Sharris di sala 2241 an de mir, şerê hundurîn destpêkir û Gûtiyan jî alîkarî didan Sumeran.

Piştî van tevlîheviyan Hamûrabî (1792-1750) cara yekemîn di nava dewletê de yekîtî çêkir û monarşiyeka navendî ya bi hêz sererast kir. Dema wî, ji Babîl re bû dema herî geş û pêş. Bê guman wî ji kelepûra Sumeriyan gelek sûd wergirt û çanda wan kopî kir, wergerand zimanê xwe û li her aliyê dinyayê belav kir. Li dû wî jî Samsu-îluna (1749-1712) hat û di sala 1595 an de Hatiyan ew welata dagir kirin. Kassiyan jî sala 1570 an BÎ de ew welata girtin û 300 salan hukum kirin. Di dema kral Şemsî-Adad ê I an (1725-1695) de Asûriyan, bi qewmên Arî yên li bakûr re dest bi tekoşînê kirin lê bi wan re riya lihevkirinê hilbijartin. Lewra gor xelkê niştecîh, bi xelkê koçber re tekoşîn zahmet bû. Kral Tîglatpîleser (1116-1077) di salnama xwe de dinivîse ku çawa xelk di şûr re derbas kiriye, bajar şewitandine, çiya di bin xwîne ve kirine û ji serî yên xelkê keleh çêkirine.(87-118)



**Tîgplatpîleser Serkeftina xwe dinivîse**

Wekî me di beşa Mûşkiyan de jî nivîsî, Asûr bi xelkê koçer re riya aştiyê girtibû. Lewra ew xelka gelek şervan bû, şerê gerîlatî baş dikir û direviya çiya. Êrîşeka artêşê gelek zahmet û bi bedel bû li ser çiyan di şopa wan keve. Riya herî aqilane jî bi rêya aştiyê vana bê alî kirin bû. Bi vî awayî rê li ber yekîtiya

Kurdan jî digirtin.

Di vê navberê de dema kral Hamûrabî de, êlên Cûhî, di rêbertiya Pêxember Îbrahîm de ketin rêya koçberiyê. Cûhî, li destpêkê ji bajarê Ûr derketin; çûn Riha, pişt re çûn Şam û ji wir jî çûn Misir. Di derdorê salên 1272 an BÎ de jî hatin Îsraîl. Cara pêşî bû ku Îbrahîm li wir Îsmaîl nekir qurban û bi vê tevgerê li dijî Nemrûd derket. Goça ji Riha texmînî li derdora 1300 an destpêkir û serhejmara wan 25 hezar in, yan jî 72 qabîle bûn. Lê çima ji Ûr derketin? Eger ew Samî bûna çima hîcret kirin? Gelo ew di esil de ne miletekî Arranî bin û di nava Samiyan de zimanê xwe hatibû guhartin? Gor dîtina Çix jî, Îbrahîm (1900-1800), bavê xwe Terah, birayên xwe Harran û Nahor ji bajarê Keldaniyan Ûr ê ji bo ku herîn welatê Kenan derketin û hatin Harranê. Li wir Xwedê Reb xwe bi Îbrahîm nimand û got: Here welatê ku ez nîşanî te bidim û bibe qewmeka mezin. Îbrahîmê 75 salî û jina wî Saray û biraziyê xwe Lût heytîne û tere Îsraîl. Ji bo hişkiyê ji wir jî tere Misir.[81] Dixwazim bidim diyarkirin ku demên berê di nava Kurdên li Anatoliya Navîn de ew bûyera Îbrahîm-Îsmaîl gelek pîroz dihate girtin; îro êdî hatiye ji bîr kirin. Di salên 700 an BÎ de Asûr êrîşî Cûhiyan dikir; di sala 585 an de jî Babîliyan Qûdûs heynan û Cûhî birin Babîlê. Li sala 70 an PÎ jî Romayî heman tişt kirin.[72]



**Seriyên xelqê**

Di belgeya ji dema kralê Asûr, Adad-Nîrorî I an (1350-1275 BÎ) mayî de wiha nivîsandiye: "....Kralê welatê **Hanîgalbat** ê bi navê Şattûara û paşê jî kurê wî Wasaşatta li dijî min, serhildan pêk anîn. Min yek dîl girt, yek jî kuşt. Min bajarên bi navê Taldu, Amasaku, Kahat, Suru, Nabula, Hurra, Sûdûkû û Waşşakanu heynan û xirab kir. Heta Firat min kir bin kontrola xwe. Ewê ku rizgar bûn jî ji bo kar bikin, bi jin, mêr, zarok û kalên wan min birin bajarê xwe Asûr. Bajarên dinê herêmê jî min şewitandin û şûna wan kudimmus rişand..."

Di dema kurê wî kralî yê bi navê Salmansar I. (1274-1245 BÎ) jî êrîşî welatê Hanigalbat kiriye û dibêje: "Bi kral Şattûara re Hîtît û Ahlamuyan jî alîkarî kir lê min ew têk birin. Çavên 14.400 kesî min derxistin, min gelek kuştin û kralê wan reviya rojava. Neh navendên rêvebiriyê û 180 bajar min xirab kirin. Ev bajarên li jor û çiyayê Kaşiari, qela Eluhat Sudu, qela Harranu û Kargamişa li keviya Firat min heynan û bajarên din şewitandin.[54] Kralê Asûr Tukulti (1242-1206) herêma Xorrî ya bi navê Alzî, Amadûnû û Pûrûtûmzî heyna û dixwest ku Xorriyan bişîne Anatolê û şûna wan Asûriyan bi cîh bike.[11]

Di salên 1234-1207 an de, Tukultî-Ninurtu yê I an êrîşî bakûrê Asûr kir. Kralê Hattiyan kuşt û 28.000 Hattî birin Asûr. Kral tafilê li ser navê xwe bajarekî din çêkir û hostên xwe ji Xorriyan, karkarên xwe jî ji Kassiyan bûn.[69] Di dema Tukutî-ninurta II (884) de Asûriyan Harran dîsa wergirtin. Di dema Salmanassarê (850) III an de 500 hezar mirovî di nava sînorên Împaratoriyê de cihê xwe guhartine.[69] Di dema Asûran de, xelk wisa ser û bin bû, ku hîn bandora xwe îro jî berdawam dike. Emperyalîzmeka mîlîtarîst bû. Ji alîkî de bi erdê de dûkutan, li ser kutekan rûşkandin; ji alîkî de belavkirin û teror kiribûn sîstemekî birêvebirî û ji mêjiyê mirov şopên qet jê nerî çekirin.[72] Polîtîka Asûran ya herî girîng ew bû ku cîhê dagirdikirin vala dikirin, xelkê wir dişandin cîhekî dûr û şûna wan jî Asûrî tanîn û bi cîh dikirin. Ew sîstema li Kurdistan gelek bi kar anîn û ew jî bû sedemek ku xelk cîh guhart û çûn welatên din. Taybetmendiya Asûriyan ya ku ji alî her dîroknasî ve tê qebûl kirin ev e; ku mirovên her welatî ku dagir dikirin dişandine cîhên din û şûna wan jî xelkên dinê bicîh dikirin.[68]



**Sargon II (751-705) Asûr**

Tiştekî din ê balkeş jî di dema Sargon de tê jiyîn. BÎ di sala 710 an de Sargon bi artêşeke mezin çû ser başûrê Mezopotamya. Kralê Babîl ji ber rêvî. Sargon bi êlên Arran re şer kir û herêma di dest êlên Gambalu, Hindanu û **RAŞÛ**-yan de ketin bin kontrola Asûran. Li wir eyaleta bi navê Gambean hat avakirin.[27]

Di vir de mirov bixwaze nexwaze jî, tiştekî tê bîra mirov: Gelo ev Raşûyana, Reşî yê îro li Anatolê, Kurdistanê û Xorasanê dijîn e? Yan jî tenê wekheviya navê heye? Îro jî bi vî navî êl li Loristanê hene. Eger ew yek êl-federasyon bin, ev tê wata ku Asûriyan, Raşu-Reşî ajotin Harranê. Yan jî li destpêka dîroka Asûriyan û di dema kral Sargonê I an de, yan jî di dema Salmanassir de, ew ji bakûrê-rojava birin başûr. Piştre jî ber eqsê vê şandin û bicîh kirin. Lewra polîtîka Asûriyan ya di vî warî de tê zanîn. Xelk ji der anîn û li Riha, Meletî bi cîh kirin. Dibe ku ji başûrê Mezopotamya çûbin Xorasan jî...

Asûriyên ku xelk ji welat û warê wan dikirin der, li ser keviran nivîsîne, ku gelek caran wan êrîş kirine Kurdistanê lê ti caran bi serneketine. Ev yeka ji bo hemû dagirkeran derbas dibe.[75] Gelê Kurd ê şervan û pişta xwe dayî çiyan zû bi zû nakeve bin kontrola dagirkeran. Ev yek ji bo roja îro jî derbas dibe.

Di sala 666 an de Asûr gihîştin Derya Ege û kral Lûdîen Guges ji kralê Asûr Asûrbanîbal **alîkarî li dijî Kimmeran xwest**. Di sala 652 an de ji Lûdîen ji Misir re alîkarî kir û Misir ji destên Asûriyan rizgar kirin.

Ji bo Asûr, Medya girîng bû. Lewra Medya li ser riyên ticaretên bi Afganîstan, Hîndîstan û Çîn bû. Ji aliyê din de li wir dikaribûn hespên şer jî peyda bikin. Sargonê II an di sala 716 an de êrîşî bajarê Harhar (100 km li rojhilatê Hemedanê) kir û vêder dagir kir. Ew bajara ji xwe re kir navenda şer. Ji wir êrîşî Ellipî (Loristan) kir. Di vê demê de kralê Asûr bihîst ku kralê Ûrartûyan di şerê li hember Kîmmeran de miriye; vê carê êrîşî wir kir. Malbata kral dîl girt û cîhên Haldî yên pîroz talan kirin. Asûriyan salên 1400 an BÎ de nedikarîn têkevin Zagrosan, ew ji belgeyên wê demê tê fêmkirin. Xelkê di navbera Derya Kesk û Zagrosan bi maldarî, zîraat, hesinkarî û xwedîkirina hespan gelek pêşketî bû û bi hunerêka mezin dewara xwe dikir. Ariyan li wê deverê bajar dewletên dora xwe bi sê sûran avakirî çêkiribûn. Ji wan yên girîng: Kişîşîm, Sagbîtu û li rojavayê Ûrmiyê Silhez; rojavayê Medya Bît-Sangîbutî, Namrîde Saksukanî bû.[87-145] Wekî berê jî min nivîsandî, Asûriyan ji başûrê rojhilatê Kurdistanê re digotin Arî; xelkê ji wir heta Derya Kesk jî dibe ku kalên Kurdên Ler-Lor û Bextiyarî bin. Wê demê jî hedadiyê dikirine ku îşaretên wê **ji bilî şûr û mertalan mirov li ser kincên jinên Kurd jî dibîne**. Bi qasî jinên Kurd ti jinên netewên din hesin, zêr û zîv ji bo sûsa xwe bikar naynin. Ew yeka heta roja îro ji alî Kurdên li Xorasanê, rojavayê Kurdistan û Anatoliya Navîn ve jî bi kar tê.

Di dema kralê Asûr Aşûr-Reş-îşî (1133-1116) de, êlê mîna Ahlamû (Aram), Lûlû û Gûtî tim êrîşî Asûriyan dikir û ew aciz dikirin. Di sala 1051 an de kraltiya Kurdistanê baca xwe neda û başûrê Mezopotamya ket destê Araman. Araman, newala di navbera Firat û başûrê Mezopotamya da mîrîtî saz kirin. Yanî Aramê koçber di salên 1010-970 an BÎ de derbasî jiyana niştecîh bûne. Bi taybetî jî li keviyên Dicle bajarên nû avakirin. Lê di dema her sê kralên Asûrî mîna Asûr Rabî III an, Asûr-Reş II an û Tîglat Plaser II an de êrîşê ser êlên Kurd kêm nebûn. Di dema Tukultî-Nimuta II an (BÎ 891-884) an de êlêka Araman ya bi navê Utuateler bi temamî ji holê rakirin. Êla mîna Hindadu, Lake, Suku giredayî bacê kirin, mîrên li Harranê giredayî Asûristanê kirin. Êlên mîna Kardûyan û Lûlû jî koçber bûn. Salmanasar ê III an di sala (BÎ 858-824) de êrîşî Sûriyê kirin û kraltiya Hamma û Şamê hîna jî di destê Araman da bû. Di dema Aşûrdan (772-754) şerê derketî de hevkariya Medan û begên Sûriyê tê dîtin ku bi dîtina min ev tiştekî balkêş e.

Henry Layard radigîne, ku Mûsa ye ji Horon idea dike; ku dema Ninus Împaratoriya Asûr damêzirand xwediyê wî welatî ku hatibû şewitandin û xe-

landin xwedî şaristaniyeka pêşketî, di huner û ilm de xwedî ramanên bilind bûne. Bêrî ku Ninusê Nînova ava bike, ew li bajarê Telanê rûdiniştiye. Bi vê re giredayî, hatiye îspatkirin, ku sembol û ayînê dînî yên ku ji kolaneyên bajarên Asûr a kevn derketî bi yên Pers-Kurdan ve mîna hev in. Lê sembola pîroz a ku; mirovekî bi baskên mîna çûkaye di nava xelekeke da ye di kolaneyên li bajarên Horsabad, Kuyuncuk û Nimruda nehate dîtin...[68]

Li ser baweriyên Asûriyan A. H. Layard niqteyeka balkêş dinivîsîne: **di abîdeyên Asûrî yên kevn de rastî ti işaretên bi agir bawerî anînê nehatiye.** Di kolaneyên li Kuyuncuk û Horsabad de, di vê demê de êdî agirperestî di nava Asûriyan de hêdî hêdî belav dibe. Sembol û ayînên olî li ser silindir û qebertma bi ê Persa kevn ve wek hev in . Gor lêkolînê wî, mirov dikare bibêje ku Asûriyan baweriya bi roj-agir ji Kurd û Persan girtine. Tiştê din ê balkêş jî pere li Asûr û Misir nehatine dîtin. Dîsa Layard radigihîne:

Heta îro di kolaneyên li Asûr û Misir de rastî pere nehatiye. Lê di xaka ku di bin kontrola Pers-Kurdan de, hatiye dîtin ku pere hene; heta perê wan bixwe jî derketine holê. Herodot dibêje: "Gelê ku cara yekemîn pere derxist Lîdyayî ne û ji alî Danus Hystastes ve hatiye derxistin. Ji wî şûnde jî, ji alî kralên Pers-Kurd û Makedonyayî ve hate derxistin û navê xwe jî **"Darik"** bû.[68] Darik peyveka kurdî ye; dar di wata dar de ye; -ik jî, di Kurdî de di wata biçûk kirin û sivik kirinê de tê bikar anîn. Yanê darê sivik-biçûkê... Ji vê jî tê fêm kirin ku cara yekem perê ji dar hatine çêkirin û ev nava lê danîne.

Ji wan agahiyan û yên din ê me nenivîsî jî tê fehm kirin, ku rola dîrokî ya serekiyê ku didin Asûr ne weqas bilind e. Bê guman wana jî keda xwe di şaristaniyê de heye, lê ne bingehîn e. Wekî hemû dagirkeran ew jî çanda miletên din û yên cîranan girtine kirine malê xwe.

## ÛRARTÛ (Bîa)

Ûrartûyî ji bo xwe dibêjin **"Bîa"** û ji welatê xwe re jî dibêjin **"Bîanînî"**.[87-127] Di zaravê Soranî de 'biyanî' tê wata xerîb, 'beyanî' jî tê wata sibe-seda; lê tekiliya vê û Ûrartûyî çi ye nizanim, îhtîmaleke ku ti pewendî di navbera wan peyvanan de jî tunebe. Di Tewratê de jî wek Ararat derbas dibe. Ararat jî peyveka kurdî ye ku ji ar-agir, -hat/hatinê hatiye. Wexta vî çiyayî agir pijiqandiyê Kurdan ew navê lêdanîne ku ji agir avêtinê derketiye. Xelkê li vê herêmê jiyaye jî, bi rihetî dikare bi navê wî çiyayî bê navkirin. Bi zimanê Asûrî jî, ji Ararat re Ûrartû tê gotin. (Wê çaxê Ûr jî tê wata Ar?). Şirova birêz Torî jî hinek cûda ye: Ew ji xwe re 'bîa-înî', ji welatê xwe re jî 'Bîaîna' dibêjin. Îro jî, di zaravê Dimilkî de Piya: Yekîne, Ûrartî jî dibe êl-qebîle. Eger wek vê şirove be, ew tê wata yekîtiya êlan. Ew jî ji bo rewşa ew tê de jiya ne şaş e. Eger têkiliya vê bi zimanê Asûrî tunebe, yanê bi bandora wî wek Ûrartû derbas nebûbe, wê demê mirov dikare ji peyvê, wata kesên ji bajarê Ûr hatinî (Ûr-hat-û) jî derxê... Gelo ew ne mumkune?

Dîrokzanê Kurd Torî dibêje: 3000 sal BÎ ji Transqafqasya êlên "Xorrî-Ûrartû" û meriyên wan hatin. BÎ di sedsala XIII an de, di bin navê "Ûrartû" û "Naîrî" de Konfederasyona Mîrîtiyên Feodal derketin ser dîrokê û ev yeka bi tehlîka Asûr ve tekildare. Li destpêkê bi navê Ûrartû ji demaka kin şûnde jî wek Naîrî derketin sehna dîrokê.(94-242) Dîtina ku Xorrî û Bîanî yek in û ew wek konfedrasyonê bûn, hêjaye û li gor lêkolîna min jî raste. Dîsa yek bûn û konfederasyona wan û derketina wan ê ser rûyê dîrokê bi Asûriyan ve giredan jî tespîteke raste. Vê dîtinê birêz Torî wiha tîne ziman: 2000 sal BÎ, Bîaînî wek êlan bûn û ji kokê Xorriyan bûn. Bîaînî yê esas li bakûrê Wanê rûdiniştin.(94-259) Dîsa dîtineka ku li şexsiyeta wan tê jî, min berê nivîsîbû ku tê gotin: 1300 sal BÎ gelê bi navê Haltî-Lohorto li "Orarto" rûdiniştin. Ew berê bi navê "Gotto" yanê kesên şervan dihatin nasîn.(127-9) Wekî bi piranî bûyî, li jor jî me qal kir ku Ûrartûyan ji xwe re digotine Bîaînî; lê xelkê din ji wan re gotine Ûrartû, Gotto û hwd... Gelek caran wiha bûye. Wekî di beşa Hatiyan de jî me gotibû, navê wan ê esas ne ewe û ew navên xelkê lê danîne. Piranî jî ew navana li ser rûpelên dîrokê mayînde bûne. Bi vê re girêdayî mirov dikare îdeaka wiha jî bike: Navê gelê herême Arî û navê welatê wan jî di wata kesên ji cîhê arê/agirê xwe pir hatî Ar-hatî bû; lê wek Ûrartû kete nava belgeyên Asûr û li cîhanê belav bû.

Dewleta Ûrartû, di navbera Derya Kesk, Meletî, Erzirûm, Musul û Helebê de ji alî êlên ji Asya hatî ve di sedsala IX an BÎ li dora Wanê hate avakirin û serokê xwe yê yekemîn Sardûr bû. Hatina wan ê ji Asya sedsalan berî vê tarîxê ye, lê dewlet avakirina wan derdora sedsala IX an e ku sedema vê jî Asûrî ne. Li hember tehdîda Asûr ew yekîtî û dewleta xwe ava dikin. Alavên ji kolaneyên arkeolojîk derketî nîşan didin, ku **têkiliya Ûrartû û Saka/Îskîtan jî hebûye**. Rimên zîvînî yên bi dû devan, şûrên hesinî, cil û bergên hespan, mircan û tiştên din nîşana vê tekîliyê ne. Tiştê li Ziwiyê-Kurdistan derketî jî mîna yên Îskîtan e.(153-39) Ev niqteyeka pir girîng e. Gor lêkolînê min kirî, têkiliya Îskît/Saka, Ûrartû û Xorriyan heye; heta mirov dikare bi hinek ceseret jî bêje ku Saka bi van ve yek in. Lê bi navên cûda û li cografyayên cûda derdikevin ser rûyê dîrokê. Yek jî îdea vê pirtûkê ewe, ku îspatkirina yekbûna wan e; heta, navê Saka/Îskîtan bi Reşiyan û Celaliyan ve jî wek hev derbas dibe ku ew di bingeh de yek in û emê di beşa Saka de li ser wan rawestin.

Kralên Bîaîniyan:
Sardûrî (Sedurî, 840-830)
Îşpuînî (Îşpîna, 830-810)
Minua (810-780)
Argiştî (770-756)
I. Serdûrî (756-730)
Rûsa (730-713) û
Sardûrî IV (643) ye.

Di dawiya sedsala VIII an de li Meletiyê kraliyetek hebû ku di rojhilatê

Firat de jî garnîzonên xwe hebûn. Ûrartûyan ji hemûyan re digotin **Welatê H/Xate.** Di sala 783 a BÎ de kralê Ûrartû Argîşt êrîşî welatê Nîrîbû/Nîrbû yê li keviya Firat kir 30 hezar kes dîl girtin[94-268]; kraltiya Meletî giredayî xwe kir û kralê Hatî Hîlarûada mecburê xerecê kir. Tê nivîsandin, ku Meletî bi awayekî aştiyane giredayî xwe kiriye. Ji welatê Xate û Şûpa (nî=Elezîz) jî gelek mirovan birine welatê Ararat (Ardahan/Erbûnî). Ji pênc salan bi şûnde, ji wan 6600 kes derbasî bajarê li Qefqasya bi navê Erebûne (Arinberd, Erevan) kirin û li wir dane bi cîh kirin. Bi gotineka din, Kurdên vê demê li wir hene. Kral Rûsa yê II (673) di seferên kirî de li zinarên Adilcevazê nivîsiyê ku ji welatê Mûşkî (Elezîz, rojava yê Firat), Xatê (Meletî û der dorê wê) û Halitu(Heleb?) mirovan birine welatê xwe. Dema Serdûrî yê II an ji kraltiya Meletî şûnde berê xwe da kraltiya Qûmaha (Komagene, Semsûr), Wita, Halpa (Golbaşi), Parala (Besnî) bi darê zorê bi dest xist û hê neçûbû payîtext Samsatê hate rawestandin û peymana aştiyê hate çêkirin. Artêşa Ûrartû herî zedê heta Semsûrê hat.[56] Wekî ji vir jî xuya dibe di nava Kurdan bixwe de jî, hertim şer û pêşbirka êl û fedarasyonêlan hebûye. Federasyonek yan jî konfederasyoneka êlan li ser yên din carna bi zorê carna jî bi aştî desthilatdariya xwe ferz dike.

Rûsa yê I an, der û dora gola Sevan wergirt bi şûnde, 23 herêm girêdayî xwe kirin û ji wan bac stend. Bi vê yekê sînorên welat gîhîşt Qefqasya biçûk û heta welatê Kîmmeran **GURÎANA** dirêj bû.[94-269] R. Blaga dibêje welatê Kîmmeran, Qirim û bakûrê Qefqasya bû.[95-79] Gor Heredot jî Kîmmer li başûrê Rûsya koçberbûn û gelekî pir şervan bûn. Ji alî dijminên wan Îskîtan ve ji cîhê xwe rabûn û sala 735 an BÎ reviyan Qefqasan. Asûrî jî qala wan dikin.[94-269] Navê vî welatî balkêşe; wekî lêkolînê min kirî îhtîmaleke ku ew Kurdên Goran bin. Her çiqas di dest min de îspat nebin jî wek îdeayeka hîn zêde bê lêkolîn kirin dixwazim dîsa jî binivîsîm. Heman nivîskar dinivîse ku: Ji bakûr ve êrîşî Ûrartûyan dikin û sê caran Ûrartûyan têk dibin. Ji başûr ve jî wê demê êrîşên Asûr hebûn.[94-270] Bi vî awayî Bîaînî li her derê rastî êrîşan dihatin.

Argiştî I an li walî Qefqas û Newala Aras de bajarên mîna Argiştîhînlî (nêzîkî Armavîra li Erîvanê), Îrpûnî (Erebûnî-nêzîkî Erîvan-girê Arîn-Berd), Teîşebaînîn (nêzîkî Erîvan-girê Karmîr Blûr) avakir û ji bajarên mîna Hattîna û Sûpanî yê ji rojava jî xelk anî lê bi cîh kir.[87-127] Her çiqas îro li gelek welatan, hebûn û nasnama Kurdan bê înkar kirin jî; wekî xuya dibe gelek bajarên li bakûrê Azerbeycan jî ji alî kalkalkên Kurdan ve hatine avakirin û bi sedsalan ew xaka wek war bi kar anîne...

Di sedsala Dewleta Asûrî yê dawî de, êrîşên wan ên li hember welatê Kurdan weqas dijwar bûn ku mirov dikare bêje xaka Kurdistan bi temamî vala bû. Cîhên ku vala nebûn jî gelek çiyayî ne û artêşa wan nedikarî bigihîjê. Jan jî ewe serdestiya Asûr qebûl dikirî mabûn. Ji bo wê emê gotinê bidin çend kiralên Asûrî: Kral Tîkûltî Nînûrta dibêje: Min bi 43 kralên Naîrî re şer kiriye.[94-243] Tîglatpleser di 1112 an BÎ de êrîşî ser Naîrî kir, kralên Tûmme û Daîaenî jî di nav de, şer li Bûlanikê pêkhat û Asûriyan ji bo serkeftina xwe

heykelek li wir danîn.[94-245] Asûr Nasirpal (BÎ 883-859) dibêje: Çiyayê Kaşîarî (Mazidax) ji alî kurê Lûtîprî yê Tûbûsî ve tê birêvebirin. Min 60 bajarên li wir baş dihatin parastin bi erdê re kir yek... Ji bajarê Tûşa derketim... 250 bajarên welatên Naîrî yên baş parastî min rûxand.[94-249] Wekî di belgeyên dîrokî de jî xuya dike bi sedan bajarên Kurdan kavil û kambax kirine û di encama vê de jî xelkê van deran cîh û warên xwe terk kirin û çûn bakûr (başûrê Rûsya) û rojhilat (navenda Xorasanê).

Di salên 882 an BÎ de desthilatdariya Asûriyan heye, lê ji demeka kin bi şunde gelê Xorrî li Mîlîda (Meletî) di bin serokatiya Kalhû (Nemrûd) de rabû ser lingan û dewleta xwe avakir. Di dema kralê Asûr Sargonê II an (721-705 BÎ) de ew têk çûn û **gelê vir bi darê zorê şand başûrê Mezopotamya. Ew ajotina Kurdan ya yekemîn** têye zanîn. Yanê, cara ewil Kurd nêzîkî 2700 sal berî îro hatine koçber kirin. Heta wê demê, Împaratoriya Asûr êrîşî dewleta Ûrartû ya Kurd dikir; ji ber vê sedemê hatiye tespîtkirin ku di navbera Kurdan de wê demê jî yekîtiyek pêk hatiye. Ev di sala 743 an de xuya dike û di bin serokatiya Sardûrî II an de pêk hatiye. Bi kralê Asûr Tûkûltî-apil-Eşama III an ve li herêma Kiştan û Golbaşi herdû hêz hatin ber hev, lê yekîtiya Kurdan têk çû û kral Sardûrî reviya Wanê.

Salmanassar ê III an di sala desthilatdariya xwe ya yekemîn de wiha dinivîse: "Min êrîşî Sugunîa Ûrartû kir, bajar ê kral Aramû ye. Şervanên wî di şûr re derbaskirin, ji seriyên wan min birc çêkirin û 14 bajarên li wan deran min xirav kirin. Paşê gihîştim derya welatê Naîrî.[94-251] Di sêyemîn sala heman kralî de jî wiha hatiye nivîsîn" :... Gihîştim bajarê Arzaşkû yê kral Aramû yê Ûrartû. Aramû reviya çiyayê Addûrî, min li çiyê êrîşî wî kir û 3400 eskerên wî kuştin. Mîna heriya ku reng bikî, min çiya bi xwîna wan xemiland. Aramû reviya jora çiyê... Min mîna gakî har êrîşî welatê wî kir û şewitand. Li ber deriyê bajêr min serên wan dan ser hevdû, serjê kirin û keç û xortên wan li dora vê kelehê, kom bi kom li ser kutekan rûnişkandi dam û kuştin.[94-252] Ew hovîtiya pêk hatî û şewitandina welatê Kurdan ne cara dawî ye, bi wan metodan Kurdan welatê xwe yê di nava şaristaniyeka pêşketî de vala kirin û koç kirin. Yek ji sedema belavbûna Kurdan yê fireh ev e. Ji alî din ve navê kral û cîhên cografîk jî balkêş in. Piraniya wan bi **'Ar'** destpê dike. Ew jî delîla Kurdbûna wan e, lewra ar-agir peyveka tenê di kurdî de heye. Pirbûna vê peyvê jî him bi ol re, him jî bi cografya volkanîk re têkildar e.

Aşşûr Nasirpal II an (883-859 BÎ) jî wiha nivîsiye: Salmanassar êrîşî welatê Naîrî kir. Nêzîkî Hûbîşkîa bûm, artêşa kralê Naîrî Kakîa Manî ji min tirsiyan û reviyan ser çiyan. Wekî xuya dike ew navekî Xorriyan e.[94-257]

Di dema kral Manûa de, Ûrartûyan êrîşî welatê Manerêyan (Mazenderan?) ê li rojhilatê Ûrmiyê kirin û gelek cîh ji dest wan girtin.[59] Di dema Addadê III an de jî heta Şam û Mansûatê çûn. Manûa bi dewleta Xorriyan li Meletiyê re jî şer kir. Di dema kral Argiştiyê I an de Ûrartû di dema xwe herî bi hêz de bû. Li dijî Asûriyan, kralê Ûrartû Sardûr ê II an û kralê

dewleta Xorrî yê Meletiyê Sûlûma ve bûne yek, lê dîsa jî têk çûn. Ûrartûyên dema Rûsa I an de bi Medan ve di sala 735 an BÎ de bûne yek. Lê Asûran ew jî têk birin û Rûsa li cîhe şer hate kuştin. Kîmmeran jî ji bakûr ve êrîşî Ûrartûyan dikirin. Di dema Rûsa yê II an de Ûrartû heta Anatoliya Navîn çûn.[59]

Welatê Bîaînî, ji alî Saka yên ku ji keviya Volga hatibûn ve rastê êrîşan dihat û wêran dibû. Di vê serdemê de êrîşên bê însaf dikirin, bajar bi xelkê wê ve tevîhev dişewitandin, xwîna dîlan vedixwarin. Kîmmeran jî Frîgya kiribûn vê rewşê. Lîdyayiyan ew, Medan jî Saka qewitandin. Dijminên Ûrartûyan yên herî mezin Asûr, Îskît û Frîgya bûn.[87-130]

Di lîsta Ûrartûyan de navê 79 Xwedêyan hebû. Di rêza yekemîn de **Haldî** hebû ku li ser şêrekî sekiniye û Xwedayê şer e. Duyemîn Teîşeba (-birûsk), sêyemîn jî Şivnî yê bi roja bi pêrik te sembol kirin.[87-135]

Di dema Sardûrê II an de (764-735 BÎ) jî Mereş, Samalli (rojavayê Dîlok), Karkamiş û kraltiya Helebê jî bi dest xist. Lê Asûrî di êrîşa sala 740 an BÎ de heta Wanê çûn û welat rûxandin. Bîaînî ji alî Medan ve ji holê hatin rakirin.

## MED (-Medeîa/Arîan) û PERS (Artae)

Tê gotin ku yek ji berdewamiya Gûtiyan jî Med bûn. Medan 2000 sal BÎ ji başûrê Derya Kesk dest bi dîrokê kirin û bûn împerotoriyeka gelek mezin a bi bandor. Êrîşên Asûriyê ku Kurdistan kirî gola xwînê cara yekemîn ji alî Medan ve hatin rawestandin. Li bakûrê Medan Saka-Îskît dijîn, her dem êrîş tanîn; lê Medan ew di salên 614-613 û 519 an BÎ de têk birin û berê xwe dan Asûriyan. Wek tê zanîn 612 an BÎ de paytextê Asûriyan kete bin destên Medan û dewleta wan ji holê rabû. Kralê Medan yê vê demê Key-esker bû. Ew nava tê wata keya yê eskeran. Hîna jî di nava Kurdan tê gotin ku "Tu çi bûyî keyayê ser me?". Kralê Asûriyan Sin-Sar rêvî û çû paş Lîdya. Di dema Împerotariya Med de gelek caran Med, Mad, Kaldahara, Ûrartûyan û Persan li dijî Asûriyan û Misiriyan bi hevra yekîtî çêkirin. Paşê Medan Ûrartû jî kirin nav dewleta xwe (BÎ 590) û Xorasan jî di nav sînorên Medaîn / Medya / Medistanê de bû.

Wekî ku tê qebûl kirin Med yekîtiya Kurdan ya herî mezin û fireh a ku pêk hatiye. Di pêş û piştî ve yekîtiyê de heta roja îro yekîtiyekê bi vî rengî pêk nehatiye; lê di sedsala em tê de ne daxwazeka bi rengê Medan heye û berbivê ve diçe… Wek tê zanîn, êlên ku Med pêk dianîn ji alî Heredot (BÎ 400) ve hatiye nivisîn: Ew dibêje, ji şeş êlan pêk dihatin; wana wek: **Busaî (Boûsaî), Strûxades, Parîtakinoi, Bûdîoî, Arîsantoi û Magî** dijmêre. Lê di dawiya pirtûkê de **Matîen-Matîenoî û Orthokorybanta** jî lê zêdê dike.[84-49] Hinek nûser jî dibêjin: piştre derkete holê, ku Magî ne êl e; çîna oldar e. Herzfeld jî dibêje, Med ji pênc beşan pêk tên: **Hamadan, Nihawand, Isfahan, Ray, Adarbaicanê.**[71-84] Ew dîtin hîn zêde nêzîkî rastiyê ye, lewra belavbûna cografîk nîşan dide, lê bi dîtina min dîsa jî kêm e. Her çiqas mirov cesaretê di xwe de nabîne jî, dîsa dixwazim bibêjim ku gor baweriya min êlên ji Medan re

pêşengî kirin Kurdên Soran û Hewreman ên îro ne.

Dîtina ku Medan ji bakûrê rojhilatê Îranê tîne zêde realîst nabînim; dibe ku Med bi zora dijminan berjor yan jî ber bi bakûrê rojhilat hilkişîbin, lê belê pêşengên Medan xelkê Kurdistanê yê niştecîh e. Bê guman nayê wê watê ku Medan ji êlên Kurdên li rojhilatê Îranê dijîn alîkarî wernegirtiye. Med dendikê grubên Aryan ê li Hîlala bi bereket in. Ji desthilatdariya Medan şûnde Faris hatin ser textê Med-Farisan û navê xwe îspat kirin. Li ser Farisan dîtina Heredot gelek balkêş û watedar e: **"Kolê Medan yên berê, bûn efendiyên wan ên îro."** Tê fêmkirin ku dema Med li ser piya bûn Farisan ti giringiya xwe tunebû. Heta gelek caran Medan destê xwe di ser wan re girtiye û ew parastine û li cîhên baş bi cîh kirine. Di nava Kurdên Xorasanê de heta îro jî ji bo Farisan dibêjin **"Tat"** , min sedema vê pirsî û digotin: Ew berê bê qîmet bûn û tu girîngiya zimanê wan tunebû, ji bo vê em dibêjin tat. Di bingehê vê gotine de biçûk dîtinek jî heye ku koka xwe ji hêza împaretorî û şaristanî û qehremaniya Kurdan digre. Heredot ji bo Medan dibêje: **"Mirovên esilzade"** û ji bo Farisan ti gotinên wiha bi kar nîne. Bê guman va jî bi şaristaniya ku Medan afirandî re girêdayî ye.

Ji bo Farisan du dîtin hene, ya yekemîn dibêje: Faris ji alî fîzyolojîk, fîlolojîk û rûhî ve gelek nêzîkî Kurdan in. Wek miletek yan jî wek pismamên Kurdan tên zanîn. Ya dudûyan jî dibêje: Tu nêzikbûna wan bi hev re nîne. Min di beşa Arran de dîtinên Heredot ên li ser herdûyan dabûn ku ew jî Farisan cûda nîşan dide. Zimanê Farisan jî ne yê Medan e. Faris di nava Medan de heliyan û bûne Arranî. Ji alî hevok çêkirin û ziman de jî ew ji hev dûr in. Di belgeyên dîrokî de gotinên li ser navê Farisan ê balkêş wek: **"Parsûma, Parşûva û Parsûas"** hene ku di belgeyên Asûr de derbas dibe. Navê Farisî ji wir tê. Faris cara yekemîn li rojavayê Gola Wanê hatin xuyakirin. S. Mihotûlî dibêje: Salên 1300 BÎ ew herêma ji alî xelkê ji Hîndîstan hatî ve hate dagirkirin. Wana dans û reqs dikir û bi wê pere qezenc dikirin. Ji bo vê, xelkê berê li herêmê bûn ji wan re got: **"Parsek"** û ew ji bo koçberên Hîndîstan jî derbas dibû. Di zimanê kurdî de îro jî ji kesên ji xelkê pere, xwarin, cil û tiştên din dixwaze re dibêjin Parsek. Ji vê jî mirov dikare ve sentezê derxe; ku dema Faris hatin Kurdistanê, Kurd niştecîh bûn û navê Parsek liwan danîn... Heredot dibêje cil, ol, ziman û çanda wan cûda bû. Gor heman dîrokzanî wan ziman jî ji Medan girtin. Bi xelkê li herêmê ve serî di berhevre nekirin, ji bo vê, ji alî Medan ve di sala 815 an BÎ de cîhê ku li rojhilatê Elam ê bi navê Anzan ji wan re hate dayin. Dr. Ctesîas, di qesta Persan de dibêje: di damarên wan de xwîna Medan nîne.(87-143) Dîtinen din ên li ser Farisan jî wiha ne: Ecem hîn natibûn Îrana îro, îhtîmaleka mezine, ku ew li bakûre Afganîstan û Asya Navîn bûn. Navbera Merv, Belh, Nesa, Gorgan, Aral û Xezer...(95-78) Bi dîtina min ew ditineka raste; xuyaye ku berî mîladê êlên Fars, Belûc û hinek Kurd ji Hîndîstan heta Afganîstan û başûrê Rûsya yê belav dibûne. Dîtina din jî cûdaye û îdea dike ku: Med û Pers di heman demê de hatin Îranê, BÎ 1200, û gelê bi navî Kaspî-Zagros ji holê rakirin.(95-78) Gor lêkolînên min kirî, Fars piştî Kurdan hatine herêma îro, îhtîmaleke mezine ku

ew ji dora bakûrê Hîndîstanê û Pakîstanê hatine.

Kalên Kurdan yên bi navê Med, rêvebirên xwe bi hilbijartin tanîn ser text; ew yeka ji alî Heredot ve jî tê pejirandin. Rêvebirê xwe yê yekemîn Diyako bû (727-675 BÎ) ku wî li hember êrîşên Asûrî yên qet dawî lênayê ket kampanya yekkirina hemû niştecîhên Kurdistanê. Birêz Îzady dibêje: Medan cara yekemîn mîlîsên gel bi kar dianîn.(154-78) Ewên ku bi karanîn jî têkiliya xwe bi Kurdên dervayê welat re heye, ku ji bo me xelekeka girîng e. Ji alî din ve vê demê yekkirina Kurdan divê ne zahmet bûya; lewra Kurd li hember zordariyeka mezin bûn, vê zordariyê bajar, gund, mal û milkên wan talan dikir û canê wan jî distand. Li hember dijminekî wiha bê rehm û ji serên wan kelehan avadikî, Kurd bê pirsgirekên mezin tên cem hev û îttîfaqeka bi hêz derdixin holê. Vê yekê, bê guman karê Diyako hêsantir dikir. Di nivîsên li başûrê Kurdistan-Behîstun de tê nivîsîn, ku mîlîsên Medan wek **"REŞ-AN"** dihatin binav kirin.(154-78) Navê Reşan dîsa li vir derdikeve pêşberê me, di dema Xorriyan de jî wek Çûxreşî bû, di dema Asûr de Reşan bû û ji vê dîrokê şunde jî ew derkeve pêşberî me. Nivîskarê vê pirtûkê jî aîdê vê komê ye. Gelo ew tenê rast hatinek e? Gor dîtina min ne tesedûfe û ew kalên Kurdên îro li dervayî sînorên Kurdistan û rojavayê Kurdistan in. Sedema vê piştgiriyê yê yekemîn: Ew ji ber dujmin reviyabûn û tola xwe distandin; ya din dijmin cîhên pîroz girtibûn; ya seyêmîn Kurdan yekîtiya xwe avakiribûn û mumkune, ku şertên xwezayî wekî hişkbûn û sermayê jî ew mecbûr kiribin. Yanê Kurdên ji zozan û germaviye xwe bi dûr diketî neçar dikirin ku herin ser dujmin û bi wî awayî vegerin warên xwe yên berê.

Li ser yekîtiya Kurdan bavê dîroka nivîskî Heredot jî dinivîse, ku yekîtiya Medan Diyako (728-673) pêk anî. Gundiyekî durist û xelkê jê hezdikirî bû. Xuya dike ku ew yekîtî bi hêsanî û di cografyeka fireh de pêk hatiye. Eger mirov dema serokên din ên Medan jî bide ber çavan, cografya ji Anatoliya Navîn heta Hîndîstan û Xorasan çawa bi hêsanî hatibû girtin? Bersiva vê yekê ev e: ku Kurd niştecîhên vê cografyayê bûn, wek mîrîtî, kraltiyên serbixwe, nîvserbixwe dijîn û carnan jî bi hevre şer dikirin. Lê bi rêvebiriyeka rast, jê teyî hezkirin û bi dad ew mirîtî, konfederasyon û federasyonên êlan bi dilxwazî ketin bin ve sîwane. Lewra ji bo vê yekîtiya mezin ti şerên giran ku pêk hatine û dîrok dinivîsî nînin. Dîsa êrîş û şerên mezin di navbera Asûr û Kurdan de pêk dihat lê vê care wekî bere Kurd ne perçe perçe bûn. Di serdema Diyako ya dawîn de, Sargonê II an Asûr êrîş kir, 28 bajar hatin talan kirin û Diyako dîl hate girtin; Ew bi malbata xwe ve hate şandinî bajarê Hamatha yê li bakûrê Sûrî. Sargon wiha nivîsiye: " Mirovkujê hov ê ji vê cografya hov, ji kralê Ûrartû Rûsa re mezin dikirin." Paşê kral Rûsa bîhîst ku Asûr bajarê pîroz Mûşaşîr talan kiriye û heykelê Xwedê Haldî jî birine, bi xencera xwe, xwe dikuje. Di vê navberê de Kîmmerên ji ber Sakan direviyan, ew dewletana tehdît dikirin.(87-145)

Agahiyên serdema kevn bi piranî ji alî Heredot ve hatine nivîsandin.

Ew, kralên Medan wiha radigihîne:

| | |
|---|---|
| Deiokes/Diyako | 715-675 |
| Phraortes | 675-653 |
| Kyaxares/Key-esker | 625-585 |
| Astyages | 585-550 (84-506) |

Di sala 674-673 an de li Medya serhildana Kurdan ya li hember dagirkerî destpêkir. Li destpêkê bi pêşengiya begên Kar Kaşşî, Maddaî, Saparda ew raperîn bi pêşket. Vana begên Eksatana Keaştaratî, Mamîtîarşû û Dûssanî bûn û îdare di destê Keaştaratî de kom dibû. Ji nava gel jî alîkarî digirtin. Bi taybet jî, ji gelê bi navê **"Reşan"** ku gelekî bi sîleh bû û jê alîkarî digirtin. Torî li ser peyva reş dibêje: Eger mirov analîz bike tê wata rêncberên azad û xelk.(94-296) Reşanê ku navê xwe derbas dibin em wek Reşî bizanin û vê demê jî xuyaye ku ew komeka şervan û pir bi çek bûye. Ewe ji kevneşopiya tekoşîna wan ê li dijî dujminan tê. Di vir de taybetmendiyeka wan jî xuya dike; ku her dem ji bo şer û alîkariye amade bûne ku ew karekter li Kurdên îro li dervayê welat ve hevdû digre. Reş di wata rêncberî de bi dîtina min ne di cîh de ye, mirov dikare bibêje ku ew koçerên azad û şervan bûn. Yekê jî cîhê ku ew lê dijîn zêde nayê pêş, bi qasî tê zanîn ew li navenda Xorasana îro bûn..



**Eskerên Med-Pers**

Piştî serhildana di sala 625 a BÎ de Key-esker rêvebirî kire destên xwe. Navê xwe yê esil çi ye nayê zanîn, lê navê ku lê hatî kirin di wata Keya/serokê eskeran de ye. Karê wî kralî li destpêkê ew bû ku artêşeka bi rêk û pêktir bîne meydanê. Cara yekemîn di dema kral Key-esker de Kurdan artêşeka bi sîstem ya ji yekîneyên cûda pêk anîn ku vê mizgîniya serkeftinên pêşerojê didan. Key-esker ji Asya heta çemê Halys-Kizilirmak girt û çû ser Asûriyan jî; lê di vê demê de, Sakayên ku Kîmmer ji Ewrûpa derxistî, di bin fermandariya kurê Protothyas Medyas de bi artêşeka mezin hatin Asya. Di heman demê de jî di axa Medya de dimeşîn. Îskîtan, çiyayê Qefqasan dabûn milê xwe yê rastê û hatibûn Medya. Li vir bi artêşa Medan re ketin şer, Med têk çûn û Îskît li hemû Asya belav bûn. 28 salan li Medya hikumdarî kirin.(84-50) Paşê Key-esker bû dostê kralê Îskîtan Madiyes û serleşkerên wî dawet kirin, serxweş kirin û hemû kuştin. Îskîtan xwe avêt bextê Lîdya.(94-302) Xeleka ji bo me girîng şerê Îskît-Saka û Medan e. Gelo ew Saka yên ku bi Medan re şer kirin giştik bûn an jî beşek ji wan bû? Yan jî berê îtîfaq, paşê şer kirin û Saka rastî îxaneta Medan hatin? Îdeayeka vê pirtûkê ewe, ku yekbûna Reşan/Reşî û Sakan destnîşan bike. Reşan çawa him alîkariya Medan him jî şerê wan kirin? Wek nakokî xuya dike. Lê dibe ku beşek ji konfederasyona Sakan, ji ewên dervayê Reşan, ew şera kiribin. Ji alîkî ve rewşa civaka Kurd mirov bide berçavan şer jî dikare bibe. Lewra komên ji hev cûda ne pir bi hêzin, îtîfaqa wan zehmete, tenê dijmınekî bi hêz li hember wan hebe ew yekîtî pêk tê. Wekî birêz Îzady dinivîsî ew şera piştî ketina Nînova pêk tê, dibe ku Key-esker xwestibe zora aliyê Saka bibe û yekîtiyekê fireh û sexlem avabike. Di vê yekê de eger serketibiya îro dikaribû rewş cûda bibûya...

Li ser çûyîna Saka yê xwe avitî paş Lîdyayiyan wersiyoneka din jî heyê ku tê gotin: Komeka Îskît ji serhildaneka şûnde bi dizî reviyabûn Medya. Li wir Key-esker hakim bû. Kral ew baş pêşwazî kirin; qîmet da wan, zarok teslîmî wan kirin ku ew **fêrî ziman û tîr avêtinê bikin**. Saka hertim diçûn nêçîrê û nêçîra ku tanîn tevhev dixwarin. Rojekê tu tişt nanîn. Key-esker ew azar kirin û ku gotin zora wan çû. Wan xwe biçûkbûyî hîs dikirin. Rojekê lawikek ji wan hûr kirin, biraştin û dan ber Key-esker. Piştî vê bûyerê reviyan Sardesê. Key-esker ew ji hukumdarê Lîdya Alyattes xwestin. Lê wî, ew nedan. Ji bo vê pênc salan bi hev re şer kirin, heta ku roj hate girtin. Ji bo peyman û dostaniya di navbera wan de zewacek jî pêkanîn. Keçika Alyates **Aryenîs** dane lawikê Key-esker Astyages û xwîna pî-zendê hev alastin û sond xwarin.(84-38) Ji wan agahiyên ku Heredot dide gelek tişt têne fêhm kirin: Yek ewe ku çima Medan zarokên xwe ji bo ziman fêr bibin teslîmî Saka dikirin? Gelo zimanê wan hîn pakijtir bû? Ew îhtîmaleke mezine, lewra zimanê neviyê Saka ku îro wek Kurdên li dervayê welat xuyadikin xwedî zimanekî di formata kevn de ne. Zimanzanên birêz mîna: Ekrem Altin û Rojan Hazim vê yekê dipêjirînin. Dibe ku wan zimanê kevn parastibe û Medan ji bo vê ew kirin mamostên zarokên xwe... Hostatiya wan ên tîr avêtin bi nav û deng bû. Ji hesin û belgeyên ji Sakan ve manî jî


ew vekirî xuya dike. Niqta din ê girîng jî ewe ku çima wana xwe avêtin paş Lîdya? Gelo Lîdyayî bi hêz bûn yan jî mirovatiya wan herdûyan hebû? Ya din, ji bo pîrozbûna rojê wan şer sekinandin û aştî pêkanîn, ku giraniya rojê li cem van herdû hêzan derdixê holê... Ya dawî jî, Ew kevneşopiya **"Biratiya Xwînê"** dema ez zarok bûm me jî dikir û wê demê (1970) di nava Kurdên me de edet bû ku ji kesê hezdikî re biratiya xwînê bi vî rengî pêktanîn. Yan zendê hev xwîn dikirin û paşê jî xwîn dihev didan yan jî xwîn dikirin nava avê û herdûyan jî vedixwar. Ji wê bi şûnde dibûn birayên hev.

Li ser hatina Saka birêz S. Mihotulî dibêje: Tê zanîn ku Key-esker hîn zû dixwest êrîşî ser Asûr bike, lê bi hatina Sakan re ew neçar ma ku berî vê pirsgirêkê çareser bike. Ji bo vê, di sala 614-3 an BÎ de dorpêça xwe ya Nînova da alîkî û kete nêçira Saka. Med li bakûrê Medya li şopa Îskît û Kîmmeran gerîn; bi piranî ew ji welatê xwe derxistibûn yan jî wan xwe veşartîbû. Di sala 612 an de dîsa vegerî ser dorpêça paytextê Asûr. Li ser vî şerî wiha tê gotin: Li dervayê bajêr sê caran şer kirin, Asûriyan li ber Medan nikarin bisekinin û vekişîn nava sûran. Li meha Tebaxê artêşa Med dîsa êrîş kir û bajar şewitand û bi erdê re kire yek. Di gelek deveran de tê gotin ku Babîl alîkarî kiriye, lê Babîla wê demê pirsgirekên xwe yên hundurî hebûn, ew dîtin zêde ne raste. Di sala 609 an de Asûrûbalît ê Asûr li Haranê seri hilda û Misir jî hat alîkariya wî. Lê Medan ew belav kirin.[87-149] Di dirêjahiya wê dîrokê de gelek caran xuya dike ku Misirî diçin alîkariya Asûr. Ji rêvebirên Asûrî ku ji şerê Nînova reviyanbûn Haranê, bi alîkariya Misir xwestin dîsa bi serkevin lê Medan firsend nedan wan.

Birêz Îzady îdeayeka pir bi nirx dike û hinek bersiva pirsa min a li jor dide: Wexta Medan bakûrê Firat derbas kirin, rastî kraltiyeka Kurdan ya bi navê **Zelanî** hatin. Zelanî jî, ji ber zexta kralê Lîdya paş vedikişîn. Herdû hêz gîhîştin hev û êrîşî Lîdya kirin. Pênc salan şer di navbera wan de ajot û di dawiyê de Zelaniyan di sala 589 an de Kapadokya, 588 an de Pontûs dîsa girtin. **Key-esker di sala 585 an de gîhîşt Kurdên li rojavayê Kizilirmakê.** Ew erde ku hatî girtin ji Zelaniyan re berda. Kapadokya û Pontûs di sedsala IV an ya BÎ de bi temamî ketibû destên Îranî-axêf û Aryenan.[154-79] Tiştekî balkêşe, ku ve demê jî Kurd li rojavayê Kizilirmak hebûne. Wekî me di beşa Xorriyan de jî gote Kurd ji berê ve li Anatolê hebûn, lê xuyaye ku wana bi temamî ew cîhên xwe terk nekirine û mirîtiyeka xwe li wir avakirine. Navê xwe jî balkêşe ku navê Zil, Zilan, Zerikan tîne bîra mirov. Kî dizane ku ew ne beşa Kurdên ji hev veqetînî yê ku bûne Mil û Zil an û navê Zerikî yê kevne? Ji bo ku ew di ber desthiladariya Medan de ne, gelek pirs tên bîra mirov. Gelo Anatol bi temamî di bin destên Kurdan de bû? Şopên Kurdan yên ku li rojavayê Anatolê û li giravên Ege tên dîtin ji wê pirsê re dibin bersiv, lê dîsa jî em vê yekê ji arkeologan û lêlolînê hîn kur re bihêlin...

Piştî Key-esker, kurê wî Astyages (584-549) hat ser textê Medan, di serdema wî de Asya Navîn, Afganîstan û Pakîstan re sefer çêkirin.[154-79] Ji alî


gelek dîroknûsan ve tê diyar kirin ku di salên 585 an BÎ de sînorên Kurdistanê digihîştin Aleksendîpol û Canîka-Samsûnê ya li Derya Reş. Dema Key-esker serdar bû û ji şerê Aliyatê Lîdyayî bişunde Kurd êdî li rojavayê Kurdistanê saxlem bi cîh bûn. Ji alî dewleta Bergama (BÎ 290-129) ve, ji bo parastina dewletê, Kurd bi pera anîn li Anatoliya Navîn bi cîh kirin.



Wekî me li jor jî qal kir, Faris vê demê wek gel ne populer bûn lê kralê Med Astyages xwest destê xwe bi ser ew xelkê hanê re bigre û wan bipareze. Keçika xwe bi navê **Merdanê** da prensê Parsûma (Pars) Kambîs û bi vê re ew bû prensê Anzan. Ji keça kralê Med, **Kûroş/Kûrreş** ê II an bû. Ji bo vê çîrokek heye ku heta roja îro qal dibe. Heredot ji bo Kûroş wiha dibêje: "...Ew wekî qantiran e, lewra dayik û bavê wî ji dû miletên cûda ne. Dayika wî ji kokêkî baştir dihat, bavê wî weqas ne asîlzade bû. Dayika wî keçika Împaratorê Med bû, bav jî miroveki normal bû.[84-46] Di şirove kirina Heredot de jî vekirî xuya dike, ku Parsan vê demê ti giraniya xwe bi kok û binat nîne.

Împaratoriya Med ji Kizilirmak heya Gola Kesk, Rê-Tehran, Xorasan û Bûhara; ji wir heta kendava Îranê; ji wir jî heta Helebê dirêj dibû. Ew Kûroşê xwarziyê Kurd di sala 559 an de li Pasargatê serî hilda. Di navbeyna Med û Kûroş de du salan şer berdewam kir û di dawiyê de di nav artêşa Medan de jî serhildan çêbû û eskeran kralê xwe Astyages teslîmî Kûroş kirin. Kûroş kete paytext Ekbatanê û ewder xirab kir. Payîtextê Medan Ekbatana (Hemedan) bû.[38] Astyages bi darbê ji alî xarziye wî Kûroş pêkhatî ve gêrbû şûnde sûlala **Axamenîş** a Pers hate desthilatdariyê. Hinek dîtin hene ku dibêjin ew jî Kurd in. Gelek dîroknas vê pêvajoya serketina Pars û têkçûna Medan nîşan dide, lê ne raste. Guhartin tenê di xanedaniyê de ye, ne ya gelekî ye. Pers û Med di heman astan de cîh digrin û herdu jî li pêş in. Ve yekê Heredot jî dipejirîne: Împaratoriya Pers ji 22 Setrapan (eyaletan) pêk dihat. Medan şûna xwe li kelaka Persan bû, dereceya wan heman bûn; rêxistina birêvebirî şîrîkatî bû. Cara yekemîn li Qefqasan eyalata Ermeniyan vê demê çebû.[72] Piştî Medan, Axameniya Împaratorî çêkirin û di bin desthiladariya wan de gelek kraltiyên Kurd ava bûn. Yek ji wana yê li rojavayê Elbrûz bû ku ji vê re kraltiya **Amard** dihate gotin. Zelaniyan jî tim bi kesayetiyên kraltiya Axamenî re zewac dikirin û 300 salan bi vê yekê pesnê xwe dan.[154-82] Kraltiya Amard li başûrê Derya Kesk bû û îro jî ji vê herêma re Gîlan tê gotin. Gelek balkêşe ku îro jî êla bi navê **E/Amar-lû** yê li wir dijî ku tekiliya xwe Reşiyan heye û mirov dikare bibêje ku ew herdu jî yek in. Bi dîtina min ew ne tesedufe, îhtîmaleka pir mezine ku ew kraltiya, ji alî heman êlan ve hatibe damezirandin. Li beşên pêş jî emê bibînin ku xwediyê vê mîrîtiyê ji alî Tirkan ve bên ajotinî Anatolê û ewê li wir jî mirîtiya Dulkadiriyan ava bikin û piştre ji alî Osmaniyan ve bên belav kirin û di dawiya dawî de vegerin cîhê bav û kalên xwe Amard ê... Dîsa zewaca Zelaniyan bi ya Axameniyan re jî balkêş e. Gelo ew du federasyonên ku ji hev veqetiyan yên li cografyayên cûda dijî bûn? Eger di nava wan de xisimatî nebe, çawa dibû ku yek li nava Anatolê, ya din jî li Îranê bû û bihevre dikevine tekîliya zewacê... Ew jî dibe îspateke ku Axamenî Kurd in.

Kûroş textê Medya kire bin destên xwe bişûnde, karê wî yê yekemîn serhildanên Kurdan bi xwînê fetisandin bû. Bê guman alîkarî kirina eskerên Med bi Kûroş re jî balkeşe. Ne durê ku di nava dewleta Med de jî nakokiyên hizbî, êlî, malbatî û çînî hebûn ku Kûroş ji ve sûd wergirt û ew bi taahûdan



**Nûnerên Setrapên Axamenîş**

xapandin... Di nava Kurdên Anatolê de navê jinan ê **Med** gelek populer e. Ew ne Medîne yê erebî ye; di nasnamê de wek Medîne tê nivîsîn lê kesek min nedîtiye ku ew bikar aniye. Hemû dibêjin Medê. Mumkune ku ew nava jî Medan yan jî keça Astyages Merdanê hatibe girtin. Heredot dibêje: Di destpêka desthilatdariya Kûroş de astengiya herî mezin grubên mîna Bextiyarî, Saka û Misiriyan derdixist. Wî dixwest li hember wan dijminan bi xwe têkeve pêşiya artêşê û ji bo Îonê jî fermandarekî xwe bişine.[84-65] Wek hatî ragihandin di serî de Bextiyariyên Kurd, ku xelkê çiyaye û fêrî azadiyê bûne, Saka yên ku em dibêjin kalên Kurdên îro li dervayê welat in serî hildane û desthilatdariya Farisan qebûl nekirine. Koma Bextiyarî, piştî têkçûna Arraniyên li hember Îskenderê Mezin jî serhildan pêk anîn kralê Pers kuştin û vekişîn çiya. Wekî tê zanîn heta roja îro ji êlêka bi navê Saka ye giredayî Celaliya heye û li alî Agirî dijîn. Ew herdû milên Kurdên azad teslîm nabin û cezayê vê jî heta roja îro ewên bi navê Saka dikşînin. Yanê, Kurdên îro bi giranî li navenda Anatolê û Xorasanê dijîn Kurdên ji Saka ma ne. Ew serî netewandin heta sedsala XIX an jî dom kiriye; ji bo vê ez dibêjim Kurdên herî dawî teslîm bûne, ola xwe guhartine ew in...

Baysanoglû dibêje: Kûroş, li rojava Lîdya ji holê rakir bi şûnde êrîşî rojhilatê Îranê kir. Bi êlên wir (pêş-Tûranî) re şer kir (546-539 BÎ). Heremên Bakterêyan, Xorasan, Harezm û Sûgdiyan heynan û heta Seyhûn çû. Saka têk birin û kralê wan Amorg dîl girtin. Artêşa xwe bi wan mirovên mêr û bêtirs teqwiye kir.[137-84] Niqta dîrokî ya ku em ji wan bûyeran derxin ev e: **Kurdên ji ber êrîşên Asûr û xelkên Golan reviyane bakûrê Derya Reş û navenda Xorasanê, di dema Medan de dîsa vegerîn Kurdistanê. Piştî şerê Asûr û Medan**

**ewana xwe avêt paş Lîdya. Bi hatina Kûroş re ew dîsa çûne bakûr û navenda Xorasanê. Yên li wir mabûn ketin bin destê Kûroş.** Ji bo tevgera heman kralî Torî dibêje: Li rojhilat, êrîşî jora Amû-Derya-Vakhsha li Afganîstana îro gelê Bactrîc kire bin kontrola xwe. Va jî te vê watê, ku Hyrcanîa (Gurgan û Atrek), Parthîa (Xorasan û Tejen-Harîrûd) ji alî Medan ve hatibû wergirtin. Dragînana (Sîstan) jî di dest Medan de bû.(94-306) Di belavbûna Kurdan de rolêke Kûroş ê bingehîn jî li vir derdikeve holê. Yanê di dema Împaratoriya Medan de Kurd ji bo parastina tixûban û dagirkirina welatên din belav bûn; bi desthilatdariya Parsan re jî ew ji ber kralên wan ê xwînxwar reviyan û belav bûn.

Kralê Lîdya Kroîsos, di sala 546 an de xwest tola Astyages ji Kûroş heyne, lê bi serneket. Heredot dibêje: Yûnaniyan êrîşî Îlyona kirin û heynan. Bi ser vê de hêrsa Persan li hember Yûnaniyan rabû. Kroîsos bi eslê xwe ji **Lydîa (Lîdya)** bû. Kurê Alyattes bû. Bavê wî ji Sûrî heta Derya Reş û ji çemê Halys (Kizilirmak) vir de (ber bi rojava) kire bin kontrola xwe û hinek xelk kire kole, hinek jî kire dostên xwe. Barbarê yekemîn e ku Îon wergirt, Aîolîa wergirt, Dorên ji Asya (demên cûda de hatin xaka Yûnan dagirkirin) wana bi xugiyê girêdan û Lakedaîmon ( herêmên ji Sînopê ber bi rojava û heta Qastamonû) kirin bin destên xwe. Berê ji Lîdyayiyan re digotin Maîonîa (gor xerîta ku Heredot çêkirî ji bakûrê Agiriyê re Maior tê gotin). Kroîsos ji binemala Mermnadan bû, lê dewlet ji alî binemala kurên Herakles ve dihate birêvebirin. Berî Kroîsos (560 hate ser text) hemû Yûnanî azad bûn...(84-20) Ji van agahiyan encama ez derdexim eve, ku Kroisosî ji nijada Arî-Kurd e. Ew jî hebûna Zelaniyan dide ispatkirin. Di vê beşê dîrokê de tarîtiyeka mezin heye, bi vê re girêdayî şerê Troya jî bi dîtina min şerekî di navbera Kurd û Grêkiyan de ye... Ji bo nijada wî ya cûda, Grêkî wî wek "Barbar" bi nav dikin. Grêkiyan ji xelkê Kapadokya re Sûrî yî digotin. Ew Sûriyîna berî têkevin bin desthilatdariya Persan, di bin desthilatdariya Medan de bûn. Kroîsos xwest Kapadokya bike bin destên xwe. Ji bo wê Xwedê hêvî dabûyê, lê sedema esas dixwest ji Kûroş heyfa Astyages heyne. Astyages kralê Medan, birajinê Kroîsos û lawikê Key-esker bû. Êrîşî Sûrî kir, welatê wan talan kir û ew koçber bûn... Kralê Grêkiyan yê bi navê Kandaûlos ku kralê Sardes bû, ji jina xwe pir hêz dikir. Bi zorê ji eskerê xwe yê bi navê Gyges re got were jina min tazî bibîne. Esker mecbûr ma; jinikê ev dît. Di nava Lîdyayiyan û hemû barbaran de tazî dîtin- eger ev mêr be jî- gelek şerm dihate dîtin. Bi zora jinikê Gyges, kiral kuşt û li ser tex rûnişt. Ji Xwedê pirskirin wî jî kraliya wî qebûl kir û herdû malbat lihev hatin. Bi wî şiklî rêvebirî derbasî destê malbata Mermnadan bû. Ji kralê Phrygîa Mîdasê kurê Gordîas şûnde barbarê yekemîn Gygesê ku ji perestgehê (Delphoî) re diyarî şandin. Gyges, artêş şand ser Îzmîr, Netewos û bajarê Kolophon wergirt. Neviyê wî Alyattes, li hember Key-eskerê Medî ji malbata Deîokes re şer vekir. Ji mirina Alyattes şûnde li cîhe wî Kroîsos rûnişt û êrîşî Yûnaniyan kir. Ji bilî Kilikîa û Lykîa yan jê re stû xwarkirî yên mîna: Lîdya, Frîgya, Mysîa, Marîandyn, Khalyb, Paphlagoîna, Thrak, Thyn, Bîthynîa, Kar, Îon ( Konfederasyoneka ji

12 bajaran çêkiribûn, navê xwe jî mîna yên Persan bi peyvekê teva dibûn.) Dor, Aîol û Pomphylîan bûn.[84-20]

Kûroş ji bo ku êrîşê bibe ser Massagetanê sebir nedikir. Krala/Kralîça wan Tomrîs bû. Bawerî bi rojê dianîn. Ji ve re name nivîsî û têde got ku ew dixwaze ve re bizevice. Tomrîsê jî di bersivê de got: Kralê Medan, ji wî karî dev berde. Gelên xwe birêva bibe û tevlî karê me yê ku em xelkên xwe birêve dibin meve! Artêşa Kûroş çû Aras û bi merdûgana jê derbasbûn. Di şêre yekemîn de Kûroş bi serket. Tomrîsê jê re xeber şand: Kralê merkujî ji xwîne têr nabî, lawkî min î dîl di destê te de serbest berde û ji welatê me derkeve. Eger tu wiha nekî, bi efendiyê Massagetan rojê sond dixwim ku ezê te bi xwîne têr bikim. Paşê Tomrîsê şer qezenc kir û Kûroş kuşt. Kinc û jiyana Îskît û Massagetane wek hev e.[84-83] Ji ve nivîsê wisa xuya dike ku Massaget kalên Gurciyan e. Tê zanîn ku ola wan ê kevn Zerduştî bû lê di salên 300 PÎ de ew bûn xiristiyan. Îdea ku dibêjin eslê Kurd û Gurciyan yekê li ser vê hinekê bi hêztir dibe. Ji alî din ve dîsa Heredot dibêje: Grêkî dibêjin ku Îskît jina bi şîrîkatî bi kar tînin; lê ew êdeta li ba Massagetan heye.[84-83] Ew kevneşopî ya di dema Îslamê de ji alî Mazdakiyan û Xuremîtiyan ve jî bi kar dihat.

Kralên Persan:

| | | |
|---|---|---|
| Kyros | Kûroş | 555-529 |
| Kambîs | Kambuzya | 529-521 |
| Dareios | Darayavahuş | 521-486 |
| Kserkses | Hşayarşa | 486-465 |
| Artakserkses | Artahşatara | 465-424[84] |

Dema Kûroşê II an (559-529) mir, sînorên dewletê Kurd û Farisan ji Seyhan heta Kizilirmak, ji Derya Kesk heta kendava Pers û heta Misir dirêj dibûn.[94-318] Ew sînor hema hema di dema Medan de jî wiha bûn; kralên Pers li rojava bi taybetî li hember Grêkiyan hîn zêde erd fireh kirin. Ji alî din ve, wekî tê dîtin di navbeyna Heredot û nûserên din de cûdahiyên nav û dîrokê hene; ez wekî wan dinivîsîm.

Dema Kambîs II (529) an derbasî text bû, çû sefera Misir. Ji oldarê Zerduştan Kahîn Patîzetîtes anî cîhê kraltiyê. Wî jî şuna xwe da oldarê Zerdeşt Gomata. Gomata, dixwest bigihîje armancên Key-esker, ji bo vê di sala 521 an de serhilda,[84] lê bi ser neket. Heft malbatên Persan yên mezin gihîştin hev û Daryûs anîn ser text. Daryûs, li seranserî Kurdistan teror û hovîtiyeka mezin ajot: Zana, oldar, desthilatdar û kesên ku ji Gomata re piştgirî dikirin hemûyan kuştin. Ji bo ku zimanê kurdî bide jibîr kirin, bi hemû hêza xwe hewl da.[84-481] Bi dîtina min Êzîdiyê me ku zimanê xwe baş parastine bi vê serhildanê re têkiliya xwe heye. Îhtîmaleke pir mezine, ku ew ji ber Daryûs reviyan çiyan û bi sedan salan xwe ji civakê qût kirin û bi serê xwe jiyan. Ew serhildana li dij fetîhên Îranê û dinê wan Ormuzd bû. Gomates bi alîgirên xwe ve vekişiya Nîseîa ya li Medya û piştre jî hate kuştin. Di vî şerî de Magî hemû hatin kuştin û ji vê rojê vir ve, cejna "Magophonî" tevkujiya Magan tê pîroz kirin.[84-481] Di

dema Xerxes de, oldarên Medya bi giştî, Magî jî bi taybetî rastê perçiqandinan hatin. Ji ber vê, ji xwe re li cîhên nû gerîn û li Mezopotamya, Sûrî, Anadol, Lîdya, Kapadokya û Pontûsê belav bûn. Li Lîdya yê ji yezdanê Aryan Anahîta re heykel çêkirin.[71-107] Li vir jî tekiliya Lîdya û Magiyan ya olî derdikeve holê ku balkêş e û hêjayê lêkolînê ye... Magî (Mecûsî-rahîbên Zerdeştî): Faris nînin û her tim ji alî kralên Faris ve hatine êşkence kirin. Nivîskarên Grêkî, qala serhildana li dijî kral Dara ya ji alî rahîbê Magî yê bi navê Gaûmata ma ve hatî kirin dike. Dara, di welatê Medan de gelek komkujî kirin û xwîn rijand. Li dijî wî gelek serhildan çêbûn, lê bi ser neketin. Di dema Xerxes de hemû Magî (yanî Mazdaî, Mîthraî û Darûzî) yan ji welat koç kirin û li cîhên ku nû tê de tevgerê bajon geriyan. Çûn Mezopotamya, Sûrî, Anadoliyê (Lîdya, Kapadokya, Pontûs). Wekî bê zanîn jêdera wan agahiyan piranî Heredot e û hinek nûser îdea dikin ku ew Magî yên tên qal kirin Êzîdiyên îro ne. Ew îhtîmaleka pir mezin a nêzîkî rastiye ye. Xwedî derketina li ol, ziman û kevneşopiya dê û bavan heta roja îro îspata vê yekê ye. Lewra mirovên xwedî dozên mezin heta mirinê li dû vê bîr û baweriyê diçin.

Di dema Darayê I an de "Riya Kral" ê ji 2575 km an di navbera Sûs û Saros ê de çêbû. Rêyeka taybet bû, meqerên eskerî hebûn ku name dibirin û tanîn. Di dema heman kralî de, yekînên eskerî yên taybet jî hebûn. Di nava vê de 10 hezar leşkerên taybet hebûn ku ji wan re digotin "Eskerên Nemir".[67] Taybetmendiya wan jî ew bû, ku dema yek dimir yekî din diket cîhê wî û bi vî awî cîhên wan vala nedibû û her tim deh hezar bûn.[72] Heredot dibêje: Key-esker berê Med û Kîssî şandin ser Yûnaniyan, lê ew şûnde vekişiyan û têk çûn. Ji van şûnde Persên ku kral digote bê mirin in şandin, ew ji Medan rindtir nebûn.[84] Bawer dikim nivîskar li wir dikeve şaşîtiyê, lewra vê demê Key-esker ne serokê Medan bû. Heman nivîskar wiha berdewam dike: Di şerê Med-Persan (Dara) û Grêkiyan de, herdû artêş li hember hev bi qasî 8 stadyûman rawestiyan. Cara yekemîn Atînayiyan êrîşî Medan kir. Li destpêkê wan cesaret kir ku li hember Medan derkevin. Lewra heta wê rojê di nava Grêkiyan de tenê navê Medan cîhê tirsê bû.[84-316] Heredot di pirtûka xwe de weqas vekirî qala qehremaniya Kurdan-Medan dike, mirov lê şaş dimîne. Wana wek mirovên gir, bi dest û pê û rû dirêj dide nasîn. Di sala 512 an de Dara derbasî Trakya bû.[72] Di navbera salên 490-480 an de jî welatên derya Ege wergirt. Dara di sala 512 an de ket dû Îskîtan, lê nikarî wan bigre. Ji ber ku ti bajar yan jî navendeka wan ê diyar û cîhêkî kralê wan tunebû.[76] Di vir de jî perçebûna Kurdan dîsa derdikeve holê. Kurdên li navenda Kurdistanê ku dendikê wan wek Med xuya dibe, bi Persan re tevhev beşdarî şerên Yûnan dibin. Saka jê cûdane û tevlî vê yekîtiyê nabin. Heta xuyaye ku hîna jî ew li dijî desthilatdariya Persan in..

M. F. Kirgizoglû li ser babeta Aşxaniyan agahiyên giranbiha dide, gorwan wekî min li jor jî gote, di navbeyna Aşxaniyan/Part û Kurdên li dervayê welat de, girêdanekê derdikeve holê: Di dîroka Îranê de Part wek Eşkaniyan derbas dibe ku di sala 248 an BÎ de serxwebûna xwe îlan kirin. Arsakê I an yê ji

zenda Part û milê Saka re Dahe/Dae dihatî gotin, di sala 256 an BÎ de li ser Belh (Baktrêya) şer kir, Partiya di sala 248 an de dagir kir û serokê wir Andragoras kuşt. Bi vî awayê dewleta Arsak damezirand. Îranî ji wî re dibêjin Eşkaniyan, Grêkî dibêjin Arsakîdas, Ermenî jî dibêjin Bahlavîg. Ji Îndûsê heta Qefqasan, ji Sirderya heta Firat welat di bin desthiladariya xwe de gîhan hevdû. Eşkanî ji Oxûzên kevn û Turkmen bûn. Vana, xwedî navên Îranî bûn, gor dewleta xwe yekemîn dihatin binavkirin û ji ola Saka-Îranî bûn û giredayî şaristaniya Helenîzmê bûn, lê edetên Oxûzan didan mêşandin.(137-93) Ew niqteyeka gelek girîng e, xuyaye ku nivîskar gelek tiştan tevlîhev dike yan jî bi zanayî dixwaze sergêjiyê bike di heman demê de jî valahiyê dide. Berî hertiştî ez dixwazim navê Eşkanî wek Reşkanî bixwînim. Gelo ew ne mumkûne? Ji alî din de xanedanek mîna Eşkaniyan çawa hem Turkmen him jî Îranî dibin? Gor mentalîta nûserên Tirk ew ne mumkun e. Lê Eşkanî-Reşkanî Kurd in! Kurdên ku Tirk wek Turkmen û Oxûz bi navdikine! Mirov dikare bêje ku beşek ji kalên Kurdên li dervayê welat in. Ji milêkî Saka bûna wan jî niqteyeka girîng e. Li vir ev encam derdikeve; ku Saka-Eşkanî-Turkmen û Oxûz yek in...

Îskenderê Makedonî cara çaremîn jî bi Dara re şer kir û dîsa zora wî bir û berê xwe da Zagrosan. Wê demê çend êlên Kurd ên ku ti caran bindestî qebûl nedikirin li wir dijiyan. Îskender wana wiha bi nav dike: Kosear (Kasîtan), Dîdonan, Arîbarzanes (Barzan) û Tangî-Roskan.(4-173) Arîbazanes (Ar/agir-berzan) êla Kurd ê ku navê xwe daye Azerbeycana îro ku hêjayê lêkolînê ye. Piştî gelek şeran, artêşa Îskender nikaribû derbas bibe û mecbûr ma ku vegere Babîl. Îskender wiha dinivîse: " Ew êlana bi xwe û warê xwe pir bawerin, vê yekê jî dibîne ku ewên berê qêt giredayî ti kralan nebûne..." Piştî wana hêzen xwe di perwerda taybetî re derbaskirin û di 40 rojan de ji Zagrosan derbas bû.(4-173) BÎ di 312 an de generalê Îskender Selêkos destê xwe danî ser welatê Kurdan. Di sala 233 an BÎ de hemû Mezopotamya kete bin destê Roma. Di 244 an de Şapûrê I an ê Fars Antakya, Kapadokya, Hûmûs wergirt û di sala 260 an de Roma li nêzîkî Riha şikeşt.

Dema Ardeşîr jî îttîfaqa Pars û Kurdan, li dijî Îskenderê Makedonî şer kir lê di sala 330 an BÎ de têk çûn. Ji wê bi şunda jî şerên Roma-Part dom kirin.(52) Di sala 224 an BÎ de dawî li dema Parta hat û dema Sasaniyan destpêkir. Îskender dema herêm dagir kir, belgeyên nivîskî yên bi wî pêwist heynan û yên din şewitandin. Evên ku heynanî jî birin Yûnanistan û tercume kirin.

Xiristiyanî di salên 100 an PÎ de li dora Riha belav bû.(52) Împaratoriya Rom sala 100 an PÎ de bi Sasaniyan ve bûn sînor. Wan herdû Împaratoriyên mezin bi dehan salan li ser axa Kurdistan şer kirin. Kurd dîl hatin girtin, li bazaran hatin firotin, koçber bûn û gundên wan wêran bûn... Gundên wek Şehîd, Kusûbû û Kuyer hatin xirav kirin. Firat ji bo herdû Împaratoriyan bû sînor. Paşê Varharan hat ser textê Sasaniyan û peymana bi Roma re kirî ji holê rakir. Pêşî di sala 502 an PÎ de êrîşî Harranê kirin û 15.500 kes dîl girtin. Di sala 503 an de ketin Amedê û 80 hezar mirov kuştin. Riha dorpêç kirin û xelkê bi

kaniyan kevir davêtin û ji ber vê artêşa Sasaniyan reviya. Lê her der tar û mar kirin.[38] Di nav Kurdên li Anadoliya Navîn de heta demên dawî ew kaniyana gelek popûler bûn.

Di navbera ziman û çanda Kurd û Farisan de cûdatiyek mezin tune û heta derengî jî ew bi hev re bûn. Ji hev veqetandin di salên 1500 BÎ de pêk hat: Ji yên li bakûrê rojava yê Îranê re Med, bakûrê rojhilat re Paidî, ji rojava yê başûr û navîn re Pars û ewên li rojhilatê başûr re jî Belûc digotin.[72-75] Gelek dîtin jî hene ku dibêjin zimanê farisî bi kurdî ve jihev cûdaye û kurdî hîn kevintir e... Kesekî ne zimanzan jî dema bala xwe dide Farisî bi hêsanî dibîne ku ew zimanekî bi tevlîbûna zimanên din hatiye holê. H. Layard dibêje: Persan nivîsa mixa yên aidî xwe bi kar tanîn. Di welatê Fars de heman nivîs li ser her kevirekî tê dîtin. Di parelêlî vê de jî, nivîsên bi zimanê Med û Babîl jî dihatin nivîsîn. Ev ji zimanê Asûr cûda ne. Nivîsa mixan ji çep ber bi rast tê nivîsandin. Nivîsa hiyeratîk (suryanî) mîna erebî ji rast ber bi çep tê nivîsandin. Sê cûreyên nivîsa mixan heye: Ya Babîl, Asûr û Med-Pers ê. Seriyên xwe bi îşareta tîrê ne. Ji wan nivîsên sê zimanan li gundê Bisutanê girêdayî Kirmanşah henê û ê aîdê Xanedana Axamenîş in. Li Wan ê jî nivîsên bi sê zimanan yê aîdê Xerxesê henê.



**Belga bi sê zimanan**

Di derbarê nivîsa Medan de, em pir kêm tiştan dizanin. Ji alî zarava hevgirtina kêran (kama) de bi temamî ji nivîsa Pers cûda ye. Ji gelek aliyan ve dişibine nivîsa Asûr û Babîl. Nivîsandina Farisî bi 39-40 tîpan pêk tê. Asûr-Babîl jî 300 tîpên cûda henê.[68] Birêz Ezîzê Cewo dibêje: Di zimanê Medan de tîpên dz, dj-c, tş-ç hebûn ku îro jî wan xwe di nav zaravê kirdkî û soranî de jî parastine. Di nava kurmancan de hatiye guhartin. Dîtina Cewo jî dîtina min ê ku berê jî nivîsî piştrast dike; min gotibû ku: Dendikê Medan ji alî Soran, Hewraman û Goranan ve tê teşkîl kirin. Kurmanc û bi taybetî jî Reşan piştgiriya Medan kirin. Cemîl Paşa dibêje: Tîpên nivîsa mixî ya ku Sumerî û Akadiyan dinîvîsandî Kurdan jî pê dinîvîsandin. Paşê merivekî bi navê Misîsûrat tîpên din çêkirin. Berî Kurdistan ji alî Ereban ve bê dagirkirin Kurdan bi Misîsûrat dinîvîsandin.[9] Di navbera Med û Parsan de, ji alî kevneşopiyan ve jî Heredot van agahiyan dide:

Pers, edetên xelkên din pir zû digrin; ji bo ku cilên Medan ji yên xwe rindtir dîtin bi xwe jî êdî mîna Medan li xwe kirin. Dîsa niqteka balkêş wiha dinivîse: Pî walî/aliyê din î Tûna (Îstros) ango li bakûrê rûbar, gelekî dijî û ez hîn bûm ku ew gelê Siginnaî ye, ku kincên Medan li xwe dikin.[84-249] Divê ew Saka, yan jî zaravaxifê (Lerî?) dine Kurd bin û bere ew li dora Gola Aral dijîn. Peyva Siginnaî nêzîkî Saka ye û demeke dirêj li bakûrê Derya Reş jiyan. Dibêje: Li ser hespên wan bi pênc tiliyan pirç heye û bêvilên pozên wan pan in. Ji bo siyarbûne nê, ji bo erebe jî ew baş in. Axa wî netewî heta Enet (Venedîk) dirêj dibe. Ew koloniyeka ji Medya hatine. Ew çawa pêk hatiye min fêhm nekir. Lê di pêvajoyek sedsalan de dikare her tişt bibe.[84-249] Kincên Medan wiha bûn: Li seri ji kulav kumên sivik hebûn, zirxên pî dirêj lêbûn û mîna pûlên masiyan bi pûlen hesinî hatibûn xemilandin; di lingan de potûrên fireh, mertalên ji darê sorkûn, rimê kin, kevanên gir û tîrên ji kamûş û xencêren bi ser çîpê de tenê hebûn. Wekî di beşa Arran de jî me gote: Grêkiyan ji Persan re digotin "Kephen" wana ji xwe re jî "Artae" digotin. Med jî wek Arîan dihatin nasîn. Mediyên ji Kolkhîs, dema ji Atîna vegeriyan welatê Arîan şûnde, navê wan hate guhartin. Med bi xwe wiha kat-qal dikin.[84-345] Çima hatiye guhartin nenivîsiye. Bextiyariyan jî kumekî wek Medan didan serê xwe; tîrên xwe ji kamûş bûn, rimê xwe kin bûn. Saka yên ji koka Îskîtan jî kumekî mîna kovikan didan serên xwe. Di lingên wan de poturên fireh hebûn. Ew ji êla Îskîtan yê bi navê Amyrgîa bûn lê wê re Sakes digotin. Tîrkêşê Arêyan mîna yê Medan bû. Wekî din jî alete xwe mîna ye Bextiyariyan bûn. Part, Khorasîma, Sodgu yan, Gandar û Dadik wek Baktrîan bû.[84-345] Wekî tê xuya kirin hemû êl û zaravaxifê Arran mîna hev li xwe dikirine û alavê wan mîna hev bûne. Ew jî çanda wan ê hevbeş nîşan dide.

Împaratoriya Pers û Kurdan li erdnigariyeka pir fireh belav dibû, bi taybetî jî ji salên di navbera 550-331 an BÎ de, ji Deryaya Ege bigre heta gola Aral, çemê Seyhan û Îndûs dikete nava sînorên ve Împaratoriyê. Di sala 500 BÎ de ew sînorên hanê bêtir fireh bûn; li Asya heta gola Işik, li rojava heta Trakya


Bextiyarî

û li rojava jî heta Misrê fireh bûn. Di vê demê de, Sakayên Arranî ku ji alî hemû dîrokzanan ve têne qebûl kirin jî, wek du beşan li ser erdnîgariya cîhanê xuya dikirin. Beşekî li rojhilatê gola Aral bû ku li heman herêmê Bextiyarî yên Kurd jî li cografyeka pir fireh belav dibûn. Mirov dikare bibejê ku ji Gola Aral heta kendeva Hindî belav dibûn. Belavbûna wan û Ew ên ji bo me girîng e lewra Bextiyarî û Lekê ji famîlyekê ne. Îhtîmaleka pir mezine ku beşê Saka yên li rojhilatê Gola Aral ew Lekî-Şêxbizinî bin. Beşê din ê Saka jî li bakûr û bakûrêrojavayê Derya Reş bû. Li ser wî xelkê ku gelek balkêş e, emê di beşa Macar û Kurd de bi kurahî rawestin.


## MACAR Û KURD (SAKA-ÎSKÎT)

Di gelek jêderên Tirkan de Saka wek Tirk tên nîşandan lê bi xwe re jî dikevin nava nakokiyan. Di pirtûka li lîseyên Tirkiyê de têne xwendin de, ji bo Saka tê nivîsîn; ku ew wek konfederasyon hatibûn bi rêxistin kirin û piraniya wan bi eslê xwe Îranî bûn. Di heman pirtûkê û paragrafa li jêr jî dibêje ew Tirkên ji Asya Navîn bûn. Gelo hem Îranî û hem Tirk çawa dibe? Gor dîroknûsê îdeolojiya fermî navê Kurdan nîne û eger Kurd be jî ew wek Îranî bên nivîsîn. Ew dîtineka ji îlm û rastiyê dûr e. Lê rastî çi bû û ew çi milet bûn? Ji bo bersiva vê emê hewl bidin ku wan ji nêzik ve binasin û dîtinên cûda peşkeşê we bikin.

Dema kralê Kurd û Farisan Dara (BÎ 521-486, gor hinek jêderan jî ew di sala 512 an de ye) derket sefera Îskîtan. Gor gotina Saka bi xwe ji, kralê wan ê yekemîn Targîtaos e û heta wî seferî **koka wan ji hezar salî zêdetir naçe**.[84-195] Gor vê gotinê, bi hesabekî gilover dîroka wan ê 1500 sal BÎ destpê dike. Bê guman berî vê jî heye lê xuyaye wana navê xwe guhartine. Ew tarîxa jî hema hema rastê dema dewleta Hatiyan ya 1200 BÎ hatî rûxandin tê. Ku ji vê demê bi şûnde Kurd li Anadol û Kurdistanê gelek hindik mabûn. Dîtineka din vê têzê rast dike: 1100 sal BÎ Saka, li Pencapa Hindîstanê bi cîh bûn. Ereban ji vê herêmê re **"Sicîstan"** digotin ku li rojavayê Kabîl û Kandaharê diket.[128-24] Li ser vê agahiyê mirov dikare bibêje ku **navê Sicîstanî ji Saka tê** ku ew jî xwezayî ye. Heta ew nêzîkî peyva Siginnaî ya me li jor qal kiriye jî. Heman nivîskar bi

berdewamî: Netewên li wir bi cîh bûne re Ereban **"Etrak/Turk"** digotin. Di sala 591 an de bi alîkariya Gokturkan, Saka bûn desthiladarê Îran û Bexda ye. Sakayên Xorasanê girêdayî birayê Deryêm Çûpîn bûn ku ji wî re **Kurdî** dihate gotin. Ji xwîşka wî re jî digotin **Kurdiye**. Vê yekê Taberî di sala 915 an PÎ de ji jêderên Îranê radigîhîne.[128-24] Saka-Îskîtan di sedsala VII an BÎ de, ji Asya Navîn, ji kêleka gola Isigol ê dest bi koçê kirin. Milek ji rojava, milek ji rojhilat ve ketin Anadolê û li wir gîhîşt hev. Milekî jî Derya Reş û Kesk kirin nava xwe û der dor zept kirin. Li ser vê axê Împeretoriya bi nav û deng avakirin.[91-73] Peyva Etrak ji bo me pir girîng e ku emê di beşên li pêş de li ser wê rawestin.

Heraklesê Grêkî rojekê gayên xwe dide ber xwe û tê welate Îskîtan. Ji serma radikeve û hespên wî jî diçêrin. Dema ji xewê şiyar dibe ew hespên xwe nabîne. Tê ber deriyê şikeftekê, heyvanekî joriya xwe jin jêriya xwe jî mar dibîne û hespên xwe jê pirs dike. Ew jî dibêje eger tu bi min re rakevî ezê wan bidim te. Heredot (490-425 BÎ) wiha berdewam dike: Ji Targîtaos re sê zarok çêdibin: Lîpoxaîs, Arpoxaîs û Koloxaîs. Di dema wan de ji ezman, nîrê ga, bivirek û kupayek dikeve. Ew wek zêr dibiriqîne. Birayê mezin dibîne lê dema nêzîk dibe ew reş dibin. Yê navîn jî dixwaze bigire lê dîsa ew zêr dişewite reş dibe. Dema yê biçûk nêzik dibe, ew sar dibe û birayê biçûk van alavana dibe mala xwe û dibe kral. Welatê wan pir fireh e. Koloxaîs dike sê dewleta û heryekî dide lawekî xwe. Herakles dibêje kîjan lawê min mîna min tîr amade bike û wî şûrî jî mina min li xwe bike, li wî welatî bi cîh bike. Ewê ku wek min gote nekirî jî ji wî welatî biqewtîne. Zarokê yekemîn navê xwe Agathyrsos, yê din Gelonos û yê biçûk jî Îskît bû.[84-195] Heta dema dawî li Dêrsîm û di nav Kurdên Anadoliya Navîn de wêneyên **Şahmaran** gelek dihatin neqişkirin. Di nava keçên li Anadoliya Navîn de, keça berzewac tulan bi wêneyên Şahmaran çêdikin û dikin nav tiştên xwe yên bûkaniyê. Bê îstîsna berê di her malekê de hebû û dihat neqişkirin. Gelo koka xwe dîrokî ji vir tê ? Bi taybetî jî çêkirina ji alî keçên berzewac watedar e û divê têkiliya wan bi hev re hebe. Lewra Kurdên îro li Anadolê û rojavayê Kurdistanê, bi taybetî jî kirmanckî axêf jî beşek ji Sakan bûn...



**Şahmaran**

Çîrokeka din heye: Sakayên koçber li Asya bûn. Bi Massagetan re şer

kirin û têk çûn. Çemê Araxes (Aras) derbas kirin û hatin ba Kîmmeran. Tê gotin ku cîhên Îskît lê rûdinên berê di destê Kîmmeran de bû ne. Kîmmer li hember vê bûyerê ketin dubendiyê. Xelkê digot em vira terk bikin û herin. Kralên Kîmmer jî digot em şer bikin. Herdû milên Kîmmeran bihevre şer kirin û yen mirî li kêleka çemê Tyras (Dinyester) kirin erdê û yên din welatê xwe terk kirin. Dema Îskît hatin kes li vî welatî tunebû. Wexta Kîmmer ji ber Îskîtan revîn di Asya re derbas bûn û hatin Khersonessos ê (Çanaqalê) bajarê ku ji alî yên ji Sînopê hatî avakirin. Kîmmer ti cara ji ber avê bi dûr neketin, lê Îskîtan rêya xwe şaş kirin û çûn Medîa.[84-196] Îskît ji rojavayê Turkîstanê hatin başûrê Rûsya û Kîmmerên li wir qewitandin.[84-506] **Texmînî ew di derdora salên BÎ 800 an de pêk hatiye.** Ew Medên li navbera çemê Tûna û Enet ê yên ku Heredot qal dike û nizane kîngê hatine jî, îhtîmaleka mezine ku wê çaxê ji wan Sakan veqetiyabin û li wir bi cîh bûbin.

Li gor dîtina K. Kara, Saka di salên 700 an BÎ de ji Asya Navîn koç kirin û hatin bakûrê Derya Reş û heta çemê Tûna belav bûn. Grêkiyan ji wan re digotin Îskît, Îraniyan jî digotin Saka.[148-74] Wekî tê zanîn bakûrê Derya Reş û Derya Kesk bi temamî heta gola Aral di bin kontrola Sakan de bû. Ew herêmêka bi heyî, av û tijî maden e. Lê, ji Asya çima hatine baş nayê zanîn, mumkune ku tekiliya vê **"koça qewman"** hebe yan jî şertên xwezayî zor dabe ser wan. Koça qewman jî, bi derketin û êrîşkariya Hûnan ve giredayî ye, ku xelkên cîran ji ber wan ji cîhên xwe leqiyan. Wekî me di beşên berê de jî gote, Xelkên Deryayê (1200 BÎ) ji rojava ve, Asûr jî ji başûr ve Kurd ji warê wan bi temamî derxistibûn. Di salên 700 an BÎ de li ser Kurdistanê zilmeke Asûriyan ya gelek dijwar heye ku me nivîsîbû û Kurdistan hema hema bi temamî vala bûbû. Di encama vê de jî yekîtiya Medan derketibû holê. Di yekîtiya Medan de xelkê bi navê Reşan ên ji Xorasan jî hebû, ku gelekî şervan bûn. Îhtîmaleka pir mezine ku ew Reşana, Reşiyên îro ne û beşekî ji Saka ne. Ji bo vê îdeayê gelek îspat hene: Awayê jiyana Saka û Reşan / Reşiyan, awayê rexistinê ku herdû jî konfederasyon in, şervaniya wan, nivîsên li ser keviran, navê Sakayî hîna jî di nava Reşiyan de dijî û hwd. hinek ji wan in. K. Kara bi berdewamî wiha dinivîse: Ewên ku çiyayên Qefqasan derbaskirin heta Filîstîn û Sûrî jî hatin. Saka wek konfederasyona qewman hatibûn birexistinkirin, lê rêvebirên wan Tirk bûn. Hukumdarê wan ê herî bi nav û deng Alp Er Tûnga ye. Tekoşîna wî rêvebirî bi kralê Faris Kuroş II an ve bûbû babeta destanan. Firdewsî di Şahnamê de vê wek tekoşîna Îran-Tûran dineqişîne.[148-74] Di Tirk bûna wan de gumanên me yên cîdî hene; Tûraniyên ku tên qal kirin jî bi temamî ne Tirk in. Ew bûyera, perçebûna di navbera gelê Arran de nîşan dide. Yekê jî; dikare hinek dîtin bibêjin ku dema Împarotoriyên Med û Pers li rojhilat fireh bûn, Saka çûn wir û ji wir jî ber bi rojava belav bûn? Mumkune hinek ji vê demê jî mabin, lê Saka hê zû li vê herêmê têne tespît kirin.

Yek ji dîrokzanê Tirkan yê ku dîrok bi kûrahî nivîsî û berovajî kirî C. Turkay e, ku li ser têkiliya Reşî û Saka wiha dinivîse: **Cemaata Rûmiyan**

**SAKA Yûsûfê ji êla Reşiyan e**. Ew li: Sîwerek, Semsûr, Nîzîp, Bîrecîk, Rakka, Dîlok, Erzirûm, Qers, Çildir, Ahiska, Sêwas, Meletî, Tokat, Karaman û Aydin ê dijîn.(160-637) Dr. Rişwanoglû jî niqteyeka hê girîngtirîn qal dike: Gelek êl ji Hindîkuş, çiyayên Elbrûzê di welatê Goran re derbasbûn û hatin Kurdistanê. Ji wana **Reşiyên ku bûne Tacik û şaxekî Saka jî heye.** Zekî V. Togan jî dibêje: **Reşan/Roşan Sakayên koçber in.**(128-149) Her sê nivîskar jî yekbûna Saka û Reşiyan dipêjirînin. Têkiliya Tacik û Reşiyan jî pêwîste zêde bê lêkolîn kirin. Ji der de dema mirov li herdû koman dinihêre gelek nêzikatî û wekhevî di navbera wan de heye. Ji alî karekter, fizîk, rûhiyat û ziman de mirov dikare vê wekheviyê bibine.


Şervanekî Tacik

Pêwîste dîrokzan êrîşa Saka yê başûr jî lêkolîn bikin û sedema vê yekê derxin holê. Saka êrîşî Anadoliya Navîn û dora Kizilirmak, Sûrî û Medya kirine. Êrîşa li ser Medya me qal kir lê yên dinê ji alî min ve nayê zanîn. Tekiliya êrîşa Anadola Navîn û dewleta Zelanî hebû? Ne îhtîmaleka dûre ku vana li vê herêmê mîrîtiyek avakiribin û piştre bi Medan re bûbin yek. Ji bo têkoşîna Îran û Tûran jî emê di beşên pêş de qal bikin ku gor ditina min ew niqteyeka girîng û serekî ye, ku diroknasên Tirk di vir de jî dereweka mezin dikin...

Mumkune ku bê gotin Kurd di serdema Medan de çûn Asya; lê Kurd berî vê demê jî li Asya hebûn. Bi taybetî jî dora Xorasan, Derya Kesk û heta çemê Amû-Derya/Seyhan; mirov dikare bibêje ku ew çem di navbera Kurd û proto-Tirkan de sînor bû. Wekî me li jor jî gote Kurdên rojava bi hilweşandina Hatiyan re vekişîn rojhilat û bakûr ku Reşanên bi Medan re alîkarî kirîn wê demê jî li wir bûn. Vê yekê dîroknas jî dipejirînin: Welatê Zabilîstan (Xûr) di nava Xorasan û Hîndîstanê de ye. Di salên 700-600 an BÎ de şûn û warê Kurdan bûye. Ristemê Zal (Zabilî) li wir bûye. Seferoglû Agahiyên girîng dide: Rojhilatê Xorasan û rojavayê Afganîstan di serdema destpêkê û serdema navîn de wek **"Sakaîstan-Segîstan"** dihate bi navkirin; paşê gotin Secîstan. Lehengê **Kurd ê efsanewî kurê Zal Rustem ji Secîstanê û ji Tirkên Saka bû...**(91-9) Mumkune wî jî ji Taberî girtibe, bê guman ew hevok jî gelek tiştan fêrî me dike. Yekemîn ew herêm welatê Kurdan bûye; duyemîn Rustem Kurde, bi vî awayî Rustem ji Kurdên Reşiyê û paşê jî çawa Kurdan wek Tirk nîşan dide re mînakeka başe...

Nivîskarên Ereb dibêjin bajarê mîna Gazne, Kabîl, Bamyan û Ferewan di dema îmam Osman de bi rêya aştî misilman bûn û ji Osman şunda dev ji misilmantiyê dîsa berdan.(32) Ew tevlîbûn ne ji dilê û xuyaye ku Kurdên wir hêza xwe têr nedikir ku bi eskerên Îslamê re şer bikin û misilmantî wek taqtîk qebûl kirin. Pişt re dev jê berdan jî îşareta vê ye ku dema tirs derbas dibe,

dîsa vedigerin ser ola xwe ya kevn, yan jî Zerdeştî. Heman nivîskar: 400 sal BÎ li rojhilatê Kurdistanê Ciloya, Zîwan, Lewalcan, Karyan, Bazencan dijîn. Di ber destpêka misilmantiyê de Kurdên Sirtî (Sirtî-Cirtî) li welatê Herat, Mazenderan, Gîlan û Xorasan dijîn. Hinek dîrokzan jî cîhe wan ji Amedê heta Şemdînan dane diyar kirin.(32) Di beşên pêş de jî emê li ser rawestin, lê Kurd heta destpêka Îslamê jî li wan herêman man.

Li ser dîroka Saka Î. Şahîn van agahiyan dide: Li Bakûrê Îran, Xorasan û Gûrcanê (Cûrcan) xelkekî ji Qefqasya yê bi navê **Partiya û Hirkanya** dijîn. Li destpêkê bi zimanê Qefqasya Îskîtî diaxifin. Piştî koçê wir kirin êdî bi Medî axifîn. Ji vir pê de Medî bû zimanê wan ê fermî. Partan di sala 175 an BÎ de bakûrê rojavayê Îran bi destxistin, bi vî awayî herêma Med ketê bin destên wan. Kralê Part Mîtrîtades I (170-176) li rojhilat, Bextiyarîstan kirê bin destên xwe û li rojava ji Qefqasan heta Firat ketê desthilatdariya wî. Sala 129 an BÎ de Herat û Arêya ketê destên Partan. Sala 36 an BÎ li dora Ûrmiyê Dewleta **Taçak a Med** hê jî hebû. Di şerê bi Roma re alîkariya Partan kirin.(94-329) Êlên Kurd, di bin serokatiya Argû de, di navbera salên 145-29 an BÎ de bûne yek û li dij Partan, Ermeniyan û Romiyan li berxwedan û serxwebûna xwe parastin. Dewleta wan 400 salan jiya. Birêvebirên wan navên xwe Abgar bûn. Salên 179-212 an PÎ de kralê Kurd IX Abgar xaçeperestî qebûl kir û bi vî awayî rêvebirî di sala 244 an de giredayî Roma bû. (59)

Gelek dîrokzan ji bo Sakan hema hema agahiyên wek hev didin; lê li gor dîtina min li ser Saka hê lêkolînên kûr nehatine kirin. Wek Sûzanne Ûnge jî radigihîne, ew xelkekî bi esle xwe Îranî bû, li bakûrê Derya Reş bi zîraat û maldariyê re mijûl bû. Êlên Îskîtên şervan jî, di sala 612 an BÎ de ji Medan re alîkarî kirin ku paytextê Asûr Nînova girtin.(152-79) Heta vir hemû yek deng in, ku Saka miletekî Arranî ye; Grêkiyan navê Îskît lê daniye; şivan bûne û ji Medan re alîkarî kirine. Ji desthilatdariya Medan bi şûnde jî ew rastî êrîşên Persan tên. Xanima Ûnge wiha berdewam dike: Di sala 513 an de kralê Pers Dara şerek li hember wan meşand, lê piştî şerekî dirêj xwe bi şûnde vekişand. Di salên 300 an de **Sarmetan** jî Îskît perçikandin, sedema vê serkeftinê jî, ew şûrên ji hesin keşîf kiribûn.(152-79) Dîsa du nivîskarên Swêdî Andersson û Sandwall jî îdea dikin: ku Îskît û Sarmatan giredayî **Saceran** bûn ku ji malbata zimanê Îranî ne.(153-79) Bi dîtina min Saka û Sarmat du komên Kurdên zaravên cûda ne; wek Kurmanc û Kirdkî lê li ser Saceran em nikarin texmînekê bikim; Mumkune ku nivîskar jî di nava şaşitiyê de bin. Heman nivîskar dibêjin: Kinc û stîla jiyana wan jî wek hev bû. Lê xelkên li Asya Navîn ji êlên cûda pêk dihatin û bi taybetî tekiliya wan bi Axameniyên Îranê re hebûn.(153-79) Ji êlên cûda mebesta nivîskaran zarave axifên Kurd in û di beşên derbasbûyî de min îşaret bi tekiliya van Axameniyan kiribû. Tê gotin, ku Saceran kumê xwe tûj bûn, şûrê xwe qut û du aliyan de tûj bûn. Di artêşa Persan de li hember Yûnan jî şer kirin. Di kolaneyên li rojavayê gola Zaîssan a li alî Tjilikta de alavên derketî jî stîla Îskîtan e, ku bi hezaran kilometer dûr e. Biroşên sê lingê ji wir derketine

nîşan didin ku ji festên Zerdeştî û ji çanda agir mane.[153-79] Agahiyên civakî yê ku nivîskar didin bi yên Kurdên li dervayê welat ve hevûdû digrin. Bi taybet jî kumê ku tê qal kirin di nava kalên Kurdên Xorasanê de tê dîtin. Min wenêyê bi vî awayî dîtibûn.

Bi dîtina min Kurdên Kurmanc, Lek û Dimiliyên ku li dervayî welat dijîn û beşek jî li rojavayê Kurdistan bi hevre Saka pêk dianîn. Mumkune ku di bin sîwana vî navî de Tacikî, beşêkî Hindî, Macar, Osetî û miletên din jî hebûn. Em vê ji lêkolînên kûr re dihêlin. Lê ez dikarim bibêjim hema hema ji sedî sed raste ku di nava Saka de her sê zaraveyên kurdî jî hebûn. Tiştê ji kolaneyên li Karmîr-Blûr de derketî, ku nêzîkî Erîvanê û navenda Ûrartûyan-Wanê ye, alavên ji salên 600 an BÎ ne, mîna sîlahên hesinî, mircan û yen din ên derketî wekî yên Îskîtan yên li bakûrê Derya Reş in. Tekiliya Îskîtan bi Ziwiyê/Seqiz-Rojhilatê Kurdistana re jî hebûn. Zêrên li Seqiz derketî bi yên li Elîzavetgrad-Ûkranya ve mîna hevbûn. Ev şûrekî dest zêrînî û çakûçek bû. Lê tiştên li Sibîrya derketinî hîn kevntirin. Nivîskarên Swêd dibêjin: Peyva Îskît, gelek êlên ne ji kokekî-nijadekî ne, lê pir bi hêz karekter, nav û navê cîhên Farisî li wan bûn. Arkeologan îşaret kir ku tiştên berê ji Îskîtan de manî, bi çanda deştê ve hevûdû digirt û kevnbûna wan heta 1500 an BÎ jî dikarin herin.[153-11] Bi rastî, ev dîtinên giranbiha ne û ew dîtinên min piştrast dikin. Tekiliya Saka bi Seqizê ve ew bû, ku beşek Kurd-Lek ji vê herêmê hatibûn bakûr û li wir dijîn ku vana çanda xwe anîn herêmê. Navên li ser cografya û li ser tiştên din jî îşareta desthilatdariya Saka yê li ser komên ji nijadên din e. Çanda wan ê heta sedsala XV an BÎ jî bi belavbûna dewletên Kurdên ji Anadol û Kurdistanê ve giredayî ye. Wekî Hatî, Xorrî, Mîtanî û yên din ên belav bûne…

Li ser cografya Saka Heredot wiha dinivîse: **Îskîtên** koçber ji çemê Pantîkapes (milekî Dînyeperê) bigre heta ava Gerros (Ava Donets) ê digirin û bi qasî rêya 14 rojan cîh digirin. Ji Tanaîs (Don) bi şûnde êdî Îskît tunene û gelê yekemîn **Saûromat** in (bi zimanê Îskîtan dipeyivin). Xaka wan jî ber bi jor rêya 15 rojan dirêj dibe. Li bakûrê wan jî **Budîn** hene. Ji rêya heft rojan bi şûnde welatê Thyssagetan tê. Gelek in ji kokekî din tên. Li sînorê wan Lûrkaî tên. Li rojhilatê bakûrê wan Îskîtên din hene. Wana ji **Îskîtên Şahane** veqetiyan bi şûnde, hatin li vir bi cîh bûn.[84-198] Bi vê awayê sê beşên Saka jî derdikevin holê ku ev îşareta sê zarava axifê cûda jî dikin.

Gor lêkolîneyên Kirgizoglû, sedsala VIII an BÎ, Hûn (Hî Yung-Nu) bûn xwediyê rojhilatê Asya Navîn û li dora çiyayê Xwedê bi cîh bûn. Ji **ew ên ku li çiya û zozanan, di nav yekîtiya Saka de dijîn re digotin "Kurd". Li herêma Saka yê li pênc welatan belavbûne û ji bo ewên li wan deran wek koçber dijîn re Kurd dihate gotin.**[128-20] Ew tespîteke raste, lê dibe bê zanîn ku di yekîtiya Sakan de kê hebû? Bi dîtina min wek Kurd: şaxê mîna Dimilî-Goran, Lek û Kurmanc hebûn. Li dû van îşaret hene ku Macar û dibe ku Polonî jî tevlî ve yekîtiyê ne. Macar û gelek miletên din di vê demê de li nav û rojhilatê çiyayên Ûralê li Rûsya dijîn. Bi hatina Hûnan re ew hemû ji cîhên xwe veqetîn.

Gor îdea Macaran bixwe jî, êlekê ji wan ber bi Qefqasan û Çemê Aras çûye. Di gelek jêderên dîrokî de jî ewên ku ber bi Korta Şadiyan hatine wek Alan tên binav kirin ku Alan jî beşek ji Kurdên Dimilî ne. Îro jî li Dêrsîmê êla Alan heyê ku Kurd in. Gor tespîtên dewleta Tirk êla Alan li Dêrsîmê navça Mazgîrtê di sala 1908 an de 350 eskerên bi çek derdexistine. Nîvgirêdayî dewletê ne.[116-108] Dîsa li nehiya Dere-Pertek, Nazimiyê û gundên wê yên mîna: Kil, Meşeyolu, Gûdeç, Atlanti, Sînan, Gûrbûz û Gomemîşê Alan (**Qeraman, Kalman**, Gûlen, Zûlfan) dijîn.[116-123] Yilmaz Çelîk jî dîtina min piştrast dike: Alanê li Dêrsîmê şaxêkî Alanên ji koka Îranî yên li bakûrê derya Kesk, Daxistan û Qirimê dijî ne.[116-127] **Alanên îro li Qefqasya dijîn wek Osetî tên binav kirin**. Eger giredaneka van hebe, dikare encamên gelek eceb jê derkevin. Alanên li Dêrsîmê di nava Kurdan de heliyane û bûne Kurd; yan jî Osetiyên li Qefqasya bi eslê xwe Kurd in? Gelê bi navê Osetî ye, ku li Qefqasan dijîn ji du êlan pêk tên: Yek Alan e ya din jî Dêgor e. Navê Dê-gor balkêşe, wek tê zanîn Gor navekî dinî yê Kurdên Zaza ye û 'dê' jî dayike. Ne dûrê ku Osetiyên zimanê Îranî yên beşa başûrê-rojhilat diaxifin Kurdên Dimilî axifên ku heliyane...

Zanyarên Tirk nivîsa yekemîn ya Tirkan wek: "Orhûn Yazitlari / nivîsên Orhûn" didin nasandin. Gorî îdea wan, tirkî zimanekî dewlemend û peyvên xwe zêde bûye... Li ser vî kevîrê li Elegeşê yê ku bingeha îdeayên Tirkan e, cara yekemîn alîmên Macar lêkolîn kirin û naveroka wî derxistin holê. Gor wan qebîla Macar ê bi navê Macar Gyarmat tekiliya xwe bi **"Min El-Kan Alp Ûrûngû yê Kurd..."** re heye.[91-3] Nivîsa Yenîsey, ji 12 rezan pêk te, kevir 320 cm dirêj û 60 cm pahne. Wek wî 32 kevirên dinê li gorîstanê hene. Ew hemû bi tirkî ne. Ew kevir yê hukumdarê Kurd-Elkan Alp-Ûrûngû ye, ku di sala 650 BÎ de miriyê. Ew kevira ji bo hukumdar hatiye daleqandin û di rêza 8 mîn de wiha tê gotin: " **Men Kurt El-Kan Alp Ûrûngû, Altûnlûx-Kesîxîm bantim belde; elîm tokuz-Kirk yaşim"**.[128-21] Kurdiya wê wiha ye: *Ez/min El-Kan Alp Ûrûngû yê Kurd im. Kemera min a zêrînî li nava min e, êlên min neh in û salên min çil e.* Li vê xelekê Rişvanoglû dibêje: Kurdên Yenîsey, bi êrîşên ji rojhilat hatine re cîhê xwe berdan, ber bi rojava, li kêleka avên mîna Îrtîş û Tobolê bi cîh bûn. Di salên 1581 an de Qazakên-Don cîhên wan îstîla kirin û xwestin ew bikin Xirîstiyan, lê ew bûn Misilman û hê jî ji neviyên wan re **"Kurdak"** tê gotin.[128-22] Bi qasî agahiyên min heye, îro ew hê jî hene lê asîmîlê bûne. Bi vê re giredayî tê gotin ku Tirkan di dîrokê de alfaba Gokturk (Orhûn), Ûygûr, **Soxd**, Suryanî, Ereb û Kirilî bi kar anîne. Alfaba Ûygûr di esasê xwe de ji alfaba Îranî ya bi navê Soxd hatibû wergirtin.[148-103] Bi vî awayî derdikevine holê ku bingeha alfaba wan Îranî ye. Yanê Ûygûrên Tirk alfaba xwe ji miletekî Arranî girtibûn û navê wê jî Soxd e. Ji bo ku di lîteratûra Tirkan de Kurd nîn in, hema hema ji sedî sed e ku ew alfabeyeka Kurdî ye. Dîsa peyva Soxd bi Saga/Saka ve jî gelek nêzîkî hevûdu ye. Kî dizane ku Soxd ne alfaba Sakayên Kurd e?

Gor Seferoglû, navê êla li ser kevirê Orhûn tê qal kirin Kurd bû. Di dêstpêka sedsala VII an de li herêma Çême Yenîsey, kraltiyeka ji "Oxûzên Şeş"

re cîran hebû. Ew Mîrîtiya pir bi hêz ji alî êlêka Sakayê bi navê "Kurd" ve hatibû damezirandin. Alfaba Gokturkan bikar dianîn. Kevirê Yenîsey û nivîsên li ser 32 goristanan bi vê alfabê hatibûn nivîsîn.[91-7] Li vir jî nivîskar bi xwe re dikevê nakokiyê û qebûl dike ku ew mîrîtiya Kurdan bû û ew nivîsa li kevir jî ji alî Kurdan ve hatiye nivîsîn. Nivîskarê rojnama Radikalê Îsmet Berkan dibêje: "Bi Serokkomar Ozal û Demirel re gelek caran çûm dewletên Tirkî. Gelek zana, lêkolîner û bavên dîroka Tirk jî bi me re diçûn. Me li Moxolîstanê koka tirkî "Yazita Orhûn" û heykelê Kul Tigin jî ziyaret kir bi şûnde guftûgoyên me li ser nijad û koka Tirk hîn zêde germ bûn. Dîsa di yekê ji van de Prof. Yûsûf Halaçoglû û gelek turkolog û arkeolog hebûn ku di **encama guftûgoyên me de herkes qanî bû ku nijadeke bi navê Tirk tunebû** balam tirkî hebû..."(2007.03.01 - Özgür Politika). Ew yeka jî dibe îtîrafa derewên dîroka fermî ya Tirkan.

Di navbera salên 898-902 an de, Oxûzan bi mutefîqên xwe Xezeran ve tevhev êrîşî Peçenekan kirin. Piraniyan Peçenekan barkirin bakûrê Derya Reş û Macaran ji wir derxistin û bûn hakimê wê deştê.[131-60] Xezer ji nijadeka Tirk-Moxol in, lê îro ew ên li Afganîstanê bi zimanê Derî diaxifin. Li vir nijada Peçenekan jî cîhê lêkolînê ye; li gorî Tirkan ew Tirk in, lê ne wiha ye. Macaran dorê salên 800 an ji Vladî Qafkas koç kirine û di nava van de Kurd jî hebûne. F. Echat dibêje: Heft êlên Macar hene. Ji yek ji wan re **Kurt-Gyarmat** dihate gotin ku ji du qebîlan pêk dihat. Li bakûrê Tûna û li Erdelê **Sekê** dijîn û di nava van de êleka bi navê Kurdan jê heye. Di belgeyên dîrokî yên Macar de heta salên 1138 û 1329 an de navê Kurdan wek Kurtu (Kurt, Kurtu) derbas dibû. Di yên 1156 an de Kurt (Kirth û Kyurta) derbas dibe.

Ascherson jî qala tiştekî nêzîkî vê dike. Dibêje; Ji hezar salî zêdetir, di navbera 700 BÎ û 300 PÎ de deşta Pontûs û beşêkî mezin ê rojhilatê başûrê Ewrûpa di destê Îraniyan de bû. Xelkê ku Grekan jê re digote "Syter-Îskît" jî ji Asya Navîn hatin û di salên 700-600 BÎ gîhîştin Derya Reş. 400 salî şûnde (200 BÎ-Ş), wexta Îskîtan bakûrê Derya Reş kirin bin kontrola xwe, êlên din ên bi zimanî Îranî deng dikirin bi erabên xwe yên şer û bi komên hespên xwe hatin. Vana ji stepên derdora Derya Kesk û Volga û xwe kirin herêma navbera başûrê Don. Grek û Îskîtan dîtin ku vana ne Îskît in û ji van re gotin **"Sarmater" (Sarmatiska Alaner /Osetîn/ Îndo-Îransk).** Vana heta Derya Reş erd ji dest Îskîtan girtin û ew ber bi platoyên Don ve ajotin. Li wir 500 salan man, heta ku Gotî û Hûn hatin. PÎ 300 an de vana xwe ber bi rojava direj kirin.[76] Tarîxa nivîsa li Elegeşê bi tarîxa Kurdan ya bi Îskîtan re li Anadol û Îranê hati dîtin hevdû digire. Vê tekiliyê N. Sevgen wiha tîne ziman: Kurd an ji koka Îskîtan in, an jî bi wan re bi hev re hatine Anadolê.[150-11] Herdû jî rast in, lê ne hemû Kurd, beşêk ji Kurdan bi Îskîtan ve yek in.

Sadî Koçaş dibêje: Kurd li rojavayê gola Baykal, dora çemê Yenisey û di zozanên li navbera çiyayên Altay û Sayan de dijiyan. **Ev ji nivîsa li ser kevirê Elegeş hatiye fêhm kirin ku ji sedî sed dewleta Kurdên Elkan (Îlhan) ê PÎ di sedsala VII de li wir hebûye.**[49]



**1300 sal berî niha, nivîsa Elegeş a bi alfaba Gokturkan hatî nivîsîn a aidê Turkên Kurd ê li keviya çemê Elegeş.**

## Nivîsa Elegeş

Hinek ji nivîskarên Tirk dibêjin ew nivîsa li ser kevirê Elegeş şîn e. Hinek jî vê dîtinê qebûl nakin û dibêjin, serokê Kurd dema derbasî ser text dibe, ji gel re axaftinekê dike û dibêje: "Êla Elkan Kurdên qehreman! dema min tûrikê tîran girêda ez xwediyê neh bajaran bûm..." Seven jî dibêje: Di nivîsên Yenîsey rêza 8 an de: "Men Kurt Îlhanî Elkan Alp-Ûrûngû, altunbug keşogîn bantim belde, êl im dokuz-kirk yaşim" tê nivîsîn û di wir de vekirî xuyaye ku li Yenîseyê bi navê Kurd zendekî Tirk î dijî ye. Zanyarê Macar, ji êlên Macar Kurd-Gyarmat ê bi ew qebîla li Yenîseye va yek dibînin. Di sedsala VI an de ewna bi Tirken Avar re û bi nava Seke-ler de hatin keviyên Tûna. Dîrokzanê

Bîzans Constantînûs VI Porphirogenetus (780-797) dema navê cîhan dinivîse wek Kurty-Germatu dinivîse.[150-5] Aydin Tanerî jî dibêje: Navê Kurd cara yekemîn di pirtûkên Gokturkên li Elegeş derbas dibe. Di nivîsa Elegeş te em wan dixwînin: Ez xanê waletê Kurd Alp Ûrûngû, tûrikê xwe yê zêrinî li nava xwe girêda, welatê min… Li vir qala êlêka Kurd tê kirin… Zanyarên Macar, êla Macaran ya bi navê Kurtgyarmata kevn bi navê êla Kurdê Elegeş ve digihînin hev. Heta dibêjin, di nava vê qebîla Macar de, qebîla Kurdê li Yenîseyê heyê.[89-11] Ew êlên Kurdên ku navê xwe derbas dibin heta Çek dirêj dibe. Li Slovakya bi Macaran re gelek Tirk (wek Kurd bixwîne-Ş) bi cîh bûn. Koka bi navê Kabare bi navê Kazarlar, Kurt, Kesik hwd.[89-11] Ji van jêderan vekirî tê fêhm kirin, ku dema Macar ber bi rojava çûn beşek Kurd jî bi wan re çûne. Wekî me gotî Alan hatin bakûrê Kurdistanê û li herêma Dêrsîmê bi cîh bûn, ji sedî sed beşekî ji wan, yanê Kurdên kirmanckî axif bi Macaran çûn û di nava wan de heliyan.




**Koça Macaran ya ber bi rojava û Alanên hatine Kurdistanê**

Eger mirov bala xwe baş bide nivîsa li ser kevirê Orhûn (Talas yaziti), tê dîtin ku vekirî qala êla Kurdê **Qereçorî** tê kirin. Qereçor bi Reşiyan ve yek in û heta dema dereng li Qefqasya jiyan. Niha jî li Kolik û Xorasnê hene. Tenê ew nivîsa îspata herî mezine ku ew Kurd in, ne Tirk. Ji bo ku lêkolîner, dîrokzanên Kurd ew nivîsa bi kûrahî nekolîne, îdeayên nûserên Tirk bê guman pejirandine û vê yekê rê li ber neheqiyên mezin vekiriye. Ji aliyê din ve Kurd bê dewlet in, saziyên wan ên mafê dîrokî biparêzin nîn in û ew jî bûye sebeb ku Tirkan çawa xwestiye bi wî awayî dîrok nivîsîne. Li ser wî esasî, belgên dîrokî tên xirab kirin û bi zanabûn şaş tên şirovekirin. Ew yeka niha aşkere bû! Lêkolînêren

Tirk jî vê dizanin û naxwazin aşkere bikin. Aşkere kirin ji bo wan jî ne hêsan e, lewra heta niha bi derewan dîrokêk hatiye avakirin û ew bi vî awayî ketiye hişên mirovan. Xirab kirina vê kes nikarê bide ber çavan. Vê yekê Ismet Berkan vekirî dide dest nîşan kirin û dibêje: "Niqta me bi Kazak û Kirgizan ve digihîne hev tenê ziman bû. Wek mînak di van serlêdanan de ez fêr bûm, ku di serî de **Nivîsên Orhûn, gelek metnên dîrokî ji tirkî re şaş hatibûn wergerandin**. Rastkirina şaşitiyê pir zahmete." Nivîsa li ser kevir wiha ye:
Otuz oxlanin vefakar arkadaşlari maymun yilinin onaltisinda
Adim Kara Çûr, yaylaximiza kar yaxdi
Alti kabilesi....bîr kuçûk kiz kardeşî (dul?) kalmiş
Kar Çûr, atim kula (rengînde) kar yaylaximiz
Kar Çûr ... dixer kardeşlerînde ayrilmiş
Oxlûnun adi Tuçayan, oglûnun adi Kar Çûr
Oxlûnun adi Sagu..... (121-161).

Kurdiya vê wiha ye:
*Di şazdê meha Meymun de, hevalên fedakar ên sîh lawikan*
***Navê min Qara Çûr e, li zozana** me berf barî*
*Şeş qebîlên xwe...xwîşkeka xwe ya biçûk (bî?) ma ye*
*Qar Çûr, hespî minî qûlê, zozana me bi berfe*
***Qar Çûr....ji birayên xwe yên din veqetiya ye***
*Navê lawê xwe **Tûçayan**, navê lawê xwe **Kar Çûr***
*Navê lawê xwe **Sagû**...*

Di vê abîdê de gelek niqtên vekirî hatine diyar kirin: Yek ewe, îro koma wek Qereçorî têyî zanîn navê xwe ji wî serokî girtiye. Hîna jî ew koma heye û bi Reşiyan ve pismamên hev in, lê mixabin gelek jî heliyan û bûn Ermen û Azerî... Niqta din ê girîng jî, vekirî tê nivîsîn ku ew ji birayên xwe yên din veqetiye. Navê kurê wî Sagu jî gelek girîng e. Bi wî awayî derdikeve holê ku ew êl yan jî federasyon-êla ku alîmên Macar qal dikin Kurdên Qereçor-Reşî ne. Bi vê yekê re giredayî di nava zimanê Reşiyên li Anadolê de jî şopa Macaran tê dîtin.

Zimanê me û yên Macaran jî jihev peyv girtine: Wek hejmarên ji deha bi şûn de têyî: Yanî, yanzdeh-devyek(11), donzdeh-devdudu(12)... tenê Kurdên li Anadolê û hinekên rojavayê Kurdistan vê sîstema dervayê gramatîka Hind-Ewrûpî (Arranî) bi kar tinîn. Di zimanê Kurdî de, ya rast ew e ku bibêje yanzdeh û donzdeh. Lê Kurdên Anadolê ew ji ku girtibûn? Di zimanê macarî û tirkî de berê deh, piştre yek yan jî dudu tê xwendin yanî wek forma Kurdên me Anadolê. Ji vir ew encama derkeve ku ew guhartina di zimanê me pêk hati de, kaniya xwe ji vir digire. Wekî din jî tenê Kurdên Anadolê ji "patatês"/ kartol re dibêjin kompîr; Macar jî dibêjin kompîr. Li navenda Anadolê dibêjin "riz", di kurdî de pirince û di Macarî de jî riz e. Di wî alî de jî bandor li ser hev

çêkirine ku ew jî bi tekilî û cîrantiya wan ve giredayî ye.

Seferoglû dibêje: Dema Macar li dora çême Don (Dentû-Mogyerîa) û di bin serokatiya "Lebedî" de bûn (îhtîmaleke mezine ku ew bi leqaba "Kundû" dihate nasîn); ji rojhilat ve bi êrîşên Peçenekan hatin herêma Dînyeper, Dînyester û Prut. Ji heft êlan pêk dihatin. Ewana: Tarjan, Yene-Gûr, Gyarmat (navestî), Kêr, Keszî, **Kurd** bûn. Kurdê li axa Çekoslowakya de bi Macaran re bi hev re bi cîh bûne. Mile bi navê Kazak, Kurd, Kesik ê, di bin navî **Kabar (Kalan?)** tên nasandin. Li Qirimê jî gundekî bi navê Kurdî heye û vana Kurdên Macar bûn (ji Josef Blaxkovîç girtiye).(91-4/13) Îro jî li Dêrsîmê êlên bi navê Kalan hene ku ti gumana min nîne ew beşekî Kabaran in. Cîhên ku îro ji Kurdên li Macarîstan mane ev in: Baç, Borsod, Heveş, Solhok, Komaron, Nograd, Nyîtra, Pojonî, Temeş ê.(91-14) Konstantîn Porfîrogenetos di sala 950 an de, di berhema xwe ya bi navê **"Dewlet"** de dibêje: 120 sal berê li bakûrê Derya Reş Macar dijîn. Gor raporên rahîban ew heft êl bûn û ya herî bi hêz zenda Kurd bûn.(128-36) Bi vî awayî hemû jêder destnîşan dikin ku komek Kurdên bi hejmarek zedê di nava van Macaran de hebûne. Lê hêjaye ku mirov hîn kûrtir vê bikole û bawer dikim gelek noqtên balkêş ên din ê derkevin holê.

Yek ji îdeologên dîroka fermî ya Tirk Seferoglû dîsa dibêje: Ilimdarên Macar, bi qasî li ser wata navê Tirkan sekinîn li ser navê Kurdan jî sekinîn, lewra; ew bi xwe jî ji Asya Navîn in û li welatê wan ne kêm be jî "Kurd" û şopa gelek berên Tirkan (naxwaze bêje Kurd-Ş) hene. Gor Macaran wata Kurd: Berfa li ser çiya mayî û zû bi zû nahelî ye.(91-1) Di vê babetê de nivîskar dixwaze Kurdan wek Tirk nîşan bide. Nivîskarên Macar aşkere li şopa Kurdan digerin, lê nivîskarê Tirk hewl dide ku vê yekê wek Tirkan nîşan bide. Ji bo, ku beşek Kurd ji Asya Navîn hatiye Macarîstan, Kurdistan û Anadolê. Yan jî demeke li Asya jiyaye. Gor mentalîta wan her kesê ji rojhilat yan jî ji Asya bêne Tirk e.

Rişvanoglû jî aliyêkî din ê dîrokî dide nîşan: Li Tannu-Tuva, berî hukumdariya Gokturkên duyemîn (681 BÎ) Kurdên koçber ên bi keriyên pêz û Yilkiyan (?) debera xwe dikirin, bi "Şeş Oxûzan" re cîran bûn. Ew Kurdên Yenîsey 650 salan BÎ xwedî dewletek **EL-KAN** bûn. Wê demê Gokturkên rojhilat di dema 620-681 an BÎ de girêdayî împaratoriya Çîn bûn.(128-21) Ew El-Kan ê ku nav derbas dibî nêzîkî peyva Xelikan/Xelkan ê ne, ne dûre ku heman êl be, lewra heta roja îro Xelikî girêdayî çanda xwe ne, ew şopa çandê bê guman ji dîroka wan ê bi nav û deng tê. Bi vê demê re giredayî di nava Kurdên li Anadoliya Navîn de, berê (1965) çirokek balkêş hebû; niha kes nizane. Orîjinala çirokê tam nizanim lê dema ez zarok bûm pîra min Ela Mamî Tozê ji min re qaldikir. Çîrok bi kurtî wiha ye: *"Kalên wan bi dujminekî bejn qût, rû spî yên naşibin mirovan û wek mirovên dinyeka din re şer dikirine. Ew mirovên ecep bi kuştinê teva nedibûne. Ji sibê de heta êvarê wan şer dikiriye û sûra wanê dixelandinê; lê sibê dema Kurd vedigerine qada şer ditîne ku ew sûrên xelandinî dîsa çêkirine û şervanên wan li cîhê xwe ne."* Min di nava rûpelên dîrokê de koka vê çîrokê peyda nekir. Gelo ew miletê ku Kurdan bi vê re şer dikir Çînî an Tirk bûn? Eger Çînî bin

gelo sûra Çîn li hember Kurdan hate çêkirin?

Wekî piraniya nûserên fermî yên dewleta Tirk, Seferoglû jî dixwaze rojê bi heriyê sîwax bike, lê xwe aşkere dike; dibêje: Di ber yan jî hema di dû Sakan de ew êla ku navê xwe li ser kevirê Elegeş hatî nîvîsin (Elxan/Xelka yan jî Qereçor), hate başûrê çiyayên Zagrosan (Îran), zimanê tirkî wenda kirin, ji farisî û erebî peyv kirin nava zimanê xwe.(91-9) Heta demên dawî îdeologên Tirk digotin kurdî zimanekî ji zimanê cîran çêbûye, ku ew dîtin jî ji heman mentalîtê derketiye. Yanê dixwazê bibêje Tirkên li Yenîsey hatin başûrê Kurdistan û bûn Kurd. Heman nivîskar dibêje: ew êla Kurd a li keviya Yenîsey hetanî sedsala VI an bawerî bi ola ezman dianîn (Zerdeştî-Ş). Di 1581-1582 an de misilmanan tekoşîn bi ser xistin û wan Kurdana jî misilmantî qebûl kirin. Navê wan ê 400 sal in têyî nasîn **"Kurdak"** bû. Sînorên dewleta Saka heta çiyayê Çîn ê bi navê Hapot, Tûna, Misir û Filîstîn diçû.(91-9) Li wir jî vekirî xuya dike ku ew hatine Zagrosan û zimanê wan jî kurdî ye. Hatina wan ê başûrê Zagrosan jî balkêşe. Gelo kîjan Kurd bûn? Kurdên Lek bûn yan jî Kurdên Celalî bûn? Em dizanin ku heta derengî Celalî (Reşî-Qereçor) li wê herêmê bûn û piştre belav bûn. Kurdên îro li dora Mereşê dijîn bi piranî ji wê herêmê hatine.

Bê guman li ser Saka dîtina bavê dîroka nivîskî Heredot girîng in, ew dibêje: Alban in (Alan?Ş) li Şîrvanê berdewamiya koka hukumdarê bi navê Afrasiyap (Kurdên Meletî di sala 1650 de digotin ew bapîrên me ne) in. Heta sala 625 a BÎ de hukumdarê Saka bû ku di dema wî de wana 28 salan desthilatdariya Asya kirin. **Afrasiyap bû hukumdarê 26 êlên Alan**. Alana pez xwedî dikirin û koçber bûn. Alan ji cîranên xwe yên rojava **Îserên** ku bavê Gurciyan in xwedî artêşeka bi hêztir bûn. Wana bi **Kaspiyên** desthiladarê Derya Kesk ve ji kokekî dihatin. Mirov li ser vê bingehê dikarê bibêje ku Kaspî-Alan û Zaza yekin û yên navê xwe danî vî Behrî jî Kurdên Dimilî axifin. 60 hezar peya û 12 hezar jî siwarî kuveta xwe hebûn. Wê demê, reqîbê Roma yê herî mezin **Arsakiyan** bûn. Koma wan a mezin li Xorasan, Îraq û Îranê bû ku paytextê xwe Hemedan e. Arsakiyên biçûk jî, ji Kaspîn bigre heta Kizilirmak, Azerbeycan, Qefqas, Gurcîstan û rojhilatê Firat desthilatdar bûn. Paytextên xwe jî di navbera Agirî, Rêvan û Qersê da bû ku li wir dewleteka pêş çekiribûn. Ev dewleta jî ji alî Pers-Sasaniyan ve hatê rûxandin.


Koçaş wana wek Kurdên Kur-Aras bi nav dike û dibêje, **ji sala 645 an ve, ku fetîha Îslam hatibû herêmê heta dema Şerafname hat nivîsandin, yanî 1597 an li welatê Aras-Kur-Aran jiyan. Neviyên Saka ji sedî sed rast e ku koçberên Kurd in.** Belazûrî, di dema fetîhên îslamê yên salên 645 an de qala Kurdên bi navê **Balasacanê** ku li Qerebaxê dijîn jî dike... Nav gelek balkeşê ku dikare bê wata Saka yên bilind... Mukaddesî jî di sala 961 an de berhemekê dinivîsîne û di wir de dibêje: Li Daxistanê, li deriyê hesin de Kurd dijîn, êlên Kurdên ku li Debilê (Divin) dijîn di malên ji kevir û kerpîçan de ne... Gorî jêderên Îslamî, Kurd ji salên 800 an şûnde li Daxistan bûn desthilatdar û yên ku bi Macaran ve çûn dora Tûna bi vanên li Qefqasan ve ji heman kokî ne.(49)

Li jor jî min nivîsîbû ku ew heman kok e. Dr. Zorab, ku li ser lêkolîneyên xwe 'di wêjeya Macaran de Kurd', tê nasîn, di kovara Hîwa hj. 33 an de dibêje: 1100 sal in ku gelê Macar li Awrûpa dijî. Di sedsala IX an de komên Macar ji Asya, bi rêya Qefqas û Rûsiyê tên Awrûpa. Di sala 1001 an de kralê Macaran ola Xaçparêziyê dipejirîne. Dibêjin ku berê bi Kurdan ve di heman baweriye de bûn.

Heredot qala bûyerêka din jî dike, lê çiqas rastê ew nayê zanîn: Îskîtan êrîşî Medan kiribû, rê li gelek şeran vekiribûn û 28 salan li Medya hukumdarî ajotibûn. Piştî ew vegerîn welatê xwe artêşekê riya wan girt. Artêşeka ne hêz kêm bû. Jinên Îskîtan ditin ku mêren wan venegerîn û bi koleyên xwe re ketibûn nav tekiliyan û zarok ji wan çêbûbûn. Îskît koçber in, erdê najon. Bi ajelan re mijûl in. Şîr didoşin, berdidin fiçiyan û bi kolên xwe hatinî korkirin didin kutandin; şîrê li jor mayî heytinin ku gor wan şîrê herî baş ewe.[84-193] Heta demên dereng di nava Kurdên li Anadoliya Navîn de jî ew fiçî hebûn û pê rûnê kayî dikirin. Mast dikirin fiçiyan û dikutan, ewe li jor mayî rûne, yê din jî dew e. Lê eger ew şîr be encam tê guhartin... Ew zarokên li kolanan hatine dinê, ji çiyayên Qirim (Tauris) heta Derya Azak (Palus-Maîotîs) erx kolan û bi Îskîtan re şer kirin.[84-193] Eger ew serpêhatiya rast be, di nava Sakan de kêm be jî, mirov tevlîbûna nijadên din jî dibîne. Eger mirov di vê niqtê de kûr bifikirê dibîne, ku ji alî fizyolojî ve di navbera Macar û Kurdan de hevbeşiyek jî heye... Serpêhatiyeka din jî heye ku wiha tê gotin: Piştî şerê Thermodon, Amazonên girtî kirin sê keştiyan, derketin nava deryayê. Di deryayê de Amazonan mêr hemû kuştin û bûn xwedî keştiyan lê nedizanîn vana bi rêva bibin û tesedûf hatin nav axa Îskîtên Azad. Xortên Îskît ew nîvro digirtin û vê re diman. Paşe bihevre zewicîn, jinan xort heynan, di Don re derbas kirin û bi riya sê rojan bi şunde hatin welatê xwe.[84-223]

Wekî dîroknûs radigîhînin di têkiliya Saka û Medan de jî carna şer carna hevkarî bi pêşdikeve, di beşa Medan de jî min nivîsandibû, ku di serdema Diyako de li hember Asûr hevkariya wan xuya dike. Lê dema Saka di sala 625 an BÎ de ketin dû Kîmmeran jî em şerê Med û Sakan dibînin. Bi dîtina min, di navbera dîroknûsan de ji bo vê demê nakokî hene û zelal kirin jî karê dîroknasan e. Piştî xanewa Medan hilweşî û xanewa Pars hate ser text, di nava Saka û wan de aştî jî holê radibe û bi piranî bihevre şer dikin. Yek ji hêza desthilatdariya Farisan qebûl nekirî jî ew beşa Kurda ye. Diyar e, ku ew ji Kurdistanê jî bi temamî derketine û li bakûrê Derya Reş û Asya belav bûne. Gor bîr û baweriya min ew demeka girînge ji bo Kurdên îro li deryayê welat dijîn. Eger têne ew beş bê lêkolîn kirin, bawerim gelek niqtên tarî dê bên zelal kirin. Ji ber stûxwarnekirina Sakan kral Dara (BÎ 521-486) piştî Babîl heyna, êrîşî ser Saka kir. Di vir de nayê wê watê ku beşên din ê Kurd ne bi Dara re bûn. Ji alî din ve, Asya pir pêşketî bû; di nava dewlemendiyê de bû û nufûsa wê pir bû.[84-193] Lewra di nivîsên Dara û kurê wî Xerxes (Husrev) de navê Saka wek **Tîgraxauda** yanê kesên kumên xwe tûj, dihate gotin.[94-292] Bê guman ew

jî terîf kirineka di cîh de ye û heta serdema dereng kalên Kurdan jî kumê xwe tûj bûn.



Îskît (148-75)

Ji ber vê asîbûyîn, girêdana çand, netew û ola xwe ew wek Kurd jiyan û ji Pers re jî serî dananîn. Bi vê taybetmendiya xwe ya serî netewînî jî mohra xwe li dîrokê dan. Ji ber wan sedemên ku gelek dîrokzan dibêjin, piştî Medan, mirasa Aryen a duyemîn a mezin ji alî **Saka-Sarmato-Alan** an ve ma û bandoreka mezin ji xwe bi şûnde hîşt.[154-81] Beşkirina mîna Saka, Sarmat û Alan jî watedar e; bi dîtina min ew hersê zarava axifên kurdî nîşan didin. Dîsa Saka gelek nav ji xwe bi şûnde hîştine. Wek mînak: Saqiz, Sakawand, Sarmî, Ardalan, Memê Alan ji wan de mane. Ji Aryenê **Sagartyan** bi grubên mezin li navbera Hewler û Nîhawendê bi cîh bûn. Dîroknivîsê Yûnan-Roma Flavius Arrian dinivîse ku di sala 134 an PÎ de Kurdistan du caran ji alî Alanan ve hate dagirkirin.[154-81] Îro em baş nizanin ku ew Sagartyana kalên Kurmancên Reşî-Qereçor (Celalî) in an na? Ew îhtîmala heye. Lê dibe ku zarava axifê din ên mîna Leran û Dimiliyan jî bin. Doç. Yilmazçelik, hewl dide wek Tirk nîşan bide jî niqteyeka pir girîng dest nîşan dike: Zazayê giredayî Sakan yên bi navê Sabûr ku proto-Tirk in, ji Asya Navîn veqetiyane hatine li hawza yên Dîclê û Firat bi cîh bûn. Pênc hezar sal BÎ ji Asya Navîn veqetiyan û li Anadolê bi cîh bûn.[116-5] Ji vir em dizanin ku Kurdên Dimilî ji sedî sed giredayî Sakan e û wê demê navê wan **Sabûr** bûye. Sabûr jî ji alî nûseran ve wek: Sarmet –Sarmatya, Saûromatên cûda têne nivîsîn.

Aschersonê bi salan li bakûrê Derya Reş lêkolîn kirî jî agahiyan dide: 400 sal BÎ êlên **Saka** (jî gelê Hînd-Îranî ne) û kesên li Mezopotamya rûdiniştinî yên hov li serê Atenê bûn bela û dijberê Atenê bûn. Lê dorê salên 200 an BÎ de, rewşa Sakan ber bi xeravbûnê çû. Sedema vê yekê jî **Sarmet** bûn. Sarmetê di stêpen navbera çêmê Don û Volga de niştecîh, ku ew jî xelkekî Hînd-Ewrûpî bûn û bi sîstema êlan dijîn. Dema bi hemû hêza xwe ber bi rojava ketin tevgere rewşa Sakan xirav kirin. Tiştên din ê balkeş jî ev e, ku di gorên jinên Sarmet de şûr, tîr û alavên dinê derketi bûn. Kralîçe jî li dora çemê Don hatibû veşartin. Li ser sûsên wê de îbadetxanê, şato û heykelekî li Îran wek sembol dihatî nasîn jî hebûn. Ji zêr fîgurên mirov û ajelan hebûn.[76] Ji materyalên derketî jî xuyaye ku ew xelkekî pro-Kurd in. Wekî min li jor jî nivîsî Sarmet îhtîmaleka pir mezine ku Kurdên Zaza bin. Ewên li Macar îro asîmîle bûne û yên Heredot qal dike li Tûna û Enet ê jî ew in. Niqteyeka din jî heye ku pêwîste mirov binivîse, her çiqas îdeayek be jî, gor dîtina min, xelkên li Qefqasê ji koka Arî, Zaza û Lek ên ku asîmîlê bûne ne... Wek mînak Asetî/Osetî îro wek xelkekî cûda xuya dikin, lê bi dîtina min ew êlên Zaza yên ku hatine asîmîle kirin in...

Yek ji wan gelê li Qefqasan dijî jî **Çerkez in**. Bi dehan salan bi Kurdan re şer û cîrantî kirine. Di pirtûka li ser dîroka wan hatî nivîsî de wiha tê nivîsîn: Osetî û Lak-an ji grubên Çerkezan têne qebûl kirinê û zimanê Hînt-Ewrûpa bi kar tînin.[62] Gor wan Lak ji koma Çerkezan tê ne; di vir de pirsgirêkekê heye: gelo Lak û Lek yek e yan jî xelkek e? Lek wek em dizanin li coxrafyeka pir fireh belav bûne: Li her qûncikê Anadolê, li başûrê Derya Kesk, Loristan, Cezayir, Kurdistan û Anadoliya Navîn... Li ser vê bingehê, mirov dikare bêje ku yan

ew têza ne raste, yan jî Çerkez ji Kurdên Lor in! Lê Lek eger Çerkez biyana wê çaxê di nava Kurmancan de hînbûna wanê Lorî ne mumkun bû... Em ji wan berdewam bikin: Tê qebûl kirin ku Osetiyan nûnertiya qewma di dîroke de ya bi nav deng û mezin Alan an dikirine. Asetî Alanên dawî ne, yanê ê baqî ne. Alan, 100 sal BÎ hatin Qefqasya û ji ber zordariya Hûnan di salên 370-375 an PÎ de ber bi rojava koç kirin. Zimanê Alanan koka xwe ji Sarmetanê ku ji bêşa Îranî yê rojhilat digirin. Paytextê Osetiyên başûr Sinvalî bû ku giredayî Gurcîstanê ye.[62] Me berê jî gotibû ku Alan Zaza ne û îro jî li Dêrsîmê dijîn. Vê demê mirov dikare bibêje ku Kurdên Dimilî û Lek bi hev re di bin konfederasyonekê de dijîn? Ew yeka jî mumkune lê dibe ku nivîskarên xwedî vê îdeayê jî di nava nakokî û şaşîtiyan de bin. Mumkune ku ew ferqa Dimilî û Lek an jî nizanine. Lê çi dibe bila bibe di vir de nêzîkatiyeka Alan, Ler-Lek, Zaza, Asetî û Sarmetanê heye. Sarmet û Lek dikare bibe grûbek (Lor); Zaza, Alan, Asetî jî koma Dimilî diaxif û zimanê herdûyan jî ji xwe grûbek e...

Ew xelkê ku Kurd ji cîhê wan î li Asya veguhurandî Hûn in. Gor dîrok nivîsarên Tirk wexta li Asya dewleta Hûn a Bakûr hilweşiya bi şûnde, Hûn li destpêkê hatin herêma gola Aral, piştre hatin navbera Volga û Ûral; di nava sedsala IV de dîsa ber bi rojava koçberbûn. Vana, **xaka Alana ye di navbera Aral û Xezer de**, ji dest girtin.[148-79] Di vê demê de Alan li dora Gola Aral û derya Kesk de dijîn, ku ew girîng e; yanê Dimilî di salên 370 an PÎ de li vê herême bûne. Di dema Alp Arslan de jî hinek mayînde Kurd li rojhilatê Derya Kesk tên dîtin ku emê paşê li ser wan rawestin. Berî vê pêwîste em qala pirtûka xanedanê Hîvê Ebûlgazî Bahadir Xan bikin. Di sala 1641 an de, di pirtûka bi navê "Secereî Terakîma" de, dinivîse ku: Li Ulu Balkan û Qiçî Balkan Turkmenê Enşarî (wek Kurdên Ensarî bixwîne) dijîn û di nava wan de zendekî Kurdî bi navê Xizir Elî dide nasandin. Yekê jî, em kurmancan, bi Tirk, Goran û Xeleçan ve tevhev dibînin. Wek tê zanîn ji 24 êlên Oxûzan du heb ji Xeleçan pêk hatine.[128-25] Hebûna Kurdan ya li wir bi vî awî jî tê îspatkirin, lê aliyê ku ew pirtûk bi me dide xuyakirin yek jî ewe, ku qala Xizir heye. Wek tê zanîn ew Kurdên li derva, bi taybetî jî yên Dêrsîmê bi xizir radibin û bi xizir rûdinin ku ew ji alî olî ve jî girîng e. Ew Kurdên (Alan) ji vê herêmê yên ku ji ber Hûnan reviyane, ji çiyayên Qefqasan derbasbûn û ber bi bakûrê Kurdistanê hatin. Heta mirov dikare vê yekê jî bibêje ku Hûnên ku heta Çûqûrovê hatine, mumkune ketibin dû şopa Alanan. Nivîskarê Tirk Kara wiha berdewam dike: Hûn di bin fermandariya Balamîr de di sala 375 an de ber bi Ewrûpa çûn. Di heman demê de li bakûrê Derya Reş qewmên Germenên mîna Gotî, Gepît, Vandal dijîn. Li heman herêman qewmen Germenên rojhilat ên mîna Slav û hinekê ji kokê Îranî dijîn. Bi vî awî Hûnan ew qewmanan derbasî tevgerê kirin û yekî yek ji cîhe xwe avêt.[148-79] Di cîh guhartina wan qewman de jî xuyaye, ku ew miletên ji Asya hatine di dîroka mirovahiyê de bûne sedem ku gelek xelk ji cîhê xwe veqetin û belav bibin.

Di fîlma bi navê **"Atîlla-Lehengê Gelê Şervan"** a ji alî Gerard Bûtler,

Sîmmone Jade Mackinnon (navê di fîlm de: **N'Kara** ye) û di rejîsoriya Jane Robînson de hatî çêkirin de Hûn, wekî Sakan xuyadikin û wekî wan dijîn. Eger çîroka wî fîlmî rast be, we demê mirov dikare bibêje ku Hûn yek ji zendê Saka ye. Di alî kinc, stîla jiyanê, koçberî, xanî-konan de û di alî yasayên civakî de Hûn bi temamî wek Saka ne. Heta N'Kara ku navê wê jî balkêşe, **baweriyê bi agir tîne**; koda ku tê de agir vêdixe bi alavên baweriya Saka yê ku ji kolîneyan derketî ve yek e...



**Çanda Saka Zerdeştî**

Li ser hatina Alanan ya ji Asya bê pejirandin, belga ku li gundê Şarik hatî dîtin gelek girîng e. Di secera li gundê Şarik de hatî dîtin de dinivîse ku Alan ji herêma Buxdan/Burkent hatine Kurdistanê. Deguîgnes dibêje, li Turkîstanê bajarêkî bi navê Alanî heye. Ji deştên Sarmatya heta Hîndîstan û li çiyayên keviyê çême Ganî ew belav dibin û **ji wan re di wata çiyayî de Alan** tê gotin.[128-154] Ji van dîtin û belgana jî diyar e, ku Alan yan jî bi navekî din Kurdên Dimilî yê wê demê li Asya bûne û yekbûna Zaza bi Sarmatan ve li vir jî tê testîq kirin. Li bakûrê Kurdistanê li herêma Dêrsîmê jî gelek gund û cîh hene ku bi Alan hatine binav kirin. Heta navê gundê bavê Seyîd Riza jî Alan e.

Dema Îskenderê Mekadonî êrîşî welatê Med û Persan kir, tê dîtin ku Saka dîsa li cem hemwelatiyê xwe ne. Ew jî qerektereka Kurdan ya ku dema hemwelatiyê wan di tengasiyê de bin, her tiştekî ji bîr dikin û dibezin alîkariya wan dikin. Ji bo vê demê nivîskar Aslier wiha dinivîse: Di sala 331 an BÎ de, di navbera Îskenderê Mekedonî û Dara de şer çêdibûn. Di şerê vê salê yê li Babîlê pêk hatî de, nêzîkî 245 hezar eskerên Pers hebûn ku ji wana 45 hezar siwarî bûn. Di nava van siwariyan de, bi taybetî jî Saka û Bextiyarî hebûn, ji deştên Asya Navîn hatibûn û xelk gelek ji wan ditirsî.[185-42] Ji vê jêderê jî em dîsa dibinîn ku vê demê Bextiyarî yê Lor jî li Asya bû ne. Stîla jiyana Bextiyarî û Kurdên îro li Anadol û dervayê welat gelek dişibine hevûdû. Heta mirov dikare bibêje ku di alî kinc û rengên kincan de jî gelek nêzîkî hev in. Carna mirov nikare ji hev veqetîne. Şervaniya wan li vir jî deng daye. Lê serhildana Bextiyariyan li hemberî kralê Persan balkêş e; serokê eyelata Bextiyarî Besso

li hember Dara serî hilda û ew kuşt. Îskender jî Besso kuşt.[185-45] Ne dûre ku li ser taktîka şer lihev nekiribin yan jî Dara sozên danî nanîn cîh ji bo wê hatibê kuştin. Ew yeka di filmê "Îskender" de jî tê dîtin, lê sedem nayê dest nîşan kirin.

Edet û sîstema rêvebiriya Saka bi ya Kurdên li dervayê welat ve gelek dişibîne hev. Wextê kralêkî Sakan dimir, ji wî re goreke kûr dikolan, paşê ew krem dikirin û di nava hemû êlan re derbas dikirin. Xelkê rûyên xwe duriçikandin, porê xwe dişêqandin, pî, enî, pozê xwe dibirîn û hesinek di destî xwe yî çêpe re derbas dikirin.[153-16] Her çiqas ew tevgerana di nava hemû civakên êlan de heye jî, Kurdên Anadolê heta salên dawî ew hereketana dikirin.

Navê kralên Saka jî balkêş in û bi kurdî ne. Hinek kralên wan navê xwe wiha ne: **Arîantas, Arîapeîthes, Madyas, Opoîa, Taxahîs e. Ar-îantas û Ar-îa-peîtethes** bi agir ve giredayî ne û yê dawî jî hem agir e û hem jî pêtî ye. Wekheviya wan navana bi forma navê Erîvan û Azerbeycanê yê kevn ve jî dişibine hev.

Wekî me berê jî gote, civaka Sakan ji êlan pêk dihat, vana bi rêya serokêlan bi hev re yekîtî û rêvebirî avakiribûn.[153-17] Ew sîstem heta derengî li cem Kurdên Anadolê jî hê zindî bû, ku sîstemeka demokratîk e jî. Her êl nûneriya xwe dibîne û dibe xwedî gotin. Êl yan jî berên Sakan jî mirov dikare wiha rêz bike, lê ew ne ji sedî sed in. Yekê jî, Heredot vana wek berên cîranê Sakan dinivîse; lê di dizîna dawiya pirtûkê de wek berên Îskîtan tê nîşan dayîn: Agathyrs-Îskîtên Ewrûpa (li cem wan, jin malê herkesî ye), Amyrgîa, Getaî, Halîzon (başûrê Rûsya), Hyperbore, Îyrkaî, Kallîpîdaî, Katîarî, Massaget-Aral, Melankhlen (vana reş lixwe dikin), Naûrî, Oneat, Paralataî, Saûramat û Thyssaget in.[84-220] Budîn-Gelon jî miletekî por sor in û eslê wan Yewnan e. Paşê Budînî tevlî wan dibin û zimanekî tevlîhev bi kar tînin.[84-221]

Li dinê xaliça herî kevn jî ji alî Saka ve hatiye çêkirin. Ew jî, bi jiyana wan ê bi pez re têkildar e. Ew gela hemû deman xwedî pez bûye û di nava wan de çanda pez pir kur û fireh e. Dîsa ji Kurdan bêtir ti netewên din hêst û evîne xwe li ser xaliyan neqiş nekirine. Yek ji wan xalîça li Pazirik-Rûsya derket, mînakeka baş a ji kêla Arranî ye, ku di cîhanê de ya herî kevn e. Meyîtê/Laşê mirovayê ji Pazirikê derketî piranî wek Ewrûpî ne, lê mirovên Îndo-Ewrûpayî û Mongolî jî peyda dibin.

Nivîskarên Swêd balê dikşînin ser niqteka din ê girîng û dibêjin: **Sakan, diyalektên Îranî yên cûda diaxivîn. Tekiliya wan bi çanda Derya Spî re jî hebû.**[153-21] Diyalektên cûda jî îdea me ya ku Saka ji Zaza, Kurmanc, Lor û Belûcan pêk dihatin bi hêztir dike. Seferoglû dibêje, **zimanê Saka yên ku 700 sal BÎ hatine Rojhilata Navîn bi yên Kurdên li Yenîsey ve dişibiya hevûdû.**[91-9] Tekiliya wan bi çanda Derya Spî jî dide xuyakirin ku ew xelka bi eslê xwe ji vê herêmê ye. Bi taybetî jî Xorrî li vir niştecîh bûn û piştre ji ber êrîşan ber bi rojhilat û rojhilatê bakûr ve çûbûn.

# TÛR-TÛRAN Û SEDE-SÎNSÎNKO

Di beşa Kurd û Macaran de jî min qala îdea yên dîroknivîsê Tirk kiribû. Gor wan: Saka yên Qefqas derbaskirine û heta Filîstîn çûne rêberê xwe Alp Er Tunga ye. Tekoşîna wî serokî bi kralê Fars Kûroş ê II an ve bûbû babeta destanan. Fîrdewsî vê wek tekoşîna Îran-Tûran dineqişîne.(148-74) Gelo ew îdea raste? Emê vê yekê ji nêzik ve bikolin û bingeha lêkolîna min jî bê guman Fîrdewsî ye.

Ewên Tirkan baş tahlîl dikin û nasdikin mentalîta wanê dîrokî jî dizanin. Ew dibêjin; em neteweki **Tûranî** ne; yanê eslê xwe bi Tûran ve girêdidin. Nijatperestên wan jî heta demên dawî, digotin emê îdeolojiya Tûranî pêk bînin. Armanca wê jî ewe: sînorê dewletê heta Tirkek li ku dijiye fireh kirin bû. Tûran welatê wan e û sînorên wî jî, ji Îranê destpêdike heta Derya Adriyatîk... Gelo rastiya Tûran çi ye? Wekî dîroknivîsê Tirk Kara dibêje, tekoşîna di navbera Alp Er Tûnga yê Tirk bi kralê Îran Kûroşê II an de ye?

Fîrdewsî, pirtûka xwe bi navê **Şahname** di salên 1010 an de (80 salî bû) teva kir. Îhtîmaleka pir mezine ku ew li dora bajarê Tûs hatiye dinê. Tûs bajarêkî Kurdan yê kevn e. Gor ew dibêje, ji mezinan, serpêhatî û çirokên wê demê sûd wergirtiye ew pirtûka dîrokî nivîsiye. Şahname li Xorasan û Îraqê gelek nêzîkayî dît û hê jî ji gelek lêkolîneran re dibe kaniyeka dîrokî. Fîrdewsî wiha dinivîsîne: Kralê yekemîn ê Ecem Kiyûmersê ku gor rîwayetê tê qal kirin wiha ye. Ew, li destpêke di nava çiyayan de rûdinişt... Wî şaristanî anî nav însanan.(86-24) Diyare ku miletê Arran ji ber dijminan xwe avêtiye nava çiyan û demeke dirêj li cîhê asê jiyaye. Lê piştî hesin bi kar anîn edî ew dadikevine qada şer û dewletê fireh dikin. Li ser vê Fîrdewsî wiha dibêje: Di serdema torinê wî Hûşeng de, ji nava keviran hesin hat derxistin, ji wî kêr, tevşo û bivir hatin çêkirin. Hesin li kevir xist û agir derket û cejna **SEDE** ji vê demê tê û agir bû qîble.(86-32) Cejna Sede ji bo me di du xalan de girîng e. Yek: Ji bo ku ew bûye qîbla miletê Arran, divê dîroka vê gelek kevn be. Ya duyemîn jî, giredana vê bi cejna di nav Kurdên dervayê Welat de ye. Kurdên îro li Anadolê dijîn berê Newroz nedizanîn! Li cîhê vê qala **"Sîn-Sînko"** dikin. Mezinan berê digot em Sîn-sînko dilîstîn. Lîstik jî wek Newrozê ye. Yanê agirekî mezin dadidan û di dora agir re govendê digirtine; xwe di ser de hil kirine û raserê hevdû dikirine. Gelo ew cejna Hûşeng Sede bi Sin-sînko ve ne yek in? Wek nav gelek nêzîkî hevdû ye. Cografya ku texmînî lê pêk hatî jî cografya ew Kurdên Anadolê jê hatine û ji bo ku Kurdên li derva dijîn tekiliya xwe zêde bi yên li Kurdistanê niştecîh re jî tunebû ew Sede bû cejna wan ê netewî. Yekê jî, ew di demeka pir kevn de pêk hatiye, îhtîmaleka mezine ku formata vê ye kevn ew be. Cûdahiya zimanê Farisî jî faktoreka ku mirov li ber çav bigre. Gor ditina min ew cejna Sede bi Sîn-Sînko ve yek in û yekê jî kî dizane ku forma yekemîn a Newrozê ne Sed e? Yane, li destpêka dîroka Arran Sede hebû, piştre ji zilim rizgarbûna miletê Arran de Newroz derket holê. Ji bo ku Kurd beşek li derva bû, Newroz

di nava wan de wek Newroza rizgarbûne cîh negirt...

Kurê Hûşeng, Tahmûrs nivîs fêr bû: ew fêrî rûmî, erebî û farisî kirin...[86-32] Fêrkirina rûmî û erebî mirov fêhm dike, lê çima farisî? Gelo ew ne Faris bû? Ji vê tespîtê tê fêhm kirin ku ew koka ne ji nijada Farisan e.

Fîrdewsî babeteka din a balkêş jî dinivîse û dibêje: Artêşa Tahmûrs hemû bi cilên reş bû.[86-32] Wekî me di beşa Xorriyan û Medan de jî qal kire; ji Xorriyên dora Helebê re Çûxreşî digotin û gelê bi navê Reşan ji navenda Xorasanê alîkarî dabûn Medan. Çûxreşî tê wata ewên ku cilên xwe reş in! Artêşa Tahmûrs jî bi cilên reş bû ye, gelo ew temamî teseduf e? Eger em bînin bîra xwe, dema Heredot berên yan jî cîranê Sakan dinivîsand qala Melankhlen reş lixwedikin kiribû.[84-220] Ji ber wan îşaretana dîtina min ewe, ku pêwîste tekiliyeka Çûxreşî, Reşan, Saka û artêşa Tahmûrs hebe...

Kurê Tahmûrs, Cemşîd jî zirx çêkirin û xelk wek çîna rûhban (Katûziyan), artêş (Nisarêyan) û gundî (Nesûdî) kire beş. Bûyera Kawa, Dehaq û Newrozê di dema wî de ye. Xelk ji Cemşîd nerazî bû, esker yek û yek ji Îranê derketin. Siwariyên Arranî yên ku ji xwe re li padîşahekî digeriyan, çûn ba Dehaq û ew wek kral anîn ser textê Îran. Kesên ji ber marên di mile wî de derketine, reviyan çiya û Kurd ji wan peyda bûn.[86-40/54] Ev babet gelek girîng e û di hûndirê xwe de gelek tiştan vedişêre. Yekemîn derdikeve holê ku Sedê berî Newrozê ye; lewra bûyera Kawa piştî Sedê pêk hatiye. Ya din jî xelk ji Cemşîd nerazî bûye û ew ji welatê xwe derketine û piştre jî serhildanê pêk anînê..

Ji sûlala Tahmûrs yekî bi navê Abtîn anîn ser text. Ji wî jî Ferîdûn ket. Ferîdûn, berê çû dora Dicle, paşe çû ser Beytûlmukaddes (Kudûs). **Ji Ferîdûn re sê lawik bûn: navê wan Selm, Tûr û Îreç** bûn. Paşe Ferîdûn dewleta xwe di nav hersê lawên xwe de wiha parve kir: welatê **Rûm û rojava da Selm; welatê Tûran da Tûr û ew kire padîşahê Çîn û Tirkan; welatê Îran û Erebîstan jî da lawê xwe yî biçûk Îreç.**[86-120] Gor vê jêdere aşkereye ku kralê Arran sê kurên xwe hebûne û yek ji wan jî Tûr ê ku beşa welatê rojhilatê daye wî. Navê welatê rojhilatê ji navê kralê wir Tûr tê û ji bo vê gotine Tûran. Ku ew di nava Kurdan de gelek normale. Yan jî, ewên girêdayî wî û ew xelkên ku ew jê berpirsiyar re gotinê Tûranî. Di vir de navê miletekî yan jî nijadekî qetî derbas nabe. Di cîlde duyemîn de jî wiha tê gotin: Gor vê biryarê, ji Ceyhûn heta sînorên Tûr û ji wir jî heta Çîn û Hoten ê dan miletê Tûran. Lê di Şehnama li Afganîstanê hatî çapkirin (1361-Delwa) de dibêje dan Tûraniyan û ti qala miletê Tûran nake.[187-14] Wextê tê tercûme kirin bi zanistî yan jî bi nezanî ew şaş tê tercûmekirin. Bi kurtî: Tûranî ne miletê Tirk e. Ew miletê di bin desthiladariya Tûr de ji gîştikan re Tûranî hatiye gotin ku din nava wan de Çînî, Kurd, Tirk, Tacik, Belûc û miletên din jî hene. Vê demê îdeaya nivîskarên Tirk şaşe.

Piştre, kralê Tûraniyan Efrasiyab ji kralê Îraniyan Keykûbad re namekê dinivîsîne û wiha dibêje: "Ew Yezdan bila rehmetê bide Ferîdûnê ku nijada me jê hatî.[187-64] Eger ew kralê Tûraniyan wek îdea dibe Tirk bûya, çawa dikaribû ji kiralê Arran re binivîse û bibêje Xwedê rehmetê bide kralê nijada me Ferîdûn?

Di rûpelê 278 an de jî wiha dibêje: " Şahê Tûran zemîn" (çapa li Afganîstan rûpel 102) lê di wergera Tirkî de tê gotin ku Padîşahê Welatê Tirk.(187-278) Li vir jî vekirî hatiye nivîsîn ku kralê erd-zemînê Tûran, nabêje miletê Tûran. Di rûpela 309 an de jî: "Ji wî welatî bi vir ve pir ferq nîne, yanê Semengan, Tûran û Îran hemû yek tên hesibandin.(187-309)

Paşe di navbera her sê birayan de şer dest pêdike û Tûr serê Îreç jêdike. Ew şerê nav xweyî gelek salan dom dike û di dawî de torinê Îreç Minûçîhr xeber werdigire ku artêşa Selm û Tûr ji çemê Ceyhûn derbasbûne û têne şer. Mînûçîhr herdû apê xwe dikuje. Di esas de ew şerê Kurd û Kurd-Persan e. Gor dîtina min **ew qewma ya ji Tûr mane, Kurdên îro li dervayê welat dijîn in**. Ew bi îdea Kara yê ku dibêje Saka ji ber Îraniyan revîn û heta Filîstînê belav bûn ve jî hevûdû digire. Heta peyva **Tûr-k-men** jî ji wir derdikeve... Di navenda van (Tûranî) de jî konfederasyona Reşan, Cilreşan û Reşiyan hene. Li jor me got ku Saka kalê Kurdên li dervayê welat in, bi xelkê Tûr ve heman xelk in. Li vê demê Kurdên girêdayî Tûr ji bira û pismamên xwe yên din vediqetin û ber bi bakûr û bakûrê rojava hildikişin. Hinek nivîskarên rojava jî li ser Tûraniyan dîtinên balkêş tînin ziman ku yek ji wana Nybergê dibêje: Navên koma ku Tûran (Tirk) têyî hesibandin hemû Îranî ne, bi vî awayî dema Avesta dihate nivîsîn, Tûra (mebesta nivîskar Tûranî ne) kalên Aryaniyên derbasî Îranê bûne. Chrîstensen dibêje: Gotina "Tûra" Îranî bibe jî nebe jî, ji sedî sed êlên koçber tarîf dike û Aryanî ye.(71-188) **Aryanan xaka Turkmenîstana îro bi carekê re terk nekirin. Ewên hatine Îranê û bi cîh bûne, ji yên ku nehatine re gotin "Tûr"** û va ya bi Mit e kê (efsaneyekê) xemilandin. Digotin Kawa mîrnîşîna xwe di nav sê kurên xwe de parve kiriye: Li gor vê Sarîma da rojava, Tûrya da rojhilat û Arya jî da navendê. Dema tu li vê dinêrî Tûra bi Mazanan (Mazenderan) ve dû êlên Aryayî bûn û nêzîkî hev rûdiniştin. Beşek ji wan di dema Zerdeşt de li Asya Navîn hîna jî aktîv bûn.(71-190) Bele ewên nehatine re piştre gotin Turkmen. Yanê wek Turkan man.

Wek tê zanîn nivîskarê cara yekemîn îdea kiribû ku: nijada Kurd ji qewmê Îranî ye, ji kesên ji ber Dehaq reviyabûn çiyan peyda bûne, Fîrdewsî ye. Gelek nivîskar û lêkolîneran jî ew dîtin ji wî wergirtine û bê şik bikar anîne. Bê guman, eger Fîrdewsî zilma li ser Kurdan qest kiriye û zilimkar di şexsê Dehaq de sembolîze kiriye xerê raste. Eger dîroka Kurdan digihîjîne vê demê tene xerê ewî ji zanistiya dîrokî mahrum bu yê. Yêk jî nivîskarê ku ew îdea Fîrdewsî wergirtî jî Şerefxanê Kurd, wiha dinivîse:

Kurd, ji nesla wan însanan in ku ji bo çareserkirina birîna ser herdu milên Dehhaq (Biwrasp) serên wan dihatin jêkirin û mêjiyên wan dihatin derxistin û li wan birînan dihatin pêçan, vêca ji ber rizgarbûna ji serbirîn, kuştin û qirkirinê yên derketine serê çiyayên bilind û asê ne. Dehhaqê (Zehaq) Maran ku pêncemîn padîşahê Pêşdadiyan (Bişdadî) bûye, li ciyê Cemşîd li ser textê Îran û Tûranê rûniştiye û dest daniyê ser piraniya cîhanê, kesekî bê merhemet bûye... Zana şairêkî zîrek wiha dibêje:

*"Ku Cemşîd rewan bû berew goreşar*
*bi zor hate ciyê wî ejderhayekî gemar*
*Qederê, xwest ji axa heft îklîman*
*Serî bitewînin li ber Dehhaqê wekî Şeddad..."* (157-61)

Di wir de niqta herî girîng ew e, ku Cemşîd li ser textê Îran û Tûranê rûniştiye û qederê, xwest ji axa heft îklîman... e. Di vê helbestê de jî xuyaye ku wê çaxê sînorê dewleta Arranê li coxrafyeka heft îklîman belav dibû ye. Sînor û kewşenê welatê Kurdan ji Derya Hurmuzê destpêdike heta Meletî û Mereşê, Welatê Faris, Iraq, Ezerbeycan, Ermenîstana Biçûk û ya Mezin, Îraqa Ereb, Mûsil û Amed dibin başûrê vî sinorê han.(157-63) Hinek êlên Kurdan ketin aliyê Mûsil û Şamê, ên wekî Dasnê, Xaldî, Besnayî, birek ji Mehmûdî û Dunbuliyan Êzdî ne. Kurdên din bi piranî sunnî û li ser şopa îmamê Şafîî ne.(157-64)

Ji pirtûka ku Fîrdewsî nivîsî em li ser Rûstemê Zal jî agahdar dibin. Li ser jiyana wî gelek niqteyên balkêş derdikeve pêş ku ew lehengê bi nav û deng bi giştî di nav miletê Arran, bi taybetî jî di nav Kurdên li derva de pir bi nav û denge. Gelek taybetmendiya çiroka wî di nava çîrokan de heta roja îro di nava Kurdên Anadolê de zindî ne. Fîrdewsî wiha dinivîse: Sam lawekî xwe yê mîna zarokên şeytan tê dine, pirça canê wî hemû spî bû, çavên wî reş bûn. Xwestin wî lawikî ji holê rakin û birin ser çiyayên Elbruz (gor Fîrdewsî ew çiya di navbera Hîndîstan û Îranê de ye. Lê di esas de ew ne çiyakî bi tene ye: Ji başûrê Derya Xezer destpêdike heta bakûrê Îranê direj dibe). Li wir çûka bi navê Sîmûrg hebû. Tê nivîsîn ku deng hate guhê Sîmûrg ku digot: "Çûka pakij a pîroz ". Paşe Zal dibêje min wek Xwedê bawerî pê anî.(86-203) Lêkolînêr Andrew Collîns(159)di vê baweriye de ye, ku berê çûk di nava Kurdan de pîroz hatiye ditin. Fîrdewsî: Sîmûrg ziman bi wî fêr kirin da, paşê wexta ewê here mal ji nav baskên xwe du perik danê û go: "eger tu ketî tengasiyê ji wan hebekê bavê nav agir.(86-210)

Li ser wê babetê û nêzîkî vê bi dehan çirok di nava Kurdên li dervayê welat de tên gotin. Yek ji vana jî çiroka "Keça Axî Periyan"e. *

---

***Keça Axî Periyan**

Du hevalê tevhev diçûne ber hêştiran. Rojekê terin cîhekî, barê xwe dadigirin û derdikevin rê. Piştî demekê li çolê, ji bo xwarin û wesaniya xwe radiwestin. Nên dixun û piştre jî radikevin. Dema şiyar dibin, dibînin ku ejdîrhakî li dora yekî xwe gerandiye û serê xwe daye ser boça xwe. Ew li hêviya ejdîrha disekinin ku ji xew rabe. Lê ejdîrha nalive. Kesê di nava ejdîrha de bi hevalê xwe re dibêje:

-Tu rabe here, heştirên min jî bi xwe re bibe û ez jî li hêviya wî bisekinim, lewra va çiyê xwe re î sewa min hatiye... Ez binêrim ka çi ye.

Bi vî awayî li hev dikin û hevalê wî tere. Dema roj rind bilind dibe, ejdîrha bi xwe dihese û tê ziman; bi dîlê xwe re dibêje:

-Rabe helkişe ser boçê min! Esîr wek wî gotî dike. Ejdîrha wî bilind dike û dibêje:

-Tu tişt ji te ve xuya dike? Mêrik:

-Na, dibêje. Dîsa bilind dike û dipirse û heman bersivê digre. Hinekê din bilind dike û dîsa dipirse:

-Tiştek ji te ve xuya dike?

Şerefxan jî dibêje: Pehlewanê mêrxas û bihêz Rustem kurê Zal, ku di dema Keykûbad Şah de jiyaye, lawekî Kurd bûye, li Sîstan (Sicîstan)hatiye dinê û bi navê Rustemê Zablî navdar bûye. Fîrdewsî, wî bi navê Rustemê Kurd dide nasîn. Her wiha di dema desthilata Hurmizê kurê Newşîrewanê Fermanrewyê Ecemîstanê de Deryayêmê Çûpîn fermandarê artêşa Kurd bûye, li Turkîstan û Xoresanê hatiye perwerdekirin û di şerên li van deran de nav û dengê wî belav bûye. Kurtî (Kurt) û sultaneyên Gûrî yên dema Îslamiyetê ji koka wî ne. Vana piştî dewleta Îlxanî bi fermana Mengû Qaan bûn fermanrewayên Gûr, Hîrat, Sîstan û Belûcîstanê. Yekemînê wan Melîk Şemsedîn Mihemmed bûye û di sala 643 an BÎ de fermanrewatiya Xûrîstanê ketiye destê wî.[157-65]

---

-Belê, ronahiyekê dibînim!

-Başê, tu dikarî peya bibî.

Ejdîrha dibêje:

-Vê bastonê, vî kumî û vî xalîçî heyne û here ji min re keçikê Axî Periyan bîne! Eger tu destên xwe jî bi keçikê bikî ezê te bixwim!

Mêrik ji tirsa re "temam" dibêje û derdikeve rê. Ha li vir ha li wir digêheje ser kaniyekê. Avê vedixwe, serçavên xwe dişo û li bin darê derbasî bêhnvedanê dibe. Mêzê dike ku du kevok li ser darê ne. Kevok jê pirsdikin:

-Rêwiyo tu ji ku têyî û herî kuderê? Mêrik:

-Ezî herime keçikê Axî Periyan bînime. Kevok:

-Tu nerî ji bo te baştir e, lê tu heta vir hatî xuyaye ku tu bi biryarî. Wê demê van herdû perikên me bigre û çi wextê serê te kete tengasiyê vana dihev bide emê werin hewara te.

Mêrik perikan dike beriya xwe. Nanê xwe dixwe, ava xwe vedixwe û dîsa li xaliya xwe siwar dibe dere rêdikeve. Pir tere hindik tere, digehêje ser kaniyeka din. Li wir nanê xwe dixwe, ava xwe vedixwe û rastî şêr û pilingekî tê. Şêr û Piling dibêjin:

-Rêwiyo tu ji ku têyî û herî ku? Mêrik:

-Ezî herime keçikê Axî Periyan ûnime; dibêje. Şêr û Piling:

-Rinde, tu herî lê kesên çûnî wir careka din venegerîne; axa miravekî qeleş e!

-Çi dibe bila bibe, ezî dere rêketime carekê, êdî veger tune. Şêr û Piling:

-We çaxê van herdû mûyên me bigre cem xwe, dema serê te ket belayê rahev bike û emê xwe bigîhinin te.

Dîsa dere rêdikeve û digehêje kaniya sêyemîn. Li wir jî sê merî tên cem. Merî dibêjin:

-Rêwiyo tu riya malê dizanî? Mêrik dibêje:

-Na, eze vê riyê bişopînim heta ez gihîştim malê. Merî:

-Wê çaxê bigre van herdû perikên me û emê bi te gereg bibin. Wexta serê te kete tengasiyê, dihev bide emê bên... lê dîqet bike ku axa miravekî qeleş e, ewê her îşî bi te bide kirin û paşî ewê ji pişta te de li te xe. Ma her daîm te haya xwe hebe.

Mêrik bi riya xwe de tere. Demekê bi şûnde digihîje mala pîrejinekê. Dibêje:

-Çaxa te bi xêr pîrê! Pîr:

-Xêr û silamet xorto, tê herî ku?

-Ezê herim mala axê.

-Xêr e?

-Ez hatim keçka axî Periyan bibim. Pîr:

-Keçikê bi dergistî ye, bi te de an nede te, ez nizanim. Lê wexta tu çûyî malê rûnê û qet deng meke; ewê bi xwe ji te pirske. Bi ser şîretên Pîrê de tere mala axê.

Sê rojan li mala axê dijî, dixwe, vedixwe û radizê, lê qet tiştekî nabêje. Piştî sê rojan Axa bi nokerên xwe re dibêje: nivanî me derdê xwe çi ye, hatiye çi, ne deng dike ne bang dike?

Di şerê Arraniyan ya navxwe (Îran û Tûran) de Rustem her daîm rizgarkarê alî Îran e. Di esas de wekî berê jî min gote ew şerê nav birayên bi navê Îreç, Selm û Tûr e. Di şerê dawiyê yê navbera hêzan de Fîrdewsî îşaret bi niqteyeka balkêş dike: Tûran û kralê Tûran Efrasiyab li hember Rustem têk çû û revî. Bi xwe li pêş, eskerên Gûr/Gor jî li paş reviyan, feydê hêvî dikirin lê zirar kirin û çûn. Felekê bi ya wî nekir û Gor reviya û rêya Tûran girt.(187-240) Di vê niqtê de gelek pirs derdikevin holê. Wekî em dizanin Gor, Goranî-Zaza yên îro yî ne. Gelo şer di navbera zarava axêfan de bû? Yan jî Goran bi Turkman bi gotinêka din bi Kurmanc, Lerên îro li dervayê Welat ve di nava heman rêxistinê de bûn? Niqta din ê girîng jî navê lehengê Tûranî ye. Navê wana bi piranî Arranî ne, wek mînak: Kerûhan, Seksar, Barman, Hazervan, Şemasas, Kerkûy e, ew belge û îşaretên derdikevin holê ne tesadufî ne û îspata vê ne ku Tûran ne Tirk in û piraniya wan Kurd û miletê Arran in.

---

Mêrik banatin didin û axa jê pirsdike:

-Nîvano tu hatî çi, ji ku têyî û herî kuderê?

-Axe te pirs nekir û min jî tişt negot…

-Eee?

-Ez bi emrê Xwedê xwezgînê keça te me! Axa:

-Pekala quweta te ku keçkê min bikî heye?

-Bi qasî ez dizanim heye. Axa:

-Sê qewlên min hene, li wî warî kesî ew nikarîn, eger te pêk anîn keçik ya te, eger nikaribî jî ezê serî te jêbikim! Mêrik:

-Temam, dibêje.

Axa di jûreke de kêlek (12 teneke) çeh, kêlek genim, kêlek nîsk tevhev dide kirin. Bi mêrik re dibêje: Heta sibê gereg tu vana jihev safî/cûda bikî, eger tu nikaribî ezê serî te jê bikim! Derî kilît dike û tere. Mêrik demekê kar dike lê serê xwe têşe û nikare. Paşê tê bîra wî ku meriyan perikên xwe dabûnê. Rahev dixe û merî tên. Heta sibê merî her sê cûrayan jihev vediqetînin. Axa sibe mêrik banatin dide û tevhev taşta sibê dixwin. Axa bawer nake ku wî jihev veqetandine, lê xulamên wî jî Mêrik piştrast dikin û axe neçar dibe qebûl dike. Tên merhala duyemîn. Axa dibêje: şêr û pilingekî min hene, tu jî duduyan bîne, eger yên te yên min têk birin ezê keçikê bidim te. Mêrik mûyên şêr û piling rahev dixe û ew tên. Di şerê navbera wan de yên Mêrik ên axê têk dibin. Axe dîn û har dibe, lê çi fêde… Tên merhala sêyemîn. Axe dibêje: Keça min 40 qatî di bin behrê de û di nava xaniyekî de ye… Kijan kevok elbîsê keçikê anîn ewê bi serkeve. Eger ên min anîn ezê serî te jê bikim! Perikên kevokan bihev dixe û ew tên û ji wan re qala fîstanê keçikê dikin. Kevok di bîstekê de terin fîstên tînin û didin destê axê. Kevokên axê dereng tên û ew serê wan jê dike… Axe keçika xwe dide Mêrik..

Mêrik keçikê heytîne û dere rêdikeve… Bi rê de keçik dixwaze bi wî re rakeve, lê ew qebûl nake û şûrê xwe dide navbeyna xwe û keçikê û radikevin.

Piştî çend rojan tên cem ejdîrha û ew pir şad dibe û dibêje: Te li min xiyanet nekir. Dibêje: Dema min tu rakirî ser boça xwe, min zanî ku tu mirovekî pir rastî û kesên mîna te jî nîn in. Di dawiyê de dibêje: Eme gilaş/bersing bikin, kê kî gerkir ma yê din bikuje! Mêrik ejdîrha gêrdike û wexta şûr bi stû de ew dibêje:

-Min mekûje, ez keçik im! Qalikê xwe davêje û jineka pir fodil jê derdikeve. Jin-mar/ejdîrha dibêje: min bihîstibû ku tu mirovekî pir baş, rast û egîd î, min got eza te tecrûbe bikim. Kesî hîn keçika axê naniye û tenê tê egîtî anî. Mêrik herdû jina jî li xwe mar dike.

Çêroka min rast, da ber we sînîk mast.

**Jêder: Pîrên Anatoliya Navîn**

## ZELANÎ

Dîrokzanê Kurd Îzady cografya Zelanî-Zilan wiha tarîf dike: Ji kaniya Dîcle re, Zelê û bajarê mîna Yozgat, yanî heta Kapadokya Pontûsa antîk re Zelanî dihate gotin. Zelanî di nava sê kraltiyan de hatibûn dabeş kirin; cara yekemîn dema bi Medan re alîkarî kirin hatin rojava. Berî Medan jî hebûn, piştî Med û di dema Axamenîşan jî ji sedî sed hebûn. Zelaniyan, bi îttîfaqa Medan ve axa xwe heta Konya û Enqere fireh kiribûn. Zelaniyan di dagirkirina keviyên Iyonya û rojhilatê başûrê Ewrûpa de rolên taybet lîstin. Paytexta zenda Zelaniya yê bingehîn, yanê yê Kapadokya berê Meletî bû, piştrê bû Mazaca/ Qeyserî. Di vê demê de, zenda Pontûs ku paytexta wan Zela/Amasya paşê jî bû Amîsus/Samsun derbasî pêş bûn. Zenda Kommagene ye biçûk bû. Vana bi mîmariya xwe Nemrûd tên nasîn. Ji Kommagene heta roja îro navê êla Kurd a Kowa/Koma ye ji wir tê. Ew Kurdana 3000 sal in xwediyê axa xwe ne. Navê wek "Zilan û Milan" hate dû beşkirin, bingeha hebûna Kurdên rojava ye, ku heta îro parastine.[154-85] Tespîtên birêz Îzady balkêş in. Balkêşiya yekemîn, tespîta ku berî Medan jî hebûna Kurdan ya li vê herêmê ye. Ya din; navê êla bi Kowa/Koma ye ku îro jî li herêmê Kawî ye hene. Ya sêyemîn, beşbûna Kurdên




Zelanî [154-84]

rojava wek Mil û Zil e. Bavê min digot; em bûne du şax: Zil û Mil. Em (Reşî) ji Zilan in. Ew kîngê pêk hatiye? Li ser vê ti agahiyên saxlem nîn in.

Li ser vê dabeşkirinê Avyarof dibêje: Kurdên ku zivistana diçûne Direzor, Haleb, Riha, Mêrdîn û çiyayên Sincarê re digotin **"Kurdên Mil."** Evên li Amedê re digotin **"Silivî"** û evên ku li Aranê (Di navbera Ararat, Xezer û çemê Kur de) dijîn re digotin **"Zil"**.[28] Mumkune ew rast be, lewra konfederasyona Milan divê navê xwe ji wir girtibe û wekî tê zanîn cîhê wan jî cografya Avyarof tarîf dike ye. Şaxê Zîlan jî yên li bakûrê wan dijîne.

Mîthridates ê ji Medya, ji bo ku birayên xwe Pontûs li hember generalê Roma Locûllûs biparêze şer kir û jiyana xwe ji dest da. Şûna kurê xwe Mede Dara derbas bû lê di encamê de Roma li ser axa Zelaniyan wejî/bilind bû.[154-88] Medan alîkarî bi birayên xwe yên rojava re kirine, nizanim ew ji ber welatparêziya wan e yan jî hevkariya wan e. Wekî me gote Saka jî ji Medan re komek/alîkarî kiribûn ku Nînova hilweşandibûn. Dîsa me li jor jî îşaret kiribû, ku Zelanî beşekî Saka ne. Îhtîmaleke ku ew dubendiya Mil û Zil jî, wê demê jî pêk hatibe. Bi taybetî jî dema ji navenda Xorasanê û bakûrê Derya Reş hatin, li bakûrê Kurdistanê ew bûn du şax û mumkune navê xwe ji wir girtibin. Lê, li ser axa Kurdistanê hêzên mezin riheti nedidan xelkê, ji bo vê jî her demê çûyîn û hatina navenda Xorasanê û bakûrê Kurdistanê pêk hatiye. Yek ji wan bûyerena jî di dema Jûlîûs Sezar de pêk hatiye.

Di sala 47 an BÎ de, Jûlîûs Sezar artêşa Zelanî têk bir. Bi ser vê de jî Zelaniyên Pontûs 100 salên din li başûrê Ukranya-Qirim û Bosporos ê yanê li diyaspora jiyana xwe berdewam kirin.[154-89] Vegerîna Zelaniyan a başûrê Rûsya jî balkêşe, lewra me gotibû ku ji vê herêmê hatibûn. Ew dîsa vedigerin herêma ku ew nasdikin. Carna jî Roma, ew wek kraltiyên girêdayî xwe dan jiyandan. Strabon, ew kombûna li Pontûs bi koça ji Kapadokya ve girêdide û vana wek **"Soranên Spî-Leukosurioi"** bi nav dike. Ew hatina Soranên Spî wek BÎ 1000 an sal tê hesibandin. Jêderên antîk Roma û Yûnan wana wek Faris binav dikin.[154-89] Dîsa pir balkêşe ku ew dibêje Soranên Spî, wê demê mirov dixwaze bipirse ku gelo ew Lek bûn?

Birêz Îzady dîsa bi niqteyeka balkêş îşaret dike, ku Kurd di dema antîq de jî li dora Derya Spî hebûne. Ew tespîta di jêderên Roma de jî heye. Tê fêhm kirin ku ji dema antîk ve Antakya û keviyên Derya Spî û Amanos welatê Kurdan ê dayik e. BÎ di 300 an de Antîockhûs Kurd li bajarê Antakya nû hatî avakirin û li dora Îskenderûnê bi cîh kirin. Gelek malbatên pêşe mîna: Veras (Baraz) û Belcanae (konfederasyona Belikan) li wir bicîh kirin û tekiliyên wan bi Roman re baş bûn.[154-91] Berazî hê jî li Riha û Sûrî dijîn ku pismamên Reşiyan in. Belikan jî îhtîmaleka mezine, ku bavê Bilikî yê îro li Anadola Navîn dijî ne. Di jiyana Kurdên li Anadoliya Navîn de mirov şopa Roma (dibe ya Ermenan be jî) hê jî dibîne. Wek mînak: dema zarok nexweş dikevin eniya wan bi riciyê, hêkên bin mîrişkan bi rengên cûda, yarên penêr bi riciyê û kevirên koşê xaniyan wek îşareta xaç ê lê dikolin û îşaretan lêdexin...

## ÇEND BÛYER JI DÎROKA KURDAN YÊN PIŞTÎ MÎLADÊ

Dîroka Kurdên dervayî welat ê Piştî Mîladê teyî zanîn pir qels e; bê guman ew bi kêm bûna dîrokzanên Kurdan ve û bi navên Kurdan yên cûda cûda derbasî dîrokê bûyinê ve girêdayî ye. Dîrokzanekî Kurdan ya dîrok bi kûrî tahlîl kirî mixabin tine, lê ew bi şertên dîroknivîsên Kurd tê de dijî ve girêdayî ye. Bê guman gelek dîrokzanên hêja hene, lê ji bo ku ew neçar in nîv profesyonelî binivîsînin jî nikarin ji bin wî barê giran derkevin. Mirov dikare bibêje ku heta destpêka Îslamê li ser Kurdan jêderên dagirtî gelek kêm in. Eger Kurd bi navên mîna Saka-Îskît, Zelanî û hwd di dîrokê de cîh bigirin zahmete ku mirov şopa Kurdan bibîne. Lê, barê giran li ser lêkolîner û mejûnûsên me ye ku bi kurahî dîrokê bikolin û ew kêmasiya agahiyên Piştî Mîladê ji holê rakin.

Di sala 36 an BÎ de, Kurdistan ket bin destê fermandarê Roma Marc Antonyûs. Wî kralî bi Aşxaniyan ve şer dikir. Medên li Ezerbeycanê xwedî dewleteka biçûk bûn jî ji Aşxaniyan re alîkarî dikirin.[19] Di vê demê de jî hebûna Kurdan ya li Ezerbeycanê girînge. Ew yeka ji xerîte û belgeyên wê demê manî de jî tê pêjirandin. Di hebûna Kurdan ya li wir guman tinin, lê kîjan Kurd li wir bûn ew girîng e. Hêvîdarim dîrokzanên Kurd van yekan rojekê tam zelal bikin. Di wî şerî de jî alîkariya wan ê ji Aşxaniyan re jî diyar dike ku hê hest û ruhê Arranî di nava wan de bi hêz e. Lê, Rom têk çû bi şûn de bûyerên pêk hatine jî îşareta gelek rojên reş didin. Kurd û Partan li ser xenîmeta li hev nekirin û Medan bangî Roma kir ku bila êrîş bikin ser Partan.[19] Bi dîtina min di vir de Kurdên navê xwe derbas dibin Soran, Hewreman in yan jî dehndikê Medan in; Part jî kalên Kurdên li dervayî welat in. Bi ser vê bangê de Roma, Ermenistana di destê Medan de, kralê part Fraat IV an jî dewleta Med dagir kir û ji holê rakir.[19] Her çiqas tê gotin Med ji holê rakirin jî ew yeka bi hêsanî nebûye û di firehbûna Roma yê ber bi rojhilat ku bi 100 salan ajotî de jî ew xuyaye. Kevnên me digotin: "Ji Sêwasê ber bi rojava Roma Reş e!" li wir Sêwas wek sînor ketiye mejiyê kalên me. Ku mirov dikare bibêje çemê Firat sînorên Rom û Kurdan yên xwezayî bûn. Kurdên li rojava jî girêdayî Rom man, yan jî piraniya wan ber bi bakûr û rojhilat belav bûn. Bi taybetî ji herêma Dêrsîm, Ezerbeycan û başûrê Rûsya. Li ser vê Îzady dibêje: Li rojavayê Firat, roj bi roj Roma ber bi mîrîtiyên Kurd fireh dibû û ew jî dibû sedema şeran. Di sala 72 an PÎ de kraltiyên Kurdan bi zorê ketibûn bindestên Roma. Tenê li Qirim kraltiyek Kurd 200 salî din di bin siya Roma de jiya.[154-83] Ewên li Qirim kîjan Kurd bûne nabêje, lê xuyaye ku ew nîvserbixwe bûne.


Salê 106 an BÎ herêma Sêwasê kete bin destê Roma û navê Sebaste lê kirin; di dura Mereş (Germanisia) wek sînor kirin bin kontrola xwe. Sala 36 an BÎ kral Lukullus bajarê Samsat, Kolik û heta başûrê Firat bi piranî kire bindestê Roma. Di heman salê de serleşkerê Roma Mark Antonyûs Kurdistan kir bin kontrola xwe. Di wê demê de tiştê balkêş, Kurd li dijî Asûriyan bi Roma ve

ketibûn îttîfaqê û bihev re hevkarî dikirin. Neron, Kurdistan û Ermenîstan dagir kir.

Şerê di navbera Îrana Sasanî û Împaratoriya Bizans de gelek zirar da Kurdistan û Kurdan. Di şerê pir dijwar ê di navbera hêzên Rom û Îraniyan de, navenda Kurdistan kete bin destên Îraniyan. Şerê di navbera salên 502-505 an PÎ de Riha hat şewitandin û xera kirin. Di dure herêma bakûrê-rojavayê Kurdistanê kete bin desthilatdariya Sasaniyan. **Û gelê li Farqînê bi zorê ajotin Xûzistanê.** Di vî şerî de Amed sê mehan di bin dorgirtinê de bû û paşê Îranî bi fêlbazî ketin hundur û ji xelkê 80 hezar kes kuştin. Paşê bi piştgiriya êlan Roma dîsa Amed wergirt.(19) **Sasaniyan di destpêka sedsala VI an de, ji bo Hûn ê ku ji bakûr de ketine welatê wan rawestîne, êla Gor ê Kurd ku li çiyayên Elbrûzê li başûrê Xezer dijiya bi piranî bir li Xorasan û bakûrê Xorasan bi cîh kir.**(4-199) Ji wan herdû koçên bi zorê jî zêde agahiya me nîne. Îhtîmaleke ku ew li dora Xorasanê gîhiştibin hev. Li ser vê Xemgîn dibêje: **Di sedsala VI an de, Deryam V an yê Sasanî, ji Farqîn û ji başûrê Derya Kesk êla Gor birê Xorasan. Li wir ji sala 1148-1215 an de dewleta Gor avakirin. Ew pesna xwe bi hilweşandina saltanata Dehaq didin. Dewleta Gor di sala 1107 an de bi Selçûqiyan re hate girêdan.**(101-53) Li ser axa Kurdistanê herdû dewletên bi hêz; bi taybetî li Mezopotamya, Şehrîzor û bakûrê rojhilatê çemê Dîcle daîm şerê hev dikirin. Sasaniyan di navbera salên 602-628 an de gelek cîhên mîna; Mezopotamya, Misir, Sûrî û Ermenistanê yên di bin destên Bîzansan de kirin bin kontrola xwe. Şerê herdû dewletan heta êrîşên Erebê misilman dom kir, kingê Ereban êrîşî Kurdistan û Îran kirin û ew têk birin; herêma Kurd lê dijîn kirin bin desthilatdariya xwe.

Ji bo me û dîroka Kurdên dervayê welat gelek xelek hene ku girîng in, lê di şertên îro de mixabin em li ser wan zêde tiştan nizanin. Yek ji wana di sala 130 an PÎ de pêk hatiye. Atlasa mirovatiyê dinivîse ku: **Saka bi Yûezhî yan** (divê ew Êzdî bin-Ş) ve çûn herêma Hîndîstan û Bextiyariyan. Herêm vê demê ji alî Helenan (Makedonan) ve hatîbû dagirkirin. Ew li wir man û bi cîh bûn.(66-70) Çûyîna wan, îhtîmaleka pir mezine ku bi ewlekariya dewleta Sasanî ve girêdayî ye. Lewra wê demê ji Sasaniyan re tehlûkê ji rojhilat de ji alî Hûnê Spî ve dihate kirin. Dorê salên 400 PÎ jî êdî dewleta Sasanî lawaz bû û Hûnan dest bi êrîşan kirin. Di wê demê de, xelkekî bi navê Sogdina jî derbas dibe, her çiqas agahiyê min li ser kêmbe jî di wê baweriyê de me ku ew jî xelkekî bi Kurdên li dervayê welat re giredana xwe heye. Dibe ku Ler bin. Ew Sogdina di sala 565 an de bi Oxûzan ve dewletekê ava dikin. Oxûz, li rojhilatê Gola Aral ber bi navenda Asya belav dibûn. Emê li ser Oxûzan jî bi firehî di rûpelên pêş de rawestin. Berê jî me got ku, Hûn heta Derya Spî çûbûn û hema vegereyan jî; îhtîmaleke ku ew ketibin dû Kurdan. Di jêderên vê demê de tê gotin ku: Di sala 445 an PÎ de Hûn hatin Muxana-Ezerbeycan, dema ew hatin navê Kurdan jî li herêmê derbas dibû û ji bo wan: kesên xwedî pez û koçber dijîn digotin. Dema Ereb hatin Kurdistanê jî navê Kurdan derbas dibû. Nasir Xusrev di Zafername

de dibêje: **Di navbera Merv û Belhê de koloniyeka Kurd hebû.**[44]




**Pers-Bîzans** [66-71]

Birêz Varli jî wê demê qala Hukumeta Daboweyh-Dabowehiyan (525-775) dike. Gor wî: Êla Kurdên bi navê Dabûyanê ji Kurdên Gîlan-Cîlan-Ceylanê ne.[32] Di dîrokê de ew herêma demeka dirêj di bin destê Kurdan de, bi taybet jî di bin destên Kurmanckî axifan de ma ye. Dabûyanê ji 85 beran pêk dihatine. Di sala 622 an de hemû Medistana kevin digrin bin destê xwe û di sala 640 an de jî misilman hêdî hêdî kontrolê dikin destên xwe. Di sala 752 an de Şêrwî miriye û kurê wî yê bi navê Espêhîd Xurşid bûye serok. Di dema wî de Ebbasiyan ji wî alikariyê xwestine. Paşê jî ji alî Ebbasiyan ve welatê wî hatiye xirab kirin û bixwe jî ji ber wan reviyaye. Gorî hinek dîrokzanan ew qet nebûne misilman.[32] Hîna jî li vê herêmê Kurdên Kurmanc, Ler û Gor hene.

Ji kuştina Eba Muslim şûnde Kurdan dest bi serhildanan kirin. Êlên Kurdên ku li başûr û başûrê rojavayê Derya Kesk dijîn di dema Sasaniyan de jî serbixwebûn. Di sedsala V û VI an de rewşa xwe hîn xurt kirin û li hember Bîzansan, alîkarî didan Nestorî û Cûhiyan.[101-33]

Jêderê Çerkezan jî bûyerên sala 550 an ji devê Prokapi Kerasyatî wiha

radigihînin: Li wî welatî keleheka pir saxlam ya bi navê Tsibila heye. Di navbera hukumdarê Laz û Tardet ê ji maleke mezin dihatî de nakokî derket. Bi ser vê de Tardet bi Medyan (Kurd) ve lihev kir û keleh teslîm girt. Paşê jî Apsilya bi giştî kete destê Medan. Di sala 551 an de, artêşa ji Ecem û Alanan (di wata Kurdan de bi kar tîne) pêk dihatî di serdariya Khoryan de êrîşî Egrisiyê (cîhe birêvebirina kraliyetê) kir. Lê li hember artêşa ji Rum û Lazan pêk dihate de têk çûn û Khoryan hat kuştin. Di gelek şeran de em dibînin, ku Bîzans, Hûn, Abaza û Lazan li dijî Kurd û Farisan hevkariyê kirine. Lê di sala 572 an de jî, artêşa ji Ermeniyan, Kolkhidan; Abaza û Alanên di bin serokatiya Sarok ê Alan de, li dijî fermandarê Îrani Miryan de digihîjin hevûdû.[62]

Şerên bi dehan salan di navbera Rom-Sasanî û Bîzans-Sasaniyan de heta salên 639 an de berdewam kir û herdû alî jî ji wan şeran lawaz ketin. Ji vê yekê herî baş Ereban îstîfade kir û bi taybetî jî bakûrê Kurdistan ji ber vê sedemê bi hêsanî kirin bin destên xwe.[61] Wekî tê zanîn Ereban di sala 751 an de êrîşî herêma gola Aral kirin, Çinî têk birin û dewleta **Sodîana** kirin bin destên xwe. Bi vê yekê re girêdayî pêwîste bê zanîn ku heta wê çaxê li herêmê: yanê bi temamî li Kurdistan, Îran, Derya Kesk, gola Aral û heta Çîn bandora Zerdeştî pir bi hêz bû.

Kurdên ku di sala 1000 an de li Elbîstanê dijiyane di wan salan da Sêwas heynan destê xwe û xwe avêtin hundirê Anadolê. Paşê ji bo parastinê hatin şandinî Qarya (?) û dora 20 hezaran bûn. Di sala 1050 an de êdî bi cîh bûn. Di gava êrîşên misilmanan de vana di navbera misilman û xirîstiyanan de bûne. Eger biçûyana kîjan alî ew alî di şer de bi serdiket. Êdî misilman bi riya van Kurdana di sala 1081 an de li Konya û Qeyserî yê bi cîh bûn. Di pirtûka **"Dîroka Qereman"** de gotina "Kurê Bahaddîn Menteşe bi 8000 Kurd beşdarî şer bû" ye derbas dibe. Di sala 1150 an de Tokat, Sêwas, Engorî/Enqere hemû kirin bin destê xwe. Ji bo ku li Stenbolê Latînî bûn desthilatdar, Kurd bi hêsanî di Anadolê de dibûn desthilatdar. Bi Selçûkiyên Qonyayê ve jî şer kirin. Ew xelek ji bo dîroka me girîng e, lê em niha derbasî ola wan ê kevn bibin. Li pêş emê dîsa li ser vê babetê rawestin.

## MAZDA-ZERDEŞTÎ, ÊZDATÎ Û ELEWÎTÎ

Hîna ku em derbasî beşa serdema Ereban û belavbûna Îslamê nebûne, pêwîste li ser ola Kurd û Arraniyên kevn çend gotinan ragihînin. Herçiqas di şerên berê de rola netewan hebe jî, bi piranî şer li ser ol û belavbûna ol bû. Ji bo ku dîroka miletan û bi taybetî jî ya Kurdên îro li dervayê welat baş bê fêhm kirin, pêwîste di alî olî de baş bê analîz kirin. Xwezî kesekî jêhatî tenê li ser ola Kurdên îro li dervayê welat lêkolîneka kûr û berfireh bikirana! Ew kesê ku wî karî bike bila bizane ku valahiyeka mezin ê tije bike. Ji jêderên heta îro hatine nivîsîn, emê hewl bidin ku li ser ola Kurdan yê kevn çend xalan ronî bikin.

Hema hema hemî lêkolîner û nûser yekdeng in ku olên dinyayê herî

kevn **Mazda** (Hurmuz) ye û kitêba herî kevn a pîroz jî **Avesta** ye. Lê mixabin ew yeka nayê dîtin û Cihûtî, Xiristiyanî û Misilmanî bi zanistî derdikeve pêş. Lewra îro jî, ol bûne alava siyasî û aborî. Ji ber vê, herkes tê de ye ku erdnîgariya ola wan bi bandor fireh bibe. Ola Mazda û fikrên Zerdeşt ji hemû olên ji vê şûnda hatî re bûye kaniya raman, civakî û rûhî. Hemî olan jê kopye girtine, lê gotine ew fikrê ol û pêxemberê me ne... Felsefa Elewîti ya olî û nêzikbûna xwe ya mirovan jî ji Zerdeştî tê. Wata Mazda di zaravê kurdî kirdkî de: 'Maz'=Em û 'da' jî tê wata dayîn ê. Yanê em dan, em xulk kirin hwd. Di kurmancî de jî Xada-Xwedê-Xudê: Xa-xwe-Xû: Bixwe, da jî dayîn e. Yanê bixwe xwe da. Yezdan jî tê mana Yê-ez-dam û Ezda; Ez-da ye.



**Nivîsa Avesta**

Mamostê birêz, lêkolînerê kurd hêja Dr. C. Bender dibêje: Gelê Kurd, di alî raman û olî de ji xelkê cîhanê re rêbertî kir. Dîsa di dema xwe de gelê Kurd dît, ku baweriyên berê bersiv nadine û derî ji olên semawî re vekir, ji olên kevn jî îstîfade kir û bingeha ola Zerdeştî danî. Zerdeştî di navbera olên pirxwedêyî û yekxwedêyî de pireyek e. Zerdeşt pêxember alimekî ku zagona olên din ên piştre derketî re bingehî kir; kitêba wî ya bi navê **"Zend Avesta"** bi xwêdana eniya wî derket holê. Zerdeşt, gelek Xweda daxistin Xwedeya qenciyê **Hûrmûz** û ya xirabûye **Ahrîman**. Cara yekemîn Zerdeşt qedexe kir ku xelk bawerî bi keviran (pûtan) bîne.[123-97] Xweda yê ola Mazda, Ahûra Mazda ye; Pêxemberê xwe jî Zerdeşt e. Wata wî navî, stêrka zêrînî ye; tê gotin ku li eniya Zerdeşt hestirka zêrînî hebûye. Li eniyên zarokan zêr giredana Kurdan ya ku heta roja îro berdewam dike, tê texmîn kirin ku ji vê kevneşopiyê tê.. Li ser vê babetê Prof. Hermann Beach dibêje: Navê xwe Zoraaster e; -aster: stêrk e û zora jî tê wata zer. Eflatûn jî Zerdeşt, wek dameziranê ola Mazda dide xuyakirin.[53] Gelek baş tê bîra min: ku pirka min, zêrekî nîvî bi benîşt bi perçêma birayê min ê biçûk ve zeliqand û ji me re jî digot: "Miqate bin bila kes jê neke." Yanê, ew kevneşopiya heta çil salî berê jî di nava Kurdên Anatoliya Navîn de hebû ku koka vê digihêje pêxember Zerdeşt. Olperestên Zerdeştî dibêjin; pêxember li bajarê Rê (Tehran); Faris jî dibêjin ew li bajarê Belxê hatiye dinyayê; lê tê zanîn ku Ew li çiyayê Elbrûzan derbasî tenebûnê (înzivayê) bûye. Xwedayê vî olî yî demê Zervan û yê dipî yê jî Vayu ye.[53]

Nivîskarê misilman Kazwînî, ji Hz. Muhammed vê gotinê ji me re radigihîne: "Di navbera Ezerbeycan û Ermenîstanê de çiyayê Sabalan heye. Di wê çiyayê de pêxemberekî raketiye. Vê herêmê havînên xwe direj in; avê xwe sar in û ewna jî xelkê dikşînin wir. Li wir dareka bilind heye û li dor vê giyayek dirûzê/şîn dibe ku ti ajal naxwazin di wê mintiqê re herin; ewên ku jê

xwarine jî pê hema dimirin."[71-69] Zerdeşt ji 23 saliya xwe ve, ji bo ku bi xwe re têkeve muhasebê çû çiyayê Sabalan derbasî jiyana înzîva bû.[71-146] Ew cîhê ku Hz. Muhammed gotiye min li Xorasanê peyda kir! Li bakûrê Xorasanê, di navbera Turkmenîstan, Afganîstan û Îranê de rêzeçiyayên Hezarmecîtê hene. Li qotê herî bilind, tê gotin ku berê şikeftekê hebûye û kesekî di wir de jiyaye. Îro ew tune; lê li ser qot du çavî xanî çêkirine û tê gotin ku dema Îmam Elî li hember Rûsan li wir şer dikiriye êvaran dihatiye vir û bêhna xwe vedaye... Ew xeyal e, lewra dîrok vê dîtinê napejirîne û Elî jî ti caran nehatiye vir. Lê cîh pîroz tê dîtin û xelk qurbanan tîne lê serjêdike û hêviyan dike. Pîrozbûna vî çiyayî ji Zerdeşt Pêxember tê. Lê dewleta Îranê ew zivirandiye ser Îmam Elî, ji bo ku Şîîtiyê hîn xurtir bike û xelkê hîn zêde bi xwe re girêbide; di vê yekê de jî bi serketiye. Li pişta wan çiyana, bi taybetî jî pişta wî qotî bi qasî hezar metre dirêj û weqas jî pan cîhekî heye ku ew giyayê ku Kazwînî dinivîsînî lê dirûzê. Kurmancên wir navê **"Axû"** li giya danîne.



**Axû**

Îro jî di zimanê me de ji jehr re dibêjin axû. Wextê nifira dikin dibêjin: "Mêro, tu axûya marî kor bixwî! " ew giyakê ku mirov destên xwe pê bike û paşê jî bibe lêwen xwe hema di cîh de dimire. Çi ajal bixwe dimire. Xelkê

herêmê wî tevlî hevîr dike û davêje nava çeman, dema masî dixwin dimirin û xelk hundirê wan pakij dike û dixwe. Dema hişk dibe ti zirara wî tune, lê dema ter bû hemî tişt pê dimirin. Li nava meydana va giya dirûzê darek jî heye. Yanê, ji sedî sed tarîfa Kazwînî digre û heman cîh e. Îhtîmaleka pir mezine ku Zerdeşt Pêxember li wê herêmê maye yan jî jiyaye. Li jêra wî çiyayî kaniyek heye ku ava vê ji heman çiyayî tê û dora wê jî gelek xweşike. Hewa zozanan dide mirov lê îro av kêm bûye û navê kaniyê jî kirine **"Kaniya Miradan"**. Ku kê çi miradê (mirazê) xwe heye, tiştekî davêje kaniyê û ew mirazê wî tê cîh... Min jî pere avêtê û Kurdistaneka azad xwestibû... Gor gotinê mezinen wir: Berê li wir hersal cejn pêk dihatine û ji Hîndîstan, Afganîstan, Kurdistan û Îranê gelek mirov dihatinê û cejnê pîroz dikirine. Ew jî îspateke ku Zerdeştî li wir jiyaye û ew cîha bûye tewafgeh ji oldarên Zerdeştî re.



**Kaniya Miradan**

Berî her tiştî pêwîste mirov li ser kesê ew ola afirandî raweste; li ser wî gelek lêkolîn hatine kirin û gelek dîtinên cûda hene. Lê emê dîtinên S. Bîlgîn bingeh bigrin: Zerdeşt ji ku bû? Nivîskarên Greka Klasîk (Ctesîas) dibêjin: Ew kralê Bakterîa yê li rojhilatê Îranê bû. Grek îddîa dikin Zerdeşt 6000 BÎ jiyayê.[71-129] Lacantîus (300 PÎ) dibêje ew kralê Medya bû. Yên misilman jî dibêjin ew ji Ezerbeycanê (Şîz-Ûrmiye) bû. Gnolî yê Îtalî jî (1980), Gola Hamûnê di navbera Îran û Afganîstan cîhe Zarathûştra ola xwe belav kiriye. Ew cîhê teye qebûl kirin Sîstane ku ola Ahûra Mazda lê "hatiye dinê".[71-94] Hemî ew mintiqên ku tên heldan di dirêjiya dîrokê de cîhên ku Kurdên koçber lê jiyane. Bi dîtina min jî rojhilatê Îranê raste; ew cîha dikare bibe mintiqa Gola Hamûn / Sîstan yan jî Xorasan; heta dikare herdû jî bin. Li jor min qala Xorasanê kir ku gelek îspatên bi bingeh û hêz hene. Lê hinek lêkolîner û pirtûkên pîroz jî dibêjin dora Gola Hamûnê ye. Kolanên li vê herême tê kirin gelek cîhên kevn derxistin holê û eger mirov çand, ziman û olên xelkên vêdere jî bide ber çavan îhtîmaleka ne dûre, ku li wir jî jiyaye. Ji bo wê dîtinê mînaka herî baş Xwedayê Hîndûyan e.

Di dawiyê şerên di navbera Hatî û Mîtaniyan de peymanek hate morkirin. Di peymanê de şahîd, "Axê Agir" yan jî "Xwedayê herî mezin ku agir afirandî-xulk kirî " yanî, "Mîthra" ye. Xwedayê herî kevn ku li ser keviran hatî nivîsandin ev e; teqriben çar hezar sal in. Hîna jî ev yek ji Xwedayê Hîndûyan e.[71-34] Xantosê ji Lîdya (BÎ 470) îddîa dike ku Zerdeşt 600 sal berî şerê Troya yanê BÎ 1800 jiyaye.[71-131]

Baweriya Zerdêştî 3000 sal BÎ derket; Pêxemberê xwe yê yekemîn Mahabad e; yê duyemîn Huşeng (tê îddîakirin ku ew Hz. Îbrahîm e) 2040 sal BÎ jiya û yê dawî jî Zerdeşt e ku sala 600 BÎ jiya ye. Di dema Zerdeşt de bawerî wek sîstemekê bi rêxistin bû û ji alî Med û Akamenîdan ve qebûl bû.[125-22] Zerdeşt ola Mazda reforme kir û evên van yekan qebûl nekirin re "Mazdak" gotin. Mazdakî herî pir li dora bajarê Heratê hebûn û di dema kralê Sasanî Kawa (488-531) de rabûn ser lingan û yekî ji kesên isyankar ji kral re got: "Pêwiste reformên civakî pêk bînî, divê jin û mal ji alî civakê ve tevhev bên bikar anîn..."[52] Di Zerdeştî de heyî(hilberîn) pîroze û ji bo wê elementên ku dinya pêk tînin mîna: av, ax, hewa, metal û nebat pîroz in.[125-24] Ji ber ku di Zerdeştî de bînfirehî û xweşbînî heye û Elewîtî jî berdewamiya wê olê ye, ji ber wê humanîzmê nebû desthilatdar.[125-28]

Dîtina din ê dijber ku dibêje Zerdeştî ji rojhilatê Îranê ye, ji alî Bilgîn ve bi vî rengî ye: Zarathûştra li Atûrpatakan (Ezerbeycan) hat dinê (BÎ 637-560), xwest ku mala bavê wî û axayên herêmê reforma erdê bikin; erd li karkeran belav bikin.[71-259] Bi ser vê daxwazê de, bi biryara malbatê ji mal hate avêtin û çû ba pismamê xwe malbata Notarya. Gatha (ayet) bi zimanê Aryanî nivîsîn. Ji bo ola xwe belav bike, li rojhilatê Îranê fersend dît û bi qebûl kirina Magûyan re ola xwe zû belav bû.[71-118] Di her pêvajoya dîrokê de di navbera Ezerbeycan û Xorasan û der dorên wir de ev tekilî hebûne û gelek êlên Kurd li herdû herêman jî jiyane. Yekê jî dora Xorasan her wext bûye keleha oldarên ji miletê Arran. Dîtineka ne şaş e, berovajî raste, lê di alî demê de gumanên min hene.

Di ola Mazda-Zerdeştî de agir û cîhê ku agir lê vêdikive (Ocax-tifik-kuçik) pîroz e; ji ber vê gelên cîran bi wata 'Xelkê bawerî bi agir tîne' re **"Mecusî"** gotine. Ji ber vê jî, Alawî/Elewî û Kurdên Anatoliyê û yên- rojavayê Kurdistanê dibêjin: **"Ocax Kurbiyo!.." û agirê di ocêx de jî pîroz tê dîtin. Heta roja îro, li Anatoliyê mirov nikarin di ser kuligê re herin û dibêjin guneh e. Di nava hemî Kurdên Anatoliya Navîn de berê, wexta mirov nexweş diketin di bine kuligê de qulek vedikirin û nexweş di bin wê re derbas dikirin. Baweriya wan ew bû ku bi vê yekê nexweş sax dibin ku nîşana pîrozbahiya agir e... Dîsa mînakeka balkêşe, li Qonya Gundê Bûldix qewimiye; jinikek dema bûye bûk agir vêxistiye û ev ara heta mirinê qêt venemirandiye. Tê gotin ku wextê ew koçber bûne jî agir dikiriye piştê hêştirê û digerandiye. Dîsa li alî Sarizê û li gundên Cîhanbeylî li ser xaniyan resmê rojê çêdikirin. Li Sarizê, ji derdê li ser pencerên xaniyan û li ser rojing-pacê agir wênê rojê dihate çêkirin. Li gundê Sêvika-Bûldûx jî heta dema dereng li ser hinek**

**xaniyan sêniyên mîna rojê ji derve dikirin pêşiya xaniyan**. Di Zerdeştî de agir wek kurê Ahûra Mazda tê dîtin û kesên bawermend nedikarîn pişta xwe bidin agir. Li aliyê Qonya dema tu li tuwaletê rûnî gereg tu berê xwe bidî rojê, eger tu pişta xwe (bidî rojê) di rojê alkî guneh e. Di ayînên Elewiyan de jî her tim agir wek sembol tê dîtin. Di Zerdeştî û Elewîtiyê de roj (-agir), hewa, av û xwelî-ax pîroz e. Di Mazdaîzm-Zerdeştiyê de, melêyen ku perwerde dibûn hildikiştin heft qatan. Ji vana ya duyemîn "Sir girtine" û di Elewîtiyê de jî ev wek "Siri Hakikat" heye.(53) Di Kurdên Anatoliyê de jî girêdana soz û sirrê gelek girînge, eger kesek vê yekê neke qîmeta wê/wî dadikeve pênc peran.

Di ola Zerdeştî de agir, parçekî ji rojê ye û ji bo wê jî pîroze. Wek ruhê Ahûra Mazda tê pejirandin. Ew pîrozbûna ji alî civakê ve jî tê parastin û em herroj dibînin: ku ji bo ku agir qirêj nebe oldar dema nêzîkî agir dibin, ji bo ku nefesa wan û tûka wan agir aciz neke devê xwe digirin; av li agir nabe; vemirandina agir guneh tê zanîn.(125-31) Zerdeşt di dema xwe de sê agirgeh çêkirin. Yek ji vana li Xorasan-Belx e, ya din dîsa li Xorasanê û ya sêyemîn jî li dora Ûrmiye bû.(125-33) Xemgîn jî dibêje: Zerdeşt, agirgeha xwe yekemîn li Belx a Xorasanê, ya duyemîn li nêzîkî Ûrmiyê li bajarê Şiza li Textî Suleyman û yeka din jî li Xorasan tê texmîn kirin. Zerdeşt şaîr bûye û nivîsên xwe yên din wek beyta ne. Wekî tê zanîn di nava Kurdan de bi taybetî jî di nav yên li Anatoliya Navîn de jî beyt gelek dihatin gotin. Di belav kirina ol de mele di nav xelkê de digerîn û tembûr lêdexistin û beyt dixwendin.(52)

Frederîc Spîegel dibêje: Ola Buda jî di bandora Zerdeştî de ma û ewên ku ji ber misilmanan reviyane li Bombay a Hîndîstan bi cîh bûn. Wekî tê zanîn li dijî misilmantiyê li navenda Kurdistan, çiyayên Elbrûzê-li Başûrê Derya Kesk (Dîlam, Gûrgan, Mazenderan), Ezerbeycan û Xorasanê raperînên mezin pêk hatin.(52) Ola Mazda heta dema Xelîfe Ma'mun (813-833) jiyana xwe berdewam kir. Xelkê Kurd li cîhên çiyayî yen Elbrûz, li Dîlam, Gûrgan, Mazenderan û Gibal di bin serokatiya Mardawîç de di sala 928 an de serî hilda. Di sala 930 an de, li herêmê Dewleta Kurdên **Dailam** saz kir. Dîsa li herêmê di navbera salen 1077-1256 an de dewleta girêdayî ola Mazdaîzmê ya bi navê Alamût jî jiya. Samaniyên li Xorasan jî girêdayî Mazda bûn.

Wek tê zanîn berê zarok wek qurban dihatin serjêkirin, paşê bawermendên Zerdeştî ew bi ajalan guhartin û paşê jî ew têne bi beşekî ji ajalan sinûr kirin. Li her cîhê Kurdistanê, berî qurban serjê bibin agir dihatiye vêxistin û ew pîroz dibûye. Di perestgehan de agir hertim vêdiket û pîroz bû.(101-64) Bi piranî Perestgeh çargoşe bûn û di nava wan de jî agir vêdiket.(101-65)

Sembola Xwedê yê Zerdeştiyan wekî Hurmuza Persan perik û boça çûçikê kirine hundirê xelekekê. Li ser kolanên Asûr jî ev wêne heye. Dîsa ew navekî Baalî (roj) hatiye guhartin jî mirov dikare bêje.(68)

Pirtûka "Kizilbaşligin Esaslari-Bingehên Qizilbaşiyê" çîna oldarên Zerdeştî wiha beş dike ku bo me pir balkêş e: Çîna li jor "Megûşa-Rabba" in; yên li navê **"Reşa Damgûşe"** û yên dawî jî "Rab Mohpate" ne.(125-35) Navê Reşa

di dema Med û Saka de jî gelek caran derbas dibû, ku me got kalê Kurdên îro li dervayê welat in. Bi heman navî jî wek çîna Zerdeştiya navîn, îdea min xurtir dikin ku ew jî îspateka din e, ku Kurdên koçber baweriyê bi Zerdeştî anîne. Derba dawî êrîşên Ereban li ola Arranan xist ku carake din nikarî pişta xwe rast bike. Wekî heman pirtûk jî destnîşan dike: Piştî êrîşên Ereban û berfireh bûna Îslamê ola Zerdeştî di sê beşan de rola xwe berdewam kir: Yek, komên ku ji Zerdeştî tawîz nedan û ti caran bi misilmanan ve lihevnekirine ku em ji vê re **Êzdî** dibêjin. Ya duyemîn, **Sersorîtî-Elewîtî** ye ku ji ber êrîşan ketiye rengê misilmantiyê. Ya dawî jî Sunnîtî ye, ku hê jî şopên Zerdeştî di navê de hene.[125-91] Bi rastî dema mirov kûr analîz dike şopa Zerdeştî aşkere ye. Hinek beş dikarin dijîtiya vê bikin, lê ev rastiyek e. Di nava Êzdatî û Sersorîtiyê de ew şopa berbi çav e û kesek nikare vê nebîne. Lê di nav sunnîtiya Kurdên li Anadolê de misilmantî ne ji dil e; ji derdê ye û mîna pîne ye. Di roja îro de pejirandineka ji dil heye. Berî deh-bîst salan ew tunebû. Heta mirov rastî tevgerên gelek radîkal dihat û ji misilmantiya wan mirov dikete gumanan.

## ÊZDATÎ

Çîn yan jî koma ku ji ola xwe yê kevn qet tawîz nedaye û gelek caran li hember Ereban, Kurdên misilman û mîletên din bi komkûjiyan re rû bi rû mane Êzdî ne. Pir caran xwe di nava çiyan de veşartine, di komkujiyan re derbas bûne, koçber bûne lê kêm ji wan misilmantî qebûl kirine. Hinek lêkolîner dibêjin Êzdî yê ji çîna Medan olperestên bi navê Magî ne. Wek tê zanîn Herodot ew wek êleka Medan nîşan da bû. Di nav Kurdên îro li dervayê welat de jî, vekirî xuyaye ku ew bere Zerdeştî, paşê Êzdî, paşê jî bi dor Xuremîtî-Sersorî-Qizilbaş, Elewî û Sunnî bûne. Di nav kesên îro Sunnî de jî îşaretên Zerdeştî û Êzdatî pir balkêş in, lê dîsa jî ew babeta li benda lêkolînerên jîr e.

Mîna Zerdeştî oleka dûalîste, Êzdî di vê baweriyê de ne, ku rind û xirabî hertim bihev re di nava têkoşîneke de ne û rengê herdûyan ji Mazdeîzm tê. Di Êzîdiyatî de cîhê Ahûra Mazda de Melekê Tawis heye. Wekî **Sorhalaman (Xuremît)** di vê baweriye de ne ku roja mehşere nîne û ruhê mirovan dema dimirin dikevin laşê mirovekî din. Di nava civaka Êzîdiyan de heft çîn hene, ewna: Mîr (meqamê dinyeyî herî mezin), Extiyarê Mergê (fetwa dide), Şêx (nivîskar in), Feqîr (digere û waaz dide), Pîr (rê nîşan dide), Pêşîman (lêkolîner), Kawal (sewa hecê Sembola Tawis û çira di nava xelkê de digerînin), Koçek (ermîş in), Murîd in. Wekî tê zanîn li ser Êzîdiyan 72 ferman û komkujî pêk hatine.

Dameziran û pêxemberê ola Êzdî wek tê zanîn Adî bin Misafir e. Di sala 1075 an de li Beeka yê li gundê Beytfar/Kirbet Kanefar hatiye dinyayê. Koka bavê wî Îsmaîl digihîşt Merwan el-Hakim ê Xelîfe Emewî yan. Diya xwe jî Yezda bû. Misafir, li Bexda ders girtin û paşê çû Laleşê; paşê bi hevalê xwe Abdûlqadîr el-Cilanî ve çû Mekkê û bû hecî. Cilanî paşê terîqeta Qadirî damezirand.[33] Bi

dîtina min, ne mumkune ku miroveki wek Adî biçe Mekkê û bibe heciyekî misilman. Mirovê ku here wir, bi ola Êzdî ve dikeve nav nakokiyeka mezin. Divê ew dîtin yan jî agahî şaş hatibe fêhm kirin yan jî bi zanistî dixwazin vê ola hanê bi Îslamê ve girêdayî nişan bidin. Dîtina dijberê vê jî ev e: Şêx Abdilqadir Gîlanî (hicrî: 470-528 ) yê ku ji xelkê Gîlanê bû (nêzîkî Qezvînê) û dû şêxên sofî yên Kurd jî şagirtên wî bûn: Şêx Mosayê Zolî ji Mêrdînê û Şêx Hadî (Adî) yê Hekkarî yê ku li ba Kurdên Êzdî roleka xwe bingehîn heye.(77-13) Ew dîtineka rasttir e lewra: Gîlan û Xorasan ji bo ola Zerdeştî û olên li dijî Îslamê bûbûn navenda perwerde û di gelek aliyên din ên civakî de ew herêm li pêş bûn.

Bîlgîn dibêje: Ola Kurdên Êzdî; Zerdeştîzm a milekî Mîthraîzm (efendiyê agir) ve tevlî hev bûye. Qizilbaşên li bakûr û Ehlî Haq ên li rojhilat û başûrê Kurdistanê; Mîthraîzm-Zerdeştîzm û Îslamê tevlîhev kirine, rêyeke din peyda kirine. Bi taybetî Kurdên Qizilbaş berê, bi derketin û çûyîna avaye rojê re ayîn dikirin, cem dikirin û li wir şarap vedixwarin û "ji bilî gepa yarê hertiştek parve dikirin" şopa ola yekemîn bi xurtî nîşan dide. Baweriya li hêviya Mêhdî û têgîna Xizir Aleyhîselam dîrekt ji ola Zarathûştra girtine. Di ola Kurdan yê kevn de rojiyê pir kin dajot, li cem Qizilbaşan jî ew dilsariya olî heye.. Ocax di Elewîtî de pîroz e; di ola Mîthra de jî ocax pîroz bû. Agir hêza herî mezin a îlahî bû, sembola vê jî roj bû. Qewl dayîn di Elewîtiyê de pîroz e; di Zerdeştîzm û Mîthraîzm de jî ew esasî ye. Xulasa Elewî, Êzdî û Ehlî Haq bawerî û çanda Kurdan ya kevne herî baş parastine.(71-53) Di nava Kurdên li Anatoliyê û Xorasanê de jî giranî û hêviya Mêhdî hê jî heye.

Di kovara Laleş-II an de, birêz Selîm Biçûk li ser pirtûka pîroz ya Êzdiyan wiha dinivîse: Tevî ku piraniya bîr û baweriyên Êzdiyan bi Zerdeştiyê re dibin yek lê dîsa pirtûka Avesta mîna pirtûkeke xwe ya pîroz napejirînin. Bi tenê navên du pirtûkan tînin ziman: **Mishefa Reş û Celwa**. Herdû pirtûk jî piştî mirina Şêx Adî hatine nivîsandin. Lê hinek çavkanî dibêjin ku ya yekemîn Şêxadî bi xwe nivîsandiye. Piştî lêkolînan digihîjin vê baweriyê: Guherîna (reform) ku Zerdeşt di Êzdayiya kevn de çêkirî bû ji hêla hin Êzdiyan ve nehatibû pejirandin. Lê piştî êrîşên Îslamê, pêwîstiya hîn guhartinan tê dîtin. Qehremanê vê guherînê jî dibe Şêx Adiyê kurê Mûsafirê Hekarî yê ku bi xwe ji bav û kalê xwe ve Zerdeştî bû. Ew guhartinên şeklî bûn ku bikaribe bi rastiya Îslamê re bimeşe. Hinek jî li hember wê derdiketin. Şerê di navbera duşopên Şêşims û Şêxsin heta roja îro jî hin şopa xwe heye. Rûspiyên Êzîdiyan dibêjin ku Şêxsin dixwest hîn guherînên din bike lê aliyê din ew nepejirand. Ji ber vê Êzîdiyan baweriya xwe avêtin hundirê xwe û bi vî awayî Avesta ji mêjiyê Êzdiyan hat hilanîn.

Êzdî, him di nava misilmanan de him jî di nava xaçperestan de wek "agirperest", "Bêbawerî" û "Mûm vêdimirandî" dihatin sûcdarkirin. Sykes dibêje: Li eskeriyê, Zazayên ku bûbûn misilman ji rabûrdiyê xwe bi şerm bahs dikirin, lewra wana bawerî bi agir tanîn.(60) Mezinen me qet nedixwestin ser vê defterê vekin, dema me pirs dikir digotin: "Ser van perdana venekin!" ew niqte

bi ya Sykes dibêje ve yek e. Lê rastiyek jî heye ku mirov binîvîse başe: Mezinen Kurdên li Anatoliyê, hinekan aşkere dikirin ku çirê vêmirandinê hebûne... Ew di arşîva min de wek vîdeo û deng heye; îro gelek mirov bi tûndî dikarin dijberiya vê bikin û min sûcdar bikin lê di rastî de kalan digot hebî ye. Ew rastiya jiyana civakî bi tevgerên di Xuremîtiyê ve jî dikare biherike çemekî...

Henry Layard, di çavdêriya ku li Laleş kirî de vana tîne ziman: Gelek mirov sibe hatin. Hemûyan xwe şûştibûn û cilên pakij li xwe kiribûn. Govend digirtin. Li deriyê Laleş mar, misîn, merî, bivir hatibûn çekirin. Êzîdiyan êvarê, li her qûncikên çiyê, li daran û li nava daristanê cîhên tarî de mûm vêxistin. Gotina "şeytan" di erebî de tê wata "lanet" ê û qedexe bû. Dîsa "nal û band" jî qedexe bûn. Loma, ew nêzîkî gotina "melûn" bûn. Wextê qala şeytan bikin bi hurmetekî mezin dibêjin Melek Tawis, kral Tawis yan jî Melek el Qût. Bawer dikin ku Îsa û Mêhdî dîsa werin ser dinê. Tû nakin agir û rengê şîn hez nakin. Ji spî hez dikin û tim û tim xwe dişon. Ev edetên wan mîna yên Seba-yan in. Êzdî bawer dikin; ku ew ji başûrê Firat yan jî ji Basra hatine Sûriyê, paşê jî çiyayên Sincarê.[68]




Wekî Layard jî dinivîse li deriyê Laleş heykelê mar heye û taybetmendiyeka mar di nava Êzdiyan de heye. Nivîskarê Kurd birêz Kemal Tolan li ser girîngiya mar wiha dibêje: "1- Melekê Tawis kete şiklê mar, Adem û Hewa ji

buhuştê derxistin. 2. Dema keştiya Nûh Pêxember qul dibe û av dikeve navê, surra Tawisî-Melek digîje marê reş û ew diçe xwe li ser vê qulê dipêçe. 3. Marê Reş ziyaret e, ew bi kesî venade û divê tu jî wî nekujî..." Vî marî, bi çîroka mar-jina Sakan re têkîliya xwe heye an na, nayê zanîn, lê gereg hebe, hinek jî dibêjin di tofana Nûh de mar ketiye qula keştiyê û mirovatiyê xelas kiriye û ji bo vê pîroz tê dîtin. Di nava Kurdên dervayê welat de jî girîngiya mar hebû.

Li ser serpehatiya pîrika min jî eger mirov hesap bike hîna jî watedar dibe: Rojêke min li ser kaniya me çermekî maran dîtibû. Ez şaş mabûm ku mar post davêje. Min anîbû mal. Pîrika min dît, ji destê min girt û da bin beroşa tiji şîr ku ya bûbûya mast. Min got dayê tu çima didî bin beroşê? Got: Lawkê min **bereketa** şîr pir bibe! Wekî tê zanîn gor zanyariya wan însanan, bereket tenê Xwedê yan jî melekên pîroz tînin. Ji wê jî mirov vê encame bi rihetî dikare derxe: pîrika min, xwendin û nivîsandina xwe tunebû, nûçe gûhdarkirin tunebû, ji ji bilî Kurmancî jî tu ziman nedizanîn û tevgera wê ji ceribandinên ji hezaran salan dihat. Yanê wê jî ji dê û bavên xwe fêr bûbû. Bi Şahmaran û serpêhatiya Saka ve bi vî awayî digihîje hev... Mînorsky jî dibêje: Mar di nav ola Êzdî de semboleka rola xwe dilîze ye; mumkune ku koka vê pir di kevn de be û sinûrên olekî derdixe holê. Herodot dibêje: **Saka (Alan) koka xwe digîhînin Xweda marakê nîv jin.**(12-424) Xwedaya Babîliyan jin Tîamat û yan Saka ya jin mar bûn. Keçên me demên berê cihêzên xwe de weneyên Şahmaran çêdikirin û ew li oda xwe ya raketinê dadixistin û bawer dikirin ku ew berekete, heyî ye û zayînê pir dike.(194) Dîsa di kurdî de ji bo zevacê tê gotin ku: "Lê mar kirin!" ew jî vekirî dide diyarkirin, ku di civata Kurdan de mar xwedî cîhekî girînge...Eger lêkolînek bibe ew dikare bi Xwedêyê Sumeriyan Dumîzî (Xwedayê zayînê Zawzê) ve jî bigihîje hevûdû. Spîegel jî têkiliya vê yekê û Ermeniyan çêdike: Êlên Ermeniyên esilzade dibêjin em ji koka kralê maran yê Med tên. A. Collîn dibêje: Kralên Medan ji alî cîranê wan Persan ve bi şana Mar dihatin nasîn.(159-234) Di nava Rûs, Ermenî, Îskît, Med û Kurdan de efsaneyeka bi vî rengî heye. Ji bo wê gereg mirov li ser efsana marên di milên Dehak de bi hêsanî derbas nebe. Di vê efsanê de, sê kesên ku xortan rizgar dikin navên xwe Armaîl, Kurmaîl û Durmaîl in. Li Kurdistanê herêma Oramar gor kevneşopiyê parezgeha maran e. Xiristiyanekî ewliya yê bi navê Marî Mummu, maran hîpnotîze dike û dike kîlera dêrê. Ew dêra hê jî heye. Bekçî-notirvan hersal bavê maran dibîne. Gor baweriyê eger xiristiyan ji rê derkevin mar ê derkevin û li dinyayê belav bibin. Cuhiyên Qefqasya jî efsanake xwe heye ku dibêjin marekî heft serî di bin derê malê de ye û ew ji hizûra malbatê berpirsiyar e.(12-424) Di nava Kurdên li Qoçgirî û Dêrsîmê de jî mar xwedî girîngiyê ye û gelek bûyerên bi van re girêdayî hene. Henry Layard jî dibêje: Mar, di ala Êzdatî de xwediyê cîhekî taybet e. Tenê di dema rojiyê de ji wî re hûrmet nedigirtin.(159-218) Gor Êzdiyan tûfana Nûh ê duyemîn 7000 sal berê pêk hatibû; keştî hîn li çiyayê Sincar sekinî bû kul bû û ew kula ji alî marekî ve hate girtin û ji ber wê hemû însan û heywan ji mirinê rizgar bûn.(159-226) Gor efsaneya avabûna di Yaresan

de, Azazel, hîna neçûbû buhuştê di xizmeta mar û Tawis de kar kiribû. Di nav bexçekî li dinyayê veguherî melekekî xweşik û Adem û Hewa teşwîk kirin ku sembola bereketê genim bixwin, ne meywe! Ji ber wê, Azazel, Mar û Tawis ji buhuştê hatin avêtin.[159-241]

Me gotibû ku Sembola Zerdeştiyan perikên çûkan yên di nava xelekêke de bûn. Ew yêka di kolanan de jî derdikeve hole. Li ser vê yekê birêz Collîn wiha dibêje: Kolanên li Kurdistanê û Anadolê hatî kirin de, derket holê ku 8870 (+/- 300) sal BÎ niştecîhên vê coxrafyayê serên sîsolekê ji xwe re dikirine şaman. Yanî di kolanên li Çatalhoyuk û li rojhilatê Kurdistanê di şikefta Şanîdar (Zêyê Mezin de ye û hat îspatkirin ku êlên koçber herî kêm 100 hezar sal zivistanan ew dera bi kar anîne) de jî ser û perikên bazan derketin. Li Çatalhoyukê miroveki perikên çûkan (teyr û toy jî hatin ditin) li xwe kirî û di depokî de serê 15 bazan û seriyên 15 bizinan derketin. Li wir derdikeve holê ku tiştê herî pîroz ji çûkên bi perik hatiye sembolîze kirin. Îro jî ew di Baweriya Êzdayetî de xwe nîşan dide. Çûka Toyê ji vê şikeftê derketî jî ji alî Êzîdiyan ve pê bawerî tê kirin û ew li Kurdistanê jî dijî. Tê vê watê ku dê û bavên Kurdan baweriya xwe bi wan çûkana anînê.[159-313]

Di Êzdayetî de roj pîroz e. Di nava Kurdên li Anatoliyê jî pîroze û hîna jî êlên li Qoçgiriyê li hember rojê dûa dikin ku bi êlên li Anadolê û Xorasanê ve parçên hev in. Mixabin em nizanin ku dema dûa dikin çi dibêjin? Lê Êzdî wiha dikin: piştî dest çav şûştinê, pişta xwe girêdidin û bi evîneke mezin berê xwe didin rojê; destên xwe dide ser milên xwe û pişta xwe xûz dike:

**Dûaya êvarê:**
Tebarek eldîn
Ya siwarê roj hilatê, roj avayê
Ella ehsenil xaliqîn
Hûn bidine xatirê dotê û dayê
Bi hîmeta Şemsedîn
Hûn me xilaskin ji qedayê ji belayê…
Faxiredîn, Sicadîn, Nasirdîn, Babadîn
Şeş imsê qeweta dîn
Siltan Şex Adî tacil ewel in heta axir in
Heq hemdila ya rebil alemîn
Xêra bide şera wergerîn
Mehderekê dixwazim
Bi rehma Şex Adî rezay melîk Şêx Sin
Kerema şeş ims
Amîn Amîn

Bi rojê û agir bawer kirin ne mexsûsî Êzîdiyan yan jî Kurdên li dervayî welat in; hemî Kurd û Arraniyan de ew yeka heye. Heta dema dawî ew

berdewam bû lê niha kêm bûye. Dema serbazê Îngîlîz F. Bûrnaby di sala 1876 an de ji Wanê tere Hoyê li ser giran xelkên ku li roja diçe ava temaşe dike dibîne. Bersiva ku ji rehberê xwe yê Tirk girtî "Ew ji rojê re baweriyê tînine!" bûbû.. Serbaz û rehberê wî yê Tirk li kêleka wî jî dibêje:"Çend caran ji bo wê min ew hişyar kirine û zor daye wan. Lê Bersiva wan tim ev e ku ew baweriyê bi rojê naynin, tenê dema ro diçe ava ew diçin ser girekî û ev fêrbûna ku ji bapîran ve mayî ew berdewam dikin..."[56] Bi vî awayî çewsandina Osmaniyan û misilmanan ya li ser Arraniyan derdikeve holê ku ew neçar dimînin ku ayîna ola xwe înkar bikin.

## SERDEMA EREBAN


Dîrokzanê Kurd Torî dibêje di salên 2600 an BÎ de, Samî li bakûrê Sumeriyan bi cîh dibin û ji vê pêvajoyê şunda Sumeriyan mîna xwe dikin.[6] Ewê ku mîna xwe kirine îro kî ne? Tam nayê zanîn, lê hinek dîtin hene ku dibêjin Asûrî ne... Hinek çavkanî jî dibêjin ku Ereb di salên 3000 an BÎ de, ji Afrîka, di bakûrê Sûriyê re hatina herêma Sumeriyan. Lê ew ji bo me zêde ne girînge û ew karêkî dîrokzanan e. Ji bo me niqta girîng ewe, ku di berî hatina Ereban de jî xelk li vê mintiqê hebûne. Her çiqas zêde zelalî li ser dîroka kevn tunebin jî, gor dîtina min hatina Ereban gelek zirar da xelkê kevne, mîna Sumerî û Kurdan. Di serî de ji şaristaniya pro-Kurdan û miletên din ê herêmê sûd wergirtin, bûn desthiladarê wê û di dawiyê de jî li ser wê kelepûrê rûniştin. Piştre jî bi êrîşên xwe yên hov Kurd mecbûrî çiya kirin. Heta vê pêvajoyê derba herî mezin Ereb, Asûr û Tirkan li Kurdan xistin ku wana welatê xwe terk kirin. Derba duyemîn jî dîsa ji alî Ereban ve di dema îslamê de li Kurdan ket. Wek birêz Mihotûlî dibêje, ti miletan mîna misilmanên Ereb ku misilmantî ji bo şovenîstiya Ereb bi kar anîne û zirar dane Arya û ew kirine hedef tunebû.[87-195] Di destpêka belavbûna Îslamê de artêşa misilmanan Kurdistan ji serîkî heta serê din şewitandin. Kurdên têkoşiyan kuştin û yên din jî reviyan çiya û herêmên dûr. Piştre jî oleka nû bi Kurdan dan qebûl kirin ku vî olî mala Kurdan şewitand. Yanê: kêd, çand, ol, şaristanî û pêşketinên ku Kurd heta wê demê pêk anîbûn yekser ji holê rakirin û sîstemeka nû, oleka nû, zagonên civakek nû li ser Kurdan ferz kirin. Vê ferz kirinê cewherê Kurdan wala kir û tenê navê wan ma. Bi kurtî Kurd bûn mirovên din. Ji aliyê din ve, ev guhartin di navbera Kurdan de jî dubendî û sêbendî derxist holê û Kurd ji hev re bûn dijmin. Ne tenê miletê Kurd, di nav êl û berên Kurdên ji bavekî veqetiyan de jî bû sedema nakokî û şeran. Ew ola nû yê ku li ser Kurdan hatî ferz kirin, îro di nava Kurdên dervayî welat de temsîla xwe wiha derdixe hole: Ji Kurdekî li Anadolê ola wî yê kevn bibirse tiştekî nizane, mezinan nedixwestin qal bikin, lê di jiyana wan ê rojane de, mirov bi hêsanî şopa Zerdeştî, Elewîtî, Sersorîtî, Şîîtiyê dibine...

Ji bo ku Kurd Zerdeştî bûn, Ereban, ew weke cinan bi nav dikirin. Vê

demê Kurdên Êzdî ji Mûsilê bigre heta Derya Spî di quntara çiyan de dijîn. Gor jêderên vê demê hinek Ereban jî gotine navê wan Sirtî-Çirtî ye. Di ber destpêka misilmantiyê de, Kurdên Sirtî li welatê Herat, Mazenderan, Xorasan û Gîlanê dijîne. Berî îslamê bazarên Ereban bajarên mîna: Yemen, Mekke, Tizfol û Dimişq-Şam bûne. Dema ew çûne wan deran rastê Kurdên bi navê **Cûnûkî** tên. Ji bo wê, li ba Ereban ew bawerî çêbûye ku hemû Kurd Cûnûkî ne, cin in. Ev dîtina Ereban ji nivîsa di çiyayê Golên xwê yên nezîkî çiyayê Şengalê derketî de jî hate pejirandin. Nivîs qala êla Zaban-Zîbarî jî dike. Van Cunûkan BÎ di salên 2400-2500 an de li hemberî Akadiyan û hevalên wan şerê hêja kirine, rojava û başûrê Mezopotamya yê kirine bin destên xwe. Di destpêka misilmantiyê de ew êla mezin ya bi navê Cûnûkî li dora Riha, Nisêbîn û Mûsilê dijiye (-Faûtûs Tarîhî, Qalaxlî Tarîhî). Vekirî hatiye nivîsîn ku ew êl yan jî federasyona êlan ê wê demê, ji Mûsil heta Rihayê belav dibûye û ti guman tine ku ew Êzdî ne. Îro jî li Anadoliya Navîn êleka girêdayî Reşiyan ya bi navê Cûtikan heye. Îhtîmaleke mezine, ku ew beşekî Cunûkiyan bin. Guhartina nav jî bi nivîsandin û nivîskarên erebî ve têkildare. Di serdema Sasanî û Grekan de jî ew li bajarê Darê bûne. Yewnanî Cunûkan li: Riha, Heleb, Amîd, Nisêbîn, Nînova, Sîncar, Cizîr, Finîk, Beytuşebabê nîşan didin. Van Cunûkanên îro li dora Enqere, Nevşehîr, Kaxizman, Bako, Selmas, Xorasan, Xuremebad, Hemedanê û Helebe dijîn. Di vê deme de ola wan ji mezhebeka Zerdeştî ya bi navê **Tiraîlî** bûye. Agatxangelosê Romî wê demê ji bo ola Xiristiyanî belav bike hatiye wan deran (332) û Kurdên bi navê **Mamok**yan-Mamokanê kirine Xiristiyan. Ereb ji welatê wan re dibejin **Dar El Beran**, Osmaniyan jî gotiye Beran Yurdu –Welatê Beranan (Muş, Xelat, Erdîş, Malazgîrt, Xinis).[26] Bi wî awayî ji wir tê zanîn ku konfederasyona êlan yên ku Tirk dibêjin Qereqoyînî yê vê demê jî wek **Beranî** dihatine binav kirin. Lê li ser dîroka ew tê diyarkirin pêwîste mirov hîn zêde lêkolînê bike û di beşa Beraniyan de emê dîsa li ser rawestin.

Piştî hîcreta Hz. Muhammed (622), di nava Ereban de gelek şerên navxweyî çêbûn. Di dawî de hêzên Pêxember bi ser ketin û li tevahiya Erebîstanê desthilatdar bûn. Karên hundurîn tevakirin bi şûnde, êdî dem hatibû îthalkirina misilmantiyê û talanê. Şerê yekemîn, cîhada li hember Xiristiyanan kirin. Di sala 636 an PÎ de, li Yarmûk a Sûriyê di şerê li hember Bîzansan de Ereb bi serketin. Piştî wî şerî, êdî deriyê rojavayê Kurdistan ji bo êrîşên Ereban û ji bo belavkirina îslamê derfetên zêde derdixistin holê. Rojavayê Kurdistanê bi hêz bûna Ereban re bû qada tekoşîna di navbeyna Bîzans, Ereb, Sasanî û Kurdan. Kurd bi piranî li aliyê Sasaniyan bûn, lê dîsa jî gelê herî zêde zirar dîtî Kurd bûn. Hinek ji alî Sasaniyan ve, ji bo ku pêşî li êrîşên Hûn, Xezer û hêzên din bigirin hatibûn şandinî Huzîstan, Xorasanê. Kalê Kurdên îro li dervayê welat bi piranî li Ezerbeycan, Ermenîstana îro, dora derya Kesk, Xorasanê û Dêrsîmê kom bûbûn. Lewra ew herêmana çiya ne û ji bo parastina wan girîng bû. Bi taybet jî, têkoşîna di nav hêzên mîna Bîzans û Sasaniyan de, herdû alî jî bê

taqet ketin û ji vê rewşê împeryalîzma Ereb sûd wergirt. Di destpêka sedsala VIII an de Ereban ji 3/2 ê xaka Bîzansa kirin bin desthilatdariya xwe.




## Kurdistan Berî Ereban

Salekê piştî vê serkeftina Bîzansan, Ereban edî êrîşî Kurd û Farisên Zerdeştî kirin. Artêşa Ereban di sala 637 an de, di bin serokatiya Kaak Ibn-Amr de bajarê Hulwan bi zorê heynan. Hulwan bajarekî stratejîk bû û dikare ji êrîşên Ereban re bibe deriyê yekemîn. Al-Balazûrî dibêje: Piştî Hulwan, Ereban êrîşî Şehrîzor kirin lê bajar di sala 642/43 an de hate zeptkirin. Ev jî tê wê watê ku Kurdan gelek li berxwe dane.[3-22] Di heman salê de hêzên Ereb û yên Kurd-Farisan li Kadîsiye hatin hember hev. Bi êrîşek ji nişkeve û bi germ negirtina torinên Medan re, Ereb bi serketin û hovîtiyeke mezin nîşan dan. Paytextê Sasaniyan kete destê misilmanan. Êdî piştî vî şerî jî deriyê Medya mezin ji Ereban re vebû. Talan, komkujî û çanda Kurdan bi hezar salan di bin agirê Ereban de şewitî. Farisan şer winda kirin bi şûnde, êdî bi temamî teslîmî Ereban bûn. Lê Kurdan, li dijî vê zilmê ti caran serî netewandin; têkoşiyan, mirin û yên din jî vekişîn heremên dûr û yên çiyayî.

Di sala 697 an de gelê Egrisi yê li dij Bîzansan serî hilda û hewara Ereban kirin. Armanca Ereban jî rêya Xezeran girtin bû da berjêr neyên. Xezer, di alî leşkerî de pir bi hêzbûn. Him Ereb him jî Bîzans ji wan ditirsiyan. Ev dewlata di navbera Çemên Don û Volga û di navbera Derya Reş û Derya Kesk de bû.[62]

Li ser wî gêlî Neal Ascherson dinivîsîne ku: Xezerî bi tirkî diaxifîn. Ji Asya Navîn PÎ derdora salên 700-800 hatin û li peravê Derya Reş împeratoriyek çêkirin û Qirim jî di destê wan de bû. Berî hatina Xezeran mintiqa Derya Reş di nav aştiyê de bû û ji wî re riya Derya Spî vekirîbû; bi hatina wan re ew jî xitimî. Lewra hersal ji bajarê Qirim 1500 dîl ji Memlûkên Misirê re diçûn. Kipçak jî ji Asya di salên 1000-1100 de hatin stepên Pontûs.[76] Li ser Xezeran û dîtinên Ascherson gumanên min hene: berî hertiştî çima navê wan Xezer e? Piştre Xezeran niha li Afganîstanê bi zimanê Derî diaxifine û wan çima zimanê xwe guhartin? Îttîfaqa wan û Saka li ser çi bingehan bû?

Bi hatina Ereban ya Kurdistan û Îranê re, li Kurdistanê qedexa ol, çand û kevneşopiya kurdî jî destpê dike. Talankerên Ereb, ji bo ku şopa vê çandê ji holê rakin her der şewitandin û di nav wan de li bajarê Şehrîzor û Medya 250 hezar pirtûkên ku dîroka Kurdan jî di nav da şewitandin. Îro mumkune ku Kurdên bûne misilman vê yekê qebûl nekin û li dilê wan neyê, lê em nikarin ji rastiyê re çavên xwe bigirin. Parçeyek ji vê rastiyê di sala 1882 an de ji aliyê Emerîkayîkî ve li çiyayê Suleymaniyê di şikevtekê de tê dîtin. Helbesteka bi zaravê Goranî yê û helbesta Kurdan ya yekemîn e.



Helbest

Helbest wiha ye:
Hurmuzekan Reman atran kejan
Wîşan şarde we gewre gewrekan.
Zorkarê Ereb kerdne xapûr
Kenayê pale ê heta Şarezor.
Şino kenîkan we dil beşînan
Mird azatlî ji rûyê hewîna
Rewştê Zerdeşt re man we bê kes
Bezîka nîka Hurmuz we hewîç kes.

**Kurmancî jî wiha ye:**

Hurmuzdegahan mizgeft hilşandin û agir vemirandin
Mezine mezinan tunekirin û wenda kirin.
Zorkarên Ereban gund heta Şarezorê wêran kirin.
Jin û keç û dildaran hemû zebûn kirin birin.
Êdî azadî ji rûyê kesî evîndar miriye nemaye
Keşê Zerdeşt bê kes maye
Hurmuz êdî li tu kesî dilovanî nake.[32]

Mûsil di sala 640 an de hat bidestxistin û Ereb li vir hatin bi cîh kirin ku ma vê heremê birşînin û biçinin û gelek Kurd jî berbi bakûr ve reviyan.[3-20] Wekî min li jor jî nivîsî Kurdên Cûnûkî diviyabû hê jî li vê herêmê biyana ku êdî ew jî berbi Ezerbeycanê hilkiştana. Lê şerê li Medya giran pêşve diçû, sedema vê jî berxwedana Kurdan û cografya çiya bû. Bi ser vê de Yezdîgerd III an biryara (642) şerekî din da. Ew şer ji bo Ereban jî, ji bo Mediyan jî girîng bû. Şer li Nehavend bû, serleşkerê Ereb Nûman îbn Makarrîn mir, lê birayê wî derbasî şûna wî bû. Di dawiya wî şerî de jî Ereb bi serketin û heta Hamadan çûn.[3-21] (hinek jî dibêjin 640/66-76) Di vî şerî de 110 hezar kes mirin.[44] Xelk reviya ser çiyayan.[38] Di vê salê de Hamadan ketê bin destê Ereban û xelkê bajêr koç kir. Gor Firat: di dema xelîfe Omer de şerê Kadîsiyê bû, di wî şerî de Ereb dîsa bi serketin û Îran bi temamî dagirkirin. Tirkên (mebesta wî Kurd in) çiyayî yên Haltî Lohorto, li çiyan derbasî tekoşîna bi salan bûn. Gelek mîrîtî û dewlet li wan çiyayan damezirandibûn lê herî dawî teslîmî Ereban bûbûn.[127-3]

Gorî ku Al-Balazuri radigihîne, xelkê Şehrîzor gotiye serleşkerê Ereb Utba Ibn Farkad, Şehrîzor (642-643), Samgan û Darabad ji destê Kurdan girt. Gelek ji wana kuştin, ew bi bacê giredan û heta Ezerbeycanê kire bin desthilatdariya xelîfe Omer. Edîp Yavûz jî dibêje: Emewiyan ji xelkê gelek bac distendin. Di nava wan de baca "Newrozê" jî hebû. Gor rîwayetê Mûaviye (680) ji xelkê **Sevad** (xelkê herî kevne li herêma alîvyonê di navbera Dîcle û Firat de ye) baca Newrozê û Mihrîcanê xwestiye, wan jî 10 mîlyon dîrhem pêşkêş kirine.[105-24] Xelkê bi navê **Sevad îhtîmaleka mezine ku kalên êla bi navê Sewêdî ya îro li Anatoliya Navîn e...**

Di navbera salên 644-656 an de Xorasan bi temamî ketê bin destên Ereban. Birêz Bûlût dibêje: fetîh kirina Xorasanê (649) di dema xelîfe Osman de ye. Serleşkerê Ereb Ahmed bîn el Yeşkûrî dema hat bajarê Xorasan Belhê, dît ku xelkê cejna Mîhrîcanê* pîroz dike.[36] Gor min jî ew tespîteke rast e, lewra Kurd Zerdeştî bûn û ji ber vê jî misilmantî qebûl nekirin û vekişîn Xorasan. Xorasan ji wan re ne xerîb bû; lewra bav û kalên wan qal kiribûn ku Xorasan qada berxwedanê û warê wan e. Ew jî kalên Kurdên îro li dervayê welat dijîne. Ji bo wê jî em dikarin bi hêsanî bibêjin, ku kalên Kurdên îro li Anadol, Xorasan, rojavayê Kurdistanê yên vê demê li wir û Ezerbeycanê bûn...

Li Xorasan gelek serhildan, tekoşîn û komkujî pêk hatin. Emê di beşa Xorasan de jî li ser rawestin lê di vê demê de em dibînin ku Kurd bi Tirkan ve li hember Ereban hevkariyê dikin. Tirk, di dema desthilatdariya Tûrgîş de, yanî di sala 716 an de hatin Xorasan. Ji tekoşîneke 20 salan şûnde Tirk belav bûn. Saîd bîn Amr el Haraşî, waliyê misilmanan yê li Xorasan bû; ji bo ku bi Tirkan re hevkarî kirine xelkê wir di salên 721-22 an de di şûr de derbas kir. Walî yê berî wî jî Yezîd bin Mûhelleb bû ku bi xwîna gelê wir kevirên aşan gerandin... 40 hezar mirov kuştin. Ji ber zordariya wan jî xelk cîhên xwe terk kirin û çûn çiya. Emewiyan li xelkê gelek zulm kirin û siyaseta koçberiyê dane

*Cejna Êzdiyan, ji Newrozê şûnde cejna duyemîn mezine.

dest pêkirin. Ji bo ku Xorasan bûbû keleha berxwedana muxalifan û ji alî aborî ve jî gelek hatina wê hebû. Ji bo ku ji hukumeta navendî dûr bû, xelk direviya wir û xwe vedişart.[36]

Nivîskarê Ereb Taberî axaftineka di navbera xelîfe Omer û kesekî de wiha radigihîne: Omer dibêje; Xwezî di navbera me û Xorasanê de behrekî ji agir hebûya! Kesê din dibêje, çima? Dibêje, şûna ev xelkê li wir (Tirk) were ser me, bila here ser xelkê herêmê (Kurd).[36] Ew jî îspateka din e, ku berî Îslamê Kurd li Xorasan niştecîh bûnê. Ev xelkê Kurd û Farisên li wir dijîn heta salên 720 an li dijî Ereban li berxwedan. Kurdên vê herêmê ji xelîfe Omer û Emewiyan zordariyeka bê hed dîtin. Ji ber vê ji Tirkan alîkarî xwestin, gelekan cîhê xwe terk kirin û çûn serê çiyan û beşek jî çû Hîndîstanê.

Ereban; Rey, Kûmiş, Teberistan, Xorasan, Kerman û Sîstan wergirtin. Ji wira jî êrîşî ser Ezerbeycanê kirin û rastî berxwedaneke pir dijwar hatin. Xelkê wir bi piranî Kurd bûn. Peyman kirin û gorî vê pêwîst bû ku ji salê 800 dîrhemî bidine Ereban û li hemberî vê jî Ereb ê xelke nekujine, dîl negire, bawergehên wan xirab neke, xelk ê bikaribe cejna xwe bi azadî pîroz bike û ti mudaxele neyê kirin... Pêwîst bû ku êrîşî Kurdên **Balasancan (Begasakan), Sabalan (Sabilan) û Satrûzan** nekirana (643-644). Ew navên Kurdan jî balkêş in: Beg-ê-Sakan, Saka-bilan, Saka-Rûzan. Ji van navan jî diyare ku ew berdewamiya Saka ne. Tê nivîsandin ku Kurdên Gîlan, Teberistan, Dîlmistan, Qazwîn, Mazenderan ji ber misilmanan reviyane. Ji desthilatdariya Ereban ya li Mûsilê bi şunde gelek Kurdan ji vir koçî Ezerbeycanê jî kiribûn. Ebdûllah Varlî dibêje; gava Deylemiyan ji ber misilmanan reviyan, li van deran bi cîh bûn. Di sala 258-274 (divê gor salnama kevn be) an de, di pey koçê, ew li Arran bicîh bûne û nivîskar li wan deran ditîne, wekî Îbnî Hewqel, Tarîxê Îran Mufessel Ebbas Îqbal, Yakût el Hemewî û yê din gotiye ev Kurd in.[32] Hîna jî Kurd li wan herêmana hene. Ev hemû mînak jî nîşan didin, ku Kurd çawa ji welatê xwe, piştre ji Qefqasya û Xorasanê jî derketine û bela-wela bûne. Bi vî awayê şopa Kurdan ku îro li wan deran tê dîtin ne tesadufî ye. Tewgerê Kurdan gelek bandor jî li ser çand, jiyan, kinc, cihêz hwd de li ser gelên herêmê kirine û kevneşopiya cejna netewa Kurd Newrozê ku li wan deran tê ditin jî ji van Kurdanan ma ye.

Tê îdea kirin ku Kurdan di sala 639 an de, Tirkan jî di sala 751 an de misilmantî pejirandine.[39] Mamoste Bender jî dîtineke din tîne: Kurd û Farisan bi dehsalan li hember misilmanan şer kirin. Tirkan jî di dema Şelçûq de misilmantî bê şer û pevçûn û komeka ji ulemayên îslam qebûl kirin şûnde, bûne misilman. Bi vî awayê wek Kurdan nebûn. Tirkan di sala 930 an de misilmantî pejirandin. Yanî: 296/266 salan piştî Kurdan.[123-94] Mesûdî jî dibeje, berî Kurd misilman bibin di navbera wan û prensê Ereban yê bi navê Gassanli de doza xwînê hebû û cara yekemîn Kurd bi Erebên misilman ve di sala 637 an de, ji dagirkirina Ereban ya Tikrît û Hulwanê şunde bû. Li dijî Ereban gelek cara îttîfaqa Kurd û Farisan bê dîtin jî, zora Ereban nikarin bibin û Kurd jî hemû yekser nebûn misilman. Ew îdea ji bo beşekî Kurdan, bi taybet jî ji bo

yên niştecîh dikare rast be, lê ne hemû Kurdan. Pêwîste ev yeka li navenda Kurdistanê piştî şerê 640 an bi şûn ve bê. Lewra hê Kurdên navenda Kurdistanê li hêviya serkeftinê bûn. Ji bo bakûr jî divê sala 645 an de be. Mirov dikare bibejê ku piştî van şeran û têkçûna Kurd û Farisan, Kurdên navendê û bakûrê Kurdistanê ji neçarî misilmantî pejirandin.

Wekî min li destpêkê de jî nivîsî, imperyalîzma Ereban zirarêke mezin da Kurdan. Mirov dikare bibêje ku Kurdistan hema hema vala bûbû. Kurd bi piranî berbi Xorasan û bakûr û bakûrê rojhilat vekişîn; di beşên Xorasan û Tirkmenan de emê bi dirêjî li ser rawestin. Hinek ji wan jî Kurdên Zerdeştî yên li Medya bûn ku di sedsala IX an de kom bi kom çûn Hîndîstanê. Li wir bi navê **Parseeler** tên nasîn û vana wextê kesek dimire li cîhekî bilind dihêlin ku teyr bên û goştên wan bixwin û hêstî jî di cîhekî de vedişartin.[159-163] Bi vî awayê Kurd, bi piranî li sînorên Medya berê yên herî dûr belav dibûn.

Li hember zilma Ereban, di sala 745 an de, di pêşengiya Misafir ê Bilekan de, gelê bakûrê Kurdistanê dîsa serî hilda. Rêvebirê Bilekan, Asim ê girêdayî Xelîfê dît ku rewş xirabe, artêş komkir. Bi ser vê de Misafir êrîşî bajêr kir û Asim kuşt. Xelîfe Merwanê II an artêşeke din şand, Misafir ew jî têk bir û ew herêman heta dema Eba Muslim di destên Misafir de bû.[101-29] Ji Omerê II an şunda, Ibn Merwanê (744-750) diya xwe Kurd hat ser textê Omeyidan (malbata xelîfe Osman). Navenda antî-Omeyidan jî Kurdistan bû û ji têkçûna Merwanê li Zê şunde Kurdistan ket bin desthilatdariya Ebbasiyan. Di dema xelîfê Emewiyan Merwanê II an de li hemberê Xariciyan şerek bû, di wir de beşekî ji Kurdan piştgiriya xelîfe kirin; ji bo ku diya xelîfe Kurd bû. Xelîfê Ebbasiyan Mansûr (754-775) jî jina xwe Kurd bû. Di sala 839 an de li herêma Mûsil mîrê Kurd ê bi navê Faharcisê kurê Cafer serhildaneke mezin pêk anî û fermandarê Tirk ê bi navê Aytan jî di sala 845 an de li Faris serhilda, Tirkê bi navê Vasif serhildan têk bir.[44] Bi vî awayî Tirkan, hêz li ku didîtin diçûn aliyê wan û bi hêza wan ji xwe re rê vedikirin. Ew ne tenê di alî eskerî de pêkhatiye; dema peşêroja ola îslamê di berjewêndiyê xwe de dîtin, hema misilmantî qebûl kirin. Ji bo vê jî tê dîtin ku carna wek fermandar li pêşiya eskerên misilmanan in, carna jî wek esker bi wan re ne. Lê divê bê zanîn ku ji bo berjewendiyê xwe ol û hêza wî bikar anîne.

Li bakûrê rojavayê Kurdistanê, herêma ku kalên me bi piranî lê dihatin ditin jî artêşa Ereban bûbû sedema gelek kuştin û koçberiyê. Bajarê Meletî di sala 756 an de ji alî xelîfe Mansûr ve dîsa hat avakirin; bajarekî pir dewlemend bû, lê bi êrîşên Bîzans, Ereb û Moxolan xirab bûbû.[48] Tiştêkî balkêş jî di sala 765 an de qewimiye, di vê salê de Ereban sîxurê xwe şandine nava Roma û ew hatine girtin. Bi ser vê de artêşa Ereban diçe li deşta **Germanîkê (Mereş) bi cîh dibe. Xelkê li wir dijiya dîl girtine û şandine Ramlê (?); dîsa xelkê Samûsata (Semsûr) jî şandin wir.**[48] Ramlê kuder e nizanim, lê gor texmîn dikim li derdora Ezerbeycanê ye. Lewra Piraniya êlên Kurdên di dem û ji cîhên cûda hatine li wir kom bûn û piştre ew yeka veguhezî dewleteke. Lewra Kurd vê

demê bi piranî di nava tevgerên muxalîf û dijber de bûn. Yek ji wan tevgerena jî Xaricî bûn.

Gor belgeyên Serfermandariya Artêşa Tirkiyê, di dema Îmam Elî de, di salên 656-661 an de li rojhilatê xelîca Basra serhildanek çêbû û di nava wan de Kurd jî hebûn.[44] Ne dûre ku ew Kurdên Lor bin. Wek tê zanîn di dema Îmam Elî de gelek Kurd û Ereben şîa û hêzên muxalif li hember paytexta xelîfetiye serî hildan. Bi piranî ji wan re Xaricî digotin. Ji ber ku ew dervayê sîstemê bûn û Îmam Elî jî mexdûr e sunniyan bû û li dijî revêbiriya sîstemê xuyadikir. Lewra dema Hz. Mihemmed wefat kir, wesiyet kiribû ku Elî li cîhê wî rûne. Lê Ebûbekir, Omer, Osman û yên din nehîştin, bi xwe li cîhê Pêxember rûniştin. Ji ber vê sedemê Elî mexdûr bû û rastî neheqiyê hatibû. Lê divê şaş neyê fêhm kirin, Elî ne li dijî sîstemê bû, tenê li rêvebiriyê cîh nedanê û ji bo wê jî, ji xelkên mixalifên misilmantiyê piştgirî wergirt. Ew bû sedema gelek nakokiyan, di nava Kurdên Elewî de jî dubendî çêkir. Wê demê tevgera cîddî ya li hember misilmanan ew Xariciyan in. Motor û hêza vê rêxistinê jî Kurd in.

**Sala 876/77** an de serokê Xariciyan Mûsavir Aş Şarî mir. Tê gotin ku serokê Şadiyan, Daysam îbn îbrahîm al-Kurdî, ku bavê wî jî Xaricî bûye û hevalê serok Harûn Aş-Şarî ye. Xaricî çûn cem Muhemmed îbn Hurzade yê Kurd ku bixwe li Şehrîzor bû û jê xwestin ku ew bibe serokê wan. Wî berê nexwest bibe, paşê Harûn Al Bagyalî Aş Şarî bû serok. Piştî ew pêk hat jî Hurzade xwest bibe serok û ev yeka bû sedema şerekî di navbera Xariciyan de. Îbnî Haldûn dinivîse ku: Hurzad bi Harûn ve li Mûsil gîhîştin ber hev. Lê niştecîhên bajêr aliye Harûn girtin û Hurzad bi hinek Kurdan ve bi serê xwe ma. Harûn êrîşî wan kir, Hurzad mir û Kurdên **Al-Celaliya** jî belav kirin. Bi vî awayî Hurzad heta Mûsil çû, lê îxaneta alîgirên wî bû sebeb ku di şer de têk biçe. Harûn Aş Şarî di sala 896 an de serî hilda, artêşa xelîfe Al Mutadîd ew perçiqand û asî çûn Ezerbeycanê.[3-56] Di vê jêderê de ji bo Kurdên li dervayî welat sê niqtên girîng hene: **Yek**, di vir de vekirî tê gotin ku Kurdên Celalî; ku ew kalên Kurdên îro ên li Anadoliya Navîn, rojavayê Kurdistan û Xorasan û gelek cîhên din dijîne ne. **Dido**, wê demê ew li Şehrîzor dijîne û serokê wan Hurzad e. **Sêyemîn** jî, ew belav bûne... Çima li Şehrîzor bûn? Bersiva vê Edmûnd R. Leach dide: Rewandûz (Şehrîzor) cîhekî pir asê ye, pir zahmete ku mirov xwe bigihîne wê derê. Tenê rêyek heye, ku ew jî bi direjiya newala Rewandûzê ye û di bin kontrola êşqiyan de ye. Rewandûz ji behrê 925 metreyan bilindtir e, lê li alî Îranê ew carna dibe 3700 metre. Mintiqeka bi av û hênike, ji ber wê, wextê mirov bi çolên Mezopotamya ve muqayese dike dijberiyeke mezin dibîne. Mintiqe li ser kaxiz di bin desthilatdariya Tirkan de ye, lê begên herêmê jiyana xwe serbixwe didomînin. Piştî şer herêm ketê bin destê Îraqê. Li Rewandûzê, di navbera Rayat û Celalî de qişleyeka eskerî ya mezin hate damezirandin.[140-23] Di vir de niqta balkêş ewe, ku hîna jî li mintiqê cîhekî bi navê Celalî heye. **Navê Celaliyan ku di dema Osmaniyan de jî bi kar dihate koka xwe ji vir digire...**

Pîştî şerê Kurd-Xaricî û artêşa Ereban ya li herêma Mûsilê, em êrîşeka Kurdên Şadî-Celaliyan li ser vî bajarî dibînin. îhtîmaleka pir mezine ew bi armanca tolhildanê pêk hatibe. Li ser vê Ansîklopediya Îslamê dinivîse ku; di sala 906 an de Kurdên Hazbanî di bin serokatiya Muhammed B. Bîlal de Ninova xirav kirin. Waliyê Mûsil Allah Hamdan ew taqîp kirin û di şerê li Ma'tûba de têk çû. Xelîfe hêzên zêde şandin û sala din dîsa ketin dû 5 000 hezar malbatên Kurd. Vê carê Kurdan xwestin aştî bikin û bi vî awî dixwestin wext bi dest bixin. Kurd vekişîn Ezerbeycan. Hazbaniyan bi tevlîbûnên teze hêza xwe zêde kirin. Allah Hamdan dîsa êrîşî wan kir û mecbûrê teslîmbûne kirin. Piştre êla Humaydî û xelkê Cabal Dasîn koçber kir.[142-10]

Şehrîzor, yane bajarê zorê bi navê Rewandûz jî tê zanîn. Rewandûz bi êla Şadî ya bi nav û deng ve jî jihev naqetin. Lewra di pêşengiya Şadiyan de li Ezerbeycanê dewleta Şadî-Şeddad ava bû ku îro torinê wan ên li derveyî welat in. Dîsa, li Qefqasan bajarê bi navê Rêwan jî alî heman konfederasyona êlên Şadî ve hatiye avakirin. Wekî me gote, Rewandûz-Şehrîzor keleha Kurdên asî ye. Keleha berxwedanê ye, çend caran artêşa Ereban bi hezaran esker êrîş kir û şerên bi xwînî pêk hatin. Hesnewî kurê Huseyn ku yek ji mezinen Şehrezorê bû, di sala 981 an de ala azadiye li Demar û Şehrîzorê bilind kir. Xelîfê Bexda çar caran artêş şand ser Hesnewiyan, lê wan her çar caran jî artêş şikandin.[9-160] Cîhê stratejîk bi şervaniya Kurdan ve, artêşa Ereban yê ku Împaratoriyan nedikarî li hember bisekinin, kalên Kurdên li derva têk birin. Lê mixabin di dawî de ew jî têk çûn û riya Arran girtin. Gelek nivîskar û jêder êlên li vê herêmê ji me re radigînin.

Gora nivîskar û gerokên Ereban, di sedsala X an de li Ezerbeycanê gelek êlên Kurdan hebûne. Ji wan êlan gelekê girêdayî Şadiyan bûn ku ji wan re Celalî jî dihate gotin. Celalî navê giştiye, ji hemû êlên serhildêr û teslîm nebî re tê gotin; Şadî jî konfederasyon û dewleta ku êlan avakiriye ye. Nivîskar û gerokên Ereb dinivsînin ku li Ezerbeycanê êlên Kurdan ye mîna; al-Barziniya (Barzikan), al-Ayşaniya, aş-şazaptjan, al-Kauhiya dijîn. Ibn Xurdad bin jî lîsteyeka hukumdarê li Xorasan dide û qala nav û dengê wan dike: Prensê Nesa şanê **Abraz**; Prensê Xoristan **Baraz**-Bandeh; Prensê Herat, Buşanc û Badgisê jî navê **Barazan** bi kar tanîn. Yanî her yekî şanê Baraz bi kar tanî. Wekî tê zanîn di kurdî de peyva 'birêz' heye ku dema xîtabê bi kar tê û êleka bi navê Baraz/Berazî jî heye. Mumkune ji van yekî, ji van navan re bingehî kiribe.

Al Masûdî (943) êlên Kurdan dinivîse lê cîhe wan nabêje. Di sedsala X an de li: Fars, Kerman, Sîstan, Xorasan, Nîhavend-Cîbal, Dînaver, Hamdan, (Kermanşah,) Şehrîzor, Darabad, Samafan, Ezerbeycan (Derbend), Cizîr, Sûriye (Şam), Sugura (sînorê Ereb-Bîzans) van êlên Kurd dinîvîsîne: Bazincan, Şuhcan, Şazîncan, Naşavira, **Buzikan**, Luriya, Curkan, Cavaniya, Barisyan, **Calaliya**, **Mustakan**, Cabarika, Curgan, Cabarika, **Kîkan**, Macurdan, **Hazbaniyan** (Mûsil) dinivîsê. Li Sûriyê Dunbilî, navbera Mûsil û Cudî de Yakûbiye û Cûrkan dijmêre.[3-92] Navbera Mûsil û Ararat de Yakûbiye û Cûrkan û nêzîkî

wir Hamîdiye-Merwanî dijîn. Dîsa li dora **Mûsil Kîkan**, Maraniya û Bohtiya jî dijin.(3-93) Li Ezerbeycanê Hezbanî û Sarat (şûrat=Xaricî); li Cîbal Şadî, Lûr-Lazba, Madanyan, Mazdanakan, Barisan, **Xalî (Celalî)**, Bûzikan û **Kîkan** li dora Mêrdîn.(2-64) Mînorskî dibêje Sughur li dora Kîlîkya ne.

Masudî (332=943) yê ji Bexda van êlana dijmêre: Li Daynavar û Hemedanê Şuhcan; li Kangavar: Macurdan; Ezerbeycan: **Hazbanî û Sarat**, hîna jî li xwarê **Şadacan**, Lazba (Lurrî?), Madancan, Mazdanakan, Barisan, Halî (Celalî), Cabarkî, Cavanî, Mustakan. Li Sûriyê: Dababila; li Mûsil û Cûdî Kurdên Yakûbî yên xiristiyan û Curkan (Curugan). Îştîharî jî vana lê zêde dike: Naşavîran, Buzikan û Kîkan (niha li dora Mereşê ne). Bi vê re cîhên ku berê Kurd lê dijin jî dinivîse: Fars, Kirman, Sicistan û Rûmum ên li Xorsan û Îstîşarî gundekî li Asadabad ê û beşek ji êla Bazancan ê li bajarê Esfehanê li bajarekî bi navê Kurd de dijî lê zêde dike. Ew nivîskaran dibêjin li gelek deveran û li Hemedan, Şahrîzor, Ezerbeycan, Ermenîstanê Kurd di xaniyên kerpîç û keviran de rûdiniştin. Mûkaddasî jî dibêje: Li Arranê deriyê cografîk yekî navê xwe **Bab al-Akrad** bû. Îbn Miskavayhî jî: dema Rûsan di sala 943 an de herêm îstîla kirin di emrê waliyê herêmê de Kurd hebûn.

Li herêma Farsê jî 33 êlên koçber ên Kurd hebûn. Gor îdea Farsname (500=1107) di artêşa Farsan ya kevn de ramm( koma) herî mezin Kurd (Cîloya=Kuh Galu ye îro Lor rûdinin), Zîvan, Lavalîcan, Kariyan û Bazancan) bûn, lê vana di dema Îslamê de ji holê rabûn. Kurdên din ji alî Azud al-Davla ve ji Fars rakirin Esfehanê. Ji holê rakirina 500 000 malbatî qebûl kirin zahmet e, lê mumkune ku vana asîmîle bûne yan jî di nava êlên Fars de wenda bûne.(142-7) Gorî Fars-namê (1107 PÎ) Kurdên herî bi nav û deng ên ku vê demê di nava artêşa Îranê de cîh digirtine; wek, Ciloya, Zavan, Lavalican, Kariyan û Bazancan in û bi şerê di dema Îslam de ji holê rabûn (500 hezar malbat).(51) Îhtîmaleka pir mezine, ku ew çûn Xorasan an başûrê derya Kesk.

Dîsa Mesûdî di sala 943 an de di pirtûka xwe ya bi navê "Mûrucûz-Zehep" de dibêje: Li dora Dîcle **Çuruhan** dijîn ku hinek ji wan bûne xiristiyan û bi Xalaçan ve cîran û birane. Vana misilman in û girêdayî Kîkî ya ne. Kîkî-Khalaçan ji berê ve, di navbera Mêrdîn, Amed û Riha de dijîn. 24 êlên girêdayî Xalaçanê Kurmanc jî şaxekî wan in û ji berê ve li Malazgîrt dijîn.(128-27) Di vê serdemê de tê dîtin, ku hinek êlên li Qefqasan jî xiristiyanî pejirandine, lê li ser wan agahiyên berfireh mixabin nînin.

Birêz Xemgîn ji belgeyên dîrokî navê gelek êlên Kurd radigihîne, wek: Tammanî (Bothan), Namrî (sala 900 BÎ), Kullar (îro Kurkur-Gurghur) li Darban-î Ramkan dijîn, Sumbiyan li Qele Diz bûn. Ji bilî wana hinekan jî tenê nav derbas dibin: Memikan, Boxîran, **Reşgatan**, Mendikan; li Îranê jî: Baban, Mukrî, Mussassir, Îder, Dagara, Kurulla, Altabrîa, Kîrrur bûn.(4-190)

Her çiqas artêşa Erebên barbar li Kurdistanê rê li gelek kuştin û wêraniyan vekiriye jî, bixwe jî lawaz bû. Ji vê rewşê Bîzans sûd wergirt. Di sedsala X û XII an PÎ de, ji lawazbûna artêşa misilmanan îstîfade kir û dîsa berê xwe da

rojhilat. Sînorên xwe heta Qefqasan direj kirin. Di vê belavbûnê de Kurdên misilman hemî kuştin, yan jî koka wan kolan. Bîzansan (963-969) li rojavayê Firat, Kizilirmak, rojhilatê Torosan, Kommagene, Kapadokya, Pontûs û Sûriyê Kurd ji kokê xwe veqetandin. Şûna Kurdan Ermenî û Aramiyên xiristiyan bi cîh kirin. Mumkune xiristiyanî qebûlkirina Kurdan jî li ser wan esasan be. Yanê ji tirs û êrîşên Bîzansan ew mecbûrî vê kiribin. Lewra dem û cîhên xiristiyanan girtine û polîtîka wan vê yekê derdixe holê. Abûl Farac dibêje: Di salên 1035 an de Roma tim êrîşî Riha dikirin. Waliyê Harranê jî kurê Vatab ê mensûbê Nûmeyîran bû. Romiyan êrîşî Riha, Harran, Aksas û Serugê (Sîweregê) dikirin û talan dikirin. Vatab baç dayin pejirand û bi ser vê de Romiyan êrîş nekirin. Vatab ji Kurdan û ji **kurên Maadan (yanî ji koçberan)** artêşeke mezin çêkir û êrîşî Roma kir. Sîbabarak heyna û 3500 zilam kuştin û jin bi zarokan ve dîl girtin.[48] Bi navkirina Kurdên koçber balkêş e, ji ber vê sedemê hêjayê lêkolînê ye.

Bi vî awayî Kurdên ku li ser rêxistina êlî jiyana xwe dom dikirin, ew qaliba neşikandin, lewra êlên Kurd pir bi hêz bûn, lê têra dijminan nedikirin. Ji bo vê jî, ji her alî ve rastî êrîşên dijminan hatin û bi hêsanî belav bûn. Ev yeka di her serdemê de pêk hatiye. Ji serdema Asûr bigre heta dema Xelkên Deryayê, Ereb û Bîzansiyan. Dema Kurd yekîtî çêkirine jî dewletên mîna Şadî û Împaratoriyên mîna Medê ava kirine. Piştî serdema Emewiyan ya bi xwîn, rengekî din ên Ereba ya bi navê Ebbasî hatin ser textê xelîfetiyê. Di serdema wan de jî rewş çûda nebû, lê piranî bi helwest û yekîtiya Kurdan re girêdayî bû.

## SERDEMA EBBASIYAN (749-1258)

Bê guman hemû dîroka Îslamê ji bo Kurdan girîng e; lewra vê îdeolojiya nû bi her awayî hestiyê pişta Kurdan şikand. Dîrok, ol, çand, desthiladariya Kurdan xira kir û Kurd wekî hemû desthilatdarên din ji hev qetandin û ji bo sîstema xwe kirin mertalên parastinê. Ji bo vê, girînge ku dîroknûsên Kurd, li ser vê dîrokê bi şêweyekî kûr û dervayê dîrokên fermî yên dagirkeran rawestin û ji nû ve binivîsîn. Di vê beşê de, emê bi taybetî li ser serdema Ebbasiyan rawestin. Sewa ku Ebbasiyan li destpêkê Kurd wek şirîkên desthilatdariyê bi kar anîn; pişt re jî zivirîn ser Kurdan û ew kuştin; bi darê zorê ew koçber kirin û xwestin asîmîle bikin. Pêwîste mirov vê jî binivîse; ku eger Kurd nebana Ebbasiyan ti caran nedikarîn desthilatdariya Emewiyan têk bibirana.

Wekî me li jor jî got; pêxemberê misilmanan li ber mirinê wesiyet kir ku bila li cîhê wî îmam Elî rûnê; lê malbata Omediyan destûr nedan vê yekê û di nava wan de nakokî û şerê berjewendiyê destpêkir. Di dawî de, bi dor ew xelîfe hatin ser kar:

Ebû Bekîr : 632-634
Xelîfe Omer : 634-644
Xelîfe Osman: 644-656

Xelîfe Elî : 656-661

E. Cemîl Paşa dibêje; di sala 646 an de Osman bû Xelîfê Îslamê. Pey Osman di navbera Ereban de pevçûnen dijwar pêkhatin. Di dawiyê de Muawiye Îbn Ebî Sufyan bû xelîfê çarîn. Xelîfetiya Emewiyan 89 salan ajot û di sala 759 an de dawî lê hat.[9-157] Di dawî lê hatinê de rola kalên Kurdên îro li dervayî welat bingehîn e. Di pêşengiya Eba Muslimê Xorasanî de, Emewî têk biribûn. Ew Kurdên îro li navênda Anadolê, bakûr rojavayê Sûriyê û rojavayê Kurdistan neviyên wan Kurdên bi Eba Muslimê Xorasanî ve li hember Emewiyan têkoşîn dane. Yanê bapîrên Kurdên li dervayî welat bûn. Xelîfê Ebbasiyan yê yekemîn Ebu-l Ebbas Abdullah (749-754); yê duyemîn jî Ebu Cafer el Mansûr ê ku di sala 755 an de Eba Muslim kuşt.[36] Kurdên ku li Qefqasya û navenda Xorasanê kombûnî, heta dawî dijberiya misilmantiyê kiribûn, bi rêberiya Eba Muslim vana desthilatdariya Emewî rûxandin û rêvebiriya Ebbasiyan hat ser textê xelîfetiyê. Lê pir neçûbû ku vana jî rûyê xweyî dijminatiyê aşkere kiribûn ku dîsa têkoşîn kete para Kurdan.

Kurdên ku dijîtiya misilmantiyê dikirin yên li Riha, Amed, Meletî, Adiyaman, Mêrdîn, Nisêbîn, Sêrt, Xelat, Mûş, Malazgîrt, Erdîş û Çewlikê rûdiniştin. Van Kurdana ji Emewiyan re alîkarî kirine û keça xwe dane serokê Emewiyan yê dawî Merwan, ku diya wî jî Kurd bû.[32] Eger ev îdea rast be, wê demê, di wê bûyerê de Kurd bûne du beş. Beşê yekemîn E. M. Xorasanî pêşengî dikir ku li Xorasan û Qefqasya bûn û li dijî Emewiyan şer dikirin. Beşa din jî alîgirê Emewiyan ên ku Merwanê çavşîn xwarziyê Kurda ye. Ew dubendiya gelo li pêşerojê bû sedema cûdahiyên mezin an na? Pêwîste dîroknûsên Kurd vê yekê derxin holê. Wek mînak, mirov dikare bipirse û bibêje gelo di bingeha ji hev veqetîna Pezgewr û Pezreşan (Beraniyan) de sedema herî mezin ew bû an na? Mirov dikare pirseke bi vî rengî jî bike: Gelo Kurdên niştecîh aligirên Emewiyan û yên koçber jî alîgirên Ebbasiyan bûn?

Di serdema dawiya Emewiyan û destpêka Ebbasiyan de, gelek şerên bi xwînî yên Kurd û Ereban em dibînin. Di dawiya van şerane de, bi zorê koçberiyeke Kurdan yê mezin pêk tê ku ew heta roja îro li ser me û dîroka Kurdan bi giştî bandor hiştiye. Bi vî awayî li destpêka Îslamê Kurdan zirareka mezin dîtibûn û di merhela duyemîn de jî, di destpêka Ebbasiyan de Kurd bi zorê li gelek cîhên ji hev dûr hatin bi cîh kirin. Li ser vê koçê Doç. Yilmazçelîk dibêje: ji Xorasan û Turkîstanê, di salên 756-760 an de gelek Tirk (di esas de ew Kurd in-Ş) anîn li rojhilatê Anadolê bi cîh kirin.[116-13] Waliyê Cizîrê Abdullah Îbrahîm bi fermana xelîfe Mansûr **li Meletî û dîsa di sala 760 an de xelkê Xorasan li Edenê bicîh kirin**. Mumkune ku ji ber heman sedemê em dibînin zenda Şadiyan ji xanedana Rêwandîya li Qefqasyayê serî hildide. Xemgîn dibêje: Êla Kurd Rêwandî, di dema Emewiyan de ketibû bin desthiladariya wan. Di dema Eba Muslim de gelek alîkarî dan wî ku Emewiyan têk bibe. Di sala 756 an de Rêwandîyan seri hildan. Di rêvebiriya serleşkerê Eba Mukanna de Taberîstan û Rêwandî ji destên Ebbasiyan derxistin. Mukanna ji qebîla Mervê Rêwandî

bû. Ew serhildana ji alî lawê xelîfe Al Mahdî di sala 759 an de bi xwînrijî hate perçikandin. Herdem jî êrîşî Kurdistan kir û di şerê li hember Rêwandîyan de, 774, serokê êlê mir.[101-33] Piştî vê serhildana bi ser neketî jî, êdî Ereb polîtîka li gorî dilê xwe dimeşînin û Kurdên wir jî beşekî dişînin Anadolê.

Dîrokzanê Kurd Cemal Reşîd Ahmed û hinekên din dibêjin xelîfê Ebbasî û Emewiyan (661-750) gelek êlên Kurd anîn li navbera xwe û Bîzansan de bi cîh kirin. Xelîfê Ebbasiyan yê bi nav û deng Harûn el-Reşîd (786-809) êlên Kurdên bi navê **Badilî û Şadî ji Kandahar, Mazenderan, Xorasan û Secsecîstanê anîn û di xeta navbera Canîk (Samsûn), Qeyserî û Sîs (Edenê) ê de li hemberî Bîzansan bi cîh kirin**. Ji Badiliyan 125 ber û ji Şadiyan (18 500 xane ne û li Eleşkirtê dijîn, hinek jî li Dersîm û Ezerbeycanê ne) jî 75 êl anîn. Rola wan li pêşiya artêşa Îslamê wek mertal bûyin bû. Ew êl û zendên ku tên qal kirin beşek ji kalên Kurdên îro li dervayê welat yan jî ewên ku zimanê xwe şikeştine ne... Niqta ji bo me girîng ewe, ku wê demê ew li Qefqasya û li navenda Xorasanê bûne. Ew demeka dîrokî û girînge. Ya din, ew êdî bi temamî deshiltdariya misilmanan pejirandine û teslîmî wan bûne. Bi ser vê de ye, ku ew anîne li Anadolê bi cîh kirine. Lê bal bê kişandin ku tenê êlên di nava zendê Badilî û Şadî de ne. Li Anatoliyê ew belav bûn û ji wan jî federasyonên din derketin. Ew herdû bi qasî 200 êlan xuyadikin ku hejmareka pir zêde ye. Lewra îro li Xorasanê nêzîkî 110 êl hene... Paşê bi wasîta wan misilmanan êrîşî Anadoliya Navîn kirin. Van Kurdana di bin serokatiya Seyit Bettalê Meletî de êrîş dibirin ser Bîzansan û heya nava Anadolê çûn. Seyît Betal berê Rafizî, Babatî û Bektaşî bûye. Gor nêrîna min **ew Kurdên hanê piştre wek Germanî tên bi navkirin...** Ji bilî wan Kurdên anîne Anadolê, Merwan El Hîmar ji bo seltenata xalanê xwe, ji Kurdên Kermanşah û Hekariyê beşek, ji bo parastinê li navbera Şam û Libnanê bi cîh kirin. Ji Ebbasiyan dîsa El Mûtasim **(835) qebîlên Birohî-Bilocî-Bilohî** (Biroxî-Ozkardeş) (Bi dîtina min ev Beravî ne) li Belûcîstanê bi cîh kirin ku erîşên Selçûqiyan bide sekinandin da ew bixwe li Bexdayê rihet be.[28] Gor van agahiyan forma bicîhbûna Kurdan jî derdikeve holê. Heta roja îro jî hîn şopa vê bicîh kirinê em dibînin û dijîn. Ji aliyê din ve misilmanan ji şervaniya Kurdan zêde zêde îstîfade kirin û sînorên xwe fireh kirin. Di dema Harûn-ûr Reşîd de sînorên Îslamê digihîştin Mavera-ûn Nehîr, Tatarîstan û Hîndîstanê.[136-167] Di sala 1096 an de hêza Ebbasiyan kêm bû. Bi ser vê de, li Îraq û dora Şamê tevgera êlên Tatar û Tirkmen li hemberî xiristiyanan tûj bû.[136-175] Di wir de nikta girîng ew e, ku di wê demê de Tirkmen li wir hebûne û Tirkmen jî wek ketî bin mêjiyê me ne Tirk in...

Ekrem Cemîl Paşa dibêje: Di sala 750 an de xelîfetiya Emewiyan ji alî Eba Muslimê Xorasanî yê Kurd ve hate rûxandin û li şûnê xîlafeta Ebbasiyan hat danî. Bi ser vê de li Kurdistanê bê hejmar mirîtî sererast bûn û ew gelek keleh, bûrç û şato saz kirin. Ev mîrîtiyana wiha ne:

1-Erdelan (Kelhor): Pilingan, Derteng, Tahîdest.

**2-Siyahmensûr**

3-Cengî
4-Zengene
5-Pazûkî
6-Somay
7-Soran
**8-Mahmûdî**
9-Mukrî
10-Baban
11-Biradost
12-Behdînan
13-Hekarî (Sîno)
14-Mikis
15-Bedlîs
16-Mûş
17-Sipayerd
18-Sason (Herzo)
19-Botan: Azîzan, Gurgîl, Fenîk
**20-Hesenkêf**
21-Sêrwan: Kufra, Kefrî, Îron
22-Xerzan
23-Farqîn
24-Batman
**25-Zirkî: Derdin, Gûrdîkan, Hatax (Lîce), Tercîl**.
26-Qulp
27-Çepaqçûr
28-Gênc
**29-Mirdasî: Egil, Palo, Çêrmûk**
30-Sîwerek
31-Çemîşgezek: Mencî Kurd, Pêrtek, Sekman
32-Koçhîsar
33-Dûrik
34-Egîn
**35-Rişwan(Reşî)**
**36-Entab**
**37-Kilîs**
38-Sorikan
**39-Mendêlan:** Mêrdîn, Qesrîk in.

Mîritiyên Kurd bi avakirina van kelehan xwe ji êrîşên Moxol, Tatar û Tirkan parastin. Lê gelekan jî xwe nikarin biparêzin û wenda bûn.[9-188] Mixabin rehmetî cîhê Piraniya ji wan mîrîtiyana diyar nake, dîsa ji bo lêkolîna me girîng in. Ewên ku me reş kirinî, Piraniya kalên Kurdên îro li Anadolê, Xorasanê, rojavayê Kurdistanê, rojavayê Sûriyê, Rûsya û cîhên din in. Hîna jî Zerikî, Reşî,

Mirdesî yê bi navê xwe li Anadoliya Navîn, Xorasanê û cîhên din hene.

Li jor jî min qala beşek ji Kurdên hatinî kiribû ku xelîfe Mansûr hinek Kurd **li Meletî di sala 760 an de bi cîh kiribûn min got ew êlên ku dewleta Germiyan pêk anîne. Di dû wan jî gelek êl û zend anîn. Piştî 60 salan em wana li rojavayê Anadolê dibînin**. Birêz Varli dibêje: Dema Xelîfê Ebbasî yê bi navê Memûn (831) de misilmanan bi Roma re şer kirin. Artêşa misilmanan heta Qestemonû û Menteşê (Aydin) çû. Kurdên bi navên **Xaldî, Germavî û Şadî** li dora Kurdîbolî, Kurdî Hîsarî Afyon, Qestemonû û Hamîd Abadê bi cîh bûne.[32] Ji van navana Şadî baş tên zanîn lê yên din ji bo zêde ne zelal in. Germavî ji navê êlan zêdetir navê herêmekê ye. Hîna jî li Meletiyê bi wê navê herêmek heye. Ji vir mirov vê yekê derdixe ku êlên ji vê mintiqê hatî, îhtîmaleka pir mezine ku Reşî di nava wan de hene. Xaldî, di dîroka kevn de derbas dibe û min qal kiribû. Eger mirov konkrettir bike û bibêje ku gelo ew Xelikiyên îro ne, çawa dibe? Dema mirov tevgêra wana dîrokî dide ber çavan ew ne xeyaliye û îhtîmaleka mezine. Bi vî awayî wekî tê îdea kirin: yên cara yekemîn hatine Anatoliyê Tirk in yan jî Selçûqîne (di wata Tirkan de) ne raste. Yên yekemîn hatin rojava û mirîtî avakirine kalên Kurdên îro li dervayî welat in. Varli jî vê yekê piştrast dike: Tirk dibêjin ew ji Selçûqîne, lê têkiliya wan bi Tirkan re tine; vê demê Tirkek hîn derbasî wî alî nebûbû. **Şixa Şîkarî û Munecîmbaşî bi Erebî, vekirî gotiye ev Kurd in**.[32] Di beşa Selçûqiyan de jî emê qal bikin, lê di lêkolînê li ser kevirên gorên li Afyonê hate kirin de jî şopa Kurdan îspat dibe. Ji bo vê guman nîne ku ew Kurd in.

Kurdên ku wek mertal bikar dihatine di nava hêzen mezin de gelek caran rastî ziararên mezin dihatin û li hember zordariya Ebbasiyan jî di her firsetê de serî radikirin. Di destpêka sedsala IX an de artêşa Bîzans dora Firat û Sûriyê kire destê xwe, komkujiyeke mezin pêkanî û berê xwe da Meletî. Li wir di sala 837 an de têk çûn û vekişîn. Lê ji bo ku herêm tampon bû gelek komkujî çêdibûn. Kurdan, di bin serokatiya Cafer Mîr Hesen de, sala 839 an de li hember Ebbasiyên zilimkar serî hildan. Piştî çend şeran Kurd têk çûn. Di sala 890 an de li Colemergê jî serhildan pêkhat û êlên wek: Diyioya, Dihivan, Lavatîdyan, Karyan û Barzanî tevlî bûn û Ebbasiyan 500 hezar malbatên Kurd kuştin.[101-79] Torî jî dibêje, di dema Xelîfe Mêhdî de bû. Lê di dema Xelîfe Memnûn û Mûtasim de jî berdewam kir. Begên Tirk di şikil de girêdayî xelîfe, di pratîkê de bi serê xwe diketin tevgerê. Li dijî Bîzansan êrîş dikirin û taybetî jî êrîş li ser Antoliya Navîn bûn. Fermandarê Bîzans Jûanis Coûrscoûas di salên 928, 947, 959, 1030 an de rojava yê Kurdistanê û Ezerbeycan hemû kirê bin kontrola xwe û girêdayî bacê kir. Samsat xelandin.[38] Çi dibe bila bibe, di dawiya wan şer û êrîşan de bi piranî Kurdên di navbera wan hêzan de zirar dîtin. Niqta din ê girîng jî em dibînin ku Împaratoriya Rom Kurdan birine Trakya. Di derdora salên 1260 an de Roma 10 hezar Kurd birin alî Trakya ku pê êrîşên Latîniyan (di sala 1204 an de Stenbol heynabûn) ên li ser Stenbolê bibirin. Piştî çûyina Kurdan, Stenbol di sala 1261 an de hate rizgarkirin. Lê çi

bi serê wan Kurdana hat em nizanin.

Di pirtûkên lîsê yên Tirkan de tê gotin: ku di sîstema Ebbasiyan de wezîrtiyê cîhekî girîng digirt, wezîrê yekemîn Yahya B. Halîd el-**Bermekî** ku bi eslê xwe Îranî ye. Bermekiyan heta sala 830 an wezîrtî kirin.(148-135) Wekî gelek caran em tînîn ziman di wêjeya Tirkan û nûserên wan de peyva Kurd nîne; di cîhê vê de, peyva Îranî yan jî Fars bikar tînin. Wekî têyî gotin ew malbateka Kurd e. Di roja îro de wekî Sewêdî derbas dibin ku xas Kurd in û bi nijada xwe gelek serbilind in. Neheqî li vê malbatê-êlê hate kirin û dîroka wan emê di beşa êla Sewêdî de qal bikin.

Di dema Ebbasiyan de alên bikar dihatine jî balkêş in û pir caran nûser li ser wan dikevin nava şaşîtiyan û xelet tê nivîsîn. C. Paşa dibêje: Nîşana xelîfên Ebbasî sancaqên reş bûn. Xelîfe Mûstadî ji bo serkeftina Seleheddîn û Nûreddînê li Misrê ji wan re ew xelatana şandibûn. Ew ji bo şehîdên Kerbelayê bû. Paşê Elewiyan êrîşî ser Ebbasiyan kirin û ji bo ku dijberê wan be alên spî hilkişandin û bi navê Mûbeyyeze navdar bûn. Paşê xelîfe Me'mûn reş rakir û kesk kire şûna alayê û kincan.(136-39) Îro jî bandora keskê berdewam e. Lê dema Kurdên li Xorasanê li hember Emewiyan serî rakirin alên sor rakiribûn. Hinek nivîskar vê wek reş didin xuyakirin lê bi dîtina min rengê vê sor e.

Piştî dawî li hatina xelîfetiya Ebbasiyan, Hûlagû Xan Bexdayê jî zept kir û berê xwe da Şehrezor. **Êlên Kurdên ku li wir dijiyan şand Cizîr, Şam û Misrê, 1257/8.**(59) Îhtîmaleke mezine ku evên hatine Şexbiziniyên îro li Anatoliyê, Kurdistan û evên li Haymana ne. Lewra dema min ew lêkolîna dikir gelek caran çûm gundên Şêxbizina-Lera û hinek gundiyan digot yekemîn cîhê ew lê bi war bûne Cizîr e. Heta hinekan digot tapoyê gundên me li wir derdikevine. Bê guman ew ji bo hemû Şêxbizinan derbas nabe, mumkune hinek hatibin Cizîrê û ji wir jî belav bûbin.

## SERHILDANÊN XARICIYAN

Di lîteratûra Îslamê de komên ku li dervayê sîstema Misilmanên sunnî mane, ewên ku ji sîstemê re sar û dijberiya sîstemê dikirin re digotin Xaricî; yanî kesên li dervayê sîstemê. Bi kurtî muxalifên misilmantiya sunnî ew nava lê dikirin. Mamoste C. Bender dibêje: Ji ber şerê Mûavîyê û Îmam Elî, neheqî, xizanî, êş û tevlîhevî zêde bû. Piştî şerê bi hakem, ku navê xwe Yezîd Asim bû û biryar da ku du alîgirên Elî û Mûavîyê bên kuştin û dawî li şer bê. Piştî wê got: "Hukim tenê yê Xwedê ye" û bi ser vê de bi deh hezaran esker ji Elî veqetîn. Ew di bin vê dûrişmê de gîhiştin hev. Wana, kesên bawerî bi Elî û Mûavîyê dianîn kafir îlan kirin û bi vî awayî Xaricî derketin holê. Bi ser wê de Elî zayif ket û Mûavîyê jî bi hêz bû; lewra gelek ji wan alîgirên Elî bûn. Pir muhafazakar in, têkçûne qebûl nakin û girêdayî fikra cebrî-şîddetê ne.(123-74) Gor Faik Bûlût jî wiha ye: Kesên ku ji artêşa Xelîfe Elî û yên li dijî Îslama sunnî derdiketine re Xaricî dihate gotin. Wana navê xwe ji cîhê ku li kêleka Firatê yê bi navê

"**Harûriye**" kom bûn ku li dijî Elî şer bikin girtin. Xaricî, 20 rêxistin in; yên herî mezin Hafssiyê û Harisiyê ne. Ji wan milana Yezidiyye di bin bandora ramanên Îranî de mabûn, şerîata Îslamê red dikin û dixwazin ji holê rakin derketin holê. Gelek nivîskar derketina Xariciyan bi şerê Elî-Mûavîyê ku li Siffinê derketî û bûyera Hakem, yanî salên 657-659 an ve girê dide. Serokê Xariciyan Abdullah bin Vehb el Rasibî ji Elî vê yekê dixwaze: 'Em ji ber xelkê bajar yê zilimkar derin serê çiyayên xwe'. Li dijî Osman li gel Elî bûn, ji ber ku; Elî dostê feqîran xuya dikir, lê paşê hat fêhm kirin ku ev şerê desthilatdariyê bûye. Xaricî, gelekî wekhevî hez (şîrîkî) û li hev xwedî derketinê pêk anîne. Ji gelên bindest re alîkar bûne; kole azad dikirin û xwediyê gotinên xwe bûn. Giringiyê didin wekheviya jin û mêran. Jinên şervan di nava wan de hene. Jina bi navê Şebîbê, serokê Xariciyan Gaxelê yê bi navê Cehîxê Haccacê yê bi zilimkariya xwe tê nasîn têk birin.[40] Xaricî; bi navê Ezrakiyye (Ezarika), Sûfriyye, Bayhasiyye, Ibadiyyê dibin çar beş. Li gelek bajarên rojhilatê Kurdistanê û Xorasanê, di sala 690 an de gelek berxwedanên Xariciyan hene. Xaricî dijminê Emewiyan ên sondxwarî bûn.[36] Sedema vê Emewiyan gelek zilim û tadê li misilmanên ne Ereb dikirin; ji ber vê yekê xelkê ne Ereb, nêzîkî koma Ehlîbeyt (Mihemmed-Elî) dibû û bi wan re dibû yek. Raman û felsefa wan dipejirandin û ji wan re xizmet dikirin. Ji ber wê, bi taybetî jî li: Îran, Xorasan, Kurdistan alîgirên Elî û Îmaman gelek zêde dibûn.[123-58] Yanê ew piştgirî ne îdeolojîk e, ji bo ku Elî mexdûr e Erebên nijadpereste li desthilatdariyê bû, bi awakî muxalif xuyadikir û vê pozîsyonê piştgiriya Xariciyan digirt. Bi kurtî Xariciyan xwe ji ava kûr davêtin ya kêm kûr...

Cîhad û împeryalîzma Ereban di pêvajoya belav bûnê de gelek talan û komkujî kirin. Sîstemeka nû ya bê tolerans û înkarkirina çand û ola kevn ferz dikirî bû. Ji bo wê jî di zilmê de sînor tunebû. Ji bo ku ew şerê zilim li ser gelan sivik bibe, bê guman tevgerên dijber jî diketin pêvajoya avabûne. Li ser wê birêz Ocalan dibêje: Emewî, di dagirkirin û şer de weqas pêşta çûn û weqas hovîtî kirin, ku tevgereke li hember vê jî derket holê. Tevgera Xariciyan û 12 îmaman û gelek rêxistinên Batinî bingehê xwe li wê demê hate avêtin.[72] Di dema xelîfe Al Mansûr (754-775) de tevgera Mazdakî bi pêşket, **Xûrremît** (nêzîkî Mazdakî ye-Qizil-Alsora) di serî de li Xorasan, Asya Navîn û Ezerbey-canê gelek aktîf bûn. Sor; sembola ji bo azadî canê xwe fedakirin e.[3-44] Li wan cîhên ku têne qalkirin de Kurd bi piranî dijîn û pêşengên Alsoran jî Kurd in. Ew Kurdên ji ber vê zilme reviyane hemû li wan herêman civîn û tevgerên olî yên nû derxistin holê. Bi hêzbûna artêşa îslamê û bê sînor bûna wan di dawiyê de ew rêxistinên radîkal jî nerm kirin...

Di dema xelîfe Abdulmelîk de, Kurd beşdarî serhildana Abdurrahman bin al-Aşas bûn. Di sala 702 an de Abdurrahman bi Kurdên navê xwe **Sabûranê** ku li Farsê dijîn re kete nav îttîfaqê. Di sala 735 an de Kurd tevli şerê Emewiyan yê xanedaniyê jî bûn û xwe dan aliyê Merwanê II an û wî jî Abdulmelîk têk bir.[65] Xariciyan, bi enerjiyeka bê tevabûn ji Mûaviyê heta Merwan B. Muhammed

(750) bi xelîfên Emewiyan re şer kirin. Ji navendê gelek derbeyên dijwar jî xwarin, lê li herêmên dûr ên mîna Xorasan, Ûman, Yemen, Afrîka Bakûr tevgera xwe domandin.[105-30]

Serhildanên Xariciyan yên li Xorasan pêk dihatin Emewiyan bi zahmetî têk dibirin. Di sala 776 an de birêvebirê Ebbasiyan yê herêmê Yûsûf bin Îbrahîm (El Berem) serî hilda. Paşê neviyê xwe Mansûr Ab'bin Yûsûf dom kir. Xelîfe Memun bixwe çû wî şerî û ew têk bir. Di dema Harûn el Reşîd de jî, li Sîstanê ji xelkê wir yekî bi navê Evk Huseyn serî hilda û di sala 793 an de hat kuştin. Paşê ji Xariciyan Hemze bin Etrûk di sala 795 an de serî hilda û ew xelkên bi navê Evk û Cûveynê ku bi alîgiriya Xariciyan dihatin nasîn ji alî misilmanan ve hatin kuştin, gundên wan hatin şewitandin û bi gîştî 30 hezar kes hate kuştin.

Kurdên Mûsilê di sala 866 an de ji serokê Xariciyan Mûsavirê ku Mûsil dagir kirî re hevkarî kirin. Di sala 875 an de jî Kurdan roleka giring di serhildana kolên reşik yên di bin serokatiya Ali Muhammed (Habis) de hatî kirin de lîstin. Di sala 906 an de Kurdên Hazbanî êrîşî Mûsilê kirin, her der xirab kirin û waliyê Mûsil têk birin. Xelîfe artêş şand û ketin şopa wan; wana jî berê xwe dan Ezerbeycanê. Ew Kurdên ji vir çûnbûn paşê dewleta bi nav û deng a Şadî ava dikin. Şadî zendekê pir şervan û mezin e. Di bin sîwana vê devletê de, bi qasî min tespît kirî sê kon/federasyonên êlên Kurdan hene. Vana Şadî, Reşî û Badilî ne. Dewleta Şadî bi Vîkîngan re jî gelek caran şer kirine. Ji bo wê, beşa piştî wê ya bi navê têkiliya Vîkîng û Kurd de, emê li ser rawestin.

Di dema Xelîfe Mûktedir (942) de jî, Kurdan aliyê Mûsil rûxandin; lê ji alî waliyê bi navê Hamdanî ve hatin ceza kirin. Kurdên Celalî ji hemûyan pirtir li ber xwe dan.[51] Celalî, şervanên Kurdên koçber in; ew ji şer qet paşve gav navêtin û heta dawî ol, çand û nasnama xwe parastin û stû li hember Ereban xwar nekirin. Ew Celaliyên ku navê xwe derbas dibin, di bingeh de navê Kurdên Şadî, Reşî, Badilî û yên din ê giştî ye...

## TÊKILIYA KURD Û VÎKÎNGAN

Wek tê zanîn ji kalên gelên Danmarkî, Swêdî, Norweçî û Îslandî re Vîkîng tê gotin. Tê gotin ku gelê cara yekemîn Amerîka keşif kirî jî ew in. Hinek çavkanî dibêjin dora salên 800 PÎ serdema wan destpê dike, lê gelek belge berî vê demê destnîşan dikin. Dema wan ê herî bi hêz dora salên 800 an bê gotin rastir e. Vîkîng, hê ku ji hev veneqetîbûn li Skandînavya, bi taybetî jî li başûrê Swêdê û li Danmarkê kom bûbûn. Ji ber sedema li bakûrê welatên wan hê jî şertên jiyanê kêm bûn, xelkê Vîkîng jî debara xwe bi masî girtinê û talana welatên din dikirin û li başûrê Swêdê kêm çandinî jî hebûye.

Di navbera kalên beşekî Kurdan û Vîkîngan de jî tekilî û şerên balkêş qewimîne. Tê bîra kê ku ji Skandînavya heta bakûrê Kurdistanê Vîkîng herin û bi Kurdan re şer bikin? Gelek kes vê yekê bawer jî nakin! Mirov dikare maf

bide wan, ji ber ku wek cografîk ji hev gelek dûr in û mirov qet bawer nake ew têkiliyên dîrokî qewimîne. Çima Vîkîngan êrîşî welatê Kurdan, bi taybetî jî kalên Kurdên îro li Anadola Navîn û Xorasanê ne kirin? Lewra welatê Kurdan wê demê di nava xêr û heyiyê de û Vîkîng jî feqîr bûn. Îspata vê ya li ser kevirekî ji Vîkîngan de mayî, niha li Gripsholmê wiha tê nivîsîn: **"Ew ji bo zêr, ji bo ku xwarinê bidin teyran çûn başûrê Şerqland (welatê Şerqê) û li wir mirin"**.(196-210) Di vê belgê de jî vekirî tê diyarkirin, ku ew ji bo zêr çûne welatê Arran. Ji bo vê armancê; Vîkîngan li ser rûyê dinê êrîşî gelek welatan kirin. Wek mînak: Ji Çîn, Bexda yê bigre heta Spanya û gelek welatên Ewrûpa yên din. Ji vê belgê em fêhm dikin ku ew ji bo dewlemendiya Kurdan çûne, lewra ew timî êrîşî cîhên dewlemend dikirin. Piştre tê gotin ku ew ji bo xwarinê bidin teyran çûne. Mirov vê hevokê dikare bi du şiklan tercûme bike: Yek, Vîkîngan xwe wek teyr didîtin; ya din jî, di wata wana Kurd kuştin û ji teyran re kirin xwarin... Niqta din ê balkêş jî navê Şerqland e. Di belgeyên swêdî de beşek ji welatê Kurdan wek **Şerqland** hatiye binav kirin. Bi zimanê Bîzansî jê re digotin welatê **Saracener**, yanê welatê misilmanan. Lê, bi dîtina min ya herî rast mirov vê wek welatê Saka bixwîne û şirove bike rasttir e. Ereban wê demê, ji rojhilatê xeta di nabera Antalya û Gurcistan îro re digotin Şerq. Peyveke erebî ye û di wata aliyê roj hiltêyî de ye; ji vî zimanî derbasî tirkî jî bûye. Xuyaye ku Swêdiyan ev navê ji lîteratûra Ereban wergirtine; eger ne wiha biya, pêwîste bigotane Arran. Lewra navê herêmî yê herî kevn Arran e.




**Nexşa rêyên Vîkîngan** (National Geographic nr 1-2000)

Yan jî, gereg bigotana Welatê Saka! Lewra ji bakûrê herême re Sakaîstan dihate gotin û kalên Kurdên li dervayî welat ew herêm demeka dirêj wek warê xwe bi kar anîn. Ji bo vê yekê jî îspat wiha derdikeve holê. G. Larsson ji pirtûka Îbn Khordadbeha ya di sala 840 an ya bi navê "Kîtab al Masalik Wa 'L-Mamalik'-The Book of roads and Kingdoms" hatî nivîsîn de van agahiyan dide: Gelekî bi eslê xwe ji As-Saqalîba, ji quncikên **Welatê Saqalîba** yê dûr, postê heywanan, yên roviyên reş û şûr tanîn derya Rûm (gereg derya Reş be-Ş)... Vîkîng ji quncikê Saqalîba dihatin derya Reş û paşê bi peyatî diçûn çemê Don û di nava dewleta Xezeran de jî diketin nava derya Kesk...[196-205] Ji vê berhemê jî vekirî derdikeve holê ku navê vî welatî As-Saka ye. Vî navî jî em ji nivîskarên Swêd; Aron Andersson û Ann Sandwall fêr dibin ku ew welatê Alanan e. Yanê Kurdên dimilî.[153] Yanî Vîkîngên ji Welatê Saka/Kurdan derbas dibûne û dihatine derya Reş û Kesk. Nivîskarên Swêdî ew nava zêde dernexistin pêş, di cîhê wî de li ser Şerqland disekinin.

Gor Alakom ji T.J. Arne radigihîne, ew navê Şerqê yê ji bajarê Sarkel ê li bakûrê Derya Kesk girtibûn. Vîkîngan ji dora derya Kesk giştikan re digotin Şerqland.[74-23] Ez ne di vê dîtine de me ku navê Şerqê ji bajarê Sarkel hatibe û bajarê li rojavayê derya Keske. Sarkel jî navekî kurdî ye û mirov dikare di gelek cûran de şirove bike. Ya herî baş bi dîtina min ê di wata 'ser ê-kel' de ye. Bi taybetî xelkê li vir jiyayî pir pez xwedî dikir û ew peyva bi piranî ji bo ajalên bi siro/şax û cîhên bilind bi kar tê. Dibe ku bajar li cîhekî bilind hatibe avakirin û ew nava lê kiribin. Ti têkiliya Şerkland bi Sarkel ve nîne. Herêm jî BÎ di destê Kurdên-Saka de bû, ew nav jî kurdî ye. Lê dema Vîkîng hatin herêmê rewşa demografîk cûda bû.

Vîkîng çawa dihatin? Vîkîngên ji çar welatan, li başûrê rojhilatî Swêd digihîştin hev; ji wir jî bi riya çemên Dînyeper, Don û Volga dihatin derya Reş û derya Kesk. Dema dihatin derya Reş, kralê Rûm ji wan bac nedigirt û eger wana bixwesta dikaribûn herin Itil (Atil), ew li ser çemê As-Saqalîba û di nava bajarê Xezeran Khazars de ye. Li wir serokê wan bac distand. Paşê ew diçûn derya Kesk û dora Gûrjan(Cûrcan) û keviyên wir. Carna wana tiştan bixwe re dianîn, ji Gûrjan bi hêştiran dibirin Bexdayê.[196-205] Ji wan jêderana em niqteyeka din fêr dibin, ku navê çemê Volga yê bere As-Saqalîba ye... Ew jî îşareta vê ye ku Kurd li herêmê demekê direj jiyanê.

Nivîskarê Ereb Îbn Rusteh di sala 903-913 an de wiha dinivîse: Kralekî wan ê Rûs bi navê Khakan...hebû. Ew ji bo talankirina Saqalîba êrîş dikirin; bi keştiyan dihatin, ew dîl digirtin, bi xwe re dibirin welatê Xezer û Bûlxar û bi wan kirîn û firotinê dikirin... Wana li beşên welat nedikarin bimînin, tenê tiştên bikaribin bi xwe re bibin ji Saqalîba dibirin. Sîstêma wan tenê tişt/alav bihev guhartin bû, postê sîmorekê û postên ajalên din bû. Ji bo wan jî zêr û zîv digirtin...[196-205] Di rûpelê 206 an ya heman pirtûkê de, Saqalîba di nava kevanê de weke Slav tê nivîsîn. Ew îşareta vê ye, ku welatê Saka-Kurd ji alî Slavan ve hatiye dagirkirin lê hê jî bi navê kevn (Saka) tê bilêvkirin. Yan jî, ji ber nezaniya

nivîskaran Kurdên li wire nedîtine. Di vê serdemê de ji bakûr Rûs, ji rojava Bîzans û ji başûr jî êrîş û firehbûna Ereban hebû.




**Rêyên Vîkîngan û Dewleta ŞADÎ.**

Di pêvajoya ku misilmanan dest bi firehbûna sînorên xwe kiri de, gelek caran êrîşî dora Mûsil kirin. Ji sala 640 an bigre heta 950 an êrîşên servegirtina Ereb-misilmanan berdewam kirin. Kurdên li vê mintiqê ketin tengasiyê jî, berê xwe dan Arran/Ezerbeycan. Ji van jî yên herî bi navûdeng konfederasyona Şadî bûn. Lê pêwîste neyê ji bîr kirin, ku Arran herî kêm ji Xorriyan vir ve welatê Kurdan e. Serokê Şadiyan, Daysam îbn îbrahîm al-Kurdî bû. Dibêjin

ku bavê wî Xaricî bû ye û hevalê serok Harûn aş-Şarî yê ku me qal kir e. Di vê de ti guman nîne ku Kurd bi piranî di nava Xariciyan de bûn; ji ber ku ew muxalifên Îslamê yên herî mezin bûn. Firehbûna axa misilmanan tevgera Kurdan ya bi sed salan têk biribû û vekişîn herêmên çiyayî. Şarî, di sala 986 an de li Mûsilê hat kuştin bi şûnve, bavê Daysam reviya Ezerbeycanê û li wir bi keçikeka serok êlekê re zevicîbû.(3-62) Malbata wî ji Mûsil bû; dema li Mûsil nakokî derketin, 896/97, malbata wî hat Ezerbeycan. Li wir bi keçikeka serokekî Kurd re zewicî û Daysam hat dinê. Çend caran xwest Ezerbeycan bi giştî têke bin kontrola xwe, Piraniya eskerên wî Kurd bûn û di sala 952/53 an de mir.(74-30) Di vê dîtinê de nakokiyekê xuya dike. Lewra di berî wê demê de, dewleta Şadî hatibû avakirin. Gelo Daysam û Şadî ne ji komekê bûn? Dîsa xuyaye ku serok Daysam xwe davê paş êlên li Qefqas û bi keçikeka serok êlekî re dizewice. Gor fikra Polatyan: Daysam bi Kurdên koçberên li wir re jî şer kir.(3-64) Ew şera jî divê ji bo berjewendî û seltanatê be. Di sala 950 an de Ardebîl wergirt û bi navê xwe pere derxist.(3-66) Di sala 953 an de bi hinek Kurdan ve direve Bexda ye. Bi alîkariya serokekî Kurd ê li Ezerbeycanê dikeve bajarê Salmasê. Îbn Mikravayh dinivîse ku; di sala 944 an de Rûsan êrîşî Berda kirin û heta Ûrmiyê çûn. Marzban 13.000 esker komkir û Rûs derxistin.(3-68)



**Nivîsa Vîkîngan a li ser êrîşa Şadiyan Mariefred-Grîpsholm**(74-24)

Wek tê zanîn dewleta Şadî di sala 951 an de, ji alî Mûhammed Bin Kartû yê girêdayî êla Rewadî, li bajarê Anî yê hate avakirin. **Dosta birêz arkeolog Gunîlla Larsson got; Cara yekemîn Vîkîng bi Kurdan re dora sala 700 an hatin hember hev. Vê demê Vîkîng ji başûrê Derya Kesk yan jî ji Gîlanê derbasî Bexdayê bûn. Dema bi keştiyên xwe hatin keviyên Gîlanê rastî Kurdan hatin**. Gorî texmînê jêderên Swêdiyan cara duyemîn Kurd û Vîkîng di sala 943 an de, dema wan êrîşî bajarê Berda (başûrê rojavayê Baku) kirin hatin ber hev. Ew bajarê kirîn û firotinê yê li Arranê ye, ku ji bo Vîkîngan pir girîng bû. Bajar li nêzîkî çemê Terter e, ku berê jêre digotin Ava Kurd-Elem.(74-25) Îhtîmale ku navê vî çemê din jî ava-Saqalîba

be. Ji dîrok nivîsê Ereb Mukaddasî jî wiha radigînin: Li wir Kurd rûdinên; ji vê herêmê re **"Deriyê Kurdan"** jî tê gotin û mintiqeka pir dewlemende.[74-25] Ji wê lêkolîna birêz Alakom û lêkolînên nivîskarên Swêdî kirî de ev derdikeve holê, ku berî Şadî bi dewlet bin jî Kurd li vê herêmê niştecîh in. Ji vê yekê ti gumana min tune, lê başe ku gor lêkolînên Swêdiyan jî ew hatiye pejirandin. Wekî din jî eger mirov bala xwe bide ser erdnîgariya Qefqasya, navên deveran bi piranî kurdî ne ku ew jî îspatek e.

C. J. Bosworth di Ansîklopediya Îslamê de wiha dinivîsîne: Mîrnîşîneka Kurdan pêşketî ya Şadî yê li Arran heye. Paytextê wê Genca ye û dîroka xwe diçe sala 859 an dibîne. Yek ji kesê damezirandî Muhammed Şaddad bîn Kartû ye û ew ji êla Rewadî ye. Seleheddînê Kurd ê mezin jî ji vê êlê bû. Gor Mînorskî kalê Seleheddîn li gundekî nêzî bajarê Dvîn (Dabîl) hatiye jiyanê. Ew malbata ji sala 952 an heta 1174 an li ser text bû. Gelek Kurd li wir hene. Nivîskarê Ereb Îbn-al-Athîr dibêje, di navbera salên 600 û 1000 an de 10.000 Kurd ji alî Xezeran ve hatin kuştin, ku ew li navbera Volga û Kafqasan dijîn. Xezeran bac digirtin û ji Vîkîngan jî ji sedî deh distendin.[74-26] Li jor jî min hinek qal kir ku kalên Xezeran îro li Afganîstan jî, gelek caran êrîşî Arran kirine û bi Kurdan re şer kirine. Ji bo vê Kurdên wêderê ji alîkî bi êrîşên Vîkîngan ji alîkî bi yên Xezeran û ji alîkî din ve jî bi yên Gurciyan gelek zirar dîtin.

Em ji birêz Alakom fêr dibin: ku bi hezaran Vîkîngan di sala 943 an de êrîşî ser bajarê Berda kirine. Xelkê bajêr dîl hatiye girtin. Marzûban îbn Muhammed ku bajar diparast bi hezaran mirov komkirin li dijî Vîkîngan derket. Lê Vîkîng di şer de bi serketin, di heman demê de bi nexweşiya epîdemiye ketin ku hejmara wan roj bi roj kêm dibû. Vîkîngan gelek zêr, zîv û tiştên hêja birin. Jin revandin û paşê li bakûr, li bazarên koleyan ew firotin. Gor Îbn Miskawaîh, li Berda kesên bê hesp hemû hatin kuştin. Perên Kurdan yê ku navê "Daysam Îbn Îbrahîm al-Kurdî-936/937" li ser nivîsî, ji Arranê hatin girtin û di sala 1929 an de li girava Swêdê bi navê Gotland hatin dîtin.[74-29] Hîna jî ew derdikevin û tê gotin ku di muzeyên Swêd de, di navbera 2000-3000 perên zîv ên Kurdan hene.

Sed sal piştî talana li Berda, Vîkîng, di navbera salên 1030-1033 û 1041 an de dîsa çûn ser Berda; hinek Vîkîngan li cem mîrê Derbend di 987 an de kar kirin. Lê êrîşa di sala 1041 an de ji bo Vîkîngan bi felekatê encam bû. Piraniya Swêdiyan mirin.[74-30] Mirina wan jî bi meywe bûye. Dema hatin Arran li daran gelek meywe hebûye, wana jî gelek xwarine, mumkune heta wê demê meywe jî nexwaribin yan jî meywe bi jêhr bûn ku pê mirin.

## XORASAN WELATÊ KÊ YE?

Heta vir min gelek caran qala Xorasan û Eba Muslimê Xorasanî kir. Lê Xorasan kudere, welatê kê ye, rastiya xwe çi ye, çiqas Kurd li vir dijîn û

tekoşîna qehremanê Kurd Eba Muslimê Xorasanî di kijan atmosferê de pêk hat? Emê hewl bidin ku li bersiva wan bigerin.

Li gor nexşa dunya ya îro: Xorasan li rojhilatê bakûrê Îranê-bakûrê Deşta Kevir, di navbera derya Kesk, Tirkmenîstan û Afganîstanê de ye. Berî misilmantiyê, Ereban ji beşekî Afganîstan û Tirkmenîstanê re jî digotin Xorasan. Misilmanên yekemîn ji cîhên ku li dervayê rojavayê Îranê re digotin Xorasan. Erdnîgariya Xorasan gelek çiyayî ye. Çiyayên bilind yên heta 2000-3000 metre ji alî Afganîstan û Tirkmenîstanê ve li Xorasan digihîjin hev û berbi başûrê derya Kesk dirêj dibin. Ji bo vê cografya çiyayî û bilind, di dirêjahiya dîrokê de ew herêm hertim bûye parêzgeha Kurdan. Başûrê Xorsanê jî deşte.



**Xorasan**

Berî her tiştî pêwîste em li ser peyva Xorasan rawestin. Dîroknûsê Kurd M. Emîn Zekî dibêje: "Hor" di zaravê Soranî û Dimilî de tê wateya rojê.[19-154] Navê Xorasan jî tê wata cîhê rojê. Kek Alî dibêje: Xur= roj e û San=Tîr û ronahiya rojê ye.[36] Gor Haşîm Kûtlû jî: -san: laş/mekan e, canê ku cîh dîtiye.[122-62] Rişvanoglû jî dibêje: Afganîstan û Pakîstan jî di nav de, bi farisî tê wata welatê rojhilat. Di serdema yekem û ya navîn de Tirkên Saka li wir bi cîh bûn û bi ser vê de ji wê re gotin Sakaîstan/Sexîstsan û di dema Îslamê de jî ew bû Seîstan.[128-23] Wekî me li jor jî gote, Saka Kurdên îro li dervayê welat in. Andrew Collîns jî şiroveka din dike: Li Qehîrê heykelekî mezin heye, ku li rojhilat mêzedike û bi roja 21 Adarê ve eleqa wî heye. Gelek nasname û erkên wî heykelê mîna şêran hebûn. Ji wan ya yekemîn û ya herî girîng ew e: ku

şeklê Xwedayê rojê **Horûs Hor-em**-akhet ve digihîştin hev. Di asoyê (horîzon) de Horûs û Hor-akhty yanê: gihîştina hev ya Horûs û Horîzon bû. Di wê dema mîtolojîk de rola Horûson dilîste, di bingeh de rola dane Xwedayê rojê Rê ye.[159-396] Agirê mezin Hvar, yanî roj... mîtolojiya Aryan e[71-35]dibêje Bîlgîn, di wê peyvê de jî derdikeve holê ku Hvar-Xar-Xor tê wata rojê.[71-35] Heta peyva H/Xorîzon û Xor jî gereg ji heman kokî û wateyî derketibe.

Di beşên derbas bûyî de jî, car bi car me qala Xorasanê kir, bi taybetî jî êlên Gûtî û Xorrî ji Xorasan heta Anatoliya Navîn û Derya Spî belav dibûn. Êlên Xorrî li dora Alallah-Surî li ser keviran jî nivîsîbûn. Ji bo dîroka Kurdan Xorasan cîhekî girînge; lewra gelek dîrokzan û lêkolîner dibêjin ku Kurd ji rojhilat, yanê ji dora Hindîstan û Asya Navîn hatine, îhtîmaleke pir mezine ku kalên Kurdan Sumerî jî ji wê herêmê hatibûn. Lê heta vir min jî hewl da ku îşaret bikim ku Kurd ji başûr, ji hîva bi heyî berbi jor û berbi rojhilat mecbûr man ku hilkişin. Gor dijminan, hêza wan Kurdan ji cîh guhartinê tê û ew li bakûrê Derya Reş jî mane. Wekî me berê jî gote: Çanda ji Loristanê heta Xorasan û derya Kesk û Derya Spî wek hev e. Wê yekê gelek lêkolîner dipejirînin û alavên ji kolanên li wê herêmê derketine jî wê dîtine bi hêztir dikin. B. Amedî dinivîse ku: Belgên li başûrê Derya Kesk, li girê Hîsar û girê Tûragê derketine, belgeyên ji 2000 sal BÎ mane û ew aîdê kalên Medan e. Derket holê ku Med li wê herêmê bi cîh bûne.[59] Bi taybetî xeta bakûr, yanê ji Qefqasya bigre heta Xorasanê û Afganîstanê Kurd li herêmên çiyayî gelek mane ku sedema wê jî êrîşên hêzên mezin in.

Yekemîn Împaratoriya ku li ser erdê Arranê avabûye ya Medan bû, ku ew kalên Kurda ne. Wê demê jî û piştî Medan di serdema Farisan de jî Xorasan di destê Kurd û Arraniyan de bû. Wekî pismamê min ê hêja Tewahûddî dibêje: Berê Med, niha jî Kurdên **Madano** li Xorasan wîlayeta Mazenderan hene. Her wiha Kurdên Kêywan-lo û Kawî/Kawyonî jî hene ku yên dora padîşahiya Kiya nin. Kurd di çend pêvajoyan de hatin Xorasan. Berî Îslamê jî Kurd li wir mabûn û li herêmê pir bûn. Ji ber ku heta bi siltan Mesûdê Xeznewî re çûne şerê Semerkant, çûne Hindîstanê. Piştre dîsa leşkerê Kurdan, bi siltan Mesûd û Tûxrûl Begê Selçûqî re di herêma Qoçanê, Nawîqê û herêmên din yên derdora Qoçanê de şer kirine. Erdê wan ê eslî derdora rêze çiyayên Zagros û heya çiyayê Demewendê bûye. Bajarê Rêy navekî kurmancî ye û te wata rê. Di Avestayê de Rêga hatiye nivîsandin.[145-10] Wekî pismamê min jî dibêje Kurd berê jî li wê herêmê hebûn. Di gerên min ên salên 2001 û 2003 an de gelek kalên Xorasanî yên kurmancî axêf: "Em pênc hezar sal in li vir dijîn. Kalên me berê li wir bûne " digotin û li ser çiyayên asê, cîhên ku kalên wan li ser jiyayî nîşanê min didan. Wekî tê zanîn li Anatoliya Navîn jî êleka girêdayî Reşiyan bi navê Molikiyê heye. Di wê babetê de birêz Bûlût îddeayeka balkêş tîne holê, gor wî: Kurdên berê li Xorasanê dijîn bi yên îro ve ne yek in. Evên îro li wir dijîn di sedsala XVI an de koçber kirin.[36] Ew li ser kijan bingehê wê yekê dibêje nizanim. Lê texmîn dikim ew dixwaze bibêje; ku Kurdên berê ji

wir hatin Kurdistanê. Di sedsala XVI an de ewên nû ji wir hatin ajotin. Lê di kûrahiya dîrokê de kalên van Kurdên îro li wir li Xorasan dijîn. Wekî me di beşa Saka de jî qal kire, Saka kalên Kurdên îro li dervayê welat in. Berî sedsala XVI an jî li wir Saka hebûn. Wek Seferoglû ji Teberî (sala 915) radigihîne: Di sala 591 an PÎ de li Xorasanê, Saka yên li wir ji milê "Arsak" ên ji birayê Deryam Çopîn re, ji ber navê êla wî, ji wî re digotin Kurdî; ji xwenga wî re jî digotin Kurdiye.(91-9) Kurdan car carna cîhên xwe li Xorasanê guhartine lê heta hatina Tirkan ti caran ewder terk nekirin. Bi hatina Tirkan re, 1030/40, mirov dikare bêje ku bi piranî wê demê Xorasan hate terk kirin. Wek W. Îvanov jî dinivîse hê jî koloniyên Kurdan mane: Di sala 1245-1389 an de li başûrê Heratê yê di çiyê de xanedaneke bi navê **"Kurd"** dijî.

Li jor Tewahûddî qala navê bajarê **Rê** (Tehran) kir. Ew nava ji rê ya kurdî tê. Lê kalên me çima gotine rê? Ew riya kuderê bû ? Belê, ji bo ku navê rê lê danîne, tê wê watê ku ew li ser riya wan bûye. Gelo ew di navbera Kurdistan û Xorasan de bû ji bo wê gotin? An jî, ew li ser riya cîhekî, kesekî pîroz bû ji bo vê gotin? Herdû bihev re jî dikarin bibin; lê baweriya min li ser ol û pêxember e. Li ser wê em guh bidin Bilgîn: Şirova bi giştî Xwanîratha welatê Aryana ye... Zerdeşt Pêxember bajarê Belh ji xwe re kiribû navenda perwerdê. Di serdema Împaratoriya Med de, Xorasan welatê Medan bû û olperestên Zerdeştî (Magî) wêder heta salên 900 an PÎ kiribûn bin kontrola xwe. Bajarê Merv jî navenda serhildana Eba Muslimê Xorasanî bû. Li dijî Emewî û Ebbasiyan keleha berxwedane bû. Li bakûrê Xorasan serhejmara Kurdan di piraniye de bû û di dema Selçûqiyan de wek "Kurdistan" derbas dibû. Paytexta Xorasan bajarê Tûs (Meşhed) e. Bajar, di dema entîk de ji alî malbata Nodarya/Notarya ve hatiye ava kirin. Ev malbata Viştaspa ji mintiqa Medya yê bi navê Notarya hatibû wir. Ji Aryanên ku ewdera ji xwe re kirine war re digotin "Mazanan".(71) Gelek dîroknûs Xorasan wek Kurdistan bi nav dikin; ew xeser nebûye, bê guman ji berê ev li wir bûna Kurdan û pirbûna wan ew encama derxistiye. Birêz Îzady jî vê yekê dipejirîne û niqteyeka din ê balkêş îşaret dike: Dîroknivîsan di sedsala XVII û XVIII an de tenê ji wir re gotine "Kurdistan". Eger li bakûr ew şer û xiravekirin pêk nehatana, îro îhtîmaleke Kurd bi gîştî wek Kurdên Xorasan renga reng bûyana.(154-39) Mebesta birêz ew e, ku Kurd di serdema kevn de wek Kurdên Xorasanê bi rengê sor xemilîbûn... Îhtîmaleke mezine ku ew dîtin raste, lewra Kurdên Xorasanê pir hindik heliyane û çandên din pir kêm ketine nava wan; wek orîjînê xwe mane.

Li ser paytextê bi navê Tûs Ekrem Cemîl Paşa wiha dinivîse: Key Tos (wek Diyako tê zanîn) di sala 715 an BÎ de li ser textê Medan rûnişt û 60 salî ew kara berdewam kir. Di van deman de firehiya Kurdistanê ji sînorê Hindîstanê digihîşt heya Derya Reş; ji Derya Kesk heya keraxên derya Ûmmanê. Key Tos, bajarê Tos/Tûsê îro li Xorasanê ava kir.(9-72) Bajarekî taybet e, gelek jî kevne û xerab bûye. Dema min ziyaret kir dewleta Îranê tamîr dikir, ketina navê qedexe bû. Bajar bi kerpîçan hatibû çêkirin, xuyaye çend tebaqe ne û di bin re

jî rêyek veşartî heye. Bajar ji derve bi çend sûran hatiye pêçan. Sûr yekê nêzik e û yek jî dûr û pir firehe; ya sêyemîn jî çavê mirov nabînin û ji dûrbûn xuya nake. Dora bajêr bi avê jî dorpêç kirine ku ma ji alî ewlekariyê ve baş be. Kurê Key Tos, Key Ferîbrez jî di sala 600 an BÎ de bû serokê Medan û sînorên Medan heta Ceyhûnê; li rojava jî heta Toros û Lîdyayê fireh kir.[9-75] Bajarê Tûs di dema Tîmûr de bi erdê re hate kavil kirin û şewitandin.[36]



**Bajarê Tûs**

Xorasan piştî Medan di serdema Persan de jî di destê Kurdan de bû. Bûyera wê demê ya herî girîng ji alî Herodot ve hatiye nivîsîn: Kralê mezin (Dareios-BÎ-521-486), li ber pênc geliyan hewzên bi qapaq çêkirin û pêşiya avê girt. Deşt tijî av bû. Welatên din ji avê mehrûm man. Paşê, pere ji welatên cîran distend û av dida wan.[84] Dema ez çûm Xorasan şopên wê bûyerê bala min kişand: li çiyayê bilind ên ji hezar metreyî ne kêmtir, heta jor şopa avê hebû. Mirov matmayî dimîne ku ew av çawa girtine; wek avbendên îro ew çiyana di bin avê de hîştine.

Xorasan, ne wek her nûserekî Tirk îddea dike welatê Tirk an e û her kesê ku ji wê herêmê hatî jî Tirk e! Xorasan welatê Arranan e. Di wê peyva Arran de mebesta min Kurd-Saka, Faris, Tacik in. Gelek caran Tirkan êrîş kiriye û dagir jî kiriye, lê nebiye welatê wan. Seferoglû yê ku yek ji îdeologên dîroka Tirk e û bi heman mentalîtê nêzîkî dîrokê dibe û dixwaze Xorasan wek warê Tirkan nîşan bide. Lê her ku dilive di nav rastiyê de dixeniqe, dibêje: Di sedsala VII an de li Xorasan, herêma **Kûhîstan**, Xalaç bi Kurdan ve nîv-koçer tevhev dijîn û debara xwe bi pez û hêştiran dikirin.[91-10] Di vir de vekirî dipejirîne ku Kurd li wê herêmê hebûne. Başe ku bê zanîn, ji Maveraûnnehîr re berê digotin Kûhîstan.[187-455] Hîna jî li rojhilatê Bûhara gundekî bi navê **Kend-î Kurdî** heye. Di dema Tîmûr de li nêzîkî çemê Heratê li zozana Oleng-Neşîn kişlaxka bi navê **Kurd-Neşîn** (Konaxa Kurd) heye.[91-10/11] Belê, em spasiya wî dikin ku agahiyên giranbiha ji me re nivîsîne ku Kurd li wir jiyane û navê xwe dane


cîh û waran. Dîsa gor "Secere-î Terakîme" li keviya rûbarê Seyhûn mintiqeka bi navê **Kurdîşe** heye û berê ji kesên li wir diji re jî digotin "Kurdan".[91-25] Mînorskî xelekeka girîng lê zêde dike: Navê êla **Kelhûr Goran e**. Kelhûran sê milên xwe hene: **Pilingan, Derteng û Mahîdeşt**. Darna û Dertengan erdê xwe li Hûlwanê bû. Mahîdeşt koçber bûn.[2-109] Wek gelek jêder didin xuyakirin, Kurdên li Hûlwanê di dema êrîşên Ereban de hatine vê herêma Kûhîstanê û ji vir jî berbi bakûr û rojava çûne.

Doç. Yilmazçelîk jî, ramanê me heta vê derê dipejirîne û wiha dinivîsîne: Belge îspat dikin ku êla **Okçû Îzzeddîn di salên 200 an PÎ de li Asya Navîn jiya ye.**[116-64] Berê jî me got, ku Saka kalên Kurdên îro li dervayê welat in û êlên di bin sîwana wan de yek jî Okçû ne. Di esas de ewe girêdayî Badilî-Şadiyane. Yanê: Reşî, Etma, Şadî, Badilî, Milan, Êlên Dimilî û yên din wê demê li Xorasan û derdora wir bûn.

Me di beşên derbas bûyî de jî gotibû; ku dema Sasaniyan bakûrê rojavayê Kurdistan kirin bin destên xwe, Kurdên li wir bi piranî şandibûn Kûhîstanê. Di destpêka sedsala VI an de, ji bo ku Hûn ên ji bakûr ve ketine welatê wan rawestînin, êla Kurdên Gor, ku li çiyayên Elbrûzê li başûrê Hezar dijiya bi piranî li Xorasan û bakûrê Xorasan bi cîh kirin.[4-199] Bi vî awayî em fêr dibin ku di dema Sasaniyan de jî gelek êlên Kurd ji bakûrê Kurdistanê û ji dora Gîlanê hatine şandinî navenda Xorasan. Yên li bakûr Kurmanc in û yên li Gîlanê jî îhtîmaleka mezine ku Hewreman/Goran in. Hîna jî Kurd li vê herêmê hene û min beşek ji wan ziyaret kiribû. Li herêmê niha: Dimilî-Goran, Lek û Kurmancî axêf hene. Li ser vê babetê birêz Xemgîn Kurdên ji Farqînê dest nîşan dike: Di sedsala VI an de, Deryayêmê V an yê Sasanî Kurd ji Farqînê û êla Gor a li başûrê Derya Kesk bire Xorasan. Li wir jî, vana di sala **1148-1215 an de dewleta Gor avakirin**. Ew pesna xwe bi hilweşandina seltanata Dehaq didin. Dewleta Gor, bi Selçûqiyan re hate girêdan.[101-53] Wek tê zanîn li navenda Anatolî ye li dora bajarê Aksarayê Kurdên Kirmanckî axêf, li Haymanê jî Kurdên Lorî/Şêxbizinî axêf hene. Li dora wan jî Kurmanc hene; dema mirov vê tevlîheviyê dibîne ew koçberiyên bi zorê li jor me gotine tenê bîra mirov. Yanê ew Kurdên bi zorê ji rojhilat re, yan jî navenda Xorasanê re hatine şandin ku piştî demeke direj dîsa hatine navenda Anadolê û ew kompozîsyona derketiye holê. Lê dema çûne navenda Xorsanê jî rihetî û aramiyê nedîtine.

Xorasan, di dema Îslamê de xwîn û agirê herî zêde dît. Dema misilmanan dest bi sînor fireh kirinê kirin û ola Îslamê bi zorê bi gel dan qebûl kirin, Xorasan kete nav agir, xwîn, şer û têkoşînê. Hinek dîrokzan dibêjin Xorasan cara yekemîn di dema xelîfe Omer de, hinek jî dibêjin di dema xelîfe Osman de hatiye dagir kirin. Mirov dikare bêje dema vê salên 651/652 an bûn. Mumkune ku di dema Omer de êrîş hatibin kirin lê tam dagirkirin di dema Osman de be. Hemû dijberên Îslamê li Xorasan gihîştibûn hev û piştî zordariyên misilmanan serhildanên Xariciyan jî destpê kiribûn. Serhildana yekemîn di dema îmam Elî de derket. Waliyê vê demê Ca'de bû û artêşa Ereban di bin

rêberiya Xalîd bin Kurra de aramiyê ava dike. Di dema Mûaviye (661-62) de jî serhildan çêdibe û artêşa Ereb di bin serokatiya Abdurrahman bin Semure da çû Sîstanê. Fermandarê herî zalim jî, Kuteybe bin Muslim bû û di salên 705-715 an de gelê Xorasan û Maveraûnnehir (Bûhara, Semerqent, Beykent) bi agir û xwînê ve birêve dibir. Ji serhildanên sedsala dom kirî, ên herî girîng serhildanên Xariciyan in. Ji binemala Ebbasiyan Muhammed bin Elî li nêzîkî Şamê li mintiqa el Humeyne rûdinişt û li dijî Emewiyan bi veşartî xwe bi tevger dikir. Xorasan, vê demê cîhe berxwedanê ye. M. Bin Alî 12 mirovên xwe yên baş bi Eba Muslim ve şandin Xorasan. Eba, li wir xelk bi tevger kir û li hember rêjîma Emewiyan derxiste tevgerê. Di şerê hatî kirin de Emewî têk çûn û Ebbasî hatin cîhê wan. Xelîfe bi nemerdî Eba kir kemînê û ew kuşt. Bi ser vê de gelên Xorasan bi dehan salan di serhildanê de bûn. Emê di beşa Eba de bi firehî qal bikin.



**Gundê Mirîşkan - Xorasan**

Ebu'l Ferec dibêje, di sala 967 an de ji Xorasanê çend kes hatin Antaqya û bi sê hezar Erebî ve ketin tevgerê ku Kapadokya dagir bikin. Li hember vana 40 hezar lêşkerên Romê şer kirin û paşê di nava wan de nakokî derketin. Di vir de ev pirsa dikeve serê mirovan, gelo çima Xorasan û Antaqya? Têkiliyên wan çi bû? Bi dîtina min ev têkiliyana li ser esasê êlî bûn. Yan konfederasyonêleka parçe bûyî yan jî êlê endamên federasyonekî li wan herdû herêman dijîn û alîkariya hev dikirin. Lewra êlên vê demê li bakûr û bakûrê rojavayê Sûriyê dijîn, bi koka xwe ji Xorasanê bûn. Ew êlên ku bi Ebbasiyan re şer kirin û têk çûn li vê herêmê belav bûbûn. Ji malbata Dirêjan pîremêrekî wiha dibêje: Di sala 748 an de, ji alî Eba Muslimê Xorasanî 24 êlên Kurd ji Xorasan ji bo Kerkûk, Hewlêr û rojava tên şandin. Eba bi hêza wan Emewî gerkirin û şûna wan Ebbasî anîn. Di sala 754 an de jî Eba ji alî Ebû Cafer Mansûrî ve tê kuştin. Bi ser vê de 24 êl, ji bo ku heyfa wî heynin diçin ser Ebbasiyan; sê mehan şer dikin lê têk terin û vedigerin Helep, Riha û Meletî yê. **Heta sala 1164 an li vê herêmê û li deştên Hama, Hamik û Mereşê dijîn**. Êlên mîna Canbegan, Celikan, Bilikan, Molikan, Galeriyan, Qerecelikan, Manogriyan, Mîrîdostan, Nermikan û Sînanan êrîşî ser Mîrîtiya Remezaniyên li Edenê kirin û konên xwe li Çûkurovê vekirin. **Di sala 1165 an de jî ji ber germa li wir barkirin Qonya, Qeyserî, Kirşehîr, Enqere, Haymana û Polatli yê...** (Filmê Dirêjan). Prof. Sirma dibêje: Wexta xebara kuştina Eba gihîşte Xorasanê, alîgirên wî **"Sûrhalaman"** rabûn serhildanê. Çûn ser Mansûr lê têkçûn. Di vê navbera de 100.000 mirov mirin.[98-21] Ew serhildana mezin bandora Eba Muslim nîşan dide; hîna jî li Xorasanê ew gelek bi rêz û bi ser bilindî tê bi biranîn. Di zarokatiya min de, di nava civaka Anatoliya Navîn de, Eba bi rêzeke mezin dihate dîtin û çîrokên wî dihatin qal kirin. Yanî ketibû nav ruhê van mirovan û ew bi vekirî dihate xuyakirin. Yekê jî, alîgirên wî wek Sûrhalaman tenê bi navkirin. **Peyva ji Sur=sor û –alaman= al pêk hatiye ku wata vê kesên xwedî alên sor in. Ala sor û Sersorîtî koka xwe ji wir digire**. Ji alîkî ve koka xwe digihêje ola Zerdeştî û Kurdên agir/roj perêst; aliyê din ve jî, dijberiya Îslamê û armanca tolhildana rêberê xwe.

Xorasan, bi taybet jî bajarê Meşhed ji alî bawermendên şîa yên misilman ve pîroz tê dîtin. Lewra di şerê navxweyî yê misilmanan de Îmamê heştan **Elî Riza di sala 817 an** de reviya Xorasan û li wir hate kuştin. Û wek tê zanîn bajar ji alî Elewiyên Şah Îsmaîl ve wek sembol tê dîtin.[36] Îro gorek ji bo wî hatiye çêkirin ku ji her aliyên cîhanê Şîa tên serlêdanê. Di bingeh de, cîhê ku gor lê hatî çêkirin jî ne cîhê Elî Riza hatiye kuştin e. Lê xelk di baweriyê de, vêder ji bo xwe wek Kaba şîan dibîne. Kesên ji derve tên vê ziyaretgehê bi evîneke mezin derî, pace û binê deriyan maç dikin û dibin 'Hecî'. Ez jî ji bo lêkolîna li ser şîatiyê çûbûm wir.

Li navenda Xorasanê ji serdema Medan heta destpêka îslamê Kurd hebûn; gor lêkolînan berî Medan jî Kurd li wêder jiyane. Ji destpêka Îslamê heta hatina Tirkan û piştre jî, heta êrîşên Moxolan mirov Kurdan û şopa wan

bi îspat dibîne. Hinek jêder û belge, di serdema hatina Tirkan de dem bi dem agahiyên li ser Kurdan wiha rêz dikin:

Di serdema xelîfe Mûtasim de, xelîfe gelek Tirk kirin xizmeta xwe; vana, xwe bi hêz kirin û guh nedan fermanên xelîfê û tevlîhevî derdixistin. Bi vî awayî hêza xelîfe kêm bû. Di sala 870 an de Xorasan û Taberîstan û gelek cîhên din ketin destên Xanedana Tahîr. Ji xwe re Nîşabûr û Merv kirin paytext û rêya Bexda, Maveraûnnehîr û Harzem girtî ma. Piştî wê li vê dere dewleta **Samanî** hate damezirandin.[136-32] Gelek nivîskar dibêjin ew dewleteka Kurd e.

Tirk di sala 1040 (hinek jî dîbêjin 1030) an de hatin Xorasan; di navbera salên 1042-52 an de jî Dewleta Şadî ya Kurd hilweşandin. Dema Tirk hatin Anadolê 19 Mîrnîşînên Kurdan hebûn.[39] Birêz Yeşîlgoz dibêje dewleta Şadî hilweşandin, lê mirov bibêje ku, girêdayî xwe kirin rastir e. Lewra dewlet hema hilneweşiya. Dema Tirk hatin bajarê Rêy xirav kirin û çûn Qezwînê, lê nikarîn wira heynin. Di sala 1037 an de Oxûza êrîşî Ermeniya kirin; Kurd û Erebên li wir di şûr re derbas kirin û gelek xenîmet heynan dest xwe. Di wir re çûn Ûrmiyê û gelek Kurdên li çiya dijiyan ku bi Tirkan re her tim şer dikirin, kuştin.

Gerokê Îtalî Gûrzon, di pirtûka xwe ya bi navê "Îran" de dibêje: Li Sîstanê êleka Kurd bi navê **Gerdek** heye ku vana bi mêraniya xwe navdar in. Ji Kurdistanê hatin wir şûnde di **sala 1245 an de dewletek avakirin û heta sala 1383 an ew jiya**.[19-24] Morgonnîstrîn jî dibêje; li Heratê Kurd dijîn. Tê qebûl kirin ku ew ji Xorasan û Tacikîstanê hatine.[19-30]

Di serdema Tîmûr de jî Kurd li vê herêmê hebûne û di pirtûka bi navê "Ez Tîmûrê Cîhangîr" de hatiye nivîsîn, ku dema Tîmûr tê Xorasanê rastî Kurdan tê û temaşe dike ku ew bejn bilind in û hêştiran li ser piyan bar dikin û dilê wî dikeve wan Kurdên bejn dirêj. Tê gotin, Tîmûr gotiye: "Xwezî bejna min jî wiha dirêj bûya!" Tîmûr, di raperîna li Xorasanê ya di sala 1388 an de, êlên Kurd ên li Fîruzkuh şandin Xorasanê.[95-169] Piştî êrîşên Cengîz Xan çend salan, **Şemseddîn Muhammed mîrîtiyeka Kurd li Xorasan û Sîstanê ava kir. Vê mîrîtiyê 130 salan ajot û 8 padîşah jê derketin**. Di sala 1370 an de bi destên Tîmûrlenk ji holê rabû.[9-313]

Di serdema Osmaniyan, Beraniyan û Pezgewran de jî Kurd li vê herêmê hebûn. Huseyn Baykara di sala 1469 an de waliyê Pezgewran yê li Xorasanê bû. **Penaberên Beraniyan di vê salê de xwe avêtin paş wî**. Hesenê Dirêj jî, ji wî xwest ku ewana teslîm bike. Lê wî red kir, Hesen sê caran lêşker şandin ser Huseyn. Di sala 1470 an de Hesen, Yadîgar M. Şahruhî wek waliyê serbixwe yê Xorasanê naskir.[114-190] Îhtîmaleke mezine ku ew beşekî ji Qerêmaniyan bin, ku piştre ew di avakirina dewleta Sefawî de cîh bigrin. Nivîskarê ji Kurdên Xorasanê Dr. Behrewan jî dibêje: 40 hezar Zaferanî li bajarên mîna Qoçan, Şîrvan, Bicnûrd û Semerqendê bi cîh bû. Li wir berê êlêka bi navî Geraîlî dijî. Heroj bi hev re şer dikirin û di dawiyê de Geraîlî ji wir avêtin.[197-15/16]. Nivîskar ji bo nijada Geraîliyan tiştekî nanivîse. Lê gereg ew Kurd bin; lewra hîna jî

êlêka bi vî navî (Gera) yê li Bala-Enqerê heye û girêdayî koma Heciba xuya dikin.

Di dema Sefawiyan de Xorasan rastî êrîşên Ozbekan dihat. Kurd di sedsala XVI û XVII an de du caran koçberî herêmê bûn. Kaîwanî (Keywanî) û Şadî hîna jî li herêmê dijîn. Di sedsala XVIII an de bi fermana Nadir Şah çend ber hatin şandin. Li Xorasanê êlên mîna: Amar, Zeferan, Şadî û Kaîwan hene. Êlên li Xorasan li gorî E. Zekî jî ev in: Şadî, Zefaranî, Keyvanî û Emenî ne. Serhejmara wan 250 hezar kes in. Li Qezwînê jî êlên mîna Omerî, Bahadirî û Bisanî hene û tê gotin ku ew ji alî Nadîr Şah ve ji Xorasanê hatine wir.[19] Dr. Behrewan jî dibêje: Hukumeta Şah Îsmaîl bi tîrekê li dû çûka xist; wî dizanî ku Kurd mirovên şervan in û xwest wana li hember Moxol û Ozbekan bike mertal. Ristem Begê Çemişgezekî jî alîkariya wî kir… **Di dema Şah Ebbas de, ji Ezerbeycan û Mehabadê 50 hezar Kurd birin. Hinek ji wan li Zencan, Takîstan û Qezwînê man û bicîh bûn. Ew yeka di sala 1007 an Qemerî** de pêk hat.[197-14] Wek tê zanîn wê demê di navbera Sefawî û Osmaniyan de peymanek tê çêkirin.

Gor wê peymana di sala 1590 an de, Şah Ebbasê yekan Ezerbeycan, Şehrîzor û Loristan ji Osmaniyan re berda. Lê di sala 1601 an de şer dîsa dest pêkir û Persan ji bilî Şehrîzor herêmên din dîsa kirin bin kontrola xwe. Şah Ebbas ji bo ku li ber êrîşên Ozbekan raweste 15.000 Kurd birin Xorasanê. Nivîskarê bi eslê xwe ji Xorasanê hêja Kardoxî dibêje: Şah Tehmasip di sala 1553 an de, di sala 1594 an de jî Şah Ebbas Kurd birin Xorasan. Gor lêkolîna min jî ew raste û emê li pêş li ser rawestin.

Ebbasê Mezin û Nadir Şah, Kurd ji hev cûda cûda birin Xorasanê. Ewana mîna Îraniyan Şîa tên qebûl kirin.[28] R. Blaga dibêje: Şah Ebbas (1587-1628) ji bo ku Ozbekan rawestîne navbera 15000 heta 50000 malbatên Kurd birin Xorasanê, wê demê hejmara wan li derdora 1.900.000 bû. Nadîr Şah jî (1736-1747) gelek Kurd birin Xorasan. Reşî û Amar-lû yên li Gîlanê (Lahican, Şahrudan, rojhilatê Sefîdrud û bakûrê Qezwînê dijîn berê di navbera Erzirûm û Şehrîzor de dijiyan.[95-164] Vana ji alî Ereban ve wek Celalî dihatin binav kirin. Nadir Şah di sala 1688 an de li Xorasan ji dayik bûye, ji êla Avşar û malbateka normal bû. Berê şivantî kir, paşê pênc hezar Kurd û Avşar li dora xwe komkirin û li hember kralê Afgan Eşref serî hilda (1729) û ew têk bir.[19-110] Pismamê min ê hêja jî dibêje: Şah Ebbas, 45-50 hezar malbatên Kurd ji derdora Erena li Ezerbeycanê, hinek ji bakûrê Kurdistanê û hinek ji Îraqê anîn. Wana alîgirên împaratoriya Sefawî û şîa bûn. Ji ber tirsa Ozbekan, wê demê paytexta Sefawî ji Tebrîzê anîn Qezwînê. Li Tehranê cîhekî bi navê Zaferan-lo heye ku Kurdên Zaferanî girtiye. Herwiha li Sebzwarê û li Qoçanê jî heye. Piştre di sala 1000 (1600?) de Kurd hatine Xorasanê. Ji wê salê heta sala 1011 an bi temamî li Xorasan heya Merv û Bûxara û rûbarê Ceyhûn Kurdan bi dest xist. Wê demê Kurdên Çegenî, Çemîşgezek û **Zengene ku li herêma Heratê man**; Çeganan ji Sebzwarê heya Meşhed, Qoçan, Merv û Bûxara belav bûn. Ji çiyayên

bakûrê Xorasan re wê demê digotin **"Cîbal El Ekrad"**.[145-10] Heman siyaset ji alî Sefawiyan ve jî hatiye meşandin. Nadir Şah li hember êrîşên Ozbekan ji Erdebîl, Tebrîz, Şoregul, Gencê, Mako, Meraxa, Mahabat û Kûm ê jî 25.550 Kurd birin li Kandahar, li Sindistan û Xorasanê jê hêzên pêşêng pêk anîn.[28] Weka hinek mînakan min da, ji berî Medan bigre heta roja îro ti caran Kurd ji Xorasanê kêm nebûne û herdem bûye welatê wan. Bi taybetî jî herêmên çiyayî yên alî Afganîstanê, bakûr û bakûr rojavayê Xorasanê jî welatê Kurda bûye. Wekî di beşa Sumeriyan de jî min gote, li gor belgên wan îhtîmaleke pir mezine ku ew ji alî Xorasanê ve hatine başûrê Mezopotamya. Ji bo vê jî dîtinen ku dibêjin Xorasan welatê Tirkan e û yên ji wir hatine jî Tirk in ji binve şaşe. Şaristaniya ku ji wir hate Anadol û Sûriyê hemû malê Kurdan e. Wekî tê zanîn muzîk, ol û gelek kevneşopiyên din ji wir hatine. Ji Mewlana bigre hetanî H. Bektaşî Welî û yên din şopa Kurdan li ser wan e. Elewiyên îro bi tirkî diaxifin, şopa çand û ola Kurdan bi giranî li ser jî Kurdên zû hatine Anadolê û hatine asîmîle kirin in.

Li Xorasan Kurd ji Farisan re dibêjin **"Tat"**. Tat jî; li Ezerbeycan, Gîlan, Mazenderanê ji zimanê xwe re dibêjin Tatî û xwe jî wek Tat bi nav dikin. Di Lûgat-î Tirk-cîldê II an de jî tê qalkirin ku Tirk bo hemû Farisan peyva Tat bikar tînin...Di dema Sefawiyan de jî ji bo niştecîhên Îranê bi kar anîne. Hinek lêkolîner zimanê Tatan berdewamiya zimanê Med dibînin. Hinek şîa ne, hinek jî (Xalxal) şafiî ne. Di ola wan de şopa Zerdeştiyê heye.[95-136] Li Gîlanê Gîlekî, yan jî Reştî jî hene ku zimanê Aryanî deng dikin. Gîlanî xwe wek Îraqî binav dikin. Gîlekiyan di sala 933-1055 an de dewleteka bi navê Deylemî-Bûveyhî (Malbata Misafir-Salarî) avakirin. Dawî li desthilatdariya Ereban anîn. Gîlekî gelê li hember îslamê yê herî dirêj li ber xwe daye.[95-146] Bi qasî min çavderî kire; Gîlekî şaxekî Zazayan e, lê pêwîste ew hîn kûr bê lêkolîn kirin; bi taybetî li ser zimanê wan ew bê kirin. Wek tê zanîn, ji Mûsil û Kerkûkê jî gelek mirov reviyan Gîlanê û xwe veşartin.[95-150] Li vê herêmê sê zaravayên kurdî tên axaftin; lê herêmêka ji bo lêkolînê zimanê Arranî kilît e. Eger bi kûrahî bê lêkolîn kirin, dikare rê li ber gelek îspatên dîrokî jî veke. Em hêvîdarin, zimanzanên Kurd vî karî rojek ji rojekê zûtir bikin.

## EBA MUSLIMÊ XORASANÎ

Li ser kok û binata Eba du îddea hene: Yek, Navê bavê wî Evdilrehman û navê wî jî Îbrahîm e. Dîlekî ku di destê êla Benû Icl de gir bûye. Ji bo tevgera Ehlî Beyt nêzîkayî nîşan da û paşê jî kete vê hereketê û çû Xorasanê. Ya diduyan, Eba di sala 718 an de li gundê Mawitê ku li Ezerbeycanê ye, di mintiqa Kurd lê dijîn hatiye dinê. Bi navê Îbrahîm bin Heyyekan (Hetekan) tê nasîn. Navê bavê wî Evdilrehman e. Hîn zarok bûye bi malbata xwe ve dibin esîrê malbateka Ereb. Mirovekî kin, tijî û laşêkî sportmen û esmer bûye. Eba girêdayî koma Rewadî ye. Ew jî ji 11 êlan pêk tê. Eba, girêdayî fikra Batinî ye, ku ew jî Îslamê

û ji Şiîtiyê dûr e. Paşê bû mirovê Ebbasiyan.[57]

Herdû dîtin jî nêzîkî hev in, bi dîtina min jî ew Kurdekî ji Ezerbeycanê ye. Ji bo ku ew ji federasyona Rewadî ye, mirov dikare bêje ew kesekî ji kon/federasyon êlên mîna Şadî, Reşî yan jî Badilî ya ye.


**Eba Muslimê Xorasanî**

Şairê Ebbasiyan Ebu Delama ji bo wî wiha gotiye:

Ey Ebu mucrîm (mêrkuj)!
Te xwest bêbextî li Mansûr bikî
Bapîrên te yên Kurd jî xayin bûn
Te ez bi kuştinê didam tirsandinê
Lê, şêrê mezin te bi destên xwe parçe kir.

Ew helbesta jî dide xuyakirin, ku ew Kurd e û dema neheqiyan an jî şaşitiya xwe dibîne û şiyar dibe, ew bi xayintiyê tê tewanbar kirin. Lewra, xuyaye ku Eba bi hestên pak û hêviya edaletê tevlî Ebbasiyan dibe. Piştre rastiya wan dibîne û wiha dibêje: "Vana ez xapandim!"

Di dema Eba de gelên li Xorasanê di bin zilma Erebên misilman de dinalin û ew herêma bûbû qada tekoşîna Emewî û Ebbasiyan. Ji bo ku gelên li wir bi rêxistin bike, M. Bin Elî, 12 mirovên xwe yên baş û Eba Muslimê Xorasanî (718-755) di sala 745 an de şand Xorasanê. Bi rêbertiya Eba li Xorasan propaganda Ebbasiyan bû, xelk hate bi rêxistinkirin û dest bi serhildanan kirin. Xelkê herêmê li dora Ebbasiyan kom bûn û li dijî Emewiyan muxalefet dikirin. Eba, li Mervê axaftinekê dike û wiha dibêje: Serhildan meseleyeka civakî ye. Bi marifete şêx, axa û began pêş nakeve. Serhildan bi hilweşandina Emewîyên bê esil tenê bi sînor kirin. Ji bo ku em mafê wan zarokên ku hê mû di rûyê wan de derneketî bistînin; li dijî efendiyên Ereb, ev serhildana ya êl û miletên mazlûm e. Ev serhildana Kurd, Tirk, Harzemî yan; ya kolan, ya xulaman e. Ev serhildanên li hember kesên li dijî Ehl-î sûnnetan, Şîan, Elewiyan, Batiniyan, Zerdeştiyan, Xariciyan, Bûdîst û Manî yan e.[36] Di daxuyaniya wî de rengê wî jî diyare, ku wî sîstemekî bo hemû gelan û bo hemû baweriyan ji xwe re kiriye armanc. Li hember misilmantiya sunnî û tehdîta wê, olên cîran jî dawetê têkoşînê dike. Li ser wê babetê birêz Ocalan jî wiha dibêje: Eba Muslim û Îmam Elî, feqîr çavdikirin, adilbûn, bi prensîp bûn û girêdana qebîla vê re tunebûn. Ji ber ku sazî avanekirin, di sînorên terîqetan yên teng de, veşartî kar kirina wan bixwe re gelek tiştên nexweş jî anîn.[72]

Di dema Eba de li Xorasanê; Xûrremîtî, Elewîtî, Îsmaîlî, Keysanîtî û Şîîtî belav bû. Eba, serhildana Şorek/Şerîkê Şîî/Elewî têk bir û di vê demê de 600 hezar mirov hatin kuştin. Şerê navxweyî jî hebû û gelekan dixwest bila yekî ji malbata îmam Elî were ser textê xelîfetiyê, lê Eba, qet êrîşî oldarên Zerdeştî nekir û navbeyna xwe wan baş bû. Oldarên Zerdeştî alîkariya Eba dikirin û beşdarî şoreşa wî bûn. Eba, li dijî mezhebên ku ji Zerdeştî veqetiyane jî bê merhemet bû. Çav li wanê bi navê "ji rê derketî" venedikir. Kurdên Xorasanê ji bo ku di felsefa Zerdeştî de bûn û ji bo ku ola xwe biparêzin bi Erebên misilman re ji dil şer dikirin. Wekhevî ji bo wan girîng bû. Îro karektera Kurdan ya ku **'berê xelk, paşê xwe difikirî'** ji wê felsefê tê. Wek birêz Bûlût jî dibêje armanca wan "Wekhevî, bi hevre parvekirin û şirîkatî bû."

Hinek nûser dibêjin: Li destpêka tevgerê, Eba, li nêzîkî Mervê bi dizikî kar kir û di sala 129 an Remezana 25 a, yanê 9 Temmuza 747 an de derbasî pêş mirovên temamî cilên reş lixwe kirî bû û serhilda. Cilên reş dihatin mana şîna kesên (Ehlîbeyt-Elî) li Kerbela hatine kuştin. Ala reş dihate mana li dijî Emewiyan serhildan û berxwedan. Ji bo wan kincana dîrokzanekî rojava dibêje **"Îblisên Reş"**.[36] Li ser vê îddeayeka din jî heye ku dibêje: wana alên sor bilind kirin. Bi dîtina min, herdû jî rast in. Li destpêkê gelên wir, cilên reş ji dîrokêka dûr û dirêj digirtin ku me qala Çuxreşiyan kiribû; paşê bandora şehîdên Kerbelayê jî heye û reş kevneşopiyeka dîrokî ye. Bi ser vê yekê jî alên bi rengê sor ji bo tola Eba hilgirtin û êrîşî Ebbasîyan kirin. Lewra piştî têkoşînên bi Eba re girêdayî, sersorî-qizilbaşî bi pêş dikeve û Kurdên ji vê kevneşopiyê tên jî cilên sor hîn zêde lixwedikin û sor li cem wan hîn watedar e... Piştî ew şer û tekoşînan jî navê wan bi temamî dibe **"Alasoran"**... Eba, di sala 747 an de bi rêvebirê Emewiyan yê li Xorasan Nasr bin Seyyar re dest bi şer kir. Di sala 749 an de li bajarê Merv ala rizgariyê bilind kir û di heman salê de îdara Emewiya hilweşiya û şûna wê îdara Ebbasiyan destpê kir. Artêşên Emewiyan yên hatin ser Eba Muslim hemû têk çûn û di sala 749 an de bû desthilatdarê bi giştî yê herêma li rojhilatê Dicle.[101-30] Armanca wî azadiya gelan bû: Kurd, Faris, Erebên Şîa û Elewiyan xwe li dora Eba civand û ji Xorasan heta Mûsilê hevaltiya wî kirin. Lê di vê demê de bûyereka girîng jî qewimî: Dema Eba serhildanê li dijî Merwanê Emewî destpê dike, Kurdên El-Cezîrê ranabin û alîkariya wî nakin. Kurdên Xorasan, Ezerbeycan û el Cibel xwe zarokên Eba dizanîn û rabûn serhildanê. Kurd bûne du beş: Evên li Amed, Farqîn, Cizîrê, Nisêbîn û Mûsilê girêdayî Emewiyan bûn. Mumkune ku sedemê vê xwarziyê Kurdan Xelîfe Merwan yan jî yên wê herêmê êdî bi temamî misilmantî qebûl kiribûn û nedixwestin careke din serê xwe bi Ereban re têxin belayê be. Bi dewleta Emewî re li dora bajarê Şehrîzor û çemê Zê şer çêbû. Eba gelek xelk da dora xwe û artêşa Emewiyan li sala 748 an li Nehavend, piştre jî li Kirmanşah û Şehrîzor kire dest xwe û di sala 750 de xelîfê Emewiyan Merwan kuşt.[125-70] Gor hinek jêderên din jî bûyer cûda bi encam bûye: Eba, li destpêkê di bin fermana lawê Muhammed Îbrahîm de bû. Paşê ew li Harranê ji alî Merwan II

an ve hate îdam kirin. Bi ser vê de ew ketin bin kontrola pismamê Mihemmed Ebbas. Di sala 750 an de Eba artêşa Emewiyan li Sabê têk bir û kete Şamê. Eskerên Emewî hemû û Merwan hate kuştin.(101-31) Cemîl Paşa jî dibêje: Li Mûsilê hêzên Eba bi xelîfê dawî Merwan re cengeka mezin lidarxist. Merwan reviya Filîstîne. Elî Îbn Ebdullah (apê xelîfê nû) kete dû û ew kuşt. Ji torinê Elî, Ebû Ebbas Bîn Ebdullah bû xelîfe.(9-158) Ebûl Ebbas Abdullah (xwînrij) li bajarê Kûfê xelîfe hate îlan kirin. Bi ser vê de serdema Ebbasiyan destpêkir û şûna îdeolojiya sûnnîtîya hişk, Batinîyan îdare heynan. Demekê piştî reva **Merwan, beşek Kurd jî ji dora Filistînê berbi bakûr hatin û li dora Amedê bi cîh bûn. Di nava wan de êla bi navê Sewêdî jî heye** ku emê li pêş li ser rawestin.

Gelek jêder diyar dikin ku Eba di dema xwe ya dawî de, raman û nêrînên xwe li ser sîstema Ereban guhartiye; ew yeka ji devê Eba wiha tê şirove kirin: "Min ji malbata Pêxember bi kesekî bawer kir, wî jî ez xapandim! Kur'an berovajî kir û ji bo berjewendiyê xwe bi kar anîn. Xwedê ji nişkava ez şiyar kirim, min fêhm kir ku ez alîgirê neheqîme" bi ser vê guhartinê ve ew ji alî Al Mansûr ve di sala 755 an de hate kuştin.(101-31) Birêvebirên Ereb, ji rêbertî, xelk bi rêxistin kirin û bandora wî ya li ser gel û ji şiyarbûyîna wî ya netewî tirsiyan. Ebbasiyan dîtin ku ewê pêşêrojê ji bo Kurdan û ola wan jî têbikoşe û li hember wan derkeve; ji bo vê jî hema li destpêkê ew bê bandor kirin. Eba dawet kirin, wexta kete hundirê qesrê ji alî xelîfê Ebbasî Ebu Cafer al Mansûr ve bi namerdî hate kuştin (754-55), laşê wî parçe kirin û avêtin çemê Dîcle. Bi ser kuştina Eba Muslim de bi dehan serhildan li Xorasan û Kurdistanê pêk hatin. Bi sed hezaran mirov di şerên bi xwîn de mirin. Ji bo ku heyfa Eba bistînin bi dehan êlên Kurd ku îro neviyê xwe li Anadolê ne hatin ser Ebbasiyan û sê mehan bi wan re şer kirin. Bi vî awayî jî beşek Kurd wê demê ji Xorasan hatin Kurdistanê û piştre jî hatin Heleb û Anadoliya Navîn. Di nava wan Kurdana de, Eba ji rêberekî zêdetir wek pêxemberekî bû.



**Eba Muslim şer dike**

Îro li ser Elewîtiya Anadolê em vê bandorê hîn zêde dibînin; ew yeka ji alî olî, civakî, kinc û folklerê de eşkere tê dîtin. Bê guman ew tevgera bi ser biketa û li Anadol, Arran û Kurdistanê bibûya dewlet îro rewş cûda dibû. Ji vî alî ve nîvcû ma û Eba nedixwest bibe mirovê yekemîn. Ji bo ku Eba ji kevneşopiya Zerdeştî dihat, wî serokatiya dewletê qebûl nekir û ji bo wê teklîf ji Îmam Caferî Sadik re bir. Kuştina Eba bû çekeka li hember Ebbasiyan û gelê xwe li dijî wan bi rêxistin kir. Hema piştî kuştinê êlên ji Xorasanê hatin bi Ebbasiyan re sê mehan bê navber şer kirin û têk çûn. Piştî wê di sala 764 an de, Kurdên Mûsilê serhildan û vê bandora xwe li der û dorên din jî kir. Di serokatiya Al-Mukanna de di sala 777 an de li Xorasanê serhildanê destpêkir û sê salan ajot. Di sala 793 an de li Cizîrê Haricî Fadil rabû.(125-72) Serhildanên ji bo Eba û li dijî misilmantiyê yên wê serdeme, nêzîkî sed salan ajot ku wek agir herder şewitand.

Beşek Dîroknûs dibêjin: Di sala 809 an de di navbera ber namzetê xelîfan, El Memun û El Emin de tekoşîneke destpê kir. Xorasanî dîsa derbasî berxwedanê bûn û herêma Tîbet, Kabîl û Cîgavey ji kontrola misilmanan derxistin. Ji bo Xorasanê, wê demê Elî Reza bin Mûsa bin Cafer ibn Ebî Talîbê ji Medînê wek berpirsiyarê gîştî hate şandin. Va tayina (817/8) ji bo Xorasaniyan memnun bikin kiribûn, bi ser vê de gelê herêmê cilên xwe yên reş bi yên kesk ve guhartin.(36) Bi dîtina min ew zêde ne di cîh de ye, lewra, gelê weqas xwîn rijandî bi rêvebirekî re hema cilên xwe naguhure. Dema mirov li vê herêmê digere dibîne ku hîna jî di nava Kurdên li Xorasanê de rengê herî zêde bi kar tê sor e. Kincên Kurdên wir ji sedî notî ji rengê sor û pir hindik jî şîn in. Lê di nava şîayên wir de hîna jî reş rengê ku tê tercîh kirin e. Prof. Sirma jî dibêje: Memnun nêzîkî Şîîtî yê bû ji ber vê jî ji gelê xwest ku cilên xwe yên reş bi yên kesk biguhurin.(98-76) Hîna jî li Xorasan alên reş li mizgeftan û malên şînê tenê daliqandin.

Bi kurtî be jî min hewl da ku jiyan û têkoşîna Eba Muslim li ber çavên we raxim; guman nîne ku ew Kurd bû. Heta vê demê jî kesekî mîna wî yê bi Kurdan ve bûye yek can û hest nîne. Kalên min, berê wexta xwe bi çîrokên Eba derbas dikirin; gelê me yê li Xorasan dema qala wî dikin pir pê serbilind in û pir jî rêz digirin. Bandora wî yê di nava Farisan de jî heye. Eger ew ne Kurd bûya bi vî xelkî re weqas dibû yek? Piştî qetîlkirina Eba gelek tevgerên tolhildanê derketin; gelê Kurd û yên din ên dijî Îslamê bi wan re weqas bûn yek ku piştî demekê ew tevgerên eskerî bûn mezheb û terîqatên cûda. Niha em hinekan ji nêz ve nas bikin.

## Mezhebên Cûda û serhildanên bi dû Eba Muslimê Xorasanî

**1- Xûrremîtî (Sûrhalaman):**

Di dîrokê de li ser Xûrremîtiyan zêde agahî û belge nînin, ewên ku heyî jî piranî yên nivîskaren Ereb in û Xûrremîtiyan wek mirovên dinyayê yên herî

xirab nîşan didin. Xûrremîzm ji alî gundiyên di bandora Zerdeştî, Mazdekî û Manîzmê de mayine ve dihate destek kirin. Nizamul Mulk, di berhema xwe ya bi navê "Siyasetnamê" de Xûrremîtiyê wiha tarîf dike: " Mal di navbera mirovan de hevbeş e, ti kes ji wî mafî maxdûr nemîne. Ji bo wê herkes malê xwe derxiste holê. Gor wan, zilim û neheqiya cîvakî tarîtiyê temsîl dike û ji bo wê qet bi misilmanan ve lihev nekirin. Wexta Mazdek kuştin bi şûnve, jina wî **Hûrrem Bintî Kade** bi dû meriyên xwe ve ji Medya reviya û çû bajarokê Rêy û bangî gelê kir ku di riya mêre wê biçin. Ji bo wê, kesên ketin dû felsefa jinikê re gotin ewê bi ola Xûrremîtî re. Di demeka kin de li her cîhekî belavbûn û li her bajarekî navek heynan. Batinî jî bi wan re bûn yek û li her cîhekî serî hildan. Ji wan re: **"Mûhamîra"** yan jî **"Qizil"** yan jî **"Alasoran"** digotin.[125-73] Di wir de navê Alasoran girtina wan girîng e, ku bingeha xwe li dijî şovenîzma Ereban, sîstema wan ê înkar û îmha yê wek mirovên azadî, wekhevîxwaz û ji bo wê jî amade ye ku her tiştekî bikin e. Di roja îro de ji berdewamiya wan re **Qizilbaş** tê gotin ku dîroka xwe ji vir tê. Mazdekiyan û Xûrremîyan wek sembol di cil û alên xwe de sor bikar anîne. Ji bo wê bi navê "Sûrhalaman-Ala Soran" derbasî dîrokê bûne. Ew yeka di dema qizilbaşiyê de dîsa derket holê.[154-257] Peyva Sûrhalaman îro jî di Kurdî de tê vê watê. Sur=Sor e, -ala=beyraq/al/perçêm ê, man jî dikare di cîhê piranî yan jî di wata şexisan de bê bikar anîn. Dîroknûsê Kurd Torî, felsefa Xûrremîyan wiha şirove dike: Vana, bingeha neheqiyê di xak û civakê de didîtin. Jin jî di nav de, dixwestin di her aliyê civakî de wek heviyê pêk bînin û xwe ji bacê rizgar bikin. Li dijî xanedaniya Ereban û Îslamê têkoşîneka mezin dan. Di dema Ebbasiyan de Xûrremîtî bi Şîa ve gelek nêzîkî hev bû. Tespîta nêzikbûna Şîa jî raste; lewra, di demê re Xûrremîtiya radikal cîhê xwe ji Şîatî û Qizilbaşî yê re hişt. Poladyan jî kesên bi Alên Sor wiha şirove dike: **"Kesên ji bo azadiyê amade ne ku xwe feda bikin.."** Gorî jêderên Sûriyê, dema Babek li **Kordûenê** (Başûrê gola Wanê, nivîskarên din jî vê peyvê di mana Xûrramî de bi kar tînin.) serî hilda pir çalakbûn û alîgirên wan digihîştin 200 hezarî. Ebu Mansûr Bexdadî dibêje: "Babek ji Ezerbeycan û Deylemiyan 300 hezar kes didît."[57] Heta vir min gelek caran nivîsî ku Kurd ji Ezerbeycanê qet kêm nebûn; Kurdên wir bi piranî jî kurmancî axêf in. Deylemî jî gelek caran di wata kurmanckî axêfan de xuya dike. Bi vî awayî em fêr dibin ku wê demê jî di nava wan Kurdan de tevlîhevbûnek pêk hatiye. Niqta din ê girîng jî serhejmara wan e. Ji vê jî derdikeve holê ku ew girseyeke pir mezine, raste jî. Ji wan jêderên Sûriyê jî tê îspatkirin ku Xûrremî Kurd in û gelek nivîskaran din **di şûna Xûrremîtî de Korduenê bi kar anîne**.

Xûrremîtî di bin bandora 'wekhevî û şirîkatî' ya Mazdeyî de man û milê Mazdeyî yê Batinî/Elewî yê ku navê Gulat-i Şîa lê dihat kirin. Bi vê re bi Soralan ve bûn yek û bi navê Mazdakîa giştî hatin nasandin. Dîrokzanê misilman dibêjin: 'Tevgera Mazdakî, di dema Îslamê de jî li herema Kurdistanê berfireh bû, endamên wê bi rêxistina Keysanî (milê radîkal ya ji rê derketî a Batinî) ve bûn yek û li dijî Îslamê muxalefet dikirin. Fermandarê Ebbasiyan ê li Xorasanê

Ammar bin Yezid (736) ji ber tevgera xwe li bajarê Mervê, ji ber "endametiya tevgera Xûrremîtiyê" hate mahkeme kirin. Navê xwe yê kod **Hidaş** bû û hate darvekirin bi şunda jî bi wî navî tevgerek derket holê. Endamên wê iddîa dikirin, ku îmamtî ji M. Bin Alî derbasî Ammar bûbû û bawer dikirin ku ewê rojekê dîsa vegere. Xûrremîtî bi (Eba)-Muslimetiyê ve bûbûn yek û ew bawer nedikirin ku Eba miriye û ew wek xwedê û pêxember didîtin. Beşekî jî bawer dikir ku ew miriye û îdîa dikirin ku mafê îmamtiyê yê keça wî **Fatma** ye (gor hinekan jî navê wê: **Mênîcxan** e). Ji wan re jî milê "Fatimî" dihat gotin. Bi dîtina min navê wê yê esas divê Mênîcxan be; Fatma navekî erebî ye.

Di dîrokê de cara yekemîn di salên 778-79 an de qala Xûrremîtiyê tê kirin.[57] Nîzamulmulk dinivisîne ku: " Di dema Xelîfe Mêhdî de, Batiniyên Gorgan bi Xûrremîyan ve bûn yek û gotin; ku 'Eba Muslim dijî!' Dema Harûn el Reşîdî li Xorasan bû (807-809), Xûrremîyan dîsa ji Esfehan, Tarmedeyî, Fayekê serî hildan û ji Rê, Hemedan û Destê gelek mirov hatin tevlî wan bûn. Hejmara Batinî û Xûrremîyan zêde bû, lê têkçûn û zarokên wan li Bexda hatin firotin. Heman dîtin ji alî Ebu Muhammed Abdullah Ibn-Esat Yafeyî ve jî tê gotin: "Xûrremîyan di sala 808 an de li Ezerbeycanê serî hildan. Di sala **833** an de gelê Hemedan bi piranî ola Xûrremî pejirand û serî hildan. Xelîfe Mûtasim, Îsheq Ibn-Îbrahîm şand ser serhildanê û wî jî 100 hezar kes kuşt, gelek mirov anîn Bexda firotin û **evên man jî reviyan cem Împaratorê Bîzans Teofîl**. Ji vê bûyerê 9 salan bi şûnde Babek li Ezerbeycan serî hildan û heta sala 913 an gelek mirov mirin. Di tevgera Xûrremîtiyê de taybetbetmendiya herî girîng ewe, ku ew ji cografyeka pir fireh piştgiriyê digirin; yan jî ew yeka bi hêsanî pêk dihat. Sedema vê yekê jî ewe, ku gelên Kurdistanê û Pars Zerdeştî bûn û di her fersendê de di dijberiya Îslamê de digihîştin hev. Bi vê re girêdayî tê gotin, ku Xûrremî, bi Muhemmîre yan jî bi-alasor e li Teberistan (Gîlan-Başûrê Hezar) û Gûrgan; bi Mûbeyyize (Kinc Spiyan) li Maveraûnnehîr û bi Mugana yên ser-çavên xwe bi maske re di eynî bîr û bawerî û olî de bûn. Mumkune ku serokê Babek li Ezerbeycan bi Mazyarê Teberistan ve di nava îttîfaq û yekîtiyê de bûn.

Saîd Nefîsî dibêje: Xelkên bi navê Xûrremîyan li herêma çiya yê bi navê Bezz (Bozzeyn) a li Ezerbeycanê (Arran) dijî. Ew jî di navbera Derya Kesk û Bakûrê Gola Ûrmiyê de ye. Wekî din jî Xûrremî li Ezerbeycan, Xorasan, Kirman, Hemedan, Rey, Samyan, Qazwîn û li gelek cîhên din ên çiyayî dijîn. Hemûyan baweriya xwe bi ola Mazdek dianîn. Ji gel e li herêma Arran dijî re Îraniyan ji berê ve digotin Alan/Alanî. Paytexta xwe berî Îslamê Kevalek bû û Ereb dora salên 643 û 655 an de hatin.[41] Wekî berê jî me nivîsî ji êleka Dimilî re Alan tê gotin ku ew ji bakûr hatine dora Dêrsîmê. Hinek dîtin jî hene ku dibêjin ew berê li Esfehanê jiyane û bi êrîşên Ereban re çûne bakûr.

**2- Serhildana Babek:**

Hinek dîtin û jêder, bi taybetî jî yên Farisan îddea dikin ku Babek Faris

e; lê ew ne raste. Gor ragihandina Ebu Hanife Dinevarî ya di pirtûka bi navê "Ehbar el Tival" de dibêje: Babek, kurê Mûteherrine Fatima keça Eba Muslimê Xorasanî ye. Yanê xwarziyê Eba ye; me li jor qala nijada Eba kiribû. Omer Tamîmî jî dinivisîne, ku Babekî ji eslê Nebtanî ne (yan jî Nebtiye **Sevadan**) kurê Abdullahê ji Medainê ne. Diya xwe jî ji gundê Bilalabad (Kelanrûd) Mimeda li Ezerbeycanê dijî, jineka navê xwe Brûmid/ **Bûrûmend** û çavekî xwe kor bû. Navê bavê wî jî **Merdes** bû. Ji koka Sevad yan jî Sewêdî ne? Wek tê zanîn êlaka Kurdan bi vî navî heye û di serî de li Anatoliya Navîn, Amed û gelek cîhên din belav bûne. Di beşa êlan de emê bi firehî qal bikin lê ew êleka pir girêdayî kevneşopiya çanda xwe ye û di dema ji Xorasan êlên Kurd ji bo tola Eba hatin, ew jî di nav de bûn û piştre jî hatin Anadolê. Taybetmendiya wan a herî mezin jî, bere şalên sor li xwe dikirine û ji kincên sor gelek hezdikin. Êlên cîran ew yeka tanê dikirin /didan ber pozî wan ... Dema mirov li pêvajoya wan ya dîrokî, çand û bûyeran tîne cem hev, ne dûr e ku Babekî ji koma Sewêdî bin û têkiliya wan bi Sefawiyan re jî hebe! Êla Sewêdî, êleka pir girêdayî Eba Muslimê Xorasanî xuya dike; bi hêza wan û êlên din, Eba Emewî têk biribûn. Piştî wan jî rêvebiriya Ebbasî hatibû û em dibînin ku Sewêdîyan bi Ebbasiyan ve di nava gelek têkîliyên xweş de ne. Yekî bi navê **Bermekiyan** yê ji vê êlê bûbû wezîrê Ebbasiyan. Piştre ew jî rastî xiyaneta Ebbasiyan hatin û wana jî koç kiribûn. Ji bo ku bavê Babek jî navê xwe Merdes e bûyer hîna jî balkêştir dibe. Bi navê Mirdêsî jî êleka mezin heye û nêzîkî Sewêdiyan e û li Anatolî ye cîranê hev in. Her dû êl jî di nava êlên ji Xorasan hatine û bi Ebbasiyan re sê mehan şer kirine de tên dîtin. Sem'anî di kîteba "Kitab el Ensab" de dibejê, ew ji mirovên kurê Merdas Babek in. Heta navê Bermekiyan jî mumkune ji Babek hatibe. Gor rîwayeteka din jî ew ji binemala kurên Mutahharan in; digotin Mutahhara Ibn-Fatima. Xuyayê ku herdû îddea jî nêzîkî hev in: Herdû jî digihîjine keça Eba Muslim Fatima û di alî olî de jî Babekî di şopa Xorasanî de ne. Torî jî dibêje, ew ji Arran (Ezerbeycan) e û ji ola Xorremî ye. Babek, kesê herî mezin ku xwestiye mezheba Xorremtîyê belav bike ye. Xorremtî milê Mazdekî yê herî mezine. Xemgîn jî dibêje: Babekî Xoremî ji Kurdên Mazyar û ji malbateka normal bû. Xelkê Kurd ji dewletê bûbû kolê û neçar dima ku xizmeta Ereban bike. Ji bo vê neheqiyê, Babek xelk bi rêxistin kir û li Al-Badd ew pêşva çû. Li bakûrê Kurdistanê gelek cîh rizgar kirin. Di sala 816 an de li kudera Kurdistan amedekarî temam bûne nayê zanîn lê di raperîna çêbûye de artêşa Kurdan bi serketiye.[101-37]

Birêz Îzady aliyekî din ê Babekî balkêş dide xuyakirin: Biryargeha Babêk li Ezerbeycanê di nav Kurdên koçber de bû. Gor baweriyê, di tevgera Xûrremîyê de, ruhê serok û şexsiyetên olî, ji kesekî derbasî kesê din dibû. Cîhê ku wek Hecî Bektaşî tê nasîn, îhtîmaleka mezine ku cîhê ku Narseh lê bi cîh bûye.[154-257] Ew Kurdên ku me li jor wek nijada Babek da xuyakirin jî Kurdên koçer bûn, Ezerbeycan warê koçeran bû, ew jî îspateke ku Babek û bi wî re girêdayî Eba yî ji Kurdên îro li dervayî welat in. Bi vî awayî Babek jî pişta xwe


dida Kurdên koçberên li Arran û yek ji wan bû. Wekî me li jor jî gote: pêvajo ya dîrokî, çand, kincên sor û di alî olî de jî ew didin xuyakirin ku Babek yek ji Kurdên koçber bû. Heta mirov dikare bibêje ku ewî ji alî dê (dayik) ve ji êla Sewêdî; ji alî bavê ve jî ji êla Mirdêsiyan bû. Mesûdî dinivîse ku: "Nasirê Kurd-Narseh" tevlî Babek bû. Ebbasiyan di sala 833 an de 60 hezar merxasên wî kuştin bişûnde, xwe avêt paş Bîzansiyan. Wana jî Nasir li nav gelê wî, li bakûrê navenda Anadolê, li Pontûsê bi cîh kirin.(154-102) Li ser vê bingehê mirov dikare bêje gelo wê demê Sewêdî û Mirdêsî li dora Enqera, Eskîşehîr û Haymanayê bûn? Ez nikarim bêjim erê, lewra ew êlên em qal dikin wê demê li Kurdistanê ne. Ew jî lêkolînên kûr dixwaze.

Piştî qetilkirina Eba Muslim, vê tevgerê 90 hezar kes komkirin û serî hilda. Serhildana herî mezin ji alî Babek ve pêk hat. Raperîn di sala 816 an de li Esfahanê destpêkir, Xorasan, Ezerbeycan û rojhilatê Kurdistanê jî kirê bin bandora xwe, lê di sala 837 an de têk çû. Îdeolojiya wê Xûrremîzîm bû ku ji gundiyên di bandora Zerdeştî, Mazdekî û Manîzmê de mabûn ve dihate destek kirin. Alên Sor hildigirtin ku di têkoşînê de, sembola ji bo azadiyê xwe fedakirinê bû. Di hinek jêderan de dibêje ku: Piştî Babek, Xûrremîtî bûne du beş: yek aliyê **Alasor** û yên din jî **Babekî** ne.(125-93) Babek bajarê Rê heyna bişûnde got Eba nemiriye û ewê di demeke nêzîk de bi Mazdak û Mêhdî re tevhev vegere û armanca wî ya esasî ewe ku Kabê hilweşîne...

Tevgera Babek, nêzîkî 100 salan li dijî Ebbasiyan têkoşiya. Wê demê Ezerbeycanê nêzîkî 300 salî Kurd heynabûn nava xwe. Ew der bû cîhê Kurdan ya dawî. Yakûbî (891 PÎ) de dinivîse ku: Nifûsa Ezerbeycan ji du gelên Îranî pêk tê; yek Azerî ne yek jî Cewanî (Caf) ne. Gor Hawafî jî: Babek ji nav Cewaniyan derket û dest bi tekoşînê kir. Li çiyayên rojhilatê Ezerbeycan Sabalan, êlên Kurdên mîna: Belikan, Gerger û Badh bi cîh bûbûn. Îro jî ew wek Belikan, Baz û Bazaynî hene.(154-101) Bi dîtina min Cewanî bi Cafan ve ne yek in, Caf Kurdên bi giranî Soranî û çend şaxên Lerî axêf in. Îhtîmaleka mezine, ku Cewanî navê Celaliya yê kevn e. Eger Babekî ji Cafan be, dîtinen me li jor nivîsîne jî vala derkevin. Bi dîtina min jî ew ne ji Cafan e; lê dibe ku her sê federasyonan (Sewêd, Mirdês û Caf) wê demê îttîfaq jî kiribin.

Xûrremîyan, di salên 787, 815, 827, 833, 838 an û gelek carên din li dijî Îslamê serî bilind kirin. Serhildana dawî 22 salan ajot. Bi taybetî jî dema Babek, artêşa xelîfe ya herî baş û serleşkerên herî bi tecrûbe şandin ser eniya Xûrremîyan û di her carekê de jî Babek ew têk birin û gelek fermanderên bi nav û deng kuştin yan jî esîr kirin. Mûtasim (833-842) tirsiya û lawê Kaûs Afşînê Kurd şand ser Babek. Bi salan li Ezerbeycan şer kirin; di dawiyê de Babek wende kir (837) û reviya. Dixwest here cem Împaratore Bîzans Teofîlê ku çend caran ji hevre mektup şandibûn û alikarî kirîbû. Di vê navberê de Mazyar li Taberistanê serî hilda. Babek, ferman da kesên agirperest û Mazyar ku têbikoşin heta ji misilmantiyê tiştek nema. Babek dema dixwest bireve, di rê de yekî Ermenî ew xapand û teslîmê Afşîn kir (838). Artêşa Babek,

ku ji Ezerbeycaniyan û Deylemiyan ya ji 300 hezar leşkerî pêk dihat nêzîkî milyonek misilman kuştin. Lê di dawiyê de ew lehengê Kurd, biraye wî û malbata wî bi merasimeke qet nehatî dîtin birin Bexda cem xelîfe Mûtasim. Li huzura Mûtasim destê wî yê çepê jêkirin, wî xwîna xwe di rûye xwe da û got: **"Wextê xwîn diçe, rûyên mirov zer dibin û bila kes nebêje ku ew tirsiya!"** û di heman demê de dibêje "Asanya=hêsan e!"(125-94) Di nava Kurdên li Xorasanê, bi taybetî jî di nava Kurdên Şadî de, berê, dema leşker diçûne şer, rûyên xwe bi sor reng dikirine ku dema birîndar bibin bila xuya neke; dost dil êş, dijmin jî pê şa nebin û cesaret negirin. Mirov dikare bêje hema hema ji sedî sed ew kevneşopiya ji Babek ve hatiye. Mumkune Medan jî dikiriye, lê ji bo ku herî dawî Babek kiriye, mirov dikare bike malê wî. Yekê jî wêneyên Babekê ku hatine xêzkirin bi yên Kurdên Şadî ve hema hema yek e.



**Şervanê Şadiyan ê bi rûyê sor**

Li ber çavên xelîfê hov dest, ling û serê wî jê dikin û serî dişînin Xorasan; li gund û bajaran digerînin (838). Di heman salê de Mîr Cafer li Mûsil serî hilda û ew heta Ezerbeycanê belav bû û di sala 839 an de jî têk çû.[125-94] Du salan şunde artêşa Ereban, Mazyarê agirperest jî li Teberistanê têk birin û ew jî wek Babek kuştin. Tê gotin, ku Xelîfe Mûtasim, bi zorê bi keça Babek re raketiye, Mazyar û patrik Emûriyye ya biçûke ku esîr ketî gotiye "Padîşah wisa dibêje!"[41] Di sala 846 an de Kurd li Esfehanê rabûn serpiya. Di sala 875 an de bi pêşengiya Mehmed Hezar Merd serhildan û heta 878 an ve domkir. Di sala 906 an de êla Hezbaniyan rabû û heta Mûsil hatin lê têk çûn û vegerîn Ezerbeycanê.[101-37] Wek tê dîtin bi dehan serhildan û alozî pêk hatine. Wekî pir caran jî mirov rast tê, kesên ji dagirkeran re alîkar dibin yan jî dibin maşika wan, di dawiyê de ji şûrê dijmin xwe rizgar nakin. Yan bi suîkastan dikûjin yan jî di serhildanan de.

Sê salan piştî şerê Babek û Afşîn, vê carê maşikê Ereban Afşîn serê xwe hilda, lê têk çû û di sala 841 an de mir. Gor jêderên Ereban; di malê de pût hatine dîtin û wî xwestiye ku desthilatdariya Şahê Îranê dîsa bide jiyîn. Dîroknas hemû di vê baweriyê de ne, ku eger Mûtasim, Babek û Mazyar têk nebira û Bîzans feth nekira Îslam dikete tehlûkeyeke mezin û belkî ji holê jî rabûya. Xûrremî, ji mirina Babek 99 salan şunve jî li Qerecê hebûn. Heta sala 1135 an li bakûrê Çemê Arasê (Mûxan) dijiyan.

Di dema xelîfetiya Reşîd de, Ereb bûn hakimê herêmê. Kelhe û set çêkirin û artêşeka gelek mezin li wir bi cîh kirin. Wek tê zanîn Xelîfe Harûn bû ku Kurd ji Xorasan, Mazenderan, Secsecîstan û Ezerbeycan rakirin û ji Samsûn heta Edenê bi cîh kiribûn. Ew dixwestin Kurdan di navbera Bîzans û Misilmanan de bikin mertal an herêma tampon.

Sem'anî îddea dike ku Xûrremî ji salê carekê li cîhekî bi mêr û jinan ve kom dibin û pifê çirayê dikin. Herkes ji xwe re jinekê digire.[41]

**3- Îsmaîlî:**

Di nava Kurdên li Anatoliya Navîn de berê şopa Îsmaîlîtiyê dihate dîtin; hinek kalan di nava gotinê de dianîn ziman ku ew berê Îsmaîlî bûne, wata wê jî nizanibûn. Dema ez di 2001 an de çûm Xorasanê apê Hecî Barûyî jî ew yeka nûva-dubare kir. Ji wan herdû dîtinên ku wek cografîk ji hev dûr û apolîtîk mirov derdixe ku demekê ew Îsmaîlî bûne. Wê çaxê Îsmaîlî çi ye? Di pirtûkê olderên Tirk amêdekirî de tê gotin: Di Elewîtiyê de Caferî Sadik îmamê şeşan tê pejirandin û Îsmaîl jî kurê wî ye.[82] Wek şîa yên radîkal baweriya wan bi buhuşt, dojeh û qiyametê nîne.[95-57] Di pirtûka "Dîroka Merwanî" de jî tê gotin: Şaxekî şîa yê radîkal û bi hêz in. Ji mirina Caferî Sadik bi şûnde, li cîhê wî kesên li hember lawê wî Mûsa Qasim derketî û xwestin bila lawê wî yê din Îsmaîl derbas bibi ne. Bûn du beş; yekî di sala 910 an de dewleta Misir-Fatimî damezirandin. Beşek jî li dora **Hesen bîn Sabah dewleta Alamût a Kurd damezirandin**. Ew dewlet di sala 1256 an de ji alî Hulagû ve hate rûxandin.

Ji wan yek reviya Hindîstan.(13-235) Wek ku ew jêderana radigihînin tu têkiliya Îsmaîltiyê bi îmaman re nîne û ew berdewamiya Zerdeştî ye. Yanî di cewher de felsefa Zerdeştî ye, lê mumkune di şikil de hinek nermbûn kiribin ku ji êrîşên Ereban rizgar bibin. Vê yekê Bîlgîn wiha tîne ziman: **Mezheba Îsmaîlî jî heye ku wê; Zarathuştra bi Îslamê porkiriyê/nixumandiye** û di nav Kurdan de cîh nedîtiye.(71-53) Di nava hinek Kurdan de, demekê cîh girtiye, lê bawer dikim ne demeke dirêj e. Milekî Îsmaîliyê jî Zikrîtiye. Pirtûkeka wan a taybet heye; di nimêj û duayên xwe de navê Hz. Muhammed avêtinê û tenê Qiyama **Mêhdî** tînin ziman. Di nav Kurdên Xorasan û Anatoliya Navîn de berê gelek kesan xwe dabû hêviya Mêhdî; ku ewê were û dinyayê rizgar bike...Di rojên taybet de ayîna zikrê dikin. Belûcîstan-Torbete Kiç-Çiyayê Mûrat navenda wan e. Li Belûcîstanê ji wan re **Zirkî** yan jî **Daî** tê gotin. Beşek jî li Qeraçiyê dijîn.(95-58) Bi van agahiyan mesele hîn balkêştir dibe; Zirkî/**Zerikî**, navê êleka Kurde ku li gelek cîhên Kurdistan, Anadol û Xorasanê dijîne. Milê Îsmaîliyê yê tê qalkirin Zerikî ne. Yanê di nava federasyon/ konfederasyona Kurdên Îsmaîlî de milek jî Zerikî bûn. Ji navê Zerikiyan ew wek milekî tê nîşandin, lê ew milê federasyonê ye.



**Zerikiyên li Qoçgiriyê di Cemê de lokme belav dikin**

Li Îran, Îraq û Sûriyê ji alîgirên Îsmaîliyan re **"Karmat"** digotin. Şîiyên Kurdistanê jî di bin wî navî de bi veşartî xwe bi rêxistin dikirin. Di nav zanaatkaran de, ji nîve sedsala IX an şûnde xuya dike. Karmat li Sûriyê bi hêz bûn: bi taybet jî li Şam, Homs, Hama yê. Ev rêxistina ji alî meşhûr belavkar Yahya îbn **Zikrazayh** dihate birêvebirin.(3-54) Belavbûna Zerikiyan ya li Sûriyê jî eger mirov li ber çavan bigire, têkiliya Zerikiyan bi Îsmaîliyan ve hîn zêdetir

derdikeve holê. Ji mirina Yahya bi şûnde birayê wî Sahib Aş Şamiya hate rêvebiriyê. Rêvebirekî Kurd li Sûriyê bi Zikrazayh ve têkiliya xwe hebû. Navê wî Cafer Îbn Hamîd Al Kurdî bû. Belga dîrokî di sala 902-903 an de ji alî Sahib Aş Şamiya ve, ji hevalê wî yê Kurd re tê şandin. Cafer Al Kurdî îhtimaleka mezine ku rêvebirê bajarê Homs bû. Mektûb wiha ye: " Cafer Kurdî re silav. Ewên ku serî hildidin û bi Xwedê û Pêxember bawer nakin li herêma te ne. Ji bo wê em artêşê dişinîn wir...." Ev nameya jî îspat dike ku Kurd wê demê jî li wir hebûne.(3-54)

Di gelek nivîsan de Îsmaîlî ji Batiniyan dihatin hesibandin û dîsa ji Xûrremîyan re jî Batinî digotin. Ibn-Don Hesen Razî dibêje: **"Ji Îsmaîliyan re; Batiniyye, Qeremita, Xûrremîye, Sab'iyye, Babekiyye û Mûhemmire digotin".** Batinî, tê wata kesên ku fikra xwe nikarin eşkere bêjin û di paş perdê de dibêjine. Tê zanîn ku ew du beş in: Yek Cavîdaniyye, ya din jî Babekî ne. Cavîd serokê berê bû û paşê Babek îddea kir ku ruhê Cavîd derbasî wî bûye. Ew dijminê Ereb û ola wan bûn. Hema hema bi temamî tevgerên li dijî Îslamê yê derdiketî re navê Îsmaîlîtiyê lê datanîn. Bi dîtina min ti têkiliya Îsmaîlîtiyê û tevgerên din bi Îmaman re tune. Mumkune ku navê Îsmaîlê Caferî Sadik ji bo ku xwe pê kamûfle bikin bikar anîbin. Yan jî hinek nivîskaran û îdeologan bi zanîstî ew giredana îddea kirin ku bi Îslamê re ware girêdan. Di bingeh de herdû jî dijber û dijminên hev in.

Îsmaîlî di sedsala X an de di nava dewleta misilmanan de bûn sedema gelek aloziyan. Ew, di nav dewleta Kurd ya bi navê Hamdaniyan de gelek propaganda dikirin ku ew terîqeta belav bibe. Li dijî zilm û zordariya Ereban, dixwestin hemwelatiyên wan hemû bi azadî olên xwe pîroz bikin; alîkariya feqîran bê kirin û erd li gelê belav bibe; di rêvebirina dewletê de demokrasî û nava mirovan de jî wekhevî dixwestin. Hesen Sabah di nava dewleta Ziyar de, êlên Kurd bi wê terîqetê birêxistin kirin û di demeka kin de alîgirên xwe gihîştin 60 hezaran.(101-44)

**4-Bektaşî:**

Ji navê Hecî Bektaşî Welî tê. Wek tê zanîn Welî ji Xorasanê hate navenda Anadolê. Îhtîmaleka pir mezine ku ew Kurdekî di baweriya Zerdeştî de bû, ji ber êrîşên Ereban hate Anadolê û li wir veşartî kar dikir. Li ser bingehê wî avête serhildana Baba Îsheq pêk hat. Ew serhildana ji alî kalên Kurdên îro li Anatolî ye û Xorasanê ve pêk hatibû; li ser wê esasê mirov dikare bibêje ku nijada ku herdû rêber jê hatine Kurdên îro li dervayê welat in. E. Gezîk dibêje: Ew, kurê siltanê Xorasan Îbrahîm bû, koka xwe digihîşte îmamê heftan Mûsa Kazim. Kengê ji dayik bûye nayê zanîn, lê di sala 1270 an de çû ser dilovaniya xwe. Ji Xorasan hate Anatolî ye û bi veşartî kar kir. Îhtîmaleke mezine, ku ew ji mîstîzma koka xwe digihîşte Xorasanê ku wê demê li Anatoliya hebû û ji derwêşê qelender Ebu'l Vefa bû.(60) Piraniya wan rêberên asî bi îmaman ve tên girêdan, lê ti bingehekî wê yê rast nîne.

Şerîf Firat dibêje: Di sala 680 an de ji Nîşabûr derdikeve û cîhên ku lê digere terîqeta xwe belav dike. Di bin bandora wî de gelek Pîr û hezkiriyê xwe ji Xorasanê hatin Anatoliya Navîn û ji padîşahên Osmaniyan mîna Siltan Mûrat û Orhan jî alîkarî wergirt.[127-50]

Di dema îro de Hecî Bektaşî Welî ji alî sîstema Tirk ve bi dawetên mezin tê pîroz kirin; ew cejn ne li gorî felsefa Welî ne, hundurê wê valakirine û wek kevneşopiya Elewî û Kurdan asîmîle bike bikar tînin. Di rastiyê de berovajiyê vê ye; ew ji Kurdên Zerdeştiye, ku ji ber zilma Ereban ya li navenda Xorasanê reviyan Anatoliya Navîn in. Mumkune Bîzansan jî hinek soz dabin ewana. Li Anatolî ye jî li hember Osmaniyan serhildan û tekoşîn dane, lê mixabin di dawiyê de hinek ji wan heliyane û hundurê felsefa wî camêrî jî vala kirine.

### 5-Ehl-î Heq:

Baweriya Kurdên Goran e. Di navbera vê û baweriya Dêrsîmê de jî paralêliyek heye û nêzîkî hev in. Him ji alî baweriyê ve û him jî ji alî rêxistina olî ve wek hev in. Têkiliya xwe ya dîrokî hene? Trowbrîdge, qala va têkiliya dike. Dêrsîmî xwe wek **"Ewladê hêq"** tarîf dikin. Xûrremît-ên ku di sedsala VIII û IX an de li Zagrosên navîn bi bandor û baweriya şîa û Mazdakî diparastin, bi Zaza û Goranan ve wekheviya xwe heye. Herî zêde di serhildana Babekê dawî ya di salên 816-838 an pêk hatî de, ew gruba hate nasin. Wekhevî, parkirina erdê dixwestin û di nav gundî û zenetkaran de gelek aligirên xwe hebûn. Navê Xoremit-an jî di wata jina Mazdak Xorem de tê bikar anîn, yan jî wiha tê texmîn kirin. Di navbera Zazayên Bîngol û Palû yê de Xûrem tê wata xakê. Ji serhildana Babek şûnde, evên ku ji qetliyamê rizgar bûbûn reviyan aliyê Bîzansan. Jêderên Sûriyê jî radigihînin, ku di sala 820 an de li rojhilatê Diclê gelek aligirên Xûrremîtiyan yên çalak hebûne. Di nav herêmên ku Xûrremîtiyan serhildan kirî de navê **"Zaza-yn"** jî derbas dibe.[60]

### 6- Tevgera Îsheqê Tirk (755):

Ev jî hevalê Eba bû û bawer dikir ku ew nemiriye û îddea dikir ku ew Pêxemberê ku ji alî Zerdeşt ve hatiye şandin e. Bi xwe ne Tirke, Zerdeştiye, lê ji bo ku li nav Tirkan xebat kiriye ev nava lê danîne.

### 7- Tevgera El Mûqanna (786):

20 sal ji mirina Eba şunda serî hilda. Dîrokzanê Ereb ji bo wan dibêjin "Ewên bi kincên Spî" Wê demê alê wan Spî hebûn û gundiyên ku ji wan re "Xelkê Reş" dihate gotin ji alî axa û birêvebirê Ereban ve dihatin perçikandin û Mûqanna çû ser wan.

### 8-Tevgera Ûstadsîs:

Xelk ji baca dewletê nerazî bû û ji xelîfê re nameyek şandin. M. Bin Saîdê ji Bexdayê hatibû bi mana 'xelk ji dîn derketiye' gelek komkujî pêk anîn. Di

sala 767 an de Ûstadsîs li alî Herat û herêmên din 300 hezar kes kom kir û dest bi şer kir. Di şer de têk çû û hate darvekirin. Ûstadsîs xwe wek Pêxemberêkî dizanî. Di şer de 14 hezar dîl hatin girtin. Ûstadsîs, şandin Bexda û li wir di sala 768 an de kuştin.(105-165)

**9- Sûnbaz:**

Dema xebera kuştina Eba Muslim gihîşt Xorasan, di nava du mehan de Sûnbaz serhildana xwe destpêkir. Îslam hîn jî di mêjiyê gelê de rûneniştibû; hêviya ol û împaratoriya berê zindî bû. Ji bo wê du sozan da, Yek: Xelîfeta Ereb ji holê rakin û Împaratoriya Sasanî ava bikin, duyem jî: qîbla misilmanan Ka'bê hilweşînin û rojê dîsa bikin qîble.(105-131) Ew tevgera ji alî olî, civakî û cografîk ve gelek nêzîkî Kurda ye. Heta vir me qala olî kir, birêz Zorlû di alî erdnîgarî ve jî wan tarîf dike ku herêmên Saka û Kurdên îro li dervayê welat belav bûyine: Di sala 755 an de, li bajarê Nîşapûr a Xorasanê serî hilda, ew wek bombeyekê kete paytextê Ebbasiyan. Lewra Sûnbaz bajarên girîng ên wek Nîşapûr, Rê, Kûmîs, Esfehan û herêma Mevaraûnnehir kiribûn bin destên xwe. Tiştê din ê balkêş jî Sûnbaz îlan kir ku ew vegeriyane ser dînê xwe yê kevn, Mecûsî/Zerdeştî. Ji gelê herêmê eleqeyeke mezin dîtiye, ku di du mehan de 90 hezar kes li dora xwe kom kir. Mansûr bi xetera mezin a dîn re rû bi rû bû. Ji bo wê serhildanê serleşkerê mezin Cehwer şand. Şer li Cercanban pêk hat û 60.000 aligirên Sûnbaz mirin. Xenîmetên bi destketin Cehwer li askerên xwe belav kir û bi ser wê de Xelîfe jê re dujminatî kir û paşê jî kuştin.(105-96)

**10- Serhildana Karîniyan:**

Biryargeha xwe Teberistan bû. Di bin serokatiya Mazyar bîn Karîn de li sala 839 an de destpêkir.

**11- Serhildana Karmatî:**

Ji Basra û Kûfe derket. Paşê di bin serokatiya Hesen bîn Sabah de derkete asta herî bilind. Navenda xwe çiyayê Elbrûz û Qazwîn bû. Ji wan re Batiniyê Îsmaîlî dihate gotin û gelek zirar dane Selçûqiyên sunnî. Ji mezheba Şafî bûn û Henefî biçûk didîtin. Nîzam ûl Mulkê dijminê Îsmaîliyan ji alî wan ve hate kuştin û dijminatiya Tirkan di nav wan de gelek kûr bû. Di keleha Alamût a bi nav û deng de rûdinişt û tenê şoreş îxrac dikir. Keleh paşê ji alî Moxolon ve bi erdê re hate kavil kirin.

Wekî hinek serhildanên me ragihand bi dehan raperîn li hember şowenîzma Ereb û zordariya wan pêk hatin. Di cewherê wan de, bi piranî Kurdên îro li dervayê welat û ola Zerdeştî hebû. Hêrsa vî xelkî li dijî îslamê rabû û bi kuştina Eba Muslimê Xorasanî re bilind bû, bi sedan salan şer kirin ku heta ji taqetê ketin û piştre jî li Qefqasya, Anadol, Sûriyê û rojavayê Kurdistanê belav bûn. Ewên ku belav bûn jî dîroknûsan bi taybet jî yên Tirkan navê Tirkmen/Oxûz li wan danîn.

# TIRKMEN-OXÛZ

Heta roja îro dema qala Tirkmenan dihate kirin me digot ew Tirk in, vê dîtine di mêjiyê mirovan de weqas bi hêz cîh girtiye ku gelek qare/zahmete bê guhartin. Min li ser gelek pirtûk, meqale û nivîsan de lêkolîn kir û xwest, ku rastî ber eqsê vê yekê bêm, lê mixabin. Lêkolîner, dîroknûs, nivîskarên Kurd, yên biyanî û bê guman yên Tirk jî vê yekê dinivîsîn. Kesekî bi kûrayî û berfirehî li ser lêkolîn kirî û serê xwe êşandî min nedît. Gelo ew gotina Tirkmen (di wata Tirkan de), term û wata wê raste? Ji bo ku mirov ber eqsê wê îddea bike û bersiva vê yekê dayîn di şertên ez tê de me ne hêsan e.

Di dîrokê de gelek derbe li Kurdan ketin, ji wan derbeyên mezin ku li mêjiyên Kurdan ketî yek jî êrîşên misilmanan bûn. Ji bo ku Kurd xwedî ola Zerdeştî bûn, rastî komkujî û bêwijdaniya Ereb û misilmanan hatin. Di pêvajoya belavbûna îslamê de, Kurdên ku ew ola nû pejirandin li welatê xwe man; yên qebûl nekirin jî berbi çiyan hilkişîn. Bi taybetî jî çûn Xorasan û Asya Navîn. Heta vir me hewl da vê hovitiyê nîşan bidin. Ew ditin ji alî mamoste birêz C. Bender wiha tê nivîsîn: Ew şera ji rûbarê Dicle bigire heta Amû Derya belav bû. Li başûrê Gola Kesk, mîrîtiya dawî ya Zerdeştî jî, di dema Eba Muslim de, di sala 750 an de ji alî Emewiyan ve hate rûxandin û ji holê rabû. Dîrokzan Dîrîver dibêje: **Ji Herranê heta Bedlîsê, li her kutekekî sê Kurdên ku misilmantî qebûl nekirine li darxistin.**[123-98] Di serdema îslam li Asya belav bûnê de, artêşa misilmanan li sînorên Medan pir giran pêşve diçû; lê sînorên ku Faris lê dijî zêde ew hêsantir dibû. Ji ber wan êrîşên bê dawî, beşekî Kurd ji Xorasanê jî derketin. Piştî têkçûna Eba Muslimê Xorasanî li Kurdistanê zorderiyeke bê hed û hudût pêk hat û gelê ji neçarî barkir Asya Navîn, Çîn û Hindîstanê.[52] Yanê, ji ber hatina Tirkan a Kurdistanê, Anadol û Rojhilata Navîn, Kurd heta nava Asya belav bûbûn. Piştî vê tespîtê em dikarin êdî li wata Tirkmen bigerin:

## Nav lêkirina Tirkmen:

Di dîrokê de, bi taybetî jî di dîroka Tirkan de carna qala Oxûzan û carna jî qala Tirkmenan derbas dibe. Ew herdû nav du miletan tînin bîra mirovan. Û Tirk, Oxûzan wek hîmê nijada xwe dizanin. Lê di bingeh de Oxûz û Tirkmen jî yek in. Ji Oxûzên misilmantî li Mavverûnehîr qebûl kirî re Tirkmen dihate gotin, ku bi vî navî ji Tirkmenên ne misilman dihatin cûdakirin. Ew cûdabûn gelek girînge; eger lêkolîner wê baş analîz bikin dikarin dîroka heta roja îro bê guhartin. Ew cûdabûn di nava Kurdên wêderê de bû sedema belavbûn, dijminatî û navên cûda... Navê Tirkmen ji Turk+man (manend) tê.[131-79] Ew tê wata ku Kurdên wek Tirkan man yan jî ya herî nêzîkî rastiyê ewe ku Kurdên di bin desthilatdariya Tirkan de mane tarîf dike. Di belgeyên Osmaniyan yên fermî de Tirkmen bi Kurdan ve di heman watê de ye.[49] Em bi mînakekê destpê bikin: Di fermaneka Osmanî de qala Kurdên Kiliçli tê kirin, dîsa di fermaneka

din ê bi wan re eleqedar de dibêje: ji taîfê Tirkmenên Kiliçli(89-13) yanê hem Kurd hem jî Tirkmen...Dîsa ...civata Tirkmen ku 36 cemaate. Di nava wan de ekrad Kiliçli ya girêdayî Asaf Kethûda jî hebû.(89-13) Di vir de jî, li sifatên din ekrad (-Kurd) jî lê zêde dibe. Yek ji îdeologên dîroka Tirkan Seferoglû vekirî dibêje: Di bingeh de Kurmanc û Tirkmen yek e.(91-27) Di lîteratûrê Osmaniyan de êl wek: "aşaîr", "taîfa koçer", "Tirkmen", "ekrat" û hwd bi navên giştî tên binav kirin.(129-35) **Psellosê** ku şerê Melazgirtê nivîsandî, di qirnê xwe de peyva **Kurd, Tirkmen û Oxûz wek hev dibîne** û ji ber wê Alparslan him wek Part him jî wek Kurtos vasileûs (kralê Kurd) dibîne. Gor dîtina wî ya piştî salên hezarî jî Kurd, Tirkmen û Oxûz yek in. Yanê li van peyvana Oxûz jî zêde dibe. Bavê Ziya Gokalp jî di sala 1884 an de dibêje: Ji gundiyên Elewî-Bektaşî re digotin Tirkmen; ew Kurd bûn. Digotin em ji Mûsilê hatin û ji Beraniyan in.(128-67) Ji Beraniyan re bi tirkî Qerekoyûnlu tê gotin. Heta roja îro me Qerekoyûnî wek Tirk dizanin, lê ne bi vî awayî ye; di beşa wan de emê bi firehî qal bikin. Wekî gelek jêderên cûda didin xuyakirin: Oxûz, Tirkmen, ekrad hemû Kurdan didin nîşandan. Ji bo Tirkan yan jî yên nê Kurd peyva **"Yoruk"** bi kar tê.

Piştî Osmanî li rojavayê Anadolê bi hêz bûn û desthilatdariya wan dest-pêkir, ji Tirkmenên koçber-nîvkoçber re gotin "Yoruk", ew ji raderê (mesterê) yuru-mek-rêçûnê tê.(115-38) Di vê hevokê de jî rastiyeke din derdikeve holê: Bi desthilatdariya wan re înkar kirina Kurda ya pêşî destpêdike û hewl didin ku Kurdan wek Yoruk nîşan bidin. Ya esasî ewe, ku ji Tirkên koçber re Yoruk tê gotin û **ji Kurdên koçber re jî Tirkmen hatiye gotin**. Vê dîtine Orhonlû jî di-pejirîne: Li Anadolê navê yoruk mefûmeka etnîkî îfade dike.(90-105) Yanê etnîsîta Yoruk û ya Tirkmanan jihev cûda tê dest nîşankirin. Di "Kanûnnamê" de tê gotin ku Yoruk gelê koçer in. Ew di şer de her tim li paş bûn, top dikişandin, diwarên kelehê avadikirin, kereste dikişandin û hwd.(161-1) Dewleta Osmanî bi zanabûn Yoruk li paş eniya şer bi kar dianîn ku bila kêm ziraré bibînin û Tirkmenên Kurd jî li pêş dajotin ser dijminên xwe. C. Tirkmen jî vê dipêjirîne: Yoruk, di artêşa Osmaniyan de hertim di xizmetê paşiyê de bûn.(160-821)

Cevdet Turkay, yek ji bavê dîroka Tirka ye, ku di arşîvên dewletê de lêkolîn kiriye û ji wan kîtabeka qalind derxistiyê û di vê de ji 7000 zêdetir, êl û koman tespît kirine. Di pirtûka xwe de wiha dinivîse: Di belgeyên kevn de niqteyekê bala min kişand, ku ew jî bîwêja: **Tirkmen ekradî-Kurd û ekrad-Kurd Tirkmanî** bû (Hûccet-î zahriyye, D-BŞM-1144 ve Mûhîmme Defterî no 124, Rûpel 24) gor dîtina me, peyva li vir wek Tirkmen û ekrad bikar hatî di heman watê de ye. Yane, Tirkman jî ekrad jî tê mana Tirkên Oxûz. Navê Tirkên Oxûz "TIRKMEN" e ku di dîrokê de cîh girtiye. Peyva "KURD" jî tirkî ye û tê wata "Aşût".(160-1) Nivîskar li vir xwe eşkere dike û rastiyê dinivîsîne. Lê, li ser nerastiyê jî dîroka Tirkan dihûne... Heman nivîskar dibêje: Mirov dikare bêje raste, ku kokê wan hemû koman Tirk qebûl bike. Di aliyê din de bi gelek navên mîna: Kurd, Kurdî, Kurdlû, Kurdîler, Kurdîkanli, Kurd Mihmatlû, Qere Kurd... Kurdcû, Qaracakurd û hwd jî di belgeyan de hene. Ji bona van

hemûyan: Tirkman ekradî, nîştecîh-koçer Tirkmanî û Tirkmen taîfesî tê gotin. Wekî bê dîtin jî êla Kurd, Kurdî, Kurtler yan jî bi navê kî din; Mûrtana li Çanqirî, Edene, Teke (Antalya) û Mersînê bi cîh bûn û ew ji Yoruk û Kurdên Tirkmen in. Dîsa civata bi navê QereKurd, QaracaKurd jî li Qeyserî, Sêwas, Nevşehîr, Edenê, Sarihan-Manîsa bi cîh bûn û wek nîştecîh-koçer Bozûlûs Tirkmenî derbas dibe. **Yane, êla navê xwe Kurd û Kurmanc jî Tirkmen e.**[160-15] F. Sumer dibêje: Oxûzan navê xwe zû bi zû ji bîrnekirin; ji sedsala XIII an bi şûnde, êdî navê Tirkmen bikaranîn.[131-127] Ew jî tê vê watê, Kurdan heta vê sedsalê navên xwe yên êlî û zendiyê bikar anîne. Piştî sedsala tê qal kirin jî êdî şerê Moxolan destpê dikin û di van tevlîheviyan de nav hatine guhartin. Bi dîtina min divê nav guhartin bi desthilatdariya Osmaniyan ve destpê bike. Lewra Osmaniyan ew nava lê danîne... Bi dehan belge û jêder diyar dikin, ku Tirkmen û Oxûz, Kurd bi xwe ne; eger pêwîst be, hîn zêde jî mînak tên dayîn.

Îro, li Tirkiyê hinek komên mirovan wek Tirkmen tên binav kirin. Ew bi tirkî diaxifin û xwe wek Tirk dizanin. Ew gelek belav dijîn. Lê di alî laşî de ew wek Moxolan in. Bi dîtina min, ew, komên ji Moxolan mane. Tu têkiliya wan bi Kurda re, yan jî Kurdên wek Tirkmen tenê binavkirin re nîne. Di pirtûka C. Turkay ya min li jor qal kirî de jî ew tê xuyakirin. Ji heft hezar êlên hatine nivîsîn beşekî pir hindik jî wek Moxol-tatar-Qeretatar derbas dibe. Tirkmenên (xwe Tirk dizanî) îro li Tirkiyê ew Moxolanan e.

Di nivîsên Osmanî de peyvên mîna **"Etrak"** û **"Ekrad"** jî derbas dibin; Doç Yilmazçelîk dibêje: Bi wan peyvan, **yên nîştevan û koçber** tên nîşan kirin. Wek mînak: dema dibêje " Bozûlûs Tirkmenî" tê wata: Bozûlûsê nîştevan; dema "Bozûlûs Ekradî" tê gotin jî tê wata: Bozûlûsê koçber.[116-8] Hinek dîroknûsên Tirk jî hewl didin rastiyê veşêrin û dikevin nav lîstika peyvan. Wek doç. Taşdemîr dibêjî: Di belgeyên Osmanî de peyva Ekrad di wata koçber û Yorukan de bikar hatiye; dîsa Etrak jî di heman watê da ye.[109-105] Di vir de hertiştekî bi zanistî tevlîhev dike û mêjiyê mirovan lihev dixe; bê guman ew jî rêya asîmîle kirinê ye. Berî hertiştî Yoruk bi Tirkmenan ve di heman watê de nayên bikar anîn. Min li jor mînakên wan dan. Ekrad, di zimanê Erebî de di wata Kurdan de ye, di lîteratûra Osmaniyan de jî bi kar tê. Bi kurtî peyvên **ekrad û etrak e; ji bo ku Kurdên niştecîh û yên koçer jihev bidin cûdakirin bikar hatiye**. Lê dîtinen Taşdemîr ên di derbarê nav lêkirinê de jî rast in: Dema nav li Tirkmenan kirin ew sîstema bikar hat: Êl ji kijan cîhî hatiye xerê, navê Mîrê yî wêderê lê dihate kirin. Wek mînak: Di belgeyan de êla wek Bozûlûs derbas dibe ji bo Kethûda (walî) Îzzeddîn Bey wek civata Îzzeddînlî hatiye nivîsîn. Ji wê komê hinekan ji bo ku tîr çêdikirin ji wan re gotine "Taîfeî Ekradî Okçû Îzzeddînlî " yan jî wek ekradî Tirkmen hatiye bi nav kirin. Wek vê ye, êlên di eslê xwe de mîna Kabaîl-î Rişvan yan jî Ekradî Rişvan dihatine nasîn û ji Helebê heta Qastamonûyê diçûn zozanan û wek êlên Tirkmen ekradî hatine nivîsîn.[109-105] Li destpêkê, navê serokên êlan wek nav lê dihat danîn, lê paşê hate guhartin û bi navê cîhên ku lê dijîn êl hatin bi nav kirin.[90-105] Ew jî balkêşe

û sedema wê ewe, ku navê Kurdan di dîrokê de wenda kirine. Wek mînak: Êlên girêdayî Reşiyan piranî bi navê serokan tên xwendin: Xel-ikan, Sef-ikan, Nasir, Bil-ika, Şêx-ika û hwd. Lê pişt re navê Tirkmenên Helebê li wan danîne ku bi temamî tevlîhev kirine.

Li ser fîzîk, jiyan û kevneşopiyên Tirkmen û Kurdan de jî dîtinen balkêş hene. Ew ji îspateka berbiçave, ku herdû peyv jî (yên din jî) Kurdên li dervayê Kurdistanê nîşan didin. Li ser vê Seferoglû wiha dinivîse: Di alî din de Kurmancên ku wek beşek ji Kurdan tên qebûl kirin bi Tirkmenan ve, bi pir aliyên xwe (fizîk antropolojî jî di navê de) ve bi qasî ji hev nayên veqetandin dişibînin hevûdû, ew rastiyeke.(91-5) Gerokê Tirk Evliya Çelebî jî dibêje fizîkê Kurdan bi yên Tirkmenan ve yeke. Laş, jiyan, kar, aşxan û konên Tirkmenan bi yên Kurdan ve û wek hev in.(91-59) Baldar bin ku herdû dîtin jî dibêjin Kurd û Tirkmen yek in!

## Nav lêkirina Oxûz:


Wekî me li jor jî gote, nûser û îdeologên dîroka Tirk yên fêrmî îddea dikin, ku Oxûz bi Tirkmenan ve Tirk in û ew koka miletê Tirk in. Ew yeka ji alî gelek nûser û lêkolîner ve jî tê pejirandin. Ji dîroknûsên Tirk me gelek mînak dan ku ew ti cûdahiyê nakine navbera Tirkmen, Oxûz û Kurdan; yan jî wek ekrad dibînin. Lê dîsa jî ew di nav hewldanekê de ne, ku vê yekê veşêrin û wek koka Tirkan nîşan bidin. Hinek nîv veşartî hinek jî temamî bi înkarê nêzîkî meselê dibin. Di vê beşê de jî emê hewl û nîşan bidin, ku ka Oxûz kî ne û bi rastî jî ew ji nijada Tirka nin an na?

Di pirtûka bi navê "Dîvani Lûgatî Tirk" de rastiyek wiha tê eşkere kirin: Bi peyva "Tat", Faris tên dest nîşan kirin, bi peyva **Tawgaç** jî Tirk tên îma kirin. Mangişlax: Di welatê Oxûz de cîheke.(134-454) Di vir de vekirî tê xuyakirin ku Tirkên berê wek Tawgaç dihatine binav kirin yan jî naskirin. Peyva "Tirk" bixwe jî ji alî Çînî yan ve li Tirkan wek nav hatiye danîn, hinek milet yan jî dewlet ji derveyê vê tên bi navkirin. Navê Tirkiyê jî; bi avakirina Osmaniyan re Venedîkiyan li wê welatî danîne.(186-8) Îhtîmaleka mezine ku Tirkan navê Tawgaç li xwe dikirin.

J. Marqûart îddea dike ku peyva Oxûz ji Ok (tîr) + ûz (zilam) a tirkî hatiye, lê di tirkî de peyva di wata zilam de ûz nîne. Zanyarê Macar J. Nemeth jî îddea dike; ku Oxûz ji ok+z pêk hatiye; Ok= oymak/êl e û z jî piraniyê îşaret dike. Lê di Kîtabên Orhûn de ji bo komên siyasî û qewmî peyva "bûdûn" bikar tê.(131-8) Wekî xuya dike di nava zanyaran de li ser navê Oxûz konsesûsek nîne. Hinek jî dibêjin ji "dokûz-neh" a tirkî weguhuziye ser Oxûz, eger ew dîtin rast be, wê demê federasyoneka Kurd ji neh (dokuzê) êlan pêk dihatî li herêma Qefqasya û bakûrê Derya Kesk û Asya dijî hebû ku nav ji wir derket holê...

Tê gotin ku cara yekemîn navê Oxûz di kevirên Yenîsey (sedsala VI) de hatiye dîtin.(148-92) Me di beşa Macar û Kurdan de qala wan kiribû ku ew Kurd

in û li vir jî ew yeka tê pejirandin. Di vê nivîsa Yenîseyê de kral dibêje "êlên min neh in". Bê guman ew xelekeka girînge û nîşana wê ye ku Kurd zû çûne wir. Bi rû vê de Seferoglû yê ku li ser koka Kurdan dinivîse û hewl dide wek Tirk îspat bike niqteyeka baldar destnîşan dike: Kurd, berî Îslamê girêdayî hakan ê Turkîstanê yê mezin Îçoxûz-Xan bûn. Di navbera salên **622-32 an de Oxûz-Xan îslamiyet qebûl kirin** û çûn vê yekê ji Hz. Muhammed re bibêjin. Navê elçiyê wan **Boxdûz-Aman Beg** bû. Ew begekî Kurd ê girêdayî Uçokan bû.[91-58]




**Di Dîwanî Lugatî Tirk de êlên Oxûz**

Mixabin îdeologên dîroka Tirk ji bo ku bi teref û liser înkara Kurdan dîtinen xwe dinivîsin, ji bo vê em bi şik nêzîkî dîtine wî dibin, lê di nava wan de rastiyan jî mirov dibîne. Ditina wî ya ku Kurd girêdayî Hakanê Turkîstanê bûn de em bi guman in; misilmantî qebûl kirina Oxûzan ya wê demê jî bi min zêde logîk nayê, lê navê serokê Kurd bi min balkêş hat. Boxdûz-Aman, eger mirov 'b' ya pêşî bavêje, ewê bibe oxdûz ku gelek nêzîkî peyva Oxûz e. Ne îhtîmaleke dûre, ku navê Oxûz ji vir jî hatibe. Lewra ew hevdîtina serok êla Kurd bi Hz. Muhammed ve navdare û gelek jêder qal dikin. Ew navê begê Kurd bi guhartineka biçûk wek Oxûz kete termînolojiyê. Dîtineke cûda jî ji alî Kara ve tê îddea kirin: Oxûz milê Tirkan yê herî zêde bi serhêjmar û yê di dîrokê

de rola herî gîrîng lîstî ne. Di sedsala **X an de Îslamiyet qebûl kirin**. Ji ber wê: di wata Tirkên misilman de, navê Tirkmen lê danîn.(148-92) Li vir jî tê îddea kirin ku di sedsala X an de Oxûzan misilmantiyê pejirandine û îhtîmaleke derdixe holê. Ew jî parçebûna Oxûzan ya di alî olî de ye. **Yanê Oxûz-Kurdên li derva yên ku hê jî nebûne misilman wê demê beşekî Îslamiyet qebûl kirine**. Her çiqas gelek nîqaş li ser hebin jî, Tirkan di ber Kurdan Îslamiyet pejirandin û bi vê yekê dixwestin ji hêza ola Îslamê sûd werbigirin. Kurdên sedsala X an, misilmantî qebûl kirinî jî di wata Kurdên wek Tirkan bûne de navê Tirkmen-Oxûz lê hate dayîn. Li ser wê di beşên pêş de jî emê bisekinin.Di dîtina Kara de niqta din a girîng jî ewe, ku berî Îslamê qebûl kirina navekî din ê Oxûzan e.

Kara îddea dike ku Oxûz, di salên 600 an de li dora çemê Selenga û girêdayî dewleta Gokturk dijîn. Di sala 630 de dewlet hilweşiya û Oxûz ketin bin destên Ûygûran. Di dema Gokturkan de bi serokên wan re lihev nedikirin. Ji bo ku qewmeke cûda û xwedî dîrokeka siyasî ya cûda bûn li hember Ûygûran bi Çîniyan re diketin îttîfaqê.(148-92) Di gotina qewmeka cûda de mebesta wî ne şaxê Tirkan e, mebesta wî Kurd in, lê nikare vê yekê eşkere bike. Di sala 750 an de Oxûzan serî hildan û Kirgizan jî alîkariya wan kir. Piştî vê di nivîsan de Oxûzên neh (dokûz Oxûz) derbas dibin, lewra ji 9 êlan pêk dihatin. Paşê koçî rojava, navbera Aral û Xezer kirin û li wir dewleta **Oxûz-Yangû** avakirin. Ew dewleta di sala 1000 an de hilweşiya. Hatin bakûrê Derya Reş, ji wir jî grûbek çû Balkanan. Bîzansiyan ji wan re gotin **"Ûz"** û Ereban jî **"Gûz"** digotin. Piştre ketin artêşa Bîzans, lê di şerê li sala 1071 an de derbasî alî Alpaslan bûn. Grûbek jî li Xorasan bi cîh bû.(148-92) Ew rewş ji alî gelekan ve tê nivîsîn ku ji artêşa Bîzansan hinek derbasî alî Alparslan bûne. Ewên ku derbas bûne Kurd in, lewra birayên wan ên li Xorasan, Qefqasya û Kurdistanê bi Alparslan re îttîfaq kiribûn, ji ber wê ew jî derbasî aliyê birayên xwe bûn û di şer de biserketin.

Pirtûka ku Tirkan dîroka xwe li ser helçinî/hunandî wekî tê zanîn "Dîvanû Lûgat-ît Tirk" e. Di dema nivîsîna wê de nakokî heye: Li cîhekî tê gotin ku di sala 1072-1073 an de hatiye nivîsîn; li cîhekî jî tê gotin ku ew di sala 1196 an de hatiye nivîsîn. Kesê nivîsiye navê xwe Mehmûd e; bavê wî jî Huseyn e, kalê xwe jî Mehmet bûye. Di cîhekî de jî dibêje bav û kalên me Turkîstan ji Samanoxûllari girtin. Kaşgarli, herdem Oxûzan ji Tirkên din vediqetîne.(134-XIII) Ew veqetandin ji bo me îspateke, ku Oxûz ne Tirk bûn û ew Kurdên koçber, yan jî beşekî Saka bûn. Di cîhekî din de dibêje: "Ez li deşt û cîhên wan geriyam. Min ziman û qafiyên zimanê: Tirk, Tirkmen, Oxûz, Çixil, Yaxma, Kirgiz hîn kirin, nivîsandin.(134-4) Destnivîsa wê ji cîldekî pêk tê. Yekî bi eslê xwe ji Savê-Îranê ew piştî 200 salan kişandiye vê nûsha di dest me de, ku niha ew kesa li Şamê rûdine... Ewê Îranî, îhtîmaleke ku Kurd e û pirtûkê wergerandiye tirkî. Mehmedê ji Şamê hema hema tirkî nedizaniyê û erebî jî baş nedizaniye.(134-XVI) Ji bo wê jî tê nivîsîn ku wî bi tirkî baş nedizaniye. Lê orîjînala wê bi kijan zimanî bû? Bersiva wê jî dikare gelek deriyan veke... Osmaniyan tirkî ji bîr kirin; bi erebî dixwendin û bi farisî jî diaxifîn. Vana Tirk û tirkî ji bîr kirin.(134-

[xxxv] Divê em bêjin, ku Tirk: di pêşxistin, hezm kirin û neqil kirina çandên heyî de zîrek in... Destanê Oxûzan yên mîna Oxûz Kaxan, Dede Korkût û Koroxlî ji alî Oxûzan ve hatin afirandin... Destana Alp-ertonga yan jî Afrasyap jî ya Kurda yê netewî ye...[91-56] Wekî tê xuyakirin gelek destanên Kurdan jî kirine malên xwe.

Dr. Gunduz ji Kaşgarli wiha radigihîne: "Navê Tirkmen, ji alî "Zulkarney" ve "Tirk-Manend (wek Tirkan) lê hatiye danîn. Lê di alema Îslamê de, Tirkên ku misilmantî qebûl kirî re Tirk-manend tê gotin. Ebûl Gazî jî dibêje nav ji alî Farsan ve hate dayîn. Di sedsala **XI an de ji Karlûk, Xalaç û Oxûzan re Tirkmen hate gotin**. Kaşgarli dibêje Karlûk şaxekî Oxûzan e.[115-19] Belê ew pir girînge. Gor dîtina min ew navên **Karlûk, Xalaç û Oxûz komên ji sê zaravên Kurdî diaxifin nîşan didin û hemû Kurd in. Dîtina Gazalî jî bi vî awî raste: Gor Kurd û Farisên li Medya niştecîh, Kurdên li derva mayî, bi taybetî jî yên li alî Tûran/Tirkan manî re "Tirk-man" hate gotin. Lewra di Kurdî de "man" tê wata wek gelê wir yan jî wek Tirkan bûn/man**. Di vir de Kurdên niştecîh, ên ji yên derva mayî re bi qar ketine, gumanên xwe yên asîmîle bûyîna wan nîşan dane û bi hêrs dikevine ku çima ew jî nehatine Kurdistanê û wek Tirk mane... Li ser vê babetê Bîlgîn dibêje: Aryanan xaka Tirkmenîstana îro bi carekê re terk nekirin. Ewên hatin Îranê û bi cîh bûnî, ji yên ku natine re gotin "Tûr" û vaya bi Mît ekê xemilandin.[71-190] Ji alî din ve **Oxûzan di sedsala XIII an de xwe wek Tirkmen bi nav nedikirin**, îhtîmaleke ku ew ji ferqa koçberî û niştecîhî yê dihat.[115-20] Dîsa girînge ku vana heta sedsala XIII an navê Tirkmenî li xwe nedikirine. Lewra ew nava hinekên din li wan danîbû; wana navê xwe yên êlî û kurdî bi kar dianîn. Lê Kurd û Farisên niştecîh û gel en cîran navê Tirkman li wan nan. Li vir nivîskar xwe dide dest ku Oxûzan xwe wek Tirkmen bi nav nedikiriye.

Gor Kaşgarli Mehmûd jî dinivîsîne Tirkmen, Oxûz in. Çîroka vê yekê wiha qal dike: Zulqerneyn ji Semerqentê derbas dibe û berbi welatê Tirkan çû. Tirkan, serdarekî (hakan) xwe yê bi navê Şû hebû û xwedî leşkerekî bi hêz û mezin bû. Keleha Şû yê nêzîkî Balasagûn jî wî avakiribû. Xeber dane Şû ku Zulqerneyn nêzîkî keleha wî dibe; fermana te çi ye em şer bikin an na? Zulqerneyn ji çemê Xoçant derbas dibe û tê meqerê Şû. Bi ser vê de Şû daholan lêdixe û berbi rojhilat diçe. Di nava gel de tevlîhevî çêdibe. Ewên ku ajal peyda kirine bi Hakan re çûn lê ewen ku neçûn 22 kes û zarokên wan bûn. Ew êlên Oxûzan in... Paşê du kesên din tên; westiyabûne û dibêjin Zulqerneyn rêwiyek e; li cîhekî nasekine. Ji wan re Kal-aç dibêjin; piştre dibêjin Xalaç. Zulqerneyn tê û dibîne ku porên wan direj in û belgeyên Tirkan li ba wan hebûne û ji bo ku dişibîne Tirkan ji wan re dibêje **"Tirkmen-end"**. Tirkmen di eslê xwe de 24 zend in. Lê Xalaç jî du zend in, carna ji wan vediqetin û wek Oxûz nayên hesibandin.[135-416] Di vê çîrokê de jî mirov şopa Kurdan dibîne. Xalaçê ji dûr hatine jî zarava axifên Kurdan yê din in. Por û şiklê wan jî dide xuyakirin ku ew Êzdî bûne, dibe ku vê demê Zerdeştî yan jî Ehlî-Haq bin jî. Heman jêder

îspateka din jî eşkere dike: Di navbera Tirkên Hakanli û Tirkên din de û di navbera Tirkmenên Oxûz û yên din de cûdahiyeke ziman ê heye, ku ew qaîdeka qet nayê guhartinê.(134-14) Li cîhekî dibêje di alfaba tirkî de 18, di cîhekî de dibêje 24 tîp hene..








Dewleta Osmanî di dema Meşrûtiyet -1908 hate îlan kirin bi şûn de, xwest "Alayên Hemîdiye" ji holê rake yan jî ji nû ve bi rêxistin bike. Ji bo wê jî nav kirin "Alayên Aşîretan" demekê xwestin nav bikin "Alayên Oxûzan" lê paşê dev jê berdan.(93-74) Bi dîtina min ew jî watedare ku neviyên Oxûzan bi navê kalên xwe yên kevn bên binavkirin.

## Şaxên Oxûzan

Jêdera li ser Oxûza yê herî kevn ji alî Kaşgarli Mehmûd ve hatiye nivîsîn; mumkune ku berî wê jî "Oxûzname" hebûne, lewra di gelek cîhan de navê wan derbas dibe, lê kesî rûyê wan nedîtiye. Ew dikarin ji gelek rastiyan re derî vekin. Kaşgarli Oxûzan dike du beş û ji wana **Bayindiran** wek bi kok, binat û navendî nîşan dide. Îddea dike: ku Melîkşahê Selçûqiyan ji êla Kinik e û xanedana Osmanî piştre bi Kinikan re bû xisim.(114-68) Heman nivîskar wiha berdewam dike: Oxûz, zendeka Tirk e. Oxûz Tirkmen in. Vana 22 bir in; her zendekî belgeyeka xwe û damxeka xwe ya heywanan heye. Bi rêya wan hevdû nasdikin. Wana:

1. Kinik
2. Kayix (-Qeregeçî-182)
3. Bayûndûr
4. Iwa (Yiwa)
5. Salgûr (-Qeregeçî-Ş.R li Milan mêzeke)
6. Afşar (-Qereman û Kurmanc in)
7. Begdîlî (-Canbeg)
8. Bûxdûz
9. Bayat
10. Yazgir (Beranî-Kocadax)
11. Eymûr
12. Qereboluk
13. Alkaboluk
14. Ixdir
15. Ûrexîr
16. Tûtirka
17. Ûlayûndlûx
18. Tûger
19. Beçenek
20. Çûvaldar
21. Çepnî

22. Çarûklûx.[134-58]

| | NAVÊN ZENDAN | | NÎŞAN |
|---|---|---|---|
| 1 | KINIK | قنق |  |
| 2 | Kayix | قيغ |  |
| 3 | BAYINDIR | با يند ر |  |
| 4 | ÎWA-YIWA | ا فا ' يفا |  |
| 5 | Salxur | سالغر |  |
| 6 | AVŞAR | ا فشا ر |  |
| 7 | BEG-TÎLÎ | بكدلي |  |
| 8 | BÛXDÛZ | بكد ز |  |
| 9 | BAYAT | بيا ت |  |
| 10 | YAZXIR | يذ عر |  |
| 11 | EYMUR | ايمر |  |
| 12 | KARA-BOLUK | قر ا بدلك |  |
| 13 | ALKA-BOLUK | ا لقا بلك |  |
| 14 | Ixdir | ا كدر |  |
| 15 | Urexir-Yurexir | ا ر كر ' ير كر |  |
| 16 | TOTIRKA | تر تر قا |  |
| 17 | Ala-Yundlux | ا لا يند لغ |  |
| 18 | TOKER | تو كر |  |
| 19 | BEÇENEK | جبنك |  |
| 20 | ÇOVALDÛR | جو لدر |  |
| 21 | ÇEPNÎ | جبي |  |
| 22 | CARÛKLÛX | جر قلغ | |

**Şaxên Oxuzan** [131-230]

Mumkune niha ji holê rabûye, lê berê di nava Kurdên li Anatoliya Navîn de kevneşopiyek hebû, di gundekî de bi hezaran sewal û bi dehan keriyên pez, berx û bizinan hebûn. Ji bo ku bê zanîn ew ajela malê kê ye, her malekê nîşaneka wan hebû. Ev jî du cûre bûn: Yek, guhên miyan di cîhên cûda cûda de qilç dikirin û herkesî dizanî ew dûri û ajala kê ye. Ya din jî, bi arengê û bi rengan îşaret li ajalan dixistin. Hinekan li qotî miyê, hinekan li gurçiyê, hinekan li ser mil û hwd gelek îşaret hebûn. Ya malê me ew bû: di gurçiyê raste de me îşareteka mîna gogê çêdikir. Guhê miyê yê raste jî, me him ji alî pêş him jî ji alî paş ve qilç (hinek jêdikir) dikir û herkesî dizanî ew miya ya mala Osî Omer e. Ew kevneşopiya me bi ya Oxûzan ve wek hev e û ew jî ne tesedufe.

Ji alî din ve, gelek jêder didin xuyakirin, ku ji berê ve li çiyayên Balhana (rojhilatê Xezer) Tirkmenên mîna Oklû, Goklû û Siltanli dijîn. Oklû di jêderên Sefawiya yên sedsala XVI an de bi Eymûr, Salûr, Goklenan ve derbas dibin. Ji giştikan re Tirkmenên Yaka tê gotin. Goklen li jora çemê Cûrcan rûdiniştin. Di vê komê de (gor Vambery 12.000 kon in) Begdilî, Bayindir û Kayî ya bi kêm

hejmar jî dihatin dîtin.[131-163] Ji bo ku navê êl û zendan guhartine pir zorê ku mirov rastiyê bibîne; wekî mirov li nava şorbê li şopa pûngê bigere ye, ji bo safî kirina vî karî pêwîstî bi komeka pisporan heye. Lê bi qasî min lêkolîn kire, dikarim bibêjim ku Begdilî û Avşar bi îspat Kurd in. Wekî din, Yiwa herdem bi Celaliyan re di tevgerê de ne û ji sedî sed ew jî endamê konfederasyona wan e. Di herikandina pirtûkê de emê hewl bidin ku Kurdbûna wan eşkere bikin. A. Tanerî dibêje: Afşar êla Oxûzan ya herî mezin a Tirkmen in. Di kevneşopiya Afşaran de jî Afşar bi Kurd ve ji heman kok û binatî ne.[89-13] Bayat jî yek ji berên 24 Oxûzan e. Wek "Tirkman Ekradî Taîfesî" derbas dibin.[91-63] Wekî berê jî min gote, ekrad di wata Kurdan de ye. Gelek hevalên min ên Afşarî hene ku em wek sêva bûye du beş in...

Di Dîvanû Lûgat-ît-Tirk de wiha tê nivîsîn: Tirk di eslê xwe de 20 zend in. Her zendekî jî gelek êlên girêdayî wê hene. Ewên nêzî sînorên Bîzans-Rûm, Beçenek in, paşê Kipçak, Oxûz-Ûxûz, Yemek, Başgirt, Basmil, Kay, Yakabû, Tatar, Kirkizê war in. Kirkiz nêzîkî Çîn in.[134-28] Zendên ku du zimanan dizanin; Soxdak, Kençek û Argû ne. Yen gerok-koçber jî Xotan, Tûbût û beşek ji Tanxûtan e. Vana piştre hatine welatê Tirkan. Zenda Çomûl xwedî zimanekî din e; tirkî jî baş dizanin. Zendên mîna: Kay, Yakabû, Tatar, Basmil jî bi vî awayî ne. Her zendekê devokeka xwe heye, lê tirkî jî dizanin. Kirgiz, Kipçak, Oxûz, Toxsî, Yaxma, Çixil, Ûxrak û Çarûkan tene zimanekî xwe heye (tirkî). Heta Peçenekên li sînorê Rûm dijîn, zimanê Suvar û Bûlxaran tirkîka dawiya peyva qût dibî ye. Ya herî rind tirkiya Yaxma û Toxsî ye.[134-30] Heman nivîskar dibêje: Oxûz bi Farisan ve pir tevlîhev bûne, ji ber vê yekê, gelek peyvên tirkî ji bîr kirine.[134-76] Ew ne jibîr kirine, Oxûz û Faris ji malbatekê ne; ji bo vê jî zimanê wan nêzîkî hev e. Xeleka din a balkêş jî tîne ziman, ku Oxûzan ji Tirkên ji Ceyhûn heta bakûrê Çînê rûdinên re gotine **Çixil**; heta roja îro bihev re şer dikin.[134-394] Kurdiya îro Kurdên li dervayê Welat deng dikin ku gelek şikeştî û tevlîhev e, bi taybetî jî piştî hejmartina dehan (wek mînak: yanzdeh di nava wan Kurdana de wek dewyek tê ziman) ew xwe eşkere dike û gereg bingeha xwe ji vê demê girtibe. Yanê di pêvajoya têkilî û şerê vê demê de, zimanê cûda êdî ketin nav Kurdiya wan Kurdana. Navê Çixilî li Tirkan dane û berê jî me got ku vana ji Tirkan re digotine Tawgaç. Yanê navê Tirkan yê berê ne Tirk e û ewî piştre girtine. Bi hev re şerkirina wan jî cihê lêkolînê ye; ew jî dîroka ku Fîrdewsî qal dike tîne bîra mirov.

"Tarîxa Neşrî" li ser Oxûzan vê agahiyê dide: Wexta kalê Oxûz, Balcas mir, şûna wî lawê wî yê mezin Qerexan derbas bû. Di dema Hz. pêxember de jiya. **Baweriya wî bi ola semawî tunebû û bi olekî Asyayî (seretayî) bawer dikir. Kurê wî Oxûzhan jî ji ola bavê xwe heznake û li dij derdikeve. Oxûz bi ola heq bawer dikir. Ew jî di nava bav û law de bû sedema şer. Oxûz malbata xwe heytine û diçe cîhekî din.** Di van şerena yekî de bavê Oxûzhan Qerexan dimire. Îşareta Kayiyan tîr û kevan bû.[160-12] Ew dema jî hêjayî lêkolînê ye. Bi rastî mirov dema dîroka Kurdên dervayê Welat bi kûrahî dikole, dibîne ku di

nava bira û êlan de parçebûneka olî pêk hatiye û ew bûye sedema gelek şeran. Ew bûyera jî dibe ku yek ji wan bingeha parçebûnan bû. Li ser vê bingehê Beranî û Pezgewr derdikevin holê, ku hemû Kurd in lê li ser esasê olî ji hev veqetiyane û şerê hev kirine…

## Dîroka Oxûzan

Dîroka wan li ser navê "Oxûz" ê ji Boxdûz Beg destpê dike. Li destpêkê ew li navenda Xorasanê bûn. Îhtîmaleka pir mezine, ku navê wan ê berî vê demê jî Saka bû. Ji serdema Boxdûz Beg vir ve ew tê guhartin; sedema wê jî hêz, qudret û jîrbûna Boxdûze. Ji çavkaniyan xuyadike ku ew serokekî pir bi dîrayet û zîrek bûye. Ji bo ku wek nûnerê Oxûzan çûye cem Hz. Muhammed, ew tê wê watê ku wî yekîtiya êlên Kurd jî pêk aniye. Di bêşa li ser navê Oxûzan de me qala Boxdûz kiribû. Taybetmendiyeka êlên Kurd jî ewe, ku piraniya êlan navên xwe ji serokên bi hêz digirin. Dîrokzanê Kurd Şerefxan qala wî begî dike: Oxûz Xan, yek ji wan fermanrewayên herî mezin ê Turkîstanê, ji serbilind û serfirazê pêxemberan û efendiyê afirinderan ku wê demê li Medînê dima re, heyetek şand. Serokatiya vê koma han jî yek ji wan mezin û giregirên Kurdan ê bi navê Boxdûz dikir. Ew, mirovekî zehf sik û kirêt, bêperwerde, dilkevir, bêzept û bêrept bû. Dema ewê han ê rû tirş, biqilefet li ber çavên pêxember ket, bêhna wî hat wî, teng bû û jê nefret kir. Dema eslê wî hat pirsîn, wî got: **"Ez ji civaka Kurd im"**…[157-66] Di vê çîroka bi nav û deng de, niqtên ji babeta me re girîng ew in, ku vê demê bûyîna Kurdan ya li Asya ye û ya din jî, navê Boxdûz e. Bi vê re girêdayî Hoko jî xelekeka balkêş dinivîse:

Di sala 229-245 an de (divê ew hîcrî be-Ş) hinek Kurd anîne li Taloriyê (Warê Beran) bi cîh kirine ku li hemberê Rom û Gurcan welat biparêzin. Navê welatê vê demê kirine **Warê Beran** (Erdîş, Xelat, Mûş, Xinis, Melazgirt-Melazkurd, Motikan, Hîzan); hinek jî dibêjin Mamokan. Dîsa Sasaniyan ji bo dewletên êrîşkar, di salên 421-435 an de ji wan deran Kurd birine li Xorasanê bi cîh kirine. Kurdên wêderê heta sala 680 an nê misilman bûn.[32]

Di serdema pêxemberê misilmanan de li bakûrê-rojhilatê Medya dewleta Samanogûllari (kurên Saman) hebû. Sînorên wê dewletê di navbera Xorasan, Sindistan û Maverannehir de diman.[32] Têkiliya vê dewletê bi Boxdûz Beg re hebû an na, nizanim, lê eger derkeve holê ewê gelek xalan ronî bike. Ji gelê vê dewletê re: Gorî, Samanogûllari û Benî Saman dihate gotinê. Li wir binav kirina Goran girînge û îhtîmaleka mezine ku ewên ku ji Gîlanê birî bûn. Ew wek Zazayan tên zanîn. Vana ji welatê Gîlan, Amed û Şeretan anîne û li wan deran bi cîh kirine. Ji bo ku welat li hemberê komela Tûranî biparezin û destdirêjiya Çîn û Hindiyan bibirin. Dawiya vê mîrîtiya Samaniyan ji alî dîl/esîr ê malê Alp Tekîn ve hatiye dayin û ew di sala 1005 an de bû xwediyê Xorasanê.[32] Ji bo dest dirêjiya **Çîniyan û şerê bi wan re min di beşên derbasbûyî de çîrokek nivîsandibû**; ew jî îspateke ku kalê me di nav wan Kurdên birî de hebûne; yan

jî ew di nava têkiliyên nêzik de bûne. Çi heyf û mixabine ku ew Kurdên hanê piştre xwe bavêjin bextê Çîniyan. Xuyaye ku dewleta Samanî jî dewletekê Kurd e; lê ji bo ku Kurd ji sê herêmên cûda birine, mumkune ku ne tene kirmanckî axêf bin û kurmanc jî tevî wan hebin.

Li ser dewleta Samanî Arşakyan dibêje: Di sala 944 an de prensê Samanî, Nûh (943-954) artêşa xwe di bin serokatiya Abû Alî de şand ku bajarê Rêy bigre. Gelek Kurd jî di nava artêşê de hebûn. Kurdên Xorasan û Maverannehir di artêşa Samanî de cîh girtibûn.[3-70] Di vir de Arşakyan dixwaze Samaniyan ne wek Kurd nîşan bide, ew dîtineka ne di cîh de ye. Lê eger mebesta wî bi peyva Kurd şaxekî Kurda ye dibe ku rast be. Di vê demê de bi taybetî Mukriyan wek Kurd dihatin binav kirin. Gunnar Jarrîngê di nav Tirkên li Afganîstan de lêkolîn kirî dibêje: li gelek deran Mukriyan navê xwe wek Kurd derbas dibû û li ser îddea Tûmanovîç, wana bi Tirkmenên Goklen re eleqedar dibîne.[89-12] Di herêma Xorasanê de, siltanê pir derketî pêş Gaznelî Mehmûd e (Siltan Sebûtekîn). Di sala 970 an de hatiye dinyayê û li destpêkê girêdayî Samaniya bajarê Bûst îdare dikir. Di sala 994 an de walîtiya Xorasan kir. Di sala 998 an de jî bajarê Gaznê heyna û hukumdariya xwe îlan kir. Di sala 999 an de paytexta Samaniyan Bûxara heyna û dewlet ji holê rakir. Çend caran êrîşî Hindîstanê jî kir û di sala 1030 an de mir.[13-126] Li ser netewa wî tu agahiyên zelal nînin, lê Tirk wek hemûyan wî jî dikin Tirk. Dewleta Gaznelî ya li Afganîstan, Pakîstan, Îran û Hindîstanê hatî sazkirin ji alî Gûr an ve (1184-1215) hat hilweşandin, Şerafxan dibêje ew Kurd in. Mesûdî (sedsala X.) dibêje ew bi Kurdên li dora Mûsilê ve du êlên bira ne... Agahiya Mesûdî dide gelek girînge, lewra Kurdên Mûsilê wek berê jî min nivîsî, ji ber êrîşên misilmanan çibûn Arran û li wir dewleta Şadî damezirandibûn. Ew dewlet ji sê konfedarayonên mîna Şadî, Badilî û Reşî pêk dihat. Ji agahiya Mesûdî tê fêhm kirin, ku ji wan konfederasyonan yan jî êlan yek hîna jî li Mûsil bûye. Di vir de niqta herî girîng ewe, ku êlên ew dewleta hanê avakirine yek ji êlên dewleta Şadî avakirî û kalên Kurdên îro li dervayê welat in.

Bi vî awayî gelek çavkanî didin xuyakirin ku dema beşek ji Kurdan li Asya bû, ew bi Tirkan re tim û tim di nava tekoşînekê de bûne. Lê mixabin di vê sahê de lêkolînê baş pir kêm in. Ew têkoşînên dûr û dirêj ji alî F. Sumer ve wiha tenê ragihandin: Îl Tirîş Kaxan hewl dida ku dîsa dewleta Tirk damezirîne; lê li dijî wî dîsa Oxûzên ji komên din bihêztir derketibûn. Serokê wan Baz Kaxan bû; pênc caran şer çêbû û Oxûz têk çûn û dewleta wan hilweşiya û ketin bin îtaatê.[131-23] Zelal kirina van şerana jî gelek girînge û xuyadike ku yekîtiya Arraniyan wek berê ne fireh bûye û ew têk çûne. Hêza Oxûzan (dibe ku beşek be) hema hema mîna ya Tirkan bûye ku pênc caran bi wan re şer kirine. Yekê jî navê serokê wan Baz e, navekî Kurdî ye. Bilge Kaxan dibêje, Oxûz dijminin û li her cîhî tevlîheviyan derdixînin. Bi wan re di navbera salên 715-716 an de pênc caran şer kirin. Cara yekemîn li bajarê Toxû Balik (li keviya Tûla ye), ya din li Andirgû ye, ya sêyemîn li Çûş Başi yê bû ku ji êla Tonra ya

Oxûz, Alpavût û 10 meriyên xwe dîl hatin girtin. Ya çaremîn li Ezgentî Kadazê pêk hat. Ya pêncemîn jî li keleha Amgî Kûrganê pêk hatiye. Di sala 717-718 an de Oxûzan xwe avêt paş Çîniyan.(131-37) Navê vî begî (Alpavût) hîna jî li ser êleka li Xorasanê maye. Tirk, êla bi navê Alpavût yek ji êla bingehîn a Oxûzan dihesibînin. Bê guman navê êlê li destpêkê jî ne Alpavûte, mumkune ku piştî dîl girtina wî begî nav li êlê dabin.

Ji çavkaniyên ku Kurdan li Asya didin xuyakirin yek Oxûzname û yek jî Secere-î Terakîme ye, ku wiha dinivîse: Çiyayê bi navê Ûlû û Qicî Balkan de Tirkmenên bi navê Ersarî dijîn. Di nava Xizir Elî yên wir de êleka bi navê Kurd jî heye. Ev êla Kurd, Gûrî-Gûrlûlar ê ji koka Tirkan bûn.(91-11) Ersarî navê ku Tirkan daniye; ji bo ku "sariya" tirkî di Kurdî de zer e, îhtîmaleka mezine ku êla Zeriyan vê demê li wan çiyana bû ye. Îşareteka din ê vê îddeayê bi hêz dike jî ev e: Heta roja îro Zerikî û êlên nêzîkî wan in li Qoçgiriyê di cîhê peyva 'biçûk' de peyva qiçik bikar tînin. Nav lêkirina çiyayê Balkan/Balhanê biçûk (qiçik) jî gereg ji alî wan Kurdana ve hatibe dayîn. Gor gelek îşaret û zelaliyan ew dibêjin Gûr-Gorê ji koka Tirkan e; bi xwe re jî dikevine nav nakokiyê. Çawa navê êlê Kurd û nijada xwe jî Tirk dibin? Di heman jêderê de wiha tê gotin: **Li destpêka mîladê zendekî Goran li jora Dîcle û Firat bi cîh bûn. Ew jî wek Zaza, Desîman, Çareklî, Dunbulî dibin çar beran.**(91-11) Ji vir jî tê xuyakirin ku Gor kalê Kurdên Zazane û ew ji dora Xorasanê yan jî ji dora Siyah-Kûh/Mankişlakê li destpêka mîladê hatine bakûrê Kurdistanê. Wekî tê zanîn Kurdên **Dimilî di sala 1240 an de di rêberiya Şemsettîn Muhammed de dewleteka bi navê "Padîşahiya Gor-istan û Sîstan" li dora Herat û Sîstanê avakiribûn û di sala 1371 an de hilweşiya**. Zazayên dora Dêrsîm, Ezingan, Meletî, Sêwas, Xarpût û Bîngolê Elewî ne. Elewîtî ji Xorasanê di sedsala XIII an de ji alî zenda Goran (Gur) a girêdayî Oxûzan ve hate wê herêmê. Di wê de rola êlên mîna Kureyşan û Damasûran jî heye.(91-48) Li vir jî him Elewîtî him jî Oxûzbûna Dimiliyan tê destnîşan kirin, ku gelek girînge. Lewra dema qala Oxûzan tê kirin, tê fêhm kirin ku mebesta wan Kurdên li dervayê welat bi giştî ne. Dîsa gor Secere-î Terakîme li keviya rûbarê Seyhûn mintiqeka bi navê **"Kurdîşe"** heye û berê ji komên li wir dijî re jî digotin **"Kurdan"**.(91-25) Mînorskî dibêje: Navê êla Kelhûr Goran e. Kelhoran sê milê xwe hene: Pilingan, Derteng û Mahîdeşta. Darna û Dertenga xaka xwe li Hulwanê bû. Mahîdeşt koçber bûn.(2-109) Kelhor berî Îslamê li başûrê Kurdistanê (Hûlwanê) bûn; ew bi hatina Îslamê re reviyan dora Xorasanê. Ji wir di sedsala XIII an de hatin bakûrê Kurdistanê. Gor Rawlînson jî Goran ji zenda Kelhûr têne. Di sala 1639 an de Mûrat ê IV an Kurdên Bacilan li rojavayê Zohap bi cîh kirin û wan jî Kelhûr ji wir derxistin. Mînorskî dibêje navê Goranî du hezar salan kevn e. Goranî ji alî Zazan ve jî tê dengkirin. Warê wanî yekemîn Derya Kesk e û di salên 645-660 an de xanedanekî bi vî navî heye.(12-220)

F. Sumer dibêje: Di kîteban de, Oxûz li bakûrê çemê Tûla yê xwar dibî de dijîn. Lê gorî ji Îstahrî jî radigihîne **welatê Oxûzan** wiha dirêj dibû: Li rojava

Derya Kesk bû; di sedsala X an de Siyah Kûh (Mangişlak) dagirkirin, li rojava yê başûr Cûrcan (navça Çît) heta başûrê Aral diçû. Li Maverannehir jî ji deşta li




Îskît -Saka

bakûrê Bûhara destpê dikir û heta Îsfîcabê diçû. Ji rojavayê Seyhûn û ji keviya çiyayên Qereçûk heta Savranê sînorên misilman û Oxûzan bûn. Li bakûr jî çemê Îtil bû.(131-62)

Zorlû jî dibêje: Li Îranê, çolên Turkîstanê ku Tirk lê dijin û heta çiyayên ku dirêjî hewza Sindê dibe, Îranî lê rûdinên.(105-16) Yanê çawa dibe ku hem welatê Tirka ye, him Tirk lê dijîn û paşê Îranî lê rûdinên? Ev çi paradokse? Di vir de mebesta wî Kurd in, lê peyva Kurd nikare bîne ser pênûsa xwe. Di pirtûka wî giştî de jî xwestiye navê Kurdan qet nenivîsîne. Li Rojhilata Navîn gor wî hemû milet hene, lê ne Kurd. Eger ew îddea raste, wê katê Kurd heta perava Sindê belav dibûne ku raste. Lewra piştre ji wan Kurdana jî gelekî tên Loristanê û ji wir tên Anadol û Sûriyê. Li ser vê yekê jî dîtinen F. Sumer ji me re giranbiha ne: Ti guman tune, ku Oxûz ji herêma Çû û Talasê hatin başûrê Seyhûn, lê nayê zanîn kengê ew hatine. Gor gerokekî ji Xorasanê dibêje, ew di dema xelîfe Mêhdî (775-785) de hatin û bûn misilman. Dibe ku rast be, lewra Karlûkan di sala 766 an de dawî li dewleta Tûrgîş anîn û ew jî bû sedema cîh guhartinan. Di dema waliyê Ebasiyan yê bi navê A. Tahîr (828-844) de Ebasî çûn ser Oxûzan, lê nezanîn li kuderê bûn. Vê artêşê Oxûz têk birin û 2000 nefer jê dîl girtin.(131-65)

Pêşengên Selçûqiyan Oxûz di sala 1029 an de hatin Rêy; serleşkerên Gaznelî Hacîp Siltan Mesûd (Taş Feraş) piranî Kurd bûn. Taş bi 3000 esker çû pêş wan û di nava wan de leşkerên Kurd jî hebûn. Serokê Kurd dîl kete destê Oxûzan û wî ferman da Kurdan ku şer bidin rawestandin, lê ew şaş hate fêhm kirin û Taş hate kuştin. Oxûz gîhiştin Maraga û gelek Kurdên Hezbanî (Ûrmiye) kuştin. Kurd bi waliyê Ezerbeycan Wahsûdan II an ve bûn yek û Oxûz vekişîn. Oxûz derbasî Çolemergê bûn û talan kirin. Li çiya 1500 mirî û gelek jî dîl dan û bi bihîstina hatina Tûgrûl Beg re ew derbasî Cîzîr, Amed û Mûsilê bûn.(2-78) Bi dîtina min, ya di vê dîtine de şaşitiyek heye, yan jî ew şerekî nava Kurda ye. Wekî li jor jî me qal kire, herdû alî jî Kurd in û divê ew şerekî navxweyî be. Bi ser vê de Kurd di pêşengiya Vehsûzan Bîn Mamelan de kom bûn û Oxûz bi tûndî têk birin. Di sala 1029 an de Vehsûzan Bîn Mamelan li Tebrîzê dewleta Rûwadiye saz kir. Di sala 1040 an de êrîşî Oxûzan dike û wana belav dike.(19-65) Selçûqiyan ji Qerehan û Gazneliyan gelek zordestî dîtin, ji herêma Maverannehir hatin Xorasanê. Di sala 1035 an de li Nesa Gaznelî têk birin û bi vê yekê îtîbara wan gelek mezin bû û Tirkmen bi grubên mezin tevlî wan bûn. Selçûqiyan jî ew şandin Anadolê.(148-161) Tirkmenên li Ezerbeycanê nexwestin ku di bin desthilatdariya Selçûqiyan de bijin û êrîşî rojhilatê Anadolê kirin, mîrên wêderê jî ji Tûxrûl Beg re gilî kirin û wî jî ji Tirkmenan re got herin ser Bizansan.(148-164) Ji vê demê bi şûnde êdî Tirkmenan berê xwe dan rojavayê Anadolê. Hemû dîroknûs dibêjin ku yên berê hatine rojavayê Anadolê Tirk in; ew ne raste; yên ku hatine Kurdên ku wek Tirkmen derbasî dîrokê bûne... Şopa vê mirov li gelek cîhan dibîne û şirova herî xweş ji alî E. Woods ve tê kirin:

Li rojavayê Anadolê gelek navê cîhên klasîk ku Oxûzan tînin bîra mirov hene; ev yek, ji zanyarên Tirk re riya xeyala koça 24 êlên di sedsala XI an de bûye, vekir. Zanyarên Ewrûpî, vê texmîna navên deveran tenê piştî sedsala XVI an de rast dikin. Ji bo wê jî rexne dikin û dibêjin mirov nikare ji bo 400 sal berê bikar bîne.(114-68) Ji vê dîtine ew encam derdikeve, ku ew nav piştre hatine guhartin. Rastî jî ewe! Dema Kurd hatin vê herêmê navên kurdî danîn û dewlet avakirin; piştre dewleta Osmanî bi pêşket û cîhên ku dagir kirin jî nav guhartin. Ew rexne di cîh de ne û pêwîst bû ku ew nivîsarana li ser rastiyê jî serê xwe biêşandina. "Tarîxa Îbn-î Bîbî" ya sedsala XIII an ya Selçûqiyên Rûm û "Tarîxa El Evamîr" jî tu qala Kayî û Bayindir nake. Di rastiyê de; jêderên nivîskî yên Îslamî berî êrîşîn Moxolan qala Doxer, Avşar, Salûr, Yive û Kinik dikin.(114-68) Oxûz li sedsala XI an li pozê Anadolê bi cîh bûbûn ku wê demê Afyon jî di nava wan pozpêran de bû ku demekê bû navenda Germiyan.(191-7)

E. Woods li ser Oxûzanaman jî dibêje: Li holê gelek Oxûzname hene, lê mirov bi ti yek ji wan bawer nake, nivîsên têde ne xirav bûne, bi hevre di nakokiyê de ne û her yek cûda ye. Serokên Tirkmenan jî di wê baweriyê de ne.(114-321)

Di "Camûî't-tevarîhê" de, li ser fizîka Oxûzan wiha tê gotin: rûyên wan berê mîna yên Tirkên din bû; lê ji hatina Maveraûnehîr bi şûnde, bi bandora hawa û avê, rûyên wan mîna yên Tacik û Îraniyan hatin guhartin.(131-76) Di vê jêderê de jî înkar kirin û xapandinekê diyare û diziya xwe dide dest. Rûyê wan hema bi hatinekê re nehate guhartin; ew Kurd bûn û fizîka wan jî mîna Arraniyên din bû.

Kurdên bi navê Oxûz û Tirkmen ku tenê nîşandayîn di dîrokê de rolên girîng lîstine, pir mixabin ku ew hîna jî zêde nayê zanîn û nayê lêkolîn kirin. Li ser van tenê nûserên Tirk nivîsine û wan jî hewl dane ku têxin forma Tirkan û dîroka xwe; di vê yekê de bi ser jî ketine. Hêvîdarim lêkolîner û dîrokzanên Kurd jî êdî vê dîrokê bi kûrahî bikolin û rastiyê hîn eşkere raxin ber çavên mirovahiyê. Nûserê Tirk ê ku bi taybet li ser Oxûzan nivîsî dibêje: **Oxûzan ji salên 1164-1165 an bi şûnde hêdî hêdî girîngiya xwe ya siyasî wenda kirin**. Bê guman sedema vê ya herî girîng ew bû; ku ew ne xwedî serokekî hevbeş bûn. Ji ber wê hêdî hêdî heliyan.(131-144) Ew jî rastiya êl û federasyonên êlên Kurd derdixe holê: Eger ew sîstema, wekî car caran kirine, veguhaztina dewleteka bi berdewam û serokekî bi hêz, îro rewş cûda dibû. Ji bo ku ew nekirin, li hember dijminan nikarin rawestin û ji salên 1174-1181 an bi şûnde jî temamî belav bûn. Begên mezin ên zû mirin jî bandoreka negatîf di vê yekê de derxistin holê. Bi ketina Merv û Serahs ve, dîroka siyasî ya Tirkmenan li Xorasanê teva bû. **Ji wan beşekî mezin çûn Kirman, hinek ji wan çûn Farsê cem Salgûran. Beşekî mezin jî çûn Anadolê.**(131-144) Ew belavbûn heta roja îro berdewam e. Li gelek bajarên Tirkan îro em beşek ji neviyên wan dibînin, zimanê xwe wenda kirine, bi gelên din re zewicîne û êdî ti têkilî û gumana wan a li ser nijada wan nemaye!

# SELÇÛQÎ (1040-1157)

## Cîhên bi navê Kurdan yên li Asya

Heta vir me gelek caran îşaret pêkir ku berê hinek Kurd li Asya jiyane; bi taybetî jî berî hatina Tirk û Moxolan ew li wir mane. Mirov dikare bibêje ku navenda vê herêmê Xorasan e. Ew Kurdên ku bi sedsalan li wir jiyane, bê guman li paş xwe gelek belge, heykel, nav û îşaret hîştin. Herçiqas li ser vê lêkolîn pir kêm in jî, yên hatine kirin jî nîşan didin ku Kurdan gelek navên kurdî li erd, bajar û herêman danîne.

Heta Kurdan li wir bajaran avakirine û li ser vê yekê Doç. Yilmazçelîk dibêje: Di nava delta Ceyhûn de **"Kurder Şehr**- Şehra Kurdan" û " **Kurder Ark**-Erqa Kurdan" hene; îhtîmale ku cîhê wan Kurdên ku me li jor qal kiriye ne. Hebûna Kurdan diçe gelek zeman berî vê; paşê bi Tirkên Hûn ve koçê Anadolê kirin. Ew yek li bakûr û rojavayê Derya Kesk pêkhat. Delîla vê Kurdên li Macar, Çek û Slovakya ne. Ewên di başûrê Xezer re çûne jî li Îran û Anadolê bi cîh bûn.[116-4] Ji wir em vê encamê derdixin: Di dema Hûnan de, ew Kurd ji ber wan reviyan û hatin Anadolê. Me berê jî qal kir, ku hinek Kurd ji ber wan reviyan Anadolê û wan jî heta Hatayê ew şopandin. Îhtîmaleka mezine ku ew Kurdana derbasî Sûriyê û Libnanê bûn.

Dîrokzan û erdnîgarê Gazneyî Gardizî dibêje: Li rojavayê Sibîrya, konfederasyonek êlan bi navê Kimak hebû û ew ji heft êlan pêk dihat. Di nava wan de qala êla Bayindir yan jî Balandûr dike.[114-67] Bayindir, yek ji êla Oxûzan e; ew êla paşê dê bê Kurdistanê û bibe bingeha dewlata Akkoyûnî-Pezgewran bi navê din jî Bayindir. Di nava Akkoyûniyan de Mirdêsî, Zerikî, Badilî û gelek êlên din hene ku piraniya wan niha li Anadolê û Xorasanê dijîn. Nasir-i Husrev, di Zafernamê de: Li navbera bajarên Belh û Merevrod de qala mintiqa Cûzcan dike. Li dawiya kîtebê tê fêhm kirin: ku di sedsala IX an de li gelek bajarên herêmê Kurd desthiladar in û di nava wan de Anhoy-Andhoç jî heye[150-6]dinivîse. Gorî ku Taberî dinivîsîne, ev Kurdên ku li Xorasan, Afganîstan li rojhilatê başûrê Gola Aral dijiyan di bin serokatiya Berham Çopîn de bûn. Wek em dizanin ew qehremanekî pir bi nav û deng e.

Di sedsala X an de Îstakhrî jî dibêje ev kewmên pez xwedî dikirî bûn. Prof. Z. Welidî jî dibêje li nêzîkî Heratê, li kêleka çemê Herî-Rûd ê navçeyek bi navê **Kurd-Neşîn** (konax) heye. Li **Kûhî Reş** (Mankişlak) dewleteka Tirkmenan hebû, serokê xwe Kafşût bû û di sala 1128 an de Atsizê kurê Harîzm Şah Muhammed wira heyna. Tirkmenan bi qehremanî şer kirin, lê têk çûn. Balhanê li başûrê rojhilatê Derya Kesk ji berê ve warê Tirkmena yê bi ewlê bû. Ji bere ve karibûn tenê li wir bisekinin.[131-137] Ji wan cîhên ku navê xwe derbas dibe beşek min dîtin, wekî bê texmîn kirin cografyayên gelek çiyayî ne û ji bo kamûflajê û şerê gerîlatiyê baş in. Di wan deveran de Kurdan heta hatina Tirkan xwe parast.


Gor dîroknûsên Tirk belavbûna KU
Moskova
Ural
Tara
İşim
Tobol
I. KURDAK
III. KÜRT
sekel
Peşte
MACAR
Tuna
Özü
Ten
İdil
III. K ÜRT
IV. KÜRT
V. KÜRT
KARA DENİZ
Ankara
Bağdat
Şam
Fırat
Dicle
Tahran
Aşkabad
ÖZ-BOY
Taşkent
PAKTUKA
Kabil
Kasgar
AŞAĞI-
Kholan
Tarım
CUN

Kurd li Asya

Li ser hatina ji bakûrê Derya Kesk de û cîhên ku bi navê Kurdên kirmanckî axifê li Asya, Kocadax dibêje: Di dema Selçûqiyan de, ji Xorasan û Ezerbeycanê hatin herêma Erzirûm û Dêrsîmê. Di navbera Derya Kesk û Aralê de li ser girê Mesa Alandûzû-Navça Alan û Girê Alanî heye. **Di dema fetîhbûna Anadolê de, Alan, Lolan û Balaban bihevre di tevgerê de bûn**. Zazakî diaxifîn.(17-214) Berê jî me nivîsîbû ku Alan îro jî li Kurdistanê dijîn û ew ji Asya hatin. Heta beşekî bi wan re girêdayî bi Macaran re çû Ewrûpa. Bi vî awayî cîhên ku ew jê hatine jî diyar dibin.

Dîroknas dibêjin cara yekemîn ji alî Beranî (Qerekoyûnî) û Akkoyûniyan ve serê mîh û beranan wek sembol hate çêkirin. Di sedsala XII û XIII an de êlên Tirkmen ji Qersê heta Dêrsîm, Akşehîr, Afyon û Aydinê ew heykelana çêkirine.(191-5) Ew cîhê heykel îro lê têne dîtin jî nîşana îstîqameta koçê êlên Kurd û cîhbûna wan nîşan dide. Bi rastî jî gelek kevirên pir hunerî mirov dikare li ser vê riyê bibîne. Hêjayê gotinê ye, ku hinek jî li Loristanê hene. Di nava Bextiyariyan de gelek in. Ew kevirên bi vî awayî belav dibin nîşana belav bûn û parçebûna êlên Kurd e. Yanî ewên li Asya, dema Tirk û Moxol hatin di nava wan re derbas bûn. Yên li bakûr di bakûrê Derya Kesk re hatin bakûrê Kurdistanê. Beşa din ê başûr jî, çûn Loristanê û ji wir berbi bakûr hatin.

Pirtûka li ser kevirên goristanê li Afyonê hatî amadekirin de peyveka balkêş derbas dibe: Di dema siltan Mesûd de, bajarê Akroenosî xirabe bû. Tirkên bi navê **Qereşan** li wir bi cîh kirin û ji wir û pêve ew wek "Qerehîsar" hate bi navkirin.(191-6) Ew navê Kareşan mirov dikare bi du şiklan şirove bike, yek: Eger mirov vê peyvê bike du beş dikare bibe kar-reş/bizin-reş, yanî ewên ku karê/bizinê xwe reş in. Wekî tê zanîn Tirk jî bi êlêka Kurd re dibêjin "Qere-keçîlî=bizin-reşan". Mirov li vir dibîne ku çawa wana nav guhartine û zivirandine tirkî. Piştre jî dibêjin ew Tirk in. Ya din jî ewe, ku mirov dikare bibêje ew Reşî bûn. Gor kevirê ji perestgeha Qerebaba hatî (muze) Tirkmenên li (Afyon) wir di sala 1156 an de bi cîh bûne.(191-15) Eger hatina Tirkan ya Xorasanê 1040 bê qebûl kirin; maqûle ku Kurdên li wan deran di wan salan de hetanî Afyon bên û li wir bi cîh bibin. Kevirekî bi vî rengî li Meletî jî hate dîtin, wek tê zanîn Germiyan li destpêkê li wir bi cîh bûbûn û piştre jî hatibûn dora Afyonê. Ew kevirana cîhên ew lê niştecîh bûne û berê hatina wan jî didin diyar kirin. Ji bo vê jî em dibêjin cara yekemîn Kurdan rojavayê Anadolê zept kirin.

## Dîroka Selçûqiyan

Hatina Tirkan ya berbi rojava, eger mirov Hûnan jî wek Tirk bihesibîne bi wan re destpê dike. Bi dîtina min, ji bo koka Hûnan pêdiviya lêkolînên berfireh heye û di Tirk bûna wan de gumanên min gelek in. Rafael Blaga, êrîşa Hûnan yê yekemîn a li ser Atûrpatkana (Ezerbeycan) di sala 227 an de dide xuyakirin. Dr. Yilmazçelîk jî dibêje: Hûn di riya Qefqasan re di sala 363-367 an de heta Rihayê çûn. Ya duyemîn jî, di sala 395 an de, ji dora Don, êlên

Hûn di bin serokatiya Basik û Kûrsik de bi riya Erzirûm û Firat hatin Meletî û Edenê. Di jêderên Ereban de **ji bo Ak-Hûn (Hûnê Spî) an, Kurd û Ekradî Bilasagûn** tê gotin. Koça din jî di sala 466 an de pêk hat ku Axaçeriyên girêdayî Hûnan hatin Ezerbeycan û rojhilatê Anadolê.(116-13) Bi rastî ew dîtin pir balkêşe! Axaçerî wek tê zanîn kurmanc in û hîn li dora Mereşê dijîn. Ekradî Bilasagûn jî mirov dikare wek Sakayên Bala tercûme bike, ku divê Kurdên Ler/Lor bin. Ew agahî ji gumanên min re dibe tercûman; lê vê pirsgirêkê ez ji dîrokzanan re dihêlim. R. Blaga, riya hatina Tirkan ya Îranê ya berî Îslamê wiha dide: Ji rojhilatê Xezer, çemê Etrek-Tecen û li rojavayê Aras-Kûra yê ve berbi başûr xuya dike. Piştî Îslamê jî piranî di başûrê Xezer re hatin rojava. Hûn li çiyayên Ûral koçber dijîn.(95-849) Pêwîste bê zanîn; ku gelek nivîskar û lêkolîner hatina Tirkan û ya Kurdên li dervayê welat bi navên Tirkmen, Oxûz û ekrad ve tevlîhev dikin. piraniya nûserên dîrokê jêderên xwe nivîskarên Tirk in; ji bo wê jî Tirk û Kurdan û Kurdên cûda zarava axêf ji hev nakin der û teoriyên xwe li ser bê bingehiya jêderên Tirk ava dikin. Bê şik qebûl kirina teoriyên Tirkan bi dîtina min gelek teng e û ew jî rê li gelek şaşîtiyên dîrokî vedike. Eger Hûn Tirk in, têkiliya wan û Selçûqiyan çi bû? Min heta roja îro ti girêdana wan bihevre nedît…



6 Katalog No. 15



7 Katalog No. 15

**Kutahya** (191)

Di beşa Ebasiyan de jî me nivîsîbû, ku Xelîfe Harûn el-Reşîd (786-809), êlên Kurdên bi şervaniya xwe navdar ên mîna: Badilî, Reşî û Şadî ya ji Kandahar, Mazenderan, Xorasan û Sîstanê anîn û di xeta navbera Canîk (Samsûn), Qeyserî û Sîs (Adana) ê de li hemberî Bizansan wek mertalên Îslamê bi cîh kiribûn. Kurd wê demê bi komên mezin li wê cografyayê bi cîh bûn. Xuyaye wê demê hinek Tirk jî bi wan re hatine yan jî Tirk bi awayekî din hatine û di artêşa Ebasiyan de bi berpirsiyartiyên cûda kar kirine. K. Kara dibêje: Di sedsala IX an de, di xeta Tarsûs, Meletî û Erzirûmê de şerê Ebasî û Bîzansan çêdibû. Di artêşa Ebasiyan de bi piranî fermandarên Tirk wezîfe digirtin û ew bi Tirkmenên ji Xorasan û Turkîstanê hatine ve li hember Bîzans şer dikirin.(148-230/31) Ew Tirkmenên ku tên qal kirin jî kalê min in. Bê guman ew Kurdên ji navenda Xorasanê anîne û Tirkên di nava fermandarên Ebasî de kar dikirine

misilmantiyê di şikil de be jî qebûl kirine û di bin ala xelifetiyê de ew şerana dikirin. Mirov dikare bibêje, ku yên wê demê hîna jî li Xorasan û herêmên din mane misilmantî bi temamî nepejirandibûn. Ew rewşa ji cûdabûna Beranî û Akkoyûniyan re bûbû bingeh û ew nakokî ya zêde ne kûr be jî divê di wê serdemê de jî hebe…

Şerîf Firat bi awayekî din hatina kalê xwe Kurdan dike: Tirkên îro bi zaravê kurmancî û zazakî diaxivin û wek Elewî, Sersor û Bektaşî tên nasîn sedsala IX, X û XI an mîladî ji Turkîstan, Xorasan, Nîşabûr û Harezmê hatin. Beşek jî paşê ji Anatoliya Navîn hatin Kurdistanê û bi cîh bûn. Firat, dema Tirk dinivîsîne xuyaye ku mebesta wî Kurd in, lê nikare binivîse û koka xwe înkar dike. Lê dîtina wî raste û gelek Kurd vegerîn Kurdistanê (wekî Kareşan-Qeregeçî). Li ser wê K. Kemal Kop wiha radigihîne: Di sedsala IX an mîladî de, ji Turkîstanê, Tirkmen hatin Anadolê û gelek jî li newalên Dîcle û Firatê bi cîh bûn. Piştî Alpaslan deriyên Anadolê vekirin, dîsa gelek êl hatin û li Dêrsîm û Ezinganê bi cîh bûn.[127-19] Deriyên Anadolê berê jî Kurdan vekiribûn lê rastiyêk heye, ku Kurd piştî Ebasiyan jî heta dema Selçûqiyan dem bi dem hatin Anadolê. Li rojava her ku Bîzans vekişîn Kurdan cîhên vala tije kirin.

Berî ku Selçûqiyên (şaxê Tirk) werin jî, li Kurdistan û Anadolê Kurd dijîn. Ji destpêka dîrokê heta roja îro ti caran Kurd ji Anadolê kêm nebûn. Berî hatina Selçûqiyan, li Kurdistanê Merwanî û gelek mîrîtiyên din desthilatdar bûn. Ew xwedî dewleteka bi rêk û pêk, bi heyî, di nava ewlekarî û aştiyê de bûn û li ser navê xwe pere derxistibûn. Vê yekê nivîskarê Rûs Avyarofî jî dipejirîne: Berî Selçûqî werin Kurdistan û Anadolê Kurd li wan deran dijîn. Wek mînak, **Kurdê li Hukumeta Bergama, Qastamonû, Kurdîbolî, Menteşe, Hamidelî, Engorî, Çanqirî, Çorûm, Qereman û eyalata Rûm (Sêwas) ê dijîn.**[28] Ew Kurdên ku Avyarofî dinivîse îhtîmaleka pir mezine ku Kurdên di dema Ebasiyan de hatine. Îro jî neviyên wan li rojavayê Kurdistanê, Anadola Navîn û rojavayê Anadolê dijîn.

Wekî gelek lêkolîner û dîroknûsên dîroka fermî ya dewleta Tirk dibêjin, ku Selçûqî peşêngên Tirkan yên ku ji Asya hatine Anadol, Rojhilata Navîn împeratorî çêkirine. Ji bo ku ewê bingeha dewletê avêtî navê xwe Selçûq bûye, navê dewletê jî kirine Selçûqî… Lê wekî me li jor jî qal kir, Selçûqî jî bi temamî ne Tirk in. Eger mirov Selçûqiyan li ser du piyan bide ber çavan yek ji wana, heta yê girîng Kurd in. Di esas de piraniya Selçûqiyan: Oxûz-Tirkmen-Kurd in. Li jor min qala wan kir, di beşên pêş de jî emê qal bikin. Hinek dîroknûs dibêjin Tirk di sala 1036 an de hinek jî dibêjin 1040 an de hatine welatê Kurdan Xorasanê. Di "Dîroka Merwanî" yên Kurd de wiha tê gotin: Di sala 1040 an de dewleta Deylem li Xorasanê hilweşiya û Tûxrûl Beg bîn Mîkaîl bîn Selçûq bû hakimê Xorasanê. Sala 1043 an Tûxrûl du serleşkerên xwe bi 10.000 siwariyan ve şandin dora Amedê û ew welata da wan. Yekî navê xwe Bûxa yê din jî Nasixlî bû. Paşê di nava wan bi xwe de şer derket û Emîr Nasrûddewle jî ji wê sûd wergirt û ew têk birin. Ew hatina cara wan ê yekemîn bû, berî wê demê,

kesî rûyê wan li wî welatî nedîbû...[13-152] Belê wekî tê gotin berî wê ti kes rûyê Tirkan li Kurdistan nedîtibû û berî hatina wan Kurd li ser welatê xwe xwedî gotin bûn ku xelîfên Bexda yê kumê xwe li ber wan derdixistin.

Şah Silêman, damezirenêrê Selçûqiyan e, kengê hatiye dinê nayê zanîn. Dema Melîkşah derbasî Anadolê bû ji Tirkmenan artêşek çêkir û bi Bîzansan re şer kir. Ji Derya Spî heta Marmara kire bin desthilatdariya xwe. Di sala 1080 an de heta Kadikoya Stenbolê çû û Îznîk kire payîtext. Hukumdariya xwe bi Ebasiyan jî da pejirandin û di şerê (1086) hukumdarê Şamê Tûtûs de mir.[13-232] Di vê polîtîkayê de Tirk yan jî Selçûqî û Osmanî gelek bi jêhatîne ku hêza Îslamê ji bo berjewendiyên xwe desthilatdarî baş bikar anîne. Di bin navê cîhadê de piştgiriyê wergirtine, Kurd tirsandine û mîrîtiyên wan yek bi yek ji holê rakirine. Lê, li ser damezirenêrê dewletê jî guman heye. Çawa ji bo Osman Beg tê gotin ku Osmanî avakirî heye, ji bo wî jî Dr. Abdulkerîm Ozaydin dibêje: Dewleta herî mezin a di dema Îslamê de Tirkan damezirand Împaratoriya Selçûqî (1040-1157) ye. Selçûqê ku navê xwe daye dewletê, kurê **Dûkak** ê ku begekî Oxûzan e. Leqeba wî **"Demîr Yayli-Hesin Kevanî"** bû. Ti agahiyên berî Dûkak nînin. Selçûqî, yek ji 24 berên Oxûzan Qinikan e. Ji ber nakokiyên navxweyî û ji ber Yabgû yê Oxûz, Selçûq welatê xwe -Yenî Kent - terk kir û hate mintiqa Cend. Li wir bû misilman. Yabgû yê Oxûz memûr şandin ku bacê jê bîstinin û wî jî got: "Misilman bacê nadin kafiran" û li hember wan cîhad îlan kir.[130] Di beşên derbasbûyî de me hewl da ku îspat bikin Oxûz kalên Kurdên îro li dervayê welat in. Ji vê îddeaya Ozaydin derdikeve ku nijada Selçûq ji Oxûzan e. Herçiqas pêdiviya vê bi lêkolînê zêde jî heye, mirov dikare vê encamê derxe ku parçebûna Oxûz-Kurdan li ser nakokiya olî ye. Ewên bûne misilman olî dane ber netewa xwe û girîngiyê nedane Kurdbûne. Her çiqas navê Selçûq wek Tirk xuyabike û wek Tirk derbasî dîrokê bûye jî ew Kurd in... Di şerê herdû aliyên Oxûz de kurê Selçûq, Mikaîl mir û wî jî torinê xwe Çaxri û Tûxrûl bire cem xwe. Nav û dengê Selçûqiyan belav bû. Bi ser vê de Samaniyan (874-999) ji ber êrîşên Qerehaniyan navça Nûr a di navbera Bûhara û Semerqentê de dan Selçûqiyan. Li hember êrîşên Qerehanliyan Tûxrûl vekişiya çolê û Çaxri jî bi 3000 siwarî êrîşî (1015-1021) Xorasan, Rêy, Ezerbeycan û dora Wanê kir. Ew êrîşeka keşfê bû û bi serkeftî derbas bûbû.[130-1] Di wê navbera de Yûsûf Qadir Xanê Qerehanî û Siltan Mehmûdê Gazneyî li ser "Îran û Tûran" lihev kirin. Gor wê lihev kirinê Selçûqî gereg bihatana ajotinî Xorasan.[130-2] Bi ser êrîşan de Selçûqî di sala 1035 an de ji Ceyhûn ve derbasbûn û bi 10 hezar siwarî çûn Xorasanê. Li wir pir bûn, Îsmaîlê Harzemşah jî bi wan re alîkarî kir û bi hêz bûn. Siltan Mehmûd êrîşî wan kir lê di sala 1038 an de têk çû. Di sala 1040 an de jî li Dandanakan artêşa Gaznelî têk çû û Tûxrûl bû hukumdarê Xorasanê.[130-3] Îbrahîm Yinal li hember Tûxrûl serhildan derxist û di şêre yekemîn de Tûxrûl têk bir. Paşê Tûxrûl ji Kavûrd (Kafşût) û Alpaslan alîkarî girt û ew têk bir, sal 1059 bû.[130-5] F. Sumer dibêje: Kafşût, serokê dewleta Tirkmenan yê li Mankişlak bû. Gor Îbnûl Esîr dinivîse, desthilatdarên wir wek Melîk dihatin nasîn û di

sala 1128 an de Atsizê Harîzm Şah Muhammed ew dera zept kir, Tirkmenan bi qehremanî bajarên xwe parastin lê têk çûn. Atsiz gelek xwîn rijand û her der şewitand. Tirkmenên wir azadiya xwe wenda kirin.[131-136] Wek ez texmîn dikim ew Kurdên dimilî axêfin.

Selçûqiyan, li destpêkê êrîşî sînoren Ermenî, Bizans û Kurdan kirin. Bi taybetî jî êrîşî Ermen û Bizans. Dema emîr Selçûqê Tirkmen ji rojhilat hate Îranê misilmantî qebûl kir. Ji vê şûnda bi artêşêka mezin êrîşî Xorasan û Ermenistanê kir. Ji bo ku gelên li wir dijîn ne misilman bûn, gor Ereban valahiyeka eskerî hebû û artêşa wir ne bi hêz bû ku berê êrîşê wir kir. Eger êrîşê Îran, Kurdistan û Erebistan bikira wê demê dikarîbû raste dijberiyeka misilmanan ya bi hêz bihata. Lê êrîşên li ser Xorasan û Ermenistanê hatin kirin berovajî yarmetî ji misilmanan girt. Li ser vê tê gotin ku di navbera serokên Selçûqî Tûxrûl û Çaxri de li ser êrîşa rojava nîqaşek pêk hatiye. Di dawiya vê de, biryar didin ku li destpêkê herin ser Arranê. Lewra ew herêma di destê malbatên bê hêzê mîna Şadî û Rewadî de bûn. Lê vê demê jî pêwîst bû ew bi Gurcî û Ermanan re jî şer bikin û bi vî awî dikarîbû hêza wan lawaz bibûya.[131-113] Kurdên li Xorasan û Arranê wê demê bi piranî misilmantî bi temamî nepejirandibûn û vê yekê jî dijberiya misilmanan zêde dikir. Ji ber vê sedema olî misilmanan, alîkarî û piştgiriya Selçûqiyan kirin. Beşekî mezin ji êlên girêdayê kurê Emîr Selçûq, Aslan di sala 1025 an de derbasî Xorasan bûn. Di sala 1037 an de li bajarên Ermeniyan komkujiyên gelek mezin kirin. Ermen, Kurd û Erebên ji alî xelîfê Omer va li wir hatibûn bicîh kirin di şûr re derbas bûn. Paşê Kurdên li çiya yekîtiya xwe çêkirin û Selçûqî têk birin, lê mixabin paşê dîsa Kurdan winda kir û Selçûqiyan bajarê Tûs heynan. Li wir 100 hezar mirov kuştin û 150 hezar jî dîl girtin.[38] Di sala 1041 an de Dewleta Selçûqî hate damezirandin. Tûxrûl, di sala 1043 an de ji xelîfe re nameyek nivîsî û alîkarî wergirt û paşê Nisêbîn, Farqîn, Sîncar, Habûr heynan û Amed rûxand... Di dîroka Amedê de jî tê gotin; ku Tûxrûl cara ewil di sala 1062 an de hate Ezerbeycanê, paşê jî bi xwe hat Arranê û gelek mîrîtiyên biçûk kirin bin desthiladariya xwe. Bi xwe vegeriya Îraqê û li cîhe xwe ji bo dagirkirinan Yaqûtî hîşt. Wî jî, wek dîrokzanên Ermenî dibêjin serdarên Cemcem û Îskûlû, da cem serdarên Xorasan û wan dagirkeriyê berdewam kirin. Ew, pêşî li dora Erxanî yê kelehên mîna Bagîn û Tilham heynan. Paşê bi Nîzamûddîn Nasrê Merwanî ve bûn yek û bakûrê Dicle û Firat heynan. Bi ser vê de împaratorê Konstantîn Dûcas artêş şand ser Amedê û têk çû.[137-213] Di dema Tûxrûl de, mintiqa Ahwaz û Xuzîstanê di destê Kurdê bi navê **Hezaresb** de bû. Gor Avcioglû ew bû zavayê Selçûqiyan û şêwirmendê Tûxrûl, hertim li kelêka wî bû û paşê Basra jî dane wî. Di sala 1065 an de Alpaslan êrîşê Kurdên ku li sînorên Hîlvanê riya bazirganan dibirîn kir û ew di şûr re derbas kirin. Beşek ji wan Kurdên ku aman anîn di ewlekariya riyan da bi kar anîn.[23]

Farûk Sumer dibêje: Berî Selçûqî bên, ji Oxûzan komekê li Xorasanê bû, lê ew kijan bûn em nizanin. Di sala 1021 an de Selçûqî 180 km li nêzîkî Bûhara

(herêma Nûr) dijîn.[131-93] Bi dîtina min ew hatin Loristanê. Her çiqas belge niha tunebin jî, piştî du sed salan li wir Kurdên wek Oxûz tênê bi navkirin xuya dikin û divê ew koma be. Heman nivîskar radigihîne ku Gaznelî Mehmûd îcaze daye ku 4000 konên Oxûzan herin Xorasanê û ew li deşta Serahs, Feravê û Abîwerdê bi cîh bûn. Piştî mirina Arslan Yabgû wana nexwestin di bin desthiladariya Selçûqiyan de bijîn.[131-96] Ibn ul-Esîr jî dinivîse ku ji Oxûzan 2000 kon hatin Esfehanê. Mehmûdê Gaznelî ji serokê Deylemî Kakûye Ala û Dewle xwest ku yan wana, yan jî serê wan bişîne. Li ser vê, Oxûz çûn Ezerbeycanê.[131-97] Deylemî xanedaneka Kurd bû ku desthilatdarê Esfehan û Hemedanê bû. Hakimê Ezerbeycanê Rewadî Vahsûdan Oxûz bi biratî pêşwazî kirin û ji wan bi keçekê re zewicî. Oxûzan li wir, li bajarê Meraga mizgeftek şewitandin û ji êla Hezebaniyê mirov kuştin. Îhtîmaleke ku Vahsûdan jî ew şera pê dabe kirin, lewra navbera wî û serokê Hezebaniya Heyca ve tunebû. Paşê herdû jî li hember Oxûzan bûn yek û Oxûz çûn Îraqê. Oxûzan, Li Ezerbeycanê bi Ermeniyan re jî şer kirin.[131-107] Bi dîtina min sedema vî şerî cûdabûna olî ye. Kurdên ku hatin hîn nebûbûn misilman û ji bo wê jî mizgeftên birayên xwe yên misilmantî pejirandî şewitandin. Di derdora salên 1050 an de dewleta Deylemî (Buveyhogûllari) bi îttîfaqa Tirkan re êrîşî Oxûzan kirin; têk çûn û dewleta 200 salî jiyayî hilweşiya.[131-119] Hezebanî li Ûrmiyê di bin serokatiya Ebûl Heyca de dijîn, ji cîrantiya Oxûzan bêzar bûbûn û bi wan re şer kirin. Oxûzan jî gundên Kurdan gelek talan girtin û kes kuştin. Oxûzan ji ber xisimtiya Vahsûdan, li Ûrmiyê cîh girtibûn. Lewra, E. Heyca el Hezebanî dijminê Vahsûdan bû. [131-108]

Farûk Sumer dibêje: Selçûqî di sala 1035 an de hatin Xorasanê. Wê demê Xorasan cazîp bû û ew texmîn dikirin ku dê bi hêsanî bigirin. Selçûqiyên ji Seyhûnê ve derbas bûn bi riya Mervê hatin Nesa û 10 hezar eskerên wan hebûn. Tirkmenên li wir bi dûrxistin. Tirkmenên di bin desthilatdariya Yinali ye Selçûqî de bûn.[131-100] Hîna jî êleka bi navî Înalû heye û Kurd in. Begê Selçûqî nameyek ji serokê dîwana Xorasanê Sûrî re şand û diyarkir ku ew girêdayî Xelîfe ne.[131-103] Navê serokê dîwana Xorasanê **Sûrî** bûye ku navekî Kurdî ye û tê wata sor, yanê kesê kej. Heman nivîskar niqteka din jî eşkere dike û dibêje: Selçûqiyan bawerî bi Oxûzan nedianîn û her dem ew di bin çavdîriyê de digirtin.[131-105] Bi gotina Selçûqî mebesta wî Tirk in û Oxûz jî Kurd in.

Vê yekê Gunduz wiha tîne ziman: **Tirkmen li Erran, Ûrmiye, Hoy, Mûgan, Nahcivan, Erdebîlê gelek zêde bûn. Li Farsê Yîva, li Xuzîstanê Avşar, li rojavayê Îranê Salûr, paşê jî Yîva piranî pêk dianîn. Şehrî Zor, Mûsil û Şam jî mintiqa din ê ku Tirkmen lê kom bûne. Selçûqiyan li Xorasan dewlet avakirin bi şûnde, hejmara Tirkmenan kêm bû. Yekemîn koça mezin a Tirkmenan wê demê pêk hat**. Ya duyemîn jî di dema Moxolan de bû. Çepnî ji alî Selçûqiyan ve ji rojavayê Derya Reş re hatin şandin. Ewên li sînorên Bîzans jî, ji alî rêvebirê dewletê ve li destpêkê wek bûyerên rojane hatin şirove kirin, lê paşê dîtin ku ew bi felaketekê re rû bi rû ne.[115-27] Bi




Gor dîroknûsên Tirk, hatina Kurdan ya ji A

hatina Selçûqiyên Tirk re Kurdên li Maveraûnnehr, Xorasan, Asya Navîn reviyan cîhên çiyayî yên li Kurdistan û Arranê. Ew komên pir mezin ku li wir kombûn, piştre hatin rojavayê Anadolê. Di vê niqtê de dîtina Gunduz raste û belavbûna Kurdên li navenda Xorasanê nîşan dide. Tespîta li Farsê Yîva û li Xuzîstanê jî Avşar girînge û me li jor jî gotibû ku beşek çû Loristanê.

Bavê dîroka Tirk Sumer rastiyeke wiha eşkere dike: Dewleta Selçûqî Oxûzan damezirand; sînorên wê Oxûzan fireh kirin. Ji welat (mebesta wî navenda Xorasanê) kom bi kom dihatin û ji alî dewletê ve ji Bîzans re dihatin şandin; sedema vê yekê ew tevlîheviyê dernexin û pirsgirêka mêrgan çaresêr bikin bû.(131-127) Sedema herî girîng erd zeptkirina wan bû; Selçûqiyên milê Tirk pêk tînin, Oxûzên Kurd wek maşik bi kar dianîn û didan pêş. Ji bo ku yekîtî di navbera wan de tunebû jî, paşê Oxûz ji Tirkan re bûn xwarin. Eger di nava wan de yetiyeka bi hêz hebûya îro di cîhê dewleta Tirkiyê de dewletaka Kurdan li Anadol û Kurdistanê hebûya. Niqteyeka din ê balkêş eşkere dike û dibêje: Di navbera fermandaran Tûxrûl û Alparslan de kesekî ji Tirkmenan peyda nedibû. Ji bo dewletê Tirkmen lingê duyemîn girîng bû.(131-127) Li wê demê jî xuyadike, ku Tirkmenên bi her awayî dihatine bikar anîn, hêzeka weqas girîng mîna milê dewletê yê dinî di rêveberiya dewletê de cîh nagire. Ew jî vekirî dijminatî, bê bawerî û tirsa Selçûqî-Tirkan yê ji Oxûzên Kurd derdixe holê. Di cîhê Oxûzan de, fermandar ji miletên din ên mîna Ereb, Faris û yên din dihatin hilbijartin. Di encama vê de jî li Oxûzên Kurd gelek komkujiyên bê vîjdanî pêk hatin.

Tirkmenên berê hatin Ezerbeycanê û bi Vahsûdan re hevkarî kirîn, di sala 1041 an de rastî îxaneta wî hukumdarî hatin. Vahsûdan, 30 serokên Tirkmen di ziyafetekî de da kuştin. Ji ber vê yekê Tirkmenên li wir nikarin bisekinin û şerê bi wî re kirin winde kirin û li der û doran belav bûn. Hinek çûn Ûrmiyê û ji wir jî çûn Colemergê. Beşek çû alî Botan û Batman û hinek jî li Amed, Farqîn û Mêrdînê belav bûn.(137-202) Ji bo belavbûna Kurdan ew girînge lê mirov nizanê kijan êl in.

Nûserê herî zêde li ser Oxûzan nivîsî Sumer e, ji bo vê jî em wek jêder ji wî zêde sûd werdigirin, lewra di nava hevokan de mirov rastiyê dibîne. Gor wî, bi avabûna Selçûqiyan re, ji welatê Oxûzan (Mangişlak û Balhan) pel bi pel koç hatin rojhilata nêzik. Komeka gelek mezin jî sala 1054 an çû bakûrê Derya Reş.(131-89) Ji vê ti guman nîne ku ew Kurd in û piştre jî ew hatin Anadolê. Jêderên Rûsên wê demê gelek qala kejbûna wan Oxûzan dikin. Îro di nava Kurdan de bi taybet jî di nava yên koçber de zerîbûn gelek balkêş e. Eger mirov bala xwe baş bide Kurdên Lêk, Alanên kirmanckî û kurmancên li Anadol û Xorasanê ew zerîbûn pir balkêşe.

Bi hatina Kurd û Selçûqiyan (Tirk) re gelek mirov li bakûrê Kurdistanê û sînorên dewleta Merwaniyan gihîştin hev. Bi pêşengiya Alparslan, ew hêzên wir bi tanzîm bûn li dijî împaratoriya Bîzans a ku wek astengiya tenê li ber xelkên ji rojhilat hatibûn mabû û ji bo êrîşa ser wê amade bûn. Torî dibêje,

di 1064 an de bi leşkerekî mezin ji Xorasan hate Ezerbeycanê. Di 1070 an de artêşa rojhilat giş, artêşa Kurdên li Hemedan û pêşengên li Anadolê komkirin û şer kir.[58] Ji vê dîtine jî xuyaye ku wî hêzên Kurdan bi temamî kom kirine. Di şerê sala 1071 an pêk hatî de, Alparslan ji gelek hêzên Kurd jî sûdwergirt û di şer de biserket. Piştî vî şerî êdî deriyên Anadolê bi temamî ji Tirkan re vebûn. Alparslan, piştî serkeftina mezin a 1071 an dibêje: Êdî deşt û zozanên Anadolê yên fireh li benda we ne. Cîhên ku we zept kir ji we re bimîne, kê kuder heyna bila li wir bicîh bibe.[17-63] Lê ew Kurdên ku di dema Ebasiyan de hatibûn, berî Selçûqî biherikin nava Anadolê, li gelek deveran bi cîh bûbûn. Nivîskarê Bîzansî Mikaîl Psellos li ser şerê 1071 an ya di navbera Romanos Diyogenos û Alpaslan de pirtûkeka bi navê **"Chronographîe"** nivîsiye. Di wir de ji bo **Alpaslan dibêje ew ji koka Parta** ye û di çend deveran de jî dibêje **siltanê Kurtom Vasileûs (Kurda)**.[49] Eger ew îddea rast be, Tirk bûyina Alparslan jî dikeve şikê. Ji bilî vê eşkere dibe, ku piraniya leşkeran Kurd in û ji bo vê jî dibêje siltanê Kurdan. Eger ji koka Parta be çawa Anadol kete ber destên Tirkan? Çawa zimanê farisî û kurdî qedexe kirin û di şûna wan de tirkî kirin praktîkê? Ev pirs û xal jî li bersivê digerin.

Bi şerê Malazgîrê re, Oxûz/Tirkmenê hatibûn, yan jî hatibûn neqilkirina rojhilatê Anadolê, ji ber pêdiviyan li sînorên Bîzans, li Kîlîkya hatin bi cîh kirin. Wek parêzvanê sînorên Selçûqiyên Anadolê li rojava diparastin; ku Germiyan, Eşref, Hamîd, Menteş ji wan bûn. Li Kîlîkya, yanî li sînorê mîrîtiya Ermanan jî Qeremanî bi cîh kirin.[31-1] Gor îddea pirtûkên Weşana Zamanê li ser dîrokê: Pêdiviya dewletê bi cîh kirinê hebû; Mumkune ku ew bi daxwaza xwe li nav sînorên ku herdû dewlet jî nikaribûn mudaxele bikin bi cîh bûn. Yan jî cîhên çiyayî yên ku ti dewlet nikaribû êrîş bike. Cîh guhartina Germiyan jî balkêşe, yan ji tirsan yan jî bi daxwaza xwe ji Meletî çûn dora Kutahya. Kon/federasyon êla yên din jî bi vî rengî cîh guhartin. Dema avabûna dewleta Selçûqî, yanî di sedsala XI an de grubên Tirkmenan zêdetir koçî Îran û Ezerbeycanê kirin. Ew nîv koçberbûn û ji bo ku di nava dewletê de tevlîheviyan çênekin dewletê ew ajotin sînoran; bi vî awayî fetîhkirina Anatolê û Sûriyê li ser bingehekî saxlem rûnişt.[82] Ew dîtin zêde ne maqûle, lewra Tirkmen-Kurd jixwe li Ezerbeycan û Îranê hebûn. Mînaka herî baş jî Şadî ne ku wê demê wek dewleteka girêdayî Selçûqiyan dijî. Lê, di vê vegerê de sedema bingehî li gor dîtina min zextên li ser Kurdane û şiyarbûna Kurda ye ku ew gihîştin vê qeneatê ku dewletê wana bikar tîne. Ew yeka di praktîkê de divê pêk hatibe; yanê Alpaslan û berdewamiya wî li ser soza xwe nesekinîn û cîhên ku Kurdan fetîh kirin dîsa ji dest wan girtin; bi ser vê de jî Kurd vegeriyan cîhên xwe yên berê yên li navenda Xorasan û Arranê... Çûyineka bi vî rengî yê di demên paş de jî pêk te. Piştî avabûn û firehbûna Osmaniyan, Kurdên li Anadolê mirîtî yan jî dewlet avakirin, li hember êrîşên Osmaniyan nesekinîn û vegeriyan Îranê; emê li pêş li ser rawestin. Selçûqiyan ne ku ji bo êlên Kurdên koçberbûn û di nava dewletê de tevlîheviye nekin ajotin sînoran. Wê demê hîn dewlet yan jî

sîstemeka Osmaniyan xirab bibe li holê tune. Sedema herî maqûl ew bû, ku ew êl yan jî federasyonên êlan di alî leşkerî de pir pêşketî, bihêz û bê tirs bûn; di şerê gerîlatî de ew hoste bûn, ku Selçûqiyan dixwest bi wan împaratoriya Bîzans ji teqatê bixe. Dîsa di pirtûkên weşanên Zaman de niqteyeka girîng eşkere dibe: Hêzên Selçûqi yên ku Anadol ji xwe re kiribûn war, bi piranî ji Tirkmenan pêk dihatin. Tirkmenên di bin bandora alozî û tevlîheviya siyasî ya di nava Ezerbeycan û Îran de mabûn, bi piranî li sînorên Bizans bi cîh dikirin. Piştî 200-300 salan siyaseta Osmaniyan li ser wan: **sazûmana wan parçe kirin, bikin grubên bicûk û girêdayî axê kirin** bû.[82] Sedema esasî ew e: Bi hêza wan dijmin lawaz bike, erdê bigre; piştre, ji bo ku ew ji Osmaniyan re nebin xeter, xwestin parçe bikin û di nava Tirkan de bihelînin. Ew siyaseta hê jî berdewame. Di hinek cîhan de bi ser ketine jî, lê piraniya Kurdan ew nepejirandin û vegeriyan warên xwe yên kevn. Tûfan Gunduz rastiyê tîne ziman: Hukumdarên Selçûqî nerihetiya Tirkmenan dizanin û ji bo wê, wek tedbîr ew li hemberî hêzên li çiya bi kar dianîn yan jî ew dişandin herêmên pêş ku pê xaka Ermenî, Gurcî û Bîzansan didan talan kirin. Ew polîtîkayeka din a firehkirina xaqa Selçûqî bû. Ji ber vê yekê jî, gelê Bîzans direvî hundur.[115-26] Ji alî gelek dîroknûs û lêkolînerî ve tê qebûl kirin, ku Selçûqiyan Tirkmenan li gorî dilê xwe bi kar dianîne; ew dişandine ser dijminan, dişandine sînoran, xakê pê zept dida kirin, ew ji rêvebiriya dewletê û derfetên wê bê par dihîştin û di dawiyê de jî ew bi komployekê ji holê radikirine.

Bi hatina Tirk û Kurdên li dervayê welat re Anadol bi piranî kete destê Selçûqî û Kurdan. Li hember vê, hewldanên Bîzans jî hene ku hemleyeka din bikin û wan hêzana ji axa xwe bavêjin. Ji bo vê gelek şer û tekoşîn di xeta Firat de pêk tên. Vê demê, li hinek cîhên herêmî carna îttîfaqa Kurd, Asûrî, Ermenî û Bîzansiyan pêk tê. Carna jî Kurd dibin dijberê Bîzans û Suryaniyan. Di sala 1098 an de pîskoposê Riha Thoros (du sala berî vê bajar bi fên kir destên xwe lê gelê bajer jê heznedikir) bi 12 kesayatiyên herêmê yên bi nav û deng ve çû cem serleşkerê Grekî yê bi navê Baûdoûîn ku bila bajarê wan ji êrîşên Tirkan biparêze.[20] 12 kesayetî federasyona êlên Reşiyan yên ji 12 êlan pêk tên tîne bîra mirov. Ew yeka ne tesedufe û îhtîmaleka pir mezine ku ew kesên çûn serokê êlên Kurd bûn. Ev kesana nûnerên gelê bûne. Xuyayê ku Suryanî bajêr birêva dibin û 12 kes wek heyata îstîşarê heye.[20] Wata 12 kesan ev e ku ji her eşîretekê kesek, yan jî ji her qebileyekê serokek e. Heyeta îstîşarê jî mumkune, lewra heta dema derengî di nav gundên Kurdên li Anatoliya Navîn de heyetên rûspiyan hebûn û wek meclisa şêwirmendiya gel kar dikirin. Dema Bozan dibe desthilatdarê Riha ew 12 kesena li dar dixe. Dîsa di navbera Kurd û Suryaniyan de li dijî Tirkan îttîfaqekê heye. Kîlîkya jî di destê Ermeniyan de ye. Dema Boûdoûîn derbasî rojhilatê Firat bû, jêra kemîn hatin danîn, ev li gel Ermeniyan bû mêvan û Kurdan jî tîr davêtin wî. Wek Albertûs nivîsî desthilatdarê Samsat **Baldûk** e; yê Sûrûçê Belek e û di artêşê de Ermenî, şovalyê frank jî hebûn lê têk çûn. Di salên navbera 1098-99 an de hezar kes mirin. Di

sala 1098 an de êrîşî ser Samsatê kir û Kurd têk birin. Berî vê jî Kûrboxa (artêşa wî ji Ereb, Tirk û Kurdan pêk dihat) êrîşî Riha kir lê têk çû. Mateosê Rihayê ji bo Baldûk dibêje: "Ev kurê Emîr **Qazî Baldûklû** bû. Gorî jêderên Ermenî yê bi navê Vardan ew kurê **Ibn el-Danişmend** Emîr Qazî ye. Wek em dizanin ew ji **Mirdêsî ya** ye. Ew êla hanê niha beşekî li Anatoliya Navîn e.

Li rojavayê Anadolê, bi taybet jî li bajarê Afyon hîna jî şopa Tirkmen-Oxûzan heye; kevirên goristanên neqişkirî û gelek belgên din vê didin îspatkirin. Bi taybet jî, li xeta ku ew jê hatine mirov dikare ji wan kerwanan bibîne. Ji Arranê bigre heta Meletiyê û ji wir jî heta Afyonê ew xet dom dike. Li aliyê din jî heman reng li Loristanê li herêma Bextiyariyan tê dîtin.

## Êlên Tirkmenên li Afyonê

Wekî me li jor jî gote, berî Selçûqiyan, Kurdên ku wek Tirkmen dihatine bi navkirin li rojavayê Anadolê belav bûn û gelek dewlet avakirin. Dîroka fermî ya dewleta Tirk li wan xwedî derdikeve, lê rastî ne wiha ye. Ji wan dewletana ya herî bi nav û deng Germiyan bû. Vana xwe li rojavayê Anadolê (Kutahya) bi rêxistin kirin lê paşê ji alî Osmaniyan ve ji holê rabûn. Kurdên dest fireh, xaka dewletê wek qelen pêşkêşê Osmaniyan kirin. Heta sedsala dawî li Afyonê hîna jî Kurd hebûn. Gelek ji wan vegerîn Kurdistanê û beşek jî li Anadola Navîn bi cîh bûn. Yên ku man jî heliyan. Hinek Kurdên li wir wek: Cerîd, Danişmend, Herdîlî, Qerekeçî, Kikan, Kizil Şêx, Mihaîlî, Alikan, Bayat, Bozûlûs, Taban, Çakalan, Germeyan, Kaçar, Qaracakurd, Kurdmihmad, Kutuklu Afşar, Okçû, Sêvik, Şereflî Tirkmanî-Şereflî Kurdu û Zir-Zer (191-8/12) an rêz dibin û hema hema piraniya wan li Navenda Anadolê ne. Piraniya wan hîna bi van navên xwe dijîn. Nivîskarê wan rêzana bixwe ji êla Sêvikî ye ku li jor navê xwe heye.

Gor texmîna min Kurd li vê herêmê gelek sedsalan man; ew yeka ji kevirên goristanan jî tê zanîn, yên dawî jî di dema Yawûz de reviyan. Kurdên ku li wan gund û bajarokan bi cîh bûbûn şopa xwe jî hîştin. Heta hê jî di alî çand û kevneşopiyan de bandora wan berdewam dike. Wekî nivîskar jî diyar dike kevneşopiya wan cûda bûye: Li gundên Buyuk Qerebax, Qereyokûş û Yoruk Qaracaoren a girêdayî Bolvadînê merasîma meyitan ya xistina goran, ne gorî edetên Îslamê ye, cûda ye. Li vê herêmê êlên mîna Avşar û Qerekeçî desthilatdar bûne û merasimên wan mîna yên Asya Navîn bûye. Termê mirov hate veşartin bi şûnde, di dora gorê bi hespan yan jî peya 7 caran dizivirin û heta sedsala XX an, bi qasî dijminên ku kuştine li dora gorê kevir dihatine danîn. Navê wan keviran **balbal** bû ye û ji bo wan kilamên şînê dihatine strîn. Wek mînak:

| | |
|---|---|
| Kürdün deweleri gîder geç gelîr | *-Hêştirên Kurdan terin dereng tên* |
| Oxun oxun karnim aç gelîr- | *-Her danî zikê min birçî tê* |
| Eller anam dedîkçe bana guç gelîr | *-Dema gel dibê dayê hêz tê min* |
| Geldî goynexîme girdî ayrilik | *-Cihêbûn hat kete nava dilê min.* (191-12) |



**Kevirên gorên li Kutahya yê**

Tê îddea kirin ku di dawiya sedsala XI an de Anatoliya Navîn derbasî kontrola Tirkan bû; bi vê yekê re bajarê Qonya bû navendeka siyasî ya girîng. Qonya berê bû payîtexta Selçûqiyên Anadolê (1097-1208) û paşê jî bû payîtextê Qeremanan (1327-1476). Qeremanî Kurd in û hîna jî bi vî navê êlên koçber li Xorsanê hene û min ew ziyaret kirin. Di Kurd bûyin û sersortiya wan de ti guman nînin û êleka pir şervan e; hîna jî kevnoşopiyên kurdî didomînin. Di nava sedsala XIII an de Qonya bû cîhê şerê Tirkmen û Moxolan. Ji dawiya sedsala XIV an heta dawiya sedsala XV an Qonya bû cîhe şerê Osmanî û Qeremaniyan. Ji sala 1483 an bi şûnde Qeremanî têk çûn.[111-9] Wekî tê diyarkirin Qeremanên şervan heta dawî li berxwedane. F. Sumer xelekaka girîng dinivîsîne: **Di sedsala XII an de li Xorasanê dema digotin Diyarî Rûm (Anadol) Tirkmenên li navbera Qonya û Enqereyê de dijiyan dihate bîra mirovan.**[131-158] Ew jî dide xuyakirin ku wê demê jî Kurd li Xorasan mane û **Kurd ji sedsala XII an ve li herêma Anadola Navîn bi cîh bûne**. Lê mirov eger bi vê cografya yê bi sînor neke hîn rasttir e. Lewra Kurd ji Îzmîrê, Antalyayê heta Marmarayê bi cîh bûbûn. Yek ji îspatên vê defterên Osmaniyan yên kevn in, di van de gundên bi navê êlên Kurd û navên kurdî hene. Dîsa kevirên bi nivîs û wenê jî îspata van in.

Lê, kîngê Tirk bi hêz bûn, xwe wek dewlet bi rêxistin kirin û hêza Îslamê ya fetîhkirinê jî dan pişta xwe, pêşî xaçperest ji holê rakirin. Piştre jî vegerîn ser Kurdan; ji aliyekê ve ew li dijîhev bikar anîn, ji aliyekî ve jî bi xwe yek bi yek dewlet û mîrîtiyên Kurdan ji holê rakirin. Li ser vê Kocadax ji dîroka Wanê wiha radigihîne: ...Êla Cibranî ya girêdayî **Milan di sedsala X an de li Teke (Antalya)** rûdiniştin, ji vir ji Riha yê re hatin şandin, ji wir jî çûn Wîranşehîr e. Piştî wê di pêşengiya axayê êla Şêxsiwar de çûn Varto, Bûlanik û Karliovayê.[17-193] Dîsa ji bo êla bi navê **Etmankî tê gotin ku ew êla berê li bakûr û bakûrê rojhilatê Derya Kesk dijîn û ji demekî pir kevn ew hatina dora Silêmaniyê; ji wir jî beşekî bi riya Midyat, Stewr, Mêrdîn, Amed û Qulpê çûne Bedlîs û**

**Araratê**. Hinek ji wan li dora Bedlîsê dimînin ji ber ku Ga yên wan westiyane ji wan re gotine **"Gawestiyan"**. Beşek jî diçin Qastamonû û Antakya.(17-198) Îro li Kirşehîrê gundên Etmanan hene û li gundên Cîhanbeyliyê ji Canbegan re dibêjin Gawestî. Gera wan ê di pêvajoya dîrokê de jî hema hema vê yekê piştrast dike.



**Gundiyekî Etmankî / Etmana / Kirşehir**

Dîtina ku dibêje piraniya êlên Dêrsîmê di sala 1300 an de bi cîh bûbûn jî raste. Lewra bicîh kirina Kurdan bi sedsalan ajot û xuya ye ku Kurd qor bi qor anîne û li cîhên cûda bi cîh kirine. Hinekan jî xwe ji ber zilma dijminan avêtine çiyayên Dêrsîmê. Wê deme êlên hatibûn ev in: **Şêx Hesenan**, Kûreyşan, **Hormek**, Îzol, **Şeydan**, Karsan, **Milan** û **Bamasûr** in.(116-18) Heta sedsala XVI an li Dêrsîmê êlên mîna: **Yîva**, Axaçerî, **Çavûndûr**, Doxer, **Çepnî** û Eymûr cîh girtin. Dîsa di vê demê de Bozûlûs ji zozanên Dêrsîmê îstîfade dikir.(116-22) Di navbera salên 1804-1813 an de jî Rûsan ji bilî axayê Kurdên Êzdî Hesen û Kurdên girêdayî wan, yên din birin meydana şer û bakûrê Qefqasya; ew paşê hatin Anatoliya Navîn..(28) Ş. Firat jî dibêje: Êlên Kurd mîna: **Hormek, Hiran, Qoçgirî, Îzol, Karsan, Şadî, Arili, Alan, Demenan** ji Xorasanê hatin û xwe avêtin bextê çiyayên Dêrsîmê. Ew rastiya di secera ku Alaettîn Keykûbat de

ye; bavekî Elewiyan yê bi navê Derwîş Beyaz de hatiye nivîsîn.[127-28] Heman nivîskar belgeyeka girîng jî pêşkêş dike: Li gundê Şarikê yê girêdayî Gimgimê secereyeka ku di sala 1186 an de hatiye nivîsîn derkete holê. Ew secere di sala 1232 an de ji alî Alaettîn Keykûbat ve hatiye pejirandin. Ew gelek dirêje. Lê di wir de tê nivîsîn ku **12 êl ji Xorasan hatine Ezinganê, Baxin-Qerekoçan û Semsûrê**. Serokên wan jî xelîfên Elewiyan Seyyid Mehmûd-Hayranî yê Xorasanî û Şax Mensûr Baba hebûn.[127-76] Ew êl wiha têne rêz kirin:

**1. Hormek (Baliyan):** Leqaba wan Begên Hurem in û serokê xwe Cafer-Delîsîn

**2. Alan:** Burkent û serokê xwe jî Teymûr e.

**3. Ba-Îlyas:** Huseyn serok e.

**4. Milan:** Muhammet.

**5. Îzol:** Abdullah.

**6. Haydar:** Leqab Qerevel e û serokê xwe Elî ye.

**7. Karsan:** Leqab Şaz e û serokê xwe Mûstafa ye.

**8. Lal:** Leqab Yuruk Ûzûn û Îbrahîm e serok.

**9. Çakir Tahir:** Mehmûd.

**10. Dada:** Muhammed.

**11. Zor Weliyan:** Yûsûf.

**12. Merdîs:** Kulah Dîk û Ebas e serokê xwe.[127-78]

Ew ên îro jî li alî Pîranê, girêdayî wan bavan jiyana xwe dom dikin: Îzol, Heyderan, Karsan, Şahweliyan, Arîlî, Şadî, Milan û li milê din jî Hormek û Hiranê ji du bira ne. Ji jêderên dîrokî tê fêhm kirin ku Selçûqiyan rûyên xwe rind bi êlên ji Xorasanê hatine re nîşan dane û ji wan gelek sûd wergirtine. Li hember Moxolan bi kar anîne û yên mane jî reviyane çiyayên Dêrsîmê.[127-85]

Herçiqas Selçûqiyan Kurd şandine ser dijmin, bi wan cîh girtine û ji wan îstîfade kiribin jî, xuyaye ku ji wan gelek ji tirsiyane. Piştî dewleta xwe bihêz kirin bi şûnde baş dîtin ku Kurd nakevin nava destên wan û kontrola li ser wan gelek dijwar e. Ji aliyê din ve miletekî pir şervan bû. Ji bo vê tê gotin; ku pirsgirêka Selçûqiyan a mezin û herî dijwar pirsa "Tirkmenan" bû. Beşek ji wan, ji ber Îbrahîm Yenalê ku bajarê Rêy dagirkirî reviyan û çûn Ezerbeycanê.[89-8] Li vir jî derdikeve holê ku **bajarê Rêy berê di destê Kurdan de bûye**. Ew Kurdan nedixwestin têkevin bin desthilatdariya Selçûqiyan. Lê Tûxrûl Beg ewna dan anîn û dixwest ewana li hember rojava bikar bîne. Tirkmenan mezinatiya Siltan qebûl kirin lê daxwaza beşdarîbûna seferan qebûl nekirin. Serokên wan got: eger ti zore bidî ser me, emê herin Anadol û Sûriye. Paşê bi rastî jî ew kirin û Mûsil bi bakûrê Mezopotamya ve dagir kirin. Di dema Melîk Şah de (1072-1092) apê wî Kavûrt pişta xwe da Tirkmenan û îddea xwe ji bo text ji dest diçe pêşxist.[89-8] Qasî Selçûqiyan dixwest ji hêza eskeriya Kurdan îstîfade bikin, Kurdên desthilatdar jî ew yeka dikirin:

Yek ji wan desthilatdaran jî Îmadeded-dîn Zengî yê Kurd bû. Wî, ji Yiwa yên li Kurdistanê (Şehrîzorê) bi hejmareka mezin dijîn birek bir bakûrê Sûriyê

sînorê Xeçperestan û war da wan. Serokê wan Yarûk bû. Yiwa yên li Kurdistan mabûn jî, di rêberiya Berçemogûllari de heta dema Moxolan man. Koma herî mezin a li Anadolê, sînorê Bîzans bû, hinek jî di geliyên tenha de bûn.(131-132/152) Wekî berê jî me gotibû; ew ji dora Seyhûnê hatibûn. Dema Celaleddîn Harîzm-Şah hate Ezerbeycanê (1225), li Arran Tirkmen gelek zêde bûn; ji bo piraniya wan nîşan bide gotibû **"keriyên meriyan"**, rêbertiya wan Emîr Husam Kiliç Arslan dikir, dema Moxol hatin ew Tirkmenena ji vir derxistin.(131-155)

Selçûqiyên Asya Biçûk gava Mîrnîşîna Danişmendî ya cîranê xwe di sala 1180 an de ji holê rakirin, Riha jî heynan û dixwestin bigihîjin Gurcîstanê. Lê ew daxwaza nîvçê ma û nikarîn. Her çikas nikaribin herin Gurcîstanê jî deriyê Kurdistanê ji wan ra vebû bû. Di dema Alpaslan de, Saltûka Erzirûm; Mengûca Ezingan; Danişmenda Sêwas; Afşîna Antalya; Kutalmişoglû ji Anadol ji Bizansiyan paqij kirin. Di 30 salan de Bizansiyan ti li berxwe nedan. Li hember vê hêzên herêmî, li Erzirûm, Sêwas, Meletî, Wan, Qeyseriyê li berxwe dabin jî, Selçûqiyan ew têk birin.(17) Hezên herêmî yên ku tên qal kirin Kurdên niştecîh in û beşekî mezin jî xwedî mirîtî bûn. Heta du cara xwestin Amedê ji destê Merwaniyan jî bigirin lê nikaribûn. Tiştê balkêş eve, ku li gorî V.A. Gordlevskî, da nav leşkerên Selçûqiyan yên digihîştin 250 hezarî de Kurd jî hebûne. Gor texmîna min di nava wan de Kurmancên bakûrê niştecîh tunin, lewra ew xwedî mirîtî bûn. Beşek ji Kurdên li dervayê welat ji sedî sed e; îhtîmaleka din ê mezin jî Kurdên Lerî-Şêxbizinî û hinek Dimilî di nava wan de hebûn ku ew kombînezona Kurdên li dervayê Welat e.

Di dema Keykûbat de jî Selçûqiyan hewl dan ku têkevin nava Kurdistanê, lê nikaribûn ji xeta Mereş, Meletî û Sêwasê derbas bibin. Wê demê li herêmên mîna Riha, Harran, Axlatê, Eşrefên Eyûbiyan desthilatdar in. Li Mêrdîn, Xarpût û Amedê jî milên Artûkogûllari desthilatdar in. Dîsa li Kolik, Semsûr, Çemişkezekê jî Artûkogûllari desthilatdar in û bi alîkariya Eyûbiyan li ser piyane. Dema ku Keykûbat êrîş kir di navbera Artûkogûllari û Eyûbiyan da îttîfaqek tê xuyakirin. Her çiqas îttîfaq kiribin jî, li ber artêşa Selçûqiyan ranawestin, têk çûn û bajarê mîna, Kolik, Semsûr û Çemişkezekê derbasî (1127) Selçûqiyan dibin. Dema li vê dijberiya bi kûrahî dinihêrî, ev pirsa tê bîra mirov: Gelo ew çawa ji Kurdistanê derbasbûn û hatin rojavayê Anadolê? Îhtîmala yekemîn ewe, ku Selçûqiyên-Tirk ji valahiya di navbera mîrîtiyên Kurdan îstîfade kir û hatin. Ya din, dema piştgiriya Alparslan kirin li ser vê peymanek çêkirin, ku Selçûqî dê dest navêjin mîrîtiyên Kurd û ew jî rê bidin wana. Ya sêyemîn jî Kurdên di nava Selçûqiyan de, ji Arran û navenda Xorasanê hatibûn ew riya ji wan re vekirin. Piştî ew li rojava bicîh bûn, êdî dest avêtin mîrîtiyên Kurdên li rojava û Kurdistanê. Di heman demê de 16 melîkên Eyûbiyan bi Artûkiyên Mêrdîn û Xarpûtê ve îttîfaq kirin û çûn ser Selçûqiyan. Artêşa Selçûqî ji Rûs, Gurcî, Frenk û ji lêşkerên Herîzm pêk dihat. Di şerê derketî de koalîsyona Eyûbiyan têk çû û Xarpût kete destê Selçûqiyan û Artûkî ji holê rabûn. Artêşa Eyûbiyan vegerî Misrê. Herîzmên di nav Selçûqiyan de

jî veqetîn, ji Firat derbas bûn û her der talan kirin. Meletî û Xarpûtiyên di bin fermandariya Selçûqiyan de her çiqas xwestibin li dij derkevin jî nikaribûn û têk çûn. Herîzmê xwîn xwar Riha, Harran, Heleb û der dorên wir serûbin kir û riyên bazirganiyê girtin. Bi ser vê de Eyûbî yên Helebê bi Selçûqiyan re hevkarî kirin û Herîzm têk birin.

Heta vir me hewl da destnîşan bikin; ku Tirkmen, Oxûz û beşek ji Selçûqiyan Kurd in û me gelek mînak û bûyer nîşan dan. Prof. Marr jî dîtinen me bi awayekî din dipejirîne: Di dema Selçûqiyan de **Kurd û Tirkmen di alî biyolojîk de gelek tev hev bûn. Heta, Tirkên ku îro li Anadolê dijîn di alî etnîkî û çandî de di bin bandora Kurdan de man**; dibêje. Ew ji bingeha Tirkbûyina Tirkmenan têza xwe ava dike, lê di bingeh de heman gel e. Rastiyeka din jî heye ku fîzîka Tirkên îro li Anadolê bi yên li Asya Navîn ve yan jî bi Tirkên xas ve hevûdû nagre. Gelek Tirk di alî fîzîkî de nêzîkî Kurdan bûne. Eger mirov bibêje: Gelo miletekî Tirk bi rastî jî heye? Mafê me ye...

## Têkçûna Selçûqiyan

Birêz Kocadax dibêje: Bi hilweşandina Selçûqiyên mezin re paralêl, li rojhilat Harîzmşah bi hêz bûn. Êlên koçber ên ku wê demê li Asya Navîn, Turkîstan û Afganîstanê bûn berbi rojava û Anadolê çûn. Kalên êla Baranliya îro li Ezinganê rûdinên yên bi navên **Yazir û Yabgû** çûn Ezingan û Helebê.(17-66) Navê wê yê rastî Beranî ye; balkêşe ku ew bi navê Yazir û Yabgû tenê xwendin ku paşê ew dewleta bi navê Qerekoyûnî damezîrînin. Dîsa me di beşa şaxên Oxûzan de navê Yazgir jî nivîsî bû. Tê wê watê ku Yazgir Beraniyên Kurd in! Di Kurdbûyîna Oxûzan de ti gumana min nîne, wekî min berê jî gotibû di herikandina pirtûkê de emê hewl bidin ku vê yekê îspat bikin. Yek ji 22/24 komên girêdayî Oxûzan jî Yazgir e û derdikeve holê ku ew Beranî ne. Heman nivîskar dibêje: Yîva çûn nava Anadolê.(17-66) Gelek caran jî bi navê Yiwa, Îwa, Yva tên nasîn. Texmîn dikim ku ew konfederasyoneka êlan e, lê navê wê hîna jî sira xwe didomîne. Îhtîmaleka pir mezine ku ji Reşî yan jî Şêxbizinan yek bin. Di berdewamiya vê de dibêje: Eftalîtê (Haytal) yan jî Abdallanê ji **Akhûnan** li rojhilat, rojava û nava Anadolê li cîhên cûda bicîh bûn. Tirkmenên Begdîlî, Avşar û Qerehitayê ji ber Moxolan direvîn û êlên din ên ku ewlekariya xwe nemabûn welatê xwe terk kirin û çûn Anadolê.(17-66) Navê Akhûn dîsa derdikeve pêşberî me û di vir de wek Kurdan tên xuyakirin. Gor texmîna min ew Kurdên Lek-Lor ên li Anadolê û Kurdistana mezin in.

Selçûqiyên Anadolê, bi zora Îlxaniyan belav bûn û hêdî hêdî mîrîtiyên Tirkmen ên serbixwe û nîvserbixwe derketin holê.(82) Di vir de mebesta wî mîrîtiyên Kurd in. Lê belavbûn ne tenê ji ber zexta Îlxaniyan e; wekî me gotibû Selçûqiyan di rêvebiriyê de û di leşkeriyê de cîh nedidan Kurdan; yanê Kurd tevlî dewletê nekirin, ji ber vê jî Kurd tim û tim li hember dewletê di nava tekoşîneke de bûn, vê yekê jî hêza dewletê kêm kir û hundirê wê vala kir. Ji

derve jî zextên Moxolan ew birin belav kirinê. Di wir de sedema herî girîng rola dewletê ya li hember Kurdan e. Dewleta bi hêza Kurdan avabûyî: bi wan re rêveberî û hatina dewletê parve nekir û bi çavên dijminan lê mêzekir. Ji hêzeka mezin û şervanên mîna Kurdan re dijminatî wê dewletê gavekê bi pêşve nabe. Ew yeka ji bo roja îro jî derbas dibe. Dewleta ku Kurd nede kêleka xwe dê tim û tim wenda bike.

Bi hatina Moxolan re, Kurdan dîsa cîhê xwe bi piranî guhartin, lê welatê xwe terk nekirin. Hêza yekemîn a li hember Moxolan rawestiya û têkoşiya Kurd in. Pirtûka Weşanên Zaman vê yekê wiha şirove dike: Ji ber tirsa Moxolan, Tirkmenên li rojhilat û navenda Anadolê dijîn bi hejmarek gelek zêde berbi rojava, Derya Reş, Qastamonû û herêmên çiyayî yên li Antalya komî ser hev bûn. Li ba wan gelek şêx, pîr û baba hebûn. Ji bo wê li rojava (Anadol) ocax hene. Ew ji tevlîheviya rewşa siyasî ya Bîzansan jî îstîfade kir û wek dewlet xwe bi rêxistin kirin. Qeremanî xwedî li mîrasa Selçûqiyan derketin û di nava mîrîtiyên din de statûyeka bilind wergirtin. Cara ewil ew tirki bi fermî bikar anîn... Di nîv çerxa dawî ya sedsala XIII an de Germiyan ji Kutahya derketin û heta rojavayê Anadolê firêh bûn. Bi parvakirina xaka dewletê di navbera zarokan de, hêza xwe kêm bûn û komên di nava wan de jî serbixwe bûn.[82] Bi dîtina min ew îddeaka bê bingehe, lewra Qeremanî mîrîtiyeka Kurd e û li dijî Osmaniyan heta dawî şer kiriye. Piştî têkçûn bi piranî çûn Xorasanê û hîna jî li wir dijîn. Hîna jî bi zaravê kurmancî deng dikin û piraniya wan zimanên din jî nizanin. Di be ku berovajiya vê dîtine rast be; yanê Qeremaniyan tirkî qedexe kiribin.

Dewleta Selçûqî wekî tê mezinkirin nebû; li hember Moxolan ti îrade û tekoşîn nîşan nedan û reviyan. Kralên dewletê rêvîn û paşê jî mecbûrî bac dayina Moxolan bûn. Li hember Kurdan jî pişta xwe dan Moxol û hêzên derve. Lê wekî me li jor jî gotibû, Kurd heta dawî li hember Moxolan rawestiyan û ew bû sedem ku Kurdan xwe bi rêxistin kirin û ne fireh be jî yekîtiyên xwe yên konfederatîf pêk anîn.

## Ol

Bêrî Kurdên ji herêma navenda Xorasanê bên ew di bin bandora Zerdeştiyê de bûn; bi şerên misilmanan re beşekî mezin ji wan ola Îslamê pejirandin. Lê ew bi zorê bûbû û Kurdan gelek sedsalan ji dil bawerî bi vî olê neanîn. Ola xwe ya kevn, bi rengê misilmantiyê boyax kirin, lê di praktîkê de wek berê dijiyan û di jiyana civakî de giraniya ola kevn hebû. Ew yeka hîna jî heye... Bi taybetî jî dema hatin Anadolê, di bin navê terîqetan de baweriya xwe meşandin û xwestin wê belav bikin. Ew yeka di dema Selçûqiyan de gelek belav bûbû û carna jî dibû sedema alozî û serhildanên mezin. Elên ji Xorasan hatibûn bi xelîfeyekî terîqetê ve hatin û rêbertiya wan di sala 1212 an de ji alî Alaettîn Keykûbatê Selçûqî ve hatiye pejirandin. Alaettîn secereyan da wan û

di wan secereyan de mafê xulamtiya êlan daye wan xelîfeyan.[27-23] Rêvebirên dewletê jî xwe tevlî baweriya wan nedikirin û ji bo wan di dereca yekemîn de girtina erdê girîng bû û hê Tirk bi xwe jî bi temamî nebûbûn misilman.

Lê dema Kurd hatin, ola xwe di bin navê Alavî/Elewîtî de kamûfle kiribûn. Vekirî nêdiwêribûn, lê bi navê îmam Elî dikaribûn bi serbestî baweriya xwe bimeşînin. Her çiqas Selçûqiyan rêya sunnîtiyê dişopandin jî, zêde hêza wan tunebû ku ji bo ol seribaniyan bigerînin. Di sedsala XIII an de di cîhên ku Kurd lê dijîn ocax û dergahên girêdayî Elewîtî û Bektaşîtî de tim ayînên olî dibûn. Di dewleta Selçûqî de jî kanûnê ola Îslamê **"Misilmantiya Sunnî"** derbas dibûn. Selçûqî di alî şaristaniyê de gelek paşta bûn. Gelek tişt ji mele û derwêşên Kurd fêr bûn. Derwêşan di alî yekîtî bûnê de jî rol lîstin. Evên ku ji Ezerbeycan, Hewlêr yan jî ji rojhilatê Kurdistanê dihatin xelk ji bo Moxolan jî hişyar dikirin. Gordlevskî işaretê pê dike, ku Selçûqiyan di wextê xwe de bi şev ji tirsa êrîşên koçeran, derî û derwazên bajaran qayim dikirin...[16]

Di serdema Selçûqiyan de, li hember dewletê serhildana herî mezin jî bi rêxistina olî pêk hat. Vê tevgerê hema hema dewlet têk biribû, lê bi alîkariya ji derve, Selçûqiyan xwe di kêlka dawî de rizgar kirin. Rebêrê vê serhildanê **Bav Îsheq**; li mintiqa Keserfûn a girêdayî Samsatê hatibû dinyayê. Îsheq li gundê xwe diçe ber golikan û bi nane zikê kar dike. Bi xwe Kurd e.[39] Navê xwe yê esil Ebûl Beka bû, ji Xorasanê hate Anadolê û kete terîqeta Baba Îlyas.[109-3] Mirîdên Bav Îsheq Tirkmenan, ji wî re digotin **"Bav Resûl"** yanî resûllah ku ew jî li dijî qeîdên misilmantiyê bû.[112-8] Gelek mirîdê wî çêdibin û herêmên mîna Samsat, Kefersûnd, Semsûrê ku Kurd lê dijîn di sala 1240 an de dest bi serhildanê kir û berbi Meletî ve çûn. Slogana wî: **"Dinya malê hemû mirovatiyê ye, ev kedxwarî çima?"** bû, yanî li dijî zilm û kedxwariya Selçûqiyan ya li Kurdistanê dest bi serhildanê kir.[39] Me berê jî qala serhildanên bi vî rengî kiribû ku piraniya wan li Xorasan û cografya Kurdan derketibûn. Bi taybetî jî dirûşma Xûrremîtan (Sûrhalaman) jî ew bû û ew jî îspateke, ku ew ji heman kevneşopiyan û nijadî tenê. Vê kevneşopiyê li Anadolê jî dom dikir.

Lê ser Bav Îsheq jî ramanên cûda hene: di hinek belgeyan de Baba Îsheq-î Xaricî, hinekan de Îsheqî Şamî yan jî Bav Îsheq e. Di cewherê xwe de hemû rast in. Ji bo ku serhildêr e û li dervayê sîstema misilmanan e ji wan re Xaricî dihate gotin; ji bo ku ji alî Şamê hatine, hê êl bi vî navî jî li Xorasanê heye, ew Şamî ye. Di vê serdemê de, elên niştecîh û Tirkmenên hatibûn di hewldana rûniştandinê de bûn. Giyasettin Keyhusrev II an wek serokê Selçûqiyên Anadolê li Qonya di nav kêf û sefa de dijî. Xelk jî belangaz û perîşan û di têkoşîna serkeftina olên (Zerdeştî, Manîzm, Xiristiyanî) xwe de bûn. Îslam jî bi pêşdiket û bi desthilatdariya xwe bi muxalifan re ketibû tekoşînê. Bav Îsheq ji dora bajarê Silêmanî hate Semsûrê. Bi dîtina min ew berê li dora Şamê bû, piştre hate bakûr. Li gundê Keferdizê bi cîh dibe. Li Îranê, ji alimê **Îsmaîlî** Alaaddîn Muhammed perwerda olî dibîne. Paşê tê Yozgatê û dikeve terîqeta Bav Îlyas, ku Bav Îlyas, li 1200 ji Xorasan hate Amasya û li wir ocax avakir û li terîqeta

Babiyîtî belav dikir.[101-111] Baweriya wî qezenc dike şûnde, wek xelîfê serekî tê Semsûrê. Miroveki zana û xatib bû. Di demeka kurt de navê xwe belav dibe û xelk dibêje ew xwedî keramete û tên dora wî dicivin. Girêdana xwe bi peyva "bavik" dianîn ziman.[85-49] Piraniya mirîdên wî Kurd bûn, xaçperest jî hebûn. Di alî baweriya Babaiyan de zelalî tune, lê Prof. Cahen dibêje: Ji dervayê Şîitî û sunitiyê bû. Dîsa heman nivîskar dibêje: Îhtîmaleka mezine ku Germiyanoglû yê li Meletiyê ji Kurd û Tirkmenan pêk dihatiye Êzdî bûn. Ebûl-Ferec jî wek olêkî nû nîşan dide û dibêje: Li dijî îslamê tevgereke pir cûda dest pêkir. D. Avcioglû dibêje: Ev ola di bin bandora olên rojhilatê başûrê Anadolê de bû. Prof. Osman Tûran jî wiha dibêje: Herêma ku ew serhildana lê pêk hatibû Mereş-Meletî ye. Eger em bala xwe bidin ser ola vê herêmê, emê bibînin; ku misilman, xaçperest, şîiyên fundementalîst (Îsmaîlî), Manî û olên kevn tevhev bûne. Tê gotin ku Hecî Bektaşî Welî jî mirîdekî Baba yê saxlam bûye.[39] Wekî hemû nûser û lêkolîner jî tînin ziman, ew li dijî Îslamê bû; lê ne Zerdeştiyeke tam bû jî. Wekî me gotibû, ji ber tirsê di formekî nû de, dikare bibe Êzdîtî, Elewîtî-Sersorî, yan jî tiştekî din... lê ne Zerdeştî, lewra ew rûpala li Xorasanê girtibûn û careka din jî nikarin vekin. Hecî Bektaş jî ji Xorasan hatibû. Wî jî xwest vê hêza di alî siyasî de bi kar bîne û ji derdê gelê re bibe derman.

Siltanê Selçûqî ji giliyan şûnde artêşê dişîne ser Bav Îlyas û ew jî direve Amasya. Bi ser vê de Bav Îsheq gundî, xizan û Tirkmenan li dora xwe dicivîne û di sala 1239 an de serî hildide. Bi dorê; Keferdiz, Semsûr, Kahta, Gerger, Meletî, Elbîstan wergirt û berê xwe da Sêwasê. Ewder jî girt û berê xwe da Amasya yê. Heta vêder şerên kirbûn hemû qezenc kirin. Amasya û Tokat jî girtin lê Bav Îlyas mir; xelk bi hêrs bû û berê xwe da Qonya. Siltan reviya. Siltan ji Rûm, Gurcî, Kurd û Tirkan esker şandin ser Îsheq. Leşkerên Rûmê bi zirxbûn û ji ber vê Bav Îsheq li Kirşehîrê têk çû û hate kuştin.[85-49]

## Di dema Osmaniyan de Tirkmen / Oxûz

Ji çend nûserên Tirk ên ku ji arşîva Osmaniyan sûd wergirtine yek jî bavê dîroka Tirk C. Turkay e û li ser êlên Kurd lêkolîn kirine û pirtûk nivîsîne. Di pirtûka xwe ya heft hezar êl di navê de niqteyeka balkêş tîne ziman: **Êla Kayî ya ku dewleta Osmanî damezirandiye ji Tirkmenên Oxûzan bû**. Welatê Tirkan Asya Navîn e. Lê di nava Tirkên wir de ji alî şaristanî, jiyan û zaravan de cûdahî hene. Ew zarava Tirkan ji hev cûda dikin. Gor vê Tirk wiha beş dibin: Oxûz, Ûygûr, Karlûk û Kalaç in. Di nava Tirkan de, Oxûzên ku Îran û Hindîstan îstîla kiribûn, Anadolê dagir kirin û tê de împaratoriya Tirkan avakirin jî hebûn. Lewra di vê pirtûkê de, êlên me nivîsîn hema hema hemû Oxûz in.[160-10] Dema min li ser vê pirtûkê kar kir, dît ku piranî êlan Kurd in. Tenê, hinek êlên Moxol kiribûn nava wan. Ji bo wê di bingeh de êla Kayî ya ku dewleta Osmanî avakiribû, îhtîmaleka pir mezine, ne Tirk in. Li ser vê yekê, Tanerî ji Ord. Prof. Z.V Togan rastiyekê radigihîne: Mirov bêje: **Osmanî ji**

**koka êleka Oxûzan e zêde ye** û Osmaniyan zêde bi Moxolan ve giredide. Prof. Wîttek jî: îddea ku Osmanî ji êla Kayî ne bi şuphe lê dinêre.[89] Ew nivîskarana di şuphên xwe de mafdar in. Lewra ew teoriya bi temamî li ser ne rastiyê hatiye avakirin. Kayî yên ku li Îznîkê dewlet avakiribûn kalên beşek ji Kurdên îro li dervayê welat in. Pişt re ji alî Tirkan ve hatine belav kirin û helandin.

Tê îddea kirin ku êla cara yekemîn li navenda Anadolê bi cîh bûye **Modanli** ye; ew êla di sala 1184 an de li Haymanayê bi cîh bûye. Tê gotin ku ew girêdayî Mirdêsiya ne.[126-31] Li vê herêmê hîna jî êleka bi vî navî heye, lê ew bi tirkî diaxifin û dibêjin em Tirk in. Şiklê wan jî mîna koçerên ji Balkanan hatiye, yanê ne wek Kurda ne. Cîranê wan jî gundê Mirdêsiyên Kurd in. Dibê ku êla Modanli di vê demê de hate herêmê, ku ew raste û navê xwe da herêmê. Paşê bi êrîşên Osmaniyan ew dîsa vegeriyan welat, lê navê xwe ma. Êlên Tirkên pişre hatine jî ew nava girtin. Yan jî, êla Tirk di nava Mirdêsiyan de li herêmê bi cîh bû. Di belgeyeka di sala 1573 an de tê nivîsîn, ku Ekrad Mûdanli derbasî Haymanê bûne û pêwîste tedbîr bên stendin.[126-31] Li rûpelên pêşde ezê di beşa mîrîtiyan de jî qal bikim ku Germiyan û hêzên din di wan salan de Enqerê kirine bin destên xwe...

Bi hatina Kurd û Selçûqiyan û bi têkçûna Melazgir û bi êrîşên Oxûzan yên gerîlawarî re Bîzans vekişiyan dora Marmara û Stenbolê. Ji vê valahiyê Kurdên koçber îstîfade kirin û hema hema li temamî Anadolê bi cîh bûn. Êla Kinik (di hinek cîhan de jî wek Qayî derbas dibe) li dora Îznîkê bi cîh bû; Germiyanî li destpêkê li Meletî paşê çûn Kutahya û dora derya Ege; Qeremanî li dora Qonyayê û yên din jî li Anadolê cîhên cûr be cûr girtin. Tirk îddea dikin ku dewleta Osmanî li ser bingeha êla Kinik ava bûye. Lê berê jî me gotibû ku xanedana Osmanî bi Kinikan re xisimatî kirine. Tê wê watê ku Osmanî bihêz bûn şûnde, Kinik ji holê rakirin û bixwe bûn xwediyê dewletê. Ew yeka gelek caran pêk hatiye. Dewleta Germiyan jî bi vî awayî ji destê Kurdan derketiye û Beyazît li ser rûniştiye. Osmanî hêdî hêdî bi hêz bûn şûnde, dest bi ji holê rakirina mîrîtiyên Kurdan kirin. Berê; Kinik, paşê Germiyan, paşê Qereman û paşê yên din... Lê Kurd li hemû Anadol, Kurdistan û Bakûrê Îranê xwedî dewlet û mîrîtiyan bûn.

Melîk Şah di sala 1106 an de bû siltan. Di vê demê de Împaratorê Bîzans Aleksî Komnenos kelehan li Anadolê çêdikirin û xelk lê bi cîh dikir. Di sala 1116 an de Aleksî bi artêşeka mezin hate Eskîşehîrê û li Bolvadînê şer bû. Ti alî serkeftin bi dest nexist. Melîk Şah aştî xwest; lê Tirkmenan ji vê yekê heznekir û birayê wî Mesûdê I an wek siltan îlan kirin. Di şerê nav herdû birayan de Melîk Şah têk çû. Di êrîşên Tirkmenan yên heta sala 1147 an de şer bi Bîzansiyan re dom dikir. Ji vê tarîxê bi şûnde, Mesûd rihet bû û ji bo ku Tirkmen ji wî re nebin tehdît di salên 1147-1156 an de ew bi cîh kirin. Di lêkolînan de 300 cîhê ku wê demê hatibûn avakirin me tespît kir. Tirkmen 80-100 salan wek nîv-koçer dijîn. Ji kevirê goran heftên xwe di şiklê beranê de ne, ew jî dide xuyakirin ku wan mirovana bi Beranî û Akkoyûniyan ve têkiliya xwe hebûne.

Mumkune ku têkiliya wan ê olî jî hebe.[191-32/33] Ji wê demê de xuyadike, ku Tirkan kengê xwe bi hêz dîtine, ya ji bo helandinê Kurd bi cîh kirine, yan jî ew ji holê rakirine. Ewên ku li wir bi cîh bûbûn jî pêşengên Germiyan in û raste ew Beranî ne. Ew 300 cîhên ku hatibûn tespît kirin jî tenê li dora Afyonê ne. Bi rû vê de gelek cîhên din ên li navenda Anadolê hene ku mirov nikare bihejmêre.

**Kurdên Zaza jî di sala 1240 an de bi rêberiya Şemsettîn Muhammed de dewleteka bi navê "Padîşahiya Gor-istan û Sîstan" avakiribûn. Ji vê binemalê heşt padîşahan ew dewleta birêvebirin. Herat, Goristan, Gerecistan, Sîstan, Serbidaran û Memelikîne bû ewên ku dewlet îdare kirin. Ev Dewleta, ji êrîşên Cengîz Xan bi şûnde li herêmên Goristan û Sîstanê hate avakirin. Di sala 1371 an de hilweşiya.**[59] Dîtinên pareleî vê, ji alî gelek nûseran ve tê parvekirin, ku yek ji wana Îzady e: Deylemî kalên Zazayên îro li bakûr in. Xanedanên Deylemi yên girîng ev in: Bawandî (665-1349) başûrê Xezer; Ziyarî (927-1090) li Tabarîstan û Gûrgan; Kengariyan (916-1090) (Mûsafirî/Salarî) li bakûrê rojavayê Îran; Cestanî (sedsala VI-XII) li Gîlan, Rûyan û Talîş; Şebînkanî (1008-1119) Kirman û Fars û Kakûyî yên li navenda Îranê.[154-105] Pêncî sal BÎ, kalên Zaza-Dumbeliyên îro yanê Tirkên Part, ji alî Belh û Bexteriyan hatin Îranê; hinek Zaza jî Tirkên Etî ye ku ji sînorê Îranê derketinê.[127-6] Zaza, ji ber dagirkirina Ereban ji Îranê derketin û çûn çiyayên rojhilat-bakûrê bilind. Her wiha ji şaristaniyê derketin û çûn derên bê deng.[127-13] Di beşa kalê Kurdan de, me ew babeta vekiribû ku ew nivîskarana jî piştgiriya ditinên min bihêztir dikin.

Memlûkiyan, êlên Tirk û Kurd, bi armanca eskerî li Sûriyê, Libnan û Filistîne bicîh kirin. Ji bilî vê, di sala 1267 an de ji alî Baybarsê I an ve Tirkmen, li hember Xaçperestan wek muhafiz li keviya peravê hatin bi cîh kirin.[155-7] Kurdên îro li dora bajarê Lazqiyê û li çiyayê Elewî dijîn û bi temamî heliyane îhtîmaleka mezine ku wê demê bi cîh bûn. Lewra ew îro tenê dizanin ku ew Kurd in. Wekî din asîmîle bûne. Wekî nivîskar îddea dike, em li vê herêmê rastî Tirkan nehatin, lê Kurd hene. Heta malbata serok komarê Sûriyê Esad jî Kurd in û ne dûr e ku ji van Kurdana bin. Ew jî beşekî Reşiyan e. Hebûna Kurdan ya li Sûriyê her caran tê niqaş kirin; Mamoste Îsmet Şerîf Wanlî li ser vê babetê wiha dinivîsîne: Hebûna Kurdan ya li Sûriyê heta dema Entîk diçe. Wek mînak li çiyayên Elewî û Bakûrê Libnanê û li dora bajarên Hama, Humus gelek cîhên Kurdan yên eskerî û feodal hebûn. Di çiyayê Elewî ya ku di navbera Humus û Tarsûsê de keleheka Kurdan hatiye çêkirin ku niha jî Ereb jê re dibêjin **"Hîzan el-Akrad"** (Keleha Kurdan). Li ser rêya Antaqyayê û ji bo parastinê cîhek stratejîk e. Kurd ji dema Selefkiyan (BÎ 312-64) vir ve lê dijîn. Li vê demê êlên Kurdan wek lêşkerên profesyonel û cotkar xizmet kirine.[63]

Gerokê Tirk E. Çelebî dinivîse ku ew çûye Rakka û dora wê û gelê wir hemû Tirkmen in. Piştre em çûn Mereşê û li ser çiyayekî hewzekî heye û ji Mereşê sê seetan dûr e. Di dema kevn de Cemcîm li van zozanan 70 hezar pez, bizin, gamêş û ga yên xwe hebûne. Wana didoşin û şîr berdidin wî hewzî. Ji

wir ew şîra diçû qesra Cemcîma li Mereşê. Li wir li gelê belav dibû. Li wan çiyan û navçeyana bi temamî Tirkmen rûdinên. Ew ji Bûhara hatine wir. Ji Maveraûnnehîr bi navê Danişmend, Selçûq, Akkoyûnlû hatine Anadolê û li vir cûda cûda cîh dagirkirine.[96/III/39] Tenê di navkirinê de ew Tirkmen bi kar tîne, ji bilî vê binav kirinê, dîtinên wî bêalîne û hîn zêde nêzîkî rastiyê ne. Ew niqtên tîne ziman jî nîşan didin, ku Kurdên ji navenda Xorasanê hatibûn çiqas dewlemend, pêşketî û di nava jiyaneka kolektîv de bûne. Ew dewlemendî hemû ji alî Tirkan ve gav bi gav hate xwarin û di dawî de ew Kurdana bûn muhtacê nanê tisî...

Li başûrê Anadolê jî, di nivîsên sedsala XIV an de êlên mîna Dulqadir û Remezanî (Yurexîr) derketin holê ku wana berê li wir hatibûn bi cîh kirin û paşê jî mîrîtiyên xwe avakirin û bi vî awayî bûn xwediyê bakûrê Sûriyê.[31-2]

Li başûrê Kurdistanê jî gelek êl hebûn ku hinek ji wan paşê hatin dora Mereşê. Şerefxan radigihîne ku li Lorîstana biçûk êlên Kurd wek: Cengrevî, Ortî, Keriskî, Leşnekî, Rozbahanî, Şakî, **Şadîlî**, Dawûderanî, Mehmedkemarî, ji milê Şelbûrî; Qerene, Zirhnekirî, Fadlî, Stodn, **Alanî**, Kahkahî, Rehvarkî, Derî, Birarinda, Mankredar, Înarkî, Ebûl Ebasî, Alî Mamasî- şaxên wê- yên Cengrevî û Samî, Esban, Şehî û Erkî hebûn. Wana di sala 1156 an de raste rast girêdayî xelîfe bûn. Husammeddîn Şûhlû yê ji Tirkmenên **Avşar** girêdayî Selçûqiyan bû û rêvebirê herêmê bû. Ji êla Cengrevî Şûcaaddîn Xurşîd, ji ber zilma Şûhlû piştgiriya gelê jî wergirt û dewleta Xûrşîdoxûllari avakir.[101-72] Wê demê êla **Baharli** li Şehrîzorê bû û di sala 1469 an de ew Lora têk dibin û serokê xwe jî Korpîr Alî ye.[101-76] Ji êlên li jor yên ku em dizanin Şadî û Avşar paşê tên bakûr. Baharli jî eger Bayindir bin ew jî hatin.

Yawûz Selîm piştî şerê Çaldiran, pişta xwe qewî kir bi şûnde, vegerî nava dewleta xwe û hêzên Kurd ji bo xwe tehlûke didîtin yan jî ewên ku li herêmên baş rûdiniştin rakirin. Hinek kuştin, hinek şandin Kurdistanê û hinek jî ji nava dewlete derxistin. Gor xwe dewlet ji Kurdan paqij dikir ku ew siyaseteka din bû. Firat dibêje: Ji şêre Çaldiranê bi şûnde, Yawûz Selîm bi pêşniyaza Îdrisî Bedlîsî, navên Haltî-Lohorto û Kurd Bav kire Baba-Kurdî û rojhilat jî kire Kurdistan û vegerî Anadolê. Ji bajarên mîna Qonya, Qereman, Teke, Enqere, Qeyserî êlên koçber ên mîna: Milan, Berezan, Qerekeçî, Cibran, Hesenan, Sîpkan, Hayderan, Zîlan, Celalî şandin Wêranşehr, Varto, Mûş, Xinis, Eleşkirt, Patnos, Agirî, Ercîş û Wanê. Wê demê Zaza-Dumbelî li çiyayên Sason, Motkî û Çapakçûrê jî tevê wan kirin.[127-5] Di sala 1510 an de, mafê erdên gelê li Teke (Antalya) dijî, ji alî Osmaniyan ve hate stendin û wan jî serhildan pêkanîn. Bi ser wê ve gelê li wir çû Îranê û bûn alîgirên Şah. Yek ew encam jê derket ku hinek êlan dev ji zend berdan.[156-18] Ew êlên ku ji dora Tekê derxistinî bi piranî Qeremanî bûn. Ew cîhên baş Yavûz nexwest bila di destê Kurdan de bimînin û bê qanûnî ew derxistin... Piştre ew ji dewleta Sefawî re bûbûn hêza mezin.

Di serdema Qanûnî de Badilî yên Oxûz ji 40 êlan pêk dihatin. Navê

yekê ji wan "Kurd Oymaxi/**êla Kurd**" bû. Berî 200 salan êla Kurd Mihmatlû ya girêdayî Canbegan li Kûşadasi (Îzmîr) bi cîh bûn û taxa Tirkmen ava kir. Hin ji vê êlê li Dînarê em di nava Danişmend de dibînin.[89-16]

Me gotibû ku Tirkmen/Oxûz hatin Anadolê bi şûnde dewlet û mîrîtî avakirin. C. Turkay dibêje: Dewleta yekemîn ya misilmanên Tirk Qerexanli û Qadî Bûrhanettîne ji êla Salûr-Salgûra ye. Akkoyûnî ji Bayindir; Qeremanî jî Avşar an; Zulqadîrê jî Bayata yê damezirandiye. Artêşa ku Anadol dagirkiribû bi piranî ji Tirkmenên Oxûz bû.[160-14] Ew jî teyîd dike ku Qeremanî ji Avşaran e, Dulqadir jî Beyat in, ku ji bo lêkolîna me girînge. Dîsa vê ditinê A. Tanerî jî tîne ziman: Tirkmenan 200-300 sal şûnde dewletên biçûk avakirin.[89-9] Mebesta wî ji hatina Tirkan (1071) ya Anadolê bi şûnde ye. Ew: Qerekoyûnlû (1380-1469); Akkoyûnlû (1403-1508). Di dema Osmaniyan de: Qeremanoxûllari (1256-1493) û Akkoyûnî dixwestin têkevin yekîtiya Împaratoriya Osmaniyan. Taybetmendiya wan a bingehîn, ew koçber bûn.[89-9] Emê ji vir û pêde ew dewletên Tirkmen/Kurd ji nêzik ve nas bikin.

## ŞADÎ

Dewleta Şadî, di sala 951 an de, ji alî Muhammed Şeddadê ji êla Rewadî yê ku beşekî Hazbaniyan in ve hate damezirandin.[52] Hinek dîroknûs jî dibêjin ji alî Muhammed Şedad Kartû ve hatiye avakirin.[12-312] Bê guman herdû jî yek kes e û navê xwe yê bi kurdî jî Şadî ye. Wekî di hinek jêderên Ereb, Tirk, Faris û biyaniyan de bi awayên cûda hatiye nivîsîn, lê emê tenê Şadî binivîsîn. Wê hêza han, navê xwe ji wî **Şeddadî** yê di jêderan de derbas dibe wergirtiye. Di zimanê tirkî de bi kesên şervan, mêr û çavnetirs re dibêjin Şeddad; ku ji şîddeta-şer tirkî tê. Divê di zimanê erebî de jî wiha be, heta koka wî ji erebî tê. Şukru Kaya Seferoglu dibejê: Şadîlî/Şadiyan/Şadan, bi navgirtina Şad navdar in, ew ji tê wata başbûx.[91-71] Di kurdî de jî wata xwe; kesên dil şa, kêfxweş de ye. Dîsa eşkere ye, ku berî Şadî jî nav/navên vê zendê yan jî êlên girêdayî vê zendê cûda bûne. Kî dizane ku ne Yiwa, Avşar yan jî hinekên din bin? Ew îhtîmala jî heye...

Dîrokzanê Ermenî Mosedsalaes of Khoren dibêje: Di dema Tikranê Mezin (BÎ 140-155) de, Madî-Medî li herêma çemê Aras in. Kurd gelê ku 1000 sal BÎ li Qefqasyan dijîne. Bi Îslamiyetê re derbasî pêş bûn. Ed Dinûrî jî di pirtûka bi navê "Elahbar Et Tîval" de hebûna Kurdan ê herêmê qebûl dike. Dîsa Dîrokzanê Ermen Leo dibêje: Gelê li navenda **serhildana Babaiyan û Xûremiyan Elbaza çiyayî wek Kurduk** bi nav dibû.[37] Navê dewleta Kurdên Rewadî ya din jî Memlan bû.[37]

Wekî min di beşên Arran, Xorrî û yên din de jî nivîsî welatê Arran ji destpêka dîrokê vir ve warê Kurda ye. Carna vala bûye lê hertim Kurd li wir hebûne. Di destpêka serdema Ereban de jî Kurd li wir hebûn. Gor peymanên di navbera Ereb û Kurdan de: Kurdan dê bac bidana Ereban, lê ol û kevneşopiyên

xwe ya mîna Newrozê dê bi azadî pîroz bikirana. Di wê dema fetîhên Îslamê yên cara yekemîn ên li Arranê, jêderên Ereb qala zenda **Balasakanê** Kurd dikin. Nivîskarên Ereb ji Ezerbeycan re digotin **"Arran"**. Di sedsala X an de li Berda, Rewan û Gêncê qala Kurdên koçber dikin. Îstîşarî dinivîse, ku li ser riya Tîflîsê, di bajarên li ser rê de 'Deriyê Kurd' heye ku ji vê re dibêjin " Bab-ul Ekrad". Kurê Kartûk Mehmed ê Şeddad di sala 951 an de li Gêncê dewlet avakir û heta 1200 an ew berdewam bû. Ji bo ji Alparslan re alîkarî kirin bajarê Anî dîsa dan wan. Di sala 1124 an de bi ser êrîşên Gurcî/Kipçak de leşkerkeşên Şadî çûn Tîkrîta Îraqê.[128-45] Nivîsandina Ereban yê Arranê di cî de ye, lewra ew berê cîhê arê pîroz bû. Deriyê Kurd jî girînge, ji bo min wata vê yekê heye; lewra: beşek ji Kurdên vê re Saka dihatinî gotin di wî derî re, yan jî di vê gelî re ji bakûr ve dihatin û diçûn. Balasakana, ku nûserên Ereb radigînin jî gelek girînge, ew peyva di wata Saka yên bilind de ye. Îhtîmaleke ku navê Şadiyan yê bere ew bû! Ku me berê gotibû Saka kalên van Kurdan in.



**Du jinên Şadî / Erexlî-Konya**

Li dora salên 900 an de em şopa Şadiyan li dora bajarê Mûsil dibînin. Gelo ew li wir niştecîh bûn an jî zivistanan diçûn wir yan jî ji Arranê heta Mûsil di destê wan de bû? Hinek jêder qala serhildana wan dikin. Ne dûr e ku ewên ji bo tola Eba Muslimê Xorasanî li vê herêmê mabin û ji ber zext, bac, xereca Ereban û astengiyê li ser ola wanê Zerdeştî ew mecbûrî serhildanê kiribin. Wekî Seferoglû dibêje: Şadî ji Xorasanê hatin. Di belgeyên Osmaniyan de wek "Taîfa Yorukan" derbas dibe.(91-71) Ez jî di wê baweriyê de me, ku ew ji Xorasanê û Arranê hatin û yekîtiya wan a bilind navê xwe Şadî bû. Ji ber vê yekgirtinê Hezbaniyan di bin rêbertiya Mehmet bîn Hîlal de sala 906 an seri hildan û heta Mûsilê hatin. Waliyê Mûsil Ebûl Hecca li hember derket, lê Şadî biser ketin. Xelîfe Muktedîbîllah hêzaka nû şand, Kurd vekişiyan çiyan û artêşê çiyayê Qendîl û hemû Kurd dorpêç kirin. Ereban rêberê Kurd dixwestin, Kurdan gelek li berxwe dan, lê rê nedîtin û birçî man. Di dawiyê de, ji neçarî M. Hîlal teslîm girtin û Ereban ew li Mûsilê kuştin. Kurd jî çûn Arranê. Di vê navberê de **Îbrahîmê Deysem, dewleta Hezbanî ya Kurd avakir. Paşê Mehmet Rewadî rêvebirî heyna û navê dewletê kir Rewadî**.(19-62)

Hîna Şadiyan dewleta xwe danemezirandibûn, rastî êrîşên Vîkîngan hatin. Me di bêşa Vîkîngan de jî qal kiribû. Di wê demê de Skandînavya gelek feqîr bû, çandinî hema hema tunebû û xelk li wir bi talanê û masî girtinê dijiya. Vîkîngan êrîşî herêm û dewletên dewlemend dikirin ku talan bikin. Tê wê watê ku rewşa Kurdan baş bûye. Lewra Vikîngan li ser keviran nivîsiye ku ewê biçin welatê Şerqê (Arranê) zêr bînin (Pirtûka G. Larsedsalaon). Ew jî dewlemdiya Şadiyan dide xuyakirin.



**Tiştên xemilandinê yên Şadiyan**

Ev yeka ji alî nivîskarê Swêdî Sundberg ve jî tê pejirandin: di navbera salên 760-1050 an de Vîkîngan bihîstibûn, ku dewlemendî ji Bizans û Rojhilata Navîn tê. Bi riya çemên Volga û Dînyeper diçûn Derya Reş, Derya Kesk, Konstantînopolîs û Rojhilata Navîn. Li Bakûrê Derya Kesk kontrola Xezeran (Tirk-Moxol) hebû. Nizanim Derya Xezer/Kesk navê xwe ji wan girtiye? Yan jî hinek dixwazin navê wan bidine Derya Kesk? Li ser vê pêwîste niqaş çêbe. Lê bi nêrîna min navê wî Derya Kesk e; ku Kurdan û pismamên wan ev nava lê daniye. Li vê herêmê gelek gelên din jî hebûn û Vîkîngan xwe baş bi rêxistin kirin û ew girêdayî bacê kirin. Keştiyên Vîkîngan taybet bûn û ji nîşkeva êrîşî gelên derva dikirin û tafilê jî paş vedikişîn. Li destpêkê ew wek kes û grubên serbixwe bûn. Lê ji salên 800 hetanî 1000 an xwe bi rêxistin kirin û tevda digerîn. Vîkîngan ticareta: dîlan, postan, zîv û hingiv dikirin.[73]

Li ser êrîşên Vîkîngan jî nivîskarê Ereb Ibn Miskawaûh (? -1030) agahiyên fireh dide: Rûsên (Ew ên li bakûr rûdiniştin) ji derya Kesk êrîş birin ser bajarê Berda, lê bi 5.000 eskêrên ji bo ku bi kafiran re şer bikin dişêvîtî re rû bi rû man. Baweriya wan ya bi Xwedê hîn zêde hêz dida wan. Rûsan (-Vîkîng-Ş) hetanî eskere dawî ew têk birin. Rûs li destpêkê li hember gelê nerm bûn. Lê paşê xelk kevir avêtin wan û sebra Rûsan teva bû. Bi ser vê de Rûsan sê roj wext dan gelê ku bajêr terk bikin; lê xelk piştî sê rojan jî xwe ji ti deran nekir û xema wan jî nebû. Bi ser vê de Vîkîng derbasî êrîşê bûn. Mêren bajêr kirin mizgeftê û derî li ser kilit kirin. Jin û zarok jî heps kirin. Kesên dîl dikaribûn xwe bi pereyan azad bikirana. Heta wê demê artêşa misilmanan ji 30 hezar esker pêk dihatî hat. Lê Rûsan li wan jî xist. Misilmanan alîkarî ji meywê girtin. Rûsan xwe li hember meywe yê li bajer nikarîn bigrin û meywên li daran hemû xwarin. Paşê hemû bi nexweşiya zik ketin; taqeta wan ya şer nema û têk çûn. Yên saxlem man jî tiştên ku ji gelên bajêr bi zorê girtibûn; jin û zarokên dîl girtî kirin keştiyan û êvarê di çemê Kûra re reviyan. Evên dîl bûne kolê êdî.[73] Kurdên li wir ên xwedî hesp hemû reviyabûn. Ewên ku man jî kal, nexweş û seqet bûn. Nivîskar qala artêşa misilmanan dike, gelo ew Ereb bûn an Kurd bûn, em nizanin. Eger artêşa xelîfetiyê bûye xêre, tê wê watê ku Kurd bi Ereban re di nava aştiyê de bûne. Yan jî, yarmetiya dijminê kevn xwestine. Lê îhtîmal heye ku ew tenê artêşa ji mîrîtiyên Kurdên cîran bê.

Lêkolînerê Kurd birêz Alakom jî dibêje: Vîkîngan li destpêke bi teknîka kevn li êlan xistin; bi vê serneketin û têk çûn. Paşê mecbûr man ku taktîkên xwe bigûherînin. Ji T.J. Arne jî radigihîne; ku ewên li wir dijiyan Kurd bûn û ew êrîşa di sala 943 an de pêk hatiye.[74] Wê katê, hîna jî Şadiyan dewlet avanekiribûn. Jêderên Swêdî li ser vê babetê gelek detayan didin; li ser yek ji wan keviran de tê gotin: Serokê tîma Vîkîngan Îngvar, nêzîkî 30 keştî amade kir û berê xwe da rojhilat… Li ser kevir tê nivîsîn ku Îngvar mirî ye. Lê hinekên din bi gelek zîv, pere û tiştên din vegeriyane.[73] Hîna jî ew perê û alavên ji Şadiyan girtibûn li girava Gotland derdikeve. Heta niha 2000 perên Kurd (Merwaniyan) li Swêdê derketin. Ji vir tê fêhm kirin, ku Şadiyan jî pereyên Merwaniyan bi kar anîne.

Piştî alafê/agirê Vikîngan şerê kevn berdewam dike; ew jî îspate; ku ti lihevhatina Ereb û Kurdan hîna jî nîne. Ibn Al Asir radigihîne; ku di salên 984 an de xelîfe Hamdan Îbn Hamdûn dîsa diçe ser Mûsil. Li wir têkoşîna Xariciyên Kurd û Ereban heye; wana diperçiqîne. Xelîfe li ser rêya Bexdayê kete bajarê al-Hasedsalaniyê. Li wir kesekî bi navê Şaddad, di keleheka mezin de bû ku 10 000 eskerên wî hebûn. Xelîfe artêşa wî têk dibe û kelehê jî dixelîne/xiravê dike.[3-57]

Gor wan agahiyan beşekî ji Şadiyên wê demê li dora Mûsil dijîn. Wekî berê jî min nivîsî, ew ji Xorasan (750) û başûrê Rûsya yê hatin; dibe ku ew dem dema Hûnan be jî. Dema ku li vê herêmê tên tespît kirine rastî berî Îslamê te. Wekî ku Al-Balazûrî radigihîne, serleşkerê Ereb Ûtba Ibn Farkad, Şehrîzor (642-643), Samgan û Darabad ji destê Kurdan girt, gelek ji wana kuştin, ew girêdayî xerecê kirin û heta Ezerbeycanê kire bin desthilatdariya xelîfe Omer.[105-24] Bê guman em nizanin ku ew xelka jî Şadî bûn an na? Lê piştî çend sedsalan em dibînin ku Şadî li Şehrîzor/Rewandûz in, yanê bajarê zorê. Rewandûz bi êla Şadiya ve jî jihev nayên qetandin. Rewandûz-Şehrîzor keleha Kurdên serhilderê. Keleha berxwedanê ye, çend caran artêşa Ereban bi hezaran esker êrîş kir û şerên bi xwînî pêk hatin. Hesnewî kurê Huseyn ku yek ji mezinên Şehrîzorê bû di sala 981 an de ala azadiyê li Demar û Şehrîzorê bilind kir. Xelîfê Bexdayê çar caran artêş şand ser Hesnewiyan lê wan her çar caran jî artêş şikandin.[9-160] Ji wan agahiyan ev derdikeve holê, ku Şadiyên ji Şehrîzor heta Arranê çalak bûne. Mirov dikare herêma Gîlan, Qazwînê jî lê zêde bike. Ew niqta girînge, ku berî Îslamê jî û pişt re jî Şadî li wê herêmê hene û wek tê zanîn herêmeka gelek bilind û çiyayî ye.

Şehrîzor, yanî bajarê hêz û zorê; fermanrewayên wê her dem Kurd bûn û çi kesê xwediyê zorê bûn, bê zehmetî pêşiya xwe radidan û li ciyê fermanrewayê rûdiniştin. Wekî tê zanîn gund û geliyekî bi navê Xelekan li geliyê Xelekanê, gundekî mezine û nêzîkî Koysancax.[157-480] Gelî û gundê bi navê Xelikan jî îspate, ku Xelikî-Reşî di nava Şadiyan de bûne û ew berê li vê herêmê jiyane. Hîna jî beşekî ji Xelikan li navenda Anadolê ku ew girêdayî Reşiyane û beşek jî li Xorasanê serbixwe ne. Gumana min nîne ku Xelikî jî di bin sîwana Şadiyan de bûn, lewra yek ji êla bi hêz ku Şadî pêk tanî jî ew e. Paşê ew êla şervan emê di bin navê Celaliyan de bibînin ku di wir de heman êl in, lê dem bi dem di bin navên cûda de ew xwe bi rêxistin dikin.

Yeşîlgoz jî dibêje Şadî ji başûr, dora quntarên çiyayên Zaxrosan ber bi bakûr ve hilkişîn li Gêncê xwe bi rêxistin kirin. Navê serokê xwe yê yekemîn Mehmûd e. Navê dewletê jî bi navê bavê xwe nav kir û kirin Şadlû an jî Şadîlû.[39] Bi navkirina wek Şadlû ne li gor termolojiya Kurdî ye, di vê de şaşitiyek heye, ew peyva ji alî Osmaniyan ve hate bikar anîn; ya rast Şadî ye. Torî dibêje; Hazbanî di sala 906 an de hatin damezirandin.[38] Şadî beşekî ji wan in. Navê wan jî balkêşe, ku tê wata ewên hêz bilind. Mumkune ku federasyonên êlan yekîtiyek çêkiribin, navê wê jî hêza-bilind lê danîbin. Ji ber jîrbûn û şervaniya Şadiyan,

ew nava pêşket, lê ew jî belav dibin. Di heman salê de Şadiyan herêma Nînova xirab kirin û ji alî xelîfe ve hatin taqîp kirin. Pênc hezar malbat bûn û hatin Ezerbeycanê û li bajarê Salmas bi cîh bûn. Li Ûrmiyê herêma Ûnşû jî di destê Hazbaniyan de bû. Di navbera herdu Zê yan de jî zivistanê derbas dikirin.[38]

Di pirtûka **"Exbarûl Dewle"** de tê gotin; ku Merwanî ji êla Hemîdî ya Kurd in; **Rewandî jî qebîleka ji êla Hezebanî ya Kurd in ku di navbera Hewlêr û Ezerbeycanê de dijiyan û zozanên wan Aşne-Aran bû.**[157-475] Di vê jêderê jî vekirî xuyadike ku ew hêza hanê, di navbera Hewlêr û Arranê de dijiya. Wekî Kurdên din ên koçber, ew jî havînan diçûne Arran, zivistanên sar jî diçûne aliyê Hewlêrê. Seven, niqteka balkêş dide xuyakirin: **Deylemî ji holê rabûn bi şûnde, li Tebrîzê malbateka Kurd ê mezin bi navê Rawadî xuya dibe**. Ji vana ya herî bi nav û deng di navbera salên 1029 û 1054 an de, ji bilî Tebrîzê kesê xwediyê kelehên li çiya yê Vahsûdanê kurê Mamlan bû.[150-15] Yanî berî Şadiyan, li vê herêmê Deylemiyên ku em wek Kurdên Zaza dizanin li vê herêmê bûne. Zaza demeke dirêj li wir serbixwe dijîn; bi hatina misilmanan re ew herêm vala bû û Şadî lê bi cîh bûn.

Bi dîtina min, Şadiyan li Arranê dewleta Kurd damezirandin û xwe baş bi rêxistin kirin bi şûnde, êdî dest bi têkoşîna li hember Ereban kirin. Di sala 971-990 an de Gênc û beşekî Ezerbeycanê jî heynan û ew der bi Divînê ve 100 salan di destê Şadiyan de bû. Di navbera salên 983-1066 an de başûrê Ezerbeycan jî dikeve destê Şadiyan. Piştî vê wergirtinê, yanê di navbera 1051-1060 an de Tirk êrîşî Ezerbeycanê dikin û di 1064 an de Qers dikeve destên wan.[65] Wersiyoneke din jî heye ku dibêje: di sala 1064 an de Selçûqî (Alparslan) hatin ber Anî yê, parastina wê baş bû lê bi îxaneta fermandarê Grekî, ew ket.[184-11] Berî ku Tirk werin herêmê, xuyaye ku îttîfaqa Grek û Kurdan jî heye. Ew îttîfaqa li ser berjewendî, ol û cografya yê bû. Herdû alî jî li hember misilmantiyê bûn; ya din axa herdû aliyan cîranê hev bû û ji bo berjewendiyê herdûyan bû. Bîzansî di vê baweriyê de bûn; ku eger Kurd bikevin, dora dê bê wan. Ji ber tirsê û ji bo ku xwe bi Tirkan şêrîn bidin nîşandan, jî îxanata di xwîna wan de ew mecbûrî hevkariya bi Tirkan re dike. Bi vî awayî jî Şadî têk diçin. Gor dîtina Mînorskî, Şadiyan bi Selçûqî û Bizansan re îttîfaq kirin.[51] Li ser wê îttîfaqê zêde agahî nînin; lê Kurdan li hember Ereban bi Bîzansiyan re, li hember Bîzansiyan jî bi birayên xwe di nava Selçûqiyan re îttîfaqê kirine. Bi taybetî ji di şerê Çaldiranê de ew pêk hat, ku Kurdên di nava Bîzansiyan de derbasî alî Selçûqiyan bûn.

Şadî xwedî du payîtextan bûn: Yek Gênc ya din jî bajarê entîk Divîn bû. Şaxê din ê Şadiyan jî li Anî (1072-1199) ye hukum ajot. Selahaddin Eyûbî jî kurê Yûsûf bin Eyûb bin Şadî bû.[65] Xwedî dû payîtextan bûyin jî balkêşe: çima du payîtext? Ew dide xuyakirin ku Şadî ne homojen in, ew ji çend kon/federasyonên êlan pêk têne û rêvebiriya wan li ser esasê lihevhatinê, yanê nê bi zorê ye. Kon/federasyonên ku dewletê pêk tînin jî herî kêm dido ne. Lê îhtîmal heye ku ew zêdenê jî. Ewê ku em dizanin yek Kon/federasyona Şadiyan e; yan din jî Badilî ne. Yên ku nayên zanîn jî Reşî ne. Ew hersê kon/federasyonên

êlan di bin sîwana-navê Şadiyan de dewletê avakirine. Bi hatina Tirkan re, em dibînin ku têkçûn, belavbûn û hevkariyeka bi Tirkan re heye. Mirov dikare bêje ku her sê kon/federasyonên êlan jihev cê dibin. Şadiyên ji zenda Rewadiyên Arranê tên (951-1088) bi Şadiyên Divînê (1020-1088) ve ji Selçûqiyan re rebertî kirin. Serdarê Selçûqiyan Alparslan ji Arpaçayê heta Agiriyê mîrîtiya Anadolê da Şadiyên Anî (1064-1209) û ew girêdayî Selçûqiyan bûn. Ji kurê Şadî Eyûb fermandarê bi nav û deng Selehaddîn Eyûbî bû.[49] Di belgeyên fermandariya artêşa Tirk de jî hatiye nivîsin; ku **Şadî (951-1174) ji birra Îskit-Saka yê ku tirkî diaxifine**. Milê Gêncê Sedatoxûllariyan di navbera salên 951-1088, milê Divîn 1020-1162, milê Anî yê jî di navbera salên 1064-1200 an de hukumdariyê ajotine. Dema Alparslan hate herêmê, Şadiyên Aniyê, ji wî re pêşengî kirin û wî jî bajar ji wan rê hişt.[44] Tespîta ku ew ji Saka ne girînge û raste. Bi vî awayî jî mirov dibîne ku çawa komên Kurd nav guhartine. Eger mirov ji Hatiyan destpê bike, bi dor dibin Saka, Şadî, Celalî û ji wan jî êlên cûda derdikevin.

Anî ji alî Gurciyan ve hatibe dagirkirin jî, di salên 1165-1174 an de dîsa hate wergirtin. Şadî gelek rewşenbîr bûn û abîdeyên balkêş ji xwe şûnde hiştin.[51] Şadî ji alî Melîk Şahê Selçûqî ve ji holê hatin rakirin. Gelek avahiyên dîrokî yên bi zerafet çêkirin.[12-312] Parçebûna Şadiyan gelek balkêşe. Balkêşiya wê jî piştî serkeftina Alpaslan pêk tê… Gelo ew bû sedema dewletên cûda yan jî yên dijminê hev? Ew beşbûn li ser pirsgirêka olî bû an jî li ser hevkariya bi Tirkan re bû? Yan jî çi bû? Divê ji van pirsan re bersivên bê alî bên ditin.

Gorî Torî radigihîne jî; gava Tirk cara yekemîn hatin herêma Arran li wir bi mîrîtiyên Kurdên wek Şadî û Hazbanî hebûn. Ew herdu mîrîtî girêdayî êla Rewadî (divê Zend be-şoreş) bûn. Wê demê li çiyayên bakûre Ezerbeycanê Celalî; li başûr, ji Erdebil heta Muganê jî êla Çakûrlû dijiya. Li wan warana ji berê ve ew êlêna hebûn.[38] Cemal Reşîd Ahmed dibêje; welatê wan Qerebax e. Qerebax, berî destpêka îslamê navenda desthilatdariya Kurdan e. Heta derketina Îslamiyetê li wê herêmê zaravayên Medan kurdî, tatî, herzenî û talîşî dihate deng kirin. Li Tebrîzê dewleta Kurdên Rewadî heta roja Tirk derketin holê berdewam kir. Di sala 1066 an de Tirkên Oxûz gihîştin Şerwanê. Gorî Mûneccimbaşi, Oxûzan malên Kurdan talan kirin, gelek zêr, sîleh birin û serok Ebûl Esvar di sala 1067 an de mir. Şadiyan di sala 969 an de li Arranê (Bajarên wek Tiflîs, Gênce/Kence, Şemkûr, BILKAN, Alan diketin nava Arranê) kraltî ava kirin.[37] Şadiyan bi Ertûxrûl re şer kirin û ew têk birin. Di sala 1081 an de birayê Melîk Şah Şadî têk birin û di sala 1072-92 an de dawî li Şadiyan hat.

Dema Alparslan êrîşê Aniyê kir, li vê herêmê di navbera Kurd û Gurciyan de tekoşîneke mezin hebû. Alparslan Anî heyna û teslîmî Ebûl-Eswar kir. Lê li derdora salên 1118 –1124 an de bajar dîsa ket destê Gurciyan.[43] Anî di salên 1126-1161-1174 an de ji alî Gurciyan ve hate wergirtin, lê dîsa kete destê Şadiyan.[2-72] Di sala 1126 an de Siltan Sancarê ku li Xorasanê hukumdarî dikir, mîrekî din ê Şadiyan yê bi navê Fazlûn şand û Anî rizgar kir. Di nava xaçperestan de navê Elî yê kurê Saltûk mezin bû. Odorîc Vîtal: **"Cîranê Begê**

**Xarpûtê (Belek) û kralê Medan Elî"** dibêje. Ev yeka tê vê watê, ku Saltûkiyên li Erzirûmê Kurd bûn. Emîr Elî di salên 1102-1124 an de emîrîtiya Erzirûm birêve bir. Fahreddin Şeddad di sala 1155 an de bajarê Anî ji birayê xwe Fazlûn re cîhişt û çû Şamê. Bavê waliyê Şamê Şîrkûh Şadî bi xanedana Şadî ve girêdayî bû. Gûrciyan di sala 1162 an de Qers heynan û merkujiyeke mezin kirin û 30 hezar kes dîl girtin. Di sala 1164 an de Anî dîsa teslîmî Şahînşahê Şadî hat kirin. Di sala 1174 an de dîsa derbasî Gûrciyan bû û di kîtêbeka ji sala 1198 an mayî de tê nivîsîn ku hîna jî Şadî li wir bûne. Bi hatina Moxolan ya di sala 1239 an de, niştecîhê ku lê dijiyan çûn Wan, Îran, Trabzon, Kirim û Astrahanê.[43] Moxolan hêza Kurdan gelek kêm kiribû.

Bi belavbûna Şadiyan re komên jê veqetiyan, bi taybetî li Anadolê gelek mîrîtiyên serbixwe avakirin. Taybetmendiya Şadiyên mezin jî, ew di nava xwe de hemû zaravaxêfên kurdî gîhandine hevdû. Ev bihevre bûn, ê paşê li cografya Anadolê jî xwe bide xuyakirin. Yanê tabloya li Arran hema hema li navenda Anadolê jî derkeve holê. Beşek ji van Kurdên Ler/Şêxbizin bûn. Ji wan re Kurdên Xoyî û Ûrûmiyê jî tê gotin.[32] Wekî tê zanîn ji bo Candariyan (1212-1478) jî dibêjin Xoyî, ku di sala 1357 an de Sînop û Qastamonû di destê wan Kurdan de bû. Malbata Şadiyên ku serokên wan jê derketî, navê xwe Pûrzayî-Bazayî-Bizayî-Yazayî bûye. Tê zanîn ku ew Kurdên ji Dêrsîmê yên nav Şadî jî ji vê binemalê ne, yanê kalikê serokê Eyûbiyan in. Gava ew hatine wêderê bûne du par: **Çemîşgezek û Şebîn Qerehîsar-Amasya**. Di vê demê de li hemberî wana tenê Ermen, Gurc û Rom hebûne. Li destpêke bi hevre hevkarî û îtîffaq kirin. Di sala 1210 an de rêberê bi navê Kurdî dibe serok û tê dîtin ku Selçûqî xwe ji wan diparêzin. Di serdema Selçûqiyan de bi xaçperestan re îttîfaq kir û li dijî misilmanan şer kirin. Ewana, êla bi navê Şadî li Amasya, li Osmancikê û li Çorûmê jî Xalidiyan bicî bûn.[32] Îhtîmaleke ku ew Xalidiyana kalên Xelikên îro li cîhên cûda dijîne. Di salên 1250 an de, ew herêma êdî carekê diket bin destê Qeremaniyan, carekê diket destê Selçûqiyan, Înalyan û Eretnayan. Di sala 1255 an de serok Xayî-Qeco, Kurdên bi navê Candiran ji alî Şebîn Qerehîsarê anîn li hêla Osmanciq û Tokatê bi cîh kirin. Paşê Kurdên bi navê Çarmoryan li alî Çorûmê bi cîh kirin. Di sala 1272 an de Kurd Şah bû serok. Çend kurên wî hebûn û hemû ji êlên xwe ra bûn serok. **Toraq, Şehabeddîn Şadî, Bilo-Bilban, Salar, Seyfeddîn Canbêzar**. Bi hozên li Xorasanê ve navên wan yek in. Di sîstema dewletê de serokê hemû parêziya Ûmeddîn Omer el Lorî ye û balkêş e! Bi êrîşa Hacî Şemseddîn Şadî (Enqere, Çanqiri, Çorûm, Toqat, Sînop, Canîk, Amasya, Ş.Qerehîsar, Qeyserî di destê wî de bûn) ew gela ji Amasya di sala 1337 an de derdikeve diçe Xernoşê.[32]

Li ser Kurd bûyina Şadiyan ti guman nînin û ev yek ji alî hemû dîrokzanan ve tê pejirandin. Heta hatina Tirkan ew serbixwe dijîn û xwedî dewleteke bi rêk û pêk bûn. Gerokekî Ereb dibêje: gelê wir nêzîkî milyonekî hebû.[184-11] Gor wê demê ew serhejmar gelek e. Lê dema mirov li komên ji wan veqetiyan û dewletên din avakirine binêre bi vê hejmarê bawerî tîne. Ji

Şadiyan beşek ber bi çiyayên xwe çûn, hinek çûn rojhilatê Ewrûpa û hinek jî çûn çiyayên Torosan. Li Kîlîkya kraltiya xwe avakirin. Bi hatina Tataran re, 1200, koçberiyeke nû pêk hat. Lê Kîlîkya jî ji alî Memlûkiyan ve di sala 1374 an de hate rûxandin.[184-11] Bi hatina Moxolan re hêza Şadiyan gelek kêm bû; berî wan jî tekoşînên bi Ereb, Gurc, Bîzans û Tirkan yên bi sedsalan ajot de wan gelek zirar dîtin. Bi hatina Moxolên xwînxwar jî ew bi temamî ji hev ketin û belav bûn.

Dema êlên ji Şadiyan veqetiyan hatin rojavayê Anadolê, bi dewleta Rom re rû bi rû hatin. Romê jî xwest Kurdan li hember misilmanan wek tampon bi kar bîne; di esas de taqtîkeka baş bû, lewra Kurdên hatin bi piranî ji kevneşopiya Zerdeştî bûn û li gor misilmanan hîn zêde nêzîkî Romê bûn. Di pêşketina Kurdan li rojavayê Anadolê de rola vê ramanê jî hebû. Di vê demê de, Germiyanan li Meletî hêdî hêdî serokatiya xwe bi pêşxistin; li **Amasya û Qeyseriyê jî Şadiyan serokatiya êlên xwe dikir. Şadî, xwarziyên Danişmendiyan in û bi wan re jî pir li hev nedikirin**. Di nava vê êlê de hozên bi nav û deng mîna; Lorî, Qotorî, Boraqî, Dawûdî, Dewendî û Rawendî hene.[37] Berê jî min gotibû ku di nava Şadiyan de Lerê (Şêxbizin) ji Lora jî hene. Lewra dîroka Lera di gelek pêvajoyan de bi Şadî û yên girêdayî wan re derbas dibe. Hîna jî dûmahiyê wan li Erzirûm, Gîlan, Enqere-Haymana, Qonya û li cîhên din hene. Wekî nivîskar dibêje: Şadî jî digihîjin Rewandî Lez-Lekzan; ne di cîh de ye; ber eqsê vê: Lerê di bin sîwana Şadiyan de bûn. Şadiyên li Tiflîz, Bako, Nahcivan, Şîrxan-Xarpût, Xelat, Erciş, Şimşatê belav bûne. Li ser Rewandiyan Major Rawlensen dibêje li Ezerbeycan 12 hezar nifûsa Rewandiyan heye. Pîresorî, Balekî, **Riso** û Şerwanî ji vê komê ne.[37] Riso, gereg Reşî bin û bi qasî ez tê digêjim Şerwanî jî kalên Sewêdiya ne. Selîm Biçûk dibêje Rewandî 12 ber in: Mamgûrd, Mamsa, Mamsil, Mamxal, Mamlis, Marneyî, Mamkal, Mamiskî, Mamsan, Pêrbal û Gelo ne.

Gor ragihandina Can Kurd, "Dîroka Ibîn Şedad" de ku bixwe dadkarê leşkeriya Selheddîn e û jînenîgariya siltan bixwe nivîsandiye, dibêje: Dayika Selheddîn ji malbata **Harimî** bû. Wê dû kurên din berî Selheddîn anîn dinyayê; yek Şahînşah, yek jî Tûranşah bû. Bavê Selheddîn ji êla Rewadiyan (Rewandî) ê Kurd e. Ew êla jî şaxeke ji êla Kurdan ya mezin Hêzan (371-481) bû. Li navenda Anadolê, bi Cûtikiyên girêdayî Reşiyan re **"Cûtikên Herêmî"** jî tê gotin. Ne dûre, ku herdû peyv ji kokekî derketibin. Ji alî dîrokî ve rastiya vê yekê heye. Rewadî li rojavayê Ezerbeycanê li herêma Dûwîn bi cî û war bûbûn. Rewadiyan berî hatina îslamê nav Kurdan, parêzkarên koçika agirdana Zerdeştî bûn û berî van bûyeran bûbûn stûna dewleta Kurdan Şadî li Tiflîsê (371-481). Navê mîrê wan Fedlonê Sêyemîn bû. Tirkan di êrîşa xwe de ew herêma jî tar û mar kirin; Şadî, bavpîrê Selheddîn Eyûbî yê ku berê xwe dayî Bexdayê ne, ji ber ku wî carekê alîkariyeka mezin ji wezîrê xelîfe re kiribû. Hinek şêxên dînên sofîtiyê alîkariya Selheddîn dikirin. Mîna: Hafizê Rehawî (ji Rihayê), Mûsa kurê Şêx Ebdulqadirê Gîlan-î û hwd.[77] Ji Tikrîta Îraqê jî qederê wan bi riya

Mûsil û ji wir jî bo rêvebiriyê ber bi Şam û Misirê dirêj dibe. Vê yekê jî em ji Şerefxan diyar bikin: Hîmê Siltanên Misir û Şamê jî ji Şadî yê kurê Merwan in. Ew ji esil ji Kurdên Rewend in. Ji binemaleka mezin û serokeşîr bûye. Li gundê Ecdenkanê nêzîkî Dwîn jiyaye. Bi regez digîhijin Fermanrewayên Şadî yên Kurd. Hevçerxê Emîr Fezlûnê III bûye. Dema ku Emîr Qirtî yê Tirkmen welatê wî ji bo Selçûqiyan îşgal kir, Şadî li welatê xwe bûn muhacîr. Di dema desthilatdariya Mesûdê Selçûqî de yek ji sipartedar û karbidestên Siltan Şadiyê kurê Merwan ji bo parastina keleha Tikrîtê hat tayînkirin. Ew mir bi şûnde kurê wî yê mezin Necmeddîn Eyûb li ser kar û barên bavê xwe rûnişt. Birayekî wî jî hebû ku navê xwe Esededdîn Şêrgoh bû. Rojekê li Tikrîtê dostekî Mesûd ê zilimkar dikûjin û Mesûd ji wan dixwaze ku ew welatê wî terk bikin. Bi ser vê de herdû bira çûn Mûsilê cem Îmadeddîn Zengî.[157-105] Ekrem Cemîl dibêje di sala 993 an de li Şamê padîşahiya **Axşadiyan** sererast dibe û li Misir û Sûriyê 40 salan hukumdarî kiriye.[9-159] Divê Axşadî jî şaxekî Şadiyan yan jî ew bi xwe bin, lê ew nava ji ku heynana nayê zanîn; nivîskar vê şirove nake.

Dema Merwanî li Amedê desthilatdarbûn (990-1096) di wê demê de Şadî jî li Anî (951-1088) dewlet bûn. Selçûqiyan di 1049 an de Şadî ji Gêncê avêtin û Anî dan wan û Kurd neçar man ku bi Moxolan re şer bikin.[12-270] Şadî li sedsala X an li Erîvan-Diwîn ê koçberbûn.[12-279] Mîrê Merwaniyan Nasrûddewle ku li Amadê salên 1011-1061 serokatî dikir, bi keçeka mîrê Arranê ye li dora Behra Kesk re zewicî. Herdûyan jî têkiliyên xwe cûda bi hevre hebûn.[74-39] Ew zewaca jî nîşana wê ye; ku Şadî di asta dewletan de û bi rûmet dihatin dîtin. Di nava arîstokratan de jî ew kevneşopiyeke. Berê jî me diyar kiribû ku Şadiyan perê Merwaniyan bikar dianîn, ew pere di kolanên li Swêdê de derketin.

Hukumdarê Amedê Ebû Elî Merwanî, qasid şandin Helebê û keça emîr **Şadûldewle** Şerîf bîn Seyfûdewle B. Hamdan xwest. 200 hezar dîrhem qelen şand. Xwest ku ew bûkê bînin Amedê. Lê bi xwe mir. Berbûka bi bûkê re jî tê ji wê re dibêje: "Xemgîn mebe, tu dibî xwedî warê bav û kalên xwe, tu dibî kralîça Amedê.[137-183] Ew jî gotineka pir watedare û mirov dikare ji vê yekê derxe ku ewên wê demê dizanibûne ku ew ji bakûr çûne Sûriyê.

Şadî ne tenê li Şam û Misirê hema hema li hemû Anadolê jî belav bûn. Bi taybetî jî piştî dewleta Eyûbî hilweşiya, ew careka din koçber û belav bûn. Serokekî ji vê xanewanê em li Amasya dibînin. Di sala 1362 an di ew bajara di destê **Hecî Şadgeldî** de bû, ku li gor jêderan ew Kurd e. Kesên ji vê malbatê tên re Kurtoxûllari tê gotin û di herêmê de, bi navê **"Hukumeta Kurdan"** çûne rêxistinê. Di sedsala XVIII an de Bozok, Amasya û Çorûm wek Ekradî Lek Kazasi derbas dibe.[126-64] Lek/Şêxbizin li vê herêmê gelek dehsalan jiyan em dizanin, lê têkiliya Şadgeldî bi Leran re heye an na, em nizanin. Mumkune ku ew Lerên di nava dewleta Şadî de ne. Li eyelata Amasya, wê demê malbatên dewlemend, xanedan û esîl gelek in. Navê wan; Gumuşluzade, Sûnkûrzade, Torûmtayzade, Halifetzade ne. Hecî Şadgeldî ji Kûtlûzade ye û Kurd e. Mîrîtiya Hecî yê bajarên mîna: Amasya, Tokat û eyelata Canîkê dike nava xwe. Wana

bi navê Kurdoglû (malbata kurê Kurdan) jî binav dikin û navê hukumetê jî Hukumeta Kurda ye; yan jî **"Al-î Kûtlûşah Emeratî"** ye. Ew emerat dixwaze li rojhilat, Mûtahhartene navenda xwe li Ezingan û bajarê mîna: Ezingan, Baybûrt û Tercanê jî di dest de dagir bike. Bi rû wan de begê Kemah û Yelman Begê Çemişkegekê yên Kurd ku girêdayî Mûtahharten bûn û li rojava jî dewleta Eretna heyna nava xwe.



**Muza Şadiyan - Bojnûrd / Neynikxane**

Di dema Yawûz de jî em dibînin Şadî li Amasya û Sêwasê xwedî gotin in. Ew yeka di nameyeka ji Osmaniyan mayî de wiha tê eşkerekirin: Dema Amed ji alî Sersor-Sefawiyan de hate dorpêç kirin, hêzên Osmanî amadekariya alîkariya Amedê dikirin. Lê Yawûz nedihat Amedê û Biyikli jî bê destûra wî nediwêrî ku êrîş bike. Di wê demê de defterdarê Osmaniyan Hoca Nîzameddîn ji Yawûz re xebereke bi vî awayî dişîne: Biyikli Mehmed ku begê Baybûrte û **Begêbegan ê Sêwas û Amasya Şadî Paşa** re rêhevaltiyê bike û ewê herin alîkariya Amedê. Gor bersiva hatî, Biyikli wek serdar û **Şadî Paşa jî bi pênc hezar siwariyan** ve derketin rê. Qerehanê Sersor ew yeka bîhîst û vekişî Mêrdînê. Biyikli xwest ku wî bişopîne, lê Şadî got paşa tenê ji bo Amedê ew wezîfedar kiriye û leşkerên xwe heynan û çû eyalata xwe.(138-496)

Di sala 1908 an de li Mazgîrta Dêrsîmê Şadiyan 500 esker derdixistin û 40-50 sîlehên wan ên nûjen jî hebûn. Nîv girêdayî dewletê bûn û şexsiyetên xwe mîna Îzolan bûn; axê xwe Zulfo bû.(116-106)

Şadî yek ji êlên Kurdan ya pir bi nav û deng û bûyî xwedî dewlet e. Di alî rêxistinî, çandî, civakî, çandinî, avasazî û hunerê de gelek pêşketîbûne. Berhêmen ji wan mane îro negîhiştin destên me, ji bo vê agahiyên me yên li ser wan ji destên diduyan in û ji alî dagirkeran ve hatine nivîsîn. Li Xorasanê hinek tiştên ji neviyê wan re mane bi orjîna xwe li muzeya Bocnûrdê (Neynikxanê-Muza Şadiyan) hene û min dîtin. Gor dema xwe pêşketî ne. Dewleteka bi vê îhtîşamê, mezin û bi qudret ji kijan êl û konfederasyonan pêk dihat, hêzên ku ew pêk dianîn kijan bûn? Ji bo vê emê serî li nûser, dîroknûs û dîrokzanan bidin. Di nava wan de gelek nakokî û ne zelalî heye em dizanin, lê ji bo ku jêder yên destên didû û sisiyan in ew jî xwezayî ye.

Yeşîlgoz êlên girêdayî Şadiyan wiha dinivîse:

**Sêvgarî (Sêvkarî-Sêvika)** yê li Tohlistanê; li 61 gundên Sêwas û Refahiyê; li navça Dêrsîm Mûhûndlûyê bi cîh bûne. Li Qers-Gole; Agirî, Erzirûm jî hene û êla herêmê ya herî mezin e. Li Qonya û Xorasanê jî hene. Nivîskarê vê pirtûkê jî ji vê êlê ye.

**Çakan:** Li navbera Dêrsîm û Bîngolê de û li Ezingan herêma Mitînî bicîh bûne û Kurmanc in.

**Kubatî:** Di navbera Dêrsîm, Kîxî, Karliova, Bîngolê de ne.

**Balaban/Bolobaniz**: Amed, Riha, Enqere, Pulumur (Yawûz gelek zirar da wan).

**Alhas (Atmali) Germiyanî**

**Lertik:** Kîxî û Karliova (gereg ew Lerî bin-Ş).

**Cûnan:** Kîxî, Karliova.

**Oxçiyan: Qerekoçan.**

**Setêr:** Herêma Holhol.

**Îzol:** Riha, Meletî, Dêrsîm, Sêwas, Mazgirt.

**Hiran:** Dêrsîm, Mazgirt.

**Savalan: Dêrsîm, Pulumur (Ji êla Dêrsîmê).**

**Sûrizo:** Dêrsîm, Mazgîrt.
**Rûtan:** Dêrîk, Hozat, Îran, Ezingan.
**Caferî:** Ezingan.
**Demeno:** Çiyayên Mûnzûr.
**Ûsedsalaûvo:** Palû, Dêrsîm.
**Seyidan:**
**Kimsor:** Nazimiye, Sêwas û Mazgirtê hene.[(39)]

Ew êlan hema hema bi temamî tên nasîn û gelek ji wana min di cîh de dîtine. Sêvikan li Qonya çar gund li Xorasanê 60 gund in. Li Semsûrê jî gelek in. Atma jî gelek in û bi giranî li dora Germiyan-Elbîstanê ne. Lera jî li her cîhî ne. Oxçî jî li her derê hene; li Anadolê carna di nava Reşiyan de, carna jî nêzîkî wan tên hesibandin û li Kurdistanê (Qerekoçan) jî gelek in. Di nava sînorên Sûriyê de jî hene. Îzol bi giranî li Maden-Amedê rûdinên. Rûta çar gundên xwe li Haymanayê, li Kadinhanê, li Xorasanê û li gelek cîhên din jî hene. Seyidan di nav Milan, Serê Qaniyê û li Xorasanê hene. Navê êla Germiyan balkêşe, dibe ku ji mîrîtiya Germiyan hatibe û îhtîmaleka mezine ku êlên ew dewleta pêk anî jî yek in. Êlên din ên min ziyaret nekirî jî bi piranî li Dêrsîmê ne. Li ser Kimsoran hevalê birêz Haydar Işik dibêje: Ji 33 gundên Nazîmiyê tenê gundê bi navî Kismor (Kimsor) Kurmancî diaxife. Niha kes lê nemaye; li Mazgertê gelek in. Ji Kismoran xelk berbi Baybûrtê jî koç kirin. Taybetmendiya wan êlana ewe, ku xwedî çandeke gelek nêzîkî hev in. Ji alî fîzîkî, ziman, çandî, rûhî û civakî ve wek hev in. Ew jî îspate ku ew bi hev re jiyane û ew dewleta bi hev re ava kirine.

Asiyanli (Azan), Alîzerlî, Şedadîfer (Şedadê bi hêz), Şedadî Ker (dêw), Şehiyanli, Berhûşlar, Dûmkanlar, Vasillar, Şêx Haydarlar, Şêx Alî.[(104-27)] Cunan: 700 kes in, şafiî ne û li Kîxiyê dijîn û ji koma Şadî ya ye.[(108-68)] Gor heman raporê, Şadî li Qerekoçan û gundên wê mîna: Okçûlar, Akarbaşi, Çayirgulu, Çamardi, Akçîçek û Kizilca dijin, 2873 kes in.[(108-104)] Dîsa li Refahiye û Tercanê 5301 Şadî hene ku ew bi Kurmancî û Dimilî diaxifin û Elewî-Sersor in. Beşdarî serhildana Qoçgirî û ya Kurd 1338 (hîcrî, îro 1428 in) an bûne.[(108-116)] Li Xinisê jî 1000 kes; li Çat û Karliova 3185 kes xuya dikin û Elewî ne.[(108-136)] Li Afşîn-Mereşê 1518 Şadî dijîn, ew Caferî-Elewî ne.[(108-213)] Li Kangal 3341 kes dijîn û Caferî-Elewî ne.[(108-283)] Li Sûrûçê 10. 000 kes dijîn, Henefî û Kurmanc in; bi xismên xwe li Sûriye ve tekildar in.[(108-337)]

Şadî, li Refahiyê-Sêwasê li nahiya Gumuşler, Kabûller, Ardiçlik, Çatalçam û gundên mîna Armûtlû, Kizilînîş, Soxutlu û li navça Tercanê jî li gundên Sarikaya, Armûtlûk û Gokdere hene. Nifûsa xwe 5301 kes in. Ew Kurmanc û Zaza ne, Elewî-Qizilbaş in.[(164-149)] Li Kangalê jî 3341 kes (Kurmanc-Caferî-Elewî); li Mazgîrtê 6908 kes (Zaza-Caferî-Elewî) hene û li Qerekoçan jî 2873 kes (Kurmanc-Henefî) hene. Dîsa li Xinis, Tekmenê 1000 kes (Kurmanc-Henefî) hene. Şadî û Laloxûlari li Çatê hene û hejmara wan 3185 kes in, Kurmanc

in. **Bilikan (Hasesoran)** milekî Şadiyan e û li Eleşkîrtê dijîn. Hejmara xwe 3250 kes in, ew Şafiî û Kurmanc in.(164-151) Li Anadolê Bilikî giredayî Reşiyan xuya dikin.




**Du gundên Bilikan Hesina û Heciyan**

Li Xorasanê jî êla Şadî gelek mezine, nivîskarê herêmî Mesûd Keyhan li ser wan vê agahiyê dide: Boxî (Şêrî, Hecîkî, Huseynî, Mişî), Alanî, Bedrî, Qaçkî, Qerebaş, Kopirî, Keçerî, Meterî, Hemzikî, Çekmaxî, Sirî, Dirî, Îzanî, Qiliçî, Dirîqanî, Înranî, Qordanî (Gordanî), Cûyanî, Qirîvanî, Capanî, Kaqanî, Xinzor, Qereçorî-Qereçorî (= 36 ber?) **a**-Silûr, **b**- Şaqulî, **c**- Develî, **ç**- Qere Welî, **d**- Kersan (Sersan). Li gundên Aşxanê ye mîna: Gazî, Şerebedî Kurd, Şaaba, Kelê Necef, Çîllîk, Qelê Mûsalî, Qelê Melle Hesen dijîn. Di sala 1311 an de / 1932= 18 300 xane ne. Henrî Fîld jî dibêje, di sala 1938 an de 80.000 kes in. Emê di beşa Kurdên Xorasanê de bi berfirehî binivîsîn.

Kurdên ku girêdayî kevneşopiya dewleta Şadî ne bi şervanî û mêraniya xwe jî navdar in. Ew şervanên wan di qada şer de wekî şêr û pilingan û kesekî nedikarî zendê wan deyne erdê. Ji bo vê jî bi gelek dewlet û împaratoriyan re heta belavbûnê bi sedan salan şer kirine. Şadiyên li Xorasanê dibêjin dema diçûn şer, serçavên xwe bi xwînê yan jî bi arangê boyax dikirine; ku dema birîndar bibin bila xwîna wan xuya neke û hêviya hevalên wan neşkê. Vê yekê em li cem Mehmûdiyan jî dibînin. Tanerî dibêje: Wexta eskerên Mehmûdî diçûn şer rûyên xwe bi sor, zer, kesk û spî reng dikirin. Hemû oldar, durist, bi îman û Şafiî bûn.(89-136) Ew Şadiyên qehreman îro têla têla belav bûne, hinek heliyane û hinek ji hev êdî fêhm nakin. Her çiqas bi sedan salan ji Kurdîtiyê dûr ketibin jî, di gewherê nava wan de, wekî di dîroka wan a bi şan û şeref de jî xuyadike hestên Kurdatiyê di dilê wan de pir xûrt in.



JI QOÇGÎRÎ YE JINEKA BI KINCÊN HERÊMÎ-Wêne: K. Gultekîn (164-228)




**Pereyên Şadiyan yên li girava Gotlandê hatine dîtin - Swêd**

# DANIŞMENDIYAN
## (1062/1080-1177/1178)

Ew navê hanê îhtîmaleka pir mezine ku Tirkan lê danîbe, lewra daniş-me/mak ji tirkî tê û di wata şêwirmendî ye. Bê guman navê wan ê esas ne ewe. Piştî Kurd û Tirk hatin Anadolê, di dû gelek şer û têkiliyan de ew nava li van Kurdana danîne û bi vî awayê jî derbasî dîrokê kirine. Berê jî me gotibû ku Harûn El Reşîd di sala 845-956 an de ji bo parastina rojavayê welatê misilmanan, federasyon/ konfederasyon êlên bi nav û deng ên mîna Badilî -ku ji 52 tîran pêk dihat-Şadî- ku ji 125 tîran pêk dihat - anîn û li rojavayê Kurdistanê bicîh kir. Cîhê ku lê bi şûn dike jî Meletî, Ezingan û Baybûrt e. Tê îddea kirin; ku di wan deran de berê jî Kurdên Êzdî, Ermen, Rom û Erebên Xaçperest hebûne. Di dema şerê li hemberê xaçêperestan de bi hevre îttîfaqê dikin û xaçperest ji van deran diçin. Hinek ditin jî hene dibêjin ku di serdema Rewadiyan (802-920) de, ew êlana ji dora Gîlan û Xoyê hatine li wir bi cîh bûne. Dibe ku wê demê bi pişgiriya Rewadiyan hatin bakûrê Kurdistanê. Seyid Bettalê wek rêber tê nasîn jî bi wan êlan re hatiye û li dora Meletî bi cîh bûye. Heta sala 950 an dema wan di tarîtiyê de derbas bûye û di nav Badiliyan de buhuriye. Seyid Ebasê Meletî di salên 900-930 an de bi olperestî û zanîna xwe deng daye. Di salên 1052 an de bi Ehmedê ji qebîla Tiganî-Ticanî-Tîxanî ve li hev nekirine û ew reviyane gundê Xijdewanê yê li Mazenderan. Abdulxaliq li vî gundî tê dinyayê û vî serokî bixwe lêkolîn dikir û xelk pê dişêwirî û ji bo wê navê wan "Danişmend" hatiye gotin.[43]

Gor Prof. Osman Tûran ji **"Tarîx duwel el Îslam"** û **"Mirqat Alê Danişmandiye El Kamîl fît Tarîxe"** radigihîne: Abdûlxaliq di sala 1062 an de, navbera Sêwas û Meletiyê kiriyê bin destê xwe. Bi cîh bûna li herêmê, pêşî li Roma girt, bi Ermen û Gurciyan re jî gelek şer kirin (1070) û zora wan bir.[43] Li gora bi wan hemû hêzan re şer kiriye û zora wan biriye, ew gelek bi hêz bûne. Kara jî wiha tîne ziman: Piştî şerê Melazgirê, yek ji fermandarê ku Anadolu heynayî Ahmet Gazî yê Danişmendoglû li Amasya, Nîksarê mîrîtiya xwe avakir û navenda xwe Sêwas bû.[148-237] Di pirtûka **"387 Nolu Muhasebeî Vîlayetî Qereman ve Rûm Defterî- II"** de tê gotin: Di sala 1071 an de Qeyseri, Havza, Pil Kopru, Canîk, Şarkî Qerehisar, Çanqiri, Çawlî, Çorûm, Amasya û Enqere û der dorên din heytînin. Keça serokê Enqerê ya bi navê Gulnoş Bano yê ji xwe re dike. Di van bajaran de bira û pismamên xwe kirine serdar û serok. Kurdên li wan deran jî bi vê yekê kefxweş bûne. Wek mînak li Kemahê birayê Danişmend Mangug (Mengûc) hakim e. Di sala 1072 an de, serleşkerê Siltan Melîkşah, Emîr Artûk piraniya Anatoliya Navîn heyna. Emîr Danişmend jî dora Kizilirmak, Kelkît û Meletî heyna û Mîrîtiya xwe fireh kir.[117-9] Di sala 1084 an de dimire; di şûna wî de, kurê wî yê bi navê Melîk Ulmeddîn Gazî Gumuştekîn bû serokê hukumetê. Wî serokî, bûka Qiliçarslan revand û li biraziyê xwe mar kir. Li ser vê bûyerê Prof. Tûran dibêje: *Hukumdarê Erzirûm*

*Îzzeddîn Saltûk (?- 1168) bi Siltanê Selçûqiyan Arslan-Şah û Şahê Axlatê Sokmen re îttîfaq kir û Gurcî têk birin. Îzzeddîn dixwest keça xwe bide Kiliç Arslanê II an û derbasî tabîiyeta wî bibe. Bi ser vê de qîmeta xwe di çavê cîranên xwe de ket. Wexta keça wî di Meletî re derbas dibû (1165) dijminê Kiliç Arslan, Yaxibasanê hukumdarê Sêwasê yê ji Danişmendan keçik rêvand.*[43] Îhtîmalek heye ku Danişmend koka Reşiyan an jî ya Milan bin, lewra gelek êlên Reşî di dema fetîhkirina Anadolê de hatin û bi taybet jî dora Sêwasê mirîtî avakirin û piştre jî dîsa vegerîn Xorasan û dora wir. Di belgeyeka Osmanî de îşaretên vê hene. Mumkune herdû konfederasyon di bin sîwana Danişmendan de gîhiştibin hev. Gelek êlên Kurd, di bin navê Tirkmenên Danişmend de derbas dibin. Wek mînak: Kurd Mehmetliyê girêdayî Welî Kethûda, Qere Kurd cemaatî ya girêdayî Koca…Vanê li sencaxa Balikesîr li gundên Omer, Sû Sigirligi, Vîran Han, Tîmûr Kapiyê îskan bûne û li wir fesadî û şîddetê bi kar tînine. Ew ferman di sala 1103 (1691) derketiye.[99-14/89-15]

Di pirtûka bi navê **"Riha Haçli Kontlûxû"** de jî tê ragihandin; ku di sala 1100 an de Danişmendiyan êrîşî ser Ermeniyên Meletî kirin û di sala **1103 an de bajar ket bin destên Danişmendan**. Di heman salê de Boûdoûîn du Boûrg çû ser Sûrûçê. Xelkê Sûrûçê bi Tirkan re îttîfaq kir, lê Tirk ji ber revîn û xelke bajêr di şûr re hate derbaskirin; jin li bazaran hatin firotin û xwîn herikî. Saleke bi şunde, Sokmen disa hat ser Sûrûçê, lê Kurd ji şer vekişîn û Sokmen jî newêrî here ser bajêr. Di sala 1103 an de jî Frankan li Helebê xelke misilman kuştin. Dîsa di heman demê de êrîşî ser Mêrdîn, Rakkayê kirin û kelehên di destê Bedran de girtin û keriyên pêz birin û xelk kuştin. Sokmen tê alikariya Bedran, Frank têk birin lê Bedran dîl dikeve. Li dijî pêşveçûna Xaçperestan Sokmenê Tirkmenî xwedî 7 hezar siwarî û Çokûrmûşê (emîre Mûsil û Nisêbînê, kurê xwe Zengî ye) Kurd yê xwedî 3000 siwarî nakokiyên xwe didin alîkî û îttîfaq dikin.[20]

Rom û Selçûqiyan bi hevre îtîffaq kirin ku dawiyê bidin hukumeta wî. Ji sala 1134 an heta sala 1142 an tim şer di nava wan û Selçûqî û Roma de derdiketiye. Di gava serok Melîk Nizameddîn Yaxibasan de komele bûye du beş. Di nava wî û birayê wî yê bi navê Melîk Eynîddewle de û wî aliyê Meletiyê kiriyê dest xwe. Gor Tûran dinivîsîne, di sala 1164 an de Yaxibasan dimire û Kiliç Arslanê II an welatê Danişmendan dagir dike.[43] Vê demê li Ezinganê mîrîtiya Mengûcikan; li Erzirûmê jî kurapê wan Cîhan Şah hene û Deryam Şah giredana xwe bi Kiliç Arslan re diyar dike. Bi hatina Moxolan re Siltan Aladdîn Keykûbad dixwaze sînorên xwe û Moxolan bi hêztir bike. Ji bo vê, ji mîrîtiyên Kurdên li Erzirûm û Ezinganê ditirse ku ewê bi Moxolan re bibin yek û xwest wana ji holê rake. Di sala 1228 an de Ezingan û Kemah heynan û ew xanedana kevn bi dewleta Mengûcan ve ji holê rabû. Şaxê Mengûcan ê li Dîvrîxî yê dirêj ajot. Kiliç Arslanê II an sala 1175 an de Sêwas û welatê Danişmend bi temamî heyna şûnde, Rûkneddin Şah Silêmanê kurê Danişmend ji bo birêvebirina Dîvrîxî tayin kir. Ji hilweşandina Mengûcan şûnde dewleta **Eretna** dest pê kir.

Taybetmendiya mîrîtiya Danişmend ev e, ku serok û rêvebirên ji alî gel ve ne dihatin pejirandin, ji text dadixistin û di şûnê de yekî din hildibijartin. Wek mînak di sala 1164 an de Hamîd Cemal davêjin û li şûnê kurê apê wî Melîk Îbrahîm (1166) tînin. Şemseddîn Îsmaîl davêjin li şûnê apê vî Nasreddîn Zulnûr (1168) tînin.

Di sala 1174 an de Selçûqiyan Sêwas heynan û mîrnîşîna cîranê xwe di sala 1180 an de ji holê rakirin. Riha jî heynan û dixwestin bigihîjin Gurcîstanê. Hukumeta Meletî jî di sala 1171 an de ji alî Selçûqiyan dawî lê hat dayin. Tirk û Ermenî dibêjin ew ji me ne, lê ne raste.

Îhtîmalêka mezine ku berdewamiya Danişmendan yek jî êla Qerekeçîliyên îro tênî nasîn in. Êla Kutabana girêdayî Şêxanê Qerekeçîlî di nav Danişmendan de navê serok êlekî ye. Dîsa navê Gokçe bi Cerabana vê girêdayî jî di nava Danişmend de xuya dikin. Heta nîşana Qerekeçîliyan "X" di heman demê de ya Avşara ye jî.[99-23] Şêxan/Şêxika, îro li Anatoliya Navîn jî xwedî çar gundan in û girêdana wan bi Milan û Kerekeçîliyan ve heye. Ji bilî wan, li Xorasanê jî ew êla heye û şiklê wan jî dişibin hevûdu. Rastiyek jî heye ku di van şertan de jihevkirina ew êl û zendêna gelek zor e; gor texmîna min ew nêzîkî Milan xuya dikine. Heta mirov têkiliya wan û Germiyaniyan jî meraq dike, gelo ew herdû jî yekbûn?

## ERETNA

C. Turkay dibêje dewleta yekemîn a misilman e, ew çiqas raste em nizanin. Lê îhtîmaleka pir mezine, ku dameziranêrê wê dewletê Qadî Bûrhaneddîn ê Kurd e. Li ser koka wî Sumer wiha dibêje: Ew ji êla Oxûz a bi navê **Salûr** bû; kalê wî yê pêncan ji ber Moxolan ji Harîzmê hatibû Anadolê.[131-184] Tê gotin ku cara yekemîn ew hatine; ji ber Moxolan reva wî jî wek êlên din ên Kurd rastiyeke dîrokî ye. Eger ji ber Moxolan reviyabe wê demê ne êla ku cara yekemîn hatiye Anadolê ye. Lewra berî wê jî êl hatibûn. Prof. Yucel jî dibêje: Malbata Qadî Bûrhaneddînî (1345-) ji Harezmê hatiye Qestamonû û ew li Qeyseriyê tê dinyayê.[35] Koçaş jî dibêje: Li Anî yê çêbû, bavê wî Tirk, diya wî jî Kurd e.[49] Hinek nivîskar dibêjin ew: Di navbera salên 1335-1381 an de li Anatoliya Navîn jiyaye. Eretna, di sala 1343 an de pêşniyaza Çobaniyên li Ezerbeycanê ku roj bi roj bi hêz dibûn red kir û heta rojhilatê Qerehîsarê talan kir û bi mûtefîkê xwe Qeremaniyan ve Enqerê heynan.[31-156] Çobaniyên ku tên gotin Beranî ne (Qerekoyûnî) ku ew jî Kurd in û li dora Erzirûmê desthilatdariya xwe fireh kirin. Îttîfaqa wî ya bi Qeremaniyan ve jî balkêşe. Lewra Qeremanî jî Kurd bûn û li Qeremanê desthilatdar bûn. Niqta din a girîng jî ew e, ku di nav gundên Qerekeçiliyan de gundê Salûr jî heye. Bi vî awayî têkiliyeka Eretna û Qerekeçîliyan derdikeve holê.

Di bin desthilatdariya Alaaddîn Eretna de, bajarên mîna Sêwas, Qeyserî,

Nîxde, Tokat, Amasya, Ezingan, Qerehîsar, Nîksar, Canîk, Dewelî Qerehîsarê girêdayî dewleta Eretna bûn. Eretna bi Dulqadiriyan ve tevhev waliyê Meletiye yê girêdayî Memlûkan, Esendemîr Tazî têk birin. Memlûkan esker şandê ser wan lê tiştek nekirin.(31-157) Di dema vî şerî de, Eretna bi Dulqadiryên li başûrê welatê xwe re îttîfaqê dike ku ew jî Kurd in. Dulqadirî şaxekî Reşiyan e, yan jî Reşî bi xwe ne û têkiliya wan herdûyan heta roja îro jî li ser dostaniyê berdewam e. Yanê ne êlên ji hev dûr in, berovejî gelek nêzîkî hev in. Ji aliyê din ve Kurdan di nava xwe de jî şerê hev dikirin. Heman nivîskar dinivîse; ku di sala 1365 an de emîrê Amasya Hecî Şadgeldî, Mehmet Begê Eretna li Qeyseriyê (hinek jî dibêjin Sêwas) kuşt û di şûna wî de kurê wî da ser mîrîtiyê.(31-158) Şadgeldî ji konfederasyon-dewleta Şadî bû ku Kurd in. Mumkune ku di navbera wan de pirsgirekên sînoran û fireh kirina wan hebe. Lewra, li jor jî me qala Beraniyan kir, ku ew li dijî firehbûna Eretna derketibûn.

Prof. Yaşar Yucel jî dibêje: Bi taybetî jî êrîşên Qerece Begê Dulqadirî li ser bajarên vê dewletê gelek bûn û Memlûkan jî piştgiriya wî dikirin. Di dema kurê Eretna Mehmût, kurê wî Alaaddin de ji ber êrîşên Tirkmen û Moxolan gelê koç kir. Beşek jê çû rojava, beşek jî çû Heleb û Dîlokê. Di vê demê (1365-1380) de emîrê Amasya Hecî Şadgeldî, yê Sêwasê Hecî Îbrahîm, yê Qeyseriyê Qadî Bûrhaneddîn û yê Ezingan (Erdîcan) ê jî Mutahharten e. Bi dîtina me gelek ji vana Kurd in û gelek caran bi hev re şer û îttîfaq kirine. Di sala 1367 an de Tirkmenên Şamê (di gelek jêderan de ji bo Kurdên Anatolî yê te bi kar anîn) û Dulqadiriyan êrîş kirin û Pinarbaşi heynan. Osmaniyan jî Enqerê heyna bûn. Di vê sedsalê de bi taybetî di nav 50 salî de gelek şer û pevçûn di navbera wan de derketin. Yek caran Tîmûr, Osmanî û Memlûkî jî beşdarî wan şeran dibûn. Ji wan serokên bihêz yek jî Qadî Bûrhaneddîn e.(35) Qadî, paşê dibe mîrê Amasya. Ji hilweşandina dewleta Eretna şunde derbasî serokatiye dibe û dewleteka bihêz ava dike. Têkiliyên van emîrana bi hevra pir balkêş in. Mirov dikare bêje wek têkiliyên Kurdan yên îro ne. Wek mînak: Qerecê Dulqadiriyan, bi piştgiriya Memlûkan êrîşî dewleta Eretna dike. Paşê waliyê Helebê Boxarus Beg li hember Memlûkiyan serî hildide û Qerecê re alîkarî dike. Piştî vê bûyera bi ser neketî Qerecê xwe davê paş Mehmedê Eretna û ew jî li dijî zora Memlûkan mecbûr ma ku teslîm bike. Di sala 1353 an de li Qehîrê te kuştin. Dema bi Elî Beg re êrîşî Erdîcan kirin, emîr Mûtahharten ji Dulkqadiriyan (Îbrahîm Beg) û emîrê Pezgewra Kûtlû alîkarî xwest (1379). Dulqadirî bi hêzeka mezin hatin. Di sala 1380 an de desthilatdarê Amasya Hecî Şadgeldî yê Danişmendî bû û di navbera Toqat û Sêwasê de jî cîhekî bi vî navî heye. Şadgeldî di sala 1379 an de ji alî Qadî ve tê kuştin. Di vir de tiştê ji bo me balkêş e ji alî Prof. Yucel ve tê dest nîşan kirin: Di bihara sala 1383 an de Tirkmenên Moxol û yên Şamê dema derketin zozanan, hatin huzura Qadî û girêdana xwe jê re diyar kirin. Di heman demê de xwediye Qeyserî kurê Omer jî gilî kirin û xwestin bila Qadî Qeyseriye heyne. Bi xwe jî ji bo alîkariyê

amade bûn. Qadî razî kirin, lê serdarê Ezinganê ji rojhilat de tehlike nîşan dida û Tirkmenên Şamê ji her demê zêdetir ji bo Sêwasê tehlûke xuya dikirin, ji ber ku gelek bûn. Wana di bin fermana serokê xwe de, ji Gazza heta Amedê bi cîh bûbûn. Di jêderê de, ew bi navê Tirkmenên Şam, Heleb û Kasrîwanê dihatin nasîn. Zivistan li Helebê, li Ûzûnyayla û başûre Sêwasê û li cîhen din jî diçûn zozanan. Ji wan re Şam Tirkmenî (milê Bozoklû) dihate gotin. Qadî, ji bo ku bikaribe li Anatoliya Navîn bisekine, dixwest; şervanên wan qebîlên ku li çiyayên Sêwasê heta Derya Spî dijîn qontrol bike. Li destpêkê bi şêweyekî aştiyane çû ser wan, lê nebû. Elçî ji wan re şand ku bila sînorên Sêwasê terk bikin û bacê bidin. Wan qebûl nekirin û şer kirin, têk çûn û Qadî gelek xenîmet ji dest wan girt.[35]

Bi qasî tê qalkirin, Qadî Bûrhaneddîn serok dewletekî gelek egîd, bi biryar, bi aqil û xwedî şêxsiyet bûye. Têkiliya wî bi êlên dihatine zozanên Sêwasê re baş bûye, ku îhtîmaleka mezine ew Reşî ne. Lê di bin sîwana dewleta wî de kijan êl û federasyon hebûn? Ew pirsa hîna jî li bersiva xwe digere. Wekî gelek nûser jî dinivîsînin: Bi hêzbûna Osmaniyan a li rojava û bi hatina Tîmûran ji rojhilat ve, ew dewleta hanê zêde nikaribû bijî û piraniyan wan dîsa vegeriyan Îranê.

Di sala 1388 an de artêşa Memlûkan bi hêzeka mezin êrîşî Qadî kir û heta Sêwasê hat. Di vî şerî de êlan jî, ji Qadî re alîkarî kirin û artêşa Memlûkiyan şunde reviya. Ji wî şerî şunde Yelboxa (Heleb), Mintaş, Sûlî Begê Dulqadir, Qadî Bûrhaneddîn li dijî Berkûk ê Memlûkî îttîfaq pêk anîn.

Di sala 1397 an de êlên koçber li dijî dewleta Qadî Bûrhaneddîn (Sêwas) û Qeremaniyan hevkarî kirin, di şer de têk çûn û aman xwestin û Qadî ew li dora Qeyseriyê bi cîh kirin. Di heman demê de Memlûkiyan ji tirsa Tîmûr elçî ji Qadî re şandin. Berkûk di nameya xwe de: Artêşa Helebê di emrê te de ye. Tirkmenên Şamê (Kurd) jî di bin îtaatê me de ne û nikarin êrîşî sînoren we bikin! Digot.[35] Bi vî awayî dixwest piştgiriya Qadî bike û ji alîkî ve jî bi wî bide xuyakirin ku gelek êlên herêmî û êlên Kurd jî li pişta wan in. Lê ji bo dewleta Eretna tehlûke ji herdu aliyan ve dihat, ji rojava ve hêza Osmaniyan roj bi roj zêde dibû û ji rojhilat ve jî Tîmûr bû. Piştî salekê Osmaniyan dawî li desthilatdariya Qadî anîn û Tîmûr ji bo serok mîrîtiyên li rojavayê yên ji ber Osmaniyan reviyabûn jî bû hêviyeke nû.

Dewleta Qadî Bûrhaneddîn di sala 1398 an de ji hêla Osmaniyan ve hate rûxandin. Qeremanî jî di sala 1397 an de ji holê hatin rakirin. Bi hatina Tîmûr re serokên mîrîtiyên li Anadolê yên ku reviyabûn, Tîmûr wek rizgarvan dîtin û li dora wî civiyan.[82] Ji vana yek jî serokê Qeremaniyan bû. Tîmûr, dijminê Qadî pirs dike û yek jî dibêje: Serokê Ezîngan Mûtahharettîn xwedî pênc hezar, Qereman 10 hezar, Nîksar-Çelebî şeş hezar û bi hinekên din re jî dijmin in. Muxalîfên xwe jî Moxol, Tatar, Amed û Tirkmenên Şamê jî 20 hezar in gotiye.[31-165] Bi vî awayî hêz û kudreta Qadî derdikeve holê, ku bi weqas hêzan re têkoşiyaye.

# QEREMANÎ/AVŞAR
## (Avşar: Atma, Oxcû, Sine Milî ne)Têrikî û Celikî)
## (1256-1487)

Peyva Qereman ji Erebî tê, Tirk jî vê bikar tînin û ketiye nava kurdî jî; di zimanê me de bi piranî di wata mêr, egîd û bêtirs tê bi kar anîn. Bi vê re girêdayî, hinek jêderên Ereban jî dest nîşan dikin, ku ew nava li mirovên natirse ku li Erebîstanê şer dikire (îhtîmaleke ku Kurdên di nava artêşa misilmanan ji vê êlê re) re "qehreman" digotine. Hinek nûserên Tirk[31-1] jî îddea dikin; ku Qeremaniyan ji ocaxên komirê, komir tanîne Ermenek-Qonya û ji bo rû û kincên wan reş dibûne ji vê re gotine Qereman (mêrê reş). Lê bi ditina min, ji ber mêrxasiya wan ew nava li wan danîne. Dibê ku navê Reşiyan, Tirkan zivirandibe tirkî û gotibin mêrên-reş yanî qereman jî. Herdû alternatîf jî bi mêraniyê ve giredane û Qereman hîna jî serbilind û bê tirs in. Min li Xorasanê konên wan ziyaret kirin, wextê te li çavên wan mirovan mêze dikir te didît ku ew mîna baz û şêran in...Tirs di çavên wan de ti caran xuya nake.. dema pêvajoya wan ê dîrokî û bûyerên li dora wan qewimî jî mirov tîne ber çawan, ew îddea rasttir xuya dike...

Gor dîrokzanê Tirk: Êla Qereman girêdayî zenda Avşar ê ji Oxûzan e.[31-1] F. Sumer, ji devê gelê Qereman wiha radigihîne: Xanedana Qeremanan di wê baweriyê de ne, ku ew ji Oxûz-Xan hatine û birayekî Qeremanî bi navê Oxûz jî hebû.[131-188] Yazicioglû dibêje: ew ji Avşaran in, îhtîmaleka mezine ku raste. Di Selçûqnamê de wiha dinivîse: **"Qereman oğlanları Avşar boyundan erînîn tarafına düşen Etrakun Ulu ve oğulları duru//Kurên Qehremanên ji zenda Avşaran, li alî Etrakûnê mezin û kurên wî dikeve.**"[131-181] Bi dîtina min jî, di nav van îddean de para rastiyê zêde ye. Lewra Avşar bûna vê komê îhtîmaleka pir mezine û girêdana wan ê Oxûzan jî bi wata em didin Oxûzan raste; Ji bo ku Oxûz, berpirsiyarê kalên Kurdên koçber giştî bûn. Yan jî mirov dikare bibêje serokê konfederasyonê bûn. Dema min di zanîngehê de dixwend hevalêkî min ji Amîka Hatayê hebû ku ji êla Avşaran bû û te digot qey ew parçekî ji min bû. Yanê di navbera me de, ji ti aliyan ve cûdahî û ferq tunebû. Ji alî fîzîkî, ziman, hest, mêranî, dostanî, arangî(henek) û hwd...Lê ne dûr e ku Qeremanan ew nava ji hatina xwe ya Anadolê bi şûnde girtibin. Yanê ji ber Tirk û Moxolan reviyan û hatin Anadolê bi şûnde ew nav heynan; navê berê çi bû? Avşar an navekî din bû? Ew lêkolînên kûr dixwaze...

Ûzûnçarşili dibêje dema li rojava bi cîh bûn, beşek jê di sala **1228** an de -dema Alaaddîn Keykûbat I an- li Ermenekê-Qonya bi cîh bûn. Di heman salê de serokê êlê, Nûrê (Nûrê Sofî) kurê Sadûddîn e û kurê wî jî Kerîmûddîn Qereman e (?-1261). Ermenek heynan bi şûnde navê bajarê Kamerûddîn Qereman lê danîn.[31-1] **Kurê Nûreddîn Sofî Qereman navê xwe da malbatê.**[131-181] Xuyaye ku navê êla wê demê guhartine yan jî êdî êl bi navê vî serokî hatiye xwendin. Lewra di nava Kurdan de ew kevneşopiyeke; eger serokê êlê

miroveki hêja, bêtirs û bi nav û deng be, êl bi navê wî tê nasîn û zanîn; ew ne seyr e. Ûzûnçarşili niqteyeka din ê balkêş jî radigihîne: Ji vê êlê beşekî em di nava **sedsala XII an de li Mevaraûnnehr û beşekî din jî em di dema Beranî avabûn de li Ezerbeycanê dibînin.**(31-1) Di nava Kurdên navenda Xorasanê de, bi hatina Tirkan re parçebûnek em dibînin; mumkune ku sedemên olî jî kiribin, lê di serdema Tirkan de ew eşkere xuyadike...Beşa li Mevaraûnnehr jî piştre tê Loristanê û hinek ji wan berbi Arran ve çûn û hinek jî hatin Anadolê. Lê dibe ku ew li Qonyayê jî beşek gîhiştibe yên Arranê û tevhev Beranî avakiribin. Rola wan di avakirina Sefawiyan de jî heye. Liser tarîxa Avşarên li Loristan Sumer wiha dinivîse: Di salên **1135-1136** an de gelek Tirkmen li Xuzîstanê dijîn. Gor "Vasedsalaaf" radigihîne, **Avşar û Salûr ji Deştî-Kipçak (Seyhan) ê hatin Xuzîstan û Kuhê-Gîlûyê**; gereg hatina wan hinek berî vê tarîxê be. Wê demê Yîva jî li Şehrîzor dijîn, Mumkune ku bihevre hatibin. Serokê Avşaran Yakûbê kurê Arslan hebû, piştî wî jî Şûmla hat. Di dema Şûmla de Loristana biçûk jî kirin bin destên xwe. Xelîfê Bexdayê xwest di sala 1155 an de Şûmla têk bibe lê wî artêşa Ereban belav kir. Sala 1159 an de Melîk Şah Şûmla têk bir.(131-271) Wekî tê zanîn di nava êlên Kurd de yeka bi navê Şamlû heye ku niha li Xorasanê bi heman navî dijîn. Ew êla dibêjin ew pismamê Sêvikanî ne, yan jî yek êl in. Herdû jî girêdayî Reşiya ne. Ne dûre ku navê vê êlê ji wî serokê Avşaran Şûmlû hatibe û ew jî têkiliyên wan herdûyan derdixe holê. Heman nivîskar dibêje: **Avşaran ji 40 salan zêdetir mirîtî kirin û di damezirandina Dulqadiriyan de jî cîh girtin.**(131-299) Li pêş emê qal bikin lê dibe bê gotin ku di navbera Dulqadiriyan, Sêvikan û Reşiyan de jî tekilî hene; ji têkiliyan zêdetir heman kok in...



**Qeremaniyê ji bajarê Aşxane**

F. Sumer li ser hatina Qeremaniyan ya Anadolê dibêje: Îhtîmaleke ku bi êrîşên Moxolan re Qeremanî cara yekemîn ji Arranê hatin Sêwasê; li wir beşdarî serhildana Bav Îsheq bûn û piştre ji çûn dora Ermenekê. Li dora Mersîn-Îçelê bi Ermeniyan re ketin têkoşînê û gor Aksarayî jî, bi Selçûqiyan ve ketin şerekî (1261) pir bi xwîn. Gor Yazicioglû jî Qerêman ji Avşaran e; bi rastî jî gor dîroka Ermenî ya anonîm a ji sala 1300 an mayî de tê gotin; ku serokê Avşar Îslam Beg di sala 1254 an de li peravê Îsorya bajarê Cracca (Kiz Kûlesî-Silifke/Mersîn) talan kir.(131-274) Sumer dibêje: Wexta Baybars hate Anadolê, kurê Qereman Mehmet jî êrîşî (1277) ser Qonya kir.(131-181) Mehmet Beg Qonya heyna û şehzadeyekî Selçûqî yê bi navê Cimrî derxist ser text û bi xwe jî bû wezîr. Di cîvînê de biryar girtin ku ji vir û pê ve, di nava qesr û civînan de ji tirkî bêtir ti zimanên din bi kar neyên; tê fêhm kirin ku zimanê hatiye qedexekirin jî farisî ye.(131-181) Ew zimanê hatî qedexe kirin kurdî ye ne farisî; lê tiştê mirov fêhm nake ew e, ku serokekî weqas bi hêz çima destûr dide, ku kurdî bê qedexe kirin? Dibe ku agahiyeka bê bingeh, ya jî berovajiyê vê be jî; yanî tirkî qedexe kiribin...Di dîrokê de gelek caran tê rasthatin ku di pozîsyonên wiha de Kurd xwe didin paş, ti caran nabin serok yan jî şexsên pêş. Di bûyera Eba Muslimê Xorasanî de jî me qala vê kiribû. Xeleka din ê balkêş **Mehmed Beg ê bi wezîr Fahreddîn Alî yê ku Tirkmenan biçûk dibîne re şer dike û zora wî dibe**; lê bi hatina Moxolan re ew vekişî Mersînê.(131-181) Berê jî min gotibû Tirkmen di wata Kurdan de derbas dibe, wezîr jî Kurdan, bi gotineka din nijada Mehmet Begê biçûk dîtiye û ji bo wê şer derdikeve. Ew ji Kurdbûna Qeremanan re îspateka din e. Gazan Xanê Moxolî ji bo Kurdan wiha dibêje: Eger ew Tirkmen û Qeremanî nebiyana, hespên Moxolan heta cîhê ku roj lê diçe ava her in.(131-181) Li ser şerê Moxolan Ûzûnçarşili jî navekî cûda dide: Serokê Nîxde Şerefeddîn Hatir li hember Moxolan serî hilda, ji Qeremanan Mehmed Beg jî alîkariya wî kir. Li hember vê Tirk bi Moxolan ve bûn yek û Hatir îdam kirin (1276) lê Mehmed Beg tekoşîna xwe berdewam kir. Di sala 1277 an de bi sê hezar siwarî Qonya dorpêç kir lê nikarî bigire. Têkiliyên Memlûkan û Qeremaniyan ya wê demê baş in. Paşê Qonya heyna, lê, yekî bi navê Giyaseddîn Siyawûş gote ez kurê Îzzeddîn im kirê Hukumdar. Moxolan paşê Mehmed Beg di heman salê de kuştin.(31-3)

Di hêmû jêderan de qala mêranî û şervaniya Qeremaniyan tê kirin, komeka pir şervan bûye û ti hêz nedikariye xwe li hember bigre. Di nava Selçûqiyan de jî vê tirsê em dibînin û gelek caran di nava Osmaniyan de jî tê dîtin. Kiliç Arslanê IV an ji ber vê tirsê, birayê Qeremanî bi navê **Bûnsûz** (1256) wek rehîne anî qesra xwe û berpirsariya qesrê dayê.(31-2) Di nava gundên li Anatoliya Navîn de, gundekî bi vî navî girêdayî êla Nasûrli heye, dibe ku navê xwe ji wî begî girtibin.

Di dema Osmaniyan de, di navbera mîrîtiyên Kurd û Osmanî de bûyerên balkêş diqewimin. Ew bi serê xwe babeta lêkolîn û têzên doxtoriyê ye...Osmaniyan ji bo firehkirina dewleta xwe her rê bi kar anîn; yek ji wan, ji

muxalîfên xwe yan jî hêzên mezin keç kirine bûk û bi vî awayî erde qezenc kirine. Li ser vê babetê Mûftuoglû dibêje: Mûratê I an li Anadolê di alî yekîtiya Tirkan de gavên girîng avêtibûn. Di vê navbera de Akşehîr, Yalvaç, Beyşehîr, Isparta, Seydîşehîr û Qerexaç bi peran ji Hamîdogûllari kirî. Lawê xwe Yildirim Beyazîd, bi keça begê Germiyan Silêmanê bi navê Şah Dewlet re zewicand û Kutahya, Sîmav, Emet û Tavşanli wek qelenê bûkê tevlî welatê xwe kir. Di vê navberê de tekoşîna Qeremaniyan ya li hember firehbûna Osmaniyan berdewam dikir û li deşta Qonyaye, di sala 1387 an de, di du saetan de ew bela berteraf kir.[133-12] Kêmasiya Kurdên wê demê herî mezin ew e ku axa welatê xwe wek qelen dane; yan jî bi hêsanî dest ji war û axa xwe berdane. Ji ber vê sedeme jî nebûn xwedî tiştekî; belav bûn û tenê ji gelên din re dewlet damezirandin.

Derba herî mezin ji alî zavê Kurdan Yildirim Beyazît ve li Kurdan ket. Wî mirîtî û dewletên Kurd yek û yek ji holê rakirin; yan kirin bindestê xwe yan jî ji rojavayê Anadolê avêtin. Yildirim bi Sirban re (Kosova) aştî kir û êrîşî mîrîtiyên Anadolê mîna Aydin, Menteş, Germiyan, Sarûhan kir û di dawî de jî çû ser Qeremaniyan û Qonya dagirkir. Li hember vê Alaaddîn Beg ji Candaroglû yê Qestamonûyê û Bûrhaneddînê Sêwasê alîkarî xwest; herdû jî heta Kirşehrê hatin û bangî Qereman Beg kirin lê ew neçû. Alaaddîn, dema Yildirim li Rûmeliyê bû êrîşî Enqerê kir û heyna. Beyazît jî bi 170 hezar leşker çû ser, yên Qeremanan 70 hezar bûn. Li Qonyayê şer kirin lê herdû alî jî bi serneketin. Paşê, Osmaniyan 30 hezar şandin pişta wî û ew têk birin. Beyazît di sala 1398 an de dawî li Qeremaniyan anî. Lê Mût, Ermenek, Îçel û Taşelî di destê Şêx Hesenê Qeremanî de man.[31-16] Bi şerê Osmaniyan re jî hêza Qeremanan diyar e, li hember 170 hezarî yên Osmanî ew tenê 70 hezar bûne, dîsa jî nikaribûne wan têk bibin. Li hember Osmaniyan rêberên Qeremaniyan li îttîfaqan jî gerîne, ku ya herî girîn îttîfaqa wan ê bi Kurdên li Sêwas û Qestamonûyê re ye. Eger bigîhiştana hev, îro ihtîmalek bû ku ew li Anadolê desthilatdar biyana.

Îttîfaqa din ê balkêş jî ya bi Xaçperestan re ye: ew hewldana jî nîşan dide ku Qeremanî ne misilman in. Ya jî mirov dikare bibêje misilmantî pejirandibin jî, praktîka wan li dij e. Lewra Osmaniyan di her demê de bi navê Îslamê ew firehbûna xwe pêk anîne. Di salên 1442 an de em dibînin ku Îbrahîm Begê Qeremanî bi Xaçperestan re, li hember Osmaniyan dikeve îttîfaqê û bi vê re Qeremaniyan Enqere, Kutahya, Afyon, Bolvadîn, Beypazari, Hamîdelî şewitandin.[31-25] Li ser ola Qeremaniyan ev hevoka jî gelek agahiyan dide: Gor dîroknûsê wê demê, ji Qeremaniyan re **"Qizil borklû û ayaxi çarikli-Kum sor û ling bi çarix/kaloş"** dihate gotin.[131-181] Ew kumsorî dê piştre bizivre, Sersoritî-Qizilbaşîtî yê. Siltan Mûrat bi Xaçperestan re aştî kir û hemû tola xwe ji Qeremaniyan re veşart. Cîhên ku tê re derbasbûyî kevir li ser kevir nehîşt û dest dirêjiya jinan kirin. Ji Qeremaniyan re Akşehîr, Seydîşehîr, Beyşehrî hîştin.[31-26] Di vê navbera de Îbrahîm Begê Qeremanî bi elçiyê Venedîk Mocenîgo re peyman çêkir.[31-29] Osmaniyan li hember xaçperestan boça xwe

danî, lê Kurd di komkujiyan re derbaskirin. Ji vê yekê jinan para xwe stendibe jî, Qeremaniyan ti caran paşve gav navêtine. Ew tekoşîna bi Osmaniyan re, di dema Pezgewran de jî dom kiriye.

Li Anadolê ji bo Osmaniyan pirsgirêka mabû Qeremanî bûn; pêwîstbû ji bo wan ew çareser bibe, lê ew pirsgirek bû sedem ku Osmanî bi Hesenê Dirêj -hakîmê Îran- re bêne hember hev. Desthilatdariya Qeremanî ya li navenda Anadolê di sala 1468 an de dawî lê hat; lê tekoşîna begên Qeremanan li Torosan hîna jî berdewam bû. Ew yeka bû sedema nexweşiya navbera Memlûk û Osmaniyan jî. Dewleta Hesenê Dirêj ji konfederasyona êlan pêk dihat û dixwest bibe Tîmûrê duyemîn. Di sala 1472 an de artêşa Qereman û Pezgewran Tokat bi erdê re kirin xalî bi şûnde, êrîşê Akşehîrê kirin.[82] Pezgewran, ji Pîr Ahmet û birayê wî yê Qeremanî re, di fermandariya Zeynel Beg de artêşeke ji 30 hezar kesan pêkdihatî şandin. Lê di sala 1472 an de Osmanî di şer de bi serketin.[31-33] Qeremaniyan xwestiyê ji nakokiya herdû hêzan sûd werbigrin, lê ew jî biser neketiye.

Jêderên Tirk dibêjin ku: Qeremanî ji sala 1327 an heta 1417 an serbixwe bûn. Ji wê demê bi şûnde ketin bin destên Memlûk, Osmanî û Tîmûr.[31-37] Lê çima ew heta 1200 naçe? Mirov fêhm nake; lewra wê demê jî Qeremanî ne girêdayî tu hêza bûn. Zagonên Qeremaniyan mukemel bûn û defterên xwe yên erdê hebûn. Şahabettîn Omerî radigihîne ku Qeremaniyan 25 hezar siwarî 25 hezar jî eskerên xwe yên piyade hebûn.[31-37] Li Xorasanê bajarê Bicnûrdê di muza Şadiyan de defterên erdê wan jî hebûn. Dîroka siyasî ya Qeremanan di sala 1475 an de qediya.[89-9] Ji vir şûnde jî mirov dibîne ku dewleta Sefawî tê avakirin û di bingeha vê dewlete de jî Qeremanî hene. Ku kumên sor ji vir pê vê jî bibin Şîitî...



**Deftera erdên Qeremanî**

Gor Şîccarî dinivîse: Kurdan rojekê êrîşî Qonya kirin û ji kurên Xelîl serê 24 şêhzadan firandin (Î. H. Qonyali-Nîxde Aksaray Tarîhî). Paşê Kurdan dev ji êrîşan berdan. Piştî salan, di sala 1655 an de, di nava bajarê Qonya de tevgereke muxelif ava bû û Mehmedê Kurd serkêşî dikir û dixwest bajêr biparêze. Di sala 1655 an de Seydî Ahmet Paşa bû mîrêmîran ê Qeremanê, lê ji ber zilmên wî yên berê, gelê bajer ew nekirin nava Qonya. Mehmedê Kurd bi 3000 sipahiyan ve li bajer ma û xeber ji Ahmet re şand ku bila nekeve bajêr. Şer derket, dewletê ew şandê Helebê.(126-41) Ew jî baqiyê Qeremaniyên ku li Anadolê desthilatdariya Osmanî naskirî û di emrê wan de mane. Di nava Îzolên li Serînde de 14 xanên Qeremaniyan hene, gor rîwayetê ew ji Qonya hatine.(121-139) Qeremanên li Xorasan jî hîn bi navê xwe dijîn û piranî li dora bajarê Aşxanê ne û hinek jî koçer in di konan de dijîn. Min herdû beş jî di sala 2003 an de ziyaret kiribûn.

Di nav vê dewlet-konfederasyonê de kijan federasyon yan jî êl hebûn? Pirsa herî zor ew e. Bersiva vê pir girînge, lê niha em dikarin tenê ji çend nûserên Tirk sûd werbigirin. Êla Tabanli, yan jî Bozûlûs havînan (1750) dihatin zozanên Kûrûca Çol a girêdayî Haymanayê û li Haymanê çandinî dikirin. Ji wê re **"arazî î madûde"** dihate gotin ku li gundê Çomakê ye. Berên xwe jî ev in: Bûlaran, **Qeremanan**, Îmanan, Îfrazan Îmanan, **Bayat û Şêxan** ne. Tabanli li: Aksaray, Çanqiri, Enqere û dora wir, Qeza Kureyş-Qereman, Haymana û Bala hene.(160-156) Ji vê ditinê mirov derdexe ku **Têrikî** yan, têkiliya xwe bi Qeremanê re ji sedî sed heye.

Êla Cibran, ji Qonya, Qereman, Teke û Enqerê ji alî Yawûz Selîm ve hatin rakirin û li Kurdistanê hatin bi cîh kirin. Gor mezinên vê êlê jî ew di sedsala X an de ji Anadolê hatine Riha û Wêranşarê. Ji wir jî di rêbertiya Şah Siwar de hatine Warto, Bûlanik û Karliovê. Hinek jî dibêjin: di dema Beyazîdê II an de, dema Osmanî bi êlên li Anadolê re şer dikir, padîşah êrîşî wan dike û ji Tekê ew diçin Rihayê.(127-66) Îhtîmaleka pir mezine ku ew girêdayî Qeremanan bûn. Lê dikarin girêdayî Germiyan û yên din jî bin. Ew hîn zêde belge û lêkolînan dixwaze. Ji bo hatina wan ê Rihayê, dîtina duyemîn bi me hîn rastir tê. Di wê demê de divê gelek êlên Kurd çûbin Kurdistanê; yên li wir jî rihetî neditibin çûbin Îranê. Tê fêhm kirin, ku Qeremaniyên dawî jî di dema Yawûz de hatine şandin. Tiştê din ê balkêş jî; şaxên Cibranî yên wek: Sûvarogûllari, **Şibil**îogûllari, Araboy, **Bilikî**, Alikî, Memikî, Sincar û Teymûr beş dibin.(127-68) Ji van Şêxbilê, hîna jî li navenda Anadolê gundên xwe hene û ew girêdayî Reşiya ne. Bilikî jî li Anadola Navîn hene ku girêdayî Reşiya xuya dikin. Niqteyeka balkêş jî alî Bêrtiyan ve tê ziman. Bêrtî dibêjin: "500-600 sal berê em li alî Qonya rûdiniştin. Ji ber şerê Osmanî û Qeremaniyan em çûn alî Riha yê. Havînan li çiyayên Şerefettîn, Bîngol û Karliova; zivistanan jî me li Rihayê derbas dikir.(17-200)

# CANDARIYAN
## Şêxbizin-Şivan-Qeren (1212-1478)

Yek ji êl yan jî zendê ku hatibûn Anadolê jî Candariyan in; mixabin li ser wan zêde agahî nînin, lê wekî min îşaret pêkirî îhtîmaleke ku ew şaxekî ji Şadiyan veqetîne. Dema hatin Anadolê li dora Qastamonû, Sînop, Çanqiri û Enqerê mîrîtiyê avakirine. Bi qasî mirov li pêvajoya wan ê dîrokî dinêre, xuyadike, yan jî ez texmîn dikim; ku ew kalên Kurdên Lek ên îro li Anatoliya Navîn dijî ne. Lê ew ne misoger e, dikare şaş be jî. Gor Prof. Ûzûnçarşili radigihîne Candariyan li dora Qastamonû, Sînop û derdorên wir mîrîtiyan avakirin û bi eslê xwe ew Tirkmen in. Serokê xwe jî Şemseddîn Yaman Candar e.[31-121] Wekî Kurdên din ewana jî wek Tirkmen binav dikin, em li vê yekê seyr namînin. Lê serdema hatina van Kurdan di dema Ebasiyan de, yan jî ji ber Tirk û Moxolan revîn hatin vir ne diyare. Gor tê texmîn kirin, ew li dora salên 1200 an de hatine, dibe ku ji ber Moxolan reviyabin.

Berî hatina Selçûqiyan, ew li dora Xoy û Ûrmiyê bi navê Kurdên **Şivankaran** dijîne. Li cîhê ku ew lê dijîn mirov mêze dike, Lek bûyina wan dibe îhtîmaleka zêde. Lewra ew ji başûrê Kurdistanê heta derya Kesk belav bûbûn. Ji wan re Benî Şivankaran-Benî Şibankaran jî dihate gotin. Ku tê wata kesên karê şivantî dikin an jî kesên şivantiya karan-bizinan dikin e. Îro ji wan Kurdan re li Anatoliya Navîn **Şêxbizin** tê gotin ku nêzîkî hev e.

Di sala 1357 an de, Sînop û Qastamonû di destê Kurdên Candaryan de bû.

Di hinek jêderên Ereban de tê nivîsîn; ku ew ji bo sînorên misilmanan biparêzin hatin Anadolê. Eger ew dîtin rast be, ew di dema Ebasiyan de hatine. Dîsa di heman jêderan de tê gotin; ku **Ew digihîjin Şibankarên Loristanê**. Ew dîtina me rasttir dike ku koka wan li Loristanê bûye. Gava hatine li dora Qastamonû, Çanqiri, Sînop û Enqerê bi cîh bûne, navê wan ê berê li wan kirine û ji wan re gotinê: **"Xoyan-Xoyli"** (Tarix Dûwelîl Îslamiyê, Taqwîmê Meskûkatê Qedîm, Îbnî Bîbî, Tarîxê Kurd ve Meşahîr). Xuyaye ku nav ji alî Tirkan ve lê hatiye dayîn û bi tirkî tê wata kesên ji Xoyê hatine. Lê navê wan ê orîjînî bi zanistî nenivîsîne. Di sala 1212 an de Husameddînê Xoyî di bajarê Qastamonû de hukumdariyê kiriye. Vê hukumeta Şibankaran li ser êrîşên xaçperestan, bi Selçûqiyan re tekiliyên xwe baş kirine. Kurdên Xalda jî hatine Qestamonûyê û ji Kurdên Xoyê baştir xwedî li xwe derketine. Piştî ku Osmanî hatine ser Menteşiyan û Germiyan, ew jî zanîne ku dê rojekê dor were ser wan û tekiliyên xwe ji Osmaniyan birîne. Di salên 1440 an de bi Osmaniyan re gelek şer kirine û paytextê xwe birine Sînopê. Di sala 1473 an de dawî li vê hukumdariyê tê. Di beşên pêş de wek berdewamiya wan, lê di bin navê Lek-Şêxbizin de emê hewl bidin ku dîroka wan bişopînin.

Wekî me berê jî nivîsî: Di şerê navbera şehzadên Selçûqî de, Yaman Çandar piştgiriya G. Mesûd dikir; di şerê pêk hatî de, Çandar artêşa

Muzafferûddîn Yavlak Arslan belav bû. Ji ber vê yekê Qastamonû û dora wê dan Çandaran.[31-121]

## DULQADIRIYAN-ZULQADIRIYAN (1339-1521)
### (Sewêdî, Avşar, Oxçû, Beydili-Milan, Zerikî, Têrikî, Bayat)

Bi hatina Tirk û Moxolan ya berbi rojava re, Kurdên li navenda Xorasanê, bi piranî reviyan Kurdistan, Anadol û Sûriyê. Ew derbeyeka mezin li rêxistina Kurdan xist, hemû belav bûn û berbi gelek cîhên cûda ve çûn. Hinek ji wan jî di nav gelên din de heliyan. Piştî rûxandina dewleta Şadî û Merwanî jî ew belavbûn hîn leztir bû. Li rojavayê Anadolê bi dehan mîrîtiyên Kurd hatin avakirin. Dîroknûsên Tirk ew wek Tirk nîşan didin, lê ew yeka ji rastiyê dûr e. Eger rêberekî bi hêz û bi biryar derketibiya û ew mirîtî wek Şadiyan di bin sîwana dewletekê de komkiribiya, îro Kurdên li Anadolê jî dê xwedî dewlet bûna. Wek tê zanîn ew yekkirina ji alî Tirkan ve pêkhat. Yanê li ser hestiyên pişta Kurdan wan dewleta xwe damezirand.

Ji komên ji Xorasanê hatinibûn yek jî ji alî Tirk û Ereban ve wek Zulqadir, yan jî Dulqadir tê binav kirin. Lê di bingeh de navê wan ê rastî ne ew e. Mirov dikare texmînek bike, bibêjê ku ew nava ji serokê wan Qadir hatiye; di kurdî de "dul" di wata zarok û tov de ye ku tê mana zarokên Qadir. Navê xwe yê kevn çi bû? Bersiva vê pirsê ne hêsan e, lewra hemû belge di destê serdestên me de ne û li gorî dilê xwe şirove dikin û bi gelê didin qebûl kirin. Prof. Y. Yucel jî dîtinê me piştrast dike: Di dîroka Osmaniyan de Zulqadir, di jêderên Misir û Sûriyê de jî Dulqadir derbas dibe û wek kok jî Xorasan derbas dibe. Ji berê ve li aliyê Mereş û Elbîstanê rûdiniştin. Bi dewleta Memlûk re girêdayî berbi Meletî, Xarpût ê fireh bûn. Hukumdarê xwe yê yekemîn Zeyneddîn Qaraca ye. Serokê êlê, ji bo qehremaniya wî siltanê Memlûkan Melik Nasir ew wek serokê hukumetê naskir. Li dijî Ermeniyan serkeftî bû. Li nivîsa li ser keleha Zamantî **"Emîr Xelîl bîn el merhûm Emîr Zeynûddîn el Zulqadir Xorasanî"** hatiye nivîsandin.[35] Ew belge jî vekirî dide xuyakirin ku ew ji Xorasanê ne.

Ji dîroknûsê Tirk R. Înanç wiha dinivîse: Ji Anadol û Îraqê gelek Tirkmen hatin û xwe avêtin paş Memlûkan û hêza wan zêde kirin. Di dema Baybarsê Memlûkî de (1260-1277), Îbnî Şeddad radigihîne; ku tenê ji Anadolê 40 hezar xanên Tirkmen li navbera Antakya, Filîstîn û Gazze de bi cîh bûn. Bi yarmetiya wan, Baybars di sala 1266 an de êrîşî Ermeniyan kir û Derbisak, Merzîban, Raban û Hadîd stend û kraltiya Antakya ya Haçli jî ji holê rakir.[146-4] Wekî di beşa Şadiyan de jî me nivîsî: nivîskarekî Ereb digot hejmara wan milyoneke. Ew 40 hezar xanên tê gotin jî bi qasî ji 5an 1ê Şadiyan dike, ku raste. Lewra di hemû jêderan de hejmara Kurdên ji navenda Xorasan hatine gelek zêde xuya dike. Yekê jî, pêwîste lêkolînerên Kurd berhemên ew nivîskarên Şadî derxin holê. Dibe ew ji bo dîroka Kurd bibe xelekeka girîng. Memlûkan ji bo ku sînorên xwe yên bakûr bikin bin ewlekariyê, Tirkmenên ku ji ber Moxolan

reviyabûn li bakûrê Sûriye bi cîh kirin. Di sala 1298 an de, Mereşa di bin destê Ermeniyan de wergirtin; ji wê dîrokê bi şûnde Mereş ji alî begên Tirkmen waliyên Memlûkan ve hate birêvebirin. Ji Helebê heta Mereşê kete bin destên ew Tirkmenên girêdayî Bozok û şaxê Bozok. Eger mirov bêje ku hîmê vê mîrîtiya hanê di vê salê (1298) de hate avêtin di cîh de ye. Ku ew jî bi piştgiriya Memlûkan dibe û ji bo berjewendiya wan jî baş bû.

Farûk Sumer dibêje: Di sedsala XIII an de gelek Tirkmen dijîn û gelek ji wan diçûn zozanên Ûzûn Yaylayê; ji wan re Şamlû, Şam Tirklerî û Şam Tirkmenî dihate gotin. Ew Tirkmenena, rêxistina Oxûzan ya kevne mîna Boz-Ok û Uç-Ok diparastin. Gelek dem derbas bû, gelek cîh guhartin pêk hatin, lê eceb bû ku hîna jî ew sîsteman berdewam dikirin. Boz-Ok bi piranî li dora Helebê û Amîkê dijîn. Boz-Ok hîn zêde bûn û di nava wan de ew zend hebûn: Bayat, Avşar, Bex-Dilî, Doxer in. Ji wana Dulqadirên navdar derketin.[131-185] Şam û Şamlû, wekî berê jî min gotibû êlên girêdayî Reşiya ne û bi taybetî jî ew wek Sêvikan tên nasîn. Wekî nivîskar jî radigihîne ew heta van deh salên dawî jî ew sîstema xirav nekiribûn û girêdayî kevneşopiyên xwe bûn. Ji wana yek jî Înallû ne, ku beşdarî Pezgewran bûne û êleka wan ê bi navê Şamlû jî çû Iranê. Hinek jî li dora Amasya, Samsûn û Çanqiriyê bi cîh bûn. Tirkmenên Şamê di sala 1294 an de ketin Sêwasê û di sala **1337 an de li Elbîstanê Dulqadirî damezirandin**.[131-186] Ûzûnçarşili jî hinek bi ferq vê yekê tîne ziman: Li Elbîstan û Mereşê rûdiniştin; bi mêranî û şîdeta xwe têne nasîn û ji Bozokên girêdayî Oxûzan e. Di sala 1339 an de, di bin hakîmiyeta Memlûkan de mîrîtiya xwe damezirandin. Paşê ew heta Meletî û Xarpûtê fireh kirin. Serokê xwe yê yekemîn Zeynûddîn Qaraca ye.[31-169]

Prof. Yinanç, li ser êl û federasyonên ku Dulqadiriyan tînin meydanê jî agahiyên girîng dide: Êlên ku gelê Dulqadir pêktînin ev in: **Bayat, Avşar û Beydilî** ne.[146-7] Di beşa Qeremaniyan de jî me nivîsî bû, ku Bayat şaxekî Tabanliyên wek Bozûlûs têne nîşandin. Ku îhtîmaleka mezine ew Têrikiyê îro ne. Avşar jî konfederasyoneka êla ye, ku Celikiyên îro şaxekî wan in. Beydilî jî gor ez difikirim Canbeg yan jî şaxekî Reşiyan in. Ew êl û federasyonên êlan yên ku navê xwe derbas dibin, hemû li Anadola Navîn hene. Mirov dikare parçên wan li herderekê bibîne û gelek jî bi navên cûda dijîn. E. Kiran jî dibêje: Rêxistina Dulqadiriyan wek organîzasyonekî Milan û Tirkmenan xuya dike; serokê xwe Qaraca Beg e û îhtîmaleka mezine ku navê çiyayê Qerecedax ji wî tê.[113-131] Li aliyê din, milekî van êl û komana jî tim di nava rêxistin û hêzên Îranê de ne. Wek nivîskar diyar dike, ji artêşa Hamza Mîrza yê Sefawî, Alî Xan (ji êla Şadiyan girêdayî Dulqadir e) bû begebeganê Fars.[112-141] Li wir jî xuya dike; ku yek ji yên êlên Dulqadirî avakirine jî Şadî ne. Êla bi navê Şamlû jî girêdayê vê mîrîtiyê xuyadike. Doç. Taşdemîr dibêje: Di arşîva Osmanî ya girêdayê serokwezîrtiyê de, deftereka bi 223 rûpelan heye ku temamê vê ji Kurdên Şamê û berên girêdayî vê dinivîse. Êlên li Anadolê û êlên Kurdên li Şam, Amîk, Rûmkalê, Meletî, Axzaz, Riha, Gerger, Kolik, Besnî, Semsûrê

têde ne. Navê vê: "**Defterî Mûfasedsalaal-i Lîva-î Axzaz û Ekrad**" e. Li sala 943/1536 an hatiye amadekirin.[109-8] Bê guman bi vî rengî gelek jêder hene lê em nikarin bi dest bixin.

Dulqadirî, bi piranî li rojhilatê çiyayên Amanosan zivistan derbas dikirin û havînan ji diçûn bakûr: Bînboxa, Berît, Nûrheq, Akçadax û Tohma. Li vê herêmê, dema Moxol jî berbi lewazbûne diçûn, beşek ji Tirkmenên Bozok û Axaçerî di bin serokatiya Zeyneddîn Qaraca de gihîştin hev. Gor Arîfî Paşa, Qaraca, kurê Dulqadir Beg e ku di sala 1310 an de miriye. Gor dîtina Şikarî jî Dulqadir lawê xwe bi 40 hezar eskeran ve li dijî Qeremanan şandiye alîkariya Şelçûqiyan. Mehmet Begê Qereman Qonya zept dike û kurê Dulqadir jî davêje zîndanê. Piştre, Eretna navbeynkariyê dike û ew azad dibe.[146-9] Ew jî mînakekê din ê ku Kurd çawa bi pişta hev ketine.

Li gor prof. Yucel dinivîsîne, Dulqadirî li dora (1335) Heleb û Dîlokê dijîn. Bi teşwîqa siltanê Memlûkî û bi daxwaza wan bi xwe ew êrîşî ser dewleta Eretna dikin. Ji bo ku Eretna xutbe li ser navê Memlûkiyan naxwîne, siltan Melîkûn-Nasir piştgiriya Qerecê Begê Dulqadir (Bozok) dike. Ji êrîşên Dulqadiriyan şunde Darende dikeve destê Qerece, Dulqadirî berbi Mereş û Meletî ve belav dibin û siltan bi vê kefxweş dibe û emîrîtiya wî qebûl dike. Di sala 1338 an de Eretna êrîş dike, lê dîsa têk diçê û Qerece Beg vê dewlete gelek caran li dor xwe digerîne. Ji vî şerî şûnde li ser 20 hezar hesp, mî û hêştir li hev tên.[35] Sazbûna Dulqadiryan jî raste vê demê (1335) tê. Di sala 1348 an de li dora Helebê, Qerece gelek cîh zept kirin û xwest hukumdariya xwe îlan bike, lê di şerê li dijî Memlûkan de têk çû û hat daliqandin. Li ser vê jî Yucel dibêje: Di sala 1341/42 an de waliyê Helebê ji Siltan re dibêje Qerece û Eretna dixwazin êrîşî Helebê bikin. Qerece xwe siparte Memedê Eretna, wî jî ji ber zora Memlûkan ew teslîm kir û di sala 1353 an de li Qehîrê hate kuştin.[35] Mintaşê Meletî jî ji Qadî îttîfaq xwest. Qadî li dijî Memlûkiyan hişk bû û got: Êdî kolê Çerkezan di Anadolê re darbas nabin! Wê demê Çerkezên ku li Qefqasya dîl dihatin girtin bi riya Derya Reş dibirin Sêwasê û li bazaran wek esîr difirotin Misirê. Mintaş, ji tirsa Şam û Memlûkiyan dixwest Meletî teslîmî Qadî bike û ji aliyekî ve jî dixwest ew li dijî hev bi kar bine. Di dawiyê de birayê xwe ji Qadî re şand ku Meletî teslîm bike. Di vê demê de tişte balkêş ev e ku **Mehmed Reşî yê Pezreşan** jî bi Mintaş re di îttîfaqê de ye. Mehmet, dema Tîmûr di sala 1387 an de hat Kurdistan û Anadolê bi wî re şer kir, lê têk çû û reviya Meletî. Li vir îttîfaqa Osmanî û Memlûkan balkêşe.

Gor dîtina Torî jî, Tîmûr ku Sêwas heyna şunde; Yoluk Osmanê Pezgewran jî heyna ba xwe û erîşî Dulqadiriyan kir; dixwest ceza bide wan. Dema gihîşte Elbîstanê Dulqadiriyan cîhen xwe terk kirin. Tîmûr, Darende û Elbîstan xira kir û berê xwe da Meletî. Ev herêma çesiband.[38]

Di sala 1337 an de li Mereşê kesekî bi navê Tarakî (Tarakli) derket û xwe xwediyê Mereşê îlan kir. Bi kurê Qaraca Xelîl ve şer kir û xwe avêt paş waliyê Helebê. Di dawî de Siltan Nasir herdû jî anîn Qehîrê û nûnertiya li bakûr da

Qerece. Bi vî awayî di sala 1337 an de, mîrîtiya Dulqadiriyan ku dû sed sal bijî, li Mereş û Elbîstanê hate damezirandin. Piştre bi Eretna ve gelek şer kirin û Eretna têk bir û Darende wergirt. Lê serokê Beydiliyan Taşgun (Danûşgu) serokatiya Qerece nasnekir û li hember wî rabû û di her firsendê de êrîşî êlên Dulqadir dikir. Danûşgu ji alî waliyê Helebê Altûnboga ve dihate destek kirin. Ji bo ku Taşgun ji holê rakin, bi serlêdana Qerece ya waliyê Şamê zext li waliyê Helebê kir û Taşgun avêtin zîndanê. Lê paşê bi alîkariya êlên girêdayî wî, ew hate rizgarkirin û ji zîndanê reviya. Di sala 1341 an de Nasir mir û ji firsendê Qerece xwest îstîfade bike û serxwebûna xwe îlan bike. Di sala 1352 an de siltanê Misir bi hêrsket û mirîtî da destê Remezan Begê Uçok (Remezanoglû) an. Qerece li hember vê derket lê têk çû, jin û du kurên xwe û gelek ji û ajalên wan ketin destê Memlûkan û wan jî hemû firotin. Qerece jî xwe avêt bextê Eretne û wî jî di sala 1353 an de ji Memlûkan re şand û bi êşkencê kuştin.(146-10)

Paşê kurê Qerece yê bi navê Tîmûr li hember Memlûkan berxwe dabe jî, nikaribû bi serkeve û îtaat kir. Kurê wî Xelîl Nasiruddin, Qereman û Remezanî têk birin, 1419. Paşê dijminê Memlûkan, Canbey Sofî girt lê teslîmî wan nekir. Ji ber vê bajarê Qeyserî ji dest hate girtin û dane Qeremaniyan. Canbey Canbegî ye. Ev serok di sala 1442 an de mir. Ûzûn Hesen ji wan Xarpût stend û dewleta Osmaniyan bi Memlûkan ve jî li ser Dulqadiriyan şer kirin.(29) Nasirûddîn Begê Dulqadir li hember Memlûkan stû nerm bû û ji ber wê Qeyserî di destê wî de bû. Lê Canbeg Sofî li hember Barsbayê Memlûk bû û ji ber vê reviya Anadolê. Nasirûddîn ew girt û ji Barsbay bo wî pere xwestin. Dema wî pere nedan, Dulqadiriyan ew azad kirin. Ji vê fersendê Qeremaniyan îstîfade kir û serî li Memelûkan dan û xwestin Qeyseriyê bikirin. Dulqadiriyan jî ji Osmaniyan alîkarî xwestin.(31-24)

**Serokên Dulqadiriyan:**

**1. Qerece Beg** ? - 11.12.1353

**2. Xelîl Beg** (1355-1386): Piştî Qerece, bi destûra Memlûkan, Xelîl Beg hate rêvebiriyê. Wî jî Mereş, Meletî, Xarpût, Besnî, Amîk heyna û welatê xwe fireh kir û du caran jî artêşa Memlûk belav kir. Lê cara sêyemîn Memlûkan di nav malbata Xelîl Beg de dubendî derxistin û beşek kişandin aliyê xwe.(146-27) Di van salan de em dibînin ku Dulqadiryên birayê serok Xelîl, Osman dişînin alîkariya Qadî Bûrhaneddîn. Di şerê li Kazabad (nêzîkî Amasya) de Qadî ji çembera dijmin rizgar kir. Îttîfaqa Xelîl û Qadî, Darende û Dîvrîxî ya girêdayî Memlûkan dan talan kirin. Bi ser vê de, Yelboxa li Darende û Sêwasê; Dulqadirên bi Tirkmenên li Harranê û Ras al-Ayn ê di îttîfaqê de têk birin.(35) Xelîl Beg ji alî birayê xwe Îbrahîm ve bi suîkastê hate kuştin, sal 1386 bû. Sûlû derbasî şûna wî bû.(31-170) Serokê Memlûkan Berkûk, Xelîl da kuştin; bi ser vê de Qadî dijminatiya wî kir.

**3. Sevlî Beg:** Di serdema birayê xwe Xelîl de fermandarekî bi nav û deng bû. Wekî tê zanîn hîna jî êleka bi navê Sêvika heye û îhtîmaleke pir mezine ku

navê wî begî girtinê. Di sala 1379 an de Memlûk li Mereşê bi tûndî têk birin. Di sala 1381 an de artêşa Memlûkan; bi Ereb û Tirkmenên girêdayî Memlûkan ve tevhev li Mereşê hatin ber artêşa Dulqadiran. Sevlî Beg vekişî çiyan. Dulqadirî derbasê êrîşê bûn û serokê Hezebanî yê Kurd Şerefeddîn kuştin, lê dîsa jî nikaribûn Memlûkan têk bibin.(146-27) Ew jî rewşa Kurdan dide ber çavan. Du sêd sal berî vê demê kalê Sevlî bi yên Şerefeddîn ve li Arranê mil dabûn milên hev û dewlet çêkiribûn; îro jî hevdû dikuştin! Piştî şerê du rojan Dulqadirî têkçûn û Sevlî Beg reviya û gihîşte Xarpûtê. Piştî vî şerî, Remezaniyan ji Memlûkan lêborîn xwestin û giredana xwe bi wan re dan diyar kirin. Reîsê civateka **Dulqadiriyan Heyderê Bişan** jî giredana xwe bi Memlûkan re diyar kir. Li Xorasanê êleka bi navê Bîçerane heye ku wek şaxekî Sêvikan tên nasîn, ew nav nêzîkî hev in û dibe ku êlê navê xwe ji wî serokî girtibe. Di sala 1385 an de Sevlî Beg ji birayê xwe veqetî û çû Helebê cem walî Yelboga Nasirî. Nasirî yên ku îro li navenda Anadolê girêdayî Reşiyan jî divê ji navê wî hatibin. Siltan Berkuk xwest ku waliyê Helebê Sevlî ji wî re bişine, lê walî ew yeka nekir û di şûna vê de ew kire zîndanê. Ji siltan re neşandin îttîfaq û giredana Kurdan ya feodal derdixe holê; herçiqas bi siltan re girêdayî be jî, alî birayê xwe bi kesî nade û wî naşîne. Paşê rê danê û ew reviya. Bû serok bi şûnde Memlûkan artêşek şand ser, ew li Goksunê têk birin û bi ser vê de, birayê wî yê li Qehîrê di zîndanê de li hember wî derxistin. Osman tevlî Sevlî bû, lê Îbrahîm li hember wî derket û ti encam negirt. Memlûk neçar man ku bi Sevlî re têkevin nav têkiliyan. Birayê Sevlî Dawid, di sala 1388 an de çû Qehîrê û li wir berpirsiyartiya emîratiya Onlar (Emîrû'l–aşare) hate dayîn.(146-29) Biraziyê Sevlî Nasreddîn Muhammed di sala 1388 an de apê xwe û hêzên Mintaş bi tûndî têk birin. Sevlî reviya û çû cem Qeremaniyan. Di sala 1398 an de bi fermana Memlûkan Sevlî û jina wî di ciyan de kuştin.(146-33) Sevlî ji alî Ereban ve bi navê **Heykelût-Tirkmen** û bi wêrekiya xwe dihate nasîn.

**4. Sadaka Beg:** kurê Sevlî derbasî serê mîrîtiyê bû, lê Yildirim Beyazidê Osmanî ew ji bajêr derxist û şûna wî Nasreddîn Mehmet di sala 1399 an de anî ser text. Di sala 1419 an de di navbeyna Qereman û Dulqadiriyan de dijminayetî destpêkir û Mehmet Begê Qereman dîl kete destê Dulqadiriyan.(146-45) Di sala 1442 an de Nasreddîn mir û kurê wî Silêman derbasî cîhê wî bû.

**5. Silêman:** Keça xwe Sitî da kurê Mûratê II an Fatîh. Keçeke xwe jî da Siltanê Memlûk Melîk Zahîr Çakmak û têkilî xûrt kirin.(31-172)

**6. Melîk Arslan:** Piştî bavê xwe Silêman derbasî cîhê wî bû. Wê deme Hesenê Dirêj di lûtkeya bi nav û dengê navê xwe de bû. Ji Dulqadiriyan jî, Qere Beg û Abdî Begê ji Bayatan û Huseyn Begê li Qerecedaxa-Amedê rûdinên jî di sala 1457 an de di emrê Hesen de bûn.(146-59)

**7. Şah Bûdak:** Piştî birayê xwe derbasî serokatiya mîrîtiyê bû. Lê li destpêke xelk li dij derdiket û ew bi kuştina birayê wî tewanbar dikirin. Hin kes serî li Fatîh dan û xwestin ku Şah Siwarê birayê Şah Bûdak bê ser text. Fatîh jî walîtiya Bozok (Yozgat) û Artûk-abad (Artova) dabû Şah Siwar. Bi ser

vê de, Bozokî û Dulqadiriyên belav bûbûn re jî ferman şand ku têkevin bin fermandariya Şah Siwar. Ji wê belge tê fêhmkirin ku hin Dulqadirî, yan ji ber began yan jî ji ber hin sebebên din barkiriye Tokat û Yozgatê. Di sala 1466 an de Şah Siwar li Zamantiyê birayê xwe têk bir. Di sala 1468 an de Memlûk jî têk birin û êrîşî Remezaniyên nêzîkî Helebê kir û ew şerpeze kirin û bajarên wan girtin. Ji alî din ve, ji malbata Bozok Sevîndîk û Sûsa, ji Înalan Îbrahîm, Pezgewran Ebû Tahîr û bege Egilê Şah Elî Hesenê Dirêj terk kiribûn û hatibûn cem Dulqadiriyan.(146-67) Şah Siwar û xismên wî û serokên Tirkmenan hatin girtin û Memlûkan ew birin Qehîrê. Xismên wî hemû tazî li heştiran siwar kiribûn û paşê bi şûran hemû kirin du felq.(146-76) Piştî vê Şah Bûdak dîsan hate ser text. Ji ber wê yekê, bira, mam û gelek begên êlên Dulqadiriyan ji ber şerm û wahşeta li Şah Siwar hate kirin xeyîdîn û çûn Amasya cem Şehzade Beyazîd. Birayê Şah Siwar Alûddevle(leqebeka xwe jî Gavsû'l-Mille ye) keça xwe da Beyazîd.(146-77)

**8. Elî Beg:** Di şerê bi Şah Îsmaîl re ew li kêleka Yawûz bû; li şerê Mercîdabik de li kêleka Zeynel Paşa bû; di wergirtina Misir û Şamê de ew li pêş bû; di serhildana Celaliyan de roleka pir mezin lîst û serê Celal ji padîşah re şand; Canberdiyên li Şamê serî hildayî têk bir. Ferhat Paşa ew û zarokên wî dawet kirin û got emê herin ser Şah. Lê wî, Elî Beg û zarokên wî hemû kuştin û sal 1522 bû ku dawiya Dulqadiriyan jî hat.(146-105) Bi vê taqtîgê Osmaniyan gelek fermandar û serokên Kurdan yen jêhatî kuştin. Li destpêkê ew bikar dianîn û piştre jî ew dikuştin, ku bila ji wan re nebe xetera pêşerojê.

Di vê serdemê de Kurdên li rojavayê Anadolê ketin nava gelek tengasiyan. Ewên ku girêdayî mîrîtiyan bûn, dewletên wan hatin hilweşandin bi şûnde bi piranî çûn rojhilat, Arran, Îranê û hinek jî ketin bin sîwana mîrîtiyên hê heyî. Êlên Kurd zanin ku êdî li vê xakê ji wan re jiyan dijwartir dibe û derfeta ku ola xwe bidin meşandinê namîne. Ji bo vê li çara serê xwe geriyan. Li başûrê Anadolê Dulqadiriyan, di navbera Osmanî û Memlûkiyan de polîtîka dostaniyê dimeşandin û ji valahiya nav herdû dewletan îstîfade dikirin. Li rojavayê Anadolê, Tirkmenên (Kurd) şîiyen ku tengavbûbûn berbi rojhilat çûn û li Îranê hejmara wan zêde bû. Avşar û Bayat jî tevlî Pezgewran bûbûn. Serokê Pezgewran Ristem, li şopa Şah Îsmaîl digeriya ku wî ji holê rakê. **Lê xaltiya Îsmaîl ew li Erdebîlê teslîmê jineka cerah/Dr. ji Dulqadiriyanê bi navê Aba-Ebe kiribû.** Ji berê ve di navbera Gîlan- Erdebîl- Derya Kesk û Dulqadiriyên li başûrê Anadolê de têkilî qût nebûbûn. Jinikê jî Îsmaîl teslîmê mirîdên wî kiribû. Ristem jinik li Tebrîzê lidarxist.(146-89)

R. Yinanç niqteyeka din ê girîng tîne ziman û dibêje: Di sala **1504** an de li Egilê emîr Lala Qasim Şah Muhammed ê **Merdasî**, Atak ê emîr Ahmed Mîr Muhammedê **Zerikî**, Li Farqînê emîr Mîr Diyadîn Mîr Îbrahîmê **Silêmanî** hebû. Ew hemû, bixwe tevlî Dulqadiriyan bûn.(146-91) Mirdêsî, Zerikî û Silêmanî (gereg kalên Sewêdiya bin) tevlî Dulqadiriyan bûne ku ew êlên navê xwe derbas dibin, ji Qonya yê bigre heta Îzmîrê û ji Enqerê bigre heta Bûrsê belav

bûne. Ve yekê Dr. Tûfan Gunduz wiha tîne ziman:

Li Anadolê herî zêde Dulqadiriyan êl belav kirin. Ji Mereşê heta Amed, Heleb, Bozok, Adana, Kutahya û Aydinê êlen xwe belav bûn. Şaxekî ji wê rêxistina girîng li Edenê bi navê "Îfraz-i Zulqadiriyê" dijîn û li herêmên din jî beşekî girîng dijîn.[115-41] Li başûrê Sêwasê; yanê li Dîvrîxî, Şarkişla, Kangal û Gurunê Tirkmenên Yenî Îl hebûn; ew ji êlên Dulqadir û Tirkmenên Helebê pêk dihatin. Ji bo ku reaya (karker) mizgefta Nûrbanû Siltanê li Uskudarê bûn, ji wan re **"Tirkmenên Uskudar"** dihate gotin.[115-41] Gundiyên Beşqavaxê yê girêdayî Cihanbeyliyê jî ew yeka dianîn ziman û bi taybet jî ji bo êla bi navê Sewêdî ew tê gotin.

Îbnî Verdî dibêje: Dulqadirî Tirkmen in, emareteka li Mereşê bi Memlûkan re girêdayî bû; di sala 1521 an de Osmaniyan dawî li vê mîrnîşînê anîn.[19-94] M. Sûcû jî dibêje; Yawûz di sala 1515 an de dawî li mîrîtiya Dulqadir anî.[120-9]




**Jineke li Erdebîlê -Gîlan**

Îro em ji defterên Osmanî fêm dikin ku Kurdên ji êla Hewêdî yên ku heta Xorasan û Hindîstanê belav bûne di sala 1524 an de li navça Keysûn a girêdayî Besniyê niştecîh bûne. Keysûn, 1519 an de wek gundekî hatiye qeydkirin. Lê paşê 28 gund û 45 mezra pêve hatine girêdan. Gundên Dulqadirî ev in: Tokar, Havzane, Karni Açik. Gundê Hewêdiyan jî: Tîzlû, Ûzûn Kûyû, Cence, Tatarlû ne. Hejmara nûfûsê li van deran di sala 1524 an de nîvî nîvî dikeve...[109-41] Tespîteka bi vî awayî jî nîşan dide, ku ew Kurdên mîrnîşîn avakiribûn, xwedî hêz û kudret in heta Xorasanê û Hindîstanê; li rojava jî heta Bûrsa, Îzmîr, Qonya û Enqerê belav bûne. Di şêxsiyeta mîrnîşîna Dulqadir de, trajediya Kurdên li dervayê welat jî radixe ber çavan...

## GERMIYAN
### (1299-1429) (Avşar, Mirdêsî...)

Ew nava ji ku û çawa girtibûn? Zêde nayê zanîn, lê di kurdî de wata germiyan: cîhê germî ku êlên Kurd lê zivistan derbas dikirin e. Avcioglû jî wiha şirove dike: Germiyan (Kişlak, li gorî hinan jî navê vê eşîretê Kermiyan (Qermiyan) qer=morê vekirî, miyan jî, mî ne. Bi Osmaniyan re şer kirin û xwe dan kêleka Tîmûr.... Cahen dibêje ew Tirkmen-Kurd in. Pêncî sal şunde Ibn Batûta dibêje, "Tirkmen bi çavêkî baş li Germiyanan mêze nakin û li gorî Tirkmenan ew 'Êzdî ne'.[24] Li ser navê wan em nikarin zêde tiştekî bêjin li gor van jêderan eger Kermiyan bin jî dibe ku were wata 'Kerî- miyan' yanê kesên xwediyê keriyên miyan in. Di alî Kurd bûyîna wan de ti gumanên me nînin û ji sedî sed ew di riya Zerdeştî de bûn.

Gor texmînan ji federasyon êlan yan jî konfederasyonekê ji navenda Xorasanê hatiye. Hatina wan ê Kurdistan û Anadolê rastî berî êrîşên Tirkan dike. Her çiqas li ser hatina Tirkan yê Xorasanê konsesuseka tam tunebe jî, eger em bêjin piştî salên 1040 an, ê bi kêm şaşitî be. Piştê vê tarîxê Kurdên li vê herêmê hatin valahiya di navbera Bîzans û Kurdên li Kurdistanê de bi cîh bûn. Wekî berê jî min gotibû ew li hesabê Bîzans jî dihat. K. Kara, her çiqas bi armanceka din binivîse jî, dîroka ew dide em rast dibinîn: Begekî Selçûqiyan yê bi navê Çûbûk, di dema Melîkşah de tevlî servegirtina Anadole bû. Di sala 1085 an de îdara Xarpûtê dan Çûbûk. Çûbûk beşdarî sefera Fatimiyan bû û piştre jî çû Edenê û Yemenê. Îdara Xarpûtê jî da kurê



7 Katalog No. 4
**Wêneyê Jin û Mêr ê li Afyonê**

xwe Mehmet Beg. Piştî mirina wî serokî, begên girêdayî Çûbûk çûn rojava û li Germiyan bi cîh bûn; di sala 1213 an de dawî lê hat.(148-241) Germiyan, li Kurdistan, li Meletiyê ji der û dorên Puturge û Şîro re tê gotin. Ew nava ji bo Mereşê jî tê bikar anîn. Wekî tê zanîn ew piştî wir jî diçin dora Kutahya.




Mîrîtiyên Turkmen(148-263)

Hinek dîrokzan dibêjin Mirdêsî jî Germiyan in û teorî hene ku navê Mirdêsî ji Merdaiyan derketiye, milekî ji Şemsiyan e ku cîhê wan ji Hema heta Şebîn Qerehîsarê û bineciyên kevn yên Meletî û Dêrsîmê bûne. Hetanî dema Osmaniyan jî ew li dora Hema, Humus, Heleb, Ezaziye (Elezîz), Kilîs, Riha, Dîlok, Şimşat, Meletî, Xarpût, Dêrsîmê jiyane. Germiyaniyên ku çûnbûn Kutahya jî ji wan bûn. Dîrokzanê Yûnanî Stepan Asolîk ê di sala 1021 an de jiyayî radigîhîne: ku ji Dêrsîmê heya çiyayên Amanos êla bi navê Şemsiyan dijîn û ew ji rojê re perestî dikirin. Kurdên Êzdî ne û hê di dema Emewî û Ebbasiyan de li wir jiyane. Ji wan Kurdan êlên bi navê Mirdêsî, Dasinî, Yesyaniye, Besnaniye, Mûsan, Şerqiyan, Germiyan û yên din hene. Eger di dema Emewî û Ebbasiyan de li wan deran jiyane mumkune ew ên ku Harûn Reşîd anîne bin.

Li ser hatin û bicîh bûna Germiyanan agahiyên berbi çav kêm in; Mumkune ku dema ji Xorasan yan jî Arran hatin ew demeke li çiyan û cîhên ji çavan dûr jiya bin. Lewra heta sala 1299 an di derbarê wan de agahî kêm in. Lê tê gotin; ku Emîr Avşîn di sala 1068 an de Amorîûm-Emîrdax-Afyon heyna û xirab kir, Tirkmenan navenda Anadolê bi dest xistin û şûnde vekişîn. Sala 1070 dîsa Tirkmenan di bin serokatiya Afşîn de êrîş kirin.[191-31] Emîr Avşîn di vir de roleka girîng dilîze, gelo ew Kurd bû? Navê Avşaran ji wî tê an na? Ne dûr e ku ew Kurdana di dema wî de jî hatibin herêmê. Hayrûllah Efendî, di **"Îbn Bîbî Selçûqnamê"** de dibêje: ***Weledî (-zarok) Alîşîr Germiyanî yê girêdayê Avşarê ji zenda Oxûzan e.***[31-39] Em nizanin ku ew Alîşîr bi Afşîn ve yek şexs in an na, Elîşêrek jî wek serokê êlê yê yekemîn tê dîtin. Li wir tê destnîşan kirin ku Germiyan ji Avşaran e. Dibe ku wê demê Meletî li destpêkê weke baregeh bi kar anîbin û ji wir êrîşî rojava kiribin. Ebûl Farac dinivîse ku; ew êl an jî kom ji kevin ve li dora Meletî û Semsûrê dijîn. Îskenderê Makedonî mir şûnde Seleûcûs Antaqya, Ûrhaî û Germanikî (Mereş) ava kir.[48] Ew dîroka jî mirov dibe berî zayînê û divê tekîliya vî navî bi wan êlana re jî hebe. Prof. Ûzûnçarşili dibêje: Germiyan cara yekemîn, di destpêka sedsala XIII an de, em li dora Meletî dibînin. Îhtîmale ku bi Celalûddîn e Harezm re di sala 1299 an de hatibin.[31-39] Vê dîtinê E. Farac û gelek jêderên din pûç dikin, lewra ew dibêje ji mêj ve ew li wir in. Gor kevirê ji tekê ya Qerebaba hatî muza Afyonê, Tirkmenên li (Afyon) wir di sala 1156 an de bi cîh bûne.[191-15] Ew kevirên li goristanên Afyonê derketine îspatek baş in ku Germiyan di sala 1156 an de hatine wir. Li Meletî çiqas man em nizanin, lê ew teqrîbên derdikeve holê, ku herî kêm 70 sal e. Dîtinek jî dibêje: Germiyan di sala 1240 an de li Meletiyê bûn.[131-182] Ew zêde rast nayê, lewra kevir îspata herî mezine ku ew di sala 1156 an de li Afyonê bi cîh bûne, yan jî gorê xwe hene. Lê, li ser vê ditinê mirov dikare bibêje ku gelo ew li Meletî parçe bûn? Eger îddea 1240 li Meletî bûn rast be, Germiyanê li Meletî parçe bûne. Kevirên mîna yên li Afyonê, li Meletî di goristana Kirklar de jî hene.[191-28] Ew jî îspat e ku ew ji wir hatine. Yanê li Meletî man û hunerên xwe derbasî ser keviran kirin; ji ber sedemekê ew – Moxol ?- çûn dora Afyonê. Di sala 1299 an de tê dîtin ku Germiyanî li Kutahya dijîn.[131-

182) Bi ser hatina Moxolan de Germiyanî ji Meletî jî berbi rojava çûn.(115-27)

Kazim Yeşîlgoz îddea dike ku serokên hikumeta Germiyanî li dora Semsûrê dijiyane. Dema Kurd ji van deran berbi rojava çûne, li destpêkê li dora Enqerê û paşê jî çûne li Kutahya bi cîh bûne.(39) Gava hatine Enqerê serokatiya vêderê demeke kirine destên xwe. Li Enqerê li ser navê serokê vê êlê Yaqûb (1299) mînberek hatiye neqişkirin û ji xwe re **Yaqûbê kurê Elî Şêr gotiye**. Ev mînber li muza Etnografya Enqerêye.(24) Di pirtûka Yoncali Hemamî ya ji sala 1234 an de mayî tê fêhm kirin; ku piştî sala 1241 an ew bicîh bûne. Yanî berî sala 1276 an em wan li Denîzlî û Kutahyayê dibînîn.(31-40) Alakom nikteyeka balkêş radigihîne: Di defterên Tahrîr yên sala 1463 an de xuya dike ku li Yabanabad a girêdayî Kizilcahamam-Enqere gundekî bi navê Kurtler/Kozkoy-Kurdan heye.(126-32) Di defterê de ji bo wî gundî wiha tê qalkirin: **Niştecîhên Kurtler, Kurd in. Di sala 1463 an de hejmara wan 35 xane ne, di sala 1572 an de ew gihîştiye 65 xaneyan**.(126-34) Di vir de lêkolînerên Kurd dikevin şaşîtiye: Di lîsta gundan yên ku dane de piranî navên tirkî ne, tenê navê Kurtler bala lêkolînerên me dikşîne ku kêmasî ye. Lewra di heman lîstê de navê gundên Milan, Kosan, Merdsalarû (Mirdês-salarû) jî heye ku navên kurdî ne û lîste bi temamî gundên Kurdan e, lê navên tirkî li wan danîne. Pêwîste ev bê zanîn û tenê ketina du navên kurdî jî me dibe şaşitiyan...Wekî min dabû xuyakirin, cîhbûna Kurdan ya li rojavayê Anadolê heta salên 1068 an diçe. Ji sala 1156 an wir ve belge hene; lê berî wê demê jî niştecîhbûn heye.

Li Puturge û Şîro êlên bi navê Germiyan û Kurdan rudiniştin.(39) Ji vê îddeayê jî derdikeve holê ku Germiyan ne tenê êlek e. Li wir du şax in, lê bi dîtina min ew herî kêm du federasyonên êlan in. Di sala 1200 an de Germiyan serokatiya komê dikir. Gor îddeayên nûserên Tirk: di dema serhildana Bav Îsheq de, Elî Şêr ji wan her du êlan lêşker kom kirin. Di navbera salên 1237-1246 an de Selçûqiyan ew serokan li dijî Bav Îsheq bi kar anîne, lê di dawiyê de Selçûqiyan ji Elî Şêr re gotiye "te li me îxanet kir!" û ji bo vê eskerên me têk çûn. Ji bo wê tewambariyê mirov dikare du alternatîfan derxe pêş; yek, ew bi lîstikên (xapînokên) Selçûqiyan li dijî birayên xwe derket lê di bin re jî hevkarî bi alîgirên Bav Îsheq re dikir. Yan jî Selçûqiyan karê xwe pê temam kirin bi şûnde, wek hemû caran îxanekarên miletê xwe bi tewanbariyekê jî holê rakirin...Bi dîtina dîrokzanê Rûs Gordlevskî, Keyhûsrevê II an ji bo raperîna Bav Îsheq ya di sala 1239 an de derketî, ji Germiyanên li alî Meletî alîkarî xwestiyê. Ji bo vê li rojavayê Anadolê bi cîh kirin.(24)

Ji Elî Şêr bi şunde Muzefhereddîn dibe serok û di navbera wî û Selçûqiyan de nakokî derdikevin. Kes nanivîse ku ka ew nakokî çi bûn? Bi dîtina min ew li ser tekoşîna li hember Moxolan bûn. Selçûqiyan nedixwestin li hember wan bisekinin û Germiyanan jî dixwest bi îttîfaq li dijî wan şer bikin. Ji ber Selçûqiyan xwe nedan ber vê, wî bi êla xwe ve cîhê xwe ji êlên, yan jî Kurdên mîna: Badilî, Kurdan û Êzîdiyan re cî hiştiye. Gor Yeşîlgoz jî, di serhildana Bav Îsheq de bi Kurdên Kolik-Keferduzê re ketin tevgerê. Ji bo vê mîrîtiya Germiyan ê ji

Kurdên **Sadic** pêk tê, Selçûqiyan ew ajotin, 1241, Kutahya.[39] Bi vê re girêdayî zahmete ku mirov bêje Selçîqiyan ew ajotin Kutahyayê. Wan ji ber Moxolan cîh guhartin û çûn herêmên hîn zêde ewle. Li dervayê vê serhildanê mayîn jî zêde ne balkêşe û berovajî wê ew jî ji beşekî serhilderan bû. Niqta din ê girîng jî girêdana wan Sadica ye. Wek tê zanîn **Sadic bi Sakan** ve yek in û Sadic li Arranê bûn ku ji wan re bi navê giştî Şadî jî tê gotin. Vê ditinê hema hema Yeşîlgoz jî dipejirîne: Mîrîtiya Germiyan li bajarê Meletî, Puturge, Akçadax û ava Tohma ji alî Kurdên ku ji Anî û Gênce hatibûn ve hate damezirandin. Dewleta Selçûqî, ev Kurdana ajot Kutahya. Navê êla wan Kurdan Sadic (Sad'lû) bû. Bi taybetî li Arapgîrê û Akçadax cîhê ku koma Etmaniyan îro lê rudinên, bi 10 hezar konan hatin û lê wêder bi cîh bûn.[39] Bi dîtina Îsmet Cherîf Vanli jî, çûyina wan ê Kutahyayê nayê zanîn, lê li gor texmînan sala 1241 an e. Di sala 1276 an de ew li dora Denizliyê xuya dikin.[29] Prof. Cahen jî dibêje: Germiyanî di sedsala XII an de ji Meletiyê derbasî rojavayê Tirkiyê hatin kirin. Xelkekî ji Tirk û Kurdan pêk dihatî bû; paşê Kurd asîmîle bûn û bûne Tirk. Bi taybetî jî Kurdên ku ji Anadolê çûbûn Ezerbeycanê di nav Tirkmenên wir de bûn Tirk.[24] Ew dîtina ku Tirk jî di navê de bûne, bi min rast nayê, lê piştre, bi xisimatî, mumkune ku Tirk jî tevlî wana bûne. Dema mirov li beşek ji gelê Ezerbeycanê yê îro mêzedike, mirov dibêje beşek ji wê ditinê raste; lewra hinek ji vî xelkî wek kopya Kurdan e lê bi tirkî diaxivin. Yekî jî gelek jêder radigihînin ku bi sed hezaran Qereçoriyên vê herêmê asîmîle bûne (heliyane).

Ditina me tevlîbûna Tirkan ya nava Germiyanî Prof. Ûzûncarşili jî piştrast dike: Di sala 1288 an de Mûradê Germiyanî li hember Selçûqî û Moxolan şer dike, lê şehîd dikeve. Ew şera dîtinên me li jor gotî Germiyaniyan dixwest bi îtîfaqa Selçûqiyan li hember Moxolan derkevin dipejirîne. Ji bo ku Selçûqiyan xwe dan alî Moxolan wana jî li hember herdûyan tekoşîn dan. Heta sala 1289 an tekoşîna Germiyan ji bo Denîzlî, li hember Tirk û Moxolan berdewam dike; serokê Germiyan Husamûddîn Alîşêr e û di dawî de Tirk bi serdikevin.[31-40] Moxolên ku dewletên mezin li ber nesekinîne, Germiyan li hember derketin û bi wan û Selçûqiyan re şer kirine ku ew jî qudret û hêza Germiyaniyan derdixe holê. Ji wî şerî jî tê fêhm kirin, ku ne maqûle Osmaniyan ew hêza hanê bi zorê şandibin Kutahya yê. Ew dîtina min ji alî jêderên din ve jî tê pejirandin:

Osmanî dema ketin rewşa firehbûne, Germiyan gelek bi hêz bûn. Lê Osmaniyan li destpêkê bi rola gelê Germiyan biparêzin û bi rola ji mafên mirovên wan adil bin derketin holê û li dijî Germiyaniyan kar kirin. Piştre, di tekoşîna navbeyna beyliga cîran a bi navê Karesîogûllari de cîhe xwe li ba Karesîogûlari girtin û bi gelek şêweyên cûr bi cûr ew kirin bin desthilatdariya xwe. Xaka Germiyan jî hinek bi xisimatî; ya Hamîdogûllari jî bi pere kirîn. Dema Osmaniyan xaka mîrîtiyên Anadoliyê kir bin destên xwe, li riya meşrû pir bi dîqat bûn. Ji bo wê huquqa îslamî derxistin pêş. Bi navê cîhad (manî-î gazaya gaza, gaza-yî ekber) gelek cîh girtin û hêzên ku li dijî wan derket jî wekî

"rêbir" îlan dikirin.[82] Taqtîkên Osmaniyan yên wê demê bi kar dianîn gelek balkêş bûn û heta roja îro jî ew berdewam dikin.

Eger ne ew lîstik û taqtîkana bûna, ew dewleta ku gelek cîh di dest de û bi hêz bû têk nediçû. Li rojavayê Andolê wekî nivîsîna "Camîû'd Duvel" jî radigihîne: Germiyaniyan, ji bilî navenda Kutahya, Ûşak, Gedîz, Armûtlû, Gokoyuk, Selendî, Kula, Tavşanli, Banaz, Işikli, Baklan, Tonuzlu, Honaz, Dazkiri, Geyîkler, Eşme, Homa, Sîmav, Emed û gelek navçên din hukumdarî dikirin.[31-41] Hema hema rojavayê Anadolê di bin desthilatdariya wan de bû.

Bi dîtina Îsmet Cherîf Vanli, Germiyanî di sala 1276 an de li Denizlî û derdora wir xuya dikin. Wezirê Selçûqî Sahîp Ata, çiqas xwestiye Denizliyê dagir bike jî, nikaribûye. Di heman demê de Germiyanan bi îttîfaqa Selçûqî-Moxolan re jî şer kir û vê yekê heta sala 1289 an berdewam kir. Di sala 1299 an de firehiya welatê xwe heta Kirşehîrê dirêj bû.[29] Li ser vê yekê nûserên Tirk dibêjin ew di bin fermandariya Selçûqiyan de pêk anîne:

Yek ji wan jî Ûzûnçarşiliyê ku dibêje: Yakûb dema di bin fermandariya Selçûqiyan de bû heta Kirşehîrê hûkme wî derbas dibû û ji wêderê re Yakûbelî dihate gotin.[31-41] Ew gotina **Yakûbelî**, zêdetir ji bo sînorên du welatan bikar tê. Di sala 1303 an de bac dan Îlhaniyan û desthilatdariya wan naskirin. Ji ber wê ji bin destên Selçûqiyan derket. Bi vî awayî li Kutahya mîrîtî avakir û ji Qeremaniyan bi şûnde li Anadolê mîrîtiya herî bi hêz e. Ş. Omerî dinivîse ku Bîzansan her sal 100 hezar zêr û diyarî didan Germiyan. Bi mîrîtiyên girêdayî vê 200 hezar eskerên wan hebûn.[31-41] Bi weqas esker û bac dayîna Bîzansan hêza Germiyan eşkere xuya dike; ne mumkune ku hêzek wiha bê daxwaza xwe têkeve bin destên Selçûqiyan yan jî hêzek din. Lê xelk ew bi riyên din kirine bin destên xwe, yek ji wana jî xisimatiya bi Osmaniyan re û bi riya ol e.

Şah Silêman (S. Çelebî) di sala 1363 an de bû begê Germiyan. Ji bo ku ji bakûr êrîşên Osmaniyan, ji başûr ve jî yên Qeremaniyan rawestîne keça xwe ya ji jina wî ya keça Mewlana Celadettîn Rûmî da Yildirim Beyazît û ji bo çihêzê wê keçikê jî Kutahya, Tavşanli, Simav, Emed dan Osmaniyan û bi xwe jî vekişî Kûla, 1378. Li cîhe wî Yakûb rûnişt. Wî jî Kutahya û cîhên din ji destê Osmaniyan girtin; lê Beyazît di sala 1390 an de welatê Germiyan bi temamî heyna.[31-45]

Prof. Yucel jî dibêje: Li dijî Osmaniyan, mîrnîşînên mîna Qereman, Sarûhan, Germiyan, Menteşe û Hamid-ili Beg ketin ittifaqê. Ji ber sedema, ku Beyazît birayê xwe Yakûb dabû kuştin; vê îttîfaqê êrîşî Osmaniyan kir. Germiyanên, ku berê ji bo cihêza xwişka xwe Kutahya dabûn Osmaniyan bi ser vê bûyerê Kutahya dîsa stendin. Osmaniyan jî bi Sirban re îttîfaq kirin, ji Candaroglûyan (me gotibû Lek-Şêxbizin in) jî alîkarî stendin û ji dest Germiyanan Aydin, Menteşe û Alaşehîr girtin, sal 1388 bû.[35] Di sala 1427 an de welat dîsa dikeve bin destê Osmaniyan. Di vî warî da Îbnî Betûta dibêje: **Dema ez çûme welatê Germiyan ez rastî Êzdiyan hatim**. Di sala 1603 an de ji welat hatine derxistin û li Axske, Axeskelek, Eçmiyazc û Qersê bineci bûne…Gorî


Betûta ti têkiliyên wan bi xerîban re tunebûne. Ew jî îspate ku heta wê demê hîna jî ew Kurdana dev ji ola xwe bernedane. Lê li hember êrîşên Osmaniyan ên bê wijdan dûmahiyên Germiyanan zêde nikarin li ber xwe bidin. Yakûb Beg ji ber van êrîşan çû cem Tîmûr. Herçî Tîmûr welatê wî dîsa dayê jî lê ew nikaribûye bibe xûdan.

Piştî şerê Enqere Tîmûr welatê Yakûb dîsa teslîmî wî kir, 1402, lê wî îttîfaqa xwe bi Qeremaniyan re xira kir û derbasî alî Osmaniyan bû. Ji bo ku zarokên xwe tunebûn, di sala 1429 an de welatê xwe ji Osmaniyan re cîhîşt.(31-51) Ewên ku desthilatdariya Osmaniyan qebûl kirin li wir man û bûne Tirk; yên din jî tevlî êlên din ê Kurd bûn û vegeriyan Kurdistanê. Îro konfederasyona Milan yek ji wan ê ku vegeriyane. Yek jî Qerekeçilî ne ku ji wê demê vegeriyan Kurdistanê. Ji bo ku ji rojava hatine hinek kes dibêjin ew Tirk in. Gelo her kesê ji rojava yan jî ji Xorasan hatibe dibe Tirk?! Min kaîdên wiha nebihîstine, lê wiha tê fêhm kirin. Ew jî ji îddea û nivîsên dîroknûsên Tirk ên bê bingeh tê.

Zorabê Aloîan, ji nivîskarê Macar Tibor General wiha radigihîne: Di salên 1440-1442 an de, pevçûn û şerên cûda cûda di navbera tîmên Osmaniyan û Macaran de çêdibûn. Tê zanîn ku di wan pevçûnan de, êla Germiyan û begê wan Osman jî beşdar dibûn, lê di sala 1442 an de eskerê Germiyan têk çûn... Gelek jêder didin xuyakirin ku Germiyan ji Kurdên Êzdî û Tirkmenan pêk dihatin. Germiyanên li başûrê Kurdistanê (Kerkûk) di vê baweriyê de ne, ku ew bi koka xwe Êzdî ne.(139-44) Germiyanên li başûrê welatê me bi wan ve ti têkiliya xwe hene an na ez nizanim. Gor texmîna min ti elêqa wan bi hevre nîne.

Li ser Germiyaniyan agahiya herî baş û balkêş ji alî Şahabettin Omerî ve tê dayîn. Gorî ew dinivîse: **leşkerên Germiyan cilên bi atlasa sor e li xwe dikirin**. Ji alî din ve jî, li Kurdistan û bi taybetî jî li Meletiyê qumaşekî zivistane yê bi navê **"Sof"** dihate hûnandin û leşkeren Memlûkan jî zivistanan ew li xwe dikirin. Li Amed û Sêrtê jî firotina hevreşîm dibû. Tiştekî din ê Germiyanî yê bi nav û deng jî hespên wan bûn; bi hezar zêrî bûn û difirotin her alî.(31) Heta roja îro Kurdên Xorasanê di cejn û dawetan de cilên sor lixwe dikin û gelek kes dibêjin ew kincên Qazaqane, lê xuyaye ku di dema Germiyanan de jî wan ew li xwe dikirin.

Îbnî Betûta dibêje: Kurdên Germiyan ên Êzdî porê xwe jê nakin û bi çavên xwe dibîne ku ew çawa rê dibirin û talanê dikin. Wê demê Tirkan ji wan Kurdana re digotin "Saçakli Kurtler", yanê Kurdên bi gulî...



**Li Xorasanê kincên sor**

# HIKUMETA EZAZ Û KILÎS
## (1180-1620)

Çil sal berî vê rojê, pîra min ê rehmetî Ela Mamî Tozê, dema bi hêrs diket digot: **"De here ma Mendola diya te bikutin!..."** Kê dizanî dixwest çi bibêje? Kê dizanî ku koka vê gotinê ji kudere tê? Û kê dizanî ku gotinek veqas dem dirêj û bi bingeh dibe?!

Di sala 1022 an de serokê Ermanan Howhanes Senbat, ji qralê Bizansê Basil, bajarê Anî, Aladax, Qop (çiya) heya Melazgirê dixwaze. Birayê wî jî Qeyserî, Sêwas û Erepgirê dixwaze. Dema Senbat ew derana vala kirin Kurd lê bi cîh bûn. Kurdê por dirêj û Êzdî bûn. Kurdên ku ew hikumeta damezirandine jî divê heman Kurd bin.

Ew Kurdên ku Hikumeta Ezaz û Kilîs damezirandine jî du şaxên cûda ne: beşekî ji Kurdên Germiyan û beşek jî ji Kurdên Colamergê hatine. Ew li dora bajarê Qesîr, Entaqya, Cûm, Kilîs, Riha, Semsûr û Meletî dijîn. Dema Eyûbî hatin, ew dev ji hikumeta Helebê berdan û bi Eyûbiyan re bûn heval. Gava êla Hekarya hatiye, herduyan alikariya hevdû kirine û li bajarê Qesîr fermandariya xwe îlan kirine (1180) û Eyûbiyan jî vê yekê pejirandiye.

Li destpêke rêvebirî di destê Kurdên Êzdî de bûye, dema misilman zêde bûne serokatiyê ji Êzdiyan stendine. Êzdiyan giraniya xwe didane Meletî yê; misilmanan jî dida ser Heleb û Enteqya yê. Kurdên Êzdî ji aliyekî ve bi Selçûqiyan re, ji aliyekî ve jî bi serokê misilman re şer kirine. Ji wan Êzdiyan beşek zû misilman bûbû û ji wan re Germiyan digotin. Dibe ku ewên li herêma Germiyan diman re gotibin. Wê demê mirov dikare bibêje, ku gelo dema ew ji navenda Xorasanê hatin li Meletî bi cîh bûn û piştre jî hinekan misilmantî pejirandin; ji yên pejirandî re jî gotin Germiyan. Me di beşa Germiyan de jî gotibû ku Germiyanan cîhên xwe ji Kurdên Êzdî û Badilî re hîştin û çûn rojava. Gelo dibe ku sedema vê çêbûne yek jî ol bû? Ew bi Selçûqiyan re, bi Kurdên bi cîhbûne û Dulqadiriyan re li hember Kurdên Êzdî yekitî çêkirin.

Paşê navê Germiyan gor Îbnî Esîr û Îbnî Xaldûn bi navê Dulqadiriyan ve yek tê xwendin...dibê ku yek bin? Belê dibe, lewra serhejmara Germiyan gelek zêde ye, paşê êlên di bin sîwana hemû mîrîtiyan û dewletan de hertim cîh guhartine. Hinek parçe bûne; hinekan dawî li dewletê hatiye bi şûnde tevlî mîrtiyên din bûne. Yanê, tim û tim yek tevlî yên din bûye û yên lewaz mane tevlî yên bi hêz bûne.

Kurdên Hekaryan di dema serokê wan ê bi navê **Mendo** de dawî li fermandariya Êzdiyan anîn. Paytext, ji Qesîrê anîn Kilîsê. Gotina pîra min ê ji wî **Mendo yî tê...Yanî wê demê em yan jî herî kêm êla me Êzdî bûye** û Mendola ew mîrîtî û dewrana me xera kiriye ku ew gotin ji wê derketiye... Ji Mendo şunda kurê wî yê bi navê Ereb bûye serokê herêmê. Ew ji aliyekî ve bi xaçeperêstan re, ji aliyekî ve jî bi Kurdên Êzdî re şer kiriye. Paşê wî bi alikariya Eyûbiyan, Êzdiyên Hema, Mereş û Meletî kirin bin kontrola xwe.

Gelek şer û serêşî di navbera Êzdî û Misilmanan de derdikevin û di sala 1285 an de Kurdên Êzdî bi serdikevin û serokatiya hikumetê didin Şêx Bekir. Ji ber ku wî cûdatiyê nedikir navbera gelê herdu aliyan û li dijî êrîşên misilmanan radiwesta, Êzdiyan dîsa Hema, Mereş, Adiyaman, Meletî kirine bin destê xwe. Paşê ji aliyekî ve Misir-Eyûbî û ji aliyekî ve jî Kurdên Dulqadirî nedihîştin ku hikumeta Êzdî di navbera wan de bijî. Serokê Remezanî, Dulqadirî û Germiyaniyan li hemberê Êzdiyan yekîtî pêk anîne û êrîşên mezin anîn ser vê mîrnîşînê. Ew her sê mîrîtî bi Misrê re girêdayî bûne. Di sala 1410 an de her sê hikumetan bi fermandarê Êzdiyan re dikevin tekiliyê û wî dixapînin û bi êrîşan, welat dikin du parçe. Her çiqas bûne didu jî, li dijî neyaran em îttîfaqa wan dibinîn. Di sala 1460 an de Emîr Mîr Xelîlî bûye serokê hikumetê û wî îtîffaqê bi Mîr Şêx Xelîl re çêkiriye. Misir li dijî vê derket, lê Mîr Xelîl guh neda wan. Di dema Mîr Hebîb (1499) de, xutbe li ser navê xwe dane xwendin û perê xwe çap kirine. Bi ser vê Misir di sala 1499 an de bi leşkerekî giran hatiye Helebê. Bi xayintî serok Hebîb li Helebê dikujin.

Di sala 1507 an de Siltan Eşref Qansû fermanekê derxistiyê û leşker civandine. Remezanî, Misirî û hinek Êzdiyan jî êrîş anîn ser hikumeta Kilîs. Serok Mîr Şêx Îzzeddîn leşkere xwe di çiyayê Seyhûn de bi cîh kir û ew kirin kemîne û têk bir. Şerê wan heta sala 1515 an dom kir. Sînan Paşa dawî li Remezaniyan anî. Dulqadirî li bakûrê wan bûn, ji bo ku dijminên wan jî hebûn, di nava wan da şer derneket, berovajî vê ew diçûn hewara hevûdû. Di dema serok Qasim de, yanê di salên 1516-1517 an de bi Yawûz Selîm re tevhev li hemberê Misir dest bi şer kirin. Piştî şerê Misir; Yawûz bangî vî serokî û kurê wî Canpolat kir û ew çûn Stenbolê. Bi gotinekê din serokê Helebê Qerece ji Yawûz re nameyêke dinivîsîne-dibêje eger ew vegere ewê li dijî Osmaniyan serî hilde- û Yawûz hemû serokê Kurd û hevalên wan dikujê û kurê wan dike qesrê. Bi ser vê bûyerê de Mîr Şêx Îzzeddîn dîsa dibe serok, lê bi fermanên Osmaniyan dimeşin. Di sala 1530 an de ev serok dimire, ji bo ku kurê xwe tunebû, serokatiya binamalê dikeve destê Eyûbiyan (Melîk Muhammed). Di vê salê de dawî li serokatiya Kurdên Êzdî tê û Kurdên misilman bi navekî din dimeşînin.

Tê zanîn ku di navbera Osmaniyan û Kilîsê de gelek peyman çêbûne, lê Osmaniyan ew sozên ku dabûn yek jî bi cîh neanîne. Kurdên Êzdî bi Eyûbiyan re û bi Kurdên din re tim şer kirine heta Huseyn Paşa çûye Helebê. Wî ji Stenbolê re nameyek nivîsandiye ku ji bilî mala Mendo ti kes wan Kurdana nikare bîne rê. Li ser vê şîretê, Stenbolê Canpolatî şandiye. Canpolat di sala 1540 an de tê welatê dê û bavên xwe. Kilîs kir paytext û mîrîtiya Kilîs, Qesir, Ezaz, Enteqya, Sûm-Cûmê heyna ser xwe... Di rûpelên dîrokê de êdî ewê bi navê **Canpolatan** werin xwendin û nasîn.

Roger Leskot dinivîse ku: Torinê Mend, mîrê yekemîn yê Kilîsê û çiyayê Kurmênc bû ku heta Sûriyê ji aliyê Siltan Selîmê I an ve hate girtin. Hingê, Mendan bi destê wî Siltanî ketine bin fermandariya serokekî Êzdî yê bi navê

Îzzeddîn. Dema Silêmanê Mezin hate ser text, Mendan dîsa desthilatdarî girtin. Lewra Şêx Îzzeddîn Mîr Beg ti law li pey xwe nehîşt. Dema Osmaniyan mîritî bi xurtî bi xwe ve girêdan, dawî li vê mîrîtiya hanê hat.[132-17] Êla wî Îzzeddînî dê piştre wek Oxçû bê binav kirin.


**Welîd Canpolat**

Ji Canpolat şunde bi dorê; Mîr Cafer, Emîr Hebîb, Emîr Huseyn Paşa bû serokê mîrîtiyê. Di dema wî de Şam û Heleb jî ketin bin destên wan. Dîsa di dema wî de leşkeren Osmaniyan davên ser Çanqiriyê û mîrê wêder ê bi navê Muhemmedê **Etmankî (Atma)** dikûjin. Ev seroka bi leşkeren xwe ve diçe ser Enqerê û bangî hemû serleşkeren tevlî êrîşa Çanqiriyê bûbûn dike û serê 40 merivî ji wana bi şûrê xwe difirîne û tola zavê xwe heytine. Paşê Osmaniyan bi hîlebaziyê ew li bajarê Wanê kuştin (1601). Gava kurê wî bûyerê dibihîze bi 10 hezar leşkeran bi Osmaniyan re şer kiriye û êdî dev ji Osmaniyan berdaye. Di vê demê de Osmaniyan, Celaliyên li Rihayê jî belav kiribûn û tenê li hemberê Osmaniyan ew mîrîtiya mabû. Di sala 1616 an de artêşa Osmaniyan bi Kûyûcû Mûrat ve ji bakûr ve, ji başûr ve jî, Kurd Yûsûf Paşa û bi lêşkerên Ereb ve şandin ser û welat di navbera du agiran de şewitî.

Sînan Paşa, Emîr Huseyn kuşt bi şûnde, birayî wî Emîr Elî derbasî cîhê wî bû; çû Helebê esker kom kir û serî hilda. Di sala 1607 an de, berî êrîşî Celaliyan bikin, Kûyû Mûrat Paşa êrîşî Canpolatan kir. Dulqadiran jî alîkariya Osmaniyan dikirin. Di şerekî dijwar de Elî nîvî hezên xwe winda kir û dev ji şer berda. Çû Stenbolê, Ahmetê I an ew efû kir û kire waliye Temavşar-Belgrad. Kûyûcû Paşa jî ew da kuştin.[19-93]

Di roja îro de ji vê malbatê Welîd Canpolat ma ye, ku di siyaseta Libnanê de gelek aktîf û tê naskirin. Ew dibêjin em Kurd in, lê mixabin Kurdî ji bîr kirine.

## HIKUMETA BABIRYAN
### (Xelebirkan-Zarên Mildirêjan)

Dîrokzanê Ermenî Kiraqosê Gêncê û Werdan dibêjin: Hikumeta Atabegê Babiryanê bi navê Xeleberîkanê ji welatê Babiryan in. Gereg ew welatê hanê li dora Gênc yan jî Gurcîstanê be. Werdan jî dibêje: Zarokên Serkîs yên bi navê Zakare (Zekerya?) û Îwan bi eslê xwe Kurd in û serokê Kurdan in. Xwediyê

Tarîxa Elî, ku di sala 1578 an de li Gurcistanê bûyerên di nav leşkeriya Osmanî de dinivîsand jî dibêje: ew ji Kurdên (Gêncê) Qerebaxê ne. Dema serokê Gurcan Dawid Saslon mir, welate Kurd, Ermen û Gûrcan kete bin destê Kurdan.

Di sala 1120 an de Zekerya hemû Kurd, Ermen û Gûrcan li dora xwe dicivîne. Di sala 1161 an de bajarê Anî yê heytînin. Di sala 1191 an de Zekerya û Îwan-Ohan dawiyê didin hikumeta Şadiyan û paytext ji **Lorî** (nêzîkî Anî ye) yê tînin Anî yê. Hemû der û dorên Sariqamiş, Qers, Eleşkîrt, Qaxizman û gelek cîhen din zept dikin. Di sala 1192 an Şadiyan dîsa Anî ji destê Babiryan derxistin; lê 1200 an dîsa heynan. Di wir de, bi dîtina min beşek Kurd li dora Zekeryane û niqta din jî di navbera Kurdan de dubendiyek xuya dike; dibe ku sedema vê yekê cûdabûna olî ye. Lewra, xuyaye ku Kurdên li dû Zekerya diçin xiristiyanî yê pejirandine.

Di sala 1210 an de serokê Eyûbiyan ê Meyafarqînê Melîk Eşref dibe. Zekerya êrîşê tîne ser welatê wî û hemû deran talan dike. Paşê Eşref êrîş dike û Îwan dîl digre û bi ser vê de Îwan xuşka xwe dide Eşref û dibin xismên hev û aştî pêktînin. Gava Gûrciyan di sala 1220 an de êrîş anîn ser welatê Îwan, wî ji Eyûbiyan alîkarî xwest û dijmin ji welatê xwe derxist. Di wan salan de jî, di navbeyna wî û Gûrciyan de nakokî hene û ji Kurdan alîkarî dixwaze.

Dema Tataran di sala 1239 an de êrîş kir, miletên mîna Kurd, Çerkez, Laz, Ermen jî penaber bûn. Beşek Kurd ji Qefqasya çûn Macaristan, Bûlxaristan, Arnawût û Romanya; Ermen jî çûn Kîlîkya. Hêza bi navê Dirêjan a ku niha li dora Meletî dijîn, di vê demê de hatin. Ev qebîleka ji Dirêjên Qerebax in. Bi qasî em dizanin girêdaneka Dirêjan bi Kurdên li navenda Anadolê yên em ji wan re dibêjin Canbegan jî heye. Mumkune ku ew girêdayî yek federasyonê ne.

Hukumdarê Osmanî Qanûnî, ji serokê Kurd Melîk Zahirê Elbakî (Başkale) cîhekî dixwaze, ku pêşiyê li Sefewiyan û Şîiyan bigire. Li hemberî vê yekê, Qanûnî serokatiya herêma Bosna-Hersekê heta Kîevê da Zahirê Elbakî. Niha li vê herêmê 160 şûn û warên navên xwe bi kurdî ne hene. Berê jî li wir Kurdên xaçperest hebûne. Hozê bi nav Dirêj-Terjan-Jeno bi êrîşa Tataran ji welatê xwe reviyane li Macaristan bi cîh bûne. **Ew malbatên ji Kurdên bi navê Babiryan in, ji qebîla Xelî-Elîkan in.** Cara yekêm li bajarê Lorî serokatî kirine û piraniya hozê wan li dora Gênce-Qerebaxê ne. Gurcî ji wan re Maxar-gerdzelî-dze- (zarokên mil dirêjan) dibêjin. Ew wek Kurdên Mamokiyan cara ewil ola xaçeperestiyê ji xwe re pejirandine. Paşê çûne ser Ortodoksiyê û bi Gurciyan ve ji heman olî bûne. Berî zayina Îsa û piştî zayina Îsa jî Kurdan serokatiya wan kirine (Daîret Mearîf el Îslamiye).

## MOXOL

Li destpêka 1200 an gelê Cengîz Xan ên Moxolî ji rojhilat û Asya Navîn bi armanca dinyayê bigrin destên xwe, derketin rê. Bê guman bi hatina wan ê rojhilat re gelek miletan zirar dîtin. Di serî de gelek Kurdan cîhê xwe terk

kirin, hinek çûn herêmên çiyayî û gelekan berdêla vê yekê bi can û malê xwe dan. Ew yeka ji bo miletên din wiha ye. Li hember wehşeta Moxolan kesekî nikaribû xwe li ser piyan bigire; tenê Kurdan ew êrîşên wan û hovitiya wan kêm kirin û carna jî têk birin. Bi taybet jî kalên Kurdên îro li dervayê welat dijîn, piranî bi şerê gerîlatî gelek zirar dan Moxolan. Gelo çawa ew weqas zirar dan gelan? Larsson dibêje: Mirov nikare şervaniya wan û hejmara hespên wan ên digihîşte nîv milyonî înkar bike.[76] Bi serhejmara xwe ya pir û bi hovîtiya ku wan dikir li ser gelan gelek bandoreka mezin dihîşt. Yanî gelên din, berî şer di warê psîkolojîk de têk diçûn.

Moxol hîn nehatibûn Kurdistanê şervaniya Kurdan bihîstibûn. Xanê mezin Mûnge, ji bo ku xaka Kurdistanê û xelifetiyê dagir bike birayê xwe Hulagû şand rojava. Talîmata ku daye Hulagû balkêşe: Yên ku ji te re stû xwar kirine re rind be, asiyan bipelçiqîne! Keleh û sûran hemûyan bi erdê re bike kavil. **Koka Lor û Kurdan bikole!** Kelehên wan eşkiyayên mîna Kerdeh-Kuh û Lembeh- şêr ên ku gerokan ditirsinin ji holê rake![65] Em nizanin ku ew kîna wan ji çi dihat.

Hinek nûser dibêjin êrîşên Moxolan di derdora salên 1212 an de[116-17]gihîştin Kurdistanê; tabî berî wê jî gihîştibû Kurdên li navenda Xorasan û herêmên din ên Kurd lê dijîn. Gelên li bajarên mîna: Ezingan, Erzirûm, Palû û dora wan deran, li deşt û dora çiyayan dijiyan, reviyan serê çiyan û nav daristanan; gelek jî çûn ser herêmên çiyayî yên mîna Ezinganê.[116-17] F. Sumer dibêje: di sala 1219 an de dora Seyhûnê girtin, li başûrê Seyhûnê ji êlên Tirkmenên koçer 10 hezar kes gîhandin hevdû û di fermandariya Taynal Noyan de şandin ser Harîzm. Di rê de, Tirkmenan serî hilda, berpirsiyar kuştin û Taynal jî di nav de gelek kes kuştin.[131-135] Sedema kîna wî ew bû an na em nizanin. Bi ser vê de Tirkmen reviyan Xorasan, Mêrv û Amûyê. Bi vî awayî Tirkmenên li welatê xwe mabûn bi piranî li Xorasanê civiyan.[131-135] Mumkune ku wana ewên ku Dîmîtrof qal dikine ne. Tirkmenên ji Seyhûnê hatibûn Merv û Nesayê, dibêjin ku 70 000 eskerên xwe hebûne.[131-146] Bi hatina Moxolan û hovitiya wan re gelek Kurd jî vekişîn çiyan û derbasî parastinê bûn; miletê ku li hember Moxalan sekinî tenê Kurd in. Ew êlên reviyabûn li çiyayên Ezingan, Dêrsîm, Akçadax û Mereşê bi cîh bûn. Ji alî Moxol, Îlhanî û Osmaniyan ve gelek zilm li wan hatin kirin û ew yên Sersor bûn.[127-19] Tê fêhmkirin ku ewên li çiyan hîna jî baweriyên xwe yên berê diparastine. Yanê wek Sersor yan jî Qizilbaş dijîne. Çîn, Afganîstan, Qeşmîr, Îran ketin destên wan û Cengîz di sala 1240-41 an de mir. Lawê wî Batû, ji 10 salan bi şûnde gihîşt Rûsya û rojhilatê Ewrûpayê.[76]

Selçûqiyên ku navenda xwe li Îranê bû, di dawiya sedsala XII an de belav bûn û şûna wan Herzem derketin holê. M. Emîn Zekî dibêje: Kurdên Zagrosan, di sala 1217 an de hêzên Herzemşahê ku ji Hemedanê şandibûn Bexdayê têk birin. Cengîz Xan jî di salên 1219-20 an de Harzem têk bir. Celaleddîn êrîşî keleha Axlatê kir, fermandarê kelehê yê bi navê Hecîp Hisamê

Kurd, qehremaniyek mezin nîşan da û keleh parast. Lê paşê Eşref Eyûbî, wî fermandarî bi dûr xist û di şûna wî de Îzzet Aydek şand, wî jî qehremanê Kurd kuşt.[19] Her çiqas sedem tunebe jî, li gorî dîtina me Eşref ji xwe tirsî ku Hecîp jê re bibe reqîb û ew dewleteka Kurd avabike. Celaleddîn dest bi revê kir û li herêma Mûşê qirkirinek pêk anî û ji bo vê xelk koçî Helebê kir. Di sala 1226-9 an de Celaleddîn ji ber Moxolan revî û xwe avêt bextê Kurdan, lê di 1231 an de ji alî Kurdekî ve hate kuştin. Yên din ku ji ordiya Harzem mabûn hatin aliyê Xarpûtê û ewderan talan kirin. Di sala 1230 an de Eyûbiyan bi Selçûqiyan ve li dijî Moxolan îttîfaq çêkirin û ew têk birin. Moxolan li alî Wan, Amed, Mêrdînê talan kirin û gelek mirov kuştin. Lê nikaribûn di aliyê Dêrsîm û Hewlêrê re têkevin hundir.[2]

Di derdora sala 1250 an de, aliyê Semsûrê kete bin destên Moxolan, gelên vî bajarî ji tirsan warê xwe terk kirin û xwe avêtin paş Memlûkan. Baybars bi wî gelî ve êrîşî Moxolan kir (1277) û ew têk birin.[109-3] Bi êrîşên Moxolan re gelek mirîtiyên Kurdan yên mîna Germiyan li vê herêmê jî belav bûn; bi vî awayî tevlîheviyeke mezin di nava Kurdan de pêk hat, ku hîna jî Kurd derdê vê yekê dikişînin. Moxolan ji vegera talankirina Ezerbeycanê şunda, êrîşî Ezinganê kirin û bajar bi erdê re kirin yek. Ji ber hovitiya wan, gelên herêmê û dewlemend reviyan Heleb û Sûriyê. Sûbaşiyên Meletî jî deriyê bajêr vekirin û reviya Helebê. Bi vî awayî, gel di sînora îro ya Tirkiyê û Kurdistanê de, yan çûn rojava, yan çûn çiya û yan jî xwe avêtin paş Memlûkan.

Di sala 1256 an de dema Kurdistan kirin bin destên xwe, ji ber vê yekê gelek Kurd li Meletî, Xarpût, Firat û Mûsilê bi cîh bûn. **Bi ser êrîşa Moxolan ve Qerekoyûnî jî di bin serokatiya Tûre Beg de bi 30 hezar konan ve hatin herêma Erzirûm û Dîgorê**. Ew ji êla Beranî bûn.[43] **Navê Qerekoyûn-Pezreşan ê kurdî Beranî** ye; sembola wan beran e û ji ber vê kevirên ku çêkirine jî hemû beran in, hatina wan gelek girînge ku emê li pêş li ser rawestin. Tiştê din ê balkêş, O. Tûranî bi xwe dibêje û her çiqas bixwaze veşêre jî ew nikare: **Di sala 1260 an de ev li Kurdistan û bakûre Sûriyê xuya dikin û piştî 100 salan bi şunde em wek Pezreşan dîsa rastê wan tên... Ew, ji berê Oxûzan yê Yaziranê û bi kurê Selçûq re şer kirin. Dema dewleta wan hilweşiya derbasî Xorasanê bûn û di bajarê bi navê Yazir ê bi xwe sazkirin de bi cîh bûn. Bi hatina Moxolan re beşek ji wan hatin Anadolê.**[43] Bi vî awayî em fêr dibin ku ji ber êrîşan ketin tevger û rêwîtiyeke dûr û dirêj.

Di dema Hulagû (1257) de jî, Kurd çûn ser çiya û ji dijîminên Moxolan re dia kirin ku bi serkevin. Moxolan êrîşî Kirmanşah kirin, gelek kes kuştin û bajar talan kirin. Dagirkirina Bexdayê bû sedema vala kirina Şehrîzor. Gorê Şahabeddin Omerî qal dike: Kurdên li wir koçî Sûriye û Misir kirin.[2] Divê ew Kurdên Lêk bin, piştre ewê disa berbi bakûrê Kurdistanê biçin. Eşîretên Lawan û Baban jî koçî Cizîrê kirin (dema min lêkolîn dikir, Kurdekî Şêxbizinî got: em ji Cizîrê hatine û hîn gundên li ser navê me li wir in). Êlên Kurd ên bi navê Laden û Badin ên li Cezayir jî, wê demê welatê xwe terk kirin.[2] Hulagû, di sala 1259

an de ji Ezerbeycan dîsa derbasî Sûriyê bû û Kurdên li Çolemêrgê hemû di şûr re derbas kirin. Bajerê Kurdistanê yek bi yek ji destê Eyûbiyan girtin û kirin bin desthilatdariya xwe. Hayton, di dema Abaka de ordiya Misir di sala 1278 an de li bakûrê Sûriyê 5000 malên Kurd bi dest xistin. Lê artêşa misilmanan ya ji Tirkmen û Kurdan pêk dihat, Kilîkya talan kirin. Êrîşên Moxolan hêza siyasî ya êlên Kurd ji holê rakir, Memlûkên Misirê ji bo ku ji Îlhaniyan xelas bin dixwestin ji Kurdan îstîfade bikin. Memlûkên desthilatdarê Misir û Sûriyê bûn, Moxol têk birin û heta Qeyserî pêşta çûn. Bi ser vê de Selçûqî bi Moxolan re bûn yek, gelên din jî bi hevre bûn yek.

Heleb û Şam heta sala 1260 an, Himus 1262 an, Hama 1341 an, di destê Eyûbiyan de bûn. Heta sala 1235 an Semsûr jî di destê wan de bû, paşê bi êrîşên Moxol û Selçûqiyan ji dest hate derketin. Di sala 1242 an de em dibînin ku li herêma Riha û Helebê 30 hezar xane (wargeh) Kurd hene û bi Eyûbiyan re hevkariyê kirine. Ew koçberana di bin serokatiya kurê Dawid de bûn, tenê ji beşekî ku ji ber Moxolan reviyabûn.[43]

Di dirêjiya dîrokê de, êrîşên Ereb-misilmanan û yên Tirkan hestiyê pişta Kurdan şikandin; Kurdan zirara mezin a sêyemîn jî ji Moxolan ditin. Wan bi komkujî û xwîn rijandina xwe, Kurdistanê ji serî heta binî di nava xwîn û agir de hîştin. Di serdema Moxolan de jî hîn beşekî Kurdan li Asya Navîn bûn. Bi hatina Moxolan re tenê Tirkmenên Mangişlakê zirar nedîtin; ew ne li ser riya wan bûn. Piraniya wan jî Tirkmenên Salûr bûn; ji her êlekê hebûn, lê herî zêde Eymûr, Doxer, Ixdir, Çavûldûr, Karkin, Salûr û Axar hebûn. Serokatiya wan jî Kilik, Kazan û **Qereman** Began dikir.[131-162] Bi bandora Moxalan ji Ezerbeycan û Xorasan koça duyemîn a mezin berbi Anadolê pêk hat. Li Eleşkîrtê 60.000 mal berbi Xelatê vekişî. Bi qasî wan jî ji Îspîr, Baybûrt û Pasînê berbi Ezingan, Sînop û Dîlok belav bûn. Tirkmenên ji ber Moxolan direviyan li hember Bîzansan hê bi cesaret bûn; ji Qastamonû û Çanqiriyê diketin sînorên Bîzansan. Rûm jî ji ber wan direviyan Îzmîtê. **Gor Îbn-î Saît, li Denîzlî 200.000, li Qastamonû 100.000 û li navbera Kutahya-Qerehîsarê jî 30.000 konên Tirkmenan hebûn.**[115-27] Careka din bêjim, ku dema Tirkmen tê nivîsandin gereg Kurd bê fêhm kirin. Kurdan xwe ji êr avêtine mêr û ji tirsa Moxolan bi Bîzansiyan re hîn xûrttir şerkirin û ketin nava Anadolê. Yekê jî, serhejmarên ku ji alî gerokên wê demê têne dayin jî mezinbûna koçê didin xuyakirin. Di sedsala X an de tê texmîn kirin ku nifûsa Anadolê 8-10 miljon bûye. Bajarê mîna Riha û Meletî nifûsa xwe digihîştin 35 hezaran.[23] Dema Moxolan jî texmînî 10-12 milyon dikare bibe, ku yên navê xwe li jor têne diyarkirin tenê, bi giştî dikarin du milyonan bibînin.

Nivîskarên Swêdî dibêjin: êrîşa Moxolan û ya Tîmûrlenk, ji bo Alanan bû felaketek; hinek ji ber revîn Macarîstan û bi navê As li wir navdar bûn, hinek ketin şer û hinek jî tevlî Moxolan bûn. Alan ji êleka Îskîtan e.[153-29] Wekî di beşên derbasbûyî de jî me diyar kiribû, Alan êleka Kurdên dimilî ye, ku têkiliyê xwe bi Macaran re çêbûne. Lê gor texmîna min, nûserê Kurdên li vê

herêmê giştikan bi navê Alan didine xuyakirin û ew nabêjin ku ew Kurd in jî, di Kurdbûna wan de ti guman nîne.

Moxolan, ji Erzirûmê heta Qeyseriyê 500 hezar; ji Bexda heta Qeyseriyê jî tevhev 6 milyon mirov kuştin. Ji bajarê Merv 1.880.000, Bexda 2 000 000, Semerqent 200 000 hezar kuştin.[17] Wekî dinivîsîn nebe jî, li gor nifûsa wê demê mirovên ji alî Moxolan ve hatine kuştin gelek in. Di sala 1257 an de Moxolan paytextê Medan Ekbatan (Hemedan) û di sala 1258 an de jî Bexda heynan û dawî dan birêvebiriya Ebbasiyan. Di sala 1300 an de Kurdan di bin serokatiya hukumdarê Mûsil Lolan Bedrettîn de li dijî Hulagû Xan serî hildan û 50 hezar mirov mirin. Kurdên ku dîl hatibûn girtin di bazaran de bi 12 dîrheman hatin firotin. Serûbineke mezin çebû û koçên mezin pêk hatin. Kurdên li Xorasan, Kirmanşah û Hemedanê hatin koçber kirin. Êla Kureso (Bawer dikim ev Zazayên li Aksarayê ne) bi Tataran ve ketin şerekî dijwar, şerê di bajarê Tanza de, Tatar rawestandin, lê paşê Kurd têk çûn û hatin Mêrdînê, paşe jî çûn Akşehîr û paşe jî çûn Dêrsîmê, herêma Zevê.[39]

Bi dîtina Burkay, bi van êrîşan re Kurd berbi rojava hatin leqandin. Bi vî awayî Kurd, heta Sêwas, Mereş, Qeyseriyê çûn û li Qonya û Enqerê koloniyên Kurdan çêbûn. Gor Kocadax jî, di vê demê de Tirkmenên Begdili û Afşar bi êlên mîna Qerehitaya û bi eşîren din ve, ji ber Moxolan mal û warê xwe terk kirin û çûn Anadolê.[17] Prof. Tûran jî dibêje: Tirkmen ji ber Moxolan bi komeke qasî 60 hezarî û di bin serokatiya Azad Mûsa de reviyan û zirar didan der û dorên xwe. Li Trabzon, Gurcistan, Axlat û heta Baybûrtê û Ezinganê belav dibûn. Moxolan di bin serokatiya Tokû Noyan de artêşek şandin û ew berbi Rojavayê Anatolê ajotin.[43] Gereg bê zanîn û me di beşên derbasbûyî de jî gotibû; ku Kurd berî Moxol werin jî li Navenda Anadolê hebûn. Bê guman Moxol bûn sedema gelek serû binbûna êl û zendan.

Ebû B. Tehranî agahiyên giranbiha radigihîne: Bavê Pezgewran ê VI an Îdrîs, di destpêka sedsala XIII an de hinek keleh û herêmên li Amedê birêvedibirin. Torinê Îdrîs, **Pehlîvan Beg jî serleşkere keleha Alîcaka li Nahçiwanê ye. Pehlîvan, bi zora waliyê Moxol Curmagun di sala 1330 an de çû rojavayê Anadolê.**[114-70] **Ji bo me girînge ku ew ji Aran hatine Amedê, ku îhtîmaleke ew kalên Têrikiyên îro bûn û ew êla Pehlîvanli** ya di dîroka Osmaniyan de derbas dibe ji wî begî tê. Pehlîvan, bi serokên Tirkmenên din ve li dora Bûrsa li hember Bîzansan tekoşîn da bişûnde vegerî Amedê. Lawê wî Tûr Elî (1300-1365) li pêş 30.000 konî beşdarî sefera Sûriye yê Gazan Xanê Moxol (1300) bû. Jêderên Memlûk dinivîsînin; ku di nava sedsala XIV an de, şaxekî êla Bayindirên (wek Dulqadir û Înal bû du şax) koçber ji Bûzûkî, Bayat, Doxer, Avşar, Bexdili, Eymûr-Remezan, Kinik û yên din ve li bakûrê sînorên Memlûkan (Misir-Sûriye) bi cîh bûn. Îhtîmaleka pir mezine ku Bayindiran piştre Akkoyûnlû-Pezgewr avakirî ji ber êrîşên Moxolan hatin van deran.[114-70] Ew êl û federasyon ê piştre bi navê Tirkmenên Heleb, Boz Ûlûs, Avşar û hwd bên xwendin.

Moxolên êrîşkar, Kurdistan û Anadol wek kaniya hebûnê dîtin û çi bidîtana ji holê radikirin û dixwarin; ew jî bû sedema hilweşîna wan. Yanî kanî ziwa kirin û dawiya wan ê siyasî jî bivê re hat. Nivîskarên tirk jî dibêjin: Li hember wê, Siltanên Selçûqiyên ku 200 sal berê Anadol ji bo xwe wek welat dîtin, êl hîşyar kirin û wan wek Moxolan nekir. Dema Oxûz hatin Anadolê dest navêtin gund û bajaran. Hêdî û bêdeng ketin nava rûniştvanên Anadolê û têkilî pêşxistin.[141-12] Wexta Oxûz-Kurd hatin, xwedî pez û dewlemendî bûn; ji bo ewlekariya xwe demeke kin li çiya jiyan û pezê xwe xwedî dikirin. Gor nivîskarên cûda radigînin bi hezaran pezên wan hebûne. Ne wekî nivîskar dibêje li ser hişyarkirina Selçûqiyan dest navêtibûn gundan û hebûna xelke.

Li hember Moxolan tenê Tirkmenên koçer li berxwe didan; Selçûqiyan nikaribûn niştecîhan û koçeran bigihînin hev û li hember Moxolan bisekinin; berovajî wê, li hember Tirkmenan bi Moxolan re bûne yek. Siltanê Selçûqî ketin bin desthilatdariya Moxolan bi şûnde, Tirkmen bi temamî li hember dewletê bûn asî. Ji ber vê, Hulagû di sala 1256-65 an de ferman da, ku Tirkmenan bi zorê bişînin cîhên din. Bi vê fermanê re, Moxolan derbên mezin li Tirkmenên Sêwasê, Qeyserî û Axaç-Eriyan xistin. Piraniya wan çûn Memlûk û xwe avêtin paş dewleta Misir. Îbn Şeddad radigihîne, ku di dema Siltan Baybars (1260-1277) de, ji 40 hezarî zêdetir malên Tirkmenan hatine. Ewe ji Gazzê heta Antaqya û Sîsê bi cîh kirine.[131-180] Ew belavbûn û fermana li hember Kurdan, roja îro, di belavbûna Kurdan de jî xuya dike. Kurdên li cîhên dûr belav bûne encama van êrîşên dîrokî ne. Îhtîmaleke mezine ku Kurdên çiyayê Elewî wê demê çûn.

Avcioglû îddea dike ku Kurd û Tirkmenan geliyê stratejîk girtin û li ber derbasbûna Moxolan bûn asteng. Keykavûs emir da, ku ji Kurd û Tirkmenan leşkeran kom bikin û kurê Şêx Adî yê Êzdî da birêvebirina bajarên mîna Meletî û Xarpûtê. Di şerê bûyî de Moxolan leşkeren Tirk û Kurdan têk birin. Keykavûs serleşkere jîr Elî Bahadir şand Meletî û Meletiyan Keykavûs naskir. Lê Elî Bahadir jî têk çû. Ebûl Farac jî dibêje, di sala 1243 an de Hulagû êrîş anî ser Meletî û gelê Meletî reviya Helebê.[48] Memlûk ku aboriya xwe baş û xwedî leşkeren baş bû, Moxol têk birin û beşekî girîng ê Anadolê tevlî xaka xwe kirin. Tirkmenên dijminên Moxol amadebûn, ku ji Memlûkan re hevkariyê bikin.[24] Di sala 1275 an de Begê began ê Amed û Xarpûtê yê bi navê Hatiroglû di nav hev de peyman çêkirin ku gazî Baybarsê Memlûkan bikin, lê ew nehat û di dawiyê de Memlûkan Moxol têk birin. Dewleta Ermeniyan jî bi Moxolan re hevkarî ji holê (1375) rakirin. Qaraca Beg li Elbîstanê dewleta Dulqadiran bi Memlûkan re girêdayî (1337) ava dike. Ew Tirkmenên ku qal dikin Kurd in û sempatiya Kurdan ya ji Memlûkan re sedema xwe yek jî ev e. Ji bo vê heta dema Yawûz herêma ku di destê Kurdên li dervayê welat de heta Meletiyê di destê Memlûkan de bû.

Kurdên li Sûriyê alîkariya Memlûkan werdigirtin û bi piştgiriya wan jî hebûna xwe parastin. Di sala 1279 an de Moxolan ji bakûrê Sûriyê û Kîlîkyayê

pênc hezar malbatên Kurd bi xwe re birin. Di dema Olcaytû (1308-1316) de navenda eyaleta Kurdistanê ji Baharê hate neqîl kirina Siltanabadê û eyalet xirab û bê îmar ma.[150-22] Di dema Olcaytû de, di nav artêşa ku Gilan dagir kirî de Kurd jî hebûn (1315). Ji demekê şunda kesekî bi navê Mûsa xwe mehdiyê Kurdên Şîî ilan kiribe jî, ji alî Olcaytû ve hate îdam kirin.[51] Tiştê balkêş ewe, ku Olcaytû Şîîtiya 12 îmaman qebûl kir ku ew jî bû sedem ku Tirkmen bi Moxolan ve nêzîkî hev bûn û pewêndiyen wan baş bûn.[112-10] Di dîrokê de, gelek caran tê dîtin, ku dema rêvebirê Tirk, Moxol û Osmanî diketine tengasiyê ola xwe jî diguhartine.

John E. Woods dibêje: **Hemû nivîskar, lêkolîner yekdeng in, ku hatina Moxolan wek xencereka berê xwe daye dilê Îslamê bû. Encama êrîşên Moxolan, Cengîz Xan û Tirkên hîna li rojhilat ew bû; ku Tirkmen û gelên din ên koçber, ji Asya Navîn; li Îran, Îraq, Sûriye û Anadolê belav bûn.**[114-14] **Ne tenê xencereka ser dilê Îslamê bû, ew li ser dilê hemû mirovatiyê bû; bi taybet jî li ser stûyê Kurdan. Bi êrîşa Moxolan re Tirkmenên li Xorasan, Maverannehîr û Turkîstanê rêviyan û hatin Anadolê.**[148-196] **Ew rastiyeke lê Tirkmen**ên ku tên qal kirin Kurd in. Êrîşên Moxolan di navbera salên 1243 –1335 an de (92 sal) pêk hatin û Selçûqî jî ji holê rakirin.[39] Tirsa Moxolan rabû şunda, li ser kelepûra Selçûqiyan 19 mîrnîşîn û dewleteka bi navê Eretna saz bû. Ji vana Kûtlûşahlar (1340-1393); Amasya û Dulqadirogullari (1337-1522), Elbîstan, Mereş, Qeyserî, Elezîz, Dîlok û Meletiyê, 17 mîrnîşin jî li rojavayê Anadoliyê hatin saz kirin. Ji wan mîrîtiyana piraniya xwe yên Kurdan bûn.

F. Sumer îddeayeka balkêş tîne: Tirkên mîna Ûygûr, Karlûk û Kipçak bi hatina Moxolan re heliyan; wan bi Moxolan ve qewmên nû anîn holê. Ozbek, Kazak, Qere Kalpak û Tirkên rojhilat ji vê peyde bûn. Tîmûr jî minakek ji wana ye.[131-162] Li ser Tirkbûna Karlûk û Kipçakan gumanên min hene, bi qasî min lêkolîn kirî, ew ne Tirk in. Ku ew Tirk bin yan jî Kurd (Ler û Goran) bin jî, di vê têzê de rastiyek heye. Mirov îro jî şopa vê yekê dibîne û gelek mirovên naşibin Tirkan, Kazakan û Ezeriyan hene û di nava sînorên wan dewletana de dijîn, ku di bingeh de ti têkiliya wan bi Tirk û Moxolan ve nîne.

## TIMÛR

Ji sîlîndira Moxolan ya ku ji ser gelan re derbasbûyî bi şunda, afata Tîmûr destpêkir û di demeke kin de gihîşt Kurdistanê. Di sala 1393 an de Mazenderan dagir kir û derbasî nava başûrê Kurdistanê bû. Bixwe êrîşî ser Loristan û Huzistan kir û heyna. Di sala 1394 an de hat bakûrê Kurdistan û Anatoliyê.

Vê demê li Ezinganê Mûtahharten desthilatdar e û bi dewleta Qadî Bûrhaneddin re tim di nava nakokiyan de ye. Mûtahharten yekser girêdana xwe pêşkeşî Tîmûr kir. Ji tirsa Tîmûr Meletî vala bû û Sûlî Begê Dulqadir qasid ji Tîmûr re şandin û ew teşwîqî heynana Sûriyê kir. Emîrên Dîvrîxî û Darende

reviyan. Êlên Tirkmen û Moxol (Hûn vê yekê wek Kirmanc û Lor/yan jî Zaza fêhm bikin) koç kirin (jêder: Bezm û Remz).[35] Tîmûr, hate ber Sêwasê û got: Eger ew teslîm bibin ez sozê didim ku xwîn narije. Sêwas teslîm bû. Tîmûr soza xwe girt xwîn nerijand, lê kort kolan û bi hezaran gel bi zindî kire wan çalana ku soza xwe bila were şûnê.[89-29] Dema hate Sêwasê Ahmet Celayir û Qere Yûsûf ji ber revîn Helebê; ji wir jî revîn ba paşayê Osmaniyan Beyazît. Di sala 1400 an de berê xwe da Sûriyê û Misirê. Di heman salê de nêzîkî Helebê bi Misriyan ve şer kir û Misrî ji ber hovîtiya Tîmûr reviyan û Heleb kete destê Tîmûr. Di sala 1401 an de Tîmûr tê Wêranşehrê, li wir dibêje: " Kevir li ser kevir, serî li ser mil mehêlin!" û bi rastî jî gotina xwe tîne cîh û bajarê ji 40 hezar mirovan pêk dihatî, kes namîne.[93-56] Ji wan mînakana jî diyare ku Tîmûr li Kurdistanê û cîhên ku Kurd lê dijîn komkujî û wehşêten mezin pêk anîne. Bê guman ew jî dibe sedema ku gel ji şûn û warên xwe barkin herin derên çiyayî, cîhên dûr yan jî têkevin bin desthilatdariya hêzên mezin.

Bi vê re girêdayî û ji bo babeta me R. Bîlaaga niqteyeka balkêş destnîşan dike û dibêje: Li destpêkê Tîmûriyan û paşê jî Pezgewran gelek Tirkmen û Beranî ajotin Ezerbeycanê. Dema Tîmûr di sedsala XIV an de ji sefera Anadolê vegeriya; Oxûzên di dema Selçûqî, Harezmşah, Moxolan de ji Îran çûbûn Anadolê, Sûriyê û Balkanan vegeriyan Îran û Ezerbeycanê.[95-92] Di vê serdemê de jî tê îspat kirin; ku dema hêzên xwînxwar êrîşî ser welatê Kurdan dikin, ew dibe sedema koçberiyên mezin. Bi vî awayî jî hinek êl bi temamî hinek jî bi parçe parçe barê derên din dikin. Encamê ve jî îro berbi çav e...Ew êlên Kurd ku ji Anadolê derketibûn ê piştre dewleta Safewî damezirînin. Tevgera Şah Îsmaîl di saya wan de li jiyanê ma. Vana komên mîna: Şamî, Ûstacaî, Rûmî, Mûsilî, Qaçar, Qereman, Afşar, Zulqadir, Kawî, Gûzan, Tekeî, Baharî, Bexdilî, Çegenî, Pûrnak...hwd bûn.[95-92] Parçeyên van êlêna îro em li Anatoliya Navîn, Xorasan, Qefqasya, rojavayê Kurdistanê û li Sûriyê dibînin.

Ji êrîşên Tîmûr, Asûrî û Suryaniyan jî para xwe girtin. Layard dibêje: Ji Hulagû bi şûnde, Tîmûrlenk bi nefreteka mezin êrîşî Asûriyan kir. Ji bilî yên ku xwe avêtin kelehên li Kurdistanê, ku nayê dagirkirin, hemû hatin kuştin. Ji sala 1413 an de bi şûnde, ji bilî Kurdistanê li ti cîhên din qala dêrên Nastûrî nayê kirin.[68] Bi dîtina min ew tespîteke raste. Asûrî û Suryaniyên li bakûrê Kurdistanê mane piranî ji vê serdemê ne.

# JÊDER Û ÇAVKANÎ


1. Tarîh Îçînde Haymana-Halîl Îbrahîm Uçak-1986-Ankara-H. Yardimlaşma Dernegi no1.
2. Kürtler ve Kürdistan-V. Minorsky,Th. Bois,D.N.Mac Kenzie-Doz-96-Çev.Kamuran Firatli
3. VII-X yy. KÛRTLER-Arşak Poladyan-Oz-Ge-1991-Ankara-Çev.Mehmet Demîr
4. Îslamiyete Kadar-Kurdistan Tarîhî- Cilt 1 E. Xemgîn
5. Lêkolîn-6. Dr. Cemsit Bender-Înstîtuya Berlîn
6. Antîk çagda Kürt Tarîhî-Torî
7. Kürt Tarîhî ve Uygarligi-Dr. Cemşît Bender-Kaynak yayinlari-1991
8. Kürtlerin Tarîhi-Dr. Fritz-Çev. Sînan Şanlier-92-Îst.Hasat Yayinlari
9. Dîroka Kurdistan bi kurtebirî-Ekrem Cemîl Paşa-În.K.Bruxselê-1995
10. Tarîh ve Uygarlik-Anadolu,Kurdistan,Mezopotamya-Şerefxan Cizirî-Rewşen-1992
11. Kürt kokenî Buyuk Boylar-Welatê,Nêrgiza TORÎ-Koral-1991-Îstanbûl
12. Kürtler- Sosyolojik ve tarihi Inceleme-Bazîl Nikitin- Cilt-1-2 Deng-1994-Îstanbûl
13. Mervanî Kürtlerî Tarîhî-Ibn'ul- Ezrak-M.Emîn Bozarslan-Koral-1990-Îstanbûl
14. Geçmîşten gunumuze-Kürtler ve Kurdistan-Cografya, tarîh, edebiyat- K. Burkay-Deng1992
15. Malatya Baliyan Aşîretî-Hasan Nedim Şahhuseyinoxlu-1991-Îstanbûl.
16. Çend Rûpel ji Dîroka Gelê Kurd-Dr.Mezher Ehmed-Elîşêr-Stockholm 1991-APEC
17. Doguda Aşîretler, Kürtler, Alevîler-Bûrhan Kocadax-ANT-1992-Îstanbûl
18. Anabasîs-Xenephon
19. Kurdistan Tarîhî-M. Emin Zeki-Beybûn-1992
20. Urfa Haçli Kontlugu Tarîhî (1098-1118)l. Cilt-Prof.Işin Demirkent-Turk Tarih kurumu Basimevi-1990-Türk Tarih Kurumu Yayinlari
21. Kürt Gerçegi-olaylar,Oyunlar,Çozûmler-Zekeriya Yildiz-Yeni Asya Yayinlari-1992
22. Kürt Aşiretleri Hakkinda Sosyolojik Tetkikler-Ziya Gokalp-Sosyal Yay.-Hazirlayan, Şevket Beysanoglu.
23. Türklerin Tarîhî-Dogan Avcioglu-IV.Kitap-Tekin Yayinlari-1984
24. Türklerin Tarîhî-Dogan Avcioglu-V. Kitap-Tekin Yayinlari-1984
25. Erzincan-Ali Kemali(eski vali)-Kaynak Yayinlari Îstanbûl -1992
26. XIX: YY: da Osmanli Imp. Kürtler-Dr.Celile Celil-Ozge Yayinlari-Anakara-1992
27. Tarih Içinde Anadolu Sakinleri ve Isyanlar-Ayaklanmalar-Abdulhadi Toplu-Ocak Y.Ankara-1996
28. Osmanli-Rus ve Iran Savaşlari'nda Kürtler 1801-1900-Avyarov-Osmanlicadan Muhammed (Hoko) Varli(Xanî)-Sîpan Yayinlari-Ankara -1996
29. Batili Seyahlarin Gozuyle Kürtler ve Kurdistan-I.Şerîf Vanly-Avesta-1997
30. Çagdaş Kurdistan Tarîhî-Lucian Rambout-Firat-Dicle Yayinlari-1992-Îstanbûl
31. Anadolu Beylikleri-Prof.Îsmaîl Hakki Uzunçarşili-TTKY-Ankara-1988
32. Dîroka Dugelên Kurdan 600-1500 Cilt I-Abdullah Memê Mehmed(Hoko)Xanî Varli-Sîpan-1997
33. Yezidilik ve Yezidilerin Kökeni-Erol Sever-Berfin-Îstanbûl-1993
34. Kurdên Haymana-Georges Perrot-Fawaz Husên-2000-apec
35. Anadolu Beylikleri Hakkinda Araştirmalar II. - Prof. Yaşar Yucel, Türk Tarih K.- 1991
36. Xorasan Kimin Yurdu? Faîk Bulut- Berfin-1998-Îstanbûl
37. Atalarin Karşilaşmasi-Derbend ve Şervan Ûlkesinde Kürtler ve Alanlar-Cemal Reşîd Ahmed-Avesta-werger ji Erebî Siraç Direk 1998, Îstanbûl.
38. Med Imparatorlugu Sonrasinda Kürtler- Tori-Aram yay. 1999- Îstanbûl
39. Kürtlerin Tarîhî ve Cografyasi Hakkinda bir Araştirma-Kazim Yeşîlgoz- 1996 Ankara
40. Ali'siz Alevilik-Islam'da Ozgurluk Arayisi-1,Faik BULUT-Berfin-Îstanbûl-1998

41. Babek- Said Nefisi- Berfin-1998-Istabul
42. Kürt Kulturunun Kaynaklari ve Uygarliklar Beşîgî Kurdistan- J. Kurdo- Ozge yayinlari-1993 Türkçesi:Huri Tuşik Ozkurt
43. Dogu Anadolu Turk Devletleri Tarîhî- Prof. Osman Turan-Bogaziçi Yayinlari-4. Baski
44. Genel Kurmay Belgelerinde Kürt Isyanlari 3- Kaynak Yayinlari- 1992
45. Hîwa- Nr 24 -Lêkolînek di rengên ola kurdî ya kevin de- Dilşa Yusif, O.Politika
46. Hurriyet-2. Şubat.2001-Cuma
47. Gurculer- David Marshall Lang- Ceylan- Nesenur Domanic-1997-Îstanbûl
48. Abul-Farac Tarîhî-1-Gregory Abu'l-Farac-Ömer Riza Dogrul-1987-2.Baski-Türk Tarih
49. Kürtlerin Kökeni ve G. Anadolu Gercegi-M. Sadi Kocas-1990-Kastas yayinlari
50. Êzidiyatî-Ola Êzidîyan-Xidirê Silêman, Xelîlê Cindî-Avdar-1995
51. Kürtler-Minorsky-Koral yayinlari-Îstanbûl, 1992
52. Aleviligin Kokenindeki Mazda Inanci ve Zerdûşt Ogretisi-E. Xemgin-Berfin-1995
53. Mazda Înancindan Alevilige .I. Etem Xemgin- Mezopotamya Yayinlari-2000
54. Eskiçagda Harran-Aynur Özfirat-Arkeoloji ve Sanat Yayinlari-1994
55. Urartu Kraligi Döneminde Elazig(Alzi)Kemalettin Köroglu-Arkoloji sanat Yay.-1996
56. Yzb. Frederick Burnaby-Kucuk Asya Seyahatnamesi,Anadoluda bir ingiliz Subayi 1876-Sabah Kitaplari 1998-Ceviren Meral Gaspirali
57. Ünlü Kürt Bilgin ve Birinci Kuşak Aydinlar-Mehmet Kemal Işik(Torî)-Sorun yay.-2000
58. Tarihselden Guncele Kürt Gerçexî- Mehmet K.Işik( Torî)-Sorun yy.2000
59. Kürtler ve Kurdistan Tarîhî-1- Botan Amedi-Firat-Dicle yy. 1991-Îstanbûl
60. Alevi Kürtler- Erdal Gezik- Kalan Yayinlari
61. Diyabakir- Dr. Ilhan Akbulut- Tukelmat AŞ. 1996-Izmir
62. Çerkes Tarîhî-Hayri Ersoy-Aysun Kamaci-Tumzamanlar Yayincilik-1994-Îstanbûl
63. Kürtler-Kreyenbroek-Sperl-Cep-Belgesel-1994 Îstanbûl
64. Suryanilerin Kokeni ve Türkiyeli Suryaniler-Yakup Bilge-1991- Îstanbûl
65. Kürt Milliyetciliginin Tarîhî- Wadie Jwaideh-Iletişim Yayinlari-1999-Îstanbûl
66. Atlas över mänsklighetens Historia-Bonniers
67. Historia med nya ögon-Anfang Förlag-1996- Stockholm
68. Ninova ve Kalintilari-Austen Henry Layard-Avesta,Çev. Zafer Afşar-2000
69. Bonniers Varldshistoria- I, II Flodrikena- Bonnier-1982
70. National Geographic- Nr; 4 Solens Faraoner -2001
71. Zerdüst-Proto-Kürt bir peygamber-M. Siraç Bilgin, Rewsen-1997-Stockholm
72. Sumer Rahip Devletinden Halk Cumhuriyetine Dogru-Cilt I-Abdullah Ocalan Weşanên Serxwebûn 108- Ekim . 2001
73. Boken Om Vikingarna-Catharina Ingelman-Sundberg-Prisma- 1998-Stockholm
74. Svensk-Kurdiska Kontakter Under tusen or- Rohat Alakom-2000-Apec
75. Sumer Rahip Devletinden Demokratik Uygarliga- Cilt II- Abdullah Ocalan Mezopotamya Yayinlari 108- Ekim . 2001
76. Svarta Havet-Neal Ascherson-Ordfront-Veger: Lars G. Larsson-Stockholm 1999
77. Selahdînê Eyûbî-Cankurd-Helvest-Stockholm, 2000
78. Dogu Anadolu da Aşîret Duzenî-Ahmet Ozer-1990-Boyut
79. Sumerli Ludingirra-Muazzaz Îlmîye Çig, 3. Baski-Kaynak Yayinlari-2000
80. Hîtîtler ve Hattuşa-Muazzez Îlmîye Çig, 2. Baski-Kaynak Yayinlari-2000
81. Îbrahîm Peygamber-Muazzez Îlmîye Çig-2. Baski-Kaynak Yayinlari-2000
82. Osmanli Devletî Tarîhî-I cîlt-Zaman Yayinlari
83. Ma'rûzat-Ahmed Cevdet Paşa-Dr. Yusuf Halaçoxlu-1980
84. Herodot Tarîhî-Herodotos, Remzi Kitabevi, 1991, M. Ökmen
85. Adiyaman-Însanligin Kultur Mirasi-Mehmet Akar-2000
86. Şahname-Firdevsî-Cîlt I, 1956-Îstanbûl
87. Arya Uygarliklarindan Kürtlere, Selahaddin Mihotuli, Koral-1992

88. Padîşah Analari-Alî Kemal Meram, 1997-Ankara
89. Türkistanli Bir Türk Boyu KÜRTLER, Aydin Tanerî, T.K.A.Ens.-1983-Ankara
90. Osmanli Împaratorlogunda Aşîretlerîn Îskani, Cengîz Orhonlu,Eren Yay.
91. Anadolunun Îlk Sakînlerî KÜRTLER-Şukru Kaya Seferoglu-T.K.A.Ens. 1982 Ankara
92. Dûnden Bugûne Yenîce ve Şexbizinlar- E. Yurtdaş, H. Çeker, Faîk Coşkun-2003
93. Gecmîşten Gunûmûze Vîranşehîr-Hasan ÎDÎKÜRT-2000-Mersîn
94. Kürtlerîn Îlkçax Tarîhî-Torî, Berfîn yayinlari-2000
95. Handbook Of Iranian Peoples-Rafael Blaga-1997
96. Evliya Çelebî Seyahatnamesî 1-VI Cîld, 1944, Reşat E. Koçu-Türk T. Serîsî
97. Kanunî Devrî Malatya Tahrîr Defterî (1560)-Doç. R. Yinanç-Doç. M. Elîbuyuk/1983
98. Abbasîler Donemî-Prof.Îhsan S. Sirma-1993-Îstanbûl
99. Dogu Anadolu Hakkinda Sosya Kulturel bir Arastirma-Doç Mehmet Eroz-1972
100. Osmanli-Safevî Donemînde Kurdîstan Tarîhî-E. Xemgîn-Cîlt III-1991
101. Îslamîyetten Osmanlilara Kadar Kurdîstan Tarîhî-Cîlt II- E. Xemgîn,1989-Koln
102. Welatê Me- Faysal Daxli, Weşanên Mezopotamya
103. Türkîye dekî Tarîhsel Adlar- Bîlge Umar
104. Dogu Anadolu da Dil-Onomastik Îlîşkîlerî Uzerine bir deneme- Edip Yavuz-1983
105. Abbasîlere Yonelik Dinî ve Siyasî Îsyanlar-Cem Zorlu, Ankara Okulu, 2001
106. Cenupta Türkmen Oymaklari-I-Alî Riza Yalman, 1977- Ankara-Kûltûr Bakanligi
107. Cenupta Türkmen Oymaklari-II-Alî R. Yalman, 1993
108. Asîretler Raporu-Çok Gîzlî-Kaynak Yayinlari-1998
109. XVI yy da ADIYAMAN-Sosyal ve Îktîsadî Tarîhî-Mehmet Taşdemîr-1999
110. Kara Koyunlular-I-Başlangiçtan Cîhan-Şah a kadar- Prof. Faruk Sumer-1992
111. 387 Nolu Muhasebeî Velayetî Karaman ve Rûm Defterî-I-(1530, Ankara 1996
112. Safevî Dev. Kuruluşu ve Gelîşmesînde Anadolu Türklerînîn rolu.Prof- F. Sumer
113. Kürt Milan Aşîret Konfederasyonu-Eyup KIRAN-Elma, 2003
114. Akkoyunlular-Aşîret,Konfederasyon, Împ. John E. Woods, Mîllîyet-1993
115. Anadolu da Türkmen Aşîretlerî-Bozulus-1540-1640-Dr Tufan Gundûz, 1997
116. XIX yy Îkîcî Yarisinda Dersîm Sancaxi, Doç. Îrahîm Yilmazçelîk-1999 Elazix
117. 387 Nolu Muhasebeî Vîlayetî Karaman ve Rûm Defterî- II- (1530) , 1997 (Amasya, Çorum, Sivas-Tokat, Kara-hîsarî Şarkî, Canîk, Malatya, Gerger-Kahta…)
118. XVI yy da Çemîşgezek Sancaxi, Prof. M. Alî Ûnal, TTK-1999 – Ankara
119. Îşte Anadolu-Omer Tuncer, 1999 Îstanbûl
120. Adiyaman Îlî ve Îlçelerî, Mustafa Sucu , 1986- 2. Baski
121. SINCIK, Ekrem Îzî-Malatya 2000
122. Temel Ozellîklerîyle Kizilbaş Alavîlîk (Talîbîn El Kîtabi) Haşîm KUTLU
123. 12 Îmam ve Alevîlîk-Cemşîd Bender-Zulfikar Yayinlari-5. Baski-1977
124. Alevîlîk Bîr Sir Dexildir-Alî Haydar Cîlasun-1995
125. Kizilbaşlixin Felsefî Dayanaklari-E. Erîp, S. Guven, A. Kilavuz, A. R. Bîlgîlî-Zulfikar Yayinlari-1997 Koln.
126. Şarktan Her Zaman Guneş Dogmaz-Rohat Alakom-2003-Apec
127. Dogu Îllerî ve Varto Tarîhî-M. Şerîf Firat-T.K.A.Enst. 1983 Ankara
128. Dogu Aşîretlerî ve Emperyalîzm- Dr. Mahmut Rişvanoxlu-T.K. Yayini-1978
129. Kose Paşa Hanedani-Necdet Sakaoxlu-Yurt Yayinlari-1984
130. Selçuklu Tarîhî (511/1118), Dr. Abdûlkerîm Ozaydin-T.T.K. Yayini-1990
131. Oxuzlar, Prof. Faruk Sumer, T. D. A. Vakfi-1999 , Stenbol
132. Çîyayê Kurmênc û Tevgera Murûdan- Roger Lescot- 1993 Swêd
133. Yalan Soyleyen Tarih Utansin-Mustafa Mûftûoglu, IV Cîlt- 1985
134. Dîvanû Lûgat-ît-Turk Tercûmesî-Cîlt I-Besîm Atalay-1985- TDKY
135. Dîvanû Lûgat-ît-Turk Tercûmesî-cîlt III- B. Atalay
136. Tarîh-î Cevdet-Ahmet Cevdet Paşa-Cîlt I –Hîkmet Neşrîyat

137. Diyarbakir Tarîhî-Cild I- Şevket Beysanoglu-Ankara 1987
138. Diyarbakir Tarîhî-Cild II-Şevket Beysanoglu-Ankara 1987
139. Bîrnebûn-Hêjmar 26- Lêkolîn-Zorabê Bûdî Aloîan-2005
140. Rewanduz Kürtleri- Edmund R. Leach- Çev: S. Birwan, H. Ozsoy, Ruken Şengul-2001 Aram Yay.
141. Dîyarbakir Evlerî-Orhan Cezmî Tuncer-D.B.B. Yay. 1999
142. Kürtler(Îslam Ansîklopedîsî cîlt VI sf 1089-1114)-Belge 2, sayi 2-Komela Çanda Gelê Kurd li Stockholm-1982
143. Cîhanbeylî 1987-Alî Fuat Belgîn Endûstrî Meslek Lîsesî
144. Bîrnebûn-18- Araştirma-2002
145. Hiwa-No 131-Heypeyvîn bi Kelîmullah Tewehûdî re-2005
146. Dulkadir Beyligi-Prof. Refet Yinanç, TTK 1989 Ankara
147. Osmanli Devletî-1600-1908, Sîna Aksîn, Metîn Kunt-Cem 1990
148. Lîse Tarîh 1-Kemal Kara-Onde-2002-03 MEBTTKB
149. Tarih Lise II-prof. K.Y. Kopraman-MEB-2002
150. Türk Beylîklerî-Osmanli Belgelerî île Kürt Türklerî Tarîhî, Nazmî Sevgen-1982
151. Belge ve Tutanaklariyla Dersim Direnişlerî-M. Kalman
152. Skyterna-Herodots/ Suzanne Unge-1979
153. Guldet Fron Steppen-Aron Andersson, Ann Sandwall-Historiska Museum-1979
154. Kürtler-Mehrdad R. Izady-Doz
155. Osmanli Imp. Derbent Teşkîlati-Cengîz Orhonlu-Eren- 1990
156. XVIII yy Osmanli Imp. Îskan Sîyasetî ve Aşîretlerîn Yerleştîrîlmesî- Prof. Y. Halaçoglu-1991
157. Şerefname-Tarîxa Kurdîstanê ya kevn-Şerefxan Bedlîsî-werger: Z. Avci, APEC
158. Bîr Kabile Aîlesînîn Tercûmeî Halî ve Necîp Şahîn in Hatirati
159. Meleklerîn Kûllerînden-Andrew Collîns-Avesta, çev: Zafer Avşar
160. Osm. Imp. Oymak,Aşîret ve Cemaatlar-Cevdet Turkay, Tercûman yy-1979
161. Anadolu'da Turk Aşîretlerî (966-1200), Ahmet Refîk-1930 Îstanbûl
162. Osmanli Tarîhî-II-Ahmet Cevdet Paşa, Hîkmet
163. Osmanli Tarîhî-III- Ahmet Cevdet Paşa-Hîkmet yy
164. Koçgîrî Ulusal Kurtuluş Hareketî-Evîn Aydar Çîçek-1999-APEC
165. Îç Anadolu Kürtlerî-Nuh Ateş, Komkar 1992
166. Moltke nîn Turkîyê Mektuplari-Feldmareşal Helmuth Von Moltke-Hayrullah Ors
167. Dogu Anadolu da Goçebe Kürt Aşîretî-Îsmaîl Beşîkçî-Yurt 1992
168. Tarîh Enstitûsû Dergîsî-13, Î. Şahîn, Osmanli Dev. Aşîretlerîn Îsîm almalari –1987
169. Tarîh Dergîsî-33, 1638 Bagdat Seferînde Zahîre Nakline Memur Edîlen Yenî Îl ve Halep Türkmenlerî-Îlhan Şahîn 1982
170. Tarîh Enstitûsû Dergîsî-12, XVI Asirda Halep Turkmenlerî-Î. Şahîn 1982
171. Orta Anadolu dakî Aşîretlerîn Îskani, Dr. Abdullah Saydam-1993 Samsun
172. Encyklopaedia Iranica-Ehsan Yarshater-II/5-New York
173. Bîrnebûn-I, Hugo Grothe nîn Seyahatnamesî, Mehmet Bayrak-1997
174. Bîrnebûn-III-Celikan Aşîretî-Muzaffer Ozgûr
175. Bîrnebûn-IV- Orta Anadolu Ax. Kürt Motiflerî-M. Bayrak-1998
176. Rişvan Aşîretînin Cemaat,Şahis ve Yer Adlari Ûzerîne bîr degerlendîrme- Yrd. Doç. Faruk Soylemez-K.Maraş Sûtçû Îmam Unîversîtesî
177. Camî'yê Rîsaliyan û h'ikayetan-Cankurd
178. Bîrnebûn-11-Yunak Kürtlerî-Kenan û Muzaffer
179. Bîrnebûn-19-Orta Anadolu da îlk Kürt Koyu-Rohat Alakom
180. Bîrnebûn-21-Aşîretler Raporu-Dr Mikaîlî
181. Bîrnebûn-23-Tarîxa eşîra Miakîlîyan li Polatli ye-Dr. Mikaîlî
182. Veger-6-Qoçgirî Bolgesîndekî Zeriqîler-Yusuf Zerikî-2003

183. Veger-7- Qoçgirî Bolgesîndekî Zeriqî Aşîretînîn Tarîhî ve Kokenî-2004
184. Det Dodsdomda Folkets Saga-M. Anholm-1906 Stockholm
185. M. Bûyûk Îskender-Milliyet-Çevîren: Încî Aslier
186. Ûlkede Gundem-2005.12.22 Prof. Baskin Oran île Roportaj-P. Selek
187. Şehname-Cîld II-Fîrdevsî-Verger Necatî Lugal-1992 Îstanbûl
188. Aventyr Bland Türkar och Araber- Alexis Kuylenstierna-1912 Stockholm
189. Ozgur Polîtika-5000 yillik şehîr bulundu-Tahsin Oruk-22.01.2005
190. Veger-V- Nivîskar: Abd Al Azîz Omer Hacî Mûsa-Verger: Dr. Xalid Hamza
191. Afyonkarahisar Yoresi Türkmen Mezar Taşlari-M. Seyirci, A. Topbaş
192. H. Tarîxê Kurden Xorasanê-Cild I , K. Tewahuddî-Meshed
193. H. T. Kurdên Xorasanê-Cîld II, K. Tewahodî-Meşhed
194. Ozgur Politika- Zeynep YUCE- 26. Temmuz. 2002
195. Êl û Koçerên Îranê, Îreç Efşar Sîstanî
196. Ship and Society- Gunilla Larsson-Uppsala Universitet -2007
197. Hereketa Tarîxî ya Kurd li Xorasan-Ûstad Rahnêma Dr. Behrewan.
198. Prisma Världshistoria-Joseph Reither
199. Bazil Nikitin- Kurtler

*Gelo mirov dikare fêhm bike ku parçeyekî êlê li Xorasana Îranê, parçeyekî li Lazqiyê û parçeyek jî li Navenda Anatolê? Çawa dibe ku perçeyek ji êlê xwedî ola Zerdeştî, yek Elewî-Sersor, yek Şia û yek jî Sunnî ye? Ew ji tirajediyê jî zêdetir e; şîne şîn! Şîna Kurda ye. Navê pirtûkê bibûya Şîna Kurdan belkî hîn rastir jî bibûya.*



ISBN
91-976130-2-7
978-91-976130-2-0